


Nûrî Şemdîn

# ZEVIYÊN SORO

Stockholm 1988

Publishing House of Kurdistan
Editor: Hanefi Celepli
© Nûrî Şemdîn
Printed in Sweden
by APEC Tryck & Förlag
Stockholm 1988
ISBN 91–87096–03–X

**Nûrî Şemdîn**

# Zeviyên Soro

**roman**

**Weşanxana Kurdistan**
Stockholm 1988

## Pêşgotin

Ez tucara nefikirîm ku ezê rojekê romanekê binivîsim. Lê belê min ji xwendina roman, çîrok û tiştên dîrokî hez dikir û di xortaniya xwede, mînanî gelek xortan, min jî çend helbest nivîsîn.

Min demekê jî, miqale û nivîsên polîtîk ceriband. Lê bi awakî amatorî bûn. Tucara doza nivîskariyê nehate bîra min, ez ji vê yekê pir dûrim.

Lê belê, jiyan dewlemende, pir tiştan tîne pêşiya merivan. Dema ku em gelek kurd di girtîgeha Diyarbekrêde bûn, di navbera îdara girtîgehê û girtiyande gelek caran bûyerên ne xweş pêk dihatin. Îdara zîndanê li girtiyan zorbetî dikir, em jî li dij derdiketin. Carna jî girtiyên ciwan, "ciwantî" dikirin, bûyerên neçê dibûn. Carekê, di bûyereke wehade, hemû pirtûk û kovarên me ji dest me girtin û hemû tiştê çapemenî ji mere qedexe kirin. Tenê name me dikarîbû binivîsanda. Min jî herroj, bi mebesta nivîsîna naman kaxez kirîn û destbi nivîsîna vê romanê kir. Ev romana di destê wede, min di heşt mehada nivîsî. Zimanê romanê bi tirkî bû, min çiqas xîret dikir jî, zimanê min kevn bû, ez carekê wisa hîn bûbûm. Ez dizivirîm, min careke din roman dixwend û zimanê xwe nû dikir.

Piştî ku em ji hepsê derketin, du weşanxaneyên ku min nasdikirin, xwestin romana min, "Zeviyên Soro" bi navê "Soro'nun Topraklari" çap bikin. Lê belê, rengên grûptiyê li ser wan dostan hebûn, min nedix-

wast ku rengekî grûptiyê li ser min hebe. Lewra jî romana min çapnebûyî ma.

Piştî ku cunta leşkerî di 12-ê îlona 1980-îde dest danî ser îdara dewletê, ez mecbûr bûm ku ji welêt derkevim, min ew romana jî derxist. Ji bo ku piraniya kurdên Tirkiyayê rehet bixwînin, min dixwast ku romana xwe bi zimanê tirkî çap bikim. Lê belê hevalê min Hanefî Celeplî bala min kişand ku vê romanê bi kurdî çap bikim. Hanefî bi kurtî digot: "Gerek herkes li gora taqeta xwe hewl bide ku çand û zimanê gelê xwe pêşde bibe. Di destpêkêde dibe ku tiştên gelekî giranbiha ji destê merivan neye, lê paşê hêdî hêdî ev kêmasî ji holê radibin. Deynê hustuyê her rewşenbîrê kurd eve ku xizmeta çand û zimanê xwe bikin."

Ez niha li pêş we, sipasiyên xwe pêşkêşî Hanefî dikim ku ev tiştê girîng anî bîra min û min jî di salekîde, di nava karên xwe yên dinêde ev romana ji nûve bi kurdî nivîsand.

Ji bo ku zimanê kurdî li Kurdistana Bakur zêde nehatiye karanînê, dema ku min destbi nivîsandinê kir, min dît ku ev kara çiqasî zehmete. Lê herweha ez pê hesiyam ku zimanê kurdî çiqasî dewlemende. Li welatê me, li her herêmê zaravakê bi kar tînin. Ev yeka dewlemendiya zimanê kurdî nîşan dide.

Min "Zeviyên Soro" bi zaravê Serhedê dinivîsî, hevalekî ku kurdî rind dizane, rojekê rûpelek ji romanê xwend û bi nîvhenekî gote min: "Kekê, kî ku romana te bigre, gerek tu biçî mala wan û romana xwe ji wanre bixwînî." Lê dîsa jî min karê xwe berdewam kir.

Çawa min li jorê diyar kir, ez doza nivîskariyê nakim û kêmasiyên min gelekin, lê ez ji xwendevanan hêvîdarim ku van kêmasiyên min bêjin û binivîsin. Eger mecala min çêbe, ezê "Zeviyên Soro" bi tirkî bi navê "Soro'nun Topraklari" çap bikim.

Ji çûyîna romanê jî tê xuyanê ku şerê "Zeviyên Soro" berdewame, ketiye rewşeke nû. Ez dixwazim wê rewşê jî binivîsim, lê di nava karên rojînde wisa ne hêsane.

**Nûrî Şemdîn**

## – I –

Ûsiv axa ji kurê xweyê biçûkre got:

— Kuro, here Şukriyê nobedar bibîne, bira zû bê vira.

Ûsiv axa, te digot barê hemû dinê li ser wiye. Bi pirçî, çav û rûyên wî tevlîhev bûbûn. Çavên wî çilmisîbûn. Çima wilo bû? Heta niha qet weha nebû bû. Wî benz avêtibû, sê – çar roj çûbûn hê wî rûyê xwe kur nekiribû. Nesitirî û di rewşek dinde bû.

Têgêhiştibû, ku ew çend mehin di rewşa wîde guhartineke mezin hebû. Ji halê xwe, bi xwe jî ne razîbû. Wî ji zeviyên xwe ku dabû gundiyan, para xwe distand. Ev kara jî tiştekî tevlîhev bû. Ewî hemû dek û dolab bi kar anîbûn û gund gişt xistibû destê xwe. Dîsa jî ji halê xwe ne razîbû. Her çiqas di van salên dawîde serê wî bi gundiyanre neêşiyabe jî... Para ku dikete destê Ûsiv axa ne ewqas zêde bû. Axayên hawîrdor niha erdê xwe bi traktoran dajotin. Gundî jî ji erdê xwe derdixistin.

Lê belê wê çawa bikira? Wê çawa bera gundiyên xwe bida? Ewqas salin rojên şênî û şînayî bi hevre derbaskiribûn. Çima? Ma heqê wî tunebû? Ger ûsabe, çima gund bi hezar derd û kulan xistibû destê xwe? Heqê wî jî hebû, wekî bera gundiya bide.

Birûyên xwe dişkandin. Gerek erdê xwe ji van merivên bêxîret bistîne. Axayên deştê çend sala berê ev kara kiribûn. Ma Ûsiv axa wê çima nekira?

Ji nişkava dihate bîra wî: "Lê gundî dernekevin, ezê çi bikim?". Te digot wekî agirek dikete hundirê wî. "Eger dernekevin, li pêş xelqê rezîlbûn ne bese, gundî êdî gura min jî nakin. Mirov carekê neşemite, êdî kes nikare bi wanre serederiyê bike. Na, na. Hukumat, cendirme benda çi rojêne? Ev tiştekî nebûyiye. Min heta niha erdê xwe bi şîrikî dida, îro jî nadim. Çi ji kêre!"

Lê dîsa jî nerehet bû. Ûsa difikrî, lê bi xwe jî ne bawer bû. Nedikete serê wî, wekî gundî ûsa bi rehetî ji erdê wî derkevin. Ev nerehetiya di laşê xwede dihesiya. Dilê wî diêşiya. Ûsa diêşiya, ku ji ber êşê êrîşî doraliya xwe dikir.

Jina wî Seyranê bi halê wî dihêsiya, lê zêde li ser nedisekinî, bêtir bi karê xwe mijûlbû. Kurê wiyî biçûk, şewqê dibistanê li serî, solên kevn di lingde, di şalê reşde li hundir bi şivê xwe dilîst. Bi lez ji derî derket, terişî û bi herdu lepanve kete erdê. Rabû ser xwe, tozê li ser xwe daw- şand û ji ber çavan winda bû.

Qasekî şûnde nobedar hat. Şukriyê nobedar, yekî sermezin, şewqê li serî di rengê qehwe, pêşiya şewqê dirêj bû. Te digot şewqe li jora serê wî dimîne. Li pêşiyê, nîşana hesinî ya nobedariyê hebû. Şukrî, ji bo vê şewqê û kincên nobedariyê berî du sala pêc—şeş cara çûbû bajêr. Bi zehmetiyeke mezin bi dest xistibû. Wê çaxê kêfa wî gelekî pêra hatibû. Niha çeket û şewqe tenê mabûn. Şalê wî çend meha jî damîş nedabû.

Şukrî sîh salî bû, lê belê çil salî nîşan dida. Qet vala nedibû, ku li karê xwe binêre. Di mala Ûsiv axade, hertim olamtiya wan dikir. Ji ber vê yekê jî, karê mala wan li ser stuyê jina wiye belengaz dima. Belengazê tenê hestî û çerm mabû. Şukrî û jina wî ji destê vî nobedariyê zare—zar bûn. Lê xema kê bû? Axa hercar, "ezê çawa yekî ji vî baştir bibînim" digot û pirçiyê xwe dikir. Êdî Şukrî jî hînî vê rewşê bûbû. Li gund çi dibû çi nedibû, ciyên ku axa lê beşdar nedibû gundiyan çi digot, Şukrî ev tiştana ji axêre carna qal dikir. Lê ne hemû tişt.

— Were Şukrî, hele were!

Şukriyê nobedar bi edeb li pêşberî axê sekinî. Axê li hemberî xwe cî nîşanî wî da, cixarek vêxist, yek jî avête Şukrî. Şukrî cixara axê xiste berîka xwe, ku paşê bikşîne:

— Axayê min xweşbe, xwedê ji te razîbe.

— Ji cîranên ku ne li gundin, kî hene?

Şukrî hinekî sekinî, destê xwe bire eniya xwe, li erdê nihêrî: te digot li tiştekî digere.

— Hemîdê Bekir û kurê Feqî vê sibê çûne bajêr, ser toxtir. Kesî din nizanim. Ew jî, bawer dikim wê îşev vegerin.

— Başe.

Nobedar ji pirçiyê rûyê axê tiştek dernexist.

— Here malên hemû gundiyan. Bira zilam hemû bêne vira. Ew jinên ku mêrên wan, kurên wanê mezin tunene, kîne?

— Fadileya pîre. Karê wê bûrayê wê dike. Bira ew jî bê?

– Na, na. Bûrayê wê Misto bira bê.
– Kî din maye?
– Fatê maye, axa.
– Erê, erê. Fata bi bela ma. Jêre bêje, bira ew jî bê. "Te çima ban min nekir?" wê bike mirte – mirt. De Şukrî, here bangke. Wexta ku ro çû ava, bira bên. Çend giliyan ezê ji wanre bêjim.

– II –

*Malê wan, malê wan,*
*Bû bela serê wan.*

*Cigerxwîn*

Şukriyê nobedar di dêstde şivek, xwe ji kûçikên gund diparast û gazî yê hundir dikir.
– Ho Evdo, Evdooo!
Evdo derkete derva.
– Îşev axa gazî dike. Çend gotinên wî hene ji gundiyanre.
– Çine gotinên wî, Şukrî?
– Ez jî mîna teme, bawerke nizanim.
Şukrî berê xwe da xanikî dinê. Evdo şa nebû. Ewî dizanî ku di bangkirinên wisade, yan ji bo tiştekî pere dihate berhevkirinê, yan axa karekî dixwaze, yan jî wê ji bo erdê xwe tiştekî bêje.
– Xalê Miho, xalê Miho!
– Ho Şukrî, xwarzî, were hundir.
– Ûsiv axa wê tiştekî ji gundiyanre bêje. Dixwaze bıı a hemû bêne mala wî îşev.
– Kesek ji bajêr hatiye? Çiye Şukrî, tiştek heye? Haya te dibe xwarzî.
– Na xalê Mihê, kes nehatiye. Ji bo çiye, ez jî nizanim, – got û çû.
Çawa xalê Mihê kete hundir, ji jina xwere got:
– Ev axa jî êdî li rûyê me nanêre. Derdê wiyî mezin eve ku ji me hinekî zêde pere bistîne. Karê zêde bi me bide kirinê. Dîsa deka û dolaba difikire. Lê nizanim çiye?
Nobedar yek û yek çû cem hemû gundiyan. Yên ku ne li mal bûn, xeber ji jinên wanre an jî ji zarên wanê mezinre dihişt.
– Olo Soro, birayê Soro!

Soro dora sîh salî xuya dikir, porê wî sor û çûr bû. Enî fireh, dagirtî û ciwan bû. Mirov bawer nedikir ku ji van deraye. Te digot qey ji cikî dinê hatiye vira. Bi rûkenî nobedar keremî hundir kir. Lê karê Şukrî hê xilas nebûbû, lewra ew nekete hundir.

– Axa bane hemû gundiyan dike. Ewê hin tiştan ji were bêje.

Li eniya Soro qirçimokeka kûr çêbû. Çavên wî li rûyê Şukrî li tiştna geriya, lê nedî... Xwe jî ne merivekî wisa bû ku zêde xeberde.

– Belê bira, ser serê min, – got û destê xwe da ser milê Şukrî:

– Axê te, helka vê carê ji gundiyanre singekî çawa hazir kiriye? Nerme an hişke? – got û keniya.

– Soro ez çi bêjim? Min jî tiştek fem nekir. Ez nikarim mînanî te bêjim, yê min kare, – destûra xwe xwest û çû.

Piştî gelek malan, Şukrî hatibû ber mala Fatê. Mala Fatê li aliyê dinê gund bû. Fatê bi mêrê xweve ji dûrê, ji serhedê hatine vira. Ji Wanê an jî ji Qerekosê, kes rind nizane. Lê dibêjin ku ew ji serhedêne. Jin û mêr bi çend firaqanve hatine vira. Axê alîkarî kiriye, gunehê wî bi wan hatiye û piçek erd û cotek ga daye serhediyan. Ew jî xebitîne û deynê xwe dane. Lê gelek sal borîne, nikarîne ji bin deynê axê derkevin.

Mêrê Fatê yekî dirêj û jîr bû. Bi namûs bû. Hinekî bêdeng bû, di nava malêde pirsa Fatê derbas dibû. Ewî dizanî wekî Fatê ji çi hez dike û ji çi aciz dibe. Lewra jî, wexta ku axê ew şandibû karekî dizî û xirab, ji Fatê veşartibû; jêre qal nekiribû. Çend rojan şûnde xeber hat ku mêrê Fatê li çiyê hatiye kuştin. Axa hat mala Fatê û dostanî nîşan da, cinazê mêrê wê hilda. Çend cara halê Fatê pirsî. Lê dîsa jî gava Fatê axê dibîne, hişê wê ji serê wê diçe û gêj dibe. Bîna wê diçike. Lê wilo... Li vê xeribiyê! Du zarokên pênc – şeş salî sêwî hiştin û çûyîn ji bo kê bû? Fatê qet ji axê hez nedikir. Ûsiv axa jî zanibû. Lewra êdî nedipirsî.

Fatê mîna mêra bû. Şorên xwe ji bavê xwe jî nediparast. Yeka mîna wê, neheqiyê, nepakiyê li rûyê mirov bêje, nehatibû dinê... Derheqa axan û began gotinên ûsa digotin ku meriv metal û şaş dima... Kê dest avêtiye namûsa gundiyên xwe, kîjan axê feqîr û fiqare perçiqandiye, kê hukumatêre alîkarî kiriye û kurapê xwe, axayê gundekî din kuştiye, ji Fatê bipirse ku bi cî û cî, bi nav û nav ji tere bêje. Yên ku dest avêtine namûsa xulamê xwe... Bira bêje û bêje.

Fatê karê xwe bi xwe dikir. Zarên wê hê nikarîbûn kar bikin. Lawikan derd û kulê diya xwe fem dikirin. Gelekî jî bi fem û bi aqil bûn. Hinek karê giran bi pera dida kirinê. Yên ku ewqas derdê wan hebin,

wê çilo bin? Por nivî nivî gewr, dest tişî tişî, lê bi can û bedenave sax bû. Rû û sûretê wê li ber sur û tavê şewitîbûn. Hine ciyê rûyê wê qelişî bûn. Kincê wê kevn, bi pîne, lê belê paqij bûn. Jinên gund, "ev Fata di nava ewqas şuxulîde çilo wisa paqij dimîne" digotin, metel diman.

– Xwenga Fatê, hela serê xwe ji malê derxe, xwenga Fatê!

– Hatim, hatim.

– Xwişkê, zehmetke, gundî wê îşev li mala axê bin. Hin gotinên axê hene.

– Şukrî, xwîşka te qurban. Ewqas cîran têne, ezê jî lêwik hildim û bêm.

## – III –

*– Min digot, axa û beg; wê go, kurê min guh medê,*
*Ew şivanin, sermiyanin, dane gur wan col û pez.*

*Cigerxwîn.*

Êvar hat. Gundî gişt karê xwe zûtirê xilas kiribûn. Hinek dil bi tirs, hinek bi meraq riya mala axê girtin. Yên ku hatibûn, di nav xwede xeber didan, dipirsîn: "gelo çiye?" Hinek ji wan serê xwe xwar dikirin. Çendekên wan bêdeng bûn. Yek dudu jî bêmînet bûn. "Çi dibe, bila bibe" digot çavên wan. Oda axê, hewşa wî hêdî hêdî tijî dibû. Li bin roniya loksa dardakirî rûniştibûn. Dengê loksê li her alî dihate bihîstînê. Hemû nêzîkî hev rûdiniştin. Li herî jorê ciyê axê bû. Li hemberî hemûyan him nerm, him jî hişk û tûj bû axa. Gotinên xwe di serê xwede rêz dikir, pê qayil nedibû, ji nûve rêz dikir. Gundiyan gerek bizanbûna ku ew bi qerare, bêheneke û ji berê zexmtire niha. Gundiyên xwe hez dikir, ji bo wan difikrî, lê belê bi awakî dinê jî nedibû. Ew bê qerariya wî, gundî hê zêde dikire şikê. Yek duda bi dest û çavan, bi piste – pista di nav xwede, tirsa xwe ji hevdure digotin. Ûsiv axa qutiya titûnê bi dor şande pêş rûspiyan. Wan jî di nav tiliyên xwede cixarên nû dipêçandin, destê xwe dibirin ser sîngê xwe û ji axêre dua dikirin. Her diçûn zêde dibûn.

Ji ber dûyê cixaran, germa lambê hêdî hedî xwî didan. Lê axê dîsa jî nedikarî tiştekî bigota, nedikarî destpê bike. Li cem axê melê gund

rûniştibû. Kurê axê, yê mezin xizmetê gundiyan dikir. Li alikî jî di bin çavande li gundiyan dinêrî. Fatê bi kurê xweve hatin û li jêrê, di cîkî tengde, li ser çoka pişta xwe dane dîwêr.

Ûsiv axe bi destmala xweye qirmiçî eniya xwe, rûyê xwe ziwa kir. Paşê du cara bi dengekî ketî kuxiya.

– Cîranno, hûn hemû bi xêr hatine. Dibe ku karê we hineka hebû. Qet nebe bi vî sebebê emê halê hevdu bipirsin. Hemîd, xwedê xweşiyê bide, îro tu çûbûyî ser doxtir, qe ne go çi?

– Tu saxbî axa. Got ku gurçikên te serma girtine. Birek derman nivîsî. Got ku tûj mexwe, tel mexwe, kêm bixebite û xwe newestîne. Ê nexwe, neweste, emê çi kulê bixwin. Yê me ne tu îşe axa, ma tu saxbî.

– Gotina min eve, ku em ji berêde cîranin, hûn gundiyên minin. Gelek rojên meyên şînî û şayî bi hevre derbas bûne, min dilê hinekan ji we şikênand. Lê tiştê wisa li kîjan gundî nabin ku? Ê, de bêjin, gundî eger car – caran şer û giliyan nekin, qet dikarin bijîn?

Zor da xwe û bi zorê keniya. Di bin çavanre li rûyê giştan dinêrî. Di destpêkirinêde devê wî zuha bû, dilê wî dîsa hate givişandin. Lêvên xwe dadilêst, bi tilyên xwe dilîst.

– Di vê demêde em hemû gundî ji erdê têr nabin. Min erd daye we hemûyan. Hûn jî heqê min didin. Lê belê hûn gişt jî carcara gazina dikin. Ku erdê we, mêrgên we kêmin, zuhane, bêavin. Ez jî mîna we. Lê dinê mezin bû, xwastin û îhtiyaca jiyanê zêde bû... Wilo pir jî nakeve destê min...

Wexta ku ev gotin gotin, bi xwe jî bawer ne dikir. Lewra jî dengê wî diket û dilerizî. Carcke din jî li dora xwe nihêrî.

– Ne wisaye? cîranno!

Melê gund, nobedar û çend meriyên kal serê xwe hêjandin, "Wisane, axa wisane", dixwastin bêjin. Hemû bêdeng bûn. Cixarên wan di nav tiliyande û çavên wan her vekirî bûn. Evê heta kêderê biçûya. Gelekan ji wan têdigêhiştin ku ewê tiştên nebaş bibîhîzin.

Ewqas derd, kul tiştek dabû wan. Ji berêde gelek tişt fem dikirin, texmîn dikirin. Xeterên mezin hêdî hêdî tên. Wisa tên ku meriv wan qebûl dike, dikşîne. Gundiyan ev hala rind zanibûn. Lê axan, began ji wan zêdetir zanibûn. Her tişt ji halê Ûsiv axa rind dihate kifşê.

– Hûn zanin, ev erdana yên bav û kalê min û yên minin. Gotinên min evin ku dinê diguhure, mal û pêçûyîna zarokan ji berê zêdetir dixwazê. Bawer bikin ewên ku hûn didine min, têra me nake.

Tûka xwe bi zehmet dadiqultand. Kevana bi zehmet, pir nemabû. Dawiya wêya hêsa bû. Wê gotinên xwe yên dawiyê rehet bigota.

Gundiyên ku di odê û hewşêde rûniştibûn, şaş û metal man. Cara pêşîn bû ku birçîbûn, tazîbûn, bêgomanî, nişkêva derketibû pêşiya wan. Belê. Birçîbûn. Halê wan ne baş bû, lê belê dîsa jî genimê xwe, sawarê xwe bi dest dixistin, dikarîbûn kêm an zêde tiştekî bidin zarên xwe. Têr nedibûn, lê ji birçîna jî nedimirin. Yê wan nîn bû erd, dîsa jî herkesekî têra derbaskirina rojên xwe hinek erd dajotin. Niha, gelo ew jî ji destê wan diçû? Ditirsiyan ku li rûyên hevdu binihêrin.

— Belê, gotinên min evin ku eva weha nabe. Xwedê rizqê hemûyan daye. Kes ji birçîna nemiriye. Ezê Beriya Sor û zeviyên pêş gund, zeviyên li aliyê gundê Zîlanê, bi traktorê xwe bajom û biçînim. Ezê dîsa jî têra we, li dora Ziyaretê, li dora wî girê paşîn hinek erd bidime we. Hinekî bêave, hinekî bi kevire, lê belê qet nebe dîsa jî erde, zeviye. Erdê xame. Eger hûn baş lê bixebitin, hûnê demekî kurtde wira ji kevira paqij bikin, dûre şovkin, zevîkin. Hûn dostê dê û bavê minin. Min got ku ez ji nihave xeberê bidime we. Di pêşiya mede zivistaneke dirêj heye, paşê bihar tê. Biharê bira kes destê xwe navêje ew ciyên ku ez dibêjim. Di wextêde xeber dayîn, heqê cîrantiyêye. Hê hêrgan destpê nekiriye, divê vê yekê bizanibin.

Xwîdaneke wilo bi ser Ûsiv axade hatibû... Lê niha rehet bû, dawiyê jî bira ew bifikrin.

Hewake giran li ser odê girt. Hinekan çokên xwe guhartin. Cixarên xwe teze kirin. Ev xwastinên weha qet nedihate bîra wan. Çilo dibû? Hinekan ji yên li tenîşta xwere tiştin digotin. Lê kesî ji cematêre tiştek nedigot. Giştan li hevdu dinhêriyan. "Çima kesek li dij neheqiyê naqîre" difikrîn... Yekî li rûyê yê dinê dinêrî. Ev bêdengî li Ûsiv axa nexwaş hat. Carekê li aliyê xweyê rastê, carekê jî li aliyê xweyê çepê nihêrî.

Paşê kurê Feqî serê xwe bilind kir. Îro ji doxtir hatibû. Qet rojekî jî cîranekî xwe neêşandibû. Bêdeng û bêziman bû. Bi nimêj û teeta xwe dabû.

— Axa, tu zanî, em gişt feqîrin, xizanin. Ew zevî jî xwe me têr nakin. Dibe ku tu qasî axayên dinê gelekî ji me nastînî. Lê erdê vî alî wisa zêde nade. Çima, yê me zêdeye em nadine te? Li dinê darekî meyî ter, hêşîn tune. Rind an xeraw ew erdê ku rizqê me dide, em wî jî nejon, îcar emê çi bixwin? Bêje axa, emê kuda biçin? Li cem xwedê û pêxember, dîn û misilmantiyêde ma em gişt ne birane. Ma heqê cîrantiyê li ser me gişta tuneye?

Zêde nikarîbû bêje. Ewqas dirêj xeberdana wi jî kesî heta niha nedîtî bû. "Welle raste", "Em giştê bimrin". "Ev kirina jî ji ku derket?"

"Emê qir bin" Ev gotinên ha di odêde dihate bihîstin. Destpêkirina xeberdana wilo, te digot ku devê têrê vekir.

Mirte—mirt herçû bilind dibû. Ûsiv axa xwe bi hêrs danî, nedixwest ku hevsar ji destê wî derkeve.

— Cîranno, hûn li mala minin. Ji ber vê yekê ez tiştekî nabêjim. Eger derdên we an jî gotinên we hebin, bêjin. Ez çi bikim? Li mal û milkê xwe nebim xwedî? Ev çi hale, li kîderê hatiye dîtinê?

Deng hatibû birrînê. Rewş ewqa ne baş bû. Kesî nedixwest xeber bide, berê pêşin. Ew xwestina xeberdanê ya gava dinê winda bûbû. Lê belê, xebernedan jî qebûlkirina gotinên axê bû. Bi dûre li dij derketin bêfêde bû. Wan ev yeka rind zanibûn. Gava meriv di destpêkede li dij derneketa, paşe zehmetir bû. Gundiyan baş têdigêhiştin ku yê ku derba pêşin lêdixe, şer qezenc dike, yê ku berî gişta qîzê dixwzaze, distîne. Poşmaniya dawî bêfêdeye.

Hemûyan ji xalê Mihêre hurmet dikirin. Kal bû, diran di dêvde nemabûn, rûyê wî qerçimî bûn. Du jinên wî hebûn; lê xwedê zarek jî nedabû. Zarek jêre bûbû, lê pir nejiyabû. Çi bûye li eskeriyê bûye, digotin. Ew bi birayê xweve malek bûn. Heyşt zarêd birayê wî hebûn.

Xalê Mihê çu cara şewqê xwe rast nedida serê xwe. Kesî nedizanî çima şewqê wî li alîkî diket. Ji jendirman gelekî ditirsiya, ji tirsa ku jendirmêd wê ji nişkêva bêne gund, şewqê wî her tim li serî bû.

— Axa xwedê emrê te dirêj bike, xwedê zarokên te bihêle. Tu merivekî başî. Lê baş bizanibe ku rehmetiyê bavê te bûya, weha nedikir. Tu jî... Gerek tu jî wilo nekî. Ew gundiyên ku erdê wan tunebe, wê çilo bijîn, Ûsiv axa? Çawa dibe? Gundî çu car bê erd nabe. Qet bê erd nabe. Rezîl dibe. Wê li germa Edenê, li ber dîwarên Diyarbekirê, Rihayê pêrîşan bibin, qir bibin. Nexweşî, tayê giran wê gişta bikuje. Tu bawerî ku namûs, heya wê bimîne? Rehmetiyê bavê te awha nedikir. Namûsa me gişta yeke, axa! Were vê yekê li gundiyên xwe meke. Tu li axêd xelqê nenihêre. Wan dest ji dîn û îman berdane. Ewê di dojehêde bişewitin. Ez qurbana herdu çevêd teme. Vê xirabiyê meke. Dest ji vê makîna kafira berde. Kê xêr ji wan dîtiye? Ev makînana urf û edetên me xirab dikin. Bênamûsa ji bo çi îcad kirine? Kevir bi ser wande bibare înşala.

Piste—pist kete odê. Deng dîsa bilind bûn. Paşê axê destê xwe bilind kir, deng hate birrînê. Yekî—duda dîsa kin û kurt axaftin. Hinekan digot, emê bimirin. Hinekan saleke din jî muhlet dixwastin. Kalên hevalên bavê Ûsiv axa, bi lava kirinê dixwastin ku wî hinekî nerm bikin.

Êdî wext dereng bû. Dengê Fatê, ku dişibiya dengê mêra, bi qît – qîtî bilind bû.

– Axa, axa... Tu ji xwedê qet natirsî? Risqê sedûbîst malan dibirî. Ev çito axatiye? Ji bona ku hinek zêde qezenc bikî, dixwazî meriv bimirin. Wîjdana te çawa qebûl dike? Me hindik ji tere xizmet kir? Ji bo te em mirin. Ne bese êdî, tu çi dixwazî? Ew êtîmêd mêrê min, ku ji bo te mir, ber kîjan dîwarî, li kîjan kûçeyê ji bo parsê destê xwe dirêjî xelqê bikin? Wê çaxê xelqê ji tera çi bêje? Paşê... Paşê tu dizanî ku...

Li vêderê tuka xwe daqultand, tiştên ku dihatin ser zimanê wê, gelo bigota an na? Ewqas mêr hebûn, yekî tiştek nedigot. – Çiqas şerme, ew çi ton mêrin? Tiştek nedigotin, difikrî Fatê. Deng nekir. Hemû li alî wê zivirîbûn, li devê wê dinihêrîn. Hemiyan dixwest ku Fatê gotinên xwe nebirre. Fatê hinekî pêşde derket, li ser çokên xwe sekinî; destê xwe rakir û li kulêv xist.

– Tu jî dizanî ku ev erd hemû ne yê teye. Ma hindik şer çêbû li ser van zeviyan. Te ji dest me girt. Paşê jî te gundî kirin hevparê vî erdî. Dûre şerê te û gundiyan sekinî. Niha lingê te erd girtiye, herin, biteysin herin, dibêjî tu. Ewqas mêr hene, ew gişt dikarin herin, lê belê, ez û herd êtîmêd xwe naçin. Ev makîna teye, traktora teye, çi belaye, hetanî ser cinazê mere derbas nebe em van çend ewlek erdê xwe terk nakin.

Fatê di destê kurê xwe girt û ji odê derket. Hemû şaş û metal mabûn. Dîsa piste – pistê di odêde dest pê kir. Ûsiv axa bi hêrs got:

– Ev jina hertim behsa çîrokên berê dike. Nizanim çima? Tim mirina mêrê xwe ji min dipirse, çi dixwaze? Çî min pêketiye? Ez çi dizanim çima miriye, çawa miriye? Dîsa jî min got cîrantiye, ewqas pêy ketim, min zarêd wê pirsî, xwedî kir. Mêrên hemûyan dimirin, qe ne tenê mêrê Fatê miriye li vê dinê. Hela hûn gotinên vê binihêrin. Na şer û hing bûne, erd ne yê min bûye!

Li jin bûna xwe nanihêre, serê heftêheft bavê xwe zêdetir diaxive. Ez li malê xwe, erdê xwe dibime xwedî. Ji bo wê jî ne baş dibin, ev çi dinyaye?

Melê gund dest ji ruyê xwe kişand.

– Heşa, heşa, got. Gişta, ka mele çi dibêje, meraq kirin û li aliyê wî nihêrîn.

– Welle gotin eve ku... Belê eve ku... Dînê me, pêxemberê me emir dide ku divê kes çev bernede malê kesî, milkê kesî û qurşekî kesî. Misilmantiyêde ev tune. Li dinya dinê ev mal û milk dibe derzî û di çevê

merivanre diçe. Divê kes ji heqê xwe zêdetir nexweze. Çevtêrnebûn ne başe, qet ne başe. Li dinya dinê îman lazime ji mere.

Ûsiv axa bi nermî li melê nihêrî, serê xwe pêre hêjand. Bi kêf çev li gundiyan gerand. Meriv di çevêd wîra dikarîbû bixwîne ku dibêje, "Vaye, gotinên min gişt rastin".

Mele destê xwe di ruyê xwe dida û di bin çevêd xwere li gundiyan mêze dikir. Her roj, wexta nimêjê, ew cîran li pey wî disekinîn. Her tim ewan halê wî dipirsiyan. Niha jî li hember vê pirsê ew serberjêrin. Hemû gundiyan bi meraq û şik bûn. "Te riya dîn û îmanê nîşanî me dida. Tu çawa dikarî bi vê neheqiyê razî bibî", gundiyan dixwestin ji melêre bêjin.

Gunê mele bi gundiyan hat. Lê ya rastî jî wisa bû. Ûsiv axa ji eydan pêve carna jî di nimêjên înêde bejdar dibû. Gundiyan pere, genim, kinc didane mele. Axê jî carna alîkariya wî dikir, xwedê jê razî be. Lê belê çi gunahê van belengazan hebû?

– Lê mezinên me gotine ku pez bê şivan nabe. Gerek şivan li pez rind xwedî derkeve. Wan nede guran. Wan ji bîr neke. Pêxemberê me dibêje ku heqê cîrantiyê ji bîr mekin û ji mezinên xwere hurmetê bikin. Qedrê wan bizanin. Çev bernedin qirşekî çu kesî. Ez dixwazim bêjim, ku bira axayê meyî mezin hinek erd ji gundiyanre bihêle. Bira bi erdê mayîn jî cîran jiyana xwe berdewam bikin. Bê goman heqê axêye. Ji erdê heta ezmana heqê wiye. Lê belê, hûn jî gundiyên wîne. Gerek nehêle ku hûn biçin di xeribiyêde pêrîşan bibin. Ew ciyên ku axa dibêje, bira hinek erd ji were bihêle û hinek jî bi traktorê ji xwere bajo. Em vê yekê ji axayê xwe yê bi merhamet lawa dikin.

Li ser axaftina mele, axa piçekî dilteng bû. Dawiya xeberdana mele heznekir. Bê deng ma wilo. Paşê heq da mele. Ji ber ku mele axa ji bin barekî giran xilas dikir.

Ev tişta bi carekî nedibû. Ma çima mele ji gundiyanre negotibû ku "Eger hûn çev berdin qirşekî axê, cîhê we dojehe". Belê, wisa gotibû. "Axa rast dibêje, ji erdê heta ezmana rast dibêje", gotibû mele. Ê, hinek gunê te li wan bê, hinek ji wî erdî baş ji gundiyanre bihêle. Lê ezê çawa bihêlim vî erdê baş. Ezê çawa erdê xwe bidim gundiyan. Nikaribû bide wan. Lazime mecalekê bibînim û bifikirim. Belê, bi lez qerardayin ne başe.

– Cîranno, min xeber da we, eva deynê stuyê min bû. Min bi cî anî. Gunê min bi we tê. Ji bo vê ezê bifikirim, ku çiqas erdê ji kîjan derê bidim we... An jî nedim! Ezê van gişta bi xwe xwe bifikirim, dîsa jî ji were xeberê bişînim.

Hemû bêdeng û kerr bûn. Ji devên wan "De bi xatirê te" jî bi zehmet derdiket. Ji hev veqetiyan, yek û yek çûne malê xwe. Mele parra ma.

Çawa hemû cîran çûn, kurê axê ji herduyanre qahwe çêkir. Li çevêd hev dinhêriyan, "ewqas xirab jî nebû", digotin.

— IV —

Berê, li van dera ermenî û kurd tev dijiyan. Kîngê dest pê kiriye, kes nizane. Lê ev yeka baş tê zanînê ku ev ermeniyên li vira dijiyan, çandina herî baş dikirin. Di nav wande gelek hunermend hebûne. Şeraba baş çêdikirin, xwedî rêzên rind bûn. Bastiqên wan gelekî paqij bû. Hesinkerî, nelbendî, dikandarî, necarî û karên wisa di gun- dande gişt di destê ermeniyande bûn. Hal û wextê wan pir xweş bû. Hinek ji wan gelekî dewlemend bûn. Li gelek gundan, ji çend malan bigire heta piraniya gund ji ermeniyan bûn. Wextekî berê, herçend dînê kurdan û ermeniyan ji hev cuda bûn jî, lê belê bi hevre baş bûn. Cîrantiya wan xweş bû. Di cejnande xweşiya hev parve dikirin. Di şînên hevde li ba hevdu bûn. Ev kirîvtiya di nav wande, dostî her zêde dikir. Ya rastî hinek kurdan wexta zarêd xwe sunet dikirin, ermeniyên dewlemend ji xwere kirîv hildibijartin.

Ew hevjîna baş, di dawiya qurna 19—ande ji aliyê dewleta Osmaniyande hate xirabkirin. Padîşahê wan, Siltan Evdilhemîd qirkirina ermeniyan plan kir û bi navê misilmantiyê êrîşeke giran bire ser ermeniyan û dest bi qirkirina wan kir. Di van êrîşande, dewleta Osmaniyan hinek axayên kurd jî bi kar anîn. Hîn jî dibêjin axayek li Mûşê bi navê Hecî Mûsa hebûye. Hecî Mûsa axakî bi navûdeng bûye, di wextê xwede li Erzorumê bi Mistefa Kemalre kongrek çêkiriye. Ewî axayî, qîzeke ermenî bi navê Gulê bi zorê revandiye. Lê keçika ermenî "Ez serê xwe nadime ser balgiyê mêrê misilmana", gotiye. Gelek bûyerên weha nexweş di qirkirina ermeniyande qewimîne. Di dawiya fermana ermeniyan çu ermenî li wê mintiqê neman. Yên hatin kuştin, hatin kuştin, yên mayîn mal û milk û gundên xwe hiştin û reviyan.

Lê wilo... Mal û milk û gundên ku ji ermeniyan man, kete destê dewlemendan. Tendurek jî yek ji wan gundan bû, ku kurd û ermenî tevde têde dijiyan. Hinek ermeniyên dewlemend, xwedî erdên fireh hebûne. Ermeniyan him tirkî û him jî kurdî baş dizanîn. Carna meriv nedizanî wekî kî ermene, kî kurde.

Li Tendurekê yên feqîr jî xwedî hinek erd bûn. Lê ne tapiyên erdê di destê wande hebû, ne jî kesî pirs dikir. Rêberên herdu aliyan jî baca xwe dişandine ji hukumatêre. Lê gişt jî ji qeyd û defterên bacê bê hayadar bûn. Ne wan ji hukumatê tiştek dixwast, ne jî hukumatê ji wan.

Piştî fermana ermeniyan, xelqê Tendurekê, axa ermeniyan di nava xwede parve kirin. Erdê herî baş bê goman kete para dewlemendan. Belê, Osmanî çûn, cumhuriyet hat. Di jiyanede guhartinek çênebû. Ferman dîsa di destê zordest û dewlemendande ma. Ji xwe dest û piyên hukumatê jî nedigêhişt her derê. Bi teybetî jî di salên pêşîde. Kê zora kê bibira, ewî qezenc dikir. Pere hemû derî vedikir, karê axa û bega mîna berê baş bû.

Paşê xeberek belav bû. Axa xezînê û axa ku ji ermeniyande maye, wê li gundiyên bê erd bê parvekirinê. Lê belê ew jî nebû.

Di destpêka cumhuriyetêde, li Kurdistanê serhildana Şêx Seîd hate li darxistin. Peyre rojên gelek teng û giran hatin. Wê demê, bavê Ûsiv axa bi hukumatêre bû, alîkariya leşkerê romê dikir. Wê demê hukumatê biryarek derxist û hemû axa û begên kurd ber bi rojavaya Tirkiyê nefî kirin, bavê Ûsiv axa jî di navde. Herçend bavê Ûsiv axa alîkariya hukumatê kiribû û çûbû cem walî û qûmandara, lê dîsa jî ji nefîbûnê rizgar nebû.

Bi nefîbûna wî, gundî piçekî rehet bûn. Lê dîsa jî memûr û berpirsyarên hukumatê mîna berê man. Guhartineke mezin çênebû. Deng û baniyên xwe nedikirin gundiyan. Bi karê xwe mijûl dibûn. Berê karên xwe yên li cem hukumatê bi destê axayê xwe didane kirinê. Niha bêtir ditirsiyan, ji hukumatê direviyan. Hinek ji wan nîşan nedidan, lê şa dibûn ku wê erdê axê bidine wan. Bawer nedikirin, wisa jî bû. Ew erd nedane gundiyan. Lê hêdî hêdî gunê wan bi axê dihat. Erd, mal û milkê xwe terk kiribû, bi zorê şandibûn rojava. Herçend axê ewqas alîkariya hukumatê jî kiribû. Carna ku firset dikete destê wan karê mala axê jî dikirin. Hatina zevî û erdê wî bi dizîkava jêre dişandin.

Qederek derbas bû. Hukumatê axa hemû efû kirin û axa bi şûnda vegeriyan. Ûsiv axa jî bi bavê xwere hatibû nefî kirinê. Ew jî vegeriya. Ew li Denîzliyê mabûn, di dema surgunêde. Wê demê Ûsiv axa tirkî hîn bûbû, bajarên mezin dîtibû, çevê wî bêtir vebûbû.

Piştî vegera axan, gundiyan ji wanre hurmeteke mezin nîşan dan. Hemûyan jêre pez, beran, çêlek dibaxişandin. Gişta pere didane axê. Di şixulê wîde ji berê bêtir dibeziyan. Li ku erdekî baş hebûya, dixwestin ku axa ji xwere bajo û biçine. Erd zêde bû. Tapiyên kesî jî tu-

nebûn. Mal, malê wan bi xwe bûn, lê kesî tapî, qeyd, defter nedihanî bîra xwe û kesî jî nedipirsî.

Wê demê bavê Ûsiv axa dimire û berpirsyariya malê dimîne di destê Ûsiv axade. Wî, bajarên mezin dîtine, tirkî dizane û ciwan û bi xeberdane. Di nav çend salade erdê gund gişt kiriye destê xwe. Ew hukumata ku Ûsiv axa şandibû rojava, niha gotineke wî nedikir dudu. Mudirê tapiyê, qûmandarê jendirman, qaymeqam, gişt bûbûn dostê wî.

Çend gundiyan bi daxwaza axê hesiyan, li hember sekinîn. Lê di qereqolande hatin hingavtinê. Hinekan gund terk kirin. Paşê mudirê tapiyê aqil dabû axê. Ji bo ku zîliyêta erdê heq bike, kaxez bi gundiyan dabû morkirinê, ku erdê xwe bi îcar dabû gundiyan. Bi tiliyên xwe ev kaxiza qebûl kiribûn gundiyan. Wan rojan, çawişê qereqolê, ku bi çawişê zer dihate nav kirinê, ji bo xatirê axê çend şevan gundî di qereqolê hingavtibû. Gundiyan nikaribûn bi axêre serederî bikin. Paşê destê xwe ji her tiştî kişandin.

Lê gundiyên nû hîn bûbûn ku ev karêd weha di dadgehande têne halkirinê. Ji bo wê jî pere, abûqat pêwîste. Hersal kara xwe bi axêre parve dikirin, xênji vê tiştek ji destê wan nedihat.

Gundiyan ew rewşa bi zorê qebûl kiribûn. Herçend wan dizanî wekî ku ev erd, erdê wane, lê tiştek ji destê wan nayê ku erdê xwe têxin destê xwe. Demeke berê, gundiyan bi hevre çûbûn dest dabûn ser erdê xwe. Lê jendirme hatin û erd ji destê gundiyan girtin û dan Ûsiv axa. Ev yeka bi ewraq û zabita jî hatibû girêdan. Lê belê axê jî dizanî ku qiymeta van ewraqan tuneye. Lê dîsa jî ji bo xatirê wan ewraqan gelek pere serf kiribû. Erd bi destê gundiyan dihate çandinê, axê jî para xwe jê distend. Bi vê çûyinê kesî deng nedikir. Lê awha jî nedibû. Axayên dinê

traktor, makîneyên ku xwe bi xwe diçine, kirîbûn. Qezenca wan her zêde dibû. Gerek wî jî wilo bikira. Erdê awha di destê kêde hebûn? Zevî – mêrgên bi av bûn. Hatina wan gelek pir bûn. Meriv traktorê nekire jî dibe. Bi kirêkirinê jî dibû. Bangê, hukumatê alîkarî dikirin. Ax, carekî ji bîna devê van gundiyan xilas bibûya...

## – V –

Bi şev Fatê bi hêrs hate mal. Kelogirî bû. Ev çi jiyan bû? Vê jiyanê ew xwaribû û teva kiribû. Di van salên dûr û dirêjde ne kesî halê wê

pirsî bû, ne jî wê halê kesî. Xwest ku kurê xwe li cem yên dinê ramedîne. Kurê mezin hişyar bû, bi çevêd nîvxewî li herduyan nihêrî, lê tiştek fem nekir. Fatê stêrkêd çevêd xwe bi lêçeka xwe ziwa kir. Nedixwest ku nîşanê zara bide. Paşê zarok ketine xewê, lê xew nedikete çevêd Fatê. Ev dinya çima awha bênamûs bû. Başbûn, jiyana bi namûs û rûmet li ku mabûn. Gundiyên ku alîkariya wê dikirin, ne ku tunebûn, hebûn. Hebûn, lê ji destên wan tiştek nedihat. Ew jî mînanî wê bûn. Destên wan di paşila wande bûn. Sala ku mêrê wê mirî bû, ew cîranên ku bi niyeteke xirab lê dinihêrîn, hatine bîra wê. Ewqas mêr ku bi axakîre serederî nekin, jinebiyeke feqîr wê çi bike? Bîhistibû, dizanibû ku yên mîna van axan hemû xirabiyan dikarin bikin. Yê serê xwe hilda, wê bi kuda biçûya? Qet... Ma di dinêde cî mabû ji bona wê?

Xalê Mihê riya malê girt. Mînanî yên ku di xewêde digerin. Ji xwedê gelekî ditirsiya. Ev Ûsiv axa çima qet ji xwedê natirse, qet naye bîra wî ku xwedê wê ceza bide wî, difikirî xalê Mihê. "Tobe, tobe, xezaba xwedê wê lê bê". Cixara xwe kişand, dibinijî. Hêdî, hedî heq da axê. "Ê, ma ev derana ne yê wîne? Memûr razî kiribû, ruşwet dabû, giriya bû... Lê paşê bû xwediyê van deran. Ma wisa nîne? Ê, ma li malê xwe nebe xwedî? Kirina me, gotina me çi bêşeye?" Te digot wekî yekî dinê bi hundirê mêjûyê wî dihesiya. Sorbû, bi ser xwede hat. "Ê, eger heqê wî heye, yê neheq kiye? Em! Dema heqê wî heye, em kuda herin, em çi bikin?" Kire of û pof, di dawiyêde kete xewê.

Kurê feqî, —Ma gelo min baş kir gava hemberî axê derketim? bi xwe xwe digot û difikirî. "Lê ku gundî hemû herin ji axê lawa bikin, wî razî bikin, wê halê mine çi bibe?" Çima wilo kiribû, difikirî. "Min baş kir. Gelo meriv çilo bera gundiyên xwe dide. Bijî Fatê. Rast digot. Ya rastî erd ne yê axêne. Welle xwedê her tiştî dibîne û dizane. Lê eger axa gotinên xwe bi cî bîne, ezê çi bikim?" Şer û lêxistin heznedikir. Siheta wî jî ne baş bû, doxtir jêre gotibû ku zêde nexebite. Li bajêr dêwdutên wî hebûn. Kîngê têkeve tengasiyê dikaribû here cem wan. Qet nebe wê jêre karekî bibînin. Çend cara, "Tê heta kîngê li gund bî", jêre gotibûn. Xwedê bela zordaran bide. Çawa hebe li bajêr zorbetî tune, kes tevî karê kesî nabe. Her kes keda xwe dixwin. Belê ya rastî çûyîna bajêre. Lewra gotine: "Tê bimirî, li cîkî mezin bimire, tê bixeniqî, di aveke mezinde bixeniqe". Xwestina xwe, qerara xwe ji nihade ji kesîre nedigot. Hîştibû demê.

Şukriyê nobedar karê mala axê xilas kir, der û dor berhev kir. Piştî ku Ûsiv axa destûr dayê, ew jî hate mal. Îro gelekî westiya bû. Mal bi mal geriya bû. Hinek malan du cara çûbû. Lempa loksê karê wî bû. Di

hundirde qet rûneniştibû, virde wêde çûbû: derî veke, avê bîne, here wira, were vira... Belê heqê axê wî bû, erd yê wî bû. Çawa hebe axa dest nade ser erdê wî, zeviyên wî ji dest nagire. Ewqasî dixebite, xizmeta axê dike. Elbet axa jî wê ferqekî têxe navbera wî û gundiyên din, difikirî Şukriyê nobedar. Dilê wî teng bû, lê got, eger axa erdê wî jî ji destê wî bigire? Ew çi hale, çi jiyane, heta meriv dibe nobedarê gund, çetire meriv bibe kuçikê ber pêz. Ne sibe, ne êvar, ne jî zivistan û bihar heye. Dawiyêde yekî ku qiymetekî bi pênc qirûşa bidê jî tune. Jina xwe ya jarok û zirav hişyar nekir, kete nav ciyan. Difikirî, "Ji xelqêre çilo, ji minre jî wisa."

Piştî wê şevê, gelek gundiyan xwestin ku herine bajêr. Ya rastî erd û zevî kêm bûn. Li bajêr qezenc baş bû. Rojekîde kulmek pere dikete destê merivan. Xortan mêjve dixwestin herine bajêr. Lewra jî li gelek malan xeberdanên tûj dihate kirinê. Hinekan, "dimirim, dîsa jî ji gund naqetim", digotin. Hinekan jî, "çi dibe bira bibe, emê herin", digotin.

Soro, li mala axê qet xeber nedabû. Bêdeng, derdê xwe avêtibû hundirê xwe. Te digot ku qet tiştek nebûye. Heta dawiyê guhdarî kiribû. Ew û cîranê wî, Huseyn giran, giran berbi jor diçûn. Dîsa jî xeber nedidan. Wexta hate mal, bûyerên qewimî anîn ber çevêd xwe. Axê di dawiyêde rê nîşanî wan dabû, wekî têxmîna wî. Hinekî jî dereng mabû axa. Li Edenê, Rihayê, Diyarbekirê û li ciyên mayîn axan ji mêjve bera gundiyên xwe dabûn.

Jina wî têgîhişt ku mêrê wê hêrs bûye, çiqasî ji wê veşêre jî. Soro cixara xwe kişand. Egîtiya Fatê hate bîrê. Di dilê xwede, ev cara pêşin bû ku xwest jina wî jî awha bibûya. Jina wî jîr, gotineke wî nedikirin dudu. Dibe ku ji Fatê jî jîrtir bû. Evana ji bîra xwe derxist. Yên bûyî yek yek ji jina xwere got. Kîngê wilo dikir, di dawiyêde rehet dibû. Jina wî ew baş nas dikir, lewra xeberdana wî qet nebirî. Got, dîsa got. Fatê gotibû, ku "heta li ser cinazê minre derbas nebin, kesek nikare erdê min ji destê min bigire". Qîriya bû. Destê kurê xwe gitrtibû û ode terk kiribû. Lawakirina kalan... Lê ew halê mele, tirsonekiya wî û alîkarîkirina wî ya axê çi bû? Di dawiyêde wî çend gilî ji bo gundiyan gotibû, lê kê bi durûtiya wî bawer dikir? Sibê li cem me xwedê zane wê çi bêje?

Soro merivekî serwext, pir bi dîqet bû. Ew tiştên ku gelekî piçûk û kes nabîne, bala wî dikişandin. Dixwest ku hinek tiştan di nav gotinande bibîne. Ewî hinek rewşên ku qet nayê bîra kesî, didît. Gelo çi wê bibe? Ji wan tiştên piçûk texmîn dikir. Ji vê yekê jî qet zirar nedidît.

Ew tiştên ku meriv gelekî li ser nasekine, Soro mane jê derdixist, gelek caran. Cîran û jina wî, ji vî aliyê wî pir hezdikirin. Dixwestin ku ew jî wisa bin.

Mele xwestibû ku ne ew biêşe, ne jî yê dinê biêşin. Ya rastî nepakî ji gundiyanre kiribû. Lê hela mayina wî li mala axê? Xelq hemû çûbû, ew ji ciyê xwe nelivî bû. Soro gelekî ketibû şikê. Ew hinekî ji malê dûrketibû, zivirîbû, lê nihêrî, lê mele ji malê derneketibû.

Gundiyên xwe rind nasdikir Soro. Ew ne li hemberî axê disekinin, ne jî daxwazeke wan wisa hebû. Soro li ciyê xwe, xwe dirêj kir. Ev deh salên dawî hatin bîra wî. Qet ji ber çevêd wî nediçûn. Çavêd xwe digirt, lê dîsa jî ew rojêd tengasî û yêd baş bi hevre dihatine pêş çevêd wî.

Soro, berî mirina bavê xwe bi du gundiyên xweve, reviyabû çûbû Edenê, ji bo xebatê. Niha ew li bajêr rûdiniştin. Wê li wê derê bixebitana, hinek pere bidana ser hev. Beriya wî wê pere bidîta, wê hinek kincên nû ji xwere bikiriya. Lê nedixwest bavê xwe jî ji bîr bike. Edene, bajarekî gelekî germ û qelebalix bû. Pembo komkiribûn. Ew merivê ku Soro li cem kar dikir, perê Soro gişt nedabû, destvala mabû. Paşê li fabrîqayeke konserveyê dest bi kar kiribû. Bi xwe zexm û xurt bû, lewra jî karê giran tim dikete para wî. Carekê, katibê fabrîqayê heqê Soro û hevalên wî rast nedayê, wan çar hevalan jî ew hingavtin û paşê jî ji karê xwe bûn. Xwezil bi wê bima. Xwezil qet tiştek nekirana, serê xwe hildana û biçûna cîkî dinê. Roja din, li cem polîs îfada wan hate girtin. Katibê fabrîqayê bi serde jî ew sucdar dikir û digot:

— Van herçaran wê fabrîqe bişewitandana, min ew girtin.

Nobedarê fabrîqê û yekî dinê, heta niha ew nedîtibûn, wan jî şahidî kirin. Gotin, — Belê wisa bû. Soro, ev bûyerana di ber çevêd xwere derbas dikir. Dewsa ku heqê xwe bistînin, niha jî bi şewitandina fabrîqayê dihatin sucdarkirinê. Li cem polîs ketibûn halekî gelekî belengaz.

Soro û hevalên wî pênc meh di girtîgehêde mabûn. Di girtîgehêde, girtiyek hebû ku xelq gişt li dûrî wî disekiniyan. Digotin ew "siyasiye". Ew hate bîra Soro. Wî her tim ji Soro û hevalên wî, erdê wan, gundê wan dipirsiya. Ya rastî ev erzihala ku ewî "siyasî" ji wanre nivîsîbû, gelekî bi kêrî wan hatibû. Kêm xeber dida. Pir caran guhdarî dikir. Gelek cara: "Ku meriv bi aqil nebe, axa merivan pêrîşan dikin, birayê min", digot. Soro ketina xweye girtîgehê ji bavê xwe, ji gundiyên xwe veşartibû. Ew herdu hevalên wî zûtirê vegeriyabûn gund, paşê birçî û tezî ew jî hate gund.

— Min du xortê xelqê Edenê kêr kir, lewra di girtîgehêde çendekî razam, gotibû ji yên ku jê dipirsiyan. Hemû dîsa jî wisa dizanin. Taqet nedikir, ku qala şewitandina fabrîqê, şerê xwe û katibê fabrîqayê bike. Ditirsiya, baş nedibû. Soro ferq nedikir, lê ew bûyerên li Edenê gelekî tesîrî wî kiribûn.

Xew nedikete çevan. Li alî rastê û çepê dizivirî. Ji alî tewlê dengê dîka dihat. Wê çi bikira? Belê, ew cîranên wî, ew cîranên wiye melomestî... Lê belê her tişt ewha dest pê dikin, paşê her diçe dikeve rê. Yêd baş di destpêkêde kêmin. Paşê zêde dibin. Eger ku cesûr dernekevin, bazar ji herkesîre vedibe. Vê neheqiyê gerek cîran qebûl nekin. Nişkêva xwe ter û can dît. Jiyana xwe anîbû bîra xwe. Yêd ku vê êvarê bûyî ji bîr kir. Wekî gişt xirab û sistin, lê Fatê ji ku derket?

— VI —

Roja dinê û rojên pêş, li gund hewake giran hebû. Kesî xeber nedida, kesî henek nedikir. Karên xwe yên rojê jî nedikirin. Hêdî hêdî sermayê wê dest pê bikira. Li ber dîwaran, li hinek malan, yên ku dihatine ba hev, bi hêrs bûn. Bêdeng, heyfa xwe ji cixaran derdixistin.

Ro nîvro bû. Li ber dîwarekî civiyabûn. Hinek ji wan li ser darê erebê rûniştibûn.

— Ev yeka naye kişandin, birayê min naye kişandin.

— Raste, lê belê emê çi bikin? Keremke tu bêje.

Yekî, bi qirşê di destê xwede erd dikola.

— Ax, dê û bavê feleke... Ev çi bêbextiye? Bi dek û dolaban nahêlin em erdê xwe biçînin. Kî bera kê dide?

— Oro, zarno! Em çiqas exmaq bûne, bê aqil bûne! Lê dê û bavên me? Ew ji me jî xirabtir bûne. Wexta ku axa nefî kiribûne rojavayê Tirkiyê, "Lo gunehe, lo cîrane", digotin. Ji hukumatê bi dizî jêre pere, tişt komdikirin û dişandin. Rûn û penêrê wî ji vira diçû. Gundiyan bi xwe nedixwarin, ji wîre dişandin. Welleh ev dinya bênamûse. Gava firsend bi destê meriva dikeve, meriv bi kar nîne, paşê xelq awha tîne serê meriva. Bise, bira ji bêvîla mere bîne. Tu bisekine ji parra hê çi tê?

— Ez vê wê nizanim. Gotin hêsaye. Eva fermana mirina meye. Mînanî fermana Siltan Evdilhemîd, mînanî Îbrahîm Paşayê Millî.

— Tê bibînî, gundî vê yekê qebûl nakin. Kî dizane wê çi bibe?

— Lo, tu qe ji xwedê natirsî! Bejê, hela te ev îcada ji ku dît?

— Ox; ox... Gundî qebûl nakin! Îca wê çi bike? Hişê xwe komî serê xwe bike. Heta niha kê çi kir, ku ji vir û ha çi bike? De bêje. Ma bi dara li me nexistin? Hetanî ku qîrîna me gihîşte ezmana? Li me xistin, kê çi kir? Li qereqolan heta binê lingê meriyan tîş—tîşîbûn, paşê, de bêje. Paşê çûn ji axa lawa kirin, "Me kir, tu meke. Em bi qurban û xulamê te bin, kûçikê ber derê te bin.", gotin an na? Tu rabûyî çi dibêjî niha?

— Evana rastin, lê belê dîsa jî dibêjim ku gundî vêya qebûl nakin. Eva yeka, wekî ku meriv bi saxî çelkin. Kesî eva li dîlîtiyê jî nedîtiye.

Li mala xalê Mihê, çend hevalên wî yên kevn rûniştibûn. Derd û kulên xwe ji hevre digotin. Jina wî çend şekirên qirêj bîter kiribûn. Çay da wan. Bû şelpiniya devê wan, him çay vexwarin , him jî xeber dan.

— Emê êdî çi bikin? Halê me wê çilobe?

— Halê me wê çi bibe, ma tu hal di mede maye? Halê kûçikan sed carê ji halê me çêtire. Ez dixwazim herime bajêr. Kurêd min wisa dixwazin. "Emê bixebitin, li te binihêrin", dibêjin. Ya rastî hişê min ji xortên vî zemanî qet nabire. Lê belê tê çi bikî, meriv bi wan jî nikare.

Xalê Mihê, kalemêr, nikarîbû bi cîkîde here. Herdu jinên wî jî pîr bûn. Ji destê wî nedihat ku kar bike. Dixwest ku ew çend rojên wî yên mayî, tevî birayê xwe û zarêd wî derbas bike. Hertim guhdarî dikir û niha jî. Paşê ew jî kete nav xeberdana mêvanên xwe.

— Xwedê bike, nepakî dernekeve, lêxistin û hevdu kuştin. Çi tê ji rûyê perçek erd tê.

Vêdrokêd wan di milê wande, çend jinên gund hatin ser kaniyê. Wan jî derdê mêrên xwe di can û bedenên xwede his dikirin, bi hevre xeber didan.

— Ax, ez bi qurbana zimanê wê me. Fata mihacir çi lê kiriye? Wisa kiriye ku tiliya hemûyan di devê wande maye.

— Bi ser axêde qîriyaye, ode terk kiriye. Sê mêra nikaribûye wê bigirin. "Ew ciyê ku neheqî lê heye, ez li wira nasekinim", gotiye.

— Vegeriyaye mêra, bi ser wande qîriyaye: "Tû ji mêraniya were! Axa hûn gişt anîne halê jina. Li welatê bavê min, yekî awha bikira, ez dizanim çi dihate serê wî. Ka di wede ew xîret, ew dil?", gotiye.

— Gelek tiştên dinê jî gotiye. "Ez erdê xwe ji kesîre nahêlim, hetanî traktor li ser meytê min derbas nebe." Paşê jî gotiye ku "Tu li bêdengiya me nenihêre, ev erdana gişt yêd mene."

Jinên gund, sed gotin jî ji aliyê xwede lê zêde dikirin û digotin. Bi gotina têr nedibûn. Paşê jî xwestin ku biçin cem Fatê, ji devê wê bibihîzin. Bi xwere ji zarêd Fatêre çend gûz, hêk an jî tiştekî dinê dibirin.

Lê Fatê, bi du – sê gotinên kin û kurt qala wê şevê dikir. Vedigeriya, destên jina digirt, wekî kesên zana digot:

– Ji mêrên xwere bêjin, mirin heye, lê vegerîn tune! Ev meriva êdî zêde çû. Bi erdê xweve bizeliqin, dernekevin. Lê eger hûn van gotinên min bavêjin paş guhê xwe, hûnê li bajaran, li ciyên dinê birçî û belengaz bimînin. Ya rastiyê ji were bêjim: namûs û heya jî wê ji destê we here! Hûnê bibine wek tolaz û jinên tolaza.

Li ber derê Soro çend cîran rûniştibûn. Him xeber didan, him jî rûyê xwe kur dikirin. Gûzanê wan ji tirpaneke kevn hatibû çêkirinê.

– Ev mîrata rind kur nake. Hertim rûyê min dibire.

Soro gazî jina xwe kir:

– Ka hela makîna mine rûya bîne.

Cîleteke nû xiste makînê û dirêjî cîranê xwe kir.

– Qet xeberek ji axê derneket. Lê gundî jî nizanin, wê çi bikin. Bêçarene. Îro, sibê hêrg wê dest pê bikin. Ku ew jî di wextêde nebe, mirina meye.

– Tu li gundiyên me nenihêre. Nivî, lo welleh ji nivî zêdetir jî razîne ku gund terk bikin herin bajêr. Lê belê, ji xinziriya xwe tiştekî ji nihade nabêjin. Xwestinên Ûsiv axa jî xwe ji wanre bû mene. Ka ew gundiyên ku vê neheqiyê ji wî bipirse?

Yekî dinê tevî xeberdanê bû.

– Ez dibêjim ku jin û zar, em hemû biçin cem qeymeqêm, cem hukumatê. Em bêjin ku hukumat dê û bavê meye, bira ji mera çarekê bibîne. Yek jî erzihaleke bi zexm û bi tesîr bidine nivîsandinê. Ma qet bextê vê hukumatê tune, çawa gundiyên xwe wê bide perçiqandinê? Bê guman wê çarekî ji mere bibîne, ma ne wiloye?

Ev gundiyê gava dinê ku bersîva wî dabû:

– Lo bavo, ya te jî aqile? Te çawişê zer çi zû ji bîr kir. Ma ew ne hukumate? Tu mudirê tapiyê, yê qûzik nas nakî? Dost û birayên Ûsiv axa bûn. Xelqê gişt nedigot ku eva tiştên ku têne serê me gişt bi destê wî bûn. Paşê bi mîlyonan pereve çû. Qumandar, qaymeqam, ew kîne? Ma ehbabên Ûsiv axa nînin? Vê biharê li baxçê Ûsiv axa, yêd ku berx xwarin û reqî vexwarin, ma ez û tu bûn? Çi zû ji bîra te çû? Mala te neşewite.

– Lê bavo, tu jî berê me didî hevraza. Herdu serê darê jî bi gûye. Em bi axê nikarin. Nivî gundiyan bi dilê xwe dixwazin ji gund herin. Li jor, zilamên hukumatê, ew jî piştivaniya axê dikin. Bi serde jî divê hûn Mirtezayê partiya nû jî ji bîra xwe dernexin. Merê herî mezin eve. Gundiyên wî jî gund terk kirin, çûn. Di gundê wîde, çend malên xula-

mê wî tenê man. Girî û qîrîna wan çû gîhişte ezmana, lê piştî çend roja hate ji bîrkirinê.

Xeberdan caran li ser karên gund, caran jî bi pirsên vik û vala dirêj bû. Soro kêm qise dikir. Gava ku qise dikir awha digot:

– Yên diçin, bira herin. Piştî çûna wan yên mayî bira hevdu bigirin. Wê çaxê ezê halê Ûsiv axa bibînim. Em gişt bi hevdu bigirin, bibine yek. Eger em nebine yek, roja diya meye ew roj. Wê di diya menin. Wê me biperçîqînin, mînanî serê meran. Lê em ku yek bin, wê hîngê tiştkî dinê bibe.

Van rojan, li ber dîwaran, li kûçan, li hemû malan xelq kom dibû, gişta ew mesele xeber didan. Ew gundiyên ku berê hevdu êşandibûn, niha nêzî hev dibûn. Tehlûka mezin ew nêzî hev kiribûn. Carna, bêhêvîtî, bêçaretî, barkirin û çûyin... Carna li ciyê xwe mayin, çi dibe bira bibe, li hember sekinandin...

Yekîtiya gundiyan pel bi pel mezin dibû, herroj li ser hevgirtinê dihate sekinîn. Roj bi vî teherî derbas dibûn. Gal – galên di nav gundde êdî bêqiymet bûbûn.

"Lê wekî neçin, dîsa ruşwet, pere, heqê nobedariyê, na çek û sîlah, na nizanim çi? Lê, yekî bênamûs lêxe, min an jî kurê min bikuje? Wê çi bibe halê me? Zevî, mal û milk wê bi kêrî çi bên? Lê nabe ku li pêş çevêd min malê min bixwin! Ya rastî min bikujin, ji vê çêtire..." Wisa difikirî Ûsiv axa.

"Di van rojande çu bûyer pêk nehatin. Heta niha bîna tiştekî derneket. Çima gelo? Diyare ku tehlûkeyek tuneye. Ma tiştek hebûya, heta niha qet nedihate bihîstinê? Mele fersendeke rind dabû min, niha ez dikarim dûr û dirêj bifikirim. Min pirsa xweya dawîn hela hê negotiye. Ya rebî ya xwedê, ji ku hatibû bîra mele? Na hinek zeviyan îsal ji gundiyan bistîne, na hikekî jî bibaxşîne wan! Gelo meleyên weha bi aqil qet hatine dinê?" Gava Ûsiv axa weha difikirî, ji nişkêva qehirî, "Eger mele ev riya nedîta, min pirsa xwe ya dawiyê gotibû û qedandibû. Minê erdê xwe bi serê xwe bajota. Minê perçakî duda ji girê pişta gund bida gundiyan, her tişt xilas dibû, diçû. Ew meleyê durû pozê xwe nexe nava her tiştê jî nabe. Ev çi qurebûna wî bû. Wexta ku qehwe vedixwar, çiqas jî ji xwe razî bû? Dixwest ku bêje: "Te dît, min tu çawa ji tengasiyê rizgar kirî." Bawerke, ew melê durû, li cem gundiyan jî awha dibêje: "We dî, min çawa axa nerm kir, min hûn parastin."

Wilo, dûr û dirêj difikirî Ûsiv axa. Ji her tiştî hêvî dikir, ji teyrên ber firê jî. Xwe gelekî bi qewet û zexm his dikir. Gotinên wî hemû bi cî dihatin. Hinek ji gundiyan dixwazin ku gund terk bikin, yên dinê jî wê di

nav çend mehande bar bikin. Yêd ku neçin jî, wê jêra xulamtî bikirana. Ji bo karê malê, zevî û çayiran çend meriv jêre lazim bûn. Wê li ser hinekande biqîriya, wê hinek bitirsande, hemû tişt wê biketa rê.

Gazî nobedar kir, Ûsiv axa. Ew gotinê wî yêd wê rojê, wê ji hemû malanre yek bi yek bihata gotinê. Kê ku bixwasta, axa wê erd li nêzîkî girê Ziyaretê bida wan. Lê qasî ku axa dixwaze. Nikarîbû gelekî bidê. Lê çêrandina pez û dewaran jî bi tevayî nedihate birrînê.

## – VII –

Bi belavbûna xeberê, gundî ji nûva hişyar bûn. Te digot ku wan qet tiştek nedizanîbûn. Gund çeliqî. Çend roj şûnda barkirinê dest pê kir. Qismek ji wan berbi gundên çiyê, diçûne cem merivên xwe. Berbi ew gundên ku hela hê traktor neketinê. Vê carê jî cem axayên wan gundan. Ku mal û erdê merivan tunebe, hemû cî wek hevin. Dîsa jî xulamî, nîvbirçî, nîv ziktêrî.

Çendek ji wan diçûne bajaran, bajarên nêzîk. Kêm ji kes çûne Edenê, Mersînê, Qonyayê. Li wan dera kar dîtin, hêsane digotin. Hemû tiştên xwe bi erzanî firotin û çûn. Yêd ku diçûne ciyên nêzîk, xaniyên xwe yêd nizm hildiweşandin, darêd xwe bi xwere dibirin. Destxistina daran, him zehmete, him jî bihaye. Derî û şibakên xwe jî nedihiştin ji parra. Yêd ku diçûne bajarên dûr, erzan, erzan her tişt firotine axê, kirne heqê rê. Roj tunebû, ku kesî çûyî nebe. Yêd mayîn ber xwe diketin, melûl bûn. Te digot ku qey ew malên çûyî, ji bedena wan, ji ruhê wan perçek diqetand û bi xwere dibir. Bi yêd mayînre, taqeta neçûyînê kêm dibû, ya rastî qet nedima. Çend qîz, xwûşk, metên wan di nav yêd çûyîde bûn. Ev merivtiya bi carekî dileriziya û winda dibû. Jinan bi dilbirîn hevdu hembêz dikir. Zarokan bê ku tiştekî fem bikin, ji gund diqetiyan. Yêd çûyî, pirs didane yêd mayîn ku li wan dera, ji wanre jî cî û kar bibînin. "Ku serê we kete tengasiyê, nesekinin, werin, emê pariyên xwe bi hevre parvekin, bi biratî bijîn", digotin. Ew cîranên berê, ku hevdu êşandibûn, niha sed carê poşman bûbûn. Destên hevdu digirtin, rûyên hevdu maçî dikirin û hevdu dibaxişandin. Ku ji vir ha li ba hevdu bana, tucara wê dilên hev nediêşandin. Lê êdî fêda tiştekî tunebû.

Tiştên ku hatibûn serê tendurekiyan, li van gundan zû hate bihîstinê. Gundiyên feqîr ku dibihîstin, gunehê wan bi tendurekiyan dihat. Xwedîgundan, "Ûsiv axa eva kara rind bire serî", digotin.

Axa bi yên çuyîre çend giliyên nerm kiribû. Dixwest nîşan bide ku dilê wî ji bona gundiyan dişewite. Ya rastî di dilê xwede şa dibû. Her tişt gelekî hêsa pêk hatibû. Ji texmîna wî jî hêsatir. Ewên ku digotin "em naçin", qet deng ji wan dernediket. "Hela lo, ez çiqas tirsiyame ji wan?" difikiriya Ûsiv axa.

Gund êdî dişibî xerabekî. Li pey cîranên çûyî bêdeng dibû. Meriv, heywan, mal her diçû kêm dibûn. Her tişt, her tişt... Hêrs, tengasiya dilê gundiyan her zêde dibû. Yekîtî, hevgirtin, ev fikı ana mînanî gilokê rîsê hiriyê her diçû mezin dibû. Lê di wan rojande, di bedena axêde rehetî û kêfxweşiyek hebû. Şa dibû. Her sehet şabûna wî zêde dibû. Lê ev şabûna, pir dom nedikir. Tiştên nepak, bêxêr dihatine bîra wî. "Na, na... Nabe. Lê wekî bên û li min xin? Lê ku neçin? Lê hatin û mala min şewitandin? Tiştên ku ji destên van berazan, van bêxîretan nayê, tuneye. Bi salan li ber derê axê xwe xizmet dikin, zikê xwe têr dikin, axa wan diparêze, paşê dizivirin û axê xwe dikujin. Ma gundiyên awha kêmin? Divê firset nekeve destê wan. Çi nakin ku? "

Melê gund, carna li cem axê, carna jî li cem gundiyan bû. Li gor dilê wan qise dikir. Valabûyîna gund bi vî awayî ji bo mele ne baş bû. Lê kes li gund nemaye, wê çi bikira? Wê ji kêra meletî bikira? Ma cin û pêriyan wê li pey wî nimêj bikirana. Lê axê ji wîre bigota, here ji xwere gundekî din bibîne û lê meletiyê bike? Bê aqilî kiribû. Çilo ev tiştana nikarîbû bîne bîra xwe? Ewqas aqil dida xelqê, lê çima bixwe nefikirîbû? Wê niha çawa bijiya? Kî wê fitre, zêkat bide wî. Kî wê di mirî û şahiyade qedir û qiymetê wî bigire? Ma ne ew gundî bûn ku saya wande mele, bû mele. Êdî tirsa birçîmayinê ketibû dilê wî.

Di van rojên dawîde, ji gund barkirin êdî sekinîbû, hema hema kesekî bar nedikir. Çend malên li gund mayî çûn cem axê, erd jê xwestin. Erdê xam û bi kevir. Axa, çend roj muhlet ji wan xwest, heta cîranêd wan jî bên. Lê ji malek du malan pêve kesî din nehat û çu erd nexwest.

Yên ku çûn, çûn. Yên ku man, êdî baş têdigêhiştin ku belayên mezin hêdî hêdî nêzî wan dibin. Niha, zêdetir di malande

diciviyan. Li ber dîwaran hevdu dîtin û xeberdan qediyabû êdî. Li malan qala rojên hêtê dikirin. Li gund heftî û du mal mabûn. Herşev di çar pênc malande kom dibûn. Çu çare nedidîtin û belav dibûn. Hinek li mala Soro û hinek jî li mala Mîro û xalê Mihê diciviyan.

— Em lêxin, mala wî hurşînin. Herşev mala wî bidine ber gullan.

– Em herin di zeviyande rûnin, xwe li ber traktorê dirêj bikin, bira li ser me derbasbe here zeviyan bajo. Bira me bikuje ku hukumat jî quzê diya wî nîşanî wî bide.

– Vêya rind têkine hişê xwe. Ûsiv axa ku bikeve tengasiyê, wê gazî hinekan ji me bike û wan bixapîne. Wê çend qirûş pere an jî çend buhust erd bide wan. Bi alîkariya wan wê bera me bide. Hemû kesên xurt, dewlemend awha dikin, qewetên yên li hemberî xwe perçe perçe dikin, ji hev dixin. Ma hûn dizanin, ewê kê hilbijêrin? Yêd ku bi du dulîne. Yên ku ji qerarê xwe vedigerin. Yêd tirsonek. Eger sibê pêwîst be, divê em amede bin ku malê xwe, canê xwe, hetanî bizina dawî, hetanî kulavê bin ciyê xwe jî bidin. Yê ku masiya digire, qûna wî jî şil dibe. Paşê, eger ku em pişta xwe nespêrin hev, bi carekî nabe. Gava neheqiyek li yekî ji me bê kirin, divê em nebêjin "bi çî min ketiye". Îro wê bê serî wî, sibê jî wê bê serê min. Eger ku em weha nekin, wê stêrkan bi me bidine jimartinê.

– Êêê, ev gişt rastin. Me hemûyan jî fem kir. Lê niha emê çi bikin? Dema çandina zeviyan hatiye, dema hêrgên biharêne.

Li van gundan, salekîde du caran hêrg dikirin. Hêrgên biharê payîzê diçandin. Zeviyên ku ne li deştê bin, nêzîkî çiyê bin, payîzê hêrg dikirin û piştî berfrabûnê diçandin. Payîza dinê jî genimê xwe hildidan.

– Hela bise birayê min, ecela te çiye? Ecelekirin bêfeydeye. Ma çima tu nizanî ku karê ecele mala meriyan xirab dike. Her tişt di wextê xwede. Qîz ku bû xama, kur ku bû xort, dizewicin. Eger ku wilo nebe, çu gû ji wan dernakeve. Hela bisekine, hela ka çi dibe. Paşê, divê meriv guh bide cîranên dim jî. Hukumata me heye, serîkî jî lazime em li wan xin, bira li me xwedî derkevin. Eger ku çu rê nema, emê bi erdê xwe bizeliqin û kesek jî nikare me jê bike.

Di kombûna mala Sorode, xeberdanê bi vî teherî dom dikir. Lê, piraniya kalan li mala xalê Mihê kom dibûn. Hertim di dawiya xeberdanande, "Xwedê bike, xirabî dernekeve" digotin rîspiyên gund.

– Lo bavo, tu merivekî bi aqilî, tu çi dibêjî? Ma ji vê xirabtir çi heye? Ji vê şûnve êdî çi ma?

– Erê, erê zanim tu çi dibêjî. Tirsa min ewe ku xort rabin dînîtiyekî bikin. Yek rabe li Ûsiv axa xe. An jî axa hinek ji me gundiyan bide kuştinê. Ez ji van tiştan ditirsim.

– Mihê, tu her diçî kal dibî, ji mirinê ditirsî. Mêrik nan û ava me biriye, gewriya me digivîşîne, dîsa jî tu dibêjî, "Lê wekî ez bimirim".

Li ser vê gotinê hemû keniyan, xalê Mihê jî keniya.

— Lo, bêîmanno! Canê we hemûyan ji yê min şîrîntire. Hûn ji min pirtir ji mirinê ditirsin. Hûn tiştekî nabêjin, lê hûn siyasetê dikin.

Xeberdanê kalan zêdê dirêj nekir. Yek — duda di xewre diçûn. Berî ku şev dereng bibe rabûn belav bûn.

## — VIII —

Ûsiv axa di van rojande çû bajêr, ku traktorekî peyda bike. Herweha wê çend dostên xwe yên memûr jî bidîta. Di rojên pêşde çi dibû, çi nedibû.

Pêlek şûnde, çend malbatên din gund terk kirin. Hinek ji cîranan ne tevî xeberdanan dibûn, ne jî nêzîkî axê, kesî nedizanî ewê çi bikin. Dilê wan taqet nedikir ku xwe bidin alîkî. Wê çi bikirana. Guhdariya gundiyan dikirin, heq didan wan. Bi cesaret, xîret li dij axê derketin jî nedikete serê wan. "Kê heta niha kariye zora axan bibe? Kî bi wan dikare? Em birçî û taziyên Xwedê çawa bi axa dikarin? Eva barekî gelekî girane", digotin di serê xwede.

Piraniya gundiyan qerar dan ku biçin bajêr ji bona ku halê xwe ji qaymaqêmre erz bikin. Herkesî wê qasî taqeta xwe tevî mesrefa çûna bajêr bibûna. Li ser navê gundiyan, sê kes wê biçûna. Hinekan digotin, sê kes ne besin, bira pênc bin, heta hê jî zêde bin. Di dawiyêde li ser pênc kesan qerar dan. Xalê Mihê jî di nav wande bû, ji ber ku gelek nasên wî hebûn li bajêr. Di karêd wehade tecrubeyên wî zêdetir bû.

Rojtira dinê her pênc bi siwarî bi rê ketin. Yên ku hespên wan tunebûn, li hespên cîranan siwar bûbûn. Ji bo ku li bajêr mesrefekî zêde nekin, xwarina xwe jî xistibûn heqîwan. Xalê Mihê, te digot qey xort bûye. Ew di ciwaniya xwede, siwarekî baş bû. Li wan deran, di dawet û dîlanande kesî nedikarî bi wîre hespa bibezîne. Dudu ji siwaran, li pey hevalên xwe, di kêleka hevde hespên xwe hêdî hedî dajotin û bi hevre xeber didan.

— Ax, wekî qaymeqam me baş guhdarî bike, vegere bêje ku "Ma min xelqê xwe li erdê dîtiye, hetanî ez sax bim, çu cara nahêlim ku axa — maxa li ser we zorbetiyê bikin. Nesekinin, herin gundê xwe, vegerin ser zevî û çayirên xwe". Ax, carekî awha bêje, wê çi xweş be. Guhên Ûsiv axa wê çawa bikevin, tê bibînî.

— Welleh meriv nizane, te dît ku qaymeqamekî şîrhelale, wisa got, got. Ma nayê bîra te ew qaymeqamê sêwazî. "Ez ne mîna kesên dinê-

me, li cem min neheqî, ruşwet tune", gotibû. Tevgerek dabû bajêr û derdoran, qet nebêje. Paşê, çavên wan kor bibe, şikyat kirin, tenî têdan. Mêrik ji van deran qewtandin. Qet nayê zanînê, te nihêrî ev qaymeqamê nû jî wekî wî derket. Ma qiran ketiye koka mêran. Ewên gund terk kirine wê çawa poşman bibin.

— Bira poşman bibin, hin kesî tiştek negotiye, revîn çûn.

Çar seet derbas bibû. Êdî darên bajêr, mînara camiyê xuya dikir. Awayiya qerekolê û qesra hukumatê dibiriqiya. Siwaran hespên xwe lez kirin. Xalê Mihê bêdeng bû. Diyar bû ku westiyaye. Gîhan xana perê bajêr. Hespên xwe kişandin tewlê û daketin sûkê.

Sûk piçûk bû. Dikanên sûkê yêd yek qatî li herdu aliyê kolana bajêr ya bi tenê, rêz kirîbûn. Li ber derî û pencerên dikanan, lêçek pişt û tiştên dinê dardekirîbûn. Solên lastîkî di hundirê sandoqên nîvvekirîde bêhna lastikê belav dikirin. Teqe – teqa tenekeciyan bû. Sobe, misîn çêdikirin. Di çayxanande dengê pêşekar û teqûreqa tawlê, domînê tevlîhev dibû. Ew herdu aşxaneyên ku li bajêr hebûn, tenê du – sê cure xwarin çêdikirin. Pêşekarêd aşxanan, li ber derî, "keremkin, keremkin", diqiriyan. Gundiyêd ku hatibûn bajêr ji dikanekî derdiketin, diketine dikaneke dinê. Herkes bi karê xwere mijûl bû. Hatina tendurekiyan bala çu kesî nekişandibû. Wan li herdu aliyê xwe dinihêrîn û berbi dayira Memed Efendiyê erzihalcî diçûn.

— Selam aleykim.

— Aleykim selam, keremkin, hûn bi xêr hatine. Fermo, qasekî rûnin, ezê niha li karê we jî binihêrim.

Memed Efendî bi karê xwe mijûl bû.

— Belê me çi got? "Binanaleyh vaki tecavüzün defini, ika edilen zarar ve ziyanin tespitini yüksek makaminizdan arz ve talep ederiz..."

Di hundurde jinek û sê mêr hebûn. Bi gotinên wan, li gundê xwe ncheqî dîtine. Hinekan dest daye ser zeviyên wan. Navberê du zeviyande hinek erdê xam hebûye, gotine ku di nav hudûdê medeye û ajotine. Jinikê di firaqekêde ji Memed Efendiyê erzihalcîre rûn anîbû. Wê du kîlo derketa. Memed Efendî qasik kiribû bin masa xwe ku tav lênexe û nehelîne.

— Van bibin û bidin qaymeqêm.

— Xwedê ji te razîbe Memed Efendî, Xwedê zarêd te bihêle.

— Paşê ewê we bişîne cem qumandarê cendirman. Li wê derê carekê dîsa halên xwe ji wîre bêjin. Eger karekî wiyî zehmet tunebe, hûn jî jêre hespa bibîmin, piştî çend roja ewê bê, erdê we teslîmî we bike.

Eger ku min ew berve êvarê li sûkê dît, ezê jî jêre bêjim. De ser seran, ser çavan.

Gundiyan deynê xwe jê pirsîn, Memed Efendî li rûyê wan nedinihêrî, di şûşa pencerêre li dûrê dinihêrî.

– Bîst pangnot. Ya rastî heqê vê erzihalê deh pangnote, lê min ji were bi usul, bi rêza qanûn û van kitêban nivîsî. Lewra jî bû bîst pangnot. Ev erzihal zûtirê hukmê xwe nîşan didin. Deh pangnotê we zêde çûn, lê ji bo we baştire.

– Belê, wisane Memed Efendî. Xwedê jin û zarêd te bibaxşîne. Em çi bikin? Bira here ciyê xwe bibîne, bira pozê wî bişkêne, bese.

– Wê bişkêne, bişkêne. Qanûn pêsîra merivê neheq bernade, wê serê wan jî bişkêne. Hûn niha biçin, paşê werin satila xwe bigirin. Ezê bişînim mal, bira vala kin.

Memed Efendî yekî pozınezin, pêncî–pêncîpênc saliye, porê wî weşiyaye. Wexta ku li qanûna dinihêre an jî dinivîse her tim berçavkên wî li ber çavêd wîne. Ew refên li pişt wî, bi pirtûkên qalind, reş û rengçilmisî tijine. Li ser masa wî daktîloyek sekiniye û li dor paş wê kaxiz û dosya tevlîhevin. Bihnekê ji cixara xwe dikişîne û dide alîkî, paşê rêzekê duda dinivîse, bihneke din dikişîne.

Ev Memed Efendî berê memûr bû, ewqas nexwendîbû. Li wê demê, kê ku ew herfên nû bizaniya, tanîn û dikirin memûr. Piştî ku Memed Efendî bû memûr, wî derûdora xwe ji bîrve kir. Foterek dabû serê xwe û baston di destde, bûbû belakî xwedê. Gelek ruşwet xwaribû û bi vî awayî dewlemend bûbû. Lê belê, Memed Efendî têrbûn nizanibûye. Çavên wî hertim di pey ruşwetên mezin digeriyaye. Kes ya rastî nizane, rojekê tevî ruşweteke mezin bûye. Hukumatê ew ji memûrtiyê derxistiye û xistiye zîndanê. Lê ewî jî rişwet daye hakim, sawciyan û piştî demeke kin ji zîndanê derketiye. Ewî cezake ewqas kin xwaribû ku, piştî zîndanê, dikaribû vegere ser karê xweyê berê. Wî di dema girtîgehêde erzihal nivîsiye, qerarên dadgehan xwendiye û bi vî teherî ewî xwe fêrî huqûqê kiriye. Piştî ku ji girtîgehê derdikeve, dibîne ku di vî karîde gelek pere heye, dest ji memûrtiya xwe berdide û dibe erzihalcî. Ew herweha di daweyên huqûqêde wekîliyê jî dike.

– Hûn bi xêr hatin, Memed Efendî gote tendurekiyan û efa xwe ji wan xwest, –biborin, hûn gelekî li hêviya min man, ez çi bikim, karê me ewhaye.

– Heşa, ew jî kare, Memed Efendî, xalê Mihê got.

– Xwedê silametiyê bide, fermo derdê xwe bêjin.

Mîro û Soro li cem hev rûniştibûn. Gava dinê, wexta ku ferqa erzihalên li qanûnan nihêrî nivîsandin û yên ku ji ber xwe nivîsandî bihîstin, hewekî bê kêf bûn û li hevdu nihêrîn. Di nav wande yê herî bi emir, xalê Mihê, di serîde dest bi axaftinê kir. "Belê, ha belê", digot û li rûyê xalê Mihê dinihêrî, Memed efendî. Berê Memed efendî baş guhdarî dikir, dît ku xalê Mihê gelekî dirêj kir, guh neda û bi qelama di destê xwede mijûl bû.

– Belê, di destê wede tapî hene?

– Na, begê min, tapiya çi? Ma tapî li cem kê heye li gundê me,? Tenê em ji bav û kalên xwe dizanin ku ev der erdê meye, me çandiye, me çiniye. Tapiya kesî jî tuneye. Ma tapiya Ûsiv axa heye?

– Başe, sûretên tespîtan? Tarîx û numrên wan? Ma ew jî tunin?

– Na, tespîta çi? Qet tiştek jî tune. Wê malê kê tespît bikin. Erd erdê meye.

– Belê, zanim zanim. Tapiya erdê nebe jî, divê tespîta wî hebe, qet nebe. Hukumat li gor wê bacê distîne. Bê wan qet, qet nabe.

Giştan li rûyê hevdu nihêrîn, çilo bûye ku ev tişt nizanibûne?

– Dibe ku Ûsiv axa baca wan erdan dabe û hûn nizanibin?

Wê çaxê Soro kete nava pirsên wan.

– Berê, di dema ew mudirê tapiyê yê qûzikde, axa hin kaxiz bi gundiyan û bi bavê min jî da mor kirinê. Wan tiliyên xwe li kaxizan xistin. Lê em nizanin ku ew kaxiz çi bûn?

– Ew jî nebû. De bisekinin, wexta ku we bi axêre li ser erdê şer kir, gava hukumat û cendirme hatin û ev erd teslîmî axê kirin, ma we qet kaxiz mor kir? We tiliyên xwe bi kaxizêve da an neda?

– Belê qurban, me tiliyê xwe bi kaxizêve da. Ma me nekira, dibû?

Memed Efendî eniya xwe xurand. Ya rastî, ew ji hemû bûyeran agehdar bû. Di wan rojande, gelek kesan li bajêr qala vî karî dikirin. Îcar, ma dibe ku yekî mînanî Memed Efendiyê erzihalcî, yekî hişyar û guhbel qet nebihîze? Ûsiv axa çendekî berê, li ser piyan, hinekî qala vî karî kiribû.

– Niha di destê wede, kaxiz û qeydên ku nîşan bidin ku ev erd yê weye, qet tiştek tunene. Tapî tune, tespît tune. Meqbûzên bacê tune. Tune û tune. Dimîne tiştek; zîliyeta vî erdê, ku yê weye. Vî qerarî jî tenê dadgeh didin. Ji bo vê yekê zehmetî û pere hewceye. Eger hûn bixwazin, perê we jî hebe, ez dikarim ji nihade dawê vekim.

– Çiqas diçe ez qurban, Memed Efendî?

– Mehkeme mesref dixweze. Hetanî dawiya mehkemê, ji bo ku hûn vî erdî bikaribin bajon û biçînin, pêwîste ku meriv bi emanetî hi-

nek pere bide hukumatê. Qerarê mîqtarê van peran jî dîsa mehkeme dide. Dibe ku zêde bixwazin. Ji bo dawê ezê pênc hezarî bixwazim. Wê direj bike. Kar û xebat dixwaze.

Gişta, li ser gotina Memed Efendî di hundirê xwede ofînîke kûr kişandin. Hinekên nû ketin hundir. Têgêhiştin ku xeberdan naye dirêjkirinê. Memed Efendî wê ji wanre ji ber kitêbên qanûnan du erzihal binivîsanda, ew jî wê erzihalek bidana qaymeqêm, wê yê din jî bişandana Enqerê, serokê hukumatêre.

Mîro û Sor li hev nihêrîn.

– Belê. Bira wisa be. Çi dixwaze, emê bikin. Tu ji me baştir dizanî.

Niha, hela di serîde, kar nedihate xirabkirinê. Her tişt wê tevlîhev bûbûya.

Memed Efendî berçavkên xwe dida ber çavên xwe û paşê derdixist û cixare dikişand. Bi teqe–teq li daktîloyê dixist. Ji hemûyanre çay dabû anînê. Erzihal nivîsî û ji wanre xwend. Ya rastî wan qet tiştek jî jê fem nekirin. Tenê, "Erd yê bav û kalên meye, niha wê çi bikirana, destê xwe direjî hukumata xwe dikirin", ev deran fem kirin. Pûl lêxistin û îmze kirin. Yê ku nedikarî îmze bike, tiliya xwe ya destê çepê boyax dikir û bi kaxizêve dida. Wê yek bidana qaymaqêm, ya dinê jî wê bişandana Enqerê. Gerek ji bîr nekirana ku meqbûza şandinê ji postaxanê bistandana. Memed Efendî ji ber kitêbên qanûnan nivîsîbû, lewra jî heqê Memed Efendî çil pangnot bû. Lê ew bi sî û pênc pangnota razîbû. Tendurekiyan perên xwe dan û derketin.

Wexta ku çûne qonaxa hukumatê, li ber derê qaymeqêm cendirmekî nobed digirt.

– Bira, yên di hundirde derkevin, dûre hûnê biçin cem qaymeqêm, got cendirme ji tendurekiyanre.

Li ber derî sekinîn, piştî çend deqîqan dora wan jî hatibû. Şewqê xwe dane destê xwe, hêdî hêdî, bi tirs li derî xistin û piştî ku dengê qaymeqêm, "gîr", bihîstin, ketin hundir. Qaymeqam, yekî ne xort û ne jî kal bû. Kincên wî gewr, rengê genimî li rûyê wî bû. Li dîwarê pişt wî qumaşekî sor dardekirîbû, navînêde şiklekî Mistefa Kemalî mezin hebû.

Li ser masa wî, kaxiz, kitêb, qelem û tiştên dinê tijî bûn. Qaymaqêm serê xwe bilind nekir, bi tiştekî mijûl bû. Soro hêdîka kuxiya, "em hatin", dixwast bêje. Qaymaqêm qet tiştek nepirsî û erzihal ji destê xalê Mihê wergirt. Xwend. Wê li ser erzihalê tiştek binivîsiya, zivirî ji wan pirsî.

– Tapiyên we li cem wene?
– Na begê min. Tapiyên kesî jî tunene.
– Qeydên, tespîtên kevn li kune?
– Ew jî tunene, begê min. Gundê me ji berêde awhaye, bê tapî û bê tespîte. Lê, herkes xwediyê erdê xwene.
– Çawa dibe, çawa dibe? Gundê bê tapî û bê tespît çilo dibe? Em li ku dijîn?
Soro bi dengekî nizm:
–Lê begê min, yê ku erd ji destê me digire, Ûsiv axa, ew jî bê tapî û bê tespîte.
– Tiştekî wisa nabe. Gundên bê tapî û bê tespît nabe. Belê, ezê niha we bişînim oda hana li rex me, ewê her tiştê pêk bînin û we serwext bikin.
Qaymeqêm gazî cendirmê li ber deriyê kir, cendirme hat, silav da.
– Vana bibe cem katib.
Paşê jî li tendurekiyan vegeriya:
– Dûre hûnê biçin cem qumandarê cendirman. Fernıo, herin.
Li binetara erzilahalê, "Ji Qelemê û Qumandarê cendirmanre", nivîsîbû qaymeqêm û îmze kiribû. Tendurekiyan silav dan û derketin.
Katib yekî porgewr, porê wî jî kurt bû. Berê çawişê cendirman bûye. Erzihala wan girt, li deftereke qalin qeyit kir. Paşê jî ew şandine daîra qumandarê cendirman. Piştî ku tendurekiyan çûn cem qumandarê cendirman jî, fêr bûn ku rojekî katib û qumandarê cendirman wê bêne gund û li ser vî karî bisekinin.
Êdî êvar bû. Hemû memûr ji kar derdiketin. Tendurekiyan jî karê xwe qedandibûn û wê vegeriyana gundê xwe. Di rêde rastî Ehmed Efendî hatin. Ehmed Efendî di daîra bacêde kar dikir. Jina wî ji xisimê tendurekiyan bû. Ehmed Efendî bûyerên ku hatibû serê ten- durekiyan bihîstibû. Ûsiv axa ji Ehmed Efendî qet hez nedikir. Ehmed Efendî silav da tendurekiyan û ew dane sekinandinê, halê wan pirsî. A rastî dilê wî ji bo tendurekiyan dişewitî. Di kûçêde li ser piyan xeberdan ne baş bû, meriv nedikarî dûr û dirêj xeber bide.
– Kerem kin, em herin mal, vê êvarê çayekî vexwin, bîna xwe hildin. Em pismamên hev tên.
Gundiyan dixwast ku zêde wext winda nekin, riya wan dirêj bû. Lê ji çavên Ehmed Efendî fem kirin ku ewê hinek tiştan ji tendurekiyanre bêje.
Hatin mala Ehmed Efendî. Jina Ehmed Efendî hal û wextê xisimên xwe pirsî û çayeke bi dem ji wanre hazir kir. Ehmed Efendî dixwast

hinek tiştan bi wan bide fem kirin. Lewra jî bi destên xwe ji wanre digot ku baş guhdarî bikin.

— Li cem we tapî û qeydên tespîtan tune. Yên Ûsiv axa jî tunen. Lê ew mudirê tapiyêyî qûzik, ew tespîtên li ser bav û kalên we qet nedane ber çavan û serde jî aqil daye Ûsiv axa. Ûsiv axa baca erdê, li ser navê xwe daye hukumatê. Ya rastî bi tespîtên kevn, ev erda yê bav û kalên weye, lê baca wan Ûsiv axa daye. Îcar, bac çiqas bûye? Qet! Pênc an jî deh pangnot. Paşê jî kaxiz dane morkirinê, îmzekirinê ku ev erd bi kirê daye we. Meriv wan kaxizan mor bike, paşê jî weha dibe.

— Way, way. Way bê namûs, way.

— Lê bavo, emê ji ku bizanin bi van tiştan, evana nayên bîra şeytên. Way, kûçikbavan, way. Çawa jî li hev anîne.

— Hemû memûrên mezin naxwazin ku li derûdora wan tiştên ne xweş bibin. Dixebitin û dixwazin ku hemû tiştên bûyî bira bê deng be, dûre wan ne rehet neke. Ji bo vêya jî qaymeqam ji şer û giliyan hez nake, naxweze. Yên ji wî bilindtir jî hene. Wê ji qaymaqêmre nebêjin ku "Te çima nikarîbû ev kara bi rêve bibira?" Hûn cendiraman jî dizanin, ew jî naxwazin ku serê wan bêşe, lê rişweta xwe jî ji bîr nakin. Ji ber van tiştan karê we gelekî zehmete. Memed Efendiyê erzihalcî rast dibêje. Mehkeme dikare van tiştan safî bike. Lê belê ewî jî ji bo karê xwe rast gotiye. Ne dostê weye. Di vî karîde pere heye. Pere dixweze, abûkat dixweze. wext dixweze ev kara. Dawên weha ewqas zû naqedin, salan dixwazin, kî dizane çend salan. Ev Memed Efendî merivekî bê îtibare. Ûsiv axa piçekî berîka wî germ bike, wê seetê wê we bifroşe. Herin, dûr û dirêj bifikirin. Bersivekî ji minre bişînin. Meyên daîra min, werin malê. Ez dixwazim dişţekî din jî ji were bêjim, min bihîst ku Ûsiv axa li wîlayetê digere ku traktorekê kirê bike. Li pey maraşî, melatyayiyan digere. De hûn li ser serê min û li ser çavê min hatin, riya we dûre. Rêwiyanre sekinandin ne başe.

Ehmed Efendî mêvanên xwe rêwî kir.

## —IX—

Ûsiv axa hate bajêr, serî da çend dostên xwe. Qederekê berê gundiyên wî hatibûn, gelo çi kiribûn? Erzihalê wan çilo gêhiştibû qumandarê cendirman. Ew giştyeko—yek hîn bû. Serîk da Memed Efendî jî. Pêre xeber da û henek kir. Di nav xeberdana xwede, eşkere kir ku haya wî ji erzihalan heye. Gerek bi xwe biçûya wîlayetê, ji bo kirêkiri-

na traktorê. Bi destê xwe divê vî karî bibe serî. Berî ku biçe wîlayetê, xwest ku Murtazayê serokê partiya nû jî bibîne. Ewî gelekî dostî nîşan da bû. Bi germî, ya rastî jî dostî, awha dibe. Herdu di milê hevde çûbûn gelek daîre û ciyan. Bira hemû qiymetê Ûsiv axa bizanibin, bira ji berê zêdetir hurmeta Ûsiv axa bigirin, alîkariya wî bikin.

Murtaza çend roj berê ji çûyina xwe wîlayetê ji Ûsiv axare behs kir. Ji merivên xwere gotibû, ku Ûsiv axa jî merivê wane. Eger karekî wî li wîlayetê hebe, dikaribû bê minet, bê tirs here cem wan, alîkariyê ji wan bixwaze.

Dîtina maraşiyan û meletiyan gelekî hêsan bû li wîlayetê. Ew gelekî dewlemend bûn jî. Eger te bixwesta, te dikarî traktorekî ji wan kirê bikî, an jî erdê bidî wan, ew ji tere hêrg bikin, bireşînin, biçînin. Paşê we nivî bi nivî parve dikir. Ew hemû girêdayî lihevhatinê bûn.

Ûsiv axa li wîlayetê bihîst ku xwedî traktoran li Yildiz Hotelê diman. Ew jî çû wir û ji xwere odek girt. Ji katibê hotelê pirsî, xwest ku yekî durust ji wan nas bike. Katibê hotelê navê Okeşê maraşî jêre got. Berê li salaona hotelê, paşê jî di oda Okêşde rûniştin. Bi Okêşre sohbet kirin û xeberdan pir xweş bû. Ewî gelekî dîtibû û derbaskiribû. Hersal dihate van aliyan, bi nivî karî erd dajot û diçinî. Tenê ji çend dostên xwere bi kirê dida. Axan hêdî hêdî traktor û makîneyên ku bi xwe – xwe diçine dikirîn. Okeş piştî çend salan êdî erdê wan axana nedajot. Lê bi gelekî hêsanî erdên nû didît. Carna naz dikir û nedixwest erdên nû bigire. Li van aliyan jî mînanî ciyên dinê bi qayide û bi rêz ev karana dimeşiyan. Di oda Okeşde her tişt xeber dan.

– Xelq çawa dikin, em jî wisa bikin. Zevî ji te, toxim ji me herduyan. Nivî ji te, nivî ji min. Emê makîna çinîne bi hevre tivdarek bikin. Traktor û ajotina erdê jimin. Kişandina genim û firotina wî jî nivî nivî. Di dawîde yê mayî emê di nav xwede nivî bi nivî parve bikin.

– Belê, zaf rinde. Xelq çawa dike, em jî wilo bikin. Tê bibînî, emê gelekî baş bi hevre kar bikin.

– Lê me tiştek ji bîr kir, tiştê herî girîng jî eve. Li gund divê em xirabiyekî nebînin. Em xerîbin, ji der hatine. Divê kesî din tu dozê ji zeviyan neke. Bira derd û bela neye serê me. Çend caran tiştê weha li me qewimîn. Qezenca me li alikî, me makîne û canê xwe jî bi zorê xilas kir. Devê min carekê şewitye bavo. Ez ji bo karên weha tuneme.

Okeş qasekê sekinî, paşê pêde çû:

– Emê ji dil li karê xwe xwedî derkevin. Min gelek xwedî erd dîtine, ku tiştek nedane me. Rikêfî me kirine. Emê qewlê xwe li cem no-

terê bikin. Kî ji pirsa xwe vegere, divê bîst û pênc hezaran bide yê dinê. Başe? Eger tu qebûl dikî, emê bi carekê dest bi karê xwe bikin.

– Bira, qet tirseke te tunebe. Erd yê mine. Gund ji bav û kalê min maye. Dubendî û gilî di gundê minde tuneye. Heqê te xwarin! Heşa, heşa. Ev ne karê miroviye. Emê, wek me behs kir, qewlê xwe çêkin û zûtirê dest pê bikin.

Ûsiv axa, bi xwe bêtir dixwest ku qewl li cem noterê bibe, nedixwast ku sibê an dusibê yekî cahil û nezan tiştekî bêje û xwediyê traktorê jî bihêle û bireve.

Li cem noter qewl çêkirin. Karê Ûsiv axa li wîlayetê qediya, divabû ku vegere bajêr ji bo hinek karên xwe yên mayîn. Herweha Okeş wê piştî çend rojan bihata bajêr, cem Ûsiv axa. Wê biçûyana gund.

## – X –

Tendurekî nivê şevê gîhane gund. Rojtira din, êvarê di çend malande civiyan. Çûna xwe bajêr, yek bi yek, çi kirine, çawa erzihal dane qaymaqêm û yek jî ji Enqerêre şandine, hemû ji serî heta dawî ji cîranên xwere gotin. Van gotinan tu hêvî neda gundiyan. Zanibûn ku tiştek ji vî karî dernaye. Lê şerm û fedî dikirin ku vê yekê eşkere bêjin. Zanibûn ku axa çûye ji bo ku traktorekî peyda bike an jî şîrikekî bibîne ku zeviyan bi hevre bajon. Vê yekê tesîreke mezin li ser gundiyan kiribû. Di çokên wande derman nehiştibû. Axê gotinên xwe di dawiyêde bi cî dianî. Dibe ku di nava çend rojande her tişt biqede.

Meriv ku hêviyên xwe winda bike, çi dimîne? Hêvî, ji dayik bûne. Kesên bi hêvî, dinyayên nû ava dikin. Hêvî, quwete. Per û baske, hêvî. Meriv tê ser xwe, mêjûyê wî baş dişuxile, dilê wî fireh û sivik dibe. Dinê çiqas xweş û geş dibe. Rojên zilaman, kesk, gevez û bi rengîn dibe. Çiye, çawane, naye zanîn, lê xirabî û nepakî naye bîra merivan. Gişt, pakî, delalî, rindî û zelalî tên fikrê jin û mêran. Mêrxasî tê, quwet û serbilindî tê.

Dixwazin ku neheqiyê di bin lingên xwede pêpez bikin. Lê belê carekê jî, te ew hêvî, bawerî winda kir, dest û milên te tên şikestinê, çokên tede derman namîne, zimanê te di devê tede nagere. Tu jî fem nakî ku tu çi dibêjî. Her tişt li ber çevên te reş dibe. Merivan û dinê hez nakî. Merivên bê hêvî, êdî bi kesî bawerî nake. Îna nake ku yekî dinê wê başiya wî bixwaze. Xwarina wî jî bê tame, mînanî jahrêye.

Niha gundî di vî halîde bûn. Bêbawerî, bêhêvîtî mînanî mirinê bi ser wande girtibû. Mînanî hewa mij û dûman, li serê çiyan, di zivistanande. Hestiyên wan, te digo vala bûne. Wer ku meriv di xewêde digere.

Soro, Mîro û yek – du gundiyên dinê dizanîbûn, ku li bajêr tu dostên wan tunin. Perên wan tunene ku ruşwet bidin. Her tiştên wan umûd û hêviyên wan bûn. Xwe bikine yek, bi erdê xweve bizeliqin. Li hemberî axê bisekinin. Xên ji vê rêyê, rê nedidîtin. Wisa xuya dikir, rê diçû û dihat ser vê rêyê.

Wan, fikrên xwe ji hevalên xwere jî digotin. Hinekan wisa femdikirin ku wê kesên din bên û di dewsa wande van karana bikin. Qet nedifikirîn ku divê ev kara bi destê wan bibe. Xalê Mihê û çendên dinê, hişkî û hing nedixwastin. Bi dîtina wan, ewên ciwan nizanin ku li ber derên hukumatê rezîl û riswa bûyîn çiye. Ji çend malan yek – du birîndar, mirî derketin çiye. Gullek bê li eniya merivan bikeve, kes li cem kesî namîne. Îcar, meriv têkeve hepisan, jin û zar birçî û tazî... Di nav çar dîwarande meriv dirize, lê dîsa jî kes kesî napirse. Mêjûyê van xortan li serê kîrê wane. Ji ku bizanibin wê çi bê serê wan. Paşê kî wê nepakiyê paqij bike, vê yekê nizanin. Birîdarbûn û mirin di dawiya van karande heye. Ev tiştana dihanîne bîra xwe, nedixwestin alîkariya Soro û Mîro bikin. Lê çi heye, axê hemû gundî belengaz kiriye, Soro wan jî ne neheqin. Nedixwastin ku ji gundiyên xwe biqetin, lê nikaribûn ku bi wanre bin jî.

Soro û Mîro, piştî ku xeber belav bû ku axa traktorê tîne, diçûn malên cîranan û mala xalê Mihê. Hal û kêf dipirsiyan, dipeyiviyan, ku çi bikin, bikin, lê yekbin. Deh tilî bi hevre bişuxilin, bixebitin, tiştên baş çêdikin. Ji bo vêya gerek yek bin. Bi hevre serî hildin û li hember axê bisekinin.

"Erdê me namûsa meye, canê meye, him jî xwîna meye. Yekê ku damarê wî yê xwînê bê birînê, ma dikarin bijîn? Na, najîn. Bo vêya, ji bo jiyanê gerek em bi erdê xweve bizeliqin. Bira serê me jêkin. Lê belê em serê xwe wisa bi erzanî jî nadin. Çima ew natirsin, hertim em ditirsin? Ma em ewqasî jî pîsin? Ma canê me ewqasî jî ezîze? Me serê xwe mînanî mirîşkan berjêr kiriye. Ji bo hembêzek giha, ji bo hêkekê em hevdu dixwin, lê ji bo erdê xwe dest û piyên me girêdayiye. Me pirçiyê xwe kiriye û em rûniştine."

Êdî di kombûnande xeberdanên weha dihate kirinê. Guhartinê xwe nîşan dida. Gişta jî digot, ku bi tevayî herin, di zeviyên xwede rûnin,

cot bikin û li hemberî traktorê bisekinin. Bera xwediyê traktorê bidin û ji gund biqewtînin.

Hêdî, hêdî tesîra Soro û Mîro û hevalên wan li ser gundiyan xurtir dibû. Hemû cîran dihatin bi wan dişêwriyan. Wan jî her car digotin, yekbin, bela belayî mebin, bê yekîtî qet tiştek nabe. Fatê berêde qerara xwe dabû. Te digot ku wexta ji diya xwe bûye, qerarê xwe daye. Wê bimiriya lê erdê xwe nedida tu kesî. Carna, wexta ku tenê dima, xwe bi xwe re digot: "Ew erda çima ewqas şîrine? Çima çavên van kesan ji erdê têr nabe, wê di dawiyêde nekevine binê erdê?" Fikrê awha kin û kurt dihatin hişê wê û diçûn. Paşê tiştên nû dihatin bîra wê. "Ewqas erdê axê heye, ew têr nabe, çima ezê têr bibim? Ma ew jî wê nekeve binê erdê? Bi serde jî ewqas perên wî, mal û milkên wî hene. Lê çî min heye? Ev zevî ku nebin, ezê van êtîman bi çi mezin bikim? Na, na. Mirin heye, lê erd dayîn tune. Eger ez buhustek erdê xwe jî bidim, ez ne keça wî bavîme."

Bavê wê jî qet ew nepirsiyabû, bira nepirse, çi dibe bira bibe. Carna lawa dikir, carna gazin dikir ji merivên dora xwe. Dixwest ku ew li erdê xwe xwedî derkevin. Li ber jinan digeriya û digot, "Alî mêrên xwe bikin". Digot ku "Nekevine paşila mêrê ku nikare zeviyên xwe biparêze. Têkevin paşila kûçikan, çêtire. Xwûşkên min, awha nebe, emê pêrîşan bibin".

Gundî niha di nav xwede yek bûn. Yên bê taqet dengê xwe dernedixistin. Fedî dikirin ku tiştekî bêjin. Ew jî mînanî pêz tevî kerî diçûn niha. Helka, hetanî kîngê, hetanî kêderê?

Çend rojan şûnde, sibêkê şiyar bûn, çi bibînin, traktoreke mezin, remorkek li paşiyê girêdayî ber bi zeviyên li perê gund diçû. Erdê li wî alî, bi piranî yê gundiyên ku gund terk kiribûn, bû. Hinek ji wî erdî jî, yê gundiyên ku li gund mabûn, bû. Di pişt zeviyande çemek nîvmezin derbas dibû.

Traktor gîha ser zeviyan. Êvarê hatibûn. Ji traktorê peya bûn. Li cem Okeş, xwediyê traktorê yekî navmilfire, bi simêlê qalin, qemer hebû. Şofêr Weysel bû ew. Li tenişta wî jî, Xidir disekinî, wê alikariya Weysel bikira. Ew herdu jî ji aliyê Albistanê, gundî bûn. Ji bo ku cîhê xwe yê razanê, cîhê xwerinçêkirin û bîhn hildanê, berbi çêm çûn û ji xwere cîhek tespît kirin.

Weysel ji zûva li cem Okeş dixebitî. Roj û şev, tav û baran nedigot, kardikir. Demên ku nexweşbûya jî dest ji dîreksiyonê bernedida. Erdên sor û reş dajot, tevî hev dikir. Wê waxtê kêfxweş dibû. Te digot, dinê ser û binî dike. Ku zevî jî bê kevirbin... Zikê wî têrbe... Ji mal xe-

berên xweş girtibe... Çevên wî tiştekî nabîne; dajot û dajot. Xidir jî mîna wî elevî bû. Ev du sal bûn ku alîkariya wî dikir. Her perçên motorê, mînanî tiştên zarokan yê lîstikê zanibû Weysel. Qet xwe şûnva nedikişand, timayî nedikir. Her tişt bi Xidir nîşan dida, hîn dikir. Waxta ku Xidir diwestiya, mînanî birayê xwe lê miqate dibû.

Du traktorên Okeş dinê hebûn. Li cîne din dişuxilîn. Karên wan ku xilas dibûn, diçûne alîkî dinê. Birayê wî û kurê wî li ber wan traktoran bûn. Okeş ji Weysel, Weysel jî ji Okeş gelekî dilxweş bûn. Lê Weysel hertim meraq dikir, ku ev jiyana wê kîngê xilas bibe? Wê kîngê tevî jin û zarên xwe kevçîk girar bixwin? Ax, karekî wî hebûya! Karekî ku hertim lê bixebitiya. Hine erdê wî hebûya. An jî erebeka xiloxarî û şikestî hebûya. Lê bira ya wî bi xwe biya. Wê şev, roj negota, bi dest û diranên xwe kar bikira, jiyaneka baş bijiya. Ne diçû ber destê xelqê. Okeş baş bû. Lê ev qirêja. Ev xerîbiya. Meriv nizane ku wê kîngê kuta bibe. Bira xwarina wî kevçîk tenê biya, lê bi xwe serê xwe biya. Bira li mala xwe, cem jin û zarên xwe biya. Evana ku dihatine bîra wî, çavên wî li dûr mêze dikir, kûr kûr cixare dikişand. "Çima ez tenê ketime derdê canê xwe", digot û dest bi kilamên Pîr Siltan Evdal dikir.

Kesek ji gundiyan nehatibû û xêrhatin nedabûne wan. Hela hê kes ne dîtibûn. Xênji xulamên Ûsiv axa, rastî kesekî gundî nehatibûn. Gund di bêdengiyêde bû. Gundekî awha bêdeng çilo dibe? Okeş axa jî kete şikê. Ji hevdû pirsiyan, paşê:

– Lo. Lo çi mere... Dibe ku nivînên xwenê germ û paşilên jinên xwe hezdikin. Mînanî me, ji mal, jin, zarên xwe aciz nebûne. Tema devên xwe zanin. Keniyan.

Okeş, wê kar têxista rêzê û piştî du roja biçûya. Car cara bo nihêrandina rewşa kar pêvîstba, wê bihata. Rûn û mazot wê li bajêr bikiriyana. Gava çend varîlên mezin bistandana, gelekî dikişand û têrê dikir.

Ev karê xwe heta nîvro kuta kirin. Ciyê xwarin, raketin û tiştên wanê din, hazir bû niha. Okeş û Ûsiv axa bi hevre xeber didan ku wê ji kêderê dest pê bikin? Wê çend roja bikşîne? Bi destê xwe çend cî nîşan didan. Hatin cem yên dinê. Weysel ji wanre:

– Her tişt hazir bûn. Hûn bixwazin, ez dikarim niha dest pê bikim. Ji ku dest pê bikin em? Giştî bi hevre bajom? Di nav zeviyande bira erd nemîne, bi serda pê bajom? An jî têkim du û sê qeta? Hezdikin, vê derê hetanî nêzîkiya avê, tevayî têkime zevîke mezin. Paşê, ev ku xilas bû, ciyên li dor avê bajom. Bere bere, nêzîkî avê jî bibim. Mere

jî pêwîste. Dûr nekevin em. Car cara ku em westiyan, emê têkevine avê. Bi toz û xuliyê meriv dixure paşê.

Li nêzîkî zevî û çayiran çend zeviyên gundiyên ku hela hê li gund bûn, hebûn. "Hela niha zeviyên van gundiyên ku çûne, bên ajotinê, daha rinde, bira ev der xilas bibin, paşê dora vanên dinêne", di dilê xwede derbazkir Ûsiv axa. Lewra, gotinên Weysel gelekî di cîde dît.

— Belê, raste. Belê. Him awha hê jî qenc dibe. Paşê ev kar yê teye. Tu ji me baştir zanî. Li çavên Okeş nihêrî. Ewî jî bi mena "belê", serê xwe hejand.

Evana hetanî ku ev kar kirine rêzê, li gund jî jiyan dest pê kiribû. Ref bi ref hemû diçûne zevî û karên xwe. Destên wande şiv, dar, li pêşiyên wan çend heywan, ser milên hinekan tirmix, mer û tiştên din hebûn. Çendek ji wan li ber Ûsiv axa wanre derbaz bûn. Qet nezivirîn û ne jî li wanê nû hatî nihêrîn. Ruyên wan bi qerar û pirçî, te digot ku dixwazin li hinekan xin. Hemû wê biçûyana zeviyên xwe, bi tiştekî kar bikirana. Traktor ku bê, bixwaze erdê wan bajo, wê li hember bisekinîna. Bere pêşîn bihatana zeviya kê, qet ferq nedikir. Çavên gişta, wê li ser hevdû bûya. Hemû wê bi hevre bihatana. Ajotina traktorê bidana sekinanadinê. Wê li ber traktorê nelipitîna. Lê li kesî jî nedixistin û rikêm nedikirin. Wexta ku yê dinê nesekinîna, an jî tiştek bi gundiyan bikirana, evana jî wê bersiv bidana. Axa, kurê wî, ewqas merivên wî tu wê bi dest û milê xwe girêdayî bisekinîna. Çima wê çepik lêxistana? Na xêr.

Weysel hetanî êvarê, li ser traktorê bû. Ajot. Li nav herdu seriyan çû û hat. Ev makîna terikî pozê xwe kir bû nava erdê, bê bîhn, hema usa pêşde diçû. Reşayiya erdên ku hate ajotinê, her diçû zêde û fireh dibû. Berê ewqas erd, çend malan bi çend rojan nikaribû bi cot bajotana. Him jî bi bihustekê kûrayî. Vê makînê nedigot ku ez birçîme an jî tîme. Her tişt li ser westandin û birçîbûna şofêr bû. Bixwasta, dikaribû şev jî heta sibê bajota. Weysel wisa ne dikir. Bihna xw hildida êvaran. Paşê dîsa demekê dajot û traktor dihanî ciyê razanê. Li pêş çavên xwe dûr nedixist. Sibê zû radibû, dîsa dest pê dikir. Berêve awha hîn bûbû, awha dikir.

Gundiyan femkirin ku îro zeviyên wan nehatine ajotinê, şev jî tiştek nabe. Hetanî êvarê li zeviyên xwe mijûl bûn. Paşê hêdî hêdî riya gund girtin.

Ûsiv axa û Okeş hatibûne mal. Şîv xwarin, sohbet kirin. Okeş westiyabû, xwast ku razê. Car cara pişta wî diêşiya. Yê pirî, kîngê diwestiya an jî piştî rêwîtiyê dihat ev êşa. Hêdî hêdî dest pê dikir niha. Ûsiv

axa mêvanê xwe xewrakir. Gazî nobedar kir, bi dengekî nizm jê re got ku bira hîn bibe, "li gund çi dibe? Erdên wan ku bê ajotinê gelo tiştek bibe an na?" "Kî çi difikirî?"

– Welle axê min, gundî bêkêfe. Bi min jî bawer nakin. Dibêjin ku ez merivê teme. Pirsên xwe ji min vedişêrin. Dîsa jî qet baş nabînim tewrên wan. Dibe ku tiştekî bikin. Qet li malên xwe nasekinin. Kom dibin, hema usa xeber didin. Dibêjin ku, xwazila axa awha nekira.

– Awha nekira. Îca destê xwe li pişta wan bida? Van tolazan.

– Hinek qet napeyivin. Lê belê, li devên yên dinê dinhêrin.

– Yên ku nepakiyê derxin kîne, Şukrî?

Nobedar kir ku navekî duda bêje. Paşê vegeriya. Gerek awha nekira. Ne rast bû. Cîranên baş bûn. Yek jî, çima neheq bûn? Lê wakî paşê hîn bibin û xerabîkê bînine serê wî? Wê çi biba?

– Walle axê min, kesekî ku xerabiyê derxe naxuyayê. Navan nizanim. Lê min halê gund ji tere got. Ez têkevim gunê kê? Nizanim.

Ûsiv axa fem kir ku nobedar hine tiştan zane. Lê dilê wî naxwaze, an jî ditirse. Lewra tiştekî nabêje.

– Eso çi dibêje? Esoyê Silo?

– Ew napeyive. Kêm tê û diçe ba cîranan. Li ber xwe dikeve. Bêdenge axa. Min vê êvarê jî dît.

– Lê Hesen. Hesenê Hemzo?

– Ew jî wisa axa.

– Niha here, wan herda bibîne. Gazî bike. Bira kes te nebîne. Bêdeng û ker, here malên wan. Li cem jinên wan jî nebêje. Bikşîne li alîkî, jêre bêje. Bira bêne vira. Wan herda hilde, bîne vira. We hersêkanre çend gotinên min hene.

Piştî nîv seheteke, hersê hilda li odeka xewle.

– Guh bidine min. We hersêka jî hez dikim. Berê jî, ji cîranên we yên dinê zêdetir, min hûn nêzîkî xwe didît, alîkariya we dikir. Ne wiloye? Dinêde her tişt li hemberî heve. Hûn bi minre çawabin, ez jî bi were wilo dibim. Ji we hersêkare û çendekên dinre, ku ez pê bawerim, ezê erdê we ji were bihêlim. Hûnê li cem min bimînin. Hûn guh nedine yên dinê. Çi were ji wan? Hemû kes, gerek tivdarekên serê xwe bi destên xwe bikin. Berê bi xwe, berê canê xwe, paşê yên dinê. Ne wisane?

Nêzîkî wan rûnişti bû. Nizm dipeyivî ku kesekî dinê nebihîse. Dixwast ku baweriyê bide wan.

– Bira kes nizanibe ku ezê zevî û erdê bidime we. Paşê ne baş dibe. Wê bêjin axa dubendiyê dike nava gund. Gişta yek nagire. Wê xerabiyê we bikin. Pirsa namûs û mêran didime we. Lê, hûnê çi bikin?

– Em çi zanin axa. Çawa emir dikî, emê jî wisa bikin. –Hesen li Eso nihêrî û got.

Eso yekî reş, dirêj, mînanî istûnekê bû. Ruyê wiyê reş di nav pirçêde, bêtir reş dixuya. Tiştek ne digot. Ker û bêdeng bû. Meriva zanibû ku bi dile.

Nobedar Şukrî, di dilê xwede digot, "bo me, her diçe wê baş bibe." Nîv şabûn hatibû ser. Axê wî, dawiyêde bi çavekî dinê li wî nıêze kiribû.

– Hunê ji nihade têkevine nav gund. Bira kes nizanibe ku hûn hatine vira û me xeberdaye. Qet bira ji tiştekî şik nekin. Xeberdan û pirsan bînin û bêjin ku "em neheqin, erd yê axêye." An jî bêjin, "em badilhewa disekinin, em herin, derdên bêne serê me." Bi dostî qise bikin. Him jî bizanibin ku ya rastî eve. Ew fem nakin. Gotinên we dibe ku wan hişyar bike. Lê serwaxt bin. Eger ew bizanibin, ku hûn vana bi ya min dibêjin, wê waxtê wê li berê zêdetir har bibin. Kes êdî li ruyê we nanihêre. Paşê... Belê paşê ez jî nikarim we li gund xwayî bikim. Rind hîn bibin ku li gund çi dibe? Kî aqil dide wan? Dixwazin ku çi bikin? Mînanî rûviyan bi fêlbin. Ji rûviyan jî zêdetir. Bêdengbin. Mînanî ava kûr bêdengbin. Kes bira şik û şipê neke. Hûn ku tiştên xeter dibihîsîn, bira haya min jê hebe. De niha ez we bibînim. Yek, yek ji mal derkevin. Bira kes we nebîne.

Gundî wekî hemû êvaran, kom bûn, dipeyiviyan. Soro, Mîro şandibû maleke dinê, cem cîranan. Wê, wext bi wext bihatana ba hev. Wê cînên dinê, malên cîranande tevî xeberdanê bibûna. Li ser yekitiya gund bixebitîna. Wê tirsa gundiyan bişkênandina. Wê bûyer ji hevdûre bigotana.

Soro li mala cîranekî, li ser rojên pêş xeber dida.

– Em herin traktorê bişewitînin. Gulla berdinê, digot xortekî. Soro li aliyê wî zivirî û:

– Wisa ecele neke bira. Em ne dijminê malê kesîne. Em kesî talan jî nakin. Axa ku bela xwe di me nede, rikêfî me neke, em destê xwe ranakin. Em çima neheqbin? Bira ew neheqbe. Bira berê ew bê rikêfî me bike. Ecele nekin. Karên ecele, xwarina bi tem jî bêtem dike. Bi hemdê xwe bisekinin. Her tişt bi hemd.

Hesenê Hemzo kete hundir. Silav da. Çû li alîkî rûnişt. Ev çend roj û şev bûn ku xeberdan dibûn, kom dibûn. Hesen li cem wan nediseki-

nî. gundiyan digot ku wê îro an jî sibêh here, terka gund bike. Vê şevê ev çiye? Him jî hertişt tevî hev dibin, bîhna karên ne baş tên. Hesen tê nava wan.

Nav peyvande, gundiyan got ku çend roja şûnda, dor dihate ajotina zeviyên wan. Gotinên xwenê hertim nû dikirin. Yên biçûna li zeviyan rûniştana. Jin û zarên xwe jî bibiranana. "Em nahêlin, hûn erdê me bajon," bigotana. Tiştekî din nedikirin. Tenê ne dihîştin ku erdên wan bê ajotinê. Ku aliyê dinê li wan xista, an jî tiştek bikira, gundî jî wê li hember derketana. Wê şiv, sing, tiştên awha hildana destên xwe. Wê baqil, bi hemd, bê qîre – qîr bûna.

Çek kar hanîn, karê wan nîn bû niha. Çi dibe, çi nabe. Lê wekî axa berî wan li wan xe? Jin û zar ne gotî, gulla berî wanda? Bû, bû. Yên awha kirî, çima kêmin li van deran? Ew peyv, bi vî tehrî dirêj dibûn û diçûn. Hesen:

– Way cîranno! Ev çi kare? Lê wekî lêxe, yekî ji me bikuje? Lê yekî ji me bikuje? An jî cendirme û hukumat bên me qir bikin. Tobe, tobe.

Yek ji cîranan:

– Lo Hesen, tu çi dibêjî? Mêrik ava me biriye, bi saxî saxî, li ber çavan, me dike gorê. Tu çi dibêjî? Wê bikuje jî, bira bikuje.

Ew xortê gava dinê, xwe ne girt:

– Heta emê bimrin, bira ew bimre. Heta diya me digrî, bira diya wî bigrî. Ev çiye Hesen? Dilê te tijî tirs bûye lo.

Hesen fedî kir. Carekê tê walya bû, dest pê kiribû. Xwe şûnva kişandin nedibû. Gotinên Ûsiv axa hatine bîrê.

– Ez. Tu min zanî. Ez natirsim. Ez dikarim devê wî jî bidirînim. Lê belê hukumat, cendirme li alî wîne. Yekê jî qanûn erdê dide wî. Nade me. Li pêş qanûnê heqê wiye. Hela hê bersiva ei zihalên me jî nedane. Gotinên min eve ku bi wîre serederî zehmete. Xênji vêya tirsa min tune.

Hinekan bersiv danê, li hember derketin. Ji axêre dane xebera. Pirsên nepak gotin. Neheqiya ku ew dike gotin. Emê qir kin, jêkin, nizam çi bikin. Hinekan, yên ku şikêda bûn, du dil bûn, xeber nedan. Guhdarî kirin. Soro fem kir ku tiştek heye. Di nav kom û xeberdanên şev û rojande tunebû. Paşê, vê şevê hat û awha qise kir. Kurê kerê xwe dabû dest, bi hostatî xeber nedabû. Soro zanîbû, ev çiye. Ev pirs ne yên wî bi xwe bûn. Hela tu devê kurê kerê binhêre. "Yê devê axê bidirîne... Lê em çi bikin, heq yê axêye..." Evana hînî Hesen kiribûn. Wisa difikirî Soro.

Nedixwast ku bi Hesen têkeve şikê. Bê deng, bê hes... Gerek meriv hînbibûya ku hela ka çi bûye? Çiye hîmê vî karî? Axa wê pişta hinekan miz bide. Çend pirsên şîrîn bêje, paşê di nav wande, dubendiyê dest pê bike. Yê ku ji her tiştî bêtir meriya ditirsîne, evaye. Yê ku gundekî rezîl bike evaye. Yê ku biran bi hevdû bide qirkirinê, yê ku yekitiyê perçe perçe dike eve. Carekê, toximê dubendiyê bira cîh negire. Paşê xêra wê derê tune êdî.

Hemûyan dengê xwe birîbûn, kesî nedixwast bipeyive. Hesen:

– Min şaş fem nekin. Ezê bi were heta mirinê herim. Yên ku hate bîra min, min gotin. Hûn çi dibêjin, ez jî bi were. Nizanim wê çilo bibe? Hişê min hilnade.

Paşê destûra xwe xwest û çû. Yên mayî li hevdû nihêrîn. Giştan bi nihêrandinên xwe, dixwastin ku hine tiştan ji hevdûre bibêjin. Lê belê, kesî eşkere tiştek ne got.

Soro:

– Her tiştê eşkere bibe niha. Hela bisekinin.

Hine tiştên dinê jî dixwast ku bêje. Lê ne got. Dereng bû êdî. Gişt belabûn, çûn.

Soro diçû mala xwe. Dît ku li mala cîranekî, işq xuya dike. Nêzîkî wir bû. Deng dihat. Berve wî yalî çû. Deng bi hêrs û bilind bûn. Li deriyê malê xist. Vekirin. Kete hundir. Soro dîtin û xeberdana xwe nebirîn. Him dipeyivîn, him jî silava wî hildidan. Mîro jî li wira bû. Nîvê şevê, ev xeberdanên bi hêrs û dirêj... Tiştekî bi xêr nîn bû. Dûmana cixarê hundir wilo kiribû ku meriv difetisiya. Dîtin ku Soro bi meraq li dora xwe mêze dike, ji wî re jî gotin.

– Eso dibêje ku xwastinên me gişt jî rastin, bi cîne. Lê wekî hukumat bêje ku li hemberî axa derketin sûce? Eva, li dij hukumatê serhildane, wê me hemûyan bavêjine hepsê. Paşê wê çawa bibe? Kiyê me xilas bike? Kê dîtiye ku meriv şerê bi axanre dibe sêrî. Yeka din jî, ma ev erd yê axê nîne? Belê, berê yê me bûne, lê em lê ne bûne xwayî. Yê ku keda xwe nexwe, yekî dinê ji dêst digre û dixwe. Ev kirinên me paşê zerarê nedine me? Soro êdî bê şik kete şiphê. Eso jî berê kêm dihat. Îşev hatiye. Devê wî û yê Hesen mînanî hevin. Ev çi kare? Him jî roja ku traktor hat dest bi ajotina erdê kir. Şik kete dilê wî. Qet ne peyivî. Tiştek di nav vî karîde hebû. Gelo çi bû?

Soro, Mîro bi hevre ode terk kirin. Şika xwe ji hevdure gotin. Gerek meriv bi van herd cîranan nexape. Li pey kirinên wan bisekine. Paşê wê çi bê kirinê, wê di nav xweda qerar bidana. Niha her tişt di nav herduyada bû. Li ser gotina Ûsiv axa, awha kirina wan, Eso û He-

sen, eşkere ku bibe, yên dîsa xeber bidana cîranan. Tirs, xof ne hewce bû.!

## – XI –

Rojtira dinê Soro gelekî li ser sekinî, lê belê tu rê nedît. Ji kesîre jî negot ku wê çi bikira. Te digot ku hinek jêre dibêjin, "bisekine, sebir bike, tê hîn bibî hertiştî." ...Hate bîra Soro ku şev û tarî gelek tiştên xirab, nepakiyê vedişêre.

Soro li paş baxçê Ûsiv axa diçû. Aveke piçûk heye li wira. Paşê hevraz çû, berve newala teng û dirêje li aliyê gundê Kanîspiyê diçe. Ji gundê wan, tu kesî ew ne dîtibû. Kêra wî tenê li ser wî bû. Tarî ket, hêdî hêdî şûnva zivirî. Serejêr dihat. Kete nav darên baxçê axê. Bêdeng diçû. Li mala axê, di oda mezinde lûks vêdiket. Pencerên malê li baxçê dinhêrîn. Qedereke li malê, penceran mêze kir. Bîhn jî hilnedida. Bîhna wî diçikiya car cara. Hinek çûn û hatin malê. Ewî giştjî naskirin. Bûk, jin û kurê wiyî mezin bûn. Xulamên wî jî hebûn. Sekinî. Sekinandina wî gelekî kişand, dilê wî teng bû. Sebra wî nema êdî. Tirsara, cixare jî nedikişand. Ji dîtina wan ditirsiya. Nikaribû şevereşêde kibrîtê vêxe. Bê tedbîrî ne rind bû. Karekî şaş, piçûkbe jî, her tiştî ser û binî dike. Kes nedikete malê, dernediket niha. Çend hew di odêde runiştîbûn. Pencere ji bejna wî bilintir bû. Lewra yên li ser piya tenê dikarîbû bidîta. Xulam li ser karên xwe bûn, an jî razabûn. Li ber derî reşayiya du merivan ber çavên wî ket. Li ber işqa şimakê, ew li ber dêrî ferq kirin, lê belê nas nekir ku ew kîne. Du gav pêşde avêt. Destê xwe dabû ser dîwarê sûrê. Hundirê malê mêze kir. Ciyê xwe guhart ku rind bibîne. Xwe bîr kir, dikaribûn wî bibînin. Çavên wî li şimaqê û li odê bûn. Nihêrî. Reşatiyên li ber dêrî ketibûne malê. Yê pêşîn, ji şewqê wî nas kir; Şûkriyê nobedar bû. Rind nedihate jibartinê. Ode ji wî gelekî dûr bû. Şewqên mînanî yê Şukrî li gund tunebûn. Lewra ewa baş nas kir. Yê li cem wî, yekî dirêj û zirav bû. Gelo kî bû? Mînanî Esoyê Silo dihate xuyanê. Merî nikaribû bêje, îlla ewe. Ax, xwazila ewa jî nas bikira. Belê ewa Eso bû. Lê çilo bikira ku ewa rind bidîta, qerar bida. Axa jî li ser piya bû. Hersêk bi hevre xeber didan. Hereketên dest û milên wan nîşan dida ku tiştên girîng dipeyîvîn. Yek dîsa kete hundir. Çawa li berdêrî baş nenihêrîbû, yê nû, rind nedîtibû. Heyf... Ev, ji malê an yekî din bû? Ciyê xwe dîsa guhart. Serê xwe dirêj kir, rind nihêrî. Nihêrî, lê kes nas nekir. Yê nû hatî xeber nedida. Soro kete şikê ku

ewî napeyive, dibe Hesenê Hemzobe? Di hişê xwede bir û hanî. Ji vir nikaribû wan nasbike. Ciyê xwe guhartin, nêzîk bûna şimakê nerast bû, baş nîn bû. Ewî nû hatî jî niha qise dikir. Te digot ku axa xeber dide, yên din bersiv didin. Yek qise dike û paşê yê dinê. Rûneniştin. Meriv zanibû ku wê zû herin. Soro kere – ker şûnve çû. Dûr ket, li ser sûrêre banzda. Ser riya li biniya gund, dîsa li mala axê mêze kir. Ev dera baş bû. Lê nikaribû ku kesekî nas bike. Qet nedibû. Ew kesên ku ji mala axê derketin, bidîta dikaribû berve wan, li alê gund here. Firset bidîta, di nava gundde rastî wan bihata, wê nas bikira. Bi çavên xwe, wê wan bidîta. Ew xeberdanê îşev hatine bîra wî. Bê şik, ew peyîv gişt, yek bi yek ji axêre hatine gotinê. Ew xortê dînik jî, ji ku got, "em lêxin, em axê bikujin." Hine cîranan gotibû ku "em şiv û darên xwe hildine cem xwe." Ji ku ev gotin gotibûn? Kertî kiribûn. Ji vir ha gerek meriv gelekî hişyar û li ser xwebe. Pirseke ne di cîde dikaribû serên hemûyan têxe belayê. Vê demê pir tişt hatine bîra wî. Wê çi çare bidîtana? Çavên wî hema usa li dêrî bûn. Derî vebû, yek derket. Tenê bû. Berve gund diçû. Soro hêdîka kete nav gund. Dixwast ku bê pêşiya wî. Xwe li ber dîwarê malekê teland. Hêviya dengên piya sekinî. Di tariyêde guh rind dibihên. Dengê piyên wî nêzîk dibûn. Hinekî din jî nêzik bûn. Soro xwe bi dîwêr ve zeliqand. Dengê piyan gelekî nêzîkî wî bûn. Ji destê wî bihata, wê bîhn jî nestanda. Niha hê rind dijbart, yê hatî. Çavên wî hînî tariyê bûn, baş ferq dikirin. Li pêşiya wîre derbas bû. Belê ev Eso bû. Rind texmîn kiribû. "Way bê nams. Way bijê heram. Kûçikê kurê kûçikan. Qet meriv gundiyên xwe difroşe? Lawo, di vê dinêde pûştî ji te tenêre ma?" got di dilê xwede.

Dengê gavên wî êdî dûr ketibûn, ne dihatine bihîstinê. Soro ji ciyê xwe derket. Nexwest li pey Eso here. Lewra li aliyê dinê berjêr çû. Hela hê çend gav nehavêtibû ku Hesen rastî wî hat. Hesenê Hemzove, niha sîng bi sîng li hember hev bûn. Herdû jî şaş bûn nişkêva. Soro Hesen texmîn kiribû, lê belê dîsa jî veciniqî. Zimanê Hesen hate girêdanê. Dilê wî lê bû bisekine. Soro xwe zû berev kir.

– Oxirbe Hesen.

– Tere jî, ê walle, ê walle.

Dengê Soro nas kiribû. Li pêş hevdû bûn. Dilê Hesen dikûta. Xwedê kir ku şeva reş bû, kesî nedidît. Çilmisîbû, di tariyêde kesî ler- zandina wî ferq nekir.

– Golika mine piçûk li derve maye, lê digerim. Tu ji ku têyî, got Soro.

Hesen hê zêde şaş bû. Wê çi bigota? Ji ku dihat? Wê çawa bigota? Xeberdanên gundiyan, axaftinên cîrananên dizî, hatibû û ji axêre gotibû. Wê çawa bigota? Zimanê wî ne geriya. Tiştek ji dêv dernediket. Cemidî di ciyê xwede.

– E...z. Eeee. Ji jêrê têmê. Jêrê.

Soro rind tê derxist ku lerizandina dengê wî, nişkêva bi şaşî bêbersîv sekinandina wî, nîşan dida ku ew jî ji mala axê tê. Yên ku bi axêre dipeyivîn, ev herdu bûn. Soro her tişt fem kir. Ewqas besî wî bû.

– Ez hewekî dîsa, mîrata golikê bigerim got û serejêr çû.

Paşê zivirî malê. Mîro li malê hivya wî disekinî. Îro qet hevdû ne dîtibûn. Yên bûyî hemû ji Mîrore got.

– Duh ewqas tolazî dikirin... Tu nabêjî hemû ji bo vêya bûye. Ax bê namûsno, ax. Ax qehpeno, ax. Bira deynê hustiyê webe.

– Xeberdanên duh giştgîhandine axê. Niha emê çawa gevezetiyê, peyivên bêcî bidine sekinandinê? Van, niha bi hezaran jî dane ser û wisa ji axêre gotin. Kî çi zane hela hê çi gotine? Yên ne bûyî, yên ne gotî. – Keniya, xeberdana xwe nebirrî.

– Di alîkîde jî baş dibe. Qet nebe wê bitirse. Lê wekî here cem cendirme qumandarî, bêje, ku "evên li hemberî hûkûmatê serê xwe hildin, çek û tivdarekên xwe dikin!" Hema yek qala serhildanê bike, cendirme hazirin wê deqîqê. Hertim di vê baweriyêdene. Nabêjin ku lo evana çima li hemberî hûkûmatê bisekinin. Wê vî karî bi çi bikin? Çima, ewqasî bê aqilin gelo? Qet awha dibe? Wê sehetê dikevin şikê, îna dikin. Kî bixwaze, şiltaxekê bavêje yên dinê. Besî her tiştiye. Hetanî ku ew xwe xilas bike, wê nebûyî jî tê serê wî.

– Bira bên, me binhêrin. Li cem kê çi heye ? Ji bav û kalan mayî, qirmek, dudê şikestî zêdetir çi heye? Lê belê dîsa jî gere em gelekî serwextbin, şaşiyê nekin.

– Vî buyera Hesen û Eso, ji kesîre nebêje. Xênjî ewên ku li zimanê xwe xwayîne. Dibe ku gele tiştên bêtem bibin.

– Ya rastî tiştekî ku meriv bike tune. Gotina min eve, hertişt eşkereye. Emê bi erdê xweve bizeliqin, nelipitin. Firsetekê bibînin, bi xwayê traktorêre, anjî bi şoferre xeber bidin. Bira bihêlin û herin. Ku xwayê traktorê bê rê, Ûsiv axa jî yê qebûl bike. Razî bibe. Traktor kirîn ne wisa hêsaye. Wisa zûtirê nabe. Lewra gere em vê traktorê nedine şuxilandinê.

Oro, tu çi dibêjî? Em qet nikaribin tiştekî jî bikin, nikarin traktorê jî bişewitînin?

# – XII –

Erzihala ku dabûne qaymeqam, li hivya cendirme qumandrî û nivîsdarê qaymeqam bû, ku herine Tendûrekê. Karên wanî dinê hebû, lewra neçûbûn û dereng mabûn. Herduka jî, qet neçûyî her tişt zanibûn. Lê neçûyî jî nedibû. Yê bibûna gilî û xeberdanên li ser zimanê xelqê. Hînî tiştên awha bibûn. Her roj li gundekî karê awha dibihîstin. Yê biçûna, herd alî jî guhdarî bikirina. Tapî û qeydên wan bidîtana. Eger ku karê wan bûya, yê raporek ji qaymeqamre binivîsîna. Tiştekî ecelekirinê jî hebûya, yê li wê derê bihanîna cî. Na, eger ku karê mehkemê bûya, yê ji herdû aliyanre jî li ruyê wan bigotana. Dîsa yê rapor bidana qaymeqam. Ewî jî, yê him ji Ûsiv axare, him ji gundiyanre qerar bişanda.

Gundî hîn bûn ku cendirme qumandarî û nivîsdar hatine mala Ûsiv axa û banî yên kû erzihal dane dikin. Mixtarê gund Qasimê xwarziyê Ûsiv axa bû. Lê belê mora mixtêr û yên ezayên wî, hemû di berîka Ûsiv axade bûn. Her tişt di destê wîde bûn.

Ew pênc kesên ku erzihal dabûn, bi ser gazîkirina cendirman çûne mala axê. Ji cîranên xwere jî gotin ku bira ew jî bênê, guhdarî bikin. Ûsiv axa bi kêf bû. Ew gundiyên ku li hemberî wîne, giliyên wî dikin, yê bihatana cem wî, yên li ruyên hev bisekinîna. Di dawiyêde hertişt wê eşkerebiya. Ew gişt yê li ser qûna xwe rûniştana. Bira hîn bibûna ku axa şîkatkirin çiye?

Rojeka xweş bû. Rojên payizên, bê ewr û zelal. Li ber derî kulav û carcîm rêxistine. Li ser wan doşegên qalind, balgiyên mezin. Mêvanan çaya xwe wexwaribûn. Rehetiyên xwe dinhêrîn. Li cem wan jî sê cendirme û tivingên wan di destande bûn. Herî jêr rûniştibûn.

Li pêşiya qumandar û nivîskar, kaxiz û erzihala ku gundiyan dabû, disekinîn. Axa li tenişta wan rûniştîbû. Bo navroja mêvanan emir dida merivên xwe. Nivîsdar serê xwe bilind kir, li gundiyan nihêrî. Li jêrê cî nîşanî wan da, ku bira rûnin.

– Rûnin. Rûnin li wê jêrê.

Te digot ku xwayî malê ewe, wisa rehet, aza ferman dida. Serê giştan li ber wande bûn. Xalê Mihê di tehrekî poşmaniyêde. Şewqê wî mînanî hertim li alîkî ketiye. Çavên xwe ji Ûsiv axa direvand, ne dixwast ku li wî binhêre. Yên dinê hêdîkan rûniştin. Soro, li nav wande yê herî serbest bû. Xêrhatinî da qumandar û nivîsdar. Ûsiv axa silav kir. Mêvanan bi nîv dil silava wî vegerandin. Ûsiv axa û xalê Mihê, ni-

zanim çawa bû, li çavên hev nihêrîn. "Tu jî Mihê?" digot, nihêrandinên axê. Mihê bêkêf bû. Ev karên ha ji ku hatibûne serê wî? Bi vî emrê xwe, çi derdê wî hebû di nav wande?

Nivîsdar kaxiz tevdidan.

– We erzihal daye. Ûsiv axa li berî me dide. Me ji gund derdixe. Erdê me ji destên me diçe. We awha gotiye, şîkat kiriye. Ev çiye? Hûn çi dibêjin?

Hemûyan li Soro nihêrîn. Tu xeberde digotin.

– Belê, qumandar û begê min. Zeviyên gund heta niha di destê me gundiyande bûn, me dajot. Ûsiv axa ana traktorek haniye û dixwaze ku me ji gund derxe. Ev erd yê me hemûyane. Yê hukumatêye, yê xezînêye û yê ermeniyên ku ji gund çûne. Hinek jî yê bav û kalên mene, berî me ajotine. Eva zilme ku mere tê kirinê, perçiqandina meye. Şîkatê me eve.

– Ev ciyên ku hûn dibêjin, yê mene, tapiyên wan ji minre bînin. Ka bidine min.

– Begê min, di vî gundîde tapiyên kesî tune. Tapiyên me tunin, lê yê Ûsiv axa jî tunin. Qey tapî nedane vî gundî. Bê tapîne gişt.

– Çawa nedane? Tiştên awha dibe qet?

– Ez çi zanim? Zanebûna me eve, ku tapiyên kesî tunin.

– Lê wisane. Ka qeydên "tespîtan" bînin. Qe nebe, wan bînin.

............

– Çima, ew jî tunin?

– Na xêr. Cem me ew jî tunin. Em dizanin ku ev der, erdê meye, em dajon. Tu kesî ev ji me nepirsîn heta niha. Ji Ûsiv axa jî ne pirsîn. Ji wî jî.

– Tu Ûsiv axa li wî alî bihêle. Ne tapiyên we hene, ne jî qeydên "tespîtan". Emê ji ku bizanibin ku ev zevî û mêrg yên wene? Binhêre birayê min, hûn şîkat dikin. Memûrên hukumatê karên xwe dihêlin têne vira. Tênê ber lingên we. Paşê destên wede qet tiştek jî tune. Awha nabe. Nabe awha. Paşê zivirî li alê Ûsiv axa.

– Tu çi dibêjî Ûsiv axa?

Ûsiv axa lêçegeke sipî vekir, gelek kaxiz jê derxistin. Yek, bi yek danê. Nivîsdar jî hêdî hêdî li kaxizan nihêrî. Dixwand û ji hevdû dixist. Kaxiznên kevn, kênarên wan kêm û diryayî bûn. Çendek ji wan veqetand, da cem xwe.

– Binhêre, li vira... Meqbûzê beşan, va li vira hene. Bêşên wan Ûsiv axa daye. Ew çima bêşên erdê we bide? Ka we digot ku ev der bê "tespît"in. Qet bêşên erdê bê tespît dibe?

— Walle em nizanin, çawa bûye?
— Lê belê, hûn zanin şîkat bikin. Çima van nizanin? Lê binhêre, berê hatine, ev der teslîmî Ûsiv axa kirine. Hine gundiyan mor kiriye, tilyên xwe lêxistine. Binhêre, binhêre. Dîsa hine kaxiz hene ku nîşan didin, wî, ev erd bi îcar daye we.
— Em nizanin. Me mor nekiriye. Kî çi zane? Dibe, hinek xapandine, dane morkirinê.
Nivîsdar ruyê xwe tirş kir, bi dengekî bilind:
— Kuro tu dînî? Kî bi zorê dikare tiştekî bide kirinê? Bide morkirinê? Navnîşan kirinê? Kî dikare kê bixapîne? De were vê derê mor bike, dibêjim, tê qebûl bikî? Erê? Tê qebûl bikî?
Gundiyan dît ku her diçe, halên wan xirab dibe. Cîranên din jî hatibûn nêzîkî wan. Cendirman carekê duda ew şûnva şandin, lê paşê hêdî, hêdî dîsa pêşde hatin.
— Waxta ev erd yê webûn, we çima bi pêçiyan mor kiriye ku Ûsiv axa bi îcar daye we, qumandar pirsî.
Soro û yên dinê niha li aliyê wî zivirîn.
— Me mor nekiriye. Em nizanin.
Vê carê nivîsdar tevîbû.
— Em bêjin ku wisane. Çima hûn keda xwe, ceh û genimên xwe bi Ûsiv axare parve dikin? Waxta yê weye, çima parekê didine wî? De ji minre bêjin. Çima didine wî?
— Berêva didinê. Em jî wisa hîn bûne. Didinê.
— Hema wilo? Bê sebeb? Çima nabin nadine yekî dinê? Hersal didine Ûsiv axa.
Ev gotin dirêj bûn. Hine tişt nivîsîn. Paşê qumandar û nivîsdar karê xwe xilas kirin.
— Niha, bi qencî, bi başî bijîn. Hûn cîranin. Heqê we tune li ser van erdan. Lê, na, hûn dibêjin ku heqê meye, wê çaxê hûnê herin mehkemê. Carekê jî li wê derê li heqê xwe bigerin. Nerehetî naxwazim. Li vî gundî tiştek bibe... Belê tiştek bibe...
Zivirî li Soro û çar gundiyên dinê nihêrî.
— Ezê her tiştî ji we bizanim. Paşê hûn zanin. Li gund şer û pevçûyinê naxwazim.
Xalê Mihê:
— Begê min. Efendiyê min. Bi van salên xwe, ezê tevî çi karî bibim? Hûnê ji me bipirsin. Em feqîrin... Gunene. Me şîkat kir û çûne hukumatê, çima ev sûce? Ez tevî tiştekî nînim. Tevî qet tu tiştî.
Soro serê xwe bilind kir.

– Begê min. Em çûne cem qanûnê. Me şîkatê xwe kir. Ya rastî gundî giştî jî wê bikira. Gotin ku niha hûn bikin. Em mêze bikin çi dibe, paşê jî emê bikin. Meriv her tiştî bi lingên xweve darda dike. Em li hemberî qanûnê dernakevin, lê belê çima gund gişt, ji me bêpirsînê? Kî gura kê dike ku hûn ji me bipirsin? Ez bi xwe wê gotina we qebûl nakim. Va gundî, hemû li vê derêne. Hûn bi xwe jêre bêjin.

Mîro jî:

– Ez jî qebûl nakim.

– Ez jî...

Nivîsdar zivirî. Gundiyan dora wî girtibûn.

– Li gund, bêtemiyê naxwazim. Hûn zanin li hemberî qanûnê derketin çiye. Cezayê wê çiye. Paşê hûn zanin, ha.

Ji her alîkî, dengek dihat niha.

– Eger axa xerawiyên neke, ne pakî ji me nayê, got hinekan.

Çendekan pişta xwe lêdan, berve gund çûn. Didane xebera. Cendirman ew hemû dûrxistin. Gundî çûne nava gund. Mêvan ji bo sêleqeliyê vegeriyane odê.

## – XIII –

Ev çend roj bûn ku Okeş axa şûnve çûbû. Dilê Weysel qet nedixwast ku bixebite. Ji roja pêşîn zanibû ku bi xwere nerehetî, nepakî hanîne vî gundî. Wexta di pêşiya wanre derbaz dibûn, kes nedikeniya, kesî li ruyê wan nedinhêrî. Caran, zarê piçûk bi meraq dihatin, mêze dikirin. Ji wan zêdetir kes nedihat. Çend xort di pêş wanre çûbûn, lê beşera wan qet ne baş bûn. "Meriv qet silavaka xwedê jî nade mêvanên ku nû hatine gundê wan?"

Paşê her tişt fem kir. Ji xulamên axê pirsî. Zimanê wan, edetên wan rind zanibû. Çi ferqa Albistanê ji van deran hebû? Her tişt hîn bû û ber xwe ket. Bi dil nexastî, dibûne sebebên derdê xelqê. Ev ne baş bû. Ji bav kalên xwe çima hindikî guhdarî kiribû, bihîstibû... Hindik şîret kiribûn li ser neheqiyê? Zarên hêlekanê jî zanibûn çîroka Pîr Siltan. Dadaloxlî, Saltiqê Pîr. Gişt jî li hemberî neheqiyê derneketi bûn? Çi karê wî li vira hebû? Hate van deran, bû sebebên derdê van feqîr û belengazan. Wisa zanibû ku ev neheqiya wî kiriye. Ew jî çima yekî mîna Ûsiv axare nedixebitî? Ew jî cem Okeş axa, şev û roj nedigot û kar dikir. Ji canê xwe zêdetir, malê axê diparast. Bi êvaran hemû laşê wî, bedena wî, te digot ku bi şiva kutane. Li ber xwe diket. "Fem dikir ku

ew najo, Okeş axa yê yekî dinê bibîne, bide ajotinê. Ev traktora mezin qet vala disekine? Çima di vê dinêde xênji Weysel şofêr tunebûn? Dibe ku ji wî erzantir jî bênê, kar bikin. Destê xwe bihêjine, wê deh şofêran keve. Ewê çi bikira? Qet nebe, karê wî hebû. Nîvî nîvî bi serê xwe bû. Kes tev karê wî nedibû. Wekî wisa nebiya, ev toz, roj û qirêj qet dihate kişandinê. Wekî ji vir here, wê çi bibe? Here gundekî dinê. Ew deran jî awha. Neheqiyên mînanî vira. Ez çi bikim? Qet gunê min tune. Xwedê jî zane tune. Çi ji destê min tê?"

Zeviya mezin hemû hatibû ajotinê. Niha dor dihate zeviyên dinê. Çi bû, wê rojê bû. Weysel hate serê zeviya ku bi wî hatibû nîşandanê. Difikirî, gelo ji kêderê dest pê bike? Li ser piya, lê dinhêrî. Li ser zeviyê, yekî çil û çilpênc salî, jarik hebû. Sîng û pêsîrên wî vekirî, kincên wî û her tiştan nîşan dida ku gundîkî pir feqîr bû. Cem wî, zarokekî heft, heşt salî, li ber du berxan bû. Berxên xwe diçêrand. Jinikek jî hebû. Jina wî bû, ruyê wê nedihate xuyanê.

Weysel, wexta ji dûrve hat, traktor nêzîkî zeviyê bû, gundî dest û milên xwe ba dikir, îşaret dida wî û diqîriya. Dixwast bêje ku "şûnva here, pêşda neye." Weysel daxwaza wî fem nekir, nizanibû. Weysel li ser piya, dirêjayî û beraya zeviyê mêze dikir. Niha Weysel li ser traktorê bû, çavên wî li zeviyê bûn. Li hîvya gundî bû ku nêzîkî wî bê. Gelo çi diqîre?

– Çiye brao? Çi dibêjî? Çi diqîrî?

– Çawa? Ezê çi biqîrim? Lê ezê li kê biqîrim? Çi karê te heye li zeviya min? Dibe ku min gazî te kir?

Him nêzîk dibû, him jî kevirekî mezin destê xwede digirt. Ruyê wî qemitî, ji hêrsan sor û reş bûbû.

– Çi karê min li zeviya te heye? Ez zeviya Ûsiv axa dajom. Ev der çima ne ya wiye? Ewî evder nîşanî min da.

– Lêxe, ji vira here. Lêxe here. Bela xwe negere li vira.

Na birayê min, na. Çi karê min bi te heye? Şaş nebe. Him jî wisa bi neyarî xeber nede. Awha xeberdan ne başe.

Xidir dakete jêrê, li benda îşareteka Weysel bû. Destê wîda hesinek hebû. Jinik jî hate cem mêrê xwe. Ew jî diqîriya niha.

– Ji vir herin. Yalla. Herin. Em we naxwazin!!!

Gundî li cem jina xwe, ji berê pirtir dengê xwe bilind dikir, dida xebera.

– Ezê di jina wînim, ku tu aniyî vira.

– Nede xebera bira. Çêra meke ku em qise bikin.

Zarok jî hatibû, çavên wî bi hêsiran tijî, li vê makîna bi tekerên mezin mêze dikir. Ji alîkiyê din, ev çilo tişte, pêş û paşya wê teselî dikir. Çavên gundî ev herdu meriv nebirî. Zanibû ku cîranên wî piştî qasekê wê li wirabin. Gelo çima nehatin? Hemûyan di nav xwede xeber dabû ku, "waxta li hevxistin bibe, netirsin. Lê şofêr ku zevî ne ajot û çû, hemû wê li ber zeviyên xwe bisekiniyan, bi piştekî mijûl bibana."

Xidir di dilê xwede, "ez bi vî hesinî yek û du bi canê gundî kevim" digot. Weysel bêtir li ser hemdê xwe bû. Gundî zimanê xwe êdî pir zêde dirêj dikir. Pir pêşde diçû. "Qet awha tê xeberdanê? Wê derd û halê xwe bigota, lê ev dide şora, diqîre." Damîş nebû.

— Oro, tu çi diqîrî? Mîna meriya xeberdanê nizanî?

— Ma ezê merivbûnê ji te hîn bibim? Erê? Tu fem nakî çima? Lêxe here dibêjim! Biteyse ji zeviya min! Çi disekinî hela hê? Tu dixwazî ku ez serê te bela – belayî bikim?

Bihna Weysel jî teng bû. Bêsebrî hate ser.

— Lawo tu çi merivekî bêfemî! Aha ezê bajom, tu derdê xwe ji kêre dibêjî, here bêje.

Traktor saz kir. Bi hêrs, lez û bez berve zeviyê ajot. Ku gundî xwe nehavêtiba alîkî, tekera rastê hindik mabû li ser lingê wîre derbaz bibe. Kevrê destê xwe ji parre havête şofêr û traktorê. Bû vizîniya kêvir. Ji parre hat li hesinê ser tekerê ket û piçekî pelixand. Ji xwedêde li şofêr neket. Bihata serê wî, wê perçe – perçeyî bikira. Şofêr li şûnve nihêrî, ajotina xwe berneda. Xidir li pişt wî, li ser traktorê bû. Weysel teme kiribû ku bira peya nebe. Çêr û xeberdan hela hê dihate guhên wan.

— Di serê vî kurê kerêde, qet piçek aqil tune. Hêrsa meriva tîne.

Mêrik ji parre kevirek dîsa havêt, kevir vala çû. Weysel traktor da sekinandinê. Peya bû jêrê. Xidir beriya wî xwe havêtibû jêr, hesinek di destê wîde bû. Gundî û jina wî, di destande kevir û dar berve wan dihatin. Kurê wan li pey, him kevir kom dikir, him jî digiriya. Kevirek hat li qalça Xidir ket.

— Way dayê... Kuro çima tu har bûyî, got û bi hêsinve rikêfî gundî kir. Mêrik xwe da alîkî û dest havête hêsin. Meriv ji wî bawer nedikir ev lez û quwet. Hesin di destên herduyande bû. Herduyan jî dikişand. Milên Xidir zexm bûn, hesin ji yê dinêre nehişt. Jina wî ji parre, bi kulman li Xidir dixist. Kurik digiriya, kevir dihavêt.

Weysel li ser hev çend cara bi Xidirre qîriya.

— Berde wî hesinî. Berde wê lewyê.

Xidir lewye nehişt. Weysel lê xist ji destê wî girt. Xidir berda, gundî jî bi nîv dil dest avîtibûyê. Weysel lewye girt û havête alîkî. Hêrsa xwe bi Xidir hanî.

— Tu dînî lawo? Bersiva kertiyê bi kertî nayê dayin. Bêhişo.

Dehfek dayê û ewa bi dûr xist. Gundî û jina wî dîtin ku Weysel hevalê xwere giliya dike û dixwaze li wî xe, zêde nekirin, sekinîn.

Wê waxtê, ji zeviyên cîranan, ji aliyê gund, jin, mêr û zar bi dirgan, dar û çoyê xweve xuya kirin; berve wan bi lez dihatin. Weysel bi deng û qîrîna wan ziviri. Nihêrî û fem kir ku halê wan xirabe.

Gundî û jina wî ku çav bi cîranên xwe ketin, êdî mînanî kesên harbûyî bûn. Xidir qalça xweye êşyayî girtibû. Çavên wî şaş û veciniqîbûn. Wê bi kude bireviya? Herke ku bireviya, wê ew bigirtana, hetanî kuştinê lêdana. Weysel nerm bû. Difikirî ku wê çawa ji nava vî karî bifilite? Lê wekî lêxin, wî bikujin? Lê wekî traktorê bişewitînin? Qerarê xwe da. Wê lewye hildana destê xwe, piştên xwe bidana traktorê, xwe biparêztana. Lê gundî nedihatine xûlîkirinê. Wê bi hinekên baqilre qise bikirana. Ku ji vira azabûna, wê ji vir biçûna.

Pêşiya gundiya gihîşte wan . Radibûn, diketin û diqîriyan. Hatine cem Weysel. Weysel qet destê xwe jî bilind nedikir. Bêdeng disekinî. Yên ku herî pêşîn hatin, dîtin ku Weysel tiştekî nake, disekine... Ew jî sekinîn. Didane xebera û çêra. Kesî lê nedixist. Soro gotibû, "li kesî nexin. Kuştin, birîndarkirin qet tune. Heta dawiyê em destên xwe bilind nakin."

Yên dinê jî hatin. Qelebalix her diçû zêde dibû. Ji nişkêve bist û pêne—sî kes bûbûn, hîn jî zêde. Ji parre dîsa dihatin. Wexta ku ewê porsor, rûzer hat, gişt vebûn. Ew pêşde hat. Ev herduyên xerîb di nav gundiyande mabûn. Gundî diqîriyan û didane çêran. Soro, bîhna wî çikiyayî, singê wî diçû û dihat. Şiveke qalind di dêstde bû.

— Çiye? Çi dibe?

Weysel:

— Lo bira. Ev erd nişanî me dan. Ez hatim û bajom. Ev camêrî han, qet tiştek negot, bi çêr û qelebalix; bi kevir û daran rikêfî me kir. Em xerîbin li vir. Ev kirinên ku hûn tînine serê me, ma mêraniye?

Ewî bi vî teherî gazinên xwe dikir ku ji dawiya qelebalixê hinekan deng da.

— Belê, ne mêraniye, tu dibêjî. Tu çima didî pey axê, têyî vira? Ma di dinêde xênji te mêrxas û dilpola tûne bûn? Tu ketî pey wî, hatî vira.

— Hela bejn û bala xwe mêze bike. Tu mînanî mêra têyî xuyanê. Te fedî nekir, hatî bo zilma xelqê?

— De bêje. Yên ku tu hanîne vira, bira bên û te xilaskin. Çi bû? Binhêre, axa qet ne xuyayê. Bi destên te agir digre. Hişê xwe komî serê xwe bike, lêxe here. Çi tere ev deran.

— Em derseke baş bidine wî, paşê bişînin. Bira bibe guharê guhan, ji bo yên ku piştî wî bixwazin bên vir. Bira neyênê Tendûrekê.

— Binhêrin, em du kesin, hûn pêncî, şêst. Ji hatina me ya vira hûn aciz dibin. De bêjin, ev çêrên ku hûn dikin, ev karên camêranin, an na? Em jî di bin emrê yekî dinin. Ev traktora bênamûs, tu ya mine. Em li ber emrê xwayî traktorêne. "Vê derê bajo", dibêje, em jî dajon. Ma çi dikeve bêrîka me? Bo ked û nanê xwe em vî derdî dikişînin... Ev kirina we şerme. Şerm û fedî kirina herî mezin eve, ku hûn bi axê nikarin, tênê ser me. Dema hûn awqasî mêrin, mêrxasin herin li hemberî axê derkevin. Axa zeviyên we ji destên we digire. Mêr ji yên wisanre dibêjim. We, awqas kes du xerîb hildane nav xwe, ne mêraniye ev.

Soro li cîranên xwe vegeriya:

— Hela, dengê xwe bibirin. Kuro, lawo, bê edebiyê neke. Ew li vir xerîbin. Gunehên wan jî tune. Gotinên wî rastin.

Piçekî bîhn hate ber Weysel. Soro li wî zivirî.

— Em bêne ya we. Binhêrin, hûn di nav mede tenê mane. Destê xwe dirêj kir, mala axê û sê çar kesên li ber deriyê wî nîşan da.

— Mêze bike, mêze bike. Li wir, li me dinhêrin. Qet kes tê, te dipirse? Wekî te li vir bikujin, tê ji kîsê bavê xwe herî. Binhêr, qet gavekê jî pêşde navêje ew axayê ku tu aniye vir. Ne, tu jî bi çavên xwe dibînî? Hişê xwe hilde serê xwe. Li van deran nesekinin. Mînanî berxên ku li dû maka xwe dikevin, pey wan neçin. Bira ew jî bêne cem we, paşê bêjin, "belê em bajon." Bibaxşînin birano... Gundît:ye... Tiştek li we nebû. Yekî, duda kire qîre qîr, awqas... Ew jî bi zora derdên xwe kirine. De herin, oxira we xêrêbe. Careka din jî tiştên awha neke birao. Paşê qet baş nabe. Herine karê xwe... Rê bidinê, bira herin.

Rê danê. Weysel û Xidir li rûyên kesî nenihêrîn, bi şerm û hêrs li traktorê siwar bûn. Qet pirsek jî, ji devên wan derneket. Lêbûn ku bifetisin. Berve cîhê ku tiştên wan lêne, çûn.

Ketin nava ciyên xwe. Di bin çadireke kevnde bûn. Weysel cixarek vêxist, yek jî da Xidir. Dîsa bêdeng. Weysel li ser piştê veleziya. Van gundiyên feqîr, jin û zarên xwe anîn pêş çavên xwe. Qet nexwestî, bê dil tevî vî karî ne baş bûbû. Li pêş gundiyan gelekî piçûk ketibû. He-

qê wan hebû. Paşê di xewre çû. Xidir li quncikê dinê dihênijî. Herdu jî westiya bûn.

Gundî, hêdî hêdî vegeriyan ciyên xwe. Alîkariya hev kiribûn, tiştekî baş bû ev. Di dilê wande sivikayî û firehtî hebû. Xênji vê rê tûnebû. Di hişê hemûyande cî girt, ev kirina. Hinek difikiriyan, wê ji vir ha çi bikirina? "Lê wekî her çûyî, kar germ û li tevîhev bibe? Wekî cendirme bi tivingên xweve bênê. Li tara hustiyê wan siwar bibin, lê paşê..."

## – XIV –

Weysel gelekî li ber xwe diket. Hindik mabû, canê xwe bide, lê Ûsiv axa ji ciyê xwe nelipitîbû. Welatê wî hate bîra wî. Çima ew der jî ne wilo bû? Axên Meraşê, çima pir baş bûn? Ew bêtir zorbe bûn. Xirabiya kesnedî dikirin. Him bi fesal û bi hine tehrên nû.

Her tişt xilas bû, Ûsiv axa hat halê wî pirsî. Gelekî bêkêf bû Ûsiv axa, wer digot. "Eger ku hinekî sebir nekiriba, wê bihata û bi tivingê yek, dudu birîndar bikira anjî bikuşta. Ji xwedêde tiştekî wisa ji dest derneketibû. Gundiyan Ûsiv axa rind nas dikir û zanibûn, lewra tiştek bi Weysel nekiribûn..."

Ev vir û derew hê jî Weysel diqehirandin. Meriv, gerek bi zimanê xweve rastbe. Bîzê wî hat, nedixwast êdî Ûsiv axa bibîne.

Ûsiv axa gelekî xeber da. Wê sê – çar xulamên xwe bi tiving pêre bişanda. Lê Weysel dîsa jî razî nebû. Nêzîkî zeviyan ne çû. Ûsiv axa xwe negirt û hêrsa xwe wîre anî. Te digot ku xwayê traktorê, axê wî, Ûsiv axaye.

— Niha bira ev traktor vala, bê kar bisekine? Ma ne gunehe? Tu perên xwe bistîne, li ser piştê razê. Traktor jî bê kar bimîne. Ma xwedê qebûl dike?

— Ûsiv axa, ez karkerim. Ez şoferim. Lê yê kê? Yê Okeş axa, ne yê te.

— Ha ez, ha ew. Çi ferq heye? Em herdu çima ne şirîkin?

— Ez tiştên wisa nizanim. Ez nikarim xwe bavêjim ber mirinê. Ezê zarên xwe binhêrim, ne tu. Meriv bimre, kes aveke sar jî nade kesî. Loma jî, ez di vî karîde tuneme. Ezê bixebitim, şev û roj... Lê, li wî erdê ku bê derd û bê belabe.

Bi ya Weysel biya, wê hemû tiştên xwe kom bikira û biçûya. Ûsiv axa, wê biçûya cem Okeş axa û cendirme qumandarî, ji bo şîkatê gun-

diyan. Lewra Weysel dikaribû benda axê xwe bisekine. Parîkî wê bîhna xwe hilda. Hela ka axê wî çi digot, çi dikir?

Ûsiv axa hate bajêr. Her tişt ji qumandarre got. Hinek tişt jî dane ser; "Gundiyan wê bi çekan şofêr û hevalê wî bikuştana. Xwedê kir ku axa û çend merivên wî gihîştibûn. Ji nav destên wan xilaskiribûn. Dil dikirin ku axê jî bikujin. Qaymeqam û cendirman jî naxwazin, ew alîkariya axê dikin. Eger ku nebe wê wan jî bikujin. Qanûn çiye?"

Bi alîkariya telefona cendirman li vîlayetê, bi Okeş axare xeber da.

— Nesekine. Zûtirê were, got.

Bi telefonê kêm tişt gote Okeş. Gundiyan hewekî kirine qîrîn, şofêr naxwaze traktorê bixebitîne. Li bajêr li benda wî bû. Zivirî li alî cendirme qumandarî:

— Ev teresên tirsonek jî derdin ha. Nika ya rastî jêre bêjim, ji vîlayetê nayê vir. Lewra min got ku tiştek tune. Bira zûtirê bê.

Okeş axa nîvro şûnda hat. Navroj tev xwarin. Ûsiv axa yên bûyî li gor dilê xwe jêre got. Yek û dudu yên pêxas, xwe nezan kirine mirte mirt, şofêr jî lewra zeviyan najo. Kar nîvçe hiştiye.

— Lo Okeş, ev çiqas bê aqile? Vî zemanî, qet traktor rojekê jî vala disekine? Te awqas pere dan, min jî gundek temamî.

— Ûsiv axa, ya ku ez zanim Weysel ne tirsoneke. Min jî, malê min jî mînanî canê xwe hezdike. Merivê minî herî başe. Nizanim çi bûye?

— Te jî çi got axa? Çi cesûre lo? Hela hê te negotibû "ha", reviya. Paşê min jê re got, were ez kesên bi tiving bidime cem te, gazî cendirman bikim. Min kir û nekir nebû. Paşê jî min gazî te kir. Min got, ez jî şêrîkê axême. Him jî bi senet û qewl. Çima gura min nakî?

Bi van gotinan dixwast ji Okeş axare bêje ku ew jî nikare xwe şûnva bikişîne. Zanibû. Ev bi femin. Zû tê digêhêjin. Bira rind têxe bîra xwe. Ji vî karî dest kişandin nabe.

Çi kir, kir û bîr û baweriya Okeş anî rê. Tev çûne cem cendirme qumandarî. Qumandar wê bi cemdirmanve bihata gund. Wê derseke rind bida gundiyan. Di guhê Okeşde got, "sed panotekî bidime qumandar, çend kesa li qereqolê miz bide, paşê dengê kesî dernakeve." Okeş axa bi xwe jî hostayê van karan bû. Dizanibû, ku gundî nikarin li van erdan bibine xwayî. Ûsiv axa sêrîde qet qala van tiştan nekiribû. Wê çaxê qet ne lêdiwaliya. Çi karê wî hebû di nav tiştên awhade.

Paşê her tişt bihîstibû. Lê belê nikaribû vegere û tiştekî bike. Yê bûyî, bûbû êdî. Ev Ûsiv axa dostê qumandar bû. Nîşan dida ku hemû serêşan dikare pê hal bike.

Wê cîp bigirtana, biçûna gund. Qumandar çar cendirme pêşyêve şandibû. Ewê jî ji parre biçûna.

Okeş û Ûsiv axa diçûne oda qumandar. Ûsiv axa li pêşiyê bû. Bê tirs û bê xem sed panotekî hêşîn kire bêrîka wî. Paşê gazî Okeş kirin, ew jî hatibû hundir.

Ew çar cendirme dibe ku têrê nekirana. Du heb jî hildabûne cem xwe. Waxta ku gihane gund êdî esir bû.

Okeş çû cem Weysel, gelekî bi pirçî bû. Ji axê xwere xêrhatin got û xwe berhev kir.

– Çawanî Weysel? Çibû di pey minre? Waxta ku ez li vir bûm, tiştek tunebû.

– Axa gelek tişt hebûne, lê me fem nekiriye. Piştî xilaskirina wê zeviya mezin, dor hate ciyên din. Gundiyan got, "emê erdê xwe bi xwe bajon, em nadine kesî." Nehiştîn. Pêncî, şêst kes hatin ser min û Xidir. Me hevdu bir û hanî. Heger me bi aqilî nekira û di nav wande yek duduyên bi aqil nebûna, halê me ne tu hal bû. Teyê niha cendekê me li vira bidîta. Ûsiv axê te, qet ji ciyê xwe jî nelepitî. Her tişt qedya, paşê ji mala xwe derket, hate ba me û got: "Na minê dardekira, minê bikuşta. Nizam çi û çi." Ji bo wê jî axa, ez di vî karîde tuneme. Tu zanî, serê min di riya tedaye. Em dostê dostê hevin. Ez te dost zanim. Ji dostê xwere mixenetiyê nakim. Lê belê, jin û zarê min jî hene. Ji bo xatirê Ûsiv axa, xwe navêjim nav êgir.

– Hela meqehire Weysel. Fesal bike. Em bûne şirîkê wî, Weysel. Gerek em vî karî heta sêrî bibin. Me wisa qewl kir, ne wisane?

– Belê wisaye. Di sêrîde jî qet çavên min Ûsiv axa negirtibûn. Lê belê em tevî karê mezinan nabin. Awha hîn bûne em. Lewra min ji tere jî tiştek negot.

– Heqê te heye Weysel. Ji minre got ku merivên mine bi çek Weysel û Xidir xelas kirine. Way tirsonekê bêdil, way!.. Ji mala xwe derneket ha!

– Derneket axa, derneket. Ya rastî, yê ku min aciz dike jî, eve. Bi tuyî tuneyî, emê ji bo zeviyên Ûsiv axa bimrana. Dest û lingên te radimûsim, em vê derê bihêlin û herin. Cîkî bi belaye. Ne mîna zanebûna teye. Tiştekî bi derde. Eger ku nabe, destûrê bide min, ez herim mala xwe. Karê te awha nîvcî hîştin, ji minre ji mirinê xerabtire. Tu jî zanî. Lê ez çi bikim?

– Hela bisekine lo. Emê tiştekî bikin niha. Ji yekî xilas dibin, bi yekî din diwalin... Niha cendirme wê wan bînin rê. Paşê tu bêderd, dikarî karê xwe bikî, bajoyî. Van galgal û qelebalixê nenihêre tu.

— Na, axa. Piştî çûyina cendirman wê dîsa bên. Ez nizanim. Lê wisa fem dikim ku ew ne mînanî yên dinêne. Yek jî, min duh lê nihêrî, dilê meriyan dişewite. Ev Ûsiv axa neheqe. Gelekî neheqe. Gerek em nebin şirîkê neheqiya wî, axa.

— Ne tu zanî. Me pirs da hev. Me cem notêr sened çêkir. Qewl da wî. Em ji pirsa xwe bizivirin, wê bîst pênc hezar panota ji me bistîne. Traktoreka baş û nû jî qasî bîst pênc hezarî dike. Gerek em karê vî kafirê kurê kafira bikin. Rêka din tune.

Weysel serê wî di berda, te digot ku lava dike.

— Lava dikim axa. Min tevî vî karî neke. Emê parîkî nan bixwin, bira tevî neheqiya Ûsiv axa nînbe. Paşê kar û keda me jî bêxêr dibe. Min bibaxşîne. Anjî ez herim traktoreka dinê. Bira hevalekî dinê bê.

Qumandar, çar cendirmên berê hatibûn û duduyên ku bi xwere anîbû kişandibû qûncikekî, emir dida wan.

— Çavên xwe rind vekin. Çi dibe, çi nabe? Çekên xwe vala bikin. Tiştekî bêtam naxwazim. Kîngê min emir da, hûn hazir bin. Zirarê nedine kesî. Bira ji we bitirsin, lê derdekî, serêşekê neynine pêşya me. Guhê xwe bidin hela ka gundî çi dibêjin. Di gundde çek hene an na? De ez we bibînim!

— Sersera, qumandarê min!

Yek, yek çûn, nêzî gundiyan bûn. Guh dane dora xwe.

Gundiyan, wê şeva ku ev tişt bûbûn, heta derengî bi hevre qise kiribûn. Mijûl bûn... Rind zanibûn ku cendirme wê bên gund. Bo ajotina zeviyên wan, traktor wê dîsa bê. Piştî van xeberdanên dûr û dirêj qerarê xwe dan. "Eger gazî wan bikin, wê biçûna. Qet kesekî ji wan rikêfî kesî din nekiribûn. Qet nizanibûn ku kê şofêrre daye çêra û beziyayê. Lê ku şofêr wan nas bike, nîşan bide, li ser bihîstina qîrîn û qelebalixê, çûne wira. Ew xortê, alîkariya şofêr dike, wî bi xwayî zeviyêre dabû xebera û dehfandibû. Tiştekî awqas mezin nîn bû. Paşê wê dîsa bihatana li cem hev û bifikirîna. Wê çawa bikin û çi bikin ku traktorê ji gund dûr bixin. Gerek neqehirîna, hêrs nebûna. Hela ka xwedê çi nîşan dide."

Qumandar gazî Weysel û Xidir kir. Yên bûyî ji wan pirsî. Paşê wê gotinên wan derbazî kaxizan bikira, bida navnîşan kirinê.

Weysel:

— Pey zeviya mezin, Ûsiv axa hine ciyên dinê nîşanî min da. Ez çûm ku wêderê bajom, hinek hatin, bi mere kirine qîre — qîr û bezyane me. Xwastin rikêfî me bikin. Paşê hinekên dinê hatin. Çêr û pevçûn çêbû.

Gotin çi karê we li vira heye? Hinek ketin nava me. Em jî dûr ketin û hatin.

— Çend kes bûn, ew?

— Gelek bûn. Min nejimirî, lê çil, pêncî hebûn.

— Di destê wande çi hebû? Çekên wan hebûn an na? Çend hew ji wan bi çek bûn?

— Yên bi dar û şiv hebûn, lê min yên bi çek nedîtin.

Li aliyê Xidir vegeriya û jê pirsî:

— Yên bi çek hebûn?

— Na xêr, begê min. Yên bi çek tûne bûn.

— Rind bîne bîra xwe, qet kesî bi çek tunebû?

— Na xêr, begê min.

Qumandar pirçiyê xwe kir. "Ev çilo gotinin? Çekên wan ku tunebin, ezê niha çi bi wan bikim? Qet." Dilê xwede awha derbas kir.

— Navê wan dizanî?

— Na xêr. Em nû hatine. Me cîkî din kar dikir. Kesî nas nakin.

— Wekî wisane. Tu ku wan bibînî, tê nas bikî?

Weysel kete şikê. Nedixwast, navê kesî bêje. Ji bo Weysel, di dinêde karê herî bênamûs û herî rezîl, îxbarkirina xelqêye. Ew bizanibe ku ewê bê darda kirinê, dîsa jî nake. Paşê kevir û kuçik li pey merivan diqîrin û îxbar kirina wî dibêjin. Lewra mezinan gotiye; kesên herî bêşeref, merivên awhane. Xwe zûtirê berevî ser hev kir.

— Nas nakim. Texmîn nakim ku ez nas bikim.

Ewê porzer, porsor, ewê zexm û bi goşt ku alîkariya wî kiribû, ji bo xilaskirina wî xebitîbû, hate bîrê. Gerek ew jî negota. Alîkarîkirina wî jî qise nekira. Paşê wê ji wî bipirsiyan, canê wî bi êşandina. Heger xwayî zeviyan dibêjin, gunêh yê wane, ne yê mine. Ez bi namûs û merivtiya xweve bijîm. Çi minre yên dinê, got di dilê xwede.

Ev çi kar bû îro? Qet kesek ji gund nêzîkî wan nedibûn û pêşde nedihatin.

Bûyînên nava gundiyande, kî bi pir cîran û qelebalix bê û kî gelekî dengê xwe bilind bike, wisa texmîn dikirin ku wê bi heq bê zanîn, loma jî bi lez dihatin hawîrdora wan digirtin. Lê belê, îro ne wisa bû. Saetek bû ku ew hatibûn, lê gundiyek jî nêzî wan nebûbû. Te digot, hemû bi hevdu şêwirîne. Ev çiye? Gelo yek aqil dide wan? Na lo, kî wê aqil bidê?

Qumandar ev hanîn bîra xwe. "Gelo ji min û cendirman ditirsin, lewra nayênê? Min çi li wan kiriye? Ez tu cara nîşan nadim ku ez aliyê Ûsiv axa digrim." Ji nobedarre got, bira gazî mêrên gund bike. Ji

xwere jî avdewek xwest. Tasa mezin tijî avdew, hilkişande serê xwe. Li hêviya gundiyan ma. Qederekê şûnda, gundî hêdî hêdî, yek û dudu nêzîk dibûn. Te digot, hema hema hemû gundî hatibûn. Li ber derî Okeş, Ûsiv axa û li cem wan jî Weysel û Xidir disekinîn. Di ortêde qumandar rûniştibû. Şewqê xwe dabû ser çoka xwe, kursîk li cem bû, li ser wê jî hinek kaxiz hebûn. Yên nû dihatin nêzîk bûn, pêşve çûn. Şewqên wan di destde bûn. Hemû bêdeng, bi meraq nîn bûn. Te digot ku her tiştî ji berêve dizanin wekî wê çi bibe. Bêxem li dora xwe dinihêrîn. "Te em îxbar kirin", digot çavên hemû gundiyan û li ser Weysel bûn. Weysel jî mînanî wan rehet, wekî dostan li wan mêze dikir. "Ez jî mînanî weme" digot çawên wî.

Okeş bi hatina xwe hezar carî poşmam bûbû. "Ji ruyê min, hûn van derdan dikşînin", difikirî û nikarîbû li ruyê gundiyan binhêre. "Heke ez nehatama, waha jî nedibû... Lê carekê hate serê min jî... Walle û bille min jî nedixwast."

Ûsiv axa dilgeş bû. Her tişt bi ser xwastina wî diçû. Kêfa wî di cîde bû. Okeş ji her alîde rind girêda bû. Ew nikare vegere. Heke hezdike, bira şûnve bizivire. Nîvî gundiyan çûne, nîviyê dinê nizane ku çi bikin. Berîka çend memûrên bajêr germ bike, hemû tişt diçe sêrî êdî. Qumandarê niha wan rind bîne rê. Bira roja xwe bibînin. Bira bizanibin ku dinê çiye. Mirtezayê serokê partiya nû, berê zêdetir li wî digeriya, pirsa wî dikir. De wê çi bibe, bira bibe. Kîder zirave, bira ji wêderê biqete. Ciyekî minî zirav tune. Yê şikestî ziraviya pişta wane... Ji minre ne derde.

– We rikêfî şofêr kiriye. Wiyê erdê Ûsiv axa bajota. We xwastiye ku wî bikujin. We çima wisa kir? Kê kir? Yên kirî pêşte derkevin.

– Heşa begê min. Me tu kesî ku bixwaze wan bikuje nedît.

– Lê wê çawa bibe? Dar, dirgan û çek di destde, hûn çûne ser mêrikan.

Kesî bersiv neda berê. Paşê yek û duda:

– Na xêr, me tiştên wisa nekir, gotin.

Ûsiv axa her tişt zanibû. Bi xwe neçûbû ber zeviyê, lê ji dûrve nihêrîbû. Ew pêncî – şêst gundî yeko – yek nas dikir. Paşê, nobedar Şukrî xeberên rast hemû jêre gotibûn. Ûsiv axa dikaribû hemûya jî yek bi yek bijbêre û bêje. Lê qet tiştek bi şofêr nebûbû. Yek jî, ewî bi xwe digot ku "ez kesên ku rikêfî me kirin, qet yekî jî nas nakim." Gundî jî em ne li wir bûn dibêjin. Tiştekî din ji devên wan dernakeve. Tirsonekan. Dixwazin li yekî xerîb xin, paşê bi tirsa canê xwe, ne em bûn, dibêjin.

Eger cendirme çend gundiyan li qereqolê bikutin û miz bidin, baş dibe. Lê wekî dîsa jî neyên rê? Kar wê çaxê gelekî dilewite? Ev gundî ji ku bûbû bela serê wî?

Qumandar, Weysel gazî cem xwe kir.

— Li ruyên giştan binhêrin. Dibe ku hûn nas bikin. Kî hebûn ji van? Bijbêrin!

Weysel yek, yek li pêş wan sekinî. Li ruyê wan mêze kir û derbas bû. Li pêş Soro, çavên wan li ruyê hev sekinî. Bi dostî li hev nihêrîn. Paşê dîsa çû pêşiya hinekên din. Heta dawiyê çû, qumandar jî pêre bû. Zivirî û got:

— Na xêr, min qet yek jî nas nekir.

— Te çi got? Qet yek jî nas nekir? Qet yek jî ne mîna wane? Tu yekî çi qasî bêaqilî? Te qet li rûyên ku dixwastin te bikujin nenihêrî? Anjî ji tirsan te serê xwe kire nav şeqên xwe. Ev çi hale?

Weysel qet hilneda ser xwe. Gundiyan rind fem dikir ku Weysel ew nas dikir, lê nedigot. Qumandar vê carê gazî Xidir kir.

— Hela carekê jî tu mêzeke!

Xidir li ruyê Weysel nihêrî. Paşê wî jî mînanî Weysel kir. Hinekî lez mêze dikir. Vegerî û got:

— Na xêr, begê min. Min jî kes nas nekir.

Qumandar gelekî bi hêrs bû. Di dilê xwede hine tiştên nû difikirî.

— De hûn dizanin. Tiştekî ku ez bikim tune.

Kef bi dora lêvên wî ket. Li ser qelebalixêde qîriya.

— Li vî gundî, de bira dîsa tiştek bibe, xwedê dizane ezê canê we bistînim. Bi namûs û bê şer di ciyê xwede rûnin. Yên ku naxwazin, bira bicehnimin herin. Kude diçin bira herin. Bira kes bela xwe bi kesî nede. Hemû di karê xwedebin. Lo lawo, hûn ji traktora xelqê çi dixwazin?

Li vira du cendirman dihêlim. Ezê emir bidim, ku kî nerihetiyê derbixe, bira li newqa wan xe. Bi tiving û gullan. Hûn jî şoferno, bela xwe di gundiyan nedin. Yên ku lêne we bikujin, hûn nas nakin... We bajar hemû tevî hev kir.

Paşê diçû û diziviri. Şûnve diçû, paşê dîsa dest bi xeberdanê dikir.

— Rewşa gund xirab nekin. Mînanî merivan bi hevre bijîn. Hûn çi dixwazin? Em hemû karên xwe bihêlin û bi were mijûl bibin? Qet dîn, îman tune li cem we? Qet hûn ji xwedê jî natirsin? De, careka din jî tiştekî bikin, bibînin ez çi dikim. Bibînin qanûn çawa devê merivan diçirîne. De hûn mêrin tiştekî bikin.

Got û got. Te digot ku gundiyan qet guhdarî nedikir. Hemûyan rojên xwe yên dihat û karên xwe difikirîn. Çêrên wî li ber guhên wanre derbas dibû û diçûn.

— Ez diçim. Hûn hemû jî gurra cendirmên min bikin. Hûn ji minre çawanin, ji wanre jî wisabin. De biteysin herin, bicehnimin herin.

Gundî hemû vegeriyan û hêdî hêdî çûne nav gund. Ûsiv axa û Okeş di quncikekîde qise dikirin. Tev qerar dan ku wê Weysel bişandina ber traktoreke dinê, şofêrê ya dinê bihanîna vir. Heger tiştekî din dernekeve, du roja şûnve wê dest pê bikirana. Weysel û Okeş axa wê bi qumandanre biçûna bajêr. Paşê ji wira wê birêketana berbi traktora dinê. Ûsiv axa wê du xulamê xwe û nobedar Şukrî bişanda alîkariya Xidir. Yên her şev heta sibêhî nobedarî bikirina. Tiştek neyê serê traktorê. Pey hatina şofêrê nû jî, gerek du nobedar hebûna. Çend quruşên wan wê biçûya, lê ne derd bû. Çi dibe, çi nabe. Nayê zanînê. Lê wekî bihatana, traktor bişewitandina? Wê çaxê wê çi bikira? Du cendirman wê rewşa gund mêze bikirina û paşê biçûna bajêr.

Qumandar ew cendirmên ku wê li gund bimana, şîret kir. Wê li mala axê razana, bixwarina û vexwarina. Wê li pêş gundiyan serhişkbûna, lê li kesekî xistin û birîndar kirin nedibû. Heke ku bizanibûna tiştên nepak wê bibin, zûtirê xeber bişandana qumandar.

Paşê yên çûyî, çûn. Şeveke reş û tarî dakete ser gund.

## – XV –

Ûsiv axa gazî Eso û Hesen kir. Ev herdu û Şûkriyê nobedar, yên ji vir ha, her şev li ber traktorê bisekinîna û biparastana. Tivinga nobedariyê û debancek jî wê bi wanrebiya. Gerek kesî nizanibiya ku axa debance daye wan. Gerek nîşanî kesî nedana û badilhewa bi kar nehanîna. Her sê jî wê bi roj li ser karên xwe bûna. Her şev yek ji wan, heta sibê hişyar, li ber traktorê biya. Ji bo vî karî her yekî wê mehê sed panot bistanda. Niha kê dikarîbû awqasî bi destê xwe xe? Meha memûran du sed û sê sed bû. Çi dixwastin êdî?

Hersêkan jî bi dil qebûl kirin. Bi vî tehrî, sebebên xeberdanên Eso û Hesen li nav gund derkete ronahiyê. Herduya jî car cara li malên çend cîranan fesadiyên xwe dajotin. Kêmbe jî dîsa yek, du cîranan guh didane gotinên Eso û Hesen.

Weysel çû, lê kes nehatibû dewsa wî hela hê. Xidir dixwast ku van hevalên xwe yên nû baş nas bike. Car cara li ser bûyînên gund xeber

didan. Du roj û du şevan li cem traktorê veleziyan û razan. Şevê qet tiştekî ku jê bitirsin nebûbû. Bi kêf li hêvya şoforê nû disekinîn.

Ûsiv axa xeber hildida ku di gundde xemeka giran heye. Hinek poşmam bûn ku zûtirê ji gund neçûbûn? Hinek ditirsiyan ku li gundde wê bûyînên mezin bibin. Çend cîranan, "axa hine erdê nû bide me, em dest pê bikin, bajon" digotin. Hema ji kêderê dixwaze, bira ji wir bide. Lê belê, çend mal jî hebûn ku meriv qet nizanibû ku ew çi dixwazin û wê çi bikin? Bi ya wan axa neheq bû. Gerek bi komekarî hemberî wî bisekinîna. "Axa, du sê malin, em ji heftê mala zêdetirin. Çi dibe bira bibe, lê emê li pêş bisekinin" digotin. Meriya nizanibû ku ewên awha çend malin. Kî li aliyê kêye? Nedihate zanînê. Yekî ku awha difikirî, paşê bi curekî din xeber dida. Anjî yên ku ditirsiyan, te dinhêrî ku bizot û germ, bûne dijminê axê.

Hesen û Eso, ku gundî didîtin, serên xwe berjêr dikirin, derbas dibûn. Ditirsiyan ku gundî wê li ruyên wan bêjin, ku ew hatine firotinê. "Wekî gundî li dewsa me bûna, ma qebûl nedikirin?", car cara wilo difikirîn û dixwastin ku herine cem cîranên xwe. Lê paşê şerm dikirin, xwe şûnve dikişandin. Li hinek ciyan, bi dizî û tele – tel digotin ku axa bira zeviyên nû bide, em bajon, ev ji mere baştire.

Sê roj bi pey çûyîna Weyselre, berve êvarê şoforê nû hat. Wê êdî dest pê bikira. Du cendirme, nobedarê wî, wê li ba wî bûna. Her tişt wê baş biçûya. Şoforê nû, ji Xidir hîn bûbû ku qet tu kêmasiyên wan tunin.

Soro û Mîro wê şevê tenê man û difikirîn. Yên ku li gund dibûn, hişê meriya hilnedida. Hinek dixwazin, çi dibe bira bibe, lê li hemberî axê bisekinin. Hinek cîran ne mînanî berê bûn, niha bêtir nerm bûbûn. Lewra gerek meriya cesaret û xîret bida wan. Tev xeber bidana û têxistana hişê wan ku rêke dinê tuneye. Gerek wan jî îna bikirina, guman bihanîna. Bê bawerî, qet tiştek nedibû. Hişên wan gerek ev tiştan fem bikirana û bawerî pê bihanîna. Bi yekbûn û tevayî li hember sekinandin. Hişê wan ku hilnede, dilên wan jî taqet nake. Wê çaxê her tişt tevî hev dibû, destên wan jî di paşila wande dima. Hinek tiştan gerek ji hemû gundiyanre negotana. Hinek bi quretiyê, hinek bi zev- zekbûnê li devên xwe nabin xwayî, qise dikin. Derd û belan tînine serên xwe. Bi vî teherî qerar dan.

Xwarziyê Soro, Elî xortekî jîre. Yê feraqekê tijî nift bikin, bidinê. Bi şev, berî berbanga sibê, wexta ku çavên meriya ji xewê ji hev venabin, Eliyê nêzîkî traktorê bibe, niftê li tekeran û her derê wê bide. Paşê

agir berdê, bi xwe jî bi lez û bez bireve, dûr bikeve. Xênji vê, rêke dinê nedihate bîra wan.

Gazî Elî kirin, li cem xwe dane rûnişkandinê.

– Binhêr xwarziyê min, Elî can. Ezê tiştekî ji tere bêjim. Te bikujin, goştê te bidine ber gûzana, çermê te ziwêl – ziwêlî jî bikin, gerek ji devê te pirsek jî dernekeve. Ne niha, ne jî paşê. Eva gerek heta mirinê li cem tebe.

– Ser serê min xalo. Walle min bikujin jî kesîre nabêjim.

– Elî bavo, netirse. Guh û çavên me wê li ser tebin. Tengasiyêde emê bêne hewariya te.

Li ser van gotinên xalê xwe, Elî meraq kir û fikirî. Xalê wî heta niha tiştekî giran û bi tirs jêre negotibû. Karek hebûya jî Soro bi xwe dikir. Gelo çima niha ji Elîre digot? "Guhên me, çavên me li ser tene. Netirse." digot. Nişkêva xwe şaş kir û bêdeng ma.

– Neke xem Elî. Tiştekî tirsê tune. Min xwast ku te rind hişyar bikim, lema wisa got. Xeberdana xwe nebirî.

– Tu zanî, em çi dikşînin ji destê axê. Zilma wî ne bes bû, çû, îcar jî traktor kire bela li serê me. Gund bela belayîbû. Hemû bi çol û baniyan ketin. Niha, heke em vê traktorê ji gund dernexin, eva mirina me hemûyane. Tu çi dibêjî, erê xwarzê?

Elî hine tişt texmîn kirin. Tirsa wî kêm bû. Niha bêtir rehet bû.

– Xalo, tu çi bêjî ezê bikim. Ez jî zanim, ev traktora ku axa aniye, wê me xizan bike. Hûn ji min mezintirin, ji min baştir dizanin... Ez li ber emrê weme. Tu û apê Mîro, hûn çi dibêjin, ezê bînime cî. Bêjin bimre, ezê bimrim.

Şewitandina traktorê niha bi tevayî difikirîn. Gerek tiştekî wisa biditana, tijî nift bikirana û xwe jî deng neda. Du qutî kibrît têkirina li her berîkeke xwe. Tu tiştekî sipî li xwe nekira. Bi şev, di waxtê xewa girande, wê nêzîk bibaya û nift pê bireşanda, agir berda. Bi xwe jî mînanî birûskekê ji wê derê dûr biketa.

Mîro tevî pirsan bû. Wê nift têkirina eyarê motê. Yekî ji wan gelekî nift hildida. "Tijî bike, bide pişta xwe, devê wê rind girêde. Paşê xwe bi erdêre bikişîne û here. Saetekê jî wisa herî, tiştek pê nayê. Li ciyê çûyî karê xwe bike. Bêdeng, ker û lal."

Kete hişê wan. Soro, ji berêva nift anîbû bîra xwe. Lewra hêdî hêdî ji mala xwere nift kirîbû. Hinek jî li mala Mîro hebû. Hanîn. Eyarê ku mot dikirinê, av jî jê nedinuqutiya. Nift kirin eyêr. Nîvê şevê, li pişta gund, Elî rê kirin. Ewê biçûya, ji dûrve biziviriya û ji paşve wê nêzî traktorê bibiya. Di ew erdên ajotîde, mînanî maran wê xwe bi erdê-

re bikişanda. Dema ku agir bi traktorê ket, deng û behs li nav gund hate bihîstin... Soro û Mîro wê hêdî hêdî bihatana nav gund. Pêwîst bû ku qet kes ji wan nekeve şikê. Yê herî nêzîkî wan jî... Ji Elîre debancek jî tivdarek kiribûn ku dema kete tengasiyê bi kar bîne. Soro û Mîro di nav ciyande xwe dirêj kiribûn. Bes xewa herdûya jî nedihat. Guhên wan li der bûn. Her çiqas wan jina Soro ji xwe dûr xistibûn jî, dîsa jinikê hemû tişt fem kiribû. Ji bo ku Soro û Mîro berxwe nekevin, ji derewan xwe xistibû xewê. Xalojina Elî û Elî ji hevdû gelekî hez dikirin. Soro ber xwe diket ku çima xwarziyê xwe tevî vî karî xeter dikir. "Heger tê bikî, bi xwe bike, vî tifalî çima davêjî nav êgir." Hemû gundî dikaribûn ji Soro biketina şikê. Lê belê kesî Elî meriv hesaw nedikir. Ji ber vê yekê jî şik nedibirinê Elî. Lewra, Soro xwarziyê xwe şandibû. "Bira çavên gişkan egîtan bibîne." Soro bi xwarziyê xwe pir dilxweş bû. Zanibû ku dilekî wiyî germ, dost heye. Di zarotiyêde diyar dibû. "Gayê çê, ji goliktiya xwede tê xuyakirin." Ev gotin ne badilhewane.

Dema Elî şevereşêde dimeşiya, nişkêva bi tenêbûna xwe hêsiya. Veciniqî, te digot ku ji dilê wî tiştek qetiya. Dilê wî li ser hev dikuta. Piyê wî li kevirekî piçûk ket, terişî. Ev çibû? Gelo ditirsiya? Eyarê niftê li pişta wî bû, bi dest pîva, giran nîn bû. Çiqas dilê wî bixwasta, dikaribû xwe xûz û xar bike û di bin vî barîde biçe. Di bêrîkên wîde jî kibrît hebûn. Li debanca di paşila xwede nihêrî, di cîde bû. Baweriya xwe bi xwe anî. Qederekê rê çû, rehetîk hate canê wî. Tirs û xof ji ser xwe havêt. Wekî ku tiştek nebûye, meşiya. Wê traktorê bişewitîne. Yek, yek hanî ber çavên xwe. Hêdî hêdî kete riya Zilanê. Paşê xwe da bin tara Kaniya guriyan, berve çem zivirî. Gund bêdeng bû, dinê di xewêde bû. Zeviya ku bi traktorê nû hatibû ajotinê, di serê wêre vegeriya. Ji paşve hat û hêdî hêdî berve traktorê diçû. Niha her bêtir hişyar û li der dorê xwe dinhêrî. Heger tiştekî ne baş bibiya, wê xwe bi erdêve bizeliqanda û bisekiniya. Meşa di nav şovêde pir zehmet bû. Piçekî pêşde çû, xwe xûz kir û wisa meşiya. Rêveçûna bi vî tehrî ne hêsan bû. Paşê pişta wî êşiya, xwe rast kir. Ji bo ku nebe xeterî, dîsa xwe xûz kir. Hinek rê hilda. Tirs û xof kete canê wî. Xwîdaneke sar pê ket. Eniya wî bi xwîdanê şil bû. Di alîkîde jî dilê wî rehet bû. Wek mirovên ku tiştekî baş pêk anîne. "Lê ku pêk neynim, bême girtinê û rûreş bibim? Ev kara ji bin serê kê derketiye, wê bê zanînî."

Wek maran bi erdêre zeliqî, xwe pêşve dikişand. Nêzîk bûbû. Çavên wî êdî, traktor û ciyê razanê ji hev derdixist. Hinek xwe da alîkî ku traktorê û der dorên wê baş bibîne. Sekinî. Bîhna xwe hilda. Dest bi-

re berîkên xwe. Çarixên wî sivik û bê deng bûn. Bi vî tehrî qederekê dîsa rê hilda. Li pêşiyê, reşaya tu tiştan nedihate xuyanê. Başe... Gelo hemû di hundirdene? Serma şevê, ew cemidandin û ketin hundir? Hê jî nêzîk bû. Gume – guma dilê wî bû. Çawa jî bi deng dikuta. Te digot ku dengê dilê wî bêdengiya şevê dişkêne. Car caran çokên wî dilerizi-yan. Lêvên xweyên zûha dadilêst.

Belê, niha ji traktorê sîh metro dûr û li pêş ciyê razanê bû. Tu ti-ştek nedilipitî. Her zêde nêzik bû. Di navbera wî û traktorêde bîst me-tro ma bû. Çavên wî li ser tekerên traktorê yên mezin bûn. Hesinên paşiyê çilo zexm bûn. Romork jî nêzî wan bû. Di reşaya şevêde hemû tişt li ber çavên wî bêtir mezin dihatin xuyanê. Li pêş traktora terikî xwe gelek piçûk didît. Hê jî çû, nêzîk bû. Careke din jî li der dora xwe mêze kir. Li pêş traktorê tiştek hebû. Mîna merivekî, veleziyayî. Seki-nî. Baş nihêrî. Belê, merivekî razayîbû. Ji tirsan ricifî. Heke ku fedî ne-kira wê biziviriya û biçûya. De çi dibe, bila bibe. Çend metro dîsa pê-şde çû. Ji tivinga Şûkrî, ew nas kir. "Wey seg bavê seg bav, Şiko, miri-na te deynê hustiyê mine, bes karê min niha ne eve."

Şev roj Şûkrî dişandine kar, xew ji çavên wî dinuqutî. Mînanî miri-yan. Mirî dikaribûn ji ciyên xwe rabin, lê Şûkrî nikaribû xewa giran hi-şyarbe. Elî, ev yeka baş zanibû, lewra pir dilxweş bû, dema ku Şukrî naskir. Karê wî êdî hêsa bû, heke tiştekî nû dernekeve. Çavên wî hînî tariyê bûbûn. Hinekî dîsa nêzik bû. Her tişt rind ji hevdû diqetand ni-ha. Şûkrî, li ber serê wî tivinga wî, li pêşiyê traktor û ciyê razanê, gişt, hemû yek yek ferq dikir. Gerek destê xwe zû bigirta. Yek ji wan hişyar bibiya, êdî tiştek nedihate kirinê. Çû cem tekera mezin, li aliyê dinê. Ne nêzîkî Şûkriye. Xwe siparte wê. Destên wî diricifiyan. Devê eyarê niftê vekir. Eyar di destê wîde bû. Nift reşande tekerê û erdê hawîr-dora wê. Bîhna niftê hate pozê wî. Îşev hînî vê bîhnê bubû. Xwe xar kir û nêzî tekera dinê bû. Nift rind rijande der û dorê. Nava herdu te-kera jî bîr nekir. Aliyek ku agir bigre, bira bigihêje aliyê dinê jî. Paşê, pêş û paşiya traktorê jî tev xilas kir. Eyarê vala kire paşila xwe. Dest da ser debanca xwe. Li Şûkrî nihêrî. Di xewêde bû, qet deng jê derne-diket. Kî çi zane, perên ku Okeş axa wê bide wî, di xewna xwede di-dît. Kibrît vêxist, di nav kefa destê xwede girt. Nêzîkî erdê bi niftê şil bûyî kir. Erdê zûtirê agir negirt. Ev çend saniye, ji bo Elî gelekî dirêj kişandin. Niha agir girtibû. Belê agir, bi dilê wî girtiye ana. Dît ku agir hêdî hêdî pêşve diçe, bawer kir ku êdî danamire, xwe xûz kir, bi şûn-ve vekişiya. Şûkrî hela hê hişyar nebûbû. Elî lez û bez dûr ket. Direvi-ya. Paşve nedinhêrî û direviya. Qet tu kes berve wî nedihat. Kesî banî

wî nedikir. Kesî ew nedîtibû. Westiya bû, lê mînanî teyrekî sivik bû. Ji ew rêyên ku berê hatibû, derbas bû. Vegeriya, hela hê berbang nebûyî hate gund. Hinek li ser xaniyan, ber deriyan şewata traktorê mêze dikirin. Hêdî hêdî diçûne malên xwe. Xwe bi kesî nîşan nedayî çû mala xalê xwe. Xalojina wî li ber dêrî disekinî. Ew hemêz kir. Elî bire hundir. Alîkarî kir ku wan kincên bi bîhna niftê bi guhire. Xalê wî hê ji nav gund nehatibû. Ew jî li derve, çav û guhên xwe vekirî li bendê Elî bû. Elî meraq dikir, gelo tiştek nehate serî?

— Diya te hat û pirsa te kir. Tu neçûyî mal. Feqîrê dilteng bûye. Min got ku tu bi xalê xwereyî. Min şîret kir ku li te negere û zimanê xwe bigre. Paşê ew çû. Li kêderêbe jî wê niha bê vira.

Agirê ku Elî berdabû traktorê, girtibû. Agir, alav pê ketibû. Bi şewat û germa alavan, Şûkrî hişyar bû. Nişkêva xwe şaş kir.

— Lo. Lo, agir... Şewitandin...

Bi aliyê hevalên xwede qîriya. Xidir, şoforê ku nû hatibû, Eso û Hesen reviyan derve. Ew lastikên mezin agir girtibûn, bîhneke giran bi ser ketibû. Şûkrî mînanî dîna, bi alîkariya cilekê dixwast ku agir vemirîne. Nedibû. Xidir qîriya:

— Bîdonên mazotê... Bîdonên mazotê! Bira agir navêje wir.

Bîdonên devgirtî, yên ku qet nehatine şuxulandinê, girtin. Kaş kirin ku ji êgir dûr bixin. Paşê li erdê tot kirin, birin dûrê. Bi xwe jî niha li cem tiştên xwe bûn. Tiştekî ku bikin tunebû. Li traktora dişewitî mêze dikirin.

— Eva bê namûsiye. Bê dîn û bê îmaniye. Tolazên bênamûs, got şoforê nû hatî.

— Gelo kê kir? Kê şewitand?

— Kî zane. Wekî şeytanane. Traktora mêrik, bi bîst pênc û sî hezarî şewitandin. Bo çi dişewitînin? Qet xwedê qebûl dike? got Xidir.

Eso û Hesen te digot ku cemidîne. Ker û lal, ji tirsan çilmisî, li hevdû dinhêrîn. Traktora terikî bişewitîne... Çi cesaret? Nikaribûn ji hevdûre bêjin, lê belê di dilên xwede herdu jî hinekî kêfxweş dibûn.

Li gund deng bilind bû, dihate bihîstinê. Ew herdu cendirmên li mala axê, bi qîrîn û hewaran hişyar bûn. Di destên wande tivingên wan, bi kurê axê yê mezinve reviyan û hatin. Niha berbangê diavêt, ronayî dest pê dikir. Dûre, piştî wan Ûsiv axa hat. Qefesa wî mînanî korikekê diçû û dihat. Hela hê ji traktorê agir bilind dibû. Ew alavên gur tûne bûn, lê dîsa jî hêdî hêdî dişewitî. Bîhneka nexweş ji lastikên şewitî dihatin. Dû qûloz dibû. Li pêş êgir hemû nêzî hev bûn. Ji hev dipirsiyan ku çawa bûye? Kesekî tiştekî bi aqil nikaribû bêje. Şûkrî, dev û lê-

vên wî ziha û çilmisîbû. Diçû cem axê, paşê cem cendirman û şoforê nûhatî. Gelo wan dizanîbû ku Şûkrî xewêde mabû? Xweşaşkirina wî ya pêşîn derbas bû, axê jê pirsî:

– Hela lê... Hela... Evqas meriv, li traktorekê xwayî nebûn. Nikarîbûn biparêzin. Dibe ku hûn ketibûn xewê?

Hemû raza bûn, lewra kesî nikaribû yê dinê gunehkar bike. Di tariya şevêde xwastine ku êgir vemirînin, lewra jî li kesî negeriyane. Paşê agir bi hemû traktorê ketibû. Damirandin zehmet bû.

Cendirme û yên dinê hema usa didane çêran. Taqeta çokên axê tûne bû ku here gund. Wê ji Okeşre çi bigota? Li ser kevirekî rûnişt, li şewata tekeran mêze kir. Serma nedikir. Sibê bû êdî. Tariya serê çiya çû, êdî ronahî hatibû dewsê. Dinê hişyar dibû. JI dûrve dengê avê dihat.

Hemû bi hevre hatine gund, niha her der bêtir ronahîbû. Çend gundî hatine ber derê axê, xwastibûn ku serxweşiyê bidinê. Xwastin bêjin ku haya tu gundîkî jî ji vî karî tunebû. Ew cîran bûn, cîrantiyêde malşewitandin, canstendin nedibû. Ev makîna bêdev, bêziman wê çima bi şewitandina? Lewra, wan tiştên awha nedikirin. Xwastin ku vê yekê bêjin. Ûsiv axa bi hêrs, westiyayî, hişê wî ne li sêrî bû. Ku gundî dîtin:

– Hûn çi digerin? Çi digerin? Bê namûsno, We mala min şewitand. Agir berda traktorê. Hûn li ber derê min çi digerin?

– Axa, bawer bike, qet haya me yekî jî tune. Em bênamûsiya weha nakin.

– Lawo, we neşewitand, kê şewitand? Ma şeytên şewitand? Erê? Cinan şewitand? Biteysin herin, bira çavên min we nebîne. Dizên mîna we, kuçikên mîna we...

Gundî dûr ketin. Axa û yên li dorê, çûn hundir. Xeber nedida, te digot ku devê wî hatibû girêdan. Cixare li ser hev dikişand.

Gundî têneg ihîştin ku kê şewitand. Çawa kiribûn ev karê ha? Nîvê şevê, li ser xebera şewata traktorê hevdu hişyar kiribûn. Gund gişt jî li ser xaniyan, li ber deriyan, li şewata traktorê mêze dikirin. Hemû hebûn. Qet kêmasî tunebû. Soro jî, Mîro jî û yên dinê jî. Hemû kes li wir bûn niha. Gundiyên ku ji hevdu şik dikirin, bi çavan li hevdu digeriyan. Piştî ku hevdu didîtin, şika wan nedima. Ev çi kar bû? Kê kiribû? Gundî hemû li vir bûn. Di dilên xwe de, "destên kirî neêşin" digotin. Çawa jî rind şewitîbû. "Me di dê û jina teno, ma cîkî dinê nemabû, tu hatîbûyî bela serê me, serê me bixwî", digotin.

## – XVI –

Qumandarê cendirma, makîna nivîsandinê di dêstde, bi şeş cendirmanve ji cîpê peya bûn. Qumandar bi telefonê qaymeqam agahdar kiribû. Ew li wîlayetê, di civînekêde bû. Ev xebera reş gîhîştibû Okeş jî.

Ûsiv axa dest pê kir, bûyer ji qumandarre got. Traktor bi şev hatibû şewitandinê. Kesî bi çavan nedîtibû. Lê gundiyan şewitandibû. Sê, çar nobedarên qasî keran nikaribûn traktorekê biparêzin. Li hemberî gundiyan bê abûr bûbû. Wê ji Okeşre çi bigota? Ha te awha kiriye, an jî te li pêş çavên wî dê û jina wî nizam çi kiriye. Çi ferq dike?

– Ez kuştim qumandar, van ez kuştim. Tu nizanî, tiştê awha carekê ku dest pê kir, kes nikare pêşiyê lê bigire. Wê sibê bên mala min bişewitînin. Wê min jî bikujin. Neynûkê wan bira cî negire. Çavên meriyan derdixin. Kurên keran, wisa şewitandine ku kes nizane kê kiriye.

– Ez dizanim ezê çi bikim. Tu bîhna xwe fireh bigre. Ezê niha giştikan yek yek derxim. Tê bibînî. Wê çawa wek bilbilan xeber bidin. Te ew nobedarên bêteşe ji ku hanîn axa? Li cem wan agir berdidine traktorê, lê yek jî pê nahêse. Ma wan bi xwe agir bernedabin? Ez jî bawer nakim, lê belê meriv awqasî jî hişkêm nabe.

– Na qumandar, na. Ev karên van gundiyên bê însafin. Min çend merivên xwe ji binve şand. Tiştek hîn nebûn. Kes nizane kê kiriye. Kurê kûçikan wisa bi fel kirine, ku wisa dibe.

– Kesên ku tu lê şikê dikî hene? Wan ji minre bêje. Berê pêşîn ji wan dest pê bikim. Ez derseke wisa bidim wan ku heta hetê kes ji bîr neke. Kes êdî dîntiyê neke, di ciyê xwede bisekine.

Ûsiv axa heft, heyşt nav danê. Soro û Mîro jî di nav wande bûn. Nobedar Şûkrî, yên dinê jî dîtinên xwe gotin. Tişteki wisa ku bi kêrî meriv bê, tunebûn di navde.

Paşê nav bi nav gazî gundiyan kir, li cem hev da sekinandinê. Cendirmên bi tiving dora wan girt. Qîz, jin û zarên gund ji dûrve mêze dikirin. Gelo wê çi bê serê gundiyên wan? Çend jin, destên wan di paşila wande, zarokên dest bi pêşên diyên xwe girtî, bi hevre digiriyan. Bi qedera xwe, bi rojên reş ku li benda wan bûn, digiriyan.

Serê pêşiyêde melê gund disekinî. Qumandar nikaribû di ciyê xwede bisekine, xwe bigre, sebir bike. Yek du rind bikuta û lêxista, wê rehet bikira. Ev karên wî, di van salên dûr û dirêjde, qumandar kiribû

vî halî. Hêrsa wî ku dihat, dida çêran, bi pîhn û kulman lêdixist, paşê hêdî hêdî mînanî pelên behrê hêrsa wî vedimirî. Niha jî wisa dibû. Lê, wê hemû gundiyan çawa bide ber dar û sîlan?

– Mele, tu ji ber van rûyên xwe jî şerm nakî? Erê, qet fedî nakî? Cîranên te malê xelqê didizin û traktora wî dişewitînin, tu jî bêdeng dimînî? Ka bêje, tu çi dizanî? Bîrve neke ha, ehlê xwedê derewan nakin.

– Welle û bille, bi navê xwedêyê mezinbe, haya min ji tiştekî tune. Min qet tiştek nebîhîstiye. Wexta ez rabûm ji bo nimêja sibê, bi deng û hewara gundiyan derketim derve. Wê çaxê min jî agir û şewata traktorê dît.

– Qet tu nabêjî ku ma tiştên awha di dîn û îmanêde hene? Ez bi dînê melayê mîna te ....

– Begê min, destavêtina malê xelqê neheqiye, diziye. Bira xwedê destên wan bişkêne. Ûsiv axa jî dizane. Ez van her roj çend caran ji cîrananre dibêjim. Kî guh didê? Dewr ne dewra berêye, ez benî.

Wisa xuya dikir ku mele dixwast dirêj bike, lê qumandar bi dengê xweyî bilind şorên mela di dêvde hişt.

– Bese, bibire. Tu wêde here.

Qumandar, aliyê vala nîşanî mele da. Mele, dest li pêş, bi lez xwe da wî alî. Paşê qumandar ji gundiyan yek yek dipirsiya. "Kê şewitand? Haya te heye?" Bersivên gundiyan hemû wek hev û kurt bûn.

– Na xêr. Nizanim. Haya min tune.

Waxta ku ev bersîvan dibihîst, cinên wî dihatine sêrî. An mistek li nav çavan dixist, an jî pînek li qûnê dida. Hêrsa wî pir jê bihata, du sê caran zêdetir lêdixist. Gundî razîbûn bi çend kulm û pînan. Çi bikirana? Çi ji destên wan dihat, xênji razîbûnê? Bi vî awayî xilas bibûna baş bû. Jin û zaran ji dûrve li wan dinhêrîn.

– Olo, haya te tune, ya wî tune, ya yê dinê tune. Ma min hat traktor şewitand, digot qumandar bi hêrs.

Dora Soro hatibû. Qumandar xwast ku ducar bike kirina xwe.

Soro:

– Li min nexe begê min. Haya min tune, got.

– Çi, çi? Tu li pêş min disekinî? Erê, tu pêş berî min disekinî, ne?

– Na xêr, estaxfirla. Li hemberî te nasekinim.

Dixwast ku, evî çûr, evî sor rind bikute. Wisa lêxe ku bira hîn bibe, wekî li hember sekininadin çiye. Qerarê xwe da. Wê ewa bibira bajêr. Li wêderê wê bi daran hûr – xaş bikira. Ava wî derxista. Bira ji yên di-

nêre bibe derseka giran. Dev û pozê wî wisa hûr hûrî bikira ku kesî ewa nas nekira. Bira bizanibûna ku dawiya giştan wê awha bibe.

Qumandar êdî dest ji kutan û lêxistinê berda. Navê wan dinivîsî û dipirsî wekî haya wan heye an tune û li pêş navê wan qeyd dikir. Soro nêzîkî xwe girtibû. Navê hinekan jî ji axê hîn bûbû, ew jî anîne cem Soro. Careka din jî berve wan zivirî.

– Hûn dîsa jî nizanin, ne? Hela hê nizanin?

– Na xêr, nizanin.

– Em ji ku bizanibin?

– Haya me tune.

## – XVII –

Qumandar heft kes ji yên dinê veqetandibû. Du bi du destên wan bi hevre girêda. Yê hefta, yekî bêreng, jar û li ser piya dilerizîbû. Halê wî baş nebû. Yan yekî din jî bijbarta û pêre girêda anjî ewa aza bikira. "Yekî mînanî miriyaye. Ev ne karekî başe", got di dilê xwe de û pêşberî wî sekinî qumandar. Xwe da ser lingekî, kulmek lê xist. Yê dinê tiştekî wisa hêvî nedikir. Li erdê ket. Qumandar çend pîn dîsa lêdan. Xar bû bi kulman li ruyê wî xist. Her lêdixist, dewsa nermbûne bêtir hêrsa wî dihat. Dîsa lêdixist. Dev û lêvên gundî tijî xwîn bûn.

– De here. Careka din jî tevî karê awha bibe ku ez di diya te nizanim çi bikim.

Gundî nikaribû xwe li ser lingan bigre. Bi zehmetî şûnve çû. Niha hemûyan texmîn dikir ku çi wê bê serên wanên ku diçin bajêr.

Di nav çar cendirmande, bi qîrîn û giriyên cîrananve gund terk kirin. Yên digiriyan, dora qumandar girtibûn. Hinek diçûne lingan û hinekan destên wî maç dikirin. Qet feydê tiştekî tunebû. Pir caran halên awha dîtibû. Nermbûn ne baş bû. Nikaribû karê xwe bibe serî, lewra hişkbûn, riya herî rind bû. Hêrs bû qumandar û qîriya... Yên ku nêzî wî bûn, dehfand. Ji alîkî jî cendirman gundî dûr xistin. Hine jin û zar êşiyan, zare zara wan bû, xwe şûnve kişandin. Destê Soro girêdayî, bi jinanre hêrsa xwe hanî:

– Hûn çima digrîn? Çiye, çi bûye? Ma mirine ev? Tu sucê me heye? Çima lava dikin û digrîn?

Hemûyan bêdeng ew guhdarî kirin. Giştan xwe şûnve kişand. Çend kesan anî, pere dane gundiyên ku wê biçûna bajêr. Qumandar ji hêr-

san sor bûbû. "Hela tu evî çûr binhêre. Çima li min lava dikin. Şeytanî çûr, ezê niha nişanî te bidim. Lavakirina wan, bi te giran tê, ne?"

Çar cendirme û gundiyên girêdayî tev ketine rê. Qumandar û herdu cendirmên dinê bi cîpê, pey wan ji gund derketin. Gundî, hela hê nû ji gund derketibûn, çend zarokên wan li pey ketin, paşê ji cendirman tirsiyan û zivirîn. Jinên wan û cîranan li ser xaniyan, çavên wan di rêde, dûr û dirêj dinhêrîn. Gelo wê çi bibiya? Ji hevdû dipirsiyan. Mêr, serên wan di berde, aqîbeta cîranên xwenê çûyî dihanîn ber çavên xwe.

Qumandar nêzîkî wan bû. Jîp hêdî hêdî diçû. Serê xwe ji jîpê derxist:

— Dereng nemînîn. Zûtirê bînin, got.

Qumandar hate mal. Qaymeqam ji wîlayetê telefon kiribû, yên bûyî hîn bûbû. Xwastibû ku dawiyê û her tiştî ji qumandar bibihîse. Walî jî pê hesya bû, gelekî li ser vî karî sekinîbû. Qumandar li qaymeqam geriya û her tişt jêre qal kir. Heta niha nizanibû ku kê şewitandiye. Lê îşev çend gundiyan heweki biêşîne, wê her tiştî hîn bibiya.

Şîv xwar. Xwe dirêj kiribû, çay vedixwar. Hatin xeber dan ku gundî anîne qereqolê. Rabû, kincên xwe li xwe kir. Jina wî ew şîret kir ku di lêxistin û kutanêde zêde neçe. Tiştekî bêteşe ji dêst dernekeve. Ewî serê xwe ba kir, di dilê wîde çi hebû, eşkere bû.

Kete hundirê qereqolê. Aliyê rastê, li oda xwe, şewqê xwe darda kir. Li ser masê, ewraqên nûhatî nihêrî. Tiştekî giranbiha tunebûn. Gazî eskerekî kir. Çend darên zexm jêre lazim bûn, ewana xwastin.

Destên gundiyan vekirîbûn. Ew kirine odekê. Li ser deriyê odê "nezaretxane" nivîsîbû. Ode bê pencere bû. Dîwar, bi qirêjê belek—belekî bûbûn. Deriyê wê hesin bû. Di odêde qet tiştek tunebû. Derî vedikirin û meriv diavêtine hundir. Odeke ne mezin bû, lê car cara bîst, sîh meriv tijî hundir dikirin. Oda mezin, cendirme têde radizan, li cem "nezaretxanê" bû. Li aliyê çepê odeke din, tişt têde dihate parastinê, lê car cara jî eziyet û lêxistinên dirêj têde dihate kirin.

Qumandar nîşan da, ode vekirin. Mase dane alîkî. Ji bo wan kursîke tenê hebû. Du cendirmên zexm, ku îro nehatibûn gund, newestiyayî hilda cem xwe.

— Berê, ewî çûr bînin vir.

Soro anîn. Gelekî westiyayîbû. Lê, di çavên wîde tirs nedihate xuyanê. Her tişt dabû ber çavên xwe. Gelo dikaribû berxwe bide? Qerarê xwe dabû. Tu carî lava nedikir. Mînanî hinekên din nedigiriya, nediçû dest û piyê wî.

– De bêje. Te li gund negot, lê tê li vira bêjî. Te motor şewitand? An kê şewitand?

– Haya min tûne. Bawer bike ku haya min tune.

– Bawerkirin. Erê, bawerkirin ha. Ji te bawerkirin. Çûro, çûroyî şeytan, ez bi te bawer bikim? Ji tere du deqîqe molet. An tê mînanî meriya giştî bêjî anjî ez dizanim bi te bidime gotinê.

– Begê min, welle haya min tûne, tiştekî nizanim. Destê xwe ji min vekşîne. Ez ji tere sond dixwim ku min tiştek nekiriye. Şeva traktor şewitî, ez li nav gund bûm. Bi kêmanî bîst meriv li cem min bûn. Dixwazî, jî wan giştikan bipirse.

– Ew jî mînanî tene. Çi ferqa we heye? Tu ji wan kûçiksanî, ew ji te. Emir da cendirman. Çarixên wî derxistin. Soro avêtin erdê. Wî di rêde kiribû hişê xwe. Heke ku lêxin, wê li hember bisekiniya. Niha, nîvê şevê, qereqol, awqas cendirme, tivingên wan, wê çawa li pêşberî wan bisekiniya? Nikarîbû serederiyê bike. Tivingek, dewsa feleqê şuxulandin. Lingên wî kirine nav qayîşên tivingê. Şewqê Soro kete alîkî. Herdû serên feleqê di destên cendirmande, lingên wî li hewa, qumandar dar hilda. Dest bi lêxistinê kir.

Yek... du... sê... Soro diranên xwe dişidand. Nedixwest ax, of bike. Qederekê şûnde lingên wî wisa diêşiyan, êşê diavête serê wî. Piyên wî werimîn. Ji bin lingên wî xwîn dinuqutîn. Soro damîş nedibû. Çavên wî reş û tarîbûn.

– Oy dayê. Oy eman. Way dimrim, got û xweve çû.

Dengê wî hate birînê. Qumandar ji hêrsan lêbû li erdê keve. Westiya bû û diricifî. Ev xinzîrê sor çiqasî jî li berxwe da. Hemû sekinîn. Qumandar li ser kursî rûnişt, dest bi cixarê kir. Soro avêtibûn ser erdê şil. Di oda dinêde, hevalên Soro, dengê lêdana daran ku dibihîstin, te digot ku li wan bi xwe dixin. Ker û lal xwe sipartibûne hev. Him ji bo Soro li ber xwe diketin û him jî qederekê şûnde dora wan wê bihata.

Bi ava sar lingên wî şil kirin. Vêdrokek tijî av kirin, paşê piyên wî xistinê. Ava sar bi enî, rû û pêsîra wî reşandin.

Ciyên cendirme lê radizan, gundîkî din hildabûn feleqê. Çawîş lêdixist û qumandar mêze dikir. Dar ku li lingên wî diketin, qîrîna wî diçû ezmana. Hêrsa qumandar bi vî halî dihat. Bi potînên hişk, gundî da ber pîna.

Li oda dinê, cendirmek li benda Soro bû. Soro hişyar bû, ferq kir ku her derên wî diêşin, lingên wî di vêdrokêdene û bi xwe ji serdapê şile. Çavên wî dîsa hatin girtinê û qulupîn.

Qumandar bi xwe hat, dest bi lêxistinê kir. Heta niha ev kesa nedîtibû, ne jî nas dikir. Qet dayîn û standina wî pêre tunebû. Awqas kîn û hêrs ji ku dihat? Gelo, reng, bejn û bala wî lê ne xweş dihat? An jî wî ji gundiyên xwere, "lava nekin" gotibû, ji bo wê yekê diqehirî? Her çi dibe bira bibe. Lê eva ne mînanî yên dinê bû. Lewra dixwast lêxe. Lêxe, dîsa lêxe. Heta nîvê şevê kişand. Qumandar hêk keland û kir binçengên wan. Bi kulman, bê hemdî xwe, poz, dev, lêv nedigot û lêdida. Cîkî Soro yê sax nemabû. Cixare danê, lê belê, tilyên wî nedigirtin. Awqasî li destên wî xistibûn ku tiliyên wî mînanî bilûran bûn. Cendirme hemû îşev bi vî karî mijûlbûn, nerazabûn. Serda jî dilteng bûbûn. "Awqas lêxistin û kutan jî nabe. Ev meriv kuştine, ya rastî."

Qabloyên tazî, da destên çend gundiyan, paşê manyato kir qumandar. Elektrîk ku di canê wanre derbas dibû, feqîran quloz dibûn û li ser hev diketin. Îşev, yên ku hate serê wan, ya rastî ji mirinê xirabtir bû. Zilmeke giran bû. Xwedê nede serê dijminan.

Hemû kirine nezaretxanê dîsa. Nîvê şevê, zûva derbas bûbû. Qumandar çû mala xwe. Cendirme jî bi dil şikestî ketine ciyên xwe.

Mîro bi halê Soro damîş nedibû. Gelo nemire? Vî ciyî şil, tiştek tunebû ku li ser rûnin. Bi vî halî nedibû. Çekêtê xwe derxist, da bin wî. Serê wî da ser çoka xwe. Destê xwe dabû ser eniya wî. Soro nîv xweve çûyîbû, li wî dinhêrî.

– Dostê çûr. Tu çi mêrî... Mêrxasî li ser tera herame, got di ber xwede.

Hemûyan halê hevdu dipirsiyan. Birîn û werimandin tişt nîn bûn. Bira şikestok tunebûya. Tu cîkî kesî neşikestibû. Ev kîn û hêrsa qumandar ji ku dihat? Çima dixwast ku Soro bikuje. Hinekan got, li ser gotina axêye. Hinekan got, ev dilkûlbûn ji qumandar bi xwe tê. Heta sibê naliyan. Sibetirê Soro hişyar bû. Her derên wî pir diêşiyan. Qumandar qet tiştek jî hîn nebûbû.

Ewqas bêxewmayîn, westandin ji bo çibû? Îşev gelekî pêşde biribû lêxistin. Kutana awha jî nabe. Lê wekî ew çûrê mirdar bimiriya? Kê wê ew xelas bikira? Qet tiştekî baş nedikir. Paşê hate bîra wî, caran di rojnamande hine nivîsandin derdiketin, hinekan xeber didan di derheqê tiştên awhade. "Na, qereqol ciyê parastinêye, ciyê gumana xelqêye." Bira bênê vira, bibînin ku qereqol çiye.

Sibetirê dîsa li qaymeqam geriya. Qaymeqam wê îro bihata, walî jî pêre bû. Walî diçû cîkî dinê, lê dixwast ku saetekê duda li vir bisekine. Gundiyên belengaz, yên di nezaretxanêde hatine bîrê. Lê wekî yekî bênamûs û qumandar hez nake, fesadiyê bike. Ji walîre bêje, ew jî

Okeş axa jî hatibû û traktora xwe biribû. Bi alîkariya çend gundiyan tişt û motora xwe li kamyonê kiribû, ji gund dûr ketibû. Qet bi kesîre nepeyivîbû. Şofêr digot, wê motorê bibin Entabê anjî Edenê, bidine çêkirinê. Lê wisa xuya bû ku gele perên wî wê biçûya. Dîsa digotin, ku Ûsiv axa ker û lal, bi kesîre deng nekiriye. Okeş axa dixwast ku bêje, "evana gişt ji ruyê tede bûn."

Li van gundan, di van rojande hemû gundî li pey cotê xwene. Kes vala nasekine. Bi herdu destan di nav xwînêdebin jî, dîsa dixwazin cotê xwe bikin. Nexweşê wan fedî dikin ku bêjin, em diêşin anjî di nava nivînande bimînin. Li alîkî cot dikin, li aliyê din jî tivdarekê zivistanê dikirin. Hişkkirina fêkiyan, kêmasiyên dinê. Meriv nikare bisekine di van rojande. Piştî vê demê, gundî bîhna xwe distînin, der dorên xwe mêze dikin. Dîlan û dawet dest pê dikin. Kirîn û firotina xwe hemû anîne cî. Ewên ku keçên xwe dane mêr anjî yên ku lawên xwe zewicandine, piştî van rojan hewekî bîhna xwe digrin. Jiyan dijware, bê însafe. Derdên nû dest pê dikin.

Îsal li Tendûrekê ne kesî têr tama rojên xweş sitand, ne jî mîna berê bi şên û şahî êmîş hişk kirin, savar kelandin. Kesî dîlan û dawet nedikir. Belê, te digot ku xwedê ev tişt ji wanre qedexe kiriye. Kî dixwast bizewice? Bi çi ruyî? Bi kîjan pereyî? Bi çi dilî? Dilên hemûya xwîn digiriyan. Ew gundê berê çûye, gundekî bê deng, nîvxalî maye li dewsê. Dû li ser nîvên malan quloz nedibû. Yên dijiyan jî bi nîvcan bûn.

Soro ji mirinê filitîbû. Panzde bîst rojande hate ser xwe. Her derê wî reş û sor bûbûn. Singê wî, dewsa pînên qumandar, diêşiya. Bi bîhnsitandinê êş zêde dibûn. Rengê wî çilmisî, pozê wî tûj dihate xuyanê. Li dora xwe nermik nermik, bêkêf dinhêrî. Kî ku halê wî bipirse:

— Başim. Îro hêjî başim. Hûn çewanin? Wê çi bibe? Emê ji vir ha çi bikin? digot.

Dîsa jî gund û rojên li pêş difikirî. Hevalên wiyê din zûtirê rabûne ser xwe. Yek diçû û yekî dinê dihate cem. Piştî vê bûyerê gundiyan ji Soro bêtir hez dikir û guh didane gotinên wî. Jin û mêr serî didanê û jêre xwarinên xweş dihanîn. Çûyîn û hatina gundiyan, jina wî gelekî dilxweş dikir. Rojên pêşîn pir tirsiya bû ku Soro wê bimire. Ji şerman, ji kesekîre tiştek negotibû. Xwarziyê wî Elî, ji ber serê wî, ji ber çokên wî qet nediqetiya. Ewî şewitandibû traktor, lê xalê wî ji berve hindik mabû bimre. Lewra li ber xwe diket.

Kesî tiştek neçandibû îsal. Saleka dinê, kesî kulmek genim nikaribû hilde. Qet libek genim jî tunebû ji parre. Ev belengazên îsal bêtir belengaz û feqîr bûn. Tu kesî kincekî nû nekirî. Jin û keçan kevnên

xwe pîne dikirin. Çarixên wan kevn bûn. Her tiştên wan kêm bû, ji bajêr yên nû nikaribûn bistînin. Îsal ji tunebûnê nikarîbûn heqê mele jî bidin. Ewî jî feqîrî kişand. Zanibû ku di destê gundiyande tiştek tunebû, hebûya wê heqê wî bidanê. Di destên wande tunebe, wê ji ku bihanîna û bidana wî. Karê mela jî ne baş bû.

Piştî şewitandina traktorê, karê Hesen û Eso jî xirab bû. Hêviya wan bi cî nehat, nikaribûn li ruyê gundiyan jî binhêrin.

Bê çaretiyê çend mal dîsa ji gund qetand. Pênc şeş mal, wan halê Soro dîtibûn, bîr û baweriyên xwe bi tevayî winda kiribûn. Di nava heftekêde, melûl melûl ji qedera xwe dixeyidîn, çav bi hêsir, gund û cîranên xwe terk dikirin. Pênc şeş xaniyên din dîsa bê dû diman êdî.

Okeş axa, "careka din nazivirime gund" gotibû. Traktora wiya nû şewitîbû. Çêkirin û ji nûve şuxulandina wê wext dixwast. Xwestibû ku Ûsiv axa zerara wî parveke. Ûsiv axa, "emê paşê bifikirin" gotibû, nexwestibû nêzîkî tiştekî wehabe. Okeş jî qet nepeyivîbû, qerarê vene- gerandinê dabû. Ji nîvê zirarê vegerîn jî baş bû. Ûsiv axa, qewlê noterê hanîbû bîra wî. Okeş dîsa jî devê xwe venekiribû.

Li Tendûrekê bêdengîke mînanî mirinê hebû. Gundiyan tiştek neçandibûn, lê axê jî awqas negirtibû. Ew zeviyên ku nedabûne gun- diyan, vik û vala disekinîn. Zeviya mezin bi traktorê ajotibû, lê tu cara têra mala axê nedikir.

Wê demê traktor hê kêm bûn li welêt. Li Anadoliya navîn û roj ava, Entabê û Edenê hebûn. Lê li van deran ne zêde bûn. Ji ciyên dinê dihatin û li vir dişuxilîn. Xênji wan yê axan hebûn, lê belê ne pir bûn. Merivan qîmetê traktoran nû fem dikir. Hûkûmatê hêdî hêdî alîkarî dikir ku xwayî erd, traktoran bikirin.

Pey van bûyeran Ûsiv axa traktoreke nû nedît. Bi çend xwayî traktorre xeber dabû, lê wan jî dawiya Okeş dîtibûn, kesî cesaret nedikir bê. Ûsiv axa dîsa jî erd nedida gundiyan. Paşê çend gundiyên kal û pîr çûn û hatin. Xwestin ku axa hine zeviyên nû, ne baş be jî bide gundiyan, bira biçînin. Ji bo vê, axa berê pirs dabû. Bi vî awayî, gundiyan ji axêre zeviyên nû hazir bikirana, kevirên wan berev bikirana. Axa, kîngê canê wî bixwaze, wê ji destên wan bigirta. Gundî jî qet nebe, du – sê kod genim, wê xwarina zar û zêçên xwe hildana. Ne gundî ne jî axa bi vî karî dilşad bûbûn. Lê belê rêke dinê tunebû. Aliyekî dixwest ku ji birçîna nemirin, aliyê dinê jî dixwast ku zeviyên nû bi dest xe.

Hinek kal û pîr, hinek zarokên jar mirin. Xênji van, tiştekî mezin nebû li gund. Gundî li ber karên giran perîşan bûbûn. Çiqasî jî bi zehmet bû... Gayên wan di nav deh rojande jar bûbûn û nikarîbûn cot bi-

kşînin. Jinan, zaran, pîran gişta, hema usa kevrên zeviyan berhev dikirin. Dest û piyên wan qelişîbûn, tîş— tîşî bûn. Mînanî takî zirav bûbûn hemû. Her kesî êvaran bi zûtirê xwe dihavêt nav nivînan. Hinek rûn li birînên dest û piyên xwe didan. Heke ku firset bidîtana, bihatana cem hev, qala rojên pêş dikirin. Rojên dijwar li pêşiya wan bûn. Di van demên bêhêvîde, Soro û Mîro bawerî dida gundiyan. Cîran jî êdî wekî wan herduyan dipeyiviyan.

— Hûnê bibînin. Em erdê xwe nadinê. Ewî neda me em bixwin, lê bi xwe jî tiştek nexwar. Destvala ma ew jî. Awqas par ji me distand berê, niha ji wê jî bû.

— Em naçin. Emê bi kude herin? Yê wê waxtê çawa bike?

— Lê, lê. Em naçin. Lê belê neçûyîn têrê nake... Gerek meriv zeviyan nede wî ku qîmetê neçûyinê hebe. Heke tu di mala xwede rûniştibî, ew jî zeviyan dajo û diçîne. Çi xêra gund heye wê demê? Neçûyina awha, axa jî dixwaze.

Hinekan:

— Van zeviyên nû bi me dide vekirinê, wê paşê ji destên me bigre, berî me bide.

— Wê berî me bide lê, te çi bawer dikir?

— Em awqas derd dikşînin, baro çi bikin bikin di dawiyêde nedine wî, digotin. Hemûyan kêm û zêde tiştek reşand û çand. Axa zeviya mezin û dirêj tenê çand. Xulam û kurên wî têrê kirin.

Erzihala ku şandibûne Enqerê, dîsa şûnve vegeriyabû cem qaymeqam. Qaymeqam jî, ji cendirme qumandarî û katibê xwere şandibû. Bersivên wana xwend. Niha her tiştî hê baş fem dikir. Tiştekî ku qaymeqam bike êdî tunebû. Hemû hatibûn cî. Erzihal çû di dosyêde ciyê xwe girt.

## — XVIII —

Ji Tendûrekê wêde gundê Qesrokê heye. Li wî gundî Zubêd axa dimîne. Zubêd axa berbi kalbûnêye. Ji piçûktiya xwede cixare kişandiye û niha jî dikuxe û pir belxem davêje. Xênji vê bê derde. Hal û wextê wî di eîdeye. Kurekî xwe dişîne dibistanê, dide xwendinê. Qesrok gundekî piçûke, sîh mal têde hene. Hemû di ber emrê axê xwedene. Zubêd axa û bavê wî Resûl di şerê Şêx Seîdde, li cem Şêx cî digrin û alî wî dikin. Kîngê qala wan rojan bihata kirinê, salên yekî bihata pir-

sînê, gişta "sala Şêx" digotin, ji wê salê re. Qesrokî jî wisa dibêjin. Piştî şerê Sêx Seîd hate şikestin, pey mahkemeke kurt li Diyarbekrê, qerara dardekirinê dane Resûl axe. Li ber sûrên Diyarbekirê darde kiribûn Resûl axa.

Gelek ji gundiyên ku bi Resûl axare bûn, miribûn, hinek jî revîbûn. Wê demê kesî newêrîbû li kesî bipirse. Kes li miriyê axê xwedî derneketibû. Qal dikin, wekî hemû tirsiyane ku wî bipirsin. Wê çaxê kurê wî Zubêd jî di şerde bû. Şer winda kiribûn, bavê wî hatibû girtinê. Zubêd revîbû, xwe dabû hidûdê Sûriyê, biniya xetê. Derbasî wira bûbû. Di wan salande frensiz li Sûriyê bûn, wan li wir hikim dikir. Erd, kar dane hinekên nûhatî. Çiqas ji destên wan bê, alîkarî kiribûn. Dîsa jî gelek damîşî germa Sûriyê nebûbûn. Bê kar mabûn, feqîrî kişandibûn. Gelek ji wan li Sûriyê mirin. Li biniya xetê erd dabûne Zûbêyd. Ji zevî û kar awqas fem nedikir. Bavê wî jî darde kiribûn. Jin, zarên wî, diya wî nav xelqêde, kî zane çi dikişand? Nikaribû xwe bide ser kar û barê xwe. Dixwest ku bi şûnde vegere.

Ew xeberên ku ji Tirkiyê dihatin, mînanî berê ne xirab bûn. Sê sal derbas bûbû, êdî kes darde nedikirin. Cendirman diavête ser gundan, zordestî dikirin. Yên dewlemend, rişwet didan û difilitîn. Xeber hemû ne wek hev bûn, Lê belê hemûyan digot ku xeniqandin êdî tunebû. Axa û merivên wan şandibûne rojava Tirkiyê. Sal derbas dibûn. Di van rojande gotinek di nava xelqêde bû, "yên ku çûne rojava wê şûnve bên, hukumat wê wan bibaxşîne. Yên ku bênê li ser erd û malê xwe, ber emrê hukûmatê bijîn, kes dest nade wan."

Ji mala Zubêd yên mayî şandibûn Edirnê. Li wê derê diya wî damîş nebûbû, miribû. Hinekên dinê nexweş ketibûn. Hinek zêr dizîkave bi xwere biribûn. Zêr ku xilas bûn, êdî jiyan zehmet bû. Li Edirnê erd, têra wan bax û baxçe dabûnê. Lê nikaribûn hînî wira bibin. Ziman û edetên wan nizanibûn, tu cara li wir jiyan hêsan nebû.

Zubêd li Sûriyê, ji mala xwe bê xeber bû. Li gund çend mal mabûn. Wan pirs û sûwal kiribûn, ciyê axê xwe hîn bûbûn. Alîkarî kiribûn. Xeber şandibûn ji axê nûre, li Sûriyê. Rind zanibûn ku axa gelekî di meraqêdeye, lê belê hukumat wisa bê însaf û bê merhemed bû, kesî newêribû ku deng bike. Gotin rast derketin. Piştî çend salan, yên çûyî şûnve hatin. Hinekên ku xwestin li rojava bijîn, hînî wan deran bûbûn, nehatin, man li wan deran. Lê yên ku man, pir kêm bûn.

Zubêd bihîst ku mala wî vegeriyaye, ji binve xeber şand. Hinek çûn û hatin. Xeter tunebû êdî. Zubêd hat û çû, xwe teslîmî hukumatê kir. Dîsa jî ji bo xilasbûnê gelek perên wî çûn. Pir rojên bi tirs derbas kir.

Di dawiyêde her tişt kete rê û baş bû. Yên ku kişandibûn êdî çûn. Dîsa jî qeymeqam, cendirme û daîrên dinê bi çevekî baş lê nedinhêrîn. Her tim di şikêde bûn. Zubêd ev gişt rind zanibûn.

Zubêd axa, Ûsiv axayê tendûrekî, ji wan rojên berêve hez nedikir. Dijminê hev bûn. Ûsiv axa jî, bavê wî jî alîkariya hukumatê kiribûn û li wan xistibûn. Riyên wan girtibûn. Gelek caran, mirovên Ûsiv axa di nav çiyande rêyên dizî nîşanî eskeran dabûn. Di dawiyêde Ûsiv axa wan jî xelas nebûn, lê belê careke xwîn ketibû nav wan. Li cem hukumatê, Ûsiv axa her tim fesadiya Zubêd axa dikir, digot ku:

— Ev Zubêd axa jî, bavê wî jî li hemberî hukumatê ser hildane û xayinin... Ev fesad, firsetê bibînin wê dîsa li hember hukumatê derkevin. Gerek meriv wan biperçiqîne. Pişta maran rast bû, jê bitirse, wê li te xe.

Ji ber ku Qesrok piçûk bû, tendûrekiyan zirar didane gundê wan. Zevî, çayirên wan didane çêrandinê. Tu rehetiya wan tunebû ji destê Ûsiv axa û tendurekiyan. Zubêd axa yekî hişyar û çavvekirî bû. Her tim mînanî mûyê ku ji nav rûn tê kişandin, bi hêsanî difilitî. Herdu axa û gundiyên wan, bi hevre xeber nedidan. Te digot, heywanên wan jî nayên cem hev, hevdu bîhn nakin.

Nepakî û pevçûn ku kete nav Ûsiv axa û tendûrekiyan, Zubêd gelekî şa bû. Ji dêst bihata, wê alîkariya gundiyan bikira. Bihata bihîstinê, wê wê çaxê rezîl bibiya. Ne baş dibû. Ya rastî ji dûrve mêzekirin bû.

Piştî qederekê, bi van bûyerên Tendûrekê, Zubêd jî bêkêf bû. Wexta ku li Sûriyê bû, dîtibû, bihîstibû ku gundî li hemberî axan derdikevin, erdê wan ji destê wan digrin û wan dikujin. Heke li gundekî vî tiştî bibin sêrî, paşê li gundên der û doran jî wê dest pê bikin. Mînanî garisên ku li ser êgir dihatin teqandin, li pey hev dihatin. Pêşî li bûyeran girtin êdî zehmet bû. Li wê derê dîtibû ku axa û beg alîkariya hev dikin. Tiştekî awha li gundekî bibiya, hemû bi hevre pêşî lê digirtin. Nedihîştin ku li gundekî din jî bûyereke weha biqewime. Agir hê negirtî gerek bê vemirandin. Gund û gundiyên wî dihatine bîra wî. Dema ku kurm têkevin birîneke, ew birîn dixure û kûr dibe. Cardin dixure û kurm her zêde dibin. Kurm ketibûn hundirê Zubêd axa. Pê aciz û dilteng dibû. Hêdî hêdî di dilê wîde dijminatiya Ûsiv axa kêm dibû. Çima ne wisaye, ma ew jî neşandibûn rojava? Ma wan jî rojên nexweş û zehmet nekişandibûn? Yên çûyi, êdî çûbûn. Ma pêşiyan negotibûn "Yê çû, nede dû". Gundiyan jî pir anîbûn serê Ûsiv axa. Traktora wan şewi- tandibûn, zerar dabûn. Meriv li yên ketî naxe. Pêwîste ku meriv

destê alîkariyê dirêjî wan bikê. Mêrxasî eve. Ev fikir bi rojan di serê wîde diçûn û dihatin. Wê çi bikira, çawa bikira? Paşê biryara xwe da. Wê ev şuxula ji Cemal axare, Cemal axayê Darebîre vekira, alîkariya wî bixwesta. Hê li van deran, serhildana gundiyan berfireh nebûbû, alav negirtibû, dixwast ku bi Ûsiv axare li hev were, alîkariya wî bike. Gundê Darebiyê nêzîkî wan bû. Li hespê xwe siwar bû, bê xeber çû mêvaniya wî.

— Bi xêr hatî. Li ser serî û herdu çavan hatî, Zubêd axa.

— Di nav xêrêdebî, kurê min. Cemal axa ne li male?

— Qasekê berê çû serê bendê. "Ezê serîkî bidime êş û bêm", got. Tu keremke, emê banî wî bikin.

Berê dengê xwe nekir. "Hetanî Cemal bê, gelo demekê rehetiya xwe binhêre, çawa dibû? Xwe jî dikaribû here serê bendê. Herdu tenê di nav xwede xeberdin, baştir dibû. Lê belê mêvan dibê xwe giran bigrin. Hela yekî mîna Zubêd axa awha bike, kî dizane Cemal axa wê çi bihesibîne?"

Ya rastî jî ewî Cemal axa qet hez nedikir. Nîşanî hev nedidan, lê belê di binde, dexesiya hev dikirin. Ji bo çi mezinan gotine, "serê du beranan di beroşekêde nakele."

— Belê, bira yek here, xeberê bidê. Hespê min nekişînine tewlê. Yek ji we lê siwarbe, bira ji Cemal axare bibe.

— Na begê min. Em dikarin hespekî din jêre bibin.

— Na, na. Nabe. Hespê min ji Cemal axare bibin.

Solên xwe derxist, çû jorê, li ser doşega raxistî rûnişt. Balgiyên bilind li ber pala wî... Merivên malê yek yek hatin, xêr hatin û kêfxwaşî danê. Avdew jêre anîn. Vexwar, simbêlên xwe bi pişta destê xwe paqij kir.

Bîstekî şûnde dengê Cemal axa ji derve dihat. Dengê wî hewekî zirav bû mînanî dengê jinan. Li rûyê wî deqên xuriyê hebûn. Bejna Cemal axa yekî kin û zirav bû. Çavên wî dibiriqiyan. Kincên baş li xwe dikirin. Nava wî û memûrên bajêr pir xweş bû. Salên wî ne zêde bûn, lê belê gelekî bi aqil û wekî şeytên bû.

— Way, tu bi xêr hatî. Ser sera hatî Zubêd axa. Tu bi xêr hatî.

— Nav xêrêdebî. Xêrê bibînî Cemal axa. Tu dizanî, nava herdu gundên me nîv saetî nakişîne. Bîhna min jî teng bû. Min mêze kir ku tu nayî, min got qet nebe ez bêm.

— Estaxfirla. Ez çawa nayêm? Lê te gelekî baş kiriye, bi hatina xwe. Ez jî bê sebir bûm, hetanî êş çûm. Tu ji wir heta vir, li ser serê min hatî.

Virda, wêda xeberdan û çay vexwarin. Cemal axa xwast ku Zubêd axa wê şevê li cem wî derbas bike. Wê sêleqelî bixwarana. Zubêd axa dûr û dirêj mayîn qebûl kir, lê ji bo riya nîv saetî nexwast ku malê tenê bihêle. Derengbe jî, gerek biziviriya gundê xwe. Qebûl kirin. Xeber- dan hate ser ev bûyerên Tendûrekê. Li cem wan çend kesên din hebûn, Zubêd nexwest bi peyive. Cemal ji bo şabûna dilê Zubêd:

– Kirinên Ûsiv axa hemû neheqîne. Ya rastî, neheqiyên mezinin. Çima li cem me nabe tiştên wisa? Meriv bi gundiyên xwere qet awha dike? Xwedê jî qebûl nake, got.

Zubêd axa xwest ku kurt xeber bide.

– Belê wisane, got.

– Ma, ewên dinê çi jîr û bi xîret bûne. Erê, ne wisane tu bi xwedê?

– Belê wisa tê xûyanê.

Cemal axa dît ku Zubêd axa li ser vî karî naxwaze zêde xeber bide, qalê tiştên din kir. Demekê jî wisa peyîvîn.

– Hez dikî em qasekê jî derkevin derve, herne ser avê? Bira hewa odê jî biguhure. Çawabe emê sêleqeliyê bixwin. Bira ew jî tivdarekê xwe bikin, got Zubêd axa.

Belê, cîranê wî dixwast ku tenê bimînin, bira xeberdanên wan yên din nebihîsîn. Cemal axa ji merivên xwere, ji bo tivdarekên seleqeliyê teme kir. Herdu berjêr ber bi êş çûn.

Zubêd axa yek yek, bi zimanekî vekirî fikrên xwe û karên weha çawa li Sûriyê bi çavên xwe dîtibû, yê ku tênê serê Ûsiv axa, gişt gotin. Ev xetera li pêşiya wan hemûyan bû. Îro ji bo Ûsiv axa, sibê Zubêd û Cemal axa. Ne wisa bû? Ma tiştekî din hebû? Bi vî tehrî gelek tişt gotin. "Van gundiyên qûntazî, dibine bela serê meriyan. Hestiyên bavê merivan ji gorê derdixin û heyfê jê distînîn..." Qise dikir, çavên xwe li ser Cemal axa digerand, dîsa dest pê dikir.

– Nepakiyên nav me, dijminatiyê, bi hevre xebernedanê gerek em ji nav xwe hilînin.

Ev gotinên wî car cara hatibû bîra Cemal axa jî. Niha bêtir rind fem dikir, kederên Zubêd axa.

– Lewra, ez fikirîm. Min got, berê ji dostê xwe, Cemal axare bêjim van. Hela ka ew çi dibêje? Erê tu çi dibêjî? Çi difikirî?

– Gotina te raste Zubêd axa. Di vê dinya derewînde, bi hevre başbûn ya herî başe. Îca xweyî gund, xweyî erd alîkariya hev nekin, wê li pêş van kuçikan bêqedir û rezîl bibin. Ez jî fem dikim, lê belê ji destê me çi tê?

Cemal axa dixwast, ku Zubêd axa bi xwe bêje, ku dixwaze nêzîkî Ûsiv axa bibe, pêre lihev were. Heta îro goştê hev dixwarin. Di dardakirina bavê wîde, para Ûsiv axa wan jî hebû. Meriv çawa dikare wan ji bîr bike? Ev çi bênamûsî bû. Heyfa bavê xwe ji bîr kiribû. Awqas kesan jêre digot "axa", hurmet dikir. Niha li ber çavên wan, qedrê xwe dixiste pênc peran. Cemal dixwast ku Zubêd axa bi destê xwe, bi zimanê xwe têkeve vî halî bêrûmet. Ew jî, bi dilxweşî mêze bike. Piçûkbûna Zubêd, rezîlbûna wî bi çavên xwe bibîne. Paşê wê alîkarî bikira. Destê xwe dirêj bikira.

– Dibêjim ku gerek axên vî alî, em hemû dostbin. Bi hevre başbin. Wekî em hevdû bixwin, ma çima xelq çavên me dernexin? Yên ku anîne serê Ûsiv axa, hela hê hindikin jî.

– Erê walle. Tu rast dibêjî. Çawa teyr hevdu bernadin, bi hevre difirin, gerek em jî wisabin. Gundî bibînin ku em gişt bi hevrene, qet yek jî di dilê xwede derbas nake ku li hemberî yekî me derkeve. Yên ku di dilê wandene, nikarin zû zû eşkere bikin. Ev bêaqiliya, bêteşetiya nayê bîra wan wê çaxê.

– Belê, rast dibêjî birayê min. Ez bi xwe jî vê dibêjim.

– Raste. Belê raste. Merivê çi bike niha? Îro, sibê. Tu, ji minre wê bêje.

Zubêd axa, ya li ser zimanê xwe negot. Dixwast ku Cemal axa bi xwe fem bike. Ew merivekî bi aqil bû. Çibûye îro, weha bêfem û ehmaqiyê dike? Tiştekî nafikire. Wekî korane. Zubêd dît ku ew fem nake, bi şerm û zehmet got:

– Di van rojên tengasiyêde, gerek em Ûsiv axa tenê nehêlin. Ewî çend cara meriv şande cem min. Got, ez bême mala wî, em li hev werin, her tiştî ji bîr bikin. Em bêne mala wî, bira bi vî tehrî min bibaxşîne. Kî çi dibêje bira bêje, hema bira ew qebûl bike, digot. Her carê jî min qebûl nekir. Ji bo ku min bîr û baweriya xwe bi wî nedihanî. Niha, tu, wekî ku te qet bi minre xeber nedaye, bi wîre bipeyîve û bişîne mala min. Ev xerabî jî bila ji nav me rabe. Paşê emê destên xwe bidine hev, van tolaziyan damirînin.

Gotinên xwe qedandibû. Lê zanibû ku Cemal vî karî dizî nahêle, wê bi Ûsiv axa bide fem kirinê.

– Ezê van bînim cî, axa. Ser serê min. Him jî di nav du sê rojande. Tu ji min bixweze. Lê gundî û cîran? Gelo wê nebêjin ku bavê wî da dardekirinê, dijminê wî bû, bi serde jî Zubêd axa Ûsiv axa wek bira hemêz dike. Mînanî dost û birayên salan. Wê nebêjin ku xwîna bavê xwe li erdê hişt?

Te digot ku bi xençer li dilê Zubêd axa xistibûn. Tirsa wî jî ev bû.

— Raste Cemal axa. Lê min her tişt ji tere got. Ez û Ûsiv axa, em hevdu bixwin, xulamên duh na pêr bên, yek bi yek me ji gund derxin. Ma ev ne bê aqiliye? Ya rastî, hundirê min ji gundiyan teqiyaye. Min serhildana wan li Sûriyê dîtiye. Xwedê nîşanî kesî nede. Axan davêjin derve. Ha jin û zarên axan, ha yên mirtiban. Cem wan ferq nîne. Wer bi teşaxuzin, wer bi teşaxuzin... Dîsa neyne bîra min. Bi şeref û jiyana axan dileyizîn. Kî çi dibêje bira bêje. Dewra berê şûnve venagere, Cemal axa. Wan jî mîna me derd kişandin. Hukumatê ew jî şandine rojava. Bêrûmet bûn, belengaz bûn. Niha ji gundiyan ditirsim. Ya baş em li hev werin. Ev ji minre jî, ji wîre jî başe. Ya rastî ji me giştanre ya herî bi xêr, eve.

Zubêd axa baş fem dikir, berî giştan Cemal axa tinazên xwe dike. "Gundî û cîran wê çi bêjin?" digot. Lê belê berî hemûyan ew wisa dibêje.

Her tişt xeberdan. Dizivirîne malê êdî. Piştî vî qerarî, êdî berx dihate xwarinê. Hatine malê. Sifre hazir bû. Bêjingek anîn, sêleke tijî goştê qelî danîne ser. Goştên bê rûn, wisa sor bûbûn, ku meriv qêmîş nedikir lê binhêre. Li dora goşt mastê sîrkirî hebû. Nanê sêlê, nerm û nûpijyayîbû. Dest bi xwarina qelyê kirin.

## – XIX –

Wê rojê hemûyan bihîst ku dijminên dê û bavan, yên ku dixwastin xwîna hevdû bixwin, li hev hatine. Axa û begên vira gişt dibûne dost û bira. Di nava wande êdî av jî derbas nedibû. Dîsa herkesî zanibû ku sebebê vê li hevhatinê serhildana gundiyane. Gundiyan baş fem dikir ev bûyer. Dixwastin çavên hevdu derxin, dê û jinê hevdu nizanim çi bikin, ji bo ku gundiyên feqîr û belengaz biperçiqînin çawa jî dibin yek, têne cem hev. "Way xulî li serê me. Ji bo ku vê dinê ji mere heram bikin, me di tasek avde bixeniqînin, dijminên salan dibin yek..." Li hevhatina axan, gundî bêtir hişyar dikir, nêzî hev dibûn.

"Çavê yekî di erdê yê dinê ye... Her tim hevdû xwarine. Îro li hev têne. Dibin yek. Em cîranên salanin. Di nava mede qet tiştek jî tune. Dostên hevdune. Em çima nayên cem hev? Nabin yek? Ne zêde erdê me heye, ne jî malê me ku em li ser şer bikin. Emên feqîr, yên ku erdên wan ji dêst tê standinê, em çima hevdu hez nekin, dijmintiyê bi hevre bikin? Tirba hevdu bikolin? Awqas bê aqilî û dînîtî jî nabe."

Ji roja ku Kurdistan bûye Kurdistan, qaçaxên wê kêm nebûn. Kêm bûn, zêde bûn, lê belê her tim hebûn qaçax. Berê, ji bo ku hukumatêre eskeriyê nekin, revîne. Li ser zevîkê, anjî ji bo tiştekî din li hevdu xistine. Lêxistine çûne çiyan. Car caran ji ber cendirman revîne, berê xwe dane wan çiyayên bilind û asê. Hinek damîşî zilma axan nedane, wan jî lêxistine axa kuştine, anjî birîndar kirine, paşê dîsa berê dane çiyan.

Ew xelqê ji wan gundên çiyan, dostê qaçaxanin. Qaçax di tengasiyêde fîşek, nan ji gundiyan distînin. Caran, dikarin nîvê zivistanê di wan gundande derbas bikin. Rojên bi xeter, xeber hildidan û zûtirê direviyan qaçax. Merivên vira, ji berêde hînî tiştên weha bûne. Hinek qaçax dibin dostê axan. Axan diparêzin. Axên ku bi hevre nebaşbin, bêtir dibine dostê qaçaxan. Qaçax, pere, xwarinê ji axan digrin, dikevin bin emrê wan. Hinek jî qet axan hez nakin, dijminê wanin, dostên gundiyên feqîr, gundiyên çiyane. Naxwazin ku bela xwe di axa bidin. Lê wan jî hez nakin. Waxta cendirme zorê bidine qaçaxan, zû hîn dibin ku sebeb kiye. Ji bin serê kê derketiye. Wê çaxê rehetiyê jê dibirin, belan tînine serê wan. Ev qaçax, çend kes bi hevre, di bin mezintiya yekî ji wan û jêhatîde dijîn. Bi navê wî merivî tênê naskirinê. Pênc kes bûn cerda Îbo. Bavê Îbo yekî feqîr bû. Erdê wan kêm bû, têra mala wana nedikir. Xwe jî ne yekî jîr û xebatkar bû. Heke bidîta dixwar, ku bi dest nediket, ji qedera xwe re dida çêra. Bi çêran zikê wî têr nedibû, wê çaxê ji der û dorên xwe tişt didiziya. Zarên wî êdî mezin bûbûn. Çar kur û keçeke wî di belengaziyêde dijiyan. Yê herî mezin, Îbrahîm, yekî nes bû. Li zarên gund dixist û xwarinên wan ji destên wan digirt, dixwar. Gelek caran serê wî şikestî anjî, çîkî wî birîndar dihate malê. Li malê haya kesî ji kesî tunebû. Her ku mezin bû, bi aqil dibû. Karê wî tunebû û bê erd, bê cot bû. Bi vî awayî kurmên wî yên berê diliviyan. Carekê dudan li gund, şer kiribû, ketibû qereqolê. Gava şerek an diziyek dibû, navê Îbo dihate bîra meriv. Gelekî xîret kiribû, lê belê nikaribû xwe jê xilas bike. Çûbû gundekî dinê, li ba merivên xwe bixebite. Ji bo ku navê wî derketibû, li wêderê jî rûke germ nîşan nedabûn. Kesî bi wî bawer nedikir. Çend mehan li wir mabû. Herdu birayên wî yên piçûk, êdî bilind û pişkûr bûn. Di xirabiyêde deh car ji Îbrahîm pêşde çûbûn. Gund ji destê wan zare zar bû. Xwûşka wan jî bi zexm û quwet bû, du mêran bi zehmetî pê dikaribûn. Ew rind û bedew bû. Li gund, keça herî bedew ew bû. Ji bo xwedîkirina dê û bavê xwe, diçû ji cîrananre dixebitî. Qet firset nedida ku kes bi çavêkî din lê binhêre. Ji mêzekirina herkesî zanibû çi di dilê wande derbaz dibe.

Bi quweta xwe, xwe diparast. Rûken û bi zarxweş bû. Henek dikir, kilam digot di nava karê xwede. Şixulê du merivan dikaribû bi tena xwe bike. Gava yek hinek zêde here, bi nepakî tiştekî bêje, deh caran giran bersiva xwe jê digirt. Rezîl û bêrûmet dikir yê gotî.

Îbrahîm gelek ga, hesp, pezên dewlemendan didizî û dibir bajarên dinê difrot. Çend cara jî hatibû girtinê. Zilma li qereqola cendirman pê kirine û yên hatine serê wî, bi rojan bigota dîsa jî nediqediya. Li gundê wan yekî dewletî ji destê wan zare zar bû. Damîş nedabû û li bavê Îbrahîmî kal xistibû. Îbrahîm jî bi şeva nîvê şevê ketibû mala wî, ka û gihayê wî şewitandibû û ew jî wisa kiribû ku ew bi çend mehan nehatibû ser xwe. Sêvikeke wî seqet mabû. Bê şiv nikaribû bigeriya. Nikaribû devê xwe veke, pişta xwe rast bike. Îbrahîm jî ji gund dûr ket, jiyana xwe li çiyan derbas dikir êdî. Hevalên wî digotin ku ew gelekî kîndar bû. Yên ku ew jê biqehire û jê hez neke, dikaribû wî bi destên xwe mînanî mirîşkan şerjêke, qet çavên xwe jî neqirpîne. Hêrsa wî ku dihat, eniya wî teng û biriyên wî nêzî hev dibûn. Aliyê rastê pozê wî dilipitî. Ev bi vî tehrî bidîtana, kesî dengê xwe nedikir. Ev xisyetên wî, hevalên wî jî zanibûn. Çiya lê hat. Li van gundan kesî pêre xirabî nedikir. Ewî jî tu cara zirar nedida kesî. Car cara, bi dizîkave diçû malê. Heke ku di destê wîde çend quruş hebûna, dida bavê xwe. Niha navê wî baş bûbû, ne xirab bû wekî berê. Çend hevalên wî pêre bûn. Bi dor nobet digirtin. Li çiyê xwarin çêdikirin. Carna jî nan û penêr tenê bi dest diket. Li van gundan, dostên ku kincên wan bişon hebûn. Li Tendûrekê xaltîke Îbo hebû. Di piçûktiya xwede çend caran çûbû wir. Paşê, çend salan berê carekê dîsa serî dabû.

Îbo bûyerên Tendûrekê bihîstibû. Xaltiya wî jî ji gund bar kiribû, çûbû Qonyayê. Axa perçek erd ji wanre zêde dîtibû, ew jî ji gund çûbûn. Ev ku dihatine bîra wî, pozê wî dilipitî, biriyên wî nêzî hev dibûn.

Li çiyê, ji nişkêve cendirme avêtibû ser wan. Vê carê xeber negirtibûn. Her tişt ji nişkêve bû. Li çiyakî asê bûn di nav hinek darên nizmde. Li paşiyê jî newaleke kûr hebû. Li nav wan daran dora wan girtibûn. Ew çiyayên dost, bê deng, ji wan dûr bûn niha. Destên wan ji çiyan qetiya bûn. Şerê di nav wan û cendirmande mînanî şerê du dewletan bû, hema serê xwe bilind bikirana gulle bi ser wande dibarî. Heta êvarê kişand şerê wan. Westiyayî û birçî bûn. Berê, çend caran bi cendirmanve rastî hev hatibûn, du sê gulle diteqiyan, cendirme nedihatin ser wan. Wan jî berê xwe didane çiyan. Niha ne wisa bû. Mirina hev dixwastin. Îbo bi dengekî nizm qerarê xwe ji hevalên xwere got.

— Di vê newala yalê rastêde, emê ber bi deştê biçin. Xetere. Gundên deştê, bê îtbarin. Em ku li vir bimînin, fîşengê me wê biqedin. Pişt ji me girtine. Mînanî berxa ber kêrê, emê destê wande bimînim. Ezê gullan li wan bireşînim, wê çaxê hûn jî bi aliyê newalê birevin. Xwe bavêjin erdê. Paşê dest bi êgir bikin, ezê bêm bigêhêjim we. Emê li ser hev çend cara wer bikin, xilas bibin.

Li aliyê dinê, di nav dar û qirşande dengek bilind bû.

— Teslîmbin! Teslîmbin, dibêjim. Meriv nikare ji ber qanûnê xilasbe. Hûn ku teslîmbin, wê ji were baş be.

Li ser vî dengî Îbo gulle barande wî alî. Hevalên wî berve newalê reviyan û xwe avêtine erdê.

— Lawo. Hûn dînîn? Teslîmbin, dibêjim ji were. Hawîrdora we girtiye, hûn bifirin ezmana jî nikarin xilas bin.

Vê carê yên dinê gulle reşandin. Îbo reviya, çû cem wan. Şer bi vî halî domkir. Paşê, Îbo û cerda wî xwe havêtibûn nav dar û mêşêyên newalê, xwe xilas kirin. Wexta ku di nêzîkî gundanre derbas dibûn, xwe ditelandin. Lê ji dilê wan nedihat ku pir nêzî deştê bibin. Dixwastin, dîsa bi awakî xwe bigihînin çiyan. Gundê xaltiya wî, Tendûrek hate bîra Îbo. Nêzîkî wê derê bûbûn. Pir westiya bûn, nikaribûn gavekê pêşde bavêjin. Fîşengên wan jî kêm bûn.

Ev girên nizm li pêşiya wan, ev kirê piştî Tendûrekê bû. Xwastin ku şevê li wir derbas bikin. Van deran baş nas nedikirin, lê belê gelekî jî nezan nîn bûn. Xetereke gelekî mezin nedidîtin. Îbo cîranên xaltiya xwe rind nas dikir. Berê, wexta dihate vir. bi wanre baş bû. Xwast here mala Mîro, cîranê xaltiya xwe. Ji bo xwe hinek nan, fîşeng tivdarek bikin. Wê bîhna xwe bistandana. Xeber ji jorê hildana. Ka li wan deran çi heye? Bê çare bûn niha.

Îbo di tariya şevêde kete nava gund. Li cem mala xaltiya xwe, mala Mîro, te digot bi destê xwe daniye, dît. Tiving bi xwere nehanîbû. Dabenca wî pêre bû. Li deriyê Mîro xist. Yekî pirsî:

— Ew kiye?

Dengê wî nas kir. Mîro bi xwe bû.

— Ezim Mîro. Ezim. Xwarziya xaltiya Siltême. Îbome.

Mîro derî vekir, bi nîvcî. Çira ji tenekê nêzîk kir û derî bi tevayî vekir. Rûyên Îbo dirêj bûn. Westiya bû. Bi şik û tirs li dora xwe dinhêrî. Jina Mîro çay keland, Mîro bi destê xwe çay jêre tijî kir. Nan, penêr û mast jê re anîn. Xwar, zikê xwe têr kir. Hêdî hêdî hişê wî hate serî û dest bi xeberdanê kir. Mîro cixarek dirêj kir. Îbrahîm hilda û got:

– Li çiyê, em ketne telê. Em vê carê xelas bûn, careka din tu tişt bi me nabe.

Hevalên xwenê li çolê, şerê wan û cendirman, xilasbûna nanê wan, kêmbûna fîşengên xwe qal kir.

– Min nedixwast ku serê we têxim belayê. Hatina mina vira ne başe. Ma hezar derd û bela ne bes bû? Ez ji neçariyê hatim. Min bibaxşîne.

– De here lo, ev çi gotine? Li dinê her tişt dibe. Meriv gerek kêrî merivan bê. Ma çibûye?

Îbo dîsa dest pê kir. Her tişt bihîstibû. Li çiyê bûn, lê ev hemû bûyerên Tendûrekê hatibûn guhên wan. Paşê pirsa Soro kir:

– Min bihîst ku ew gelek aciz kirine. Ji mirinê filitiye.

Mîro wê biçûya, xeber bida Soro jî. Paşê wê bi hevre mêvanê xwe rêwî bikirana. Mîro ku derket, tirsekê bi Îbo girt. "Lê telekê bînine serê min." Qet îtbara meriya bi kesî dibe? Çend kesa weha, mêvanê mala xwe îxbar kiribûn, dabûn dest. Merivên ji ber qanûnê direvin, tu cara gerek çavgirtî nebin. Şaşiyeke piçûkbe jî, qet meriyan nabaxşîne. Meriv jiyana xwe dide der. Nexwest tirsa xwe nîşan bide. Jina Mîro û zarên wî li cem bûn. Gelo Mîro dikare dînitiyên weha bike? Paşê ev tişt ji hişê xwe dûr xist.

– Xwûşka min, bi vî axayîre serê we di derd û belayêdeye. Zivistan bê şer, bêdeng çû, lê ditirsim ku pevçûyîn dîsa dest pê bike.

– Bira, de xwedê qebûl neke. Em jî şaş bûn ku çi bikin, çilo bikin. Belengazî, perîşanî li alîkî, em nizanin ku wê ji vir ha çi bibe.

Vê demê, derî hate lêxistinê. Îbo bê hemdî xwe dest havêt dabenca xwe. Eger xayîntiyek bê pêşiyê, wê bersiva wan bida. Nedixwest badilhewa bê girtinê.

Soro û Mîro ketin hundir. Îbo ji fikrên xwe fedî kir. Çi hatibû serê wan, gişt peyivîn. Çiqas nanê wan herdu malan hebû, gişt hanîn. Penêr û pîvaz dane ser, bi lêçegeke sipî pêçandin. Soro û Mîro, hinek fîşeng hanîn danê... Dibe ku rojekê bi kar bînin, zûve ji çerçîkî kirîbû Soro. Mêvanê xwe rêwî kirin.

Piştî wê şevê, Îbo bêtir hate guhartinê. Bêtir bêdeng bû. Li hemberê neheqiyê hê jî tûj bû. Tevî her tiştî nedibû. Dixwast ku deynê hustiyê xwe bîne cî, tiştekî bike ji bo tendûrekiyan. Li kêderêbe jî guhê wî li ser Tendûrekê bû. Li wêderê çi bibûya, zû dihate guhê Îbo. Her tim ji hevalên xwere qala neheqiyê, zorbetiyê dikir. "Evên ku zorê dikin, gerek bênê perçiqandinê" digot.

## -XX-

Dinê, êdî germ bû. Zivistanê, feqîriyê û belengaziyê dest da bûn hev, gundî pir pêrîşan kiribûn. Lê niha hêdî hêdî dest vekişandibû zivistanê. Zarok li nav malan, li derva dilîstin. Lingên wan xas, dora serê wan kurkirî. Bi porên dirêjve morî, stêrkên hesinî zeliqandîbûn. Di dawiya zivistanêde, zarên jar û kal û pîr miribûn. Her sal di van mehande mirin zêde dibû, lê îsal hîn jî zêde bûbû. Kalan henek dikirin, tirsa xwe ji van mehan ji hevdure digotin. Ka û gîha zû diqediya. Heywanê jar ji bo devek gîha diçûne çolê, newal û kortan.

Mirov jîndar bûbûn. Gelek kes dikeniyan niha. Ûsiv axa jî hate ser miriyên çend kalan. Gundiyan pêre xeberdidan di van şînande. Ji bo hurmeta mirî, bi edet û tora gund. Lê wisa jî bi germ û dostî nîn bû. "Merheba... Çewanî?... Başî?..." Niha dinya wan ne yek bû. Gundî bi derd û kulên xwede bûn. Yek ji wan nexweş bibiya, mal tijî cîran dibû û alîkariya hev dikirin. Derdên wan ew nêzî hev dikirin. Xeberdan û kirinên kesî yên dinê nediêşand, dostiyeke germ hebû di dilê wande. Kesî xwestina yê dinê, şûnve venedigerand. Dianî cî. Hemû diçûne ser karê xwe, te digot ku qet tiştek nebûye li vî gundî. Dîsa hemûyan dizanibûn, bi biharêre derd wê dest pê bikin. Bê dengiya zivistanê, pevneçûyîn weha nediçû. Axa wê bixwaze ku zeviyan bajo û biçine. Gundî jî wê li hember bisekinin, şer wê di serîde, di ciyê mayîde ji nûve dest pê bikira.

Bi baharan, germbûna dinê û hewê, hêşînbûna der û doran meriyan diguhêrîne. Meriv baştir difikire. Dixwaze her baş bijî. Cîran, jin û zarên meriyan, xweş dixwêyin li ber çavên meriyan. Zimanê kesan her xweş dibe. Ew xeberdanên tel û tûj, ciyên xwe didine pirsên şirîn û nerm. Belengazî, feqîriya zivistanê zû ji bîr diçe. Qîrîn, lîstin û henek. Jiyaneke nû li gund. Çiyan dest bi hêşînbûnê dikir. Berf radibû, gûlik derdiket. Hêşnayiyeke bi belgên dirêje gûlik. Pir zû derdikeve û zû jî diçilmise. Gundî hemû, di wan rojande rikêfî gûlikê dikin. Di beroşên mezinde, piçek rûn, dikelînin gûlikê. Hemû mal bi kevçiyan dikevin ser. Meriv zû têr dibe. Lê belê piştî qedereke kurt, tu dibêjî ku te qet tiştek nexwariye. Birçî dibe meriv.

Berf dihelin, av radibin. Ji çiyan berve jêr, ava berfê dike xuşe – xuş û tê. Çemê pêşiya gund, di van rojande pir xetere. Gelek caran zarok têde dixeniqin.

Rojan dane pey hev û çûn. Rojekê, Ûsiv axa bi yekî ji Qeyseriyê, xwayî traktor, bi traktoreke mezinve derketin hatin gund. Wê ew zeviyên ku par nehatibûne ajotinê, biajotana îsal.

Ûsiv axa berê xwast ku dîsa xeberê bide gundiyan. Paşê poşman bû. Marên di xewêde gerek neyên hişyar kirinê. Yê ku ne di bîra wande bû, gerek bi wan neda hêsandinê. "Paşê wê bidana ber tirsa wî, wê bela xwe têdana." Lewra ji kesîre negot, ku li ku û çawa dîtibû ev qeyseriyî û anîbû gund. Kesî nizanibû, bi çi qerarî tev hatine.

– Li ber derê axê binhêre, berderê axê. Traktoreke ji ya par, dîsa haniye.

– Hela rengê wê binhêre. Ne ya parbe gelo? Çêkiribin û dîsa hanîbin?

– Na lo, ne ewe. Hişê xwayê wê hebe, qet careke din jî tê van aliyan?

Li ber deriyan, ji ser xaniyan li traktorê mêze dikirin gundiyan. Niha li gund qedera şêst malî hebûn. Yên çavên wan baş nedidît, destên xwe didane ber eniya xwe, dûr û dirêj dîsa dinhêrîn. Ji cahilên dora xwe tiştin dipirsiyan.

– Dîsa derd tênê ber deriyên me.

– Lê te nizanibû? Zivistan hat, her tişt qediya, te wisa digot ne? Hela em mêze bikin, vê carê wê canê çend meriyan bişewite?

– Xilasbûn tune bira. Hukumat alîkarî nake. Xwedê jî mal û erd daye wana. Karên wan di cîdeye.

Çavên wan li ber derê mala axê bûn. Diçûn û dihatin. Gişt bi lez û bez bûn, bi kêf dihatine xuyanê. Tivdarekên sibê dikirin... Kêmasiyên xwe bînine cî û sibê dest bi karê xwe bikin.

Gundiyên bêhêvî, yek bi yek ji gund çûbûn. Yên kal hela hê hebûn. Piraniya wan tiştên xeter nedixwastin. Axa dîsa jî mìnanî her tınî bi tivdarek bû. "Li bajêr, ew merivên dayrên hukumatê gerek bihatana dîtinê", bi hemûyanre xeber dabû. Nobedar, Eso û Hesen wê îsal dîsa parastina traktorê bikirana. Par tiştek neketibû destên wan. Ma axa çi bikira? Ne sûcê wî bû. Traktor ku bê şewitandinê, axa çi bike? Îsal karê wan wê baş bibiya.

Soro nexwastibû, lê belê nikaribû wan bide sekinandinê. Hinek ji kalên gund çûne cem axê û pêre xeberdan. Axa ji wan re:

– Min usa zanibû, ku hûn bi aqilin. Hûn jî tevî zar û xortan dibin, gotibû û hêrsa xwe anîbû.

Paşê jî xwastibû, hinekî bi dilê wan xeber bide.

— Di cîrantiyêde tiştên weha nabin. Min bixwasta, min dikaribû we hemûyan ji gund bavêjim, derxim. Min dîsa jî nekir. Yên we rabûn traktor şewitandin. Ev qet tê kirinê?

Paşê, him ew tirsandibûn him jî şîret li wan kiribû.

— Herin. Baqil, baqil karê xwe binihêrin. Em hemû mînanî berê, bi hevre cîrantiyê bikin. Vê carê wek cara pêşîn nabe. Zeviyên min dest lênedayî man. Min weha nedihîşt, lê heq û hûqûqê bav û kalan heye.

Soro û Mîro, li mala Soro ser kulavan rûniştibûn, cixare dikişandin. Di vê sala dawiyêde, hê bêtir bûbûn dostê hev. Ji hev nediqetiyan. Mîro ji Soro pir hez dikir, ji hemûyan pirtir qedir û qîmetê wî digirt. Bêdeng, bi qerar û merivekî bi hemdê xwe bû Soro. Li hemberî qumandar sekinîbû, piştî awqas lêxistinê, dîsa jî serê xwe li ber wan nizm nekiribû. Pey wan, êdî Soro li ber çavên Mîro merivekî din bû. Yekî pir bi qedir bû. Merivekî mezin bû. Hinek aliyê wî hebûn ku di kêm kesande dihate xuyakirin. Bi tivdarek, bi aqil. Dostê cîranên xwe bû.

Mîro, bi hêrs û esebî bû. Vê yekê jî pir zirar dida wî. Bi Sorore hevaltiya wî ku pêşde çû, ev kêmasiya xwe ferq kir. Mîro jî dixwast ku mînanî wîbe, qasî ku ji destê wî dihat.

Jina Soro dixwast alîkariya wan bike. Esmer, bi bedena xweve gelekî li ser xwe bû. Pir bîr û baweriya wê hebû ku mêrê wê ne neheqe. Soro, Mîro di nav xwede xeber didan, ewê nîşanî wan nedida, lê ji bin çavan, bi dilxweşî li mêrê xwe dinhêrî. Qet xirabiya mêrê xwe nedîtibû, ne jî bihîstibû. Dizanibû ku mêrê wê jê hez dike û bi xwe jî ji Sorore wisa bû. Soro qet pirseke ne pak jêre negotibû û lênexistibû. Li gundan, jinên ku mêrên wan lênexin hene qet? Jinên gund dihatine cem hev, henek dikirin û jêre digotin:

— Keçê, reşokê! Tu çiqasî bi bextî? Soro rojekê li te naxe, nade xebera. Qîzê tu çi dikî bi wî? Ji mere bêje. Tiştekî dinê ku em nizanin heye gelo? Dikeniyan.

Cixarên xwe yên qalind dipêçandin, difikirîn, wê çi bikin. Derî lêket, xwarziyê wî, Elî kete hundir. Yên çûbûn ba axê, axê çi tehrî şîret kiribûn, çavên wana tirsandibû, yek bi yek qal kir.

Mîro:

— Meriv nikare bi vana bide fem kirinê, gelekî zehmete ya rastî. Kafirê Ûsiv qet tê rê, hey lolo? Ûsiv, wê diya xwe jî bifroşe, lê ji zeviyan dest nakşîne.

— Em çi bikin Mîro? Tê wana jî, wisa qebûl bikî. Merivê awha, çend caran bi çavên xwe nebînin, çend cara neyê serê wan, xisyetên

xwe terk nakin. Berê çawa hîn bûne, dixwazin dîsa wilo bikin. Gerek meriv sebir bike. Par ceribandin, nebû. Îsal dîsa ceribandin, nebû. Lewra ber xwe dikevin. "Hûn çima awha dikin?" nayê gotinê. Sebir bike. Ewê jî binhêrin ku rêke dinê tune, wê berdin van kirinên xwe. Ew jî mînanî mene, tênê perçiqandinê. Loma ji axê lava dikin. Bê çarene. Qet hêrsa xwe ji wanre neynin, got Soro.

Ya rastî Mîro diqehirî. Car caran tûj û bi hêrs jî xeber dida. Elî ji hêrsan dîn dibû. Piçûk bû, lewra fikrên xwe nedigot. Xwedê kiribû ku piçûk bû. Yên di dilê xwede nediavête derve. Ne wisa biya, xirabiyên mezin jê bîter dibûn.

— Tu dibêjî sebir... Ha sebir. Başe. Mêrik traktor aniye, sibê dest pê dike. Ev diçin û lava dikin, li ber digerin. Were, weha neke dibêjin. Lo qet çavên wan vê traktora terikî, li ber dêrî nabînin?

— Belê raste. Lê dîsa jî ji bêçaretiye. Tu hemûyan jî baş nas dikî. Ma mirovên xirabin ew? Na. Çıına ne başbin? Taqeta wana têrê nake, mînanî yên ku di behrêde destên xwe bavêjin mêr. Loma lava dikin.

Elî şandine ınalên çend cîranan. "Sibê em gişt li ber serê zeviyên xwe bin. Mînanî par. Bi tivdarek û bira haya me ji hevdû hebe."

Wê ji gundiyan giştare bigotina. Li gund, mînanî Eso, Hesen, ıneriyên axê, wê hîn bibana. Dibe xênji wan hinekên din jî hene. Şûkriyê nobedar, bê îtbar bû. Mele, berê aliyê axa girtibû, niha tevî tiştekî nedibû. Xeber nedida. Çendekî dîsa rûniştin. Mîro biênijî.

— Sibê kar pirin. Ez herim, got û rabû çû.

Jina Soro hate cem. Der û dor berev kir. Xwe nîşan dida ku dixwast nêzî wî bibe, pêre hinek tiştan bipeyive. Mêrê xwe di xeterêde didît, dixwast wî hemêz bike, nede kesî. Nedixwast Soro vê bizanibe. Fedî dikir. Zarok di xewêde bûn. Di xewnêde, ji dinê bexeber, li hespên xwe yên qamîşî siwarin. An jî li ser perê teyrekî difirine, li ciyên ku heta niha qet nedîtine. Soro li pê, nêzî wê bû. Fem kir, jina wî dixwaze tiştekî bibêje. Te digot, ku herdu jî li benda hevdu bûn.

— Dîsa tiştek neyê serê te? Par, payizê te çi kişand? Wekî tu nebî, ezê çi bikim?

— Ev ji ku derketin, ji ku hatin? Çi wê li min bibe?

— Lê. Lê. Çi wê li te bibe... Ez nizanim çima? Çima tenê li te xistin, tu ji ınirinê vegeriyayî. Çima yên dinê wisa nekirin? Her tiştî ji te dizanin.

Soro keniya. Di dilê xwede şa bû. Li ber çavên jina xwe, weha bi qedir û qîmetbûn kêfa wî dianî. Wî jî nedixwast ku nîşanî wê bide.

– Tu li wê demê mêze neke. Wê çaxê wisa bû carekê.

Jina wî çav bi hêsiranve tijîbûn, rûyê wê dibiriqiya. Xwe şaş kir, nizanibû wê çi bike. Dest bi girînê kir. Soro destên wê girtin. Bi dil û can destên wê di nav destên xwede givaşt. Niha li pê bûn. Soro çavên wê ziha dikir.

– Tê bibînî. Van derd û kulên ku em dikişînin, zarên me wê nejîn. Emê belengazbin, lê ji bo wan wê baş bibe. Tu li tiştên dinê nenihêre. Guh medê. Bê derd qet tiştek naçe sêrî. Tu kevirên zeviyê berev nekî, avnedî, emegê xwe nerijînî, tê ji zeviyê çi bigrî? Qet. Lewra hinek belengazî, zehmet, rojên teng, emê bijîn, lê belê, dawî, bawer bike ku wê pir baş bibe. Tê bibînî, îsal wê ji par baştirbe.

Destê xwe bir rûyê wê, jina wî xwe sipartibû mêrê xwe. Dixwast ji wî quwet û cesaretê bigre. Firnikên bêfilê wê vedibûn û dihatine girtinê. Çavên wê bi dilovaniyê mij bûn. Çav û dilên wan bi xwastina hev tijî, nivînên xwe raxistin û razan.

Rojtira dinê, gundî hemû bi tivdarek bûn, gişta di dilê xwede digot, "Xwedê bike, ji zeviya min dest pê nekin. Lê, wekî nikaribim li hemberî axê û traktorê bisekinim. Lê wekî di xwede nebînim ku berî wan bidim. Lê zimanê min bê girtinê. Şewitîm çûm. Mirim çûm. Li pêş hemû cîranan bê abûr û bêrûmet bûn, ji mirinê xirabtire." Her tişt bêguman dihate bîra wan, lê nedixwastin ji kesîre bêjin û nîşan bidin.

Ev xeber lezekê şûnde çûn ber guhên axê. Him jî ne bi gotina Eso û Hesen. Niha, hê nebûyî, her tiştî dikaribû bibihîze. Him jî bi rêke nû û pir fireqet. Eso û Hesen tevî dest û rûyên xwe nedabûn, lê belê pir baş jî nebiribûn sêrî.

Axa ku ev bihîstin, merivekî xwe siwar kir û şande bajêr. Bi şefaqêre şeş cemdirme û vê carê, ne qumandar bi xwe, dewsa wî çawîş hatibû. Rind şîret girtibûn. Gerek rû nede gundiyan, lê nehêle jî bûyerên mezin bibin, zeviyên Ûsiv axa bênê ajotinê. Qanûn, zagon gerek bi başî bi rêve biçûya. Hemû kes çi bê ber aqlê wan, gerek nekin.

Sibê zû gundiyan, cendirme li pêş mala axê dîtin. "Vê sibê hatine. Duh tunebûn." Gelekan fem kir ku haya axê ji berêve bûye. Kesî neecîband. Gişta eşkere xeber dabûne hev. Haya wî jî, wê bibe. Ma wê niha çi bikin?

Gundiyan, di dilê wande bawerî û hêvî, gavên xwe dihavêtin. Gerek em bibine sêrî. Ev yeka ji xwe hêvî dikirin. Rojên nû û şa, xwayî erd bûn di ber çavên wanre derbas dibû. Bi vî bîr û baweriyê meşa wan, gavên wan bi tehrekî din diçû. Bêtir zexm û jîr. Di nav van meşan-

de hinek jî şik hebû. Lê wekî nikaribim ji bin vî karî derkevim? Hêvî û şik, tirs tevîhev...

Heta niha kîngê pêk anîn ku? Destên xwe avêtibûne çi, hemû tişt di destên wande mabûn. Lewra ji her tiştî diketine şikê, bêhêvîtiyê. Ya rastî, pir caran, baweriya xwe winda dikirin. Ditirsiyan ku lingên wan li keviran keve. Qedera wan wisa kiribû, ji her tiştî diketine şikê. Bibine sêrî. Di dilê wande, bîr û bawerî dihatin û diçûn. Lewra, gavên xwe bi tirs diavêtin. Wê baş nebe. Wê bi zehmetbe. Rojên teng û tarî wê bên. Her tim ji van ditirsiyan. Wê wextê, çokên wan, lingên wan sist û bêtaqet dibûn. Niha şik tevî hêviyan bûbûn. Bawerî tevî tirsan bûn. Ditirsî, hêviya xwe winda dikî. Dikevî şikê, paşê bi peyre tirs tê dilê te. Hêvî, tirs, bê bawerî, şik... Tirs, hêvî, şik...

Rojên dihatin, şepezetî û belengazî dihanî. Gelek wê perîşan bibûna. Dîsa jî ezman hêşîn, dinê kesk, çem û av jiyan tijî... Kulî, teyr, berx û giştîkan bêtir, pêştir mirov... Çi dibe bira bibe, dîsa jî jiyan pir xweşe. Dinê, dinêke jiyanêye. Destên meriv ji jiyanê venakişe. Axa çiqasî zilmê bike, traktor bê emanbe û tirsa cendirman her giranbe, jiyan dîsa jî xweşe.

Hesenê Hemzo xayîntiyê bike, nîvê gund serê xwe hildin herin, bi ta ketin, birçîbûn emana meriyan jî bibe, jiyan dîsa xweşe. Hemû kes jiyanê hezdikin, lewra gundiyên ku diçûn zeviyên xwe, di dilê xwede guman û hêvî dibirin bi xwere. Lê belê tirs û bêhêvîtiyê jî nikaribûn bi tevayî ji dilê xwe bavêjin. Hêviyên rojên baş. Hêviya hinek erd ku bi dest û tiliyên xwe bipişirînî. Tijî nava çarixên te bibe. Qirêja wê bi pirça singê te keve û xulya wê tevî porê te bibe. Piştî xermana, hatina zeviyên xwe, kesekîre parve nekî. Wek tiştekî ji can û bedena meriv bi zorê diqetînin.

Bi emegê xwe, keda xwe, bi tîş tişîbûyina destên xwe, bi neynûkên xwe çend kod genim hildî, paşê bi axêre parvekî... Çi mirine ew, çi mirine. Tu were van ji tendûrekiyan, ku bi tirs û hêvî diçin ber zeviyên xwe, ji wan bipirse.

Hinekan dev û lêvên xwe dikotiyan, hinekan jî cixare li ser cixara dikişand. Bi alîkariya cendirman, zevî wê bihatana ajotinê, wê çi bikirana? Hey lo, çawa ev tişta berê nehatibû bîra wan. Wê bi cendirmanre bi çi awayî serederî bikirana? Qet tiştekî napirsin, didin ber darê tivingan.

Ew zeviyên ku par li ser şer û gilî çêbûn, dest pê kirin wan bajon. Bi parastina cendirman û xulamên axê, traktorê, tire – tira wê bû, ji serîkî diçû seriyê dinê.

Xwayê zeviyê, di dilê xwede, gelekî êriş kir, di dawiyêde ji cîranan fedî kir, çû li pêşiya traktorê sekinî. Dest û milên xwe dihejand. Tiştin digotin, kesî fem nedikir. "Par ji rûyê minde, ji bo ku zeviya min xilas bikin, cîran gişt hatin alîkariya min. Hinek cîranên min hatibûne lêxistinê, teda dîtibûn. Ez çawa dikarim bêdeng bisekinim? Çawa vê kirina axê qebûl bikim?" got di dilê xwede. Mêjiyê wî tevîhev bû. Her tişt ser û bin bû. Çavên wî êdî tiştek nedidît. Vê sibê ku cendirme dîtibû, jina xwe bi xwere neanîbû. Nedixwast ku jina xwe tevî karên weha bike. Bi xwe tenê bû. Li pêş traktorê diqîriya û tiştin digot. Gavek jî bi şûnve nediçû. Traktor sekinî. Cendirme û xulamên axê xwe gîhandinê. Ewî hema usa dest û milê xwe dihejand û digot:

– Ev der yên minin. Hûn nikarin bajon. Çi heqê we heye?

Du cendirman ew dehfandin. Xwastin ku ew xwe bi şûnve bikişîne. Gundî di cîhê xwede sekinî, şûnve neçû. Li ser qûna xwe ket û erdê ma. Çavên wî li hewîrdora wî bûn. Vê carê, cîranên wî zûtirê nehatin û ew xilas nedikirin.

– Ji vêderê, mirina mine min biqetîne. Lêxin, min bikujin... De. De ha li min xin. Zevî ku ji destê min çû, mirin ji wê çêtire.

Cendirman li rûyê hevdû nihêrîn. Çawîş:

– Bi çeplê wî bigrin, bi milan kaş bikin. Bavêjin der. Kûçikê heram. Mirinê dixwaze. Na, werin li mixin, min bikujin. Kurê kerê, got.

Herdu cendirman milê wî girtin, bi erdêre kişandin. Wê çaxê gundiyên din jî bi tirs hêdî hêdî hatin, nêzîkbûn. Cendirme bi tiving bûn. Kesî mînanî par, mêranî û cesaret nîşan nedida ku herine ser kesî. Yekî û duda:

– Guneye, gune. Ew jî merive. Çima bi erdêre dikişînî? Hûn çi jê dixwazin? Awqas meriv we dora yekî girtiye.

Herdu cendirme sekinîn. Li aliyê ku deng jê hat, zivirîn. Çawîş:

– Çiye? Çiye? Ew kiye, erê? Ew kiye tevî karê me dibe?Gişt di ciyê xwede sekinîn. Li paş wan, dengek wekî dengê topê kire gurrînî. Dengê jinekê:

– Way dayê. Wah bê namusno. Hûn çi ji mêrê min dixwazin? Hûnê bi erdêre kaşkin û bikujin? Ji bo xatirê axê, hûn ji vî feqîrî, belengazî çi dixwazin?

Yên wira vekişiyan û jinik hate cem mêrê xwe. Xeber dida, herdu destên xwe quloz dikir, ba dikir. Te nizanibû şer dike, an dua dike. Hinek gundî dîsa hatin. Fatê dîsa destê kurê xweyî piçûk girtibû:

— Hela bihêlin. Hela bisekinin. Ev çi rezîliye? Hûn fedî nakin? Xort û mêrên mezinin hûn. Ji bo xatirê axê, li xelqê dixin, mînanî kulavan bi erdêre dikişînin.

Fatê gelekî bi hêrs bû. Tirsa gundiyên xwe ku dît, her qehirî, wek dînabû.

— Hela çi bi we hatiye? Li cem we merivan bikujin, hûn nazivirin û napirsin ku "hûn çima wî dikujin?" Ev çito cîrantiye? Ev çito mêraniye? Mêraniya we erdê we, erê welle.

Cendirman nedixwastin ku pêsîra gundî berdin. Wî jî xîret dikir ku rabe ser xwe. Çawîş ji gundiyanre:

— Dengê wê jinê bibirin. Pir pêşde diçe. Paşê baş nabe, got.

— Hela lê. Hela lê. Wê nebaş bibe!

Lêçega serê xwe rast kir û destê xwe bire singê xwe.

— Bikuje. Bikuje... Ji mirinê wêde çi heye? Çi disekinî? Ji bo xatirê axê, bo evlegek erdê axê bikuje, ku bira ji tere mêrxas bêjin. Bira ji tere çepikan lêxin. Bira nîşanekê li pêsîra tedekin.

— Dengê xwe bibire. Dengê xwe bibire jinik. Karê me îro eve. Hûn naçin, heqê xwe li cem hukumatê, li jorê nagerin, tên pêşiya me digrin. Ma em bi serê xwe hatine vir? Em bi kêfa xwe hatine vir?

— Jora we jî mînanî weye. Hûn hemî... Jor jî, jêr jî, hemû yekin. Gişt li aliyê Ûsiv axane. Yekî ji minre bêje, em jî xuliyê li serê xwe bikin, herine cem wî... Erê, gişt çima ne mînanî hevin?

— Dengê vê bibirînin. Awqas mêr mînanî dewaran lê dinihêrin, ew jî dire — dira wêye.

Cendirman tivingê xwe hazir kirin, xwastin hemûyan dûr bixin. Jina mêrik wekî dînan berve zeviya xwe reviya. Xwe avête erdê. Giriya. Bi destên xwe, bi kulman xulî quloz dikir û li ser serê xwede direşand, li rûyê xwe dida. Digiriya û diqiriya.

Cendirman berê destê xwe lê nedan. Şofêr sekinîbû, bîhna cixarekê dabû. Cendirme di nav xwede dipeyivîn, şerm dikirin li aliyê jinan binhêrin. Hemû cendirma bi xwe jî gundî bûn. Ev çiqasî jî mînanî dê û bavê wan bûn. Ew jî awha digiriyan. Awha dibeziyan û li hember derdiketin. Destên dayikên wan jî awha qelişî û tîş — tîşî bûn. Awha hişk û ziha bûn. Rûyên wan jî wisa qelyayî bûn. "Xwazila ew nehatana vir. Xwazila hevalên wanên dinê bihatana li dewsa wan."

— Ev tişt ne rinde. Lê em çi bikin. Karê me eve. Heke ku nekî, ji jorve pirsên ne baş dibihîsî, demê ku dikî wê çaxê jî awha dibe. Xwedê eskeriyê xirav bike. Biqediya, em jî biçûna malên xwe. Teskere nayê zû zû.

— Ber xwe nekevin hevalno. Çi gunê me heye? Em bêsûcin. Hemû der wehane. Şerên axa û gundiyan qet xelas dibin. Li Yozgata me jî weha. Her sal çend kes tênê kuştinê.

Paşê hêdî hêdî nêzîkî wê jinika ku digiriya, bûn. Mêrê wê jî hatibû. Fatê bi kurê xweve li wir bûn. Soro li cem wan bû. Bêdeng û serên wan di berde bûn. Hevdu rind fem dikirin. Mînanî ava zelal, mînanî şûşê, dilê wan hevdû didît. "Rabe em li rêke dinê bigerin. Tu tivingên wan nabînî? Ûsiv axayê bênamûs ne di navdeye. Ev meriv şandine ser me. Me li hemberî hukumatê nîşan dide." digotin di dilên xwede. Soro û Fatê rind texmîn dikirin ev tişt. Li rûyên herdukan jî dihate femkirinê.

— Rabe em herin xwûşka min. Rabe. Xwedê mezine. Hela ka çi derî vedike.

Cendirman jî alîkariya wan kir, jinik serwext kirin. Fatê rûyê cîranê xweyî bi toz, ji xulî û hêsiran nedihate naskirinê, bi bervanga xwe paqij kir. Jinik him diçû û him jî diziviri li pişt xwe dinhêrî. Li zeviya xwe mêze dikir, nikaribû xwe bigre û dîsa dest bi giriya dikir. Di nav hilke — hilka giriyande:

— Xwedê qebûl neke. Xwedê qebûl neke. Giştî bi riya doxtorande bidin. Jin û namûsa we di destê xelqêde bimîne. Hûn bibine al di nav xelqêde. Xwedê vê li erdê nehêle, digot.

Ew roj rind derbas nebûbû; Şofêrê ji Qeyseriyê bêkêf û bêdil bû. Milê wî bê hemdî wî diçûn û dihatin. Ji ber bûyerên îro, cendirme jî kêfxweş nîn bûn. Kar zû hiştin îro. Bîst bîstpênc serî tenê ajotibûn ji zeviyê. Dilê kesî nedixwast. Bêdil kar nedibû. Bi şev, gerek li traktor û benzînê baş miqat bibiyana. Biparastana. Çi dibe, çi nabe?

Êvarê Soro, Mîro û sê hevalên wan rûniştin, peyîvîn. Bi zûtirê qerar dan. Gelek kes gerek nizanibin. Çend kesên ku natirsin, li devên xwe xwayîne, şev wê ji pêşve nêzîkî ciyê traktorê bibin û çend gullan di ser wanre bavêjin. Yên ku traktorê diparêzin wê berve wan bên, bi çend gulla dîsa wan bixapînin. Wê çaxê ji paşve yek ji wan wê nêzîkî bîdonên benzînê bibe û êgir berdê. Her tişt wê bişewitiya. Traktor jî. Heke niha traktor neşewite jî, meriv dikaribû paşê rêke din bibîne. Ana ji wanre wext lazim bû.

Her tişt rind fikirîbûn. Hemû kar Mîro hilda ser xwe. Ne karekî awqas zehmet bû, lewra nedixwast Soro bê. Çar heval, wê çendên din jî hildana û ev kar bi cîh bihanîna. Di nav wande, xwarziyê Soro Elî jî hebû. Wê ji paşve nêzîk bibiya. Bi şev ewqas gulle avêtin, lê belê kesek ji cem traktor û benzînê neqetiya. Ewder terk nekirin. Wan jî bi çend

gullan bersiva yên dinê dabûn. Ciyê mazot, benzîn û rûn çend qeratî dihate xuyanê. Di nav bêdengiya şevêde dengê ba dihat. Halê wan bi Elî xweş nedihat. Piste pistek hatibû ber guhê wî. Belê rind bihîstibû. Şaş nîn bû.

— Qet ji vir neqetin. Dûr nekevin. Kurê keran wê bîdonên benzînê bişewitînin.

Kar neçû sêrî. Bêşik, fikra wan dizanibûn. Anjî texmîn kirine.

Rojtira dinê zevî dihate ajotin, gundiyê xwayê zeviyê û jina wî digiriyan, diqîriyan û li xwe dixistin. Yên ku îşev bêxew mabûn, traktor diparastin, zanibûn bîdonê bihatana şewitandinê, vê carê bêtir bi hêrs û bi qerar ew herdu ji wir dûr xistin. Dîsa jî meriv nikare bêje ku wê rojê baş kar kirin. Li ser bûyerên rojtira berê gelek tişt xeberdan êvarê. Kar çima nebiribûne sêrî? Şevê dewar, çêlek, ga dixistinê tewlan. Hela hê pez li derve nedima. Bi dereng dixistin goman. Çendekî şunde wê li derve bimana, lê ne niha. Gelo him gom him jî tewla axê bişewitandana, çawa dibû? "Ew bi nanê me, bi jiyana me dileyize, xwarina me dibire, em çima yên wî neşewitînin." Yek du pêş derketin. Yekî qet xeber neda. Dîsa pêne kes bûn. Ji berêde tiştên weha hez nedikirin. Şerê yên wisa kiribûn. Di dawiyêde bi neçariyê qebûl kirin.

Nivê şevê nêzî gom û tewlan bûn. Tirs û xof kete dilên wan. Bêdengîke wisa hebû, merî jê ditirsiya. Bi şik bûn. Ji nişkêve, wê agir berdana herdu ciyan jî. Agirê her alî bigirta, paşê haya mala axê wê bibiya. Ji malê piçekî dûr bûn. Herder ku ji nişkêve bişewitiya. Her tişt wê bi zûtirê bibiya. Gelek bi xeter bû. Nobedar Şiko, Eso û Hesen jî bi çek bûn. Cendirmên ku wê du roja şûnde biçûyana, hela hê li mala axê bûn. Vê sibê sê cendirme çûbûn, lê sê hew mabûn. Xeter pir bû. Gerek meriv gelekî hişyar û serwaxtbe.

Bi şev li ber quncê gomê, Elî qeratîk dît. Li wêderê telyayîbû. Elî vê carê jî hebû. Elî rind lê nihêrî. Mêrik wek tirsoneka di ciyê xwede nedisekinî. Vî yalî û wî yalî diziviri. Elî xwast ku di pişt wîre nêzîkî gomê bibe. Lingê wî li kevrekî ket, deng da. Qeratiyê pêş gomê, li hawîrdora xwe gulle reşand. Elî banzda pişt sûrê. Li dora gomê çend kesên din jî hatin xuya kirin û bi çek agir kirin. Te digot ku dixwazin yekî bigrin, alîkariya hev bikin. Elî dûr ket, hate malê. Vê carê jî haya axê bûye, got di dilê xwede. Bi curekî din nedibû. Wê çawa bizanibûna? Berê qet kesek li ber gomê nedima. Îşev te digot ku ordiyek esker nobedarî dike. Belê duh jî bihîstibû Ûsiv axa.

— Ma "Dûr nekevin, wê benzîn, mazotê bişewitînin", negotibûn?

Nîha jî awqas tivdarek. Belê şik û şibhe tune ku axa her tiştên wan dizane. Lewra tivdarekên xwe jî dike, difikirî Elî. "Gelo kiye? Pênc kes bûn. Ez jî li cem wan bûm. Yek ji wanbe gelo? Dibe gelo? Yek xalê Soro. Mîro û cîranê wanî baş Evdo, Qasim û Seît." Nedixwast ku qet ji wan yekî jî bikeve şikê. "Ez ji xalê Soro û Mîro şikê nakim. Lê ew hersêkê dinê. Ew çima bikin? Na lo." Yên ku di hişê wîde derbas bûn, ji xalê xwere got. Tiştek hebû di nav vî karîde. Merivên axê traktor û mal her şev diparastin êdî.

Li mala Mîro dîsa ew pênc heval rûniştibûn. Soro bêkêf bû. Wê çawa bikirana, çilo biserketana? Nikaribû qerar bide. Bi vî halî xweyî belengaz, bi vî gundîtî û nezaniya xwe wê bi çi teherî bikira ku karê wan baş biçûya? Xwedê kir bi sebir bû, dilekî rast lê bû. Gelek tişt zûtirê dianî bîra xwe. Gundî hinek tiştan ji pêşve texmîn dikin, ji vî aliyêve Soro dewletî bû.

— Ev du rojin, me got, em tiştekî bikin, nebû. Me nebir serî. Ev ne gunê meye. Ez texmîn dikim haya axê dibe. Hûn çi dibêjin?

Li rûyê hemûyan dinhêrî, hela ka bi çi teherî têne guhartin? Mîro mînanî wî difikirî. Wî jî li rûyê hevalên xwe mêze dikir. Me awqas gulle avêtin, gavekê jî pêşta nehatin. Te digot ku bîhna benzînê, bîhna jinên wanin. Qet jê neqetiyan. Her şev gom û tewle mifte dikirin, berdidan. Îşev bi dehan meriv li ber dipan, diparastin. Weha nedibû. Di vî karîde tiştekî din heye. Ev axa tiştina dizane.

— Ez jî wisa dibêjim. Em çi dikin jî dizane, got Seît.

Evdo li ber xwe dinhêrî. Li wan gundarî dikir. Lê belê hiş û fikrên wî li ciyekî din bû. Guhên wî piçekî sor bûn. Serê wî diêşiya.

— Tu çi dibêjî Evdo?

Bi şik li dora xwe nihêrî. Xwast ku xwe qewî nîşan bide.

— Walle, axa gelek tiştan dizane û fem dike.

Wê hine tişt jî bigota, lê nikaribû. Dawî weha girêda:

— Dibe yekî bênamûs xeberê dide axê. Ez jî dikevime şikê.

Evdo hêdî hêdî hate ser xwe, rehet bû. Dîsa jî nikaribû li rûyên hevalên xwe mêze bike.

Hine pêşneyar hatin gotinê. Gişt jî ne di cîde bûn. Na, warin bira hemû kes sond bixwin. Na, kî ji kê şik dike, bira bêje. Heke ku emê tiştên weha bikin, werin em bi xwe bi destên xweve bikin. Kesî dinê bira neyê alîkariya me. Dirêj kirin û dirêj kirin. Soro di dawiyêde got:

— Hevalno, şik tiştekî rinde. Gerek meriv ji hemû kesî şikê bike. Hela hê di serê şuxulande şik merivan hişyar dike. Meriv riya xweye rast digere. Kar hela hê di sêrîde, genî nebûye, bîhn bi ser neketiye tê

xilaskirinê. Mînanî exmaqan, qet ji tiştekî şiknekirin ne karê merivane. Gerek hemû kes xwayî şikbe. Şikê ku nekî, xeterê, xirabiyê, ne- başbûnê zûtirê nikarî bibînî. Nikarî fem bikî. Xirabiya herî mezin tê pêşiya merivan. Lê belê wê jî bizanibin ku şik mala merivan xirab dike, hildiweşîne. Hevaltiya merivan birîndar dike. Meriv bi xwe xirabiyê bi şexsê xwe dike. Ji mala xwe dikevî şikê, gunehê jin û keça xwe digrî. Ji hevalê xwe şikê dikî, paşê dostê xweyî herî nêzîk winda dikî. Tenê diminî. Ji kevir, kuçikan, teyrên difirî dikevî şikê êdî. Eva li hemû ciyan wehaye. Binhêrin, em pênc cîran li virin. Cîranên me yên dinê hene. Em hemû ji bo hevdu, qenc û xirab serê xwe diêşînin. Ji bo ku erdê xwe ji dest dernexin, digrîn û lava dikin. Heke ku em ji hev têkevine şikê, paşê em nikarin du cîranan jî li ba hev bibînin. Wê çaxê em gişt zirarê dibînin. Bisekinin, guhên xwe bidine ser kar û baran. Lê ji kesî şibhe nekin. Ne wisane ciranno? Hela bisekinin, ka çi dibe. Ji yekî ji mere bêjin, ku tu ji bo hinek pere, ji bo hinek malê dinê, bi du pirsên axê yên şirîn diçî xiyanetê dikî. Mixbîriyê dikî. Wê çawa bibe? Emê çi bikin? Ji xelqêre, ji yekî dinre wilo gotin zehmete, xetere. Him jî ne başe. Bi ya minbe, gerek em sebir bikin. Rind hîn bibin, ev çiye, çima awha dibe.

Evdo:

— Tu rast dibêjî Soro. Lê belê yekî wiloyî bêabûr, di gundde hebe, gerek meriv bibîne û derxe eşkeretiyê. Gerek meriv bênamûsan ji gund derxe, got.

Hemû çûn. Paşê Soro gazî xwarziyê xwe, Elî kir. Soro, Mîro û Elî bûn. Roja bêtirpêr, wê şevê li cem bîdonên benzînê, ew gotinên nobedaran, Elî bi guhên xwe bihîstibû, an na? Şevekê berê, ew nobedarên dora gomê û tewlê, çekên wan, çend hew bûn, gişt yek bi yek jê pirsîn.

Mîro:

— Kî çi dibêje bira bêje, ez ji Evdo dikevime şikê, got.

Soro xeber nedida, bêdeng bû. Heta niha, di jiyana xwede qet weha nebûbû. Ev kar ji wî zêde bûn, pir giran bûn. Gundekî mezin, axa, hukumat, yên li dijî gundiyên xwe, alîkariya axê dikin. Ev gişt nediketine hişê wî. Berê hinek tiştên weha bîhîstibû. Bihîstin hêsa bû, lê belê wexta ku tê pêşiya merivan bi xwe, pir zehmet bû. Ewî jî ji Evdo şibhe dikir. Lê çawa dikaribû awha bike? Evdo bi salan berê, çi anîbû serê birayên xwe. Paşê çawan jina xweyê bêsuc, bêgune berdabû û pirsên xirab ji bo wê gotibû. Karên mêran nîn bûn ev.

Lê wekî şikên wan rast nînbûna? Ji bo merîkî, "yekî xwefirotiye, yekî xaîne" gotin, wisa ne hêsa bû. Wekî ne rastbe? Yên weha gotî, ma

paşê nabine derewnek? Ev jî wekî şiltax avêtina xelqêye. Çi ferq heye? Fikirî û nikaribû ji nav derkeve.

– Tê çawa nîşan bidî ku wisane, Mîro? Tiştekî ku meriv baş nizanibe... Ya rastî, rind bifikire. Qerardayin zehmete.

Elî guhdarî dikir, tevî xeberdanê nedibû. Berê fikirî, Mîro rast dibêje, Evdo dibe ku tiştên weha bike. Te digot ku yek ji wîre dibêje. Seît, Qasim tiştên wilo nakin gelo? Çima nekin? Na, ew jî dikarin bikin. Lewra, hingî ku xalê xwe guhdarî dikir, her diçû heq dida Soro. Xalê wî nedixwast, zû zû kesekî gunehkar bike. Çi merivekî baş bû. Hertim, her roj van aliyên xalê xwe didît û bêtir nas dikir, xalê xwe ji berê zêdetir hez dikir.

Ev çend rojin, karê traktorê baş nediçû. Şofêr hînî van deran û van xurekan nîn bû. Piştî xwarinên bi rûn, şeveka sar, zikêşê pê girtibû. Nexweş ketibû. Li dora navika wî te digot, bi tiştekî dikolin. Xwe bi zehmet diavête derva. Nava wî diçû. Navçûyineka bi xwîn. Rojê panzde anjî bîst cara biçûya ser destavê, dîsa têrê nedikir. Nedixwast ji ser destavê rabe. Rûviyên wî lêbûn, perçe perçe bênê xwarê. Tiştên mînanî palaxê hebûn di destava wîde. Di rojekêde zirav bû. Çilmisî û zer bû. Wexta radibû li ser xwe, pêş çavên wî reş dibûn, hişê wî diçû. Bi tasan av vedixwar. Dilê wî dişewitî, dîsa jî têr nedibû. Qehwa tehl, çaya hişk û çi nedanê? Qet fêde nedikirin. Mast û avdew vedixwar bi ser hev. Sê roj awha derbas bûn. Paşê birin ser doxtir. Bi vî teherî heftekî nexebitî. Piştî nexwaşiyê jî, mîna berê nikaribû kar bike êdî.

Li newala berve Kanîsipiyê, fêza gund, qederekê ji gund dûr, çem nav kevir û zinaranre derbas dibe û dikişe. Di nav wande, hine ciyên avê, golên piçûk çêkirine. Meriv li vanderan dikare têkeve avê. Mêr berve jor diçûn û diketine avê û destav digirtin. Jin, sê çar hew bi hevre diçûn, yekê nobedarî dikir, yên dinê av li xwe dikirin û xwe dişûştin carna.

Riya Kaniyasipiyê, di fêza newalêre derbas dibe. Lewra kes nikare li jêrê, kesên dikevine avê bibîne. Cîkî awha, bêdeng û bêkes tune. Car cara navê vê newalê tevî kurt û pistên gund dibin.

Elî li pêş zinarê sipîre vedigeriya. Ferq kir, ji jêrve Hesenê Hemzo tê. Hesen hat li ser kevirekî mezin rûnişt. Destava xweya mezin kir. Paşê xwe tezî kir, kete avê. Av di nav kevir û kuçikanre bi deng diçû. Lewra meriv dengê kesî zû bi zû nedibihîst, hetanî wan nebîne. Dengê lingê kesî nedihate bihîstinê. Ne hêsan bû.

Elî qirma xwe her tim bi xwere dibir. Lê nihêrî. Devê wêde gullek hebû. Bêdeng berve jêr bû. Hat ciyê kincên Hesen. Ew di nav avêde

bû. Carêkê duda xwe cûmî bin avê kir. Bi destên xwe çavên xwe miz dida. Dev û lêvên xwe bi avê şuşt. Careke din jî xwe di avêde kir. Sîng û şeqên xwe miz dan. Bi hînbûyina berê, mînanî hinek li der dorê hene, bi destên xwe ciyên xweyên şermê vedişart.

Elî xwe dabû ser kevirekî, bêdeng li Hesen mêze dikir. Mînanî pûtekî ji kêvir. Mînanî kevirekî reş. Destê xwe bir ser debanca xwe. Hesen xwe şûştibû. Berve kincên xwe zivirî û Elî dît. Bi herdu destên xwe, ciyên şermê rind veşart. Xwe hinekî nizm kir. Tirsê pê girt. Çavên wî bêtir mezin bûbûn. Tiştek negot. Elî derpiyê wîyî nîvqirêj avête wî.

— Derpiyê xwe lixweke Hesen. Li xweke ku em hinekî xeber bidin.

Hesen ji dengê Elî hinek tirs, lerzok û şik ferq kir. Bi vî halî Elî qet baş nedixuya. Gelo çima li vir bû? Ji bo tiştekî xêrê nîn bû.

Derpiyê xwe li xwe kir, serê xwe bilind kir û gavek pêşde avêtibû ku Elî debance di dêstde, ji ser kêvir bazda, hate jêrê pêş wî.

— Neyê. Bisekine di ciyê xwede.Hesen şaş bû. Bû bilde bilda wî. Diricifiya. Tiştekî bêxêr texmîn dikir, lê belê debance nehatibû bîra wî. Li vêderê, merivek gullekê li mêjiyê wî, li dil anjî zikê wî xe, bikuje, bi rojan haya kesî nabe. Çima hatibû vêderê, têkeve avê.

— Tu dîn bûyî Elî? Tu ji min çi dixwazî? Elî, Elî ez qurbana teme. Jin, zarên min hene, wan bîne ber çavên xwe. Tê wan êtim bihêlî. Çi wê bi destê te keve?

Baweriya xwe ji jiyanê birîbû. Bi xwe jî bi gotinên xwe îna nedikir.

— Tu bersivên min bi rastî bidî, ez tiştekî bi te nakim. Na, nebû, ne Ûsiv axa, qet kesek jî nikare te ji destên min xilas bike. Gullek li mêjiyê te, besî teye.

— Elî, neke, Elî. Debancê bikşîne wî yalî, em xeber bidin. Wê têke şûnê.

— Dest bi lava kirinê neke Hesen. Van berde.

Hinekî din jî nêzîk bû. Debance anî rex serê wî.

— Bêje. Yên di gundde dibin, kî ji Ûsiv axare dibêje? Nebê, nebê, bixwazî min mîna zarokan bixapînî! Bi edeb û namûs bêje. Ez jî sond dixwim, tu tiştekî bi te nakim. Kesîre nabêjim ku te gotiye. Wê di nava me herduyande bimîne.

— Ez qurban, tu nexerîbî. Tu çawa qêmîşî min dibî? Tu zanî, walle, ez bi peran jêre dixebitim. Li ber traktorê nobedariyê dikim. Tu dixwazî, ez dikarim wî jî bihêlim. Çi bikim, bû carekê. Walle, bille poşmanim ez. Min carekê gû xwar. Bû, çû.

— Wan dayne li alîkî. Di destê tedeye. Çi dixwazî dikarî bikî. Kes pêşiya te nagire. Çi heqê min heye? Ez kîme? Li ber çime? Bêje, van

rojan, kî diçe gotinên gundiyan ji axêre dibêje? De zû bêje! Ez naxwazim awqasî jî dirêj bikim. Hêviya yekî bisekinim ku bê vira.

— Nizanim. Walle nizanim. Ez ji axêre tu tiştî nabêjim. Xelq nahêle ez nêzî wan jî bim.

— Niha, tu nabêjî ne? Suc, gune ji hustiyê min çû. Heta bîsta ji tere molet.

Fem kir ku hal xetere. Dest û milên wî bi rexde diricifiyan. Muyên çermî wî top—topî bûbûn, mînanî serên derziyan. Av ji porê wî dirijiyan, dilop dikirin. Çeqe—çeqa dev û diranên wî bûn.

— Yek... du... sê... çar...

— Elî, walle nizanim. Destê xwe bi xwînê meke. Xwîna min neke hustiyê xwe.

— Heyşt... neh... deh...

— Heyjde... nozde... Tê bêjî an na? Wext qediya êdî.Berê debance berve eniya wî kir. Çavên Hesen te digot, lêne ji cî derkevin. Diricifî û li Elî dinihêrî. Ji nişkêve li erdê ket.

— Ezê bêjim. Ezê bêjim.

Elî ji jorve devê debancê da ser serê wî.

— Zû bêje.

Hesen bi zor ji devê xwe derxist û got.

— Evdo.

Dest û piyên wî bi zingînî dilerziyan, dilê wî lêbû ji cî derkeve.

— Min bi namûs sond xwariye, ji kesîre nabêjim ku min ji te bihîstiye. Wê di nava me herdûyande bimîne. Ji min netirse. De xwe tazî bike, têkeve avê dîsa. Hetanî ez dûr ketim.

Kincên wî di hemêzede, dûr ket. Paşê ew dane ser kevirekî. Hesen hela di nav avêde bû.

Du roj derbas bûn. Ew pênc kes dîsa li ba hevdu bûn. Cara dinê gom û tewle şewitandin neanîbûn cî, vê carê gerek ev kara biçûya serî. Wê çawa bikirina, dûr, dirêj xeberdan. Paşê çûne malên xwe.

Mîro û Soro, Elî şandine malên hevalan, xênji Evdo gazî wan kirin. Vê carê nizm xeber didan. Gelekî li ser gotinên xwe disekinîn. Yên nûhatî, tiştek fem nedikirin. Ev çibû? Çima awha bû? Dîtin ku wê bêî Evdo van karan xeber bidin. Gelek tişt texmîn kirin. Çavên wan dikeniyan. Kes ji wan neketibû şikê.

Soro ji hevalên xwere got, baş hîn bûye ku Evdo ji axêre hemû tiştan dibêje. Bêtir nedixwast xeberde. Ji cîkî pir bîr û bawer hîn bûbû, ku Evdo wisa dikir.

– Gom û tewle na, em dixwazin traktorê dûr bixin. Bi çi mereye şewitandina heywanan. Me wê rojê weha xwest, lê ew jî ji qehran û hêrsan bû. Em çi ji pez û dewarên bêziman dixwazin? Na bavo, na. Çi gunê wan heye?

Dipeyivî, hêvî û baweriya wî bi xwe jî bi xeberdana wî dihat.

– Ji hêrs û qehran tiştên baş dernakevin. Paşê poşmanî tê. Gere em traktorê ji vir dûr bixin. Hela hê gelek kar jî nekiriye. Ewê li cem gom û tewlan li benda mebin, emê benzîn û tiştên wan bişewitînin.

Kî, wê çawa bikin? Bi çend merivanve, gişt hatine xeberdanê. Vê carê bi zehmet nedihate xuyanê. Niha traktor li dûrî benzînê didane sekinandinê. Ne wisa bûya, wê bi hevre bişewitîna. Çi baş dibû wê çaxê.

Piştî nîvê şevê merivên axê bi telyayî disekinîn, mînanî nêçîrvanan. Axa bi hêrs:

– Gulla mavêjin hewayê. Van diz û tolazan bi xwe bikujin, birîndar bikin. Çend hew ji van kuçikbavan li ser qûna xwe nekevin, nemirin, dest ji van karan nakişînin.

Ji nişkêve benzîn, mazot, rûn û tiştên wan agir girt. Te digot, deng bi ezmana diket. Bîdon du caran bi dengên bilind teqiyan. Şewqê dida der doran. Mîna tîrêj û şewqa rojê. Her diçû alaf bilind û zêde dibû. Agir carna kêm û nizm, paşê dîsa bilind û pir dibû.

Şofêr û yê ku alîkariya wî dikir, li benda traktorê bûn. Tiştek bi wan nebû. Di bin traktorêde radizan. Nedixwastin jê dûr bikevin. Di hundirde nediman. Agir, alaf dest pê kir, şofêr gelekî bi aqil û bê zehmet traktor hêjî dûr xist. Dibû ku ji agirên der doran difiriyan, bi qirş û gîhayên dişewitîn, lastikên traktorê jî agir bigrin û bişewitin.

Kes bi dest neket. Ev çendek bû ku gundî gelek bêkêf bûn. Ser vê şewatê hinekî şa bûn. Li êgir mêze dikirin, dizanibûn ku wan bi xwe şewitandiye, agir berdayê. Te digot, alaf ji dilên wan quloz dibû. Dîsa jî neheqî ji kesîre nedima. Li erdê nedima. Bi dilşayî û kêf êgir dinihêrîn. Ji hev dipirsiyan.

– Kê şewitand? Erê kê şewitand?

– Kî çi zane? Qûlekî xwedêyî baş şewitandiye.

– Qet kesekî axê tunebû li wira? Te bihîst, wê rojê jî hinekan xwastiye bişewitînin. Paşê tirsiyane û reviyane. Evana bi dil û cesûr bûne.

– Te dît, kurên xelqê çito bi dilin? Çi mêrin? Carekê hînî van karan bûn, êdî axa bi wan nikare. Her roj tiştekî wî, wê bişewite.

– Ez jî wisa dizanim. Oro, qet natirsin lo.

– Çima bitirsin? Kî zane kîne?

lî şandibû gund. Nizam çi, nizam çi. Qaymeqam jî jêre gotibû, gerek vî karî gelekî pêşde nebe. Paşê serê wî wê biêşe. Yên jorê, wê li ser vî karî bisekinin û bipirsin.

"Him her tişt bira başbe, him jî bira pozê kesî xwîn nebe. Paşê jî dibêjin, tiştek bibe em nikarin te xilas bikin. Li bajêr digotin, qumandar rişvetê distîne. De bira bêjin. Kîjan memûr heye, rişvetê naxwe? Devê te ku heye, tê bixwî. Yê ku naxwe, nahêlin bijî." Di vî warîde tirsa wî tunebû. "Çi dibe bira bibe. Lê wexta tiştekî dikî, gerek bê deng bibe. Bîhna wê dernekeve. Li ser berfê here, lê şopa piyan nehêle." Lewra xwest, vê carê gotinên wan bigre. "Hinekî bitirsîne. Paşê hinekan ji wan berde û yên din bişîne cem sawcî. Bira hinekî jî serê wî biêşe. Hertim çima ezê pêre mijul bibim. Di nav xelqêde xirab bibim. Yên dinê û sawcî wê bizanibin ku ez ne neheqim."

Gişt yek bi yek guhdarî kir. Qet haya kesî tunebû, wisa digotin. Hinek kal û pîr piçekî dane xeberdanê. Qerarê xwe dabû, wê kê bigre û kê berde. Ji nav bîst kesande neh meriv berda bû. Di nav wande Evdo û Elî jî hebûn. Elî gelekî cahil û zar dihate ber çavên wî. Xalê wî ku li wirabe, çi gunê vî tifalî hebû. Gotinên van yanzde kesan, da nivisandinê. Du rojan li qereqolê man. Ji wan neh kesên dinêre xeber da û ew şîret kirin. Paşê ew şandin malên wan. Ev yanzdeyên ku li qereqolê mabûn, gotinên hemûyan mîna hev bûn. Haya wan ji tu tiştekî tunebûn. Ûsiv axa giliyê gundiyan kiribû. Qumandar berê gotinên wî guhdarî kiribû. Kaxiza şîkatê xwe, dabû qumandar. Qumandar ev hemû dane nivîsandinê û şande ba sawcî.

Di derheqê vî gundîde, sawcî, berê ji qaymeqam, hinek memûrên dinê gelek tişt bihîstibû. Traktor şewitandin... Benzîn, gom û heywan şewitandin... Meriv nikaribû van tiştan piçûk bibîne û guh nedê. Heke tapiyên gundiyan hebûna, gunê wî yê bi wan bihata. Lê belê ew him neheqin, him jî zorê dikin.

Dihate xuyanê di derheqê van gundiyande, sawcî ji berêve tiştên wisa bihîstibû, li ber çavên wî ew neheq bûn. Kirinên Ûsiv axa jî beled bû. Zanibû ewî çi kiriye, çi nekiriye. Çawa bûye xayê vî gundî. Gişt rind bihîstibû. Lê belê çi ji wîre? Qanûnê heq dida Ûsiv axa. Ew jî memûrê qanûnê bû. Karê wî ev bû.

Yek bi yek ew kaxiz xwandin. Carekê jî bi xwe pirsî û guhdarî kir. Bi vî halî gerek kes negirta. Ew jî nedibû. Di dêstde tiştek tunebû ku wan bigre. "Lê wakî herin hinek tiştên nû bikin. Paşê wê çi bibe?" Ya rastî, van çendekî di girtîgehêde bigre. Paşê hêrs û tûjbûn ku derbas

bibe, wê wan jî berda. Wê êvarê sê kes berda û heyşt gundî girt sawcî.

## –XXI–

Girtîgeh kîlometrek li dûrî bajêre. Li der dora wê awqas xanî tunin. Qederekê wêde çend malên nizm hene. Li fêza rêya ku diçe wîlayetê û nava bajêrve derbas dibe, diket. Rê bi vî halî herdu taxên bajêr ji hevdû diqetand. Xanîkî kevn, bi keviran çêkirî û zexm bû. Sê odên mezinre "qowîşên mezin" digot girtiyan, di nav xwede. Du hew jî odên piçûk hebûn. Girtiyên bi qedir û qîmet, gelek caran di van odên piçûkde diman. Di qowîşên mezinde, ciyên razanê bi daran çêkirîbûn û sêzde, çarde kes diman, lê belê niha ji sîhî zêdetir têde radizan. Navê bajêr ne baş derketibû ku gelek şer, dizî, birîndarî lê dibe. Jimarên girtiyan her tim zêde bû. Her diçû zêde dibûn.

Di wan herdu qowîşên piçûkde gundiyên dewlemend û bajariyên bi nav diman. Axa û bajariyên pir tênê naskirinê, tu cara nakevine girtîgehan. Yê ku em dibêjin, yên hal û waxtên wan baş bûn. Ji yên awhare, vê derê, "bi qedir, xwayî der – dor" tê gotin. Di van odande çar meriv diman. Eger ku têkevine tengasiyê anjî nasên ji yên berê bên, yek du hildidane cem xwe. Yên mezin ne wisa bûn. Ji aliyê feqîrên nû hatîve, car cara baş dibû ev halên qowîşên mezin. Yên nû hatî, nivînên wan tunebûn, di nav du ciyan xwe direêj dikirin, radizan.

Heyşt gundî, di nava cendirmande hatin ber girtîgehê. Dîwarê der bilind bû. Li ser dîwêr têlên bi strî kişandibûn ku kes nereve, neçe der. Derê der bi hesin bû. Nobedarekî bilind, qelew, simbêlboxe û esmer derî vekir. Li ser, kincên romê hebûn, mînanî yên nobedarên gund bûn.

Berê ew hildane baxçê hundir. Yên nû hatî şaş û metel bûn. Kêder jêre nîşan didan, diçûn wir. Baxçe vala bû. Hemû li wir bûn niha. Dirêjiya baxçê panzde mêtro hebû. Kêmber bû. Deh mêtro berayî. Dîwarên wê qalind û fireh bûn. Bejna sê meriyan zêdetir bû bilindayî. Şeş mêtro dihate xuyanê, bi texmînî. Li ser dîwêr, têlên bi strî li hawîrdor kişandibûn. Bilindiya têlan jî nêzîkî du mêtro bûn. Di quncekîde nobedar, tiving di dêstde. Ew ciyê ku nobedar li dorê diçû dihat, bi berayî û dirêjayî du mêtro hebû. Him li der û him jî li hundir dinhêrî.

Li ser xênî bi xwe jî, dîsa nobedarên bi tiving hebûn. Soro vê carê, ji halê xwe aciz nîn bû. Tirsa wî kutan û lêxistin bû. Lêxistinên cara

din, di rêde hatibû bîra wî. "Gelo vê carê dikarim damîş bidim? An bikevim, xuva herim û cendirme bi min bikenin." Qet tiştek nebûbû, lewra bi kêf bû. Hepisxane berê jî dîtibû. Hepisxana Edenê hate bîrê. Ev der tu girtîgehe li cem ya Edenê. Bi hezaran kes. Ji her miletî. Çi digerî, têde dikarî bibînî. Naskirina wir, hînbûna wir çend meh dixwaze. Wisa tê xuyanê ku evder cîkî xirab nîne.

Li pencerên ku li baxçe dinhêrin, hemû çav li ser yên nûhatî bûn. Simbêlên qalind û badayî. Çavên mînanî agir diçirisîn. Mîro li cem Soro bû. Niçande wî, "hevalên meyên vir ha."

Cendirmên ku ew hanîbûn, bi kaxizanve çûne hundir. Sergardiyan, bi porên weşyayî û bi çavên ken, li wan zivirî:

— Derbasîbe. Hûn bi xêr hatin. Canê we saxbe.

Li ser deriyê girtîgeheyî hundir, du mifte hebûn. Mêvanên nû ketin hundir û çûne odeke piçûk, li aliyê rastê. Sergardiyan navê wan li deftereke mezin nivisî.

— Yê mayî, nivîsdar bira sibê biqedîne. Min dixwast ku we hemûyan di cîkîde bihewînim. Hûn ne hindikin. Eger mayina we ya vir dirêj bû, emê jêre rêyekê bigerin. Niha emê çar hevalan ji we hildin vê qowîşa mezin. Çarê dinê jî qowîşa hana mezin. Ya dinê heta dev û lêva tijiye. Dinhêrim ku qet tiştekî we jî tune. We dest û piyên xwe hejandiye û hûn hatine.

Soro dît, sergardiyan yekî nerme, bi merivanre mînanî bavê merivan xeber dide. Xwest jêre sebebê vî halî bêje.

— Me bibaxşîne, me nizanibû wê awhabe. Ji nişkêve wilo bû, em destvala hatin.

— Belê. Belê. Hertim wisa dibe. Paşê tiştên xwe tînin gişt.

Hewş û pişt deriyê ku ew lêne, tijî girtiyên kevn bûn, yên nû meraq dikirin. Paşê bûne du qîta û herine qowîşên xwe. Îşev girtiyên kevn, wê nivînên xwe parvekirina, hetanî sibê, ji gund nivînên wan bihatana. Dema wê biçûna ciyên xwe, nobedarê derve diqîriya. Tendûrekiyan fem kir, gundiyên wan li ber dêrîne. Ji xwere nivîn teme kirin. Ew gardiyanê mezin û qelew damîş nebû.

— Lolyo. Hûnê çi bixwin? Rûn, penêr, bilxur, hema çi dibînin, ji bo xwarinê bîr mekin, bi xwere bînin sibê.

— Derbasîbe bira.

— Xwedê ji te razîbe.

— Merheba. Derbasîbe. Derbasîbe.

— Tu saxbî.

— Derbasîbe.

Soro, Mîro, Qasim û gundiyekî wanî xort bi hevre bûn. Seît û sê hevalên dinê jî, di qowîşekêde bûn.

Girtiyên kevn, Soro û hevalên wî gazî çaya êvarê kirin. Li ser ciyan rûniştibûn. Çar mêvan û yên dinê, hinek gencin, hinek jî kalin. Simbêlên wan bi kêfa te bûn. Ji kinc û solê wan wisa dixuya ku gundîne, anjî nû hatine bajêr. Kesekî dewlemend di nav wande tunebû. yekî xort qedehên bê tarîlk tijî çay dikir. Çayeke giran bû. Berê dane mezin û mêvanan. Li ser xwestina wan çay du carî kirin. Yek li aliyê Soroyî rastê rûniştibû. Bi texmînî, pêncî salî hebû. Lêvên wî qalind, zik berdayî, li ser pişta destê wî deq deqî û îstêrk çêkirî. Piştî çayê cixare keremî mêvanan kir. Soro paşê hîn bû, navê wî Evdilqadire.

— Binhêrin, biraziyên min. Dibe hûn nizanibin. Berê pêşîn, du sê edetên vira ji were bêjim. Paşê em tiştên dinê qise bikin.

Zivirî û sêrîde li rûyên wan nihêrî.

— Qe hûn berê raza bûn?

— Na xêr. Qet ne yek ji me jî, got Soro.

Çîroka xweya Edenê qet qal nekir. Çi hewce bû? Eger ku ciyê wê bê, meriv dikare qal bike, got xwe bi xwe.

— Li vêderê, her sibê nanekî didine meriva. Mînanî nanên eskeriyê. Wisa ne xweşe, lê belê dîsa jî nane.

Keniyan. Yekî ji wan:

— Tiştên awha serê wan bixwe.

— Yek jî nîvro xwarin didin. Nok, bilxur anjî girar dibe. Hemû awqase. Bira çavên we netirse birazîno. Em hinek rûn û îsot tevî dikin. Wisa nebe nayê xwarinê. Xênji qowîşan, mitbaxeke me heye. Gişt li wir xwarina xwe çêdikin. Têrê nake. Lewra, hûn dinihêrin, li qowîşan bi bihna ocaxên niftê meriv nikare bisekine. Hinek, xwarinê ji hev didizin. Lewra em tiştan jî li vir dihebînin.

Pirên wan keniyan.

— Du ciyên destavê hene. Yek di hundirde, yek jî li derveye. Ava herdukan jî zêdeye. Di vî alîde ev der başe. Yên dinê, hûnê hêdî hêdî hîn bibin. Me bihîst ku hûn ji Tendûrekêne. Ev şerê çiye?Soro zanibû, girtîgeh cînên bê îtbarin. Hela hê hevalên xwe, ji vî alîde hişyar nekiribû.

— Erdê gundê me, yê meye. Lê belê destê meda tapî û tespît tunin. Di destê Ûsiv axade jî tunin. Ewî karê xwe kire rê. Erdê me ji destê me girt. Traktor hanî û berî me da. Me xwast ku bi nîvîkarî û mîna berê kar bikin. Nebû. Me lava kir, em ber Ûsiv axa geriyan, dîsa nebû.

Yên dinê bi meraq guhdarî dikirin. Te digot Soro, çîrokeke ji dewra berê dibêje, wisa li devê wî dinhêrîn. Her roj ev tişt li cem wan jî dibûn.

— Yên ku zeviyên wan bi traktorê hatine ajotinê, giriyan, kirin zare—zar, dîsa nebû. Paşê kê şewitand, çawa bû kes nizane. Yekî Maraşî, şirîke Ûsiv axa, xwayî traktor. Traktora wî şewitandin şevekê. Ewî jî hişt çû. Tu çawa zanî kê şewitand, em jî wisa. Paşê hinek erdê xam da me. Me kirin zevî. Îsal dîsa traktor hanî. Me dîsa lava kir, nebû. Xwedê jî zane ku haya gundiyan tûne bû. Vê carê jî benzîna wî şewitandin.

Evdilqadir serê xwe ba kir. Hinekan:

— Way çavê min bin. Çi xweş kirine, got.

Yekî din qehirî:

— Dengê xwe bibirin lo. Çi dikevî nava pirsan? Bise bira mêrik bêje.

— Paşê jî ji bîst kesan ketine şikê. Neh kes, du rojan di qercqolêde girtin û di dawiyêde ew jî berdan. Em birin cem sawcî. Wî jî sê kes berda. Bi ya wan, hinekan ji me şewitandiye. Em heyşt jî hanîne vir, birano. Ne kesî dîtiye, ne jî şahit hene. Wekî ez niha bibêjim ku ez ji te şikê dikim, qet awha dibe?

Paşê xwastin ku şîvê bi hevre bixwin. Soro, Mîro tev hinekên ji berêde girtîbûn dixwarin. Herdu hevalên wan jî li alîkî din, li ser ciyên wan, xwarina çend girtiyan parvedikirin. Her der di nav qirêjêde bûn. Feraq jî wisa. Xweregê wan savar bû. Dabûne nava xwe, çend serî pîvaz jî hebûn. Di nav deh deqîqande, di wê beroşa mezinde qet tiştek nema.

Bi şev, her yek ji wan, di cîkîde, nav hevalên nû razan.

Ji deh rojan zêdetir bû, ku li vêderê bûn. Hînî vir bûn. Ji gund nivînên wan hatibûn, tivdarekê xwarinê jî kiribûn. Hemûyan tev dixwar. Sibê û êvaran du seet li baxçe, bi serê xwe bûn. Dor bi dor digeriyan. Navê gera wan, di girtîgehêde "volta" bû. Yên ku cezayên wan zêdeye, li vê hepisxanê nadin sekinandinê. Lewma, ji hepsê revîn kêm bû, li vir.

Qedrê Soro digirtin. "Yekî bi aqile" digotin ji bo wî. Şevekê, ew hevalê ku li tenişta wî radiza, bi dizîkave, di bin orxanêde ji Sorore got:

— Ew Evdilqadir, ewî qert, bi esrarkêşeke. Dostê axane. Tu nabînî, qet rojekê ji bo wan pirseke xirab ji dêv derdikeve? Di kadîna xwede esrar veşartiye. Hinekan îxbar kiriye. Hatine, ew girtine. Van şibhe kiriye ku cîranekî wan îxbariya wan kiriye. Evdilqadir û kurê wî mê-

rikê cîran kuştine û berê xwe dane çiyan. Nîşan nade lê, mînanî marane.

Wê şevê xew nedikete çavên cîranê Soro. Ewî ji Soro gelekî hez kiribû. Soro jî ji wî. Kêm xeber dida. Dostê hemûyan bû, tevî her tiştî nedibû. Hinekan xwûşka wî revandibûn, wî jî li wan xistibû. Kes nemiribû, lê du meriv birîndar bûn.

Soro:

— Te çima wisa kir? got û jê pirsî.

— Xwûşka min bedewe. Sêzde salî bû. Destgirtiya kurapê min, Kemal bû. Xwûşka Kemal jî li cem mine. Apê min zûve miriye. Malên me di hundirê hevdane. Mînanî malekê. Ji me wêde gundek heye. Yekî dewlemend heye li wî gundî. Dewlementiya wî serê wî bixwe. Hatin û qîzik ji me xwastin. Du jinên mêrik jî hene. Mêrê malê, mezinê malê, min dihesibînin. Bavê min, berî sê salan emrê xwe qedand, bû qurbana te. Me got ku ew destgirtiya Kemale. Me hela hê nîşanî nekiriye, lê pirs û qerar daye. Ew dibêjin ku pirs û qerar çiye? Nîşan tune, nîkah tune. Kemal ku ji eskeriyê hat, wê yeke dinê bibîne, gotin. Rojekê min dît ku xwûşka min, li cem diya min digirî, "dayê ev mêrika qet ji xwedê natirse. Ez dewsa keç û neviya wîme. Min dixwaze. Ez çime? Zarokekim. Ez çawa ji wîre dikarim jintiyê bikim? Dayê ez qurbana teme, min nedine wî." Bavê min ji xwûşka min pir hez dikir. Min ku dît ewa digirî, bavê min hate ber çavên min.

— Xwûşka min, çima em mirine, tu digirî? Xelqê ji mere çi bêje? Çi ferqa destgirtî û jina markirî heye? Ezê te bidim kurê apê me. Ne yekî din.

Ew li wir nesekinî, reviya çû derve. Çavên min kelo girîbûn. Me careke din jî mêrik vegerand û qebûl nekir. Paşê rojekê, du mêvan hatin. Gotin ku em dereng mane, bi edeb û tore bûne mêvan. Me got ku mêvan, mêvanê xwedêne. Ser serê me hatine. Şev, diya min, jina min û ez girêdan. Xwûşka min revandin, birin. Ax cewrê xinzîran. Paşê çawa bû, ez filîtîm. Min tiving ji bin istêr derxist û pey ketim. Min nizanibû ku bi kîjan alîde çûne. Min aqil nekir ku ji gund hinekan pê bihesînim. Mala me qederekê ji gund dûre. Min berê xwe da gundê wî mêrikî ku xwûşka min dixwast. Min xwe neda rê, bi cîkî kin û kurtre, çiyêre çûm. Hîv hebû. Li ser riya gund min ew ferq kirin. Riya çiyê ez westandibûm. Mînanî dîna bûm. Kuçikên kurê kûçikan. Mêvan were, bixwe, razê. Paşê rabe, bê namûsiyê bike. Ji ber girekî zivirîm, hatim pêşiya wan. Xwûşka min di erdêre kaş dikirin. Qîzika feqîr, te bidîta

mînanî kaxizekê, di dest wande diricifiya. Ji bo ku li wê nexim, min gulle neavête wan.

– Bisekinin, lolyo. Bê namûsno.

Sekinîn. Bi sekinandinêre dest bi reşandina gullan kirin. Xwûşka mine belengaz mînanî dînan, bi şûnve direviya. Wan jî gulle diavêtin min. Ez li cîkî baş û fêza wan bûm. Ew li pêş min eşkere û veneşartî-bûn. Min ew rind didîtin û li ser hev du cara agir kir. Yekî "wax dayê ez mirim" got, qîriya. Her tişt li ber çavên min reş û tarî bûbûn. Min dixwast, wan bikujim. Yê ku ne birîndar bû, xwast nêzî hevalê xwe bibe. Min yek jî berda wî. Ew jî birîndar bûbû.

Min gazî xwûşka xwe kir, da sekinandinê. Soro, te bidîta. Meriv awqasî ditirse. Awqasî perîşan dibe. Lingên wê di nav xwînêde bûn. Por li hev walyayî, serqot bû. Lêçega xwe winda kiribû. Xwe avête hemêza min û giriya. Li nêzîkî wir gundek heye. Dengên gullan bihîstine. Berve wan çûm. Ciyê birîndaran min ji wanre got, em hatine gundê xwe. Roja dinê çûm, min xwe da dest. Ew jî rakiribûne nexweşxanê. Yek ji sîngê xwe birîndar bû. Çend rojan berê ji nexwaşxanê derketiye û doxtoran rapor danê. Yê dinê, çîpa wî û lingê wî şikestiye. Di alçiyêdeye niha. Çar meh bû ku ez li virame.

– Dê û xwûşka min, her hefte tênê dîtina min. Ji te çêtir nîn bin, cîranên meyên baş hene. Hemû di karê wande alîkariyê dikin. Kêmasiya min nîşanî wan nadin. Kurê apê min wê mehekê şûnde teskere bistîne, eskeriyê biqedîne. Wê çaxê tu saxbî, ezê bê minet cezayên xwe bikişînim.

Giştan mêrxasiya Bekir qebûl dikirin. Ji bo namûsa xwûşka xwe, du kes birîndar kiribû. Hinekên din ji Sorore qal kiribûn. Şevekê dîsa di nav pirsên xwede got:

– Birayê Soro, hevalên we yên di qowîşa dinêdene, xwayî zimanên xwe nînin.

– Belê, hinekî zêde xeber didin, bêteşene. Ez çi bikim Bekir?

– Binhêr, ez ji tere bêjim. Bawerî gelekî nayên kirinê di girtîgehande. Ku di hundirde dûr û dirêj dimînin, aliyê meriyayî xirabiyê giran dikişîne. Meriv dibe yekî pîs û qellaş. Di hepsande yên ku awha dibin pirin. Hela di hefta nû hatî xirabiyên wan xwe nîşan dide. Îftira, gilîkirin, xeywkirin, çi bêjî dikin. Çi tê bîra te, giştî jî. Her roj xeberên nû dibin û digîhînine sergardiyanê girtîgehê. Xwedê kiriye, ew sergardiyan merivekî başe. Guh nadê. Bi îftiran îna nake. Yekî dinêdiye. Merivên awha baş nasdike.

Soro fem kir ku Bekir xeterekê dixwaze jêre bêje.

— Tiştekî ku tu zanî heye? Çiye? Çima, çibû?

— Belê bira. Di qowîşa dinêde, hevalekî weyî qemer û reş heye. Pir xeber dide.

— Erê, erê. Belê. Çi kiriye?

— Virde wêde xeber dide. Na motor jî, benzîn jî min şewitand. Min çû bi serê xwe agir berdayê. Li pey min gulle havêtin, lê qet nêzîkî min jî nebûn gullên wan.

Soro şaş, metel ma. Yên dinê jî, li cem vî derewnekî bêdeng disekinin û guhdarî dikin? Çawa dibe? Lê Seît? Çawa bê aqilî kiribû, jêre tiştek negotibû? — Lê. Wisa, erê... Way derewkarê rezîl. Binhêr, tê bibînî, ev pirsa wê bizivire paşê here ber guhê sawcî. Tê wê çaxê bibînî. Wê bi xwe têkeve belayê, bi saya zimanê xwe. Meriv dişewitîne. Dişewitîne, lê li zimanê xwe jî dibe xwayî.

Paşê Soro ji Seît pirsîbû. Hîn bû. Wextên ku Seît ne li wirbe, qal dikir. Du roja berê Seît jê şibhe kiriye. Ewî Seît nîşanî kesên ku pêre xeber dida kiriye, "evên tirsonek dexesiyan min dikin" gotiye. Li cem Seît qisên awha nekiribû.

Mîro wê pêre xeber bida. Bi zimanekî ku ew jê fem dike, ew hişyar bikira, pê bihesanda. Yên ku bûyî bûbûn êdî. Xwedê kir ku ew tiştên qal kiribûn qet yek jî wî nekiribû û têde jî tunebû. Serda qet haya wî jî nîn bû. Li gund, ji Ûsiv axare dabû çêra, wî jî bihîstibû û kiribû tevî yên dinê. Car cara bi mêvanî diçûne qowîşa piçûk. Oda wan bêtir raxistî û baş bû. Bîhna wê jî wisa ne giran bû. Giştan zanibû ku li wêderê qumar tê lîstinê, esrar tê kişandinê. Lê hemûyan jî, xwe dida nezaniyê. Sergardiyanê dilnerm jî zanibû. Hemûyan perên xwe distand û tu tişt nedidîtin. "Hukumat nikare wan bîne rê, ezê çi bikim" digot û pir li ser vî karî nedisekinî. Ew nivîsdarê ser mezin jî, ji nav esrarkêşan kêm nedibû. Biniya çavên wan werimî, nihêrandinên wan bi mij û dûman bûn. Caran bi merivanre xeber didan, lê te digot ku di dinêka dinêde dijiyan. Bi şev gelek radizan û bi roj jî hetanî nîvro pal didan. Soro ew jî nas kirin.

Sê çar rojan şûnde, gazî Soro kirin. Ew û sergardiyan tenê bûn. Ew oda ku roja pêşîn hatibûnê, li ser lingan bûn.

— Ehmed efendî, di maliyêde memûre. Cîranê mine. Xortekî başe. We silav dike. Kêmasiyên we dipirse. Ji nivîsdarên mehkemê bihîstiye, dibe ku van rojan, we berdin, digot. Ji yên dinêre nebêje. Bira serê wî nekeve belayê.

— Tu saxbî. Qet kêmasiyên me tunin. Xwedê ji te jî, ji wî jî razîbe.

Dema ku Soro wê ji cem sergardiyan derketa der, wî serê xwe dirêj kir û li dora xwe nihêrî. Kesek li wan deran nedît. Bi dengekî nizm got:

— Birazî. Guhên hevalên xwe bikişîne. Bira li zimanên xwe bibine xwayî.

Wê hêjî bigota. Dengê lingên hinekan bihîst, ji hewşê. Gotinên xwe birî. Soro derkete der.

Belê eva êdî rast bû. Gundiyê wî awqas vir û derew kiribûn ku gişt hatibûne bihîstinê. Ji halê sergardiyan dihatê xuyanê.

Bîst roj derbas bû di girtîgehêde, di nava çar dîwarande bûn. Kes çavtirsiyayî anjî aciz nebûbûn. Di alîkîde jî baş bû ku ev der nas kirin. Ji hepis û girtinê êdî neditirsiyan. "Tirs hetanî ber çeme." "Ku te pişta tirsê şikand êdî netirse..." Heke ku girtîgeh evbe, heyfa wan meriyan ku di hundirde dihelin û ji hepsê hundirqetî dibin. Ma çi bûye? Dibe ku di girtîgehêde mabûna wan gelekî dirêj bikişande.Sibêkê, li qowîşa din ya mezin, gazî du merivan kirin. Roja mehkema wan nîn bû. Şevekê dikanek şêlandibûn. Nobedarê sûkê ew girtibûn. Ku çav bi debancê ketibûn, mînanî kûçikan lava kiribûn. Lê nobedar ew bernedabûn.

Piştî nîvro tendûrekî, dest bi kelepçe di nava cendirmande birin cem sawcî. Nû, ji sêrîde her tişt dipirsiyan. Yek û yek diketin hundir. Di dawiyêde ew xortê ku bi viran pesnê xwe dabû, gazî hundir kirin. Ji hemûyan zêdetir di hundirde ma. Wexta ku derket, rûyê wî di xwiyêde sor bûbû. Ziman ziha, li ber xwe dinhêrî. Çû cem hevalên xwe.

— Ez dê û jina wan... Dizên bênamûs. Qelaşên kurê qelaşan.

Soro û Mîro her tişt fem kirin. Sawcî ew şûnve şandin girtîgehê.

Rojtira dinê sawcî heft hew ji wan berda. Xortê fortek tenê girtî ma. Qanûn wê demê awha bû. Merivan nikaribû li hember van qeraran şîkat bike. Tendûrekî bîstûçar roj di girtîgehêde mabûn. Di van rojande, gelek ji gundiyên wan dihatin dîtina wan. Di gund, çi dibû ji wanre digotin. Evdo çar cara hatibû dîtinê, halê wan pirsîbû. Her cara jî Soro û Mîro qedir, qîmetê wî girtibûn. Bi kêf û ken wîre xeber dabûn.

Hatine berdanê. Hevalekî xwe di hundirde dihiştin û dilşikestî dane ser rê. Li ser riya xwe serîk dane xanê. Bihîstin ku di gundê wande, xwayê traktorê hatiye kuştinê. Kê kuştibû, nedihate zanîn. Her yekî tiştek digot. Xeber saetek û du saetan berê hatibû bajêr. Mîro û Soro bi kijan alîde dinhêrîn, dîsa jî nikaribûn ji nav derkevin. Gelo kê kuştibû?

## – XXII –

Car caran di hinek gundên dost, caran di şikeftên çiyande dijîn cerdên van deran. Çiya hînî wan bûn, ew hînî çiyan. Dostên wanê herî nêzîk ev çiyane. Caran jimarên wan zêde dibû, caran jî kêm. Ji bo çi ku derketine serê çiyan, heke wan tiştan têxine rê, ew jî ji çiyan tênê jêr. Çend mehan di hepsêde radizan û derdiketin. Di pey wan, ew rojên tengasiyên û navên ku pey ketî, diman. Ev çilo dinê ye ku eşqiyayên li serê çiyan jî, eger xwe nesipêrîne axakî, nikarin bisitirin û bijîn. Jiyana wan her tim di xeterêde, pêçiyên wan li ser tivingê... Dîsa jî bê axa nedibûn. Ew eşqiyayên dostê axayên bi nav, hevdu nas dikirin. Kî merivê, dostê kîjan axayiye... Lewra tu caran zirara wan nedigihîşte axakî. Hetanî ku ji destên wan tê, tevî karên feqîran nedibûn. Ji ber cendirman û qanûnê direviyan. Gundiyan jî alîkariya merivên weha dikirin, eger ku ji destên wan bihata.

Car caran cendirman diavête ser gundan, ew diêşandin û dikutan. Ji bo ku wan eşqiya xwayî dikirin û alîkarî didanê. Gundiyan tiştek nedigot. Zanibûn ku heke xirabiyek bê serê eşqiyan, bizanibin ku wan alîkariya cendirman kiriye, vê carê qaçax û eşqiya wê zor bidana ser gundiyan. Wê çaxê cendirman jî nikaribûn gundiyan ji destên eşqiyan xilas bikin. Mal, genim û gîhayên wan wê bihata şewitandinê. Ewên ku ji ber qanûnê direvin wilone. Heke ku tu bela xwe di wan nedî, ew başin. Te ku ew dane dest, bela hanî serê wan, êdî ji tere xilasbûn tune. Ji derdên wan, êdî tu nikarî serê xwe bilind bikî. Şev û roj wê li tara hustiyê te suwar bibin. Wê bîhna te biçikînin, mînanî maran di erdêre bikişînin. Gundiyan ew rind zanibûn û nas dikirin. Lewra, ji xira- biyên wan dûr disekinîn. Cerdan jî, ji bo ku zirara wan negihêje gundiyan, bi dizîkave dihatin gundan û kêmasiyên xwe dihanîne cî û diçûn.

Îbrahîm û hevalên wî wisa bi nav û deng nîn bûn. Ji bo tirsa canê xwe dest pê kiribûn. Ne mînanî yên dinê bûn. Her diçûn bêdeng û tevî tiştekî xelqê nedibûn. Car caran poşman dibûn. Hevalên Îbo, qedrê wî rind digirtin. Bi gura wî dikirin. Gotinên wî dianîne cî. Xirabiyên wan tune bûn.

Pişta xwe dabûne kevirên mezin, ber tavê, sipiyên kincên xwe dikûştin. Mehan bi kincanve razê, bi ava germ xwe neşo. Yê çi bibe? Qirçimên bin paşilên wan, nav pizyên doxînên wan, hêlînê sipiyan bûn. Him pakiş dikirin, him jî hevre ketibûne henekan. Nîv tezîbûn, tavê

canê wan germ dikir û di dilê wande xwestinên dinê dilipitin. Hemûyan li gundê xwe dilketiyên wan hebûn. Hinêk bi şevan, ji bo ku dilketiyên xwere çend pirsan bikin, çiqas xeter dabûn ber çevên xwe. Ji bajêr sawûnên bi bîhn, qutiyên krem, destmal dikiriyan û didan dilketiyên xwe. Wisa dilşa dibûn. Te digot ku dinê hemû yê wane. Naha li vêderê, di nav wande yên zewicî jî hebûn. Çi zehmet kişandibûn, ku hetanî destgirtiyên xwe bibînin? Niha gişt dûr bûn. Him jî pir dûr. Di dilê wande xwestin tenê hebû. Her tişt ji wan dûr bûn. Xwestineke ku tama tûj dida devê merivan. Xazila niha li gundê xwe, li cem xwastiyên xwe bûna. Li cem zarên, jinên xwe... Çiqasî jî bîra wan kiribûn. Hinek caran qala serpêhatiyên xwe dikirin. Yên dilan û vekirîbûn. Digotin, dikeniyan. Tiştên qet nebihîstî, çirokên wisa digotin, meriv ji kena dimir. Hezkirina wan, dilketîbûna wan mîna gulên serê çiyan vekirîbûn. Xwe bi xwe bilind dibûn. Paşê qet bîhnnekirî diçilmisîn, hişk dibûn. Dilketina wan bêdeng, di hûndirê wande mînanî rîsê bi gilok mezin dibe, mînanî pêlên behrê quloz dibin, canê wan diqijirînin û paşê winde dibin. Wê winde bibiya, filitandin tûne bû. Evîna eşqiyan di nava bêbextiyê û hêwî anjî bê ûmûdiyêde tê û diçe. Dawiya eşqiyan nayê zanînê. Lewra xwestina wan, evîna wan jî mînanî kozê êgir di bin xweliyêde dimîne. Salên dirêj hêdî hêdî wê dihelînin. Car caran yek ji wan nîv bi henek, nîv bi rastî:

— Lawo, xwedê em ji jin û karê dilan bêpar hîştine. Ji bo ku cezê bide me, wisa kiriye. Heke ku piçek barûta we heye, bihêle wan rojên fireh.

Li kêderê dibin bira bibin, lê eşqiyan nikarin tivdîran ji bîr bikin. Ev qanûna wane. Çiqasî westiyayîbin, di halekî xirabdebin jî, gere nobedariyê bikin. Ji nişkêve di xewêde bêne girtin, ji bo eşqiyan ji mirinê jî girantire. Şev nîvî şevê bûbû. Ber ronahiya hîvê, Îbo nobedar bû. Hevalên wî di xewêdane. Tvingên wan hemêzêde, bi kincanve razayîbûn. Ewî jî nobed digirt. Xew nedikete çavan. Gund, mal û rojên tênê hatine bîra wî. Evê awha çawa bibe? Emê heta kîngê li serê van çiyan, di halê kûçikande bijîn. Hela kanê di bin kîjan kevirî, bi gulla cendirmekî anjî bi ya yekî dinê, emê bênê kuştinê. Kes miriye me jî hilnade. Emê bibine xurê teyr û mişkan. Genî bibin, kurmê têkevin laşê me. Ji nişkêve tirsek kete dilê wî. Hatibû kuştinê, tivinga wî li cem ketibû alîkî. Xwîn ji devê wî hatibû. Zikê wî werimîbû. Ev hatin ber çavan. Kurm tijî çavan bûbûn, guh û pozê wî dixwarin. Teyr li ezmanan, dora wî difiriyan û dizivirîn. Xwast ku van ji hişê xwe derxe, bavêje. Cixarek vêxist. Şeveka hênik û xweş. Hemû bûyerên Tendûrekê, bihîsti-

bû. Mîro, Soro hate bîra wî. Ew şeva ku çûbû mala wan. Dostî û hevalîke baş ji wan dîtibû. Jina wî nanên malê gişt anîbû, dabû Îbo. Penêr û fîşek hatine bîrê. Çiqas baş bûn ew. Ji nişkêve tiştek kete dilê wî. "Serê wan feqîran bi axêre, wê têkeve belayê. Wê rojekê li axê xin. Paşê heta dawiya emrê xwe, rûyê rehetiyê nabînin. Mînanî me. Li serê çiyan. Ji me jî xirabtir. Me çi kiriye? Qet. Nasên me, merivên me hebin, em çima li van çiyan dimînin? Herderê bibe cehenem ji bo wan. Xwedê bike ku kes dînitîke weha neke."

Rabû ser piya, li der dorên xwe mêze kir. Ew teselî kir. Qet tiştek nîn bû. Meh û sal derbas bûbûn. Bûbûne merivên din êdî. Di xewêde, ji mêşên difiriyan jî dihesiyan. Xewa eşqiyan bi navdare. Qet tiştek tunebe jî, di bêdengiyêde jî, di xewa xwede xeterê fem dikin. Pir caran jî, texmînên wan rast derdikeve. Şaş nabin.

"Ewên ku awqas dostî û dilxwastî nîşanî min dan, niha girtîne." Hemûyan zanibû. Çûbû kêderê, rastî kê hatibû, gişta digot ku axa ew avêtine hepsê, erdê wan dajo. Ew benzîn û tiştên ku hatine şewitandinê jî qet kar nekiribûn. Hinek pere û malê wan çûbû. Ne zêde bû ew jî. Karê axa niha ji berê baştir diçû.

"Dest û piyên min girêdayî, mînanî kerguşkan bijîm. Feydê min jî negihêje tu kesî." Xaltiya wî hate bîrê. Hingî çûbûn, qet tu xeberek jê derneketibû. Carekê ji yekî bihîstibû ku baş bûn û li Qonyayê dijiyan. Ya rastî kesî jî rind nizanibû. Xaltiya wî, ji wî çiqas hez dikir. Çi dilekî germ û şîrîn lê bû. Tiştên xweş û rind dianî û dida wî. Ji bo wî, feqîrê, xwe pirtî pirtî dikir. Porê wêyî bi henne, çavên wêyên delal hatine ber çavên Îbo. Îbo qet awha diltenik nebûbû berê. Gelo bi xweşiya şevê, bi dûrketina ji dostên xwe, wilo bû? Ji çibû? Anjî xaltiya xwe pir hezdikir û ew jî çûbû xerîbiyê, ji wê bû? Anjî ji malê, ji birayên xwe dûr bû? Bi gur û teyranre awqas dem tev dijîn, ji wê bû? Her çi dibe bira bibe. Demên wî yên bi diltenîkî bûbûn berê, lê mînanî niha nebûbû tu cara. Çavên wî bi mij, pozê wî bi jan bû. Gewriya wî dihate şidandinê. Qefesa wî teng û piçûk dibû. Rabû. Çend gav pêşde çû. Mîz kir û zivirî. Çiqasî xîret kir ku hevalê xwe hişyar neke, dîsa jî ew hişyar bû.

Nobedarî hişt. Cixarek da hevalê xwe û li dewsa wî xwe dirêj kir. Rojtira dinê wê tiving û çekên xwe paqiş bikirana û rûn bikirana. Paşê wê evder, qederekê terk bikirina, dûr biketana. Zanibûn ku li cîkî zêde mayîn xetere û bêyîmê tîne pêşiya merivan. Eşqiya gerek li hinek ciyan gelekî nesekinin, wan deran hez nekin, eva yek. Dostiya xwe bi eşkere nîşanî wan gundiyên feqîr û dost nedin, ev dudu. Yek jî, xew mirine. Heke ku tu van neynî cî, tu li ezmanabî, dîsa jî tu nikarî bijî.

Ew eşqiyayên ku çavên wan di namûsa xelqêdene, wan bihêle li alîkî. Ew zêde najîn. Mirina wan li pêş pozê wane.

Li cem hev rûniştibûn, çekên xwe paqiş dikirin. Hevalekî wan nobedar bû. Yên dinê li erdê rûniştibûn, him karên xwe û him jî henek dikirin. Gelek tişt didîtin ku li ser xeber bidin û laqirdiyan bikin. Te digot ku xezînên bêbinî bûn.

Di destê Îbode mawzera wî hebû. Ew gelek hez dikir. Wisa lê dinhêrî, mînanî meriv li keçeke heyjde salî mêze bike. Mînanî çavên xwe, mînanî canê xwe. Berê xwast ku mekanîzmê derxe. Hesinê bin kişand. Deng derket, got "çit". Mekanîzma ji cî derxist. Çep û rast lê nihêrî. Şewqê xwe ji serê xwe derxist, danî erdê. Mekanîzma da ser şewqê xwe ku toz, xulî û qirş pê negrin. Mêze kir ku mekanîzma û ciyê wê baş bûn. Çek her tim lênihêrandinê dixwaze, lê mekanîzma her bêtir gerek bê mêze kirin. Li cem xwe rûnê tivingan qet kêm nedikirin. Paşê namlî girt pêş tîrêjê, li hundir mêze kir. Bi qirêj bû. Danî cem xwe. Ji bêrîka xwe rîsek derxist, ji mûyên bizina çêkirîbû. Di sêrîde hesinekî piçûk hebû. Hine pîne û paçê paqiş pêve girêda. Ji alîkî berda û ji yalê namliyêyî dinêde derxist. Îbo rîs kişand, derxist. Pînê dawiyê qirêj, barûta hundir paqiş kir, bi xwere anî der. Careke din, ew tişt bi aliyê dinêve jî kir. Pîne guhart, rûnê zirav têda. Dîsa di namliyêde berda xwarê û aliyê dinve kişand. Namlî hatibû rûn kirinê. Vê carê bi pînenên paqiş ev paqişkirin ji sêrîde kir. Hevalê cem wî, tivinga xweya rûsî paqiş kiribû. Çavekî xwe girtibû, ji namliyê dinhêrî. Him jî xeber dida.

— Li cem me nêçîrvanek hebû, gelek dijwar bû. Qet vala nediavêt. Li wan deran navdar bû. Ser wîre nêçîrvanî heram bû. Li hemberî rojê, tîrêj bênê çavên wî, neynikên piçûk didane cîkî. Ewî nîşan hildida û neynik pirtî pirtî dikir. Ewî car caran digot; "Namliya tivingê hatibe xwarinê, ew tiving mînanî mêrê neçêye. Xêra wê çekê tune. Heke ku namlî gelekî bi rûnbe, ew jî mînanî jinê dilreqosin. Ew jî pênc pere nakin. Xirabiya ku neke tune." Ev gotinên wî, kîngê çekan paqiş dikim, tên bîra min.

Îbo li aliyê wî zivirîbû, guhdarî dikir.

— Ji bo xwedê rast gotiye. Herdu jî rastin. Paşê, ji bo ku rind paqiş bûye an nebûye, namlî da ber tîrêjê. Paqiş bû, hundirê wê mînanî neynikê dibiriqiya. Ji bo ku rind bawer bibe, ji bêrîka xwe kaxizeka cixarê derxist, çar qat kir. Tiving kire nava herdu çîpên xwe. Mekanîzma li jêrê, kaxiz hinekî bi alîkîde.xar, destê xwede girt. Tîrêj da hundir û jorve lê nihêrî. Di hundirê wêde toz tune bûn niha. Karê wî qediya bû.

Mekanîzma ku li ser şewqê wî bû, rûn kir, kire cî. Fîşeng yek û yek kire xeznê. Mekanîzma pêşde şand û fîşeng ji jorve tepisand û hesinê gulleavêtinê hilda aliyê vala.

Paşê nan û penêr dixwarin. Îbo xwast, ew tiştên ku di dilê wîdene, wan ji hevalên xwere veke.

– Oro, hevalno. Hûn van kirinên axayê Tendûrekêre çi dibêjin?Dev û gepên wan tijî nan û penêr bûn. Pariyên ziha nediçûne jêrê. Hevalê wan Sînan, bi daqûrtandina pariyan zehmet dikişand. Emrê wî ji yên din zêdetir bû. Di nav xwede, jêre "Apê Sîno" digotin. Salên wî pir zêde nîn bûn, lê belê zû ji can û beden ketibû.

– Çiye? Ew jî yek ji wanên ku tu zanî. Te nebihîst, deh kes di hundirdene. Nivê gund bela bû, çû. Yên mayîn jî perîşanin. Dinê bêbexte. Awhaye.

– Tê bîra te, wexta cendirman dabû ser me? Çilo bûbû? Me ji gundê wan xwarin û fîşek standibûn.

– Îbo, tu çi dibêjî? Wê şevê me qira nan û penêr anîbû.

Yên dinê bêdeng, him nanê xwe dixwarin û him jî guhdarî dikirin. Pariyên xwe bi avê şil dikirin.

– Bira ew kes awha qir bibin? Feydê me qet negihêje wan gelo? pirsî Îbo.

– Nizanim... Walle bira di vê dinya bêbextde, meriv nekeve di bintara rê... Kes bi destên merivan nagire. Yên mîna me, bê erd û bê cî, ji ber qanûnan direvin... Feydê me hela hê nagihêje me, emê ji bo wan çi bikin? Em zirarê didine dostên xwe, zirarê.

– Wisa nebêje apê Sîno. Zirara me gihîştiye kê?

– Nexeyde bavê min. Ez ji bo xwe jî dibêjim. Dilê xwe neke. Bextê me, yên ku ji ber qanûnê direvin awhaye. Yên ku bi mere dostin, cendirme û axa her tim zorbetiyê lê dikin. Wan diêşînin. Zirar gotina min ewe. Xênji vê çi zirara me bigihêje kesî, ez qurban? Heke ku cîkî em destê xwe bavêjin hebe, çend merivên meyî kar ji dest bên hebin, çi karên me li ser van çiyan û baniyan heye? Erê bêje, çi karê me heye? Kîjan ji me li hemberî hukumatê sekinîbû? Bêje, çend kes ji me çend meriv kuştin? Kîjan ji me li pêş hukumatê serî hilda? De bêje, me çi kiriye? Yê me hemûyan, tiştên piçûk û sivikin. Em tirsiyan. Em ji bêxwayîtiyê, bêkesiyê tirsiyan. Em tirsiyan ku gelek tişt wê bêne serê me. Em ji girtinê tirsiyan, ji lêxistinê û tedayiyê tirsiyan.

– Belê gitş jî rastin apo. Lê dîsa jî dilê min qebûl nake, yên ku hatine serê tendûrekiyan. Halê wan ne tu hale.

– Hela lê. Hela lê. Dilê kê naşewite?

Yek ji wan li jêr rûniştibû. Qemer, zirav û ji hemûyan ciwantir bû. Ku kesî tiştek jê nepirsiya, qet xeber nedida. Nan û penêrê mayî berev dikir, got:

— Ez jî mînanî birakê Îbo, ji bo wan dil şewitîme. Belengazan gelek zilm û zehmetiyê dikişînin. Car caran dilê min dibêje, herim axê wan bikujim. Bikujim ku gundî jê xilas bibin.

Apê Sîno keniya. Paşê ji dil axînek kûr kişand.

— Tu xortî lawê min. Qet axa bi kuştinê xilas dibin? Tu wisa zanî, ne? Ew diçe kurê wî tê şûnê, biraziyê wî tê, neviyê wî tê. Kurê wiyî mezin, ji nihave dora xwe dipê. Lawê minî mêrxas, te xweş got... Lê ew mînanî kêçanin. Bi yek, dudu kuştinê naqedin. Mînanî kêçanin, mînanî sipiyanin. Heke ku hêlînên wan derman nekî, nekelînî, qet kêç û sipî xilas dibin? Lê ew awhane. Hukumat bi wanre naçe sêrî, tu belengazekî li serê çiya, tê li wan çi bikî?

— Apê Sîno, merivên kîjan axayî di hukumatêde tunin? Tu çi dibêjî, got Îbo.

— Lê ez qurban, tu rind dibêjî. Tu bi xwe dibêjî. Ez jî wisa difikirim. Hukumat jî bi wanre seredariyê nake. Li her derê destên wan hene.

Ew xortê gava dinê, dîsa kete nava xeberdanê. Dihate xuyanê ku ji van xeberdanan hez dikir. Çima dijî axan bû? Ji destên axa çi kişandiye? Hevalên wî rind zanîbûn, lewra heq didane wî.

Ji deştê, ji gundekî dûr bû. Li gund hinek erdê wan hebû, ji bav û kalan mabû. Jiyana xwe pê dikirin. Ew çend mal bûn ku erdê wan kêmbe jî, yê wan bûn. Yên mayî, yê axê bû. Axa xwestibû ku erdê wan jî bikire. Lê kesî qebûl nekiribû. Ya rastî, paşê van çend malên xwayî erd, alîkarî û piştgiriya hev kiribûn, axa jî dev jê berdabû. Careka din jî qal nekiribû.

Ji bo dil tu ferman û qanûn heye? Dilê xortê me dikeve qîza axê. Ewrên xeter li hawîrdora wî digrin û her roj giran dibin. Bavê wî li pêş disekine, "kurê min her kes gerek çiyê xwe bizanibe, here ber derên yên mînanî xwe, ev kes axaye, dewletiye û em feqîrin. Were me li erdê nexe, paşê wê bi me bikenin", dibêje. Lawik van giştan guhdarî dike û heq dide bavê xwe. Lê çavê evînê kor bibe. Di alîkîde jî keçik xort tûj dike. "Ez dimrim dîsa jî naçime yekî dinê. Tiştekî naxwazim, qet tiştekî. Ne dewlemendî, ne tişt, ne jî kinc. Tu ji çi ditirsî? Tu çilo mêrî?" digot.

Xort, di gura dê û bavê xwede, bi edeb û tore bû. Vî şuxulî dikole, dawiyê bernade. Dilê dê û bavê damîş nade. Qîzikê dixwazin. Wisa pi-

çûk dikevin, wisa piçûk dikevin ku xwe bi tengasî digihînin malê. Bavê wî mîna zarokan digirî. Kurê xwere dide xeberan, diqehire. Lê dîsa jî hêrsa wî jê kêm nabe. Bi rojan nikare derkeve nav cîranan. Pirsên bavê qîzê dadiqultîne û li rûyê kurê xwe nanihêre. "Awqas sal bi rûmeta xwe bijî, paşê were piçûk bikeve û bêrûmet bibe."

Lawik gelekî dilbirîndare, ku bû sebebê van halan, ji bo berxweketina bavê xwe. Van qet deqîqekê jî bîrnake. Dixwaze keçikê birevîne. Qîz dixwaze û ew dixwaze. Lê, wê şevê, dê, bav, xwûşk û birayên wî di hundirê malêde bûn, axê agir berî mala wan da û şewitand. Kes nikare wî bide sekinandinê. Cîranên wan, wan ji mirinê xilas dikin. Dest û lingên diya wî dişewitin, hetanî bigêhêje hestiyan. Goşt û hestî jê dikevin. Mal bi tevayî dişewite. Heywan li derve girêdayîbûne, lewra ew difilitn, tiştek bi wan nabe.

Dûman û alaf ji gund quloz dibe. Xort û dilketiya wî hela hê ji gund rind dûr neketine. Merivên axê, bi çek li pey wan bûn. Qîzik xwe davê dest û piyê wî, lava dike.

– Ez qurban, tu bireve, here. Ew, qasî ordîkêne. Tu bi wan nikarî. Binhêre, mala we jî şewitandin. Tu wan nizanî, zorbene. Wê te bi saxî bişewitînin, biqelînin. Qurbana teme, lingên te maç dikim. Min bihêle, bireve.

– Qîzê, çima tu dînî? Ew çito mêrin ku qîzan direvînin paşê didine destên bêşerefan? Ez dimrim, dîsa jî te nadim wan.

– Neke, necirine. Tu bavê min nas nakî. Tu nizanî wê çi bike?

Di alîkîde zenda wê girtibû, direviyan. Siwar û peya ji gund derketibûn. Ew dûrve ferq kirin.

– Ji tere dibêjim ku here. Min bihêle, here. Nikarin tiştekî bi min bikin. Haya diya min heye. Min ji wêre gotibû. Tu dizanî gund ji diya min maye. Lewra, wê min bikute, li min xe û bide çêra. Paşê wê dawiyê berde. Ez ji tere dibêjim, bireve, here. Ez pirs didime te ku heta mirinê ezê li benda tebim.

Paşê xwe davê bin lingên dilxwestiyê xwe. Qîza axê dest û lingê wî maç dike. Xort damîş nade, dilketiya xwe dihêle û direve. Wî nikarin bi dest xin.

Wextek derbas dibe, dibihîse ku bavê wî bi zarokanve çûne gundekî dinê. Cem merivekî xwe. Diya wî hildane nexweşxanê û nîvcan maye. Lewra, ji hemûyan bêtir, dilê wî bi tendûrekiyan dişewitî.

Îbo xwestibû ku xort çay bikelîne. Dengê wî bi dostî, biratî bû. Çay vedixwarin ku Îbo:

– Binhêrin hevalno. Xwestineke min heye. Ez dawiya me ne rind dibînim. Ji bo me, yên li serê çiyan dijîn, çiye? An gulla cendirmekî anjî gulla eşqiyakî dinê. Awha hatiye nivîsandinê li eniya me. Her kesek ji me ji bo derdekî, ji ber zorbetîkê reviye, hatiye van deran. Jiyana me jî ne tu jiyane. Her roj tirs û tel. Qirêj û lewitandin. Westandin û kûvîtî. Xwedê xirab bike vê jiyanê. Feydê min negihîşte min jî. Halê tendûrekiyan jî ne jiyane. Meriyan dihelîne. Ez gotinên apê Sîno baş fem dikim. Gişt jî rastin. Dîsa jî çi dibe bira bibe. Ez dixwazim Ûsiv axa ji dinê rakim.

Bi can û dil guhdarî dikirin. Te digot ku hinek veciniqîn. Ji ber pêşneyareke weha hinekî şaş bûbûn. Baş anjî xirab dijîn û rê diçûn. Dibe ku xwedê derîk ji bo wan vekira.

Ewî gotina xwe nebirî û got:

– Belê, em hemû li serê xwene, serbestin. Heke ku hûn dixwazin em koma xwe bela bikin. Çawa dixwazin bira wisa bibe. Ez bi xwe, ezê herim. Biceribînim ku vî karî bînime cî. Xwedê an wê bide min anjî wê bide Ûsiv axa. Dilê min wilo dixwaze. Qet yek ji wan jî ne merivê minin. Dixwazim ku bi kêrî tiştekî bêm. Ew herdu kesên ku wê şevê me hevdû dît û alî me kirin, we jî bidîta, we yê heq bida min. Herdu jî di gìtîgehêdene niha. Jin û zarên wan birçî, gund hemû stuxarin niha.Apê Sîno qedeha xwe careka din jî dirêj kir ku tijî bikin. Paşê:

– Tu mêrekî xasî Îbrahîm. Xwedê zane ku ez yên mêrxas hez dikim. Wexta dibe, bira yên wisa bin. Lê belê, gerek meriv him bi aqilbe, him jî mêrxasbe. Min ji tere got. Bawer bike ku ez jî dixwazim. Lê Ûsiv axayê here, Ûsiv axakî dinê wê bê dewsê. Yê ku nû hatî, wê bêtir zorbebe. Bêtir zalimbe. Meriv pey yên çûyî digere, wexta ku yên nû hatin, bavê min. Tu mînanî nezanan xeber didî.

– Ez zanim apo. Lê dîsa jî, wisa dixwazim. Bira zirara min negihêje kesî ji we. Ezê vî karî bi xwe bikim. Em ji hevdû hez dikin û hurmetkarin. Heqê min tune ku kesekî bavêjime xeterê.

– Îbrahîmê xwarzî. Qet tu difikirî ku axa û beg bûne yek. Ewên ku dixwastin xwîna hevdu vexwin, ji hevdû xeyidî, canê hevdu distandin, gişt bûne yek. Tu Zubêd axa zanî. Niha dostê Ûsiv axayî herî başe. Mînanî biran. Na, na ji bira jî zêdetir. Vî Zubêd axayî bîr neke.

Çavên Îbo diçirisiyan. Zanibû ku pirsên bênê kêderê.

– Tê qala Eşo bikî, ne wisane? Cerda Eşo.

– Belê. Belê. Tu zanî. Li van deran, yê herî bi nav û deng Eşoye. Eşo di bin emrê Zubêd axadeye. Paşê emê çawa ji wî xilas bibin?

— Raste. Dibêjim ku herim, her tiştî ji Eşore bêjim, pêre xeber bidim. Ma ewî jî zilm nediye? Ji bo dîlan û dawetê nehatiye van deran! Ji ber xwe hatiye çima? Ji çî mere Tendûrek? Ne diya minin, ne jî bavê min. Dilê meriyan qebûl nake. Ezê jêre bêjim.

— Birayo. Min qet nizanibû ku tu awhayî. Gotinên te başin, rindin. Lê. Belê. Lê. Jiyana Eşo li van deran, di tengasiyêde ji bajêr xeber girtina wî, li hemberî wan tivdarek sitandina wî, gişt girêdayî çiye? Girêdayî dostaniya hinek kesane. Ew xwe dispêre Zubêd axa. Ji bin emrê wî dernakeve. Gotinên te, wê li vir bimînin. Zubêd axa jî hewcî wiye. Lewra kes nikare dest dirêjî mal, milkê wî bike. Ev kar awhane. Bide û bistîne. Dinê awha bûye. Dinêke qellaşe. Her tiştî meriv bi qelem, defteran dixe bavê min. De bêje, em Eşo nakine bela serê xwe?

— Belê raste. Wê bibe bela. Min ewa jî hanî bîra xwe. Min got ku dibe Eşo guh nede vî karî. Lê gotinên te, hê bêtir rastin apê Sînan. Waxta ku wiloye, ezê pey vêre serê xwe hildim herim. Dûrkevim. Ji van deran gelekî dûr. Aliyê rojhilat. Berve çiyayên herî bilind û tûj. Lingê kesî lê nakeve û teyr lê nafirin. Ne ezê kesî bibînim, ne jî kes min bibîne.

— Tu di qula derziyêdebî jî, wê bên û te bibînin. Tu heft qatî di binê erdêdebî jî.

— Na lo apo. Çima ewana bûne çi? Kî dikare ku bê çiyayên wisa? Kî damîş dide? Tu nenihêre merivên wan yên ku bi peran girtine. Nikarin ji paşilên jinên xwe derkevin. Ew, ji serê wan zêdetire. Yên ji ciyên xwenên germ, jinên xwenên nerm biqetin û herine mirinê... Na lo. Hişê min hilnade.

Sekinî. Ker bû. Hevalên wî li benda qerarekî bûn. Te digot ku ewê qerar nedin, hinekên dinê wê bidin. Heta niha qet tiştekî awha nebûbû. Lewra nizanibûn, wê çawa bibe. Îbo xeberdana xwe xwest bibire û got:

— Erê. Belê. Dawî çi dibe bira bibe. Niha qerarê min eve. Çi dibêjî apê Sîno?

— Qurban. Hela bifikirim. Ezê gavekê ji tere bêjim. Tu zanî ev ne mînanî lîstika zarokane.

— Lê tu?

Ew xortê ku çay dihanî:

— Ez bi tereme. Ciyê minî ku ez herim jî tune.

— Ez jî birayê Îbo.

Hevalê wanî dinê, serê wî di berde, bi bendê çarixa xweve dileyst. Bersiv bi vî teherî da:

— Heke ku hûn destûrê bidin, ezê herim teslîm bibim. Hûn zanin sucê min meriv birîndarkirine. Dibêjin, cezayê wî ne geleke. Piştre gelek wext derbas bû. Yalê dinê jî dev jê berdaye. Lewra, qasekê pêşde herim, teslîm bibim, ji minre baştire.

— Na lo, destûr çiye? Em, tu, bi destûrê hatine vira? Tu kîngê bixwazî, dibe. Ev çiyan awhane. Yek tê û yek diçe

— Lê tenê, xwastineka min heye. Roja piştî karê Ûsiv axa, karê Tendûrekê hate cî, ezê herim xwe bidim dest. Ne şerme. Hûn zanin kesên mîna me, gerek xwe ji mêşên difirin jî biparêzin. Şikkirin tiştekî başe.

Îbo fem dikir ku çima wisa dibêje. Gelekî dilşa bû ku bi yekî wilore hevaltî kiriye heta niha. Belê, gerek mînanî wan şerpeze nebûya, xwe bida dest. Dibe ku bi cezakî kêm xilas bibûya.

— Ez ji xwe dikevim şikê, lê ji bo te, qet nayê bîra min. Wan tiştan ji hişê xwe derxe. Gerek tu îro, him jî lezekî şûnve herî. Tivinga xwe bide cîkî bi îtbar. Dibe ku rojekê kêrî te bê. Paşê here teslîmbe. Em nizanin kîngê û çawa emê vî karî bînine cî. Tu ji riya xwe şûnve nemîne.

Ji berîka xwe pînekî qatkirî derxist. Ji nav, hinek pere derxist û da wî.

— Hilde vana. Kêrî hemû kesan dibin. Tu girtîgehê nizanî. Perên te ku tunebin, bizanibe ku bend di hustiyê tedeye... Wê demê tê poşman bibî ku çima te xwe da dest.

Paşê çi hate bîrê, hine pere dîsa dayê. Apê Sîno cixara xwe dipêça û kaxiz bi zimanê xwe şil dikir. Li wan nihêrî. Kelo girîbû. Diltenik bû. Mînanî bavekî ku dema lawên wî tiştên baş dikin, wisa dilxweş bû. Ev Îbo, ya rastî, xortekî bi dilê te bû, got bi xwe xwere. Dilên awha bi kêm kesanre hene. Yên ku bi vî tehrî bifikirin, kêmin niha.

— Birayê Îbo. Birayê Îbo.

Dengê wî lerzok û mînanî bavan bû. Nerm û deng dida heta dilê meriyan.

— Min bibaxşîne. Cara dibêjim bira, cara dibêjim birazî. Caran jî xwe şaş dikim, dibêjim lawê min. Ez ne ciwanim. Lê belê hela gelek rojên min hene bi jiyanê. Dilê min dibêje, ku meriv ku hevaltiyê dike, gerek bi yên baş, bi dil, camêranre bike. Dilê min qebûl nekir ku te tenê bihêlim. Hema kî der zirave, bira ji wêderê bişkê, lawê min. Ez jî heme ji vî karîre. Hela berê em vî biraziyê xwe bi rê bikin. Paşê emê bifikirin.

Çavên tijî hêsir, dilopek, dudu dihate xarê. Hevdu hemêz kirin û ji hev qetiyan.

— Oxira te xêrêbe. Riya te vekirîbe. Li xwe baş mêze bike bira.

— Careke din jî nekeve van riyan, birazî!

## –XXIII–

Di bintara çiyakî, nav darên piçûk û pirparêde sekinîbûn. Bîhna xwe distandin. Îbo ji yê cem xwere:

— Here nobedariyê, got.

Xort westiyabû û bêhemdî xwe bersiv da.

— Bira, kî tê van deran? Çi zirar heye?

— Ev çito pirse? Tu difikirî ku kes nayên van deran. Lê em çawa hatin? Yên dinê jî dikarin bên. Ew çima nayên? Heke ku merivên mîna me, bi serê xwe tenêbe, gerek qet ranezê. Ku dudubin, dor bi dor. Tu hew zanî hêsane ev jiyan?

Xort şaşiya xwe fem kir. Ker û bêdeng, ji wan wêde, berve kevirekî çû.

Wê di newaleke tengre derbas bibana. Ronahiya hîvê hebû. Sekinîn. Berê Sîno derbas bû. Bi destan îşmar kir. Yên dinê, bi dor, hemû çûn alê dinê. Qedereka mezin rê hildabûn nû. Di nava Tendûrekê û Kanîsipiyêde bûn. Di nava herdu gundande, di newaleke kûrde bûn. Di ew riya ku diçû çiyê, aliyê rastê, li pey hev berjêr diçûn. Lingên wan dişimitîn. Yên ku çarixên wan qul bûn, kevir, qûm diketine nav tilyên wan. Keviran lingên wan dibirî. Nêzîkî gund bûn. Hela hê hîv neçûbû ava. Dengê çend kûçikan dihat. Xwe telandin. Bi sebir di ciyê xwede man. Dengê kûçikan hatibû birînê. Îbo evder baş nas dikir, lewra li pêşiyê bû. Wê li hêviya avaçûyina hîvê bisekiniyan. Hema hema hîv li ser avaçûyinê bû. Çavên hemûyan li hîvê bûn. Hîv bi lez diçû, paşê nehate dîtmê êdî. Her der bû tarî. "Cixare kişandin, kibrît vêxiştin tune" gotibû Îbo. Riya nava gund hiştin. Bi erdêve, çalepîkan berve pişta baxçê Ûsiv axa bûn. Li wê derê careka din jî ji hevdûre gotin. Îbo û Sîno, wê xwe li erdê bikişandana û biçûna malê. Wê li oda ku axa lê radizê, binhêrin. Heke ku li wir bû, wê gulle berdanê û bikuştana. Na eger ku axa nedîtana, wê vegeriyan û bihiştina careka dinê. Wê demê, hevalên ciwan, çek di destde, wê hazir û li benda wan bibûna. Heke ku xeterek çêbû, hinekan gulle berdana hevalên wan, wê bihatana alîkariyê. Na, ku kar baş biçûya sêrî, ji bo ku hevalên wan şûnve birevin, wê di ser xaniyanre agir bireşandina. Îbo û Sîno ku xilas bûn, ew jî wê

biçûna û di berbanga sibêde, ciyê ku berê kifş kirine, li wê derê wê bigîhiştana hevdu.

Kêmbe jî, dîsa qederek tawetî û tirs bi xortanra hebû. Lê karê giran çima neketiye para wan, lewra ber xwe diketin. Dîsa jî fem dikirin ku di karê awhade, her tişt qasî hevdu giranbihaye. Her alî jî wekî heve. Wê alî Îbo û Sîno bikirana ku ew birevin. Di meraqêde bûn, şikêde bûn. Ji hemûyan zêdetir jî Îbo. "Lê ew bê namûs li mal nînbe?"

Zanibû ku ew di oda mezinde radizê. Heke ku mêvanê wî hebin, li cem wan paldide. Mêvan ku tune bin, bi jina xweve dîsa li wê odê radizên.

– Ax, min Ûsiv axa ji paşila jina wî derxista û bi gulekê walgeranda. Çi dibû bira bibûya. Ax çi xweş dibû, got di ber xwede.

Dengê kesî tu li hemberî Ûsiv axa dernediket di gundde, lewra axa gelekî dilkêf bû. Cîranên wan ku hatine girtinê, gundî mînanî keviran bêsewt bûn. "Wisa tê xuyanê ku wan bênamûsan gund xirab dikirin, tevî hev dikirin" digot axa. Lewra bi kêf bû. Qet kesî jî êdî mala wî nediparast. Kûçik hîn kiribûn, piçekî ji malê wêde li cem gom û tewlan disekinîn. Gelek caran diziya heywanan dibû, lema awha hîn kiribûn. "Yek tenê li ber malêbe, bese". Kûçikekî mezin, meriv perçe perçc dikir. Ew jî li cem yên dinê, li ber gomê bû. Wisa kifş dikir.

Qet tiştek li ber dêrî nedihate xuyanê. Îbo, Sîno bi nêzî hev, bêdeng xwe erdêve zeliqandî, çalepîka çûn û li ser sûrêre bazdan. Hatine ber dîwarê odê. Yek li pêş û yek li paş. Xwe bi dîwêrve zeliqandî, hêdîka heta ber pencera oda ku yalê xermana, baxçê dinhêre, hatin. Yekî, yê din diparast. Wê bi hevre gulle bireşandana hundirê odê. Çavên wan her tişt ji hevdû ferq dikir. Hînî tariyê bûbûn. Di tariyêde merivek pir hêsan dijbartin û didîtin. Îbo serê xwe hêdîka dirêj kir, lê nihêrî. Li serê odêyî jorîn, du cî li cem hev raxistîbûn. Xwe şûnve kişand. "Wisane ku mêvanê wî heye" got. Dîsa mêze kir. Tivingek di dîwêrde dardakirîbû, li ber serê ewê ku li ber dîwêr razabû. Gelo kîjan Ûsiv bû? Nedixwast destê xwe di xwîna kesî bide. Têkeve bin gunêh û xwwîna yekî dinê. Ne xwedê qebûl dikir û ne jî tu kesî. Nikaribû Ûsiv axa di tariyêde, di nava cîde nas bike. "Mêvan gerek yê ber dîwêrbe" fikirî. Xwest ku gullan berde yê dinê. Bi dengekî nizm ji Sînore jî got. Sîno serê xwe hêjand ku bêje "belê". Herdu bi hevre nêzî pencerê bûn. Nîşan hildan. Agir kirin. Yê di nava cîde rabû. Li ser teêlekê ket. Dîsa xwast ku rabe ser çokan. Gulleka nû ew velezande erdê. Yê dinê xwast ku xwe dirêjî tivinga bi dîwêrde dardakirî bike. Îbo agir kir berve milê wî û dîwêr. Wê lezê şûnve zivirîn. Karê wan du, sê deqîqan jî

ne kişandibû. Şûnve direviyan. Ji yalê baxçê, gulle di ser malêre deng didan û diçûn. Ji malê jî, paşê çend deng bi çekan agir kirin. Paşê herdû alî jî bêdeng bûn. Pey wan dengê kûçikan, caran nêzîk û caran jî ji dûrve dihat.

Gundî hemî hişyar û li ser piyan bûn. Der, dor nişkêve mînanî ceneme bûbû.

— Xwayê traktorê xistine. Ji Qeyseiyê hatiye ku serîkî bide traktora xwe. Lêxistine, kuştine. Destê Ûsiv axa jî birîndare. Kê lêxistiye? Qeyseriyo, bêgune û bêsûco.

— Were mêvantî, paşê qet bê serî û bê tune, here can bide. Hela lê. Hela te jî roja hatina xwe dît, evdalê xwedê? Teyê ji bo çi traktor bipirsiya? Çi bikira?

Ber mirina wî diketin, lê gelekî hêrsa wan ji Ûsiv axare dihat ku bû sebebê mirina wî.

— Xazila Ûsiv axa bimira. Wekî ew bimira, wê her baş bibiya.

Hetanî xeber şandine bajêr, wexteke dirêj derbas bû. Sawcî, doxtir, qumandarê cendirman, nivîsdarê wan bi du cendirmanve hatin gund. Mirî, li ser cî, bi çarşefekê hatibû niximandinê. Nivîn mînanî gola xwînê bû. Li derdorê, xwîna hişk û zihabûyî hebû. Doxtir çarşef bilind kir. Yekî, ne kin û ne jî dirêj, heweki tijî û qelew, ruyê wî gilover, hestiyên ceynokan piçekî pêşde derketibû. Ruyê wî spîçilokîbû. Doxtir her derên wî mêze dikir. Ji kincên wî bigre, heta muyên ruyê wî, gişt dan nivisandinê. Dewsa çar gullan hebû. Du hew li zikê wî, yek li çîpê, yek jî li aliyê çepê bin çiçikê wî ketibû û di pişt pîlên wîre derketibû. Bi çi teherî, çawa hatiye kuştinê, eşkere bû, lê dîsa jî otopsî çêkirin.

Li pêş malê cîkî bilind hazir kirin. Hine dar dane ser. Cinaze li ser dirêj kirin. Doxtir di destande lepikên lastik, bi kêrên mezin kete laşê mirî. Mirî perçe perçeyî kir. Qefesa wî vekir. Gulla ku di qefesêre çûbû, dilê wî qul kiribû. Zikê wî vekir. Bi sê çar ciyan ruviyên wî qul bûbûn. Bîhneka giran û ne xweş jê dihat. Çi bidîta, diziviri û dida nivisandinê. Paşê bi takî qalind, zik û qefesa Qeyseriyê mirî dirût û girt.

— Niha êdî hûn dikarin miriyê xwe hildin.

Doxtir du sê cara dest û zendên xwe şûştin. Destê Ûsiv axayê pêçandî vekir. Her pêçan vekirinêde Ûsiv axa, ruyê xwe dipirçiqand. Destê wî pir diêşiya. Destê wiyê rastê, pêçiyên çara û pêncan ji kokêde firya bûn. Ew jî dane nivisandinê. Xwîn hatibû birînê, lê birîn paqiş nîn bû. Ji nihade dest bi werimandinê kiribû. Bi ava nîv germ, birîn şûşt. Ji qutîkê hinek derman derxist, birîn rind paqiş kir. Toz pê

reşand û dîsa pêçand. Wê demê, mezin, piçûk gelek meriv kom bûbûn, van bûyînan mêze dikirin. Çavên xwe qet ji doxtir dûr nedixistin. "Gelo ev di hundirê mêrikde li çi digere?" digotin û meraq dikirin. Bi vê nihêrandinê, gunê wan pê dihat, bîzê wan diçû. "Ev ji yekî mirî çi dixwazin? Miriya jî rehet nahêlin. Perçe perçeyî dikin. Çima, ne gune- ye?.." Bi kêlên mezin, bi bend û tayên qalind zikê mirî dirûtibûn. Gundî şaş û metel mabûn.

Sawcî, gotinên mixtêr, nobedarê gund, kurê axa yê mezin û Ûsiv axa guhdarî kir. "Na saet çend bû? Te çawa bihîst? Paşê çibû? Deng, berê ji kîjan alî hat?" Tiştên awha dipirsiya. "Çend kes bûn? Bi kîjan alîve reviyan? Gelo kîbûn?"

Nivîsdar, pêçiyên wî mînanî makînê zû dişuxulîn. Çend rûpel tijî kir. Di dawiyêde qerar dan ku telgrafê bikişînîne Qeyseriyê. Gune bû, mirî nikaribû zêde bisekine. Wê bîhn biketayê. Ya baş, gorkirina mirî bû.

Yên hatî, şûnve zivirîn, çûn. Ûsiv axa qet negot ku "şika min diçe filan kesê". Sûc neavête hustiyê kesî. Ya rastî jî ev bû. Hinek ji gundiyan di girtîgehêde bûn. Ji bo yên dinê, çi bêje?

Melê gund, yên ku ji Kanîsipî, ji Zîlanê hatibûn, Zubêd axayê Qesrokê û yên dinê, laşê mirî şuştin û rakirin.

Sawcî zanibû ku tu gunehê wan bi vê bûyerêve tune, lê dîsa jî poşman dibû ku çima ew heft tendûrekî berdabû îro. Qasekê din jî bisekiniya, bêtir baş dibû, digot bi xwe xwe. Paşê, piştî çend deqîqan, "ya rastî ew bû ku min kir" digot dîsa.

Traktor piştî rojtira dinê wê dîsa kar bikira. Hetanî Ûsiv axa hat, kurê wî, yê hişyar û çavvekirî, li traktorê miqate bûya. Him jî bikaribaya hinek tiştan bibihîse û hîn bibe. Waxta çûyînê, bavê wî, ew kişande alîkî:

— Çi dikî bike, tiştna hîn bibe, got.

## –XXIV–

Soro, Mîro û hevalên wan tiştên xwe li hespekî hûrik û jarik kiribûn. Dema ku gihîştine gund, xelq ji goristanê vegeriyabûn. Di rêde rastî sawcî, doxtir bûbûn. Sawcî ew dabû sekinandinê. Teme kir ku kîngê ban kir, yên bihatana cem wî. Gundiyên wan xeber sitandibûn ku ew hatine berdanê. Ev bûyîna ne hişt ku gundî bi dilşayî herine pêş heval û cîranên xwe. Tu kesên wan nehatibûn bajêr, ku alî bikin û pê-

şberbin. Ya rastî jî ev bû. Bêtir rehet hatibûn gund. Çend quriş perên wan ji bo hespê çûbû. Ew jî ne zêde bû.

Qedereke ji gund der, gundî çûne pêş wan. Dilşabin an jî berxwe bikevin? Herdu jî, ji destên wan nedihatin. Berxwe diketin ku tiştekî ku wan nedixwast, bûbû. Li alîkî din jî, kî çi dibêje bira bêje, ji dûrvebe jî wê ji tendûrekiyan têketana şikê. Lê qet xebera yekî jî pê tune bû. Dilşa bûn. Gundiyên wan yên ku hemû cîran ji wan dilxweş bûn, nêzîkî mehekê, bêsûc, bêgune di hepsêde bûn. Niha ew jî hatibûn û di nav wande bûn.

Belê, piştî mehekêbe jî, niha bi hevre bûn. Destê mezinan maç kirin, şekir kamfêt dane zarokan. Her çûn, yên ku pêş wanve dihatin zêde bûn. Mirina xwayê traktorê ji bîr kiribûn. Bi merivên xweve herkes çûn malên xwe. Fatê destê kurê xwe girtibû, ew jî hatibû pêşiya yên ku ji hepsê derketibûn. Soro, Mîro û yên dinê bi qedir, qîmet hal, kêfê Fatê pirsîn. Şekir dan kurê wê. Ji alîkîde hemû bêkêf bûn. Ji bo ku ew xortê gundiyê wan di hepsêde mabû. Diya wî li çokê xwe dixist. Rûyê xwe pençerûk dikir û porê xwe dirûçikand. Bavê wî bêdeng û dilşikestîbû. Dengê diya wî quloz dibû. Digiriya û kinc mincê xwe diqelaşt. Paşê hê jî pêşde çû.

— Wayê, wayê. Ev çito gunde? Çito gundîne? Kurê min di hundirde hiştin û hatin. Şerm nekirin, fedî nekirin, hemû tişt avêtine hustiyê kurê min.

Çendekî disekinî û dîsa dest pê dikir.

— Way kurê minî bê aqil. Way kurê minî nezan. Binhêre, tu çawa di hundirde hiştin û hatin.

Soro bi vî halê wanî dilşikestî, nikaribû bêje ku vir û pesndayina kurê wan ev karan anîbû serê wî. Bi sond û qeseman caran kir ku ewê jî di rojên nêzîkde bê.

Çend roj derbas bûn. Dê, bavê wî û gundî, bi ya rastî hesiyan. Diya wî êdî gilî û gazin nedikir. Zû zû xwarin dişande girtîgahê.

Hemû bêsewt û bêdeng bûn. "Kê ev mêrika kuşt? Çima kuştin? An jî bi şaşî, dewsa Ûsiv axa hate kuştinê, feqîrê feqîr? Xwedê zane. Xênji wî kes nizane..." Ev pirs rojê sed caran dihataine gotinê û cara kirinê. Ew herd pêçiyên Ûsiv axa ku çûn, hela di roja pêşînde navê wî, "Ûsivê koppo" mabû.

## – XXV –

Piştî çend rojan, merivekî mînanî memûran, xwendiyan hate gund. Kamyoneka piçûk pêre bû. Yekî din jî bi wanre bû. Di dawiya kamyonetêde, du tabût jî bi xwere hanîbûn. Ûsiv axa li mal bû. Rojekê berê hatibû. Kurê xwayê traktorê ji Qeyseriyê hatibû ku laşê bavê xwe bibe welatê xwe.

— Me bavê te wek dostekî, wek birakî hilda, gor kir. Qedera wî awha bûye. Were, wî rehet bihêle, ji vir nebe, got Ûsiv axa.

— Na xêr, ez bavê xwe li vir nahêlim.

— Ez te fem dikim. Tu berxwe dikevî. Tu rastî. Xwedê axa wî zêde bike. Ferq nake. Hemû jî erdên xwedêne. Ha evder, ha ewder.

Mêvan bi pirçî bû. Dihate xuyanê ku xênji mirina bavê xwe, tiştek nedifikirî. Bavê wî bêsûc hatibû kuştinê. Lewra gelekî diqehirî.

— Çi gunê wî hebû? Serde, li nav merivên ku ew kuştin, bihêlim.

— Mirin li pêşiya me hemûyane. Li eniya wî awha hatiye nivisandinê. Kî dikare nivisandina xwedê biguhêre?

— Çima bi qedera xwe nemir? Kê ew tevî van karên xeter kir? Tu ninî? Paşê, belê paşê, ma ew ne mêvanê te bû? Tu zanî gund hemû dijminê teye. Te çima ew hişyar nekir, şûnve neşand?

— Ev çiye? Ev çiye? Îca, di mirina bavê tede, gunê min çiye?

— Lê gunê kêye? Sûcê kêye?

Melê gund hate cem wan, bi nermik nermik dest pê kir. Ji misilmantiyê qal kir. Qala çend pêxemberan kir ku li ser çiyan, di riyande miribûn. Li wan deran hatibûne gor kirinê. Xêra van peyivan qet nebû.

Gundî tiştek tênedigihîştin. Çawa meriv goran vedike û miriyan dibe cîkî dinê. Heta niha qet nedîtibûn. Qet kesî jî qal nekiribû.

— Hezkirin, hurmeta bavan çima awha dibe? Di bin erdêde jî rehetiyê nadine mêrik. Bi erdê me qaîl nabin ku miriyê xwe lê nahêlin.

Gundî dilşikestîbûn. Ji mirîre hurmet kiribûn, bi qedir, qîmet gor kiribûn. Kurê wî dixwast, bavê xwe di nav wande nehêle. Eva ji gundiyanre giran dihat. Gelek ji wan neçûne cem. Mele û sê çar kes li wir bûn. Kefinekî nû li mirî pêçandin, paşê kirine tabût.

Traktor jî bi xwere dibir. Şofêrre xeber da û teme dayê ku wê biçûna. Xirabî û başiya vê derê gişt jî, bira ji Ûsiv axarebe. Heta niha kar kiribû traktor, ewa hesab kir. Ji Ûsiv axa xwast. Ûsiv axa bêdeng, mî-

nanî yekî ku sûcekî mezin kiriye bû. Nedixwast û nikaribû tiştekî bêje. Destê wî yê rastê pêçandî, bi vî halî wekî tiştekî mezin bûbû. Ji bo ku neêşe, di hustiyê xweve darda kiribû. Li hember nesekinî, perên ku ew dixwaze, derxist dayê.

Kamyonet û traktor li pey hev ji gund derketin. Ruyên wan bi pirçî, nedixwastin li kesî binhêrin. Ew li cem şofêr, cixara wî di dêstde, zivirî li cinazê bavê xweyî di dawiya kamyonetêde nihêrî. Hêrsa wî ji Ûsiv axare dihat.

— Bê namûsê bênamûs. Ewî jî hat em dîtin. Bavê min dît, digot. Paşê xwe nedigirt, dîsa digot:

— Ji bo qedrê xwedê, qet di ruyê wîde xêr heye? Hela lê binhêre. Gulle tên pêçiyên wî dikevin. Min devê te gullê no. Cîkî dinê nizanî çima?

Jan û êşa destê wî zêde bûbû, du hew derxist, bi avêve daqultand Ûsiv. Perîşan bû. Qet hêvî nedikir. Nişkêve derd û belan pê girtibûn. Xelqê çi bêje? Mirina mêvanê wî qet ne baş bû. "Pêçiyên min çûn. Min pê tiştek nedikir, lê dîsa jî, ji vir ha destê min nîvciye. Mêrik eşedbilla ji Qeyseriyêye. Kafir. Li hustiyê min siwar bû, awqas pere jî ji min sitand. Ev çibû, hate serê min? Ez ji ku tevî van karan bûm. Ax, çi xweş dibû, wekî mîna berê bima. Te digot derzî di minre diçûn. Min çû bela xwe di gundiyan da. De bikişîne niha. Hela bisekina, tê hê bêtir bikişînî ji destên vanan..." digot bi xwe xwere.

Gotinek digeriya di navberê û der dorande. "Îbahîmê eşqiya. Cerda Îbo, ev kara kiriye", digotin. Ûsiv axa ne Îbo nas dikir, ne jî ew dîtibû. Xaltiya wî ji vî gundî bû. Di piçûkiya xwede carekê, duda hatibû gund. Paşê gotin ku ew jî bûye cerd. Dayin û standina wî pêre tune bû. Ne bi xirabiya wî, ne jî bi qenciya wî, karê wî pêre nîn bû. "Çima Îbo dîn bûye? Har bûye?" Şaş û metel ma têde.

Her diçû ev gotin bêtir dihate xeberdanê. Ji tchrekî dikete tehrekî dinê û paşê dihate ber guhê Ûsiv axa. Gişta jî digot ku "xwayê traktorê di dewsa Ûsiv axade hatiye kuştinê." Ûsiv axa jî ev yeka zanibû. Bêşik zanibû ku wisaye. Lê nikaribû awha bêje. Mêrik ji bo xatirê wî, di gorêde bû niha.

Sawcî, cendirman jî ev bihîstibûn. Ew jî li pey Îbo bûn. Çiya û banî nehiştin. Îbo qet li cîkî nîn bû. Gelo kete binê erdê? Çibû? Firiya gelo? Cendirme lê digeriyan û gotinên nû derdiketin her roj. "Îbo lêxistiye, ji nav heyşt cendirman filitiye û reviye. Xwe ji riya min vikişînin, karê min ne bi were ye, bi Ûsiv axareye, gotiye Îbo..." Ûsiv axa ku ev

dibihîst, rojê çend caran dimir û dîsa dihate ser xwe. Her şev li cîkî dinê radiza. Mînanî kergûşkan.

– Li vî gundî dîtine.

Roja dinê:

– Li vî çiyayî, şewqê xwe daye alîkî û kilam gotiye. Çend kesan bi çavên xwe dîtine.

Cendirman rehetî nedidane ew gundên wan der doran. Kevir û kuçik geriyan. Îbo qet li cîkî nehate xuyanê. Zubêd axa ji Eşo bihîst ku Îbo ev der terk kiriye, çûye. Ev xebera gîhande Ûsiv axayê dostê xwe. Nedihate van aliyan êdî. Li gelekî dûr bû niha. Çûbû cînên wisa ku lingên tu kesan nedigîhiştê. Ji tirsa Eşo. Ûsiv axa piçekî bîhna xwe sitand. Ev tiştên ku bihîst, ji kesîre negot. Bira cendirme hema usa lê bigerin. "Lê wekî Eşo jî xapandibin? Lê Eşo ku derew bike? Qet îtbara merivên awha heye? Îro dostin, lê sibê dijminin yên weha."

– Lo Îbo, Îboyê cerda serê çiya. Bêdîn û bê îmano. Min di dinêde rûçikê te nedîtiye. Xirabîke min negihîştiye te. Tu were mirina min bigere. Lo lawo, qet xwedê qebûl dike? Xwedê vê li cem te dihêle çima? Kê dîtiye ku neheqî li erdê dimîne?

Li gund, hemû kes di kar û barê xwede bûn. Rojên ku dihatin, derd û kul bi xwere dihanîn. Wilo difikiriyan. Tiştek nehatibû guhartinê, xênji belengazî û bêtamiya ruyên wan. Zeviyên berê, hinek ji wan Ûsiv axa ajotibû, yên dinê jî vala û neajotî diman. Gîhayên bi kelem û merjorikanve tijî bûbûn. Zeviyên nû têra kesî nedikirin. Bi zehmet, tenê têra xwarina rojê dikir. Ew jî nîv têr û nîv birçî. Zevî kêm bûn. Meriv gelekî didane westandinê. Ji zeviyan hetanî xermana kişandin jî zehmetekî giran bû. Axa jî wisa. Kar bi dilê wî nediçû. Ji belayekê xilas dibû, lê belake din dihate pêşiyê. Nav du sala, traktor, benzîn, mazot hatibû şewitandinê. Xwayê traktorê hatibû kuştinê. Hela ka kîngê dora wî dihat? Ew zeviyên ku payizê ajotibûn, wê biçanda. Heke ku traktora wî bi xwe tunebe, nedibû. Gerek rêyekê bibîne, traktorekê bikire.

Ew xortê ku di girtîgehêde, hate perçiqandinê. Gelek tengasî kişand. Hemû kesan, kevir û kuçikan jî digot ku ew bûyerên Tendûrekê Îbo kiriye. Sawcî, hakim, qumandarê cendirman jî bihîst.

Kesî riya Îbo ser rast nekir. Hemû xeber jî bi hevdu nedigirtin. Ne mînanî hev bûn. Hinekan digot ku "çûye serê çiyayên wisa ku qet rê nadine kesî." Hineken jî, "çûye çiyayê Maziyê" digot. Çendan jî digot ku "çûye ew gundên ku dostên wîne."

Peyketin, ger û avêtina ser gundan bê feyde bû. Îbo çûbû, gihîştibû ciyê xwe. Paşê hêdî hêdî, li pey Îbo ketin û gerandin kêm bûn. Bûyerên Tendûrekê jî, ketine nav ew bûyerên ku yê kirî nedihate zanînê.

Girtî hemû, di wexteke kinde fem kirin ku wî xortî pesin dabû xwe. Lewra şiltax avêtibû bi xwe xwe. Her tim digot ku "min weha kir, min weha kir. Nizanim min çi kir..." Her hefte dê û bavê wî dihatin dîtina wî. Şîretên Soro jêre digotin. "Bira li zimanê xwe bibe xwayî. Zimanê xwe bigre." Caran qebûl dikir, caran jî diqehirî xorto.

– Ew tivrê sor jî kiye, ku şîretan li min dike?

– Wisa nebêje kurê min. Ji bo te dibêje. Çima xûlî dibî. Binhêre, pere jî ji tere şand. Tu silav dikirî.

Wê demê sawcî, ji girtîgehêde hîn bû ku ev xort newxaşe ku peya û pesina dide xwe. Vira dike. Baweriya wî hat. Belê, ilm jî wisa nedigot çima? Hineken wisa derew dikirin, wekî ku ev bûyer di serê wande derbas bûye. Ev jî nexweşîk bû. Yên weha, pirê wan, ji bajaran, xwendî û nîv xwendîbûn. Ev jî yekî mînanî wan, lê gundî bû.

Hemûyan her tişt ji Îbo zanîbûn. Ji vanderan dûrketina wî jî wisa nîşan dida. Ew herdu dizên ku xort îxbar kiribûn, sawcî ew careke din guhdarî kir. Wan jî got ku tu pirsên wî bi hevdu nagirin. Derewan dibêje. Sawcî ewa di hundirde negirt û berda. Niha ew jî li gund bû. Dê û bavê wî, ji eşqan, lingên wan erd nedigirt. Ew dîsa wekî berê. Şewqe dida alîkî, li ser çavê xwe, bi jorve li hevalên xwe dinhêrî. Piştî girtîgehê, niha bêtir peya dida xwe. Li kêderê rûdinişt û radibû, qala rojên xwenê girtîgehê dikir. Heke ku kesî nizanibûya, wê bigotina ku bîst sala di hundirde maye. Li wêderê, li çend kesan xistibû, xwedê zane.

Hemû gundî her bêtir feqîr bûn. Têr kamaş nedidîtin. Ji bûk û qîzanre kincên nû nikaribûn bistînin. Bi yên kevnve dijîn û ew pîne dikirin. Meriv rengê şalê mêran êdî nas nedikir jî pînan. Zarok jî tazîbûn. Ji bo ku piçek ka û genim nexwin, devên heywanan girêdidan, li xermanan. Zarok li ser kamên xerman, zikwerimî, çîpzirav, çavên wan ji toz û kayê nedihate xuyanê, tenê diçirûsîn. Te pifkira, wê li erdê biketana.

Ûsiv axa, rojên xweyên xemgîr bîr dikir caran, li gund dinhêrî, rehetîk dikete dilê wî. Hinek ji ew malên li gund mane, ji pirsa wî dernediketin û bi dizîkave dihatin pêre xeber didan, lê kêm bûn. Halê wan xirab nîn bû. Yên dinê tazî û nikaribûn dûr û dirêj weha bijîn. Ewê jî biçûna. Wê çaxê Ûsiv axa wê bêtir dilxweş bibiya.

Ya herî baş ew bû, ku ji xwere traktorek bikiriya. Her tişt hatibû guhartinê êdî. Hukumatê genim di hundirde nedirizand. Ji bo ku rind

kar bikin, zêde genim û çandinê bistînin, bi deyn û krediyan traktor dida yên ku xwayî erdin. Banqa çandinê û daîra hacetên çandinê gelek alîkarî dikir niha.

Gundiyan jî bizanibûna ku êdî rêke dinê tunebû. Wê baweriya xwe winda bikirana û yên mayî jî wê biçûna. "Ya herî baş ewe" difikirî Ûsiv axa. Mirteza jî negotibû çima, "tu qerarê xwe bide, yê dinê hêsaye bira..."

Çû, serîk li banqê da. Qedir û qîmet dane Ûsiv axa. Mirteza her tişt baş kiribû rê. Midir tapiyên gund xwastibû. Rêyek ji wêre jî dîtin. Hinek kaxizên kevn anîbûn ji midirre. Midir tapî nestandibû, lê van kaxizan têra wî kiribûn. Di nav wan kaxizande nîşan dida ku Ûsiv axa bêşa gund daye û wî gund çandiye, hildaye. Hukumatê digot, "alîkariya gundiyên ku erdê wan hene bikin. Hêsaniyê û rêyên nû nîşanî wan bidin..."

Midir ji jorêre nivisîbû, dora wî wê bihata. Qrediya wî nava panzde rojande derket, hat. Ûsiv axa di dora pêşînde bû, li benda traktorê bû. Niha xwe bi xwe her bêtir qewî didît, dilê wî fireh dibû. Gundên der doran jî bihîstibûn, qedrê wî her zêde bûbû.

Ew û Zubêd axa gelekî nêzî hev û dost bûn êdî. Dost, di rojên tengasiyêde kifş dibûn. Wî jî dostiya xwe nîşan dabû. Gazî Eşo kiribû, xwastibû ku Eşo tendûrekiyan bitirsîne. Bira bizanibûna ku Ûsiv axa bixwaze, wê xirabiyên herî mezin bîne serê wan. Dikaribû wan bide kuştinê. Şevê bide ber gullan. Her tiştî bike. Her tiştî.

Eşo awqasî li ser vî karî nedisekinî. Carekê duda di ser gundre gulle avêtibû. Di serîde gelek jê tirsiyan, lê paşê tendûrekî jî hîn bûn. Fem kirin ku Eşo dixwaze wan bitirsîne. Karê Eşo bi vî halî dirêj bû, çû. Wan xwe tirsiyayî nîşan didan. Eşo jî di ser gundre gulle diavêt, paşê perê wan gullan ji Zubêd axa distand.

Yên ku gund terk kiribûn, êdî hatibûn ji bîrkirinê. Di ciyên çûyîde jiyaneke nû dest pê kiribûn. Çendên wan, di wîlayetê, di karê avakirina xaniyande dixebitîn. Hinekan fêkî û hêşnayî, bi erebên desta, nav taxan digerandin û difrotin. "Sêvên şêrîn, hirmiyên bi av, zebeşên bi hingiv" digotin û diqîriyan.

Merivên wan ên li gund mayî, dibihîstin ku wan li bajêr dest bi dayin û sitandinê kirine. Ji dûrî bajêr, di xaniyên piçûk, nizm û mînanî holikande dijiyan. Av û elektrîk nîn bû. Zivistanê, di şilî û şilopêda, ji ber herî û zirmixê, meriv nikaribû here û bê. Tiştek hatibû guhartinê, ew jî, niha li vir, ji gund bêtir feqîr û belengaz bûn. Ji xwe xwere digo-

tin ku em hêla hê di destpêkêdane. Di bajaran, di ciyên mezinde jiyîn pêşiyêde weha bi zehmete.

Ji Qonyayê, Edenê kêm xeber dihatin. Yên ku çûne Edenê, hînî wir nebûne. Ji birçîbûnê, germê, nexweşiyê û ji tayê gelek kes mirine. Her kesekî qulek dîtibû û serê xwe kiribûnê êdî.

Destê Ûsiv axa pak bûbû. Ew herdu pêçiyên dawiyê tunebûn niha. Berê jî tiştek nedikirin wan. Axa, kingê li destê xwe dinhêrî, hêrsa wî zêde dibû. Ji gundiyanre dida çêra. Dê û jinên wan nedihişt. Ev nîşanek bû jê re. "Bîmhêr em weha dikin. Em nîşana xwe li meriv dixin. Em meriv wilo nîvdest dihêlin..." Niha hîn bûbû, destê xwe zû zû ba dikir. Çaxa ku mêze dikir, dilê wî dikire kizînî. Perçek ji bedena wî dipekiya. Paşê hêrsa wî bi xwe dihat: "Lo Ûsivê bê aqilo. Dewsa du pêçiya, wekî canê te biçûya, wê bêtir rind bibiya çima? Mînanî ewê ji Qeyseriyê, tu qul qulî bikirana. Lê wekî milê te, xwedê nekirî çîpa te bihata jêkirinê... Çîpeke bi dara têxistina dewsê, wê bêtir baş bibiya ne? Çîp daro. Ha çîp daro, wê bigotina ji minre. Serda jî axayê çîp dar bigotina dewsa navê min." Ev ku dihatine ber çavên wî, ruyê wî tevî hev dibû, eniya wî radibû û diqurmiçî.

Midirê banqê û Mirtezayê serekê partiya nû jêre gotibûn, "di van nêzîkayade nebe jî, tê di dora duduyande traktorê bistînî." Pir dirêj bikşîne jî bi biharêre traktor wê bigihîşta destê wî. Wê çaxê karê wî yên çilo xweş bibiyan. Wê gîha jî pê bikişanda. Hêrg bikira. Tiştên firotinê pê bibira bajêr. Qet tiştên mîna traktorê heye gelo? Qet derdên awqas kesî tê kişandinê wekî traktor hebe? Ser êşa wê tune, mesref jî kême.

## –XXVI–

Payizê li wilayetê walî, qaymeqamên wî aliyê civiyan. Valiyên wîlayetên hewîrdor, qumandarên cendirman, midirên parastinê jî hebûn. Civata wan wê du roja bikişanda. Ji Enqerê midirên bilind û dewsa wezîr jî misteşar hatibû. Civat di wîlayetê, di cîkî mezinde dibû. Wê parastin, tevgera wan wîlayetan û meselên vir qise bikirana. Wezîr wê bi xwe bihata, lê ji nişkêve çûbû dewleteke dinê û dewsa wî misteşar hatibû.

Otomobîlên reş, yên waliyên wan wîlayetan, yên polêsan li pêş ciyê civatê disekinîn. Polêsan, salona civatê dabûne bin çavan. Hemû

hatin, bin biçengên wande kaxiz, pirtûkên qalind hebûn. Misteşar armanca civatê dûr û dirêj da nîşandanê û dawî weha girêda.

— Armanca me başkirina jiyana gundiyane. Lewra hukumata me dixwaze rê û avê bibe gundan, doxtiran bişîne bajaran. Em ji bo vê şev û roj kar dikin. Em dixwazin ku gundî ji hukumatê hez bikin, di bin emrê cimhûriyetêde bin. Lewra çi dixwaze, gerek bê kirinê. Sêrîde, parastin mesela herî mezine. Wexta Osmaniyande, salên pêşînên cimhûriyetêde, li vanderan parastin nehatiye cî. Hevalên min gerek quwe- ta qanûnan, hukumatê baş nîşan bidin. Gerek meriv him tûjbe, him jî li ser vê meselê geleklî bisekine. Ji vî alîde gerek em nerm nînbin. Vanderan, ji destên axayên zorbe gelek kişandiye. Ji bîr nekin ku ew dewr derbas bûne êdî. Gerek em destê xwe dirêjî xelqê bikin. Alîkariya wan kesên welatparêz bikin. Cot û hacetên kevn û edetên berî sed salan gerek êdî bê terkkirinê. Çandina nû, makîne têkevine gundan. Lewra gerek alîkariyê bikin, qrediyan bidine yên ku erdên wanî fire û mezin heye. Li dibistanan, yekîtiya millet, yekîtiya çand, yekîtiya hînbûn û xwendinê, xwestina me ya pêşîne. Hûkûmata me wê saleke dinê, vê meselê her pêşde bibe, giraniyê bidê. Firsetên nû difikire. Niha ez ji we, hal û meselên wîlayetên we, dîtinên we yên ku hûn dixwazin bêjin, dixwazim. Berê me nivisîbûn. Gerek wek raporan bihata bersivkirinê. Kerem bikin, wan bidin min. Ez bigîhînime hukumatê. Hukumat gelekî, him jî gelek gelekî li ser vî aliyê dewletê disekine.

Waliyan bi dor, meselên wilayetên xwe, dibistan, rê, nexweşxane û yên dinê digotin. Caran li kaxizên pêş xwe dinhêrîn, hine jimar dixwendin.

— Berî her tiştî, gund ji hevdu dûrin. Ev alî bi çiya û kevirin. Rêçêkirin, avbirina gundan, dibistan çêkirin zehmete. Ji bo vê, ez dibêjim ku van gundên piçûk li cîkî nêzî hev kom bikin. Wan bînine cîkî. Karê me him zû him jî erzan dibe, wê çaxê. Bi vî halî niha karê parastinê jî zehmete. Merî û memûr têrê nakin.

Yekî dinê dûr û dirêj xeberda û got: — Li vî alî welêt, çi heyfe ku me qanûn, hukumat têr nedaye hezkirinê. Ew axayên ku me şandibûn rojava welêt, me ew şûnve anîn û baxişandin. Tiştekî baş jê derneket. Niha bêdeng û di bin emrê hukumatêdene, lê meriv nikare baweriya xwe bi wan bîne. Kîngê firsetê bibînin. wê dîsa serê xwe bilind bikin. Ez di wîlayeta xwede, li ser vî karî pir disekinim. Lê dixwazim ku ev polîtîka me hemûyan û ya hukumatêbe jî. Em hemû wilo bifikirin.

Walîkî dinê, salê wî pir zêde nîn bû, eniya wî vekirî û namilên wî fireh bûn:

– Ev aliya pir paşde maye. Li hemberî aliyên dinê yên Tirkiyayê, evder pir paşdene. Febrîqe hema hema qet tunenin. Rê, av, nexweşxane kêmin. Elektrîk li wîlayetan û bajarekî dudê dinê tenêde heye. Ez vî halî, ji aliyên dinên şûnve mayî, ji bo welat, ji bo salên pêşiya me, baş nabînim. Paşê emê gelek zirarê bibînin. Meselên nû wê derkevin pêşiya me. Lewra, pêşveçûyina vî alî, gerek berî her tiştî li pêş çavan bê girtinê ji bo hukumatê.

Hinekan, serê wan di berde, an dixwandin anjî dinivisîn, hinekan jî bi çavên xweve gotinên wî qebûl dikirin. Di civatêde fikrên cure û cure dihatine gotinê.

Qaymeqamekî ciwan qala eşîrên koçer kir. Di bajarê wîde, karekî giran bû ev mesela eşîrên koçer.

– Di van wîlayetan, ya pirî jî di wîlayeta minde, mesela herî mezin, eşîrê koçerin. Koçerin, ji bo bêşê nayên jimartinê. Zarên xwe nadine xwandinê. Daîrên eskeriyê, qeydkirinê nikarin tiştekî bikin. Ji bo mehkeman diçin wîlayetên dinê. Evana ji bajar, gundan her dûrin. Li serê çiyan dijîn. Li ber surê sermayê, berf û baranêde zarên wan ji nexweşiyan dimirin. Heywanên wan bê alaf û ji nexweşiyan qir dibin, diçin. Heke ku em wan li gundan, bajaran cî nekin, em nikarin bêjin ku ew jî ji xelqê mene. Baweriya min ewe ku pêşvebûyin, ji cîbûyina gund û bajaranre derbas dibe. Yeke dinê jî, her tim koçerin, pir zirar didine yên dinê û hewîrdora xwe. Her roj, gelek bê tevgerî tê pêşiya me.

Paşê qaymeqamê li cem wî rabû. Qala gundiyên bê erd kir.

– Gundî ezîzê mene. Yên mîna meyên ku welat îdare dikin, gerek ku ev zagona me ya herî pêşînbe. Lê belê we giştan jî berya min dît ku ewana ne bi halê ezîzan, xwedanê welatde dijîn. Her tişt tê li ser kinc, xwarin û jiyana baş. Erd û zevî, dikare zikê gundiyan têr bike, jiyana wan baş bike. Lê, werin lê binhêrin ku erdê gundiyan nîne. Jana vê hetanî hestiyên xwe dikişînin. Gundên deştê, pirên wan, yê axa û beganin. Gundî li cem wan, bi têrbûna zikê xwe dixebitin. Xilaskirina kesên weha, tenê ji wanre, bi erd dayinê dibe. Heke ku em wan xwayî erd nekin, rê, av, nexweşxane û dibistan feydên mezin nade wan. Yên ku nikarin xwarinê bi dest xin, em dibêjin ku zarê xwe bidine xwandinê. Rûdinin û digrîn. Bi ya min her tişt bi vê noqtêve hatiye girêdanê. Erdê dewletê pirin. Piştî çûyina Ermeniyan jî gelek erdê baş şûnve maye. Ev gişt niha di destên axandene. Her diçe, traktor dikevin gundan. Gundî êdî nikarin li cem wan axan jî bisekinin. Ez dibêjim ku erdê dewletê berê pêşîn gerek em bidin gundiyan, bi wan bidin parvekirinê. Eger em bikaribin gundên axan jî pêre... Ev halê nû, hinek me-

selên dinê tîne pêşiya me. Axa û gundî li hev dixin. Hukumat dixwaze alîkariya axan bike, alîkariya yên ku xwedî erd bike. Lê belê gerek ewên bê erd jî neyêne ji bîrkirinê, got û pirsên xwe kuta kir.

Di vê civata ku du roja kişand, qaymeqamekî jî got:

– Xwendegehên hundirîn gerek em vekin. Jimar û ciyên wan pêşiyêde baş bê bijartinê. Di nava gundan, xwendegehên hundirîn bê çêkirinê. Em bi vî tehrî, zimanê wan dikarin biqulibînin. Him jî dibistanan li hemû gundan çêkirinê xilas dibin. Van zarokên ter û ciwan, em dikarin kîjan teherî, kîjan fikrî bixwazin, bidinê. Lê dibistanên gundan ne wehaye. Zarok ji dibistanê derdikevin, diçin malên xwe, dîsa zimanê xwe, yê dê û bavê xwe xeber didin. Wê çaxê, dibistan ew feydê ku em dixwazin, nadin.

Civatêde tiştên wilo, bi cure cure hatine qise kirinê. Lê belê ne erd didane gundiyan, ne jî eşîrên koçer li gundan dihatine bi cî kirinê. Rê, av û meselên dibistanan nedihatine cî. Her sal dihiştin saleke din.

Ji bo hinek sebebên îdeolojîk dest bi xwendegehên hundirîn kirin, lê ew jî bi dilê hukumatê neçû serî, hêdî hêdî hemûyan bend sist kirin. Ya rastî, hukumatê neheqî dikir û ewê jî bi xwere, rehetî nehanî.

Qirediyên mezin didane gundiyên dewlemend, hacetên çandinê dibaxişandine wan. Dixwastin ku ew pêşde herin. Partiyên nû hêdî hêdî dest pê dikir. Her diçû, pirsên wan merivên ku di partiyande bûn, derbas dibûn. Giraniya wan xwe nîşan dida.

## – XXVII –

Wê salê zivistan zû hat. Zivistaneke weha giran qet nedihate bîra kesî. Gelekî berê, zivstanên wisa bihîstibûn. Kerme û alafên wan zû xilas bûn. Ji bo ku heywanan bigihînine biharê, ka û gîha hindik hindik didanê. Zikên wan digihîşte hev, parsiyên wan dihate jimarê. Wexta ku dibirine avdanê, lêbûn ku li erdê kevin. Çiqas jî xîret kirin, dîsa gelek heywan telef bûn û mirin.

Li gund, yên ku nexweş zêde bûn. Yên pirî, pîr, kal û zarok bûn. Zarên gund hemû bi sorikan ketin. Sorik diqediyan paşê kuxik, agir, alaf û zarok dimirîn. Çiqas dimis didane wan, sorik nexweşîka hêsaye digotin, dîsa jî tifal li pey hev ji ber mirinê nedifilitîn. Her roj sê çar tirbên nû li tev yên kevn dibûn.

Zivistanê, xwarin xilas kirin. Xêra heywanan nîn bûn. Sergîn û xwarin kêm bû. Niha jî, mirinê pêsîra zaran bernedida. Dîtin ku gelek za-

rok dimirin, xeber dane doxtir. Li bajêr û gundên din jî sorik hebû. Doxtir piştî heftekê hat. Piştî sorikan, zarok pişikêşê diketin. Lewra dimirin. Doxtir dixwast ku zaran bi derzî bike. Li gund girîn û li hember sekinandin dest pê kir. "Qet ji bo sorikan derzî dibe, kê dîtiye eva?" Doxtir yek dudu ji wan razî kir. Derzî li zarên wan xist û derman dayê. Yên dinê qebûl nedikirin. Vê zivistanê, di vê qiyametêde, wê çawa biziviriya bajêr? Li ser yên dora xwe diqîriya û diqehirî.

Lo, wexta weyê weha bikira, çima we herdu lingên min kirine solekê, ecele kir? Çi feydê awqas zehmetê bû? —digot.

Çiqasî got jî, dîsa bê feyde bû. Mirin dîsa nesekinî. Yên ku doxtir derzîkiribûn, derman dabûnê, pak bûn. Dîsa jî kesî îna nedikir ku feydên derziyan bûye.

Nêzîkî nîvê zivistanê, gelek kal, kuxika wan zêde bûn. Belxem diavêtin û bîhna wan diçikiya. Paşê dimirin. Zivistan çiqasî bê guman bû? Yên ku arên wan diqediyan, bi deyn didane hev. Kesî nedixwast ku here ber derê Ûsiv axa.

Serma kêm bû. Berf û cemed heliya. Jiyan û ronahî hate ruyên kesan. Zivistan diqediya, lê gundî jî pêre.

Dostê Ûsiv axa, Mirtezayê ji partiya nû, li ser karê wî baş disekinî. Kingê diçû wîlayetê, traktora Ûsiv axa dipirsî. Qewl û pirs dabû ku traktoreke herî baş ji Ûsiv axare bistîne. Dixwast ku yeke mînanî traktora wî xwe be. Wexta ku di sûkêre derbas bû, midirê banqê ew ji dûrve dît û dergewanê xwe şande pey wî. Xeber da ku êdî dikarin herin wîlayetê, traktorê bigrin. Vê earê, ji her demê zêdetir dostî û nêzîkayî nîşanî Mirteza da. Mirteza fem dikir ku midir çi dixwaze bêje. Midir awqas alîkarî kiribû. Wan jî dinê û tore dîtine. Di bin vî deynîde nediman. Midir bêpar nedihiştin.

Mirteza ji Ûsiv axare xeber şand ku bira nesekine bê. Hemû kar bi cîbûn. Piştî çend rojan tev çûne banqê. Wê derê zerfek danê û yên pê biçûna "daîra hacetên çandinê".

— Binhêr bira, em hinekî li hêviyê man. Derengî man. Lê baş bû di dawiyêde. Xwedê ji midir razîbe, pir xîret û alîkarî kir. Traktoreke ji ya min, wê bidine te jî. Tu nizanî Massey Harrîsan. Çêkirina kafirê întgilîze. Motor ji ser wanre tune.

— Yek ji ya te, erê. Massey ne wisane?

— Belê. Meriv baş li wan binhêre, hetanî jiyaneke merivekî diçin. Qet tiştek jî, pê nabe. Emê li wîlayetê, şofêrekî dost, ji me bibînin. Yekî wisa ku ji zimanê motoran fem bike.

– Ez ji tere tiştekî bêjim bira? Di vî karîde te gelek zehmet kişand, ez vê qet ji bîr nakim. Qet, qet.

– Hela lê. Hela lê. Ev çi gotine. Emê ji bo hevdu nekin, îca ji bo kê bikin? Lê hindik mabû, min ji bîr bikira. Paşê dîsa kêrî me tê. Gelek jî alîkariya wî gihîşte me. Kî erdê bê tapî qebûl dike û traktorê dide kesî? Gişt jî bi destê midirê banqê hate cî. Gerek em jêre xelatên bihagiran bistînin. Me pere bidanê, dibe ku her bêtir kêrî wî dihat. Nabe. Emê jêre xelateke baş bistînin. Tu memûran nas dikî. Nedî xwarinê, destê wan nalipite. Lê, te pê da xwarinê, tiştê ku nebe tune.

– Erê walle, gotina teye. Xwedê zane ku tu jîrî. Hemû deriyan dikarî vekî. Maşalla. Him jî hezar carî maşalla.

Çûne wîlayetê, bi rêberiya Mirteza, şoferek dîtin. Li Edenê kar kiribû, ji motoran jî rind fem dikir. Ne ciwan bû. Porê wî gewr bû bûn. Sî û pênc salî hebû. Destên wiyên reş û mezin tîş–tîşî bûn. Mil û pîlên wiyên bi goşt, di hundirê çakêtê wîde dihate xuyanê. Çavên wî hêşîn û xwîngerm bûn. Li Edenê karê wî baş bûye, lê jin û zarên xwe nikaribûye bibe wira. Paşê jina wî ku nexweş ketibû, pak nebûbû, ewî jî karê xwe hiştibû û şûnve hatibû. Niha jîna wî baş bû. Lê ditirsiya ku here Edenê. "Lê wekî jina min dîsa nexweş bibe", digot. Her gotinên Mirteza qebûl dikir. Lê belê xwestineke wî xwe jî hebû. Heftê carekê anjî deh rojan carekê, bikaribûya here cem jin û zarên xwe. Car caran serîk bida mala xwe.

– Belê. Belê birazî. Jin û zarên me jî hene. Çawa dibe? Ji bo ku tu kar dikî, nikarî ji wan dûr kevî, bi serê xwe bihêlî. Ûsiv axa wê xwestina te bîne cî.

Ûsiv axa jî tevî xeberdanê bû.

– Erê. Erê. Kîngê te xwest, tu dikarî herî cem wan. Em jî xweyî malin. Qet vê ji xwerc neke derd.

Xeberdan û qerar dan. Heqê meha wî jî birîn, li hev hatin. Paşê tev çûne daîra hacetên çandinê.

Daîre, di berre rêke mezin derbas dibû. Li ser, ji hesinan simbileke genim û çerxeke makîna çêkirîbûn û çikandibûn. Du qat bû. Cîkî gelek fireh digirt. Li aliyê pêşîn ciyên memûran, mala midir û yên çendê dinê hebûn. Hersêk bi hevre ketine hundir. Li dîwaran, şiklên makînan bi reng û reng, tirpan û gundiyan, makînên ku genim pê dihate çandinê hebûn.

Midir li kaxizên destê wan nihêrî. Paşê da memûrekî dinê. Qasek şûnde karê wan qediya bû. Midir gazî sermakînist kir. Jêre got ku bi-

ra Massey Harrîsa ji bo wan jibartine, nîşanî wan bide. Her tiştî bi wan bide têgihîştinê. Kaxizên traktorê bide wan.

Di baxçê dawiyêde, li ber traktoreke mînanî rengê hundirê kundira, nêzîkî sor, li ser Massey Harrîs nivisî, sekinîn. Hersêkan bi meraq lê dinhêrîn. Sermakînîst li ser piya qala traktorê dikir.

— Xêr û oxirbe. Evanan him erzanin, him jî perçên wan pirin. Rind jî dikişînin. Hetanî heyşt dîska bê minet dikişînin.

Wî ku qal dikir, şofêrê Ûsiv axa serê xwe li dikir, nîşan dida ku ew jî van tiştan zane. — Evanan motorê nakelînin, germ nakin. Bê hîdrolîkin. Meriv pûlixên wan bi bendekî qiloz dike û datîne.

Ji kitêba di destê xwede tiştin nîşanî şofêr da. Şofêr:

— Ez li Edenê gelek caran li ser traktorên vî cureyî xebitîm. Ya rastî jî, îro, yên herî baş evin.

Mirteza jê fem dikir, lê Ûsiv axa qet tiştek tênedigihîşt. Romorka wê sê ton bû, lê belê nava mehekêde wê bihata. Li Edebazarê tên çêkirinê û tên.

Traktor hildan, ji wê derê çûn. Çiqasî geryan jî tiştekî bi layîqî midir nedîtin. Di dawiyêde qerar dan ku jêre xalîçekî bikirin. Xalîçe mezin bû, têde gulên sipî, sor hebûn, li Binyanê hatibû darxistinê. Paşê zivirîne bajêr.

Li ber derê Ûsiv axa, ji bo traktorê ciyek jibartin. Ji bo rûn û bîdonan koxek çê kirin. Her tişt bi cîbû êdî. Destûr dane şofêr, ku here mala xwe, karê xwenî xebatê bike.

Bihar ku hat, yên ku dijîn, giştan qalikên xwe şikandin û dîsa dest bi jiyanê kirin. Bê hêwîtî ji nav rabû.

"Bihar jiyane" gotine pêşiyan. Raste. Zivistanê pir berf barîbû. Nika diheliyan, çem û avên piçûk gelekî pêre hilda bûn, der dorên xwe di bin avêde hiştibûn. Zevî, çayir ji her salan bêtir bi av bûn. Dihate xuyanê ku îsal wê gelekî firêqetîbe, zevî û çayir wê zêde zêde bidin. Hemû bi hêwî bûn. Zivistanê ji wan gelek tişt biribû, niha dixwastin ku yên çûyî ji bîr bikin. Xweşî, rindiya biharê awqas dibe êdî. Gerek meriv, heyfa zivistana dirêj derxe. Dinê tazî û xwe li her alî berdida. Gerek meriv tama biharê derxe.

Gelek ji gundiyan, bondirix, cot û hacetên xweyên dinê dinhêrîn, kêmasiyên wan dianîne cî. Niha êdî, derdê ka, gîha, savar û arvan nîn bû. Rojên xebatê, kar dihatin nû. Heke ku axa dest ji wan bikşîne. Ya rastî, wan jî nehiştibû ku axa zeviyan biçîne. Lê belê çi ketibû destê wan? Qet. Qet tiştek jî. Her diçû, halê wan nedihate kişandinê. Gelek, bê hêvî û ji canê xwe jî aciz dibûn. Çi bikin? Gelo, lêxin herin, ji

gund dûrkevin? Evê weha çawabe? Bi salan, bi vê jiyana kûçiselaniyêde, wê çawa bijîn? Axa êdî bê derd bû. Di pêşiyêde kevir, kuçik tunebûn. Dîsa jî her tişt hatibû serê gundiyan.

## – XXVIII –

Zivistana dirêj qediya bû. Hemûyan rojên xweş hêvî dikirin. Wê çaxê axa, traktoreke nû kirîbû û anîbû gund. Tendûrekiyan zanibûn ku Ûsiv axa wê traktorekî bistîne. Dizanibûn, lê dîsa jî hinek ji wan "na lo, dibe ku nestîne" digotin di nav xwede. Bûyerên tûj û bê însaf niha li ber çavên hemûyan bûn. Lê nedixwastin ku wan bûyeran bibînin. Dixwastin, wan neynine bîra xwe. Te digot ku di destê wande bû. Dixwastin ku yên bûyî qet neyên pêş çavên wan. Lê tiştek hebû ku nedihate veşartinê. Axa traktora nû anîbû û li ber derê wî bû. Van nêzîkiyande wê biçûya, zeviyên gundiyan bajota. Di van rojên xweşde, tirsa bûyerên giran û tûj ji bîra wan dernediket. Dayin û sitendina axê û gundiyan gelekî kêm bû. Ne gundiyan, ne jî axê dest bi hevdu nekiribûn. Niha qudreta Ûsiv axa pir bû. Xwestina gundiyan tenê, neajotina zeviyên wan bûn. Bira axa, ew halê berê qebûl bikira, bes bû. Axê vê xwestina wan rind zanibû. Lê dîsa jî bi sebir û dilfirehî bende mabû. Vê carê, traktor ya wî bi xwe bû. Lewra kîngê bixwesta dikaribû biajota. Gundiyan ku her tişt bidîtiyan, êdî per û baskên wan wê bişikesta, nikaribûn li hemberî wî bisekinin.

Niha li bajêr, dostên Ûsiv axa ji berê bêtir bûn. Qedir, qîmetê wî her zêde bû. Îsal bêtir bê însaf û gunê wî bi kesî nedihat. Hemû kes li pêş çavên wî piçûk dihatine xuyanê. Baweriya wî bi xwe ji berê pirtir bû. Berê car caran tiştek ji jina xwe dipirsî, niha ew jî nîn bû. Gelekî tûj bû li hemberî xelqê malê û giştan bêtir jî li hemberî jinan. Çibûn jin? "Kesên por dirêj û bê aqil. Gundî jî gerek gundîtiya xwe bizanibe."

— Evê weha çawa bibe?

— Mêrik, çima tu dersek hilda? Mêze bike çû traktoreke nû sitand û hanî. Yeke nû, mînanî qîzan. Traktor besî meye ku me ji gund bavêje, canê me bistîne. Di nav xwede wilo qise dikirin.

Ana, wê çawa bibiya? Du salên dirêj bîhna wan hanîbû ber pozên wan. Nedixwastin ku traktora axa, a nû hatî bibînin. Dibe ku êdî nikaribin zeviyên nûvekirî jî bajon. Vê traktorê wê koka wan ji gund biqe-

tanda. Nîvê wan zeviyên ku nûvekirîne bidine axê, dîsa jî nabe. Îsal ji van zeviyan jî tiştekî wisa nehatibû.

Gelekên wan weha difikirîn, lê hinek jî li hember bûn. Çi dibe bira bibe, dixwastin li zeviyên xwe bibine xwayî. Qerarên wan qerar bû. Lê hinekên wan wilo nerm dibûn, wan karên yên dinê jî xirab dikir.

— Heke ku emê bimrin, bira tev bimrin. Bijîn jî tev bijîn. Ev çiye em weha dikşînin?

— Diyên me em anîne dinê, ji bo ku her tim derd û kulan bikşînin çima?

— Pir caran em difikirin, gelo gundî hemû di halê medene?

— Em bixwazin jî, nexwazin jî xirabî wê derkevin.

— Çima emê bi xwe xwe herine mirinê? Emê ji nêzde bimrin.Yên ku weha qise dikirin, tê digihîştin ku êdî dawiya wane. Xwe şûnve kişandin, wê heta kêderê biçûya? Wê bi van zeviyên kevir û kuçikve şerpeze bibin, paşê ewên jî ji dest herin. Ya rastî, ya başî meriv her tiştî hilde ber çavan û zeviyên xwe nede Ûsiv axa.

"Du sal bû. Hêvî û benda bûn. Dawiya benda sekinê xilas nedibû. Meriv ji canê xwe aciz dibû êdî. Dibe ku rêyek bê dîtinê gotibûn, benda mabûn, lê belê ew jî nebûbû. Lê niha? Na xêr. Na xêr. Zeviyên xwe ji Ûsiv axare nedihîştin. Bi salan mînanî çavên xwe li zeviyan nihêrîbûn, xwîdana eniyên xwe pêre rijandibûn." Zeviyên xwe nedidane kesî. Awqas serî kilfet, li van zeviyan mêze dikirin. Bi biharêre, rojên teng jî tev hatibûn. Traktora Ûsiv axa, hinekî jî ew pîj kirin ku qerarê xwenî dawiyê bidin.

Rojan da pey rojan. Van rojan gelekên wan bi tingijî û bi hêrs bûn. Nû, dîsa di malande dicivîyan. Bi hevre difikirîn. Li ser rojên berê, bûyerên kevn xeber didan. Soro, Mîro bi nermî, her tişt û çûyin mêze dikirin. Cîranên wan dilipitîn û rêkê digeriyan. Wan jî meraq dikir. Di alîkî dinêde, herdu hevalên xwenên kevn, Qasim û Seîdve bûyerên nû berbîr dikirin.

— Em ji vî gundî mîrat herin. Emê heta kîngê ji Ûsiv axare xulamiyê bikin? Tu nanihêrî, qet tiştek jî nabe. Saleke dinê emê bêtir birçî û tazî bibin. We zivistan nedît çima? Bîhna me diçikiya.

— Wekî em bihîştina, meyê hela par ew bişanda wê dinê. Niha jî traktor anî, da ber biçenga me. Wê çaxê nikaribû. De werin kirina xwe paqiş bikin. Di gundekîde awqas aqildan hebin, dawî yê wehabe.

— Bi wanre serederî nabe. Me digot ku erd yê meye, em benda wê bûn. Lê hukumatê bo xatirê vî erdî, hanî traktorek jî da Ûsiv axa, kre-

dî dayê. Lo rabin herin ser şuxulên xwe. Xêra vî erdî ji mere tune. Min di vî erdîde mîsto, erê walle.

– Yên ku diçin bira herin. Diya min jina min kiribe... Berê miriyê min derdikeve, paşê lingê xwe davêjin erdê min. Hişê we li kêderêye? Hetanî ezê mînanî qehpikan bijîm, bi namûs bimrim ji wê çêtire, digotin hineken.

Car caran xeberdanên wan wisa diçû ku di axiriyêde li hev diqîriyan. Kesî êdî meraq nedikir ku "gelo axa bibihê". Ji tirsan kesî li dora xwe nedinhêrî. Kêr gihîştibû hestî niha. Giştan dev ji tivdîra berda bûn. Soro, Mîro, bê xeberdan bûn. Yekîtî û li hember sekinandin didane pêşiya gundiyan. Wê çawa bibe? Hertim ew tişt digotin.

– Oro Soro, me digot ku te hine cî dîtine, hişê te têdigêhije. Lo yekîtî çêbû, paşê wê çibe? Belê emê yekbin. Çima em nizanin ku em nebin yek, eva mirina meye? Belê, paşê wê çi bibe? Çima tu tênagihêjî? Emê çi bikin, ewê bêje? Her tim dibêjî yekîtî ha yekîtî.

Soro bersivên yên weha, neqehirî û nermik dida, her car.

– Emê tevayî bifikirin û qerar bidin. Bira, neqehire. Gerek em dilê hevdu neşikênin.

Hemû malên gund, te digot ku dikeliyan. Li her cî, "wê çawa bibe, emê çi bikin?" dihate xeberdanê.

Axa ev çend rojin ku bi motora xwena nû, ji berê pirtir erd diajot. Xwe jî meraq dikir ku van rojên bi diltengî, gelo wê çawabin ji vir ha. Wî jî zanibû. Ev êdî dawiye. Heke ku vê jî derbas bike, her tiştê biqediya.

Cîranan, êvaran, ji berê zêdetir serî didane hev, diçûn û dihatin. Ji hevdu dipirsiyan. Diqehiriyan. Dest dihavîtine kîjan kevrî, ji bin derd û kul derdiket. Diqehiriyan, nedibû... Qise dikirin, nedibû. Kal û pîran dua û lava dikirin. Ji bo ku xwedê vê belayê ji pêş wan hilde, dîsa lava dikirin. Dîsa jî nedibû. Êdî di mizgeftêde xeber didan. Ne mizgeft bû, odeke mezin bû, li wê derê nimêj dikirin bi tevayî. Nimêj dikirin û peyre jî xeber didan. Xeberdanên wan, car caran hevdu dişikênand jî. Hêdî hêdî hînî vê bûn. Dûr û dirêj li ser gund xeber didan di mizgeftêde.

Rojekê, bi hêrs û tûj, di mizgeftêde diaxiftin, pevçûneke bi ziman bû. Pevçûneke giran bû. Berê qasî bîst kesî hebûn. Paşê her zêde bûn. Ji wan yekî ciwan:

– Birano, weha dest piyên me girêdayî, em li hêviya deweta diya xwene, çiye? Zevî tune, mêrg tune. Em bi perçekî erdve zeliqîne, mane. Ew jî bi kevir û kuçik, têra zikê du kesan nake. Çi ji destê me tê,

gerek em bikin. Ji me mestirin, mezinên mene, dibêjin em ji hinekenre. Lê belê qûna mezinan jî, ji erdê ranabe. Ciwan, spîçilokî û reng têde nemabû. Zû zû bihna xwe hildida û dida. Destên wî dirieifiyan. Bi hêrs bû.

Misto, çavekî wî piçûk, spî li ser, pozê wiyî dirêj û xwar, mînanî hertim bêdeng bû. Di halê xwede, di hemdê xwede bû.

— Raste, tu rast dibêjî. Dawiya vê sekinandinê tune. Heke ku kar berve başbûnê biçûya, sekinandin û hêvî baş bû. Lê belê, her rojên çûyîn, halê me bêtir xirab dibe. Axa ku traktor anî, her tişt ji bo me qediya. Ji parre dengek hat:

— Hela bisekinin, bisekinin hûn. Kîngê ji gund berdane me, wê çaxê hişê we wê bê serê we. Ji sêrîde, meriya zanibû ku wê wehabe. Bisekinin. Hela hinekî din jî bisekinin. Van "bisekinin, bisekinin"an, ev kar anîn serê me. Tiştekî din nizanim ez. Yên ku digotin "bisekinin", sûc gune yê wane.

— Raste. De werin, ji nav vî karî derkevin ha. Her tişt tevî hev bûn, werin ji hev derxin.

Yek li pêşiyê rûniştibû. Destê wî li ber çenga wî, ruyê xwe dixurand, bê qehir destê xwe dirêj kir:

— Oro lo, me evder kire hemama jina. Piçekî hevdu guhdarî bikin. Yek bi yek xeberdin. Yên bi sal û kal hene. Ji her serîkî dengek derdikeve. Yê bûyî bûye. Yê çû nedine dû. Niha, em dikarin çi bikin? Ewê bêjin. Hevdu neêşînin, minanî meriyan bêjin.

— Belê, belê. Raste. Bi qîrîn û gal galan kar naçe sêrî.Yekî rû ne pir dirêj, kal, cixara xwe danî pêşiya xwe:

— Xwedê qebûl neke. Traktor derket, xwcyên gundan niha qet li hêsirên çavên me jî nanihêrin. Me ji gundan davêjin. Bê kar û bê mal mane em. De xweyî gund wisa... Lê li cem me. Ev erd yên mene, gerck me di sêrîde kar biqedanda. Hûn çi bêjin, ez bi wereme.

Cîranê wiyî reş û qemer, kin û qut bi dengekî bilind qîriya.

— Tu tiştekî nabêjî. Nabêjî. Niha jî gerek me berê ev kara xilas bikira dibêjî. Kê li erdê dîtiye? Bêje, bêje, wê çawa bibe niha? Em bihêliln herin an bisekinin, her tiştî bidine ber çavên xwe? Ya rastî, ya dilê xwe bêje. Neke mirte mirt.

Yê pêşîn dil şikestî û pirçiyê xwe kir, got:

— Lawo, tu çito meriyî? Min tu tiştekî xirab negot. Hûn çi dikin ez jî bi wereme, min got. Tu di ciyê xwede nasekinî. Çima ev der ji te tê pirsîn?

Hamoyê kal û por gewr:

— Hûn çi diqîrin? Hûn herdu jî kerrbin. Hûnê li hevdu xin? Ev çi hale? Mînanî merivan xeber bidin lo. Ez dibêjim ku qet xêra sekinandinê tune. Ev du salin em şerpeze bûn. Me tu kar nekir. Em jî rojekê pêşda herin. Ya baş ewe.

— Hela lê, hela lê. Ew jî kalê meye. Baqilê meye. Yên ku bi aqilê te diçe û gura te dike, xwedê hiş bide wan.

— Lawo, edeba xwe bizanibe. Tora xwe bizanibe.

— Çi edeb û tore? Çima tu nabihêyî ku tu çi dibêjî? Tu he zanî ku li her derê, ji mere nan û goşt çêkirine û li hêviya mene. Ji mere name şandine, mora sor jî bi qûnê xistine. Li benda mene. Hemû cî wehane. Her cî. Gerek em hişê xwe berev kin. Em şêst mal bi yekî nikarin niha. Paşê em ku çûn cîkî nû, li wê derê em bi zarekî jî nikarin.

Ev xeberdan dûr û dirêj bûn. Hatine çend car kirinê. Hewa piçekî nerm bû paşê. Soro xwast ku wan di hinek ciyande hişyar bike. Ker bûn. Carên berê, kîngê ku Soro xeber dida, gundiyên wî dilfire dibûn. Baweriya wan bi wî hebûn. Zêde xeber nedida. Derew nedigot. Evînek, ronahiyek dikete dilê wan ku ew guhdarî dikirin. Evî çûr, bi tehrekî din qise dikir. Bi dostî, bi dilgermî.

— Me gerek hevdu neşikênanda. Dilê me ji hevdu ma. Rojên teng li pêşiya mene, lewra em weha bi hêrsin. Du salin derdên me zêde bûn. Hêviyên me kêm bûn. Feqîriya me her bêtir bû. Axa li ser erdê me rûnişt, ev jî têrê nake, çû traktor hanî. Lewra em diqehirin û bi hêrsin. Heyfa wî, em ji hev derdixin, ji hev distînin. Dilên hev dişkênin. Van rojan gerek em her bêtir bi hevrebin. Hevdu fem bikin. Lê belê em ne wisane.

Kefa destê wî şil, eniya wî xwî dabû. Pêsîra wî vekirîbû. Heke ku van rojên teng û tarî, yekîtiya wan nebûya, bela bibana, êdî paşê tiştekî kar nedikir. Lewra wexta ku xeber dida, caran mînanî zara diltenik û lêbû ku bigrî, caran wek kêreke tûj bû.

— Di van bûyerande, qet gunê kesî jî tune. Me nikaribû tiştekî dinê bikira. Em nezanin, nexwendîne. Yên ku berî me, hê jî ji me nezantir bûn. He zanibûnê ku dinê her tim wê weha here. Tapiyê erdê nestandine, lê nebûne xwayî. Her tişt bi tespît û bi qeyd nebûne. Nezanî, çima hêsaye? Hûn wisa zanin? Kî ji we li hemberî van gotinên min derdikeve? Em nezanin. Loma, niha awqasî dikişînin. Cîranekî, duda got ku gerek me ev kara berê xilas bikira. Bêjin cîranno, meyê xilas bikira, çi bikira? Çi ji destê me dihat? Em çûne hukumatê nebû. Giryan, zarîn dîsa nebû.

Yek tev xeberdanê bû:

— Lê niha? Niha wê çawabe?

— Bise, guhdarî bike bira. Nebe, emê dîsa mînanî biran xeber bidin û qerar bidin. Pevçûyin, xeyidandin nabe. Em lêxin herin. Wê çaxê eme bigerin, sitarekê ji bo xwe bibînin. Na heke ku me go, emê li gund bimînin, emê piştên xwe bisipêrîne hev, dawiyê bifikirin. Lewra dibêjim ku emê her tiştî bi hevre bikin. Her roj karê me her diçe bi zehmet dibe. Gerek em rind bifikirin.

Giştan heq didane wî. Bi can û dil ew guhdarî dikirin. Soro dîsa digot:

— Gerek em hemû, li ser vî karî rind bisekinin û bifikirin. Emê sibê dîsa li virabin. Emê bi tevayî qerar bidin. Ez ji we lava dikim. Em ku hevdu diêşînin, Ûsiv axa dilşa dibe. Ev roj, rojên pirsên tehl û dilbirîndarî nînin.

Gund bêdeng bû. Hewake giran û şînê hebû li gund. Jin û qîz, destên wan di paşila wande, bi xem û bêtam diçûn, dihatin. Bi dil nexwastî. Zarokan nedixwastin hêrsa mezinan bînin. Tiştekî wisa bikin. Xêra şîretan nedibûn. Tûj xeber didan. Dilên hev dişkênandin. Di nav her tiştîde sûcê hinekan didîtin. Jin û mêr tevayî, "xwedê qebûl neke, xwedê li erdê nehêle", dawiya xeberdanên wan bûn.

Wê şevê di hemû malande, herkesî bi tehrekî xeberdan. Gelek tişt hatine gotinê. Hinek tehl û tûj, hinek jî bi dilxweşî bûn bi van peyivan. Van rojên bi hêrs û xemgînde, wê li ser qedera gund qerar bidana. Wê şevê Soro ji Mîrore gotibû ku gund terkkirin, çûyîn qet ne başe. Dawî tarî dihate xuyanê. Çiqasî ji destên wan tê, gerek dest bidana hev û her tişt hildana ber çavên xwe. Gerek gundî jî bi vî awayî bidana bawer kirinê. Pirê wan jî wisa îna dikirin. Diltengiya wan, ji metelbûnê dihat. Şaş bûbûn ku wê çi bikin. Piçekî karê wan, qerarê wan têketa rê, ev tevlihevbûn û neçarî wê hêdî hêdî winda bibiya. Ji çend dostê xwere jî gotin. Eger, paşê karê wan ku bi dilê wan nebû, "yên ku tê serê hemûyan, ji mere jî eyd û dîlane" bigotana. Di dawiyêde dibe ku biçûna hine deran. Çend pariyên tisî dikaribûn bi dest xin.

Rojtira dinê, piştî nîvro, gelekan karên xwe dabûne ser hev û hatibûn. Xênjî Hesenê Hemzo, Esoyê Silo, nobedarê gund Şukrî, ji du sê malan dîsa kes nehatibûn. Çend kes dereng hatin. Yên dinê, li ciyê teng, xwe civandibûn, rûniştibûn. Mele, piştî nimêjê "dibe ku bêmê, lê ez hewekî nexweşim" gotibû. Lê nehatibû. Fatê, destê kurê xwe girtibû, li pişt dêrî ji xwere ciyek dîtibû. Yekî kal:

— Cîranno, li vi ciyî teng, emê bibhecin. Emê çi qerarî bidin, werin em bidin. Hûn çi dibêjin? Ji duhve we çi fikirî, çi qerar da?

Hemû bi keder û dilteng bûn. Hinek qîriyan, hinek qehirîn. Xeberdan bi dengên bilind dibû, hevdu rind guhdarî nedikirin. Hinek ji wan, gund hîştin û çûyin nebaş didîtin. Digotin ku em li ciyên xwe bimînin û şerê axê bikin. Mêranre, eybeke girane hiştin û revîn, jin jî wisa nakin. Wê çaxê çend hew keniyan, li Fatê nihêrîn. Ewê pirsa xwe danequltand:

— Erê, erê. Hema hûn nehêlin, nerevin. Jin qet qet narevin.

Hamo dîsa, "ya rastî em zûtirê ji vir herin û çarekê ji xwere bibînin", digot. Hinek li pêş derketin. Soro, Mîro li pey hev qise kirin. Fikra mayinê û li hember axê derketinê parastin. Xîret û dilgermî dane cîranên xwe. Hamoyê kal, qet nedixwast van gotinan bibihîse. Dest û milên xwe ba dikir, xeber dida. "Em herin, em herin" digot û tiştekî din nedigot. Li ser xeberdana wî, Fatê xwe negirt û dest pê kir. Gişt kerr bûn. Dengê Fatê rind dibihîstin. Li aliyê Hamoyê kal zivirî û jêre got:

— Tu xwe baqil qebûl dikî, ne Hamo. Yên dînok jî qet van gotinên te nabêjin. Her der wehaye niha. Hemû der. Kêder valaye niha? Ev hesinên bê oxir, ev traktor hatin nehatin, xelqê hevdu xwar. Zilma axan zêde bûn. Kalê xurifî, meriv erdê xwe bihêle û bireve, paşê ji merivanre çi dibêjin? Ji min û tere zevî, mêrgên ter û can tivdîr kirine. Li benda mene ne? Tu wisa zanî ne? Li hine ciyan, axan erdê yên mînanî me, ji destê wan digire. Li cînan jî, gundiyan ji gundan davêjin. Çima te nebihîst? Gundên deştê hemû weha bûne. Hişê xwe bicivîne serê xwe. Çûyin nabe. Nabe. Lê, we gava dinê digot ku "mîna jina"... Ka mêraniya we, li ku ma? Ya rastî, gerek hûn bi darên xwe, çoyên xwe bawer bin. Ne bi tiştekî dinê. Heke ku ji dilê we nayê, dûr û dirêj xeber nedin. Sibê barkin ji vir herin. Rê eve. Xênji vê tiştek nabe.

Ji van gotinan, Hamo pir dilşikestîbû. Fedî kir û qehirî. "Kî vê pîrekê tîne nava mêran gelo? Xwedê bela dayê. Çi tê ber devê wê ji mere dibêje". Diricifî ji hêrsan. Rabû ser çokên xwe. Berve Fatê vegeriya, pêçiya xwe dirêjî wê kir:

— Fata bi qirêj û lewitî. Dêla kewt-kewtokê. Bela xwedê. Ji sêrîde jî, ew pîj kirinê te nîn bûn çima, mala me xirab kirin? Gişta guh da ewte ewta te. Wan jî bi wî teherî xeberdan. Ev kar û belan hatin serê me. Hê jî tu nehatî rê. Nasitirî. Tê kîngê zimanê xwe bigrî?

— Ewqas cîran me herdûyan jî dibînin. Ez bi qirêj û lewitîme? Erê ez? Tu fedî nakî ji xwe? Te gelek tişt heq kirine ku ez ji tere bêjim. Lê belê, ez ji van cîranan şerm dikim. Tu here qurbana wanbe.

— Tê bêtir çi bêjî? Te tu tişt ji şûnve hişt êdî. Erdê bav û kalê meye, belê em têgihîştin. Lê niha yên Ûsiv axane. Tu tiştekî dinê ku em bikin heye?

Di vê navberêde hineken:

— Ji ku yên wîne? Erdê bavê wiye çima? An te pêşkêşî wî kir? digotin û li dij derdiketin.

— Niha erdê xwe, xwe dajo. Bixwaze, dikare berî me bide. Heqê wiye. Bixwaze hinekî dide, nexwaze jî qet nade. Qet evlegekê jî nede, em nikarin tiştekî jêre bêjin.

Fatê dîsa tevî gotinan bû.

— Na. Na. Wê bide te. Ji bo xatirên van gotinên te, wê bide te. Qet zirnixê jî nade, tu vê bizanibe.

— Çavê te li wêye ku em hevdu bikujin Fatê. Hinek ji aliyê axê bênê kuştinê, anjî ji me. Dilê teyê wê çaxê bê cî. Paşê herin, çi di dest û berîka mede heye, bidine cendirman û abiqatan. Di girtîgehande birizin. Xwestina te hemû eve. Em çi bikin? Feqîrin, pê nikarin. Him dewlemende, him jî di hukumatêde merivên wî hene. Ya rastî eve. Cîranno em bi mêrik nikarin. Çima hûn qebûl nakin? Em çiqasî birçî, tazî û perîşanbin, Ûsiv axa jî ewqas gunekar dibe. Li vê dinê çilo xirabiyê bi me bike, emê jî li wê dinê pêsîra wî bigrin. Xwedê wî wisa bernade. Wê jê bipirse.

Dengekî xurt bilind bû:

— Heke ku tu wî li wê dinê bibînî başe. Tê wê çaxê jê bipirsî.

— Ez pêsîra wî negirim jî, xwedê wê bigire.

Esreke teng bû, êvar dihat. Fatê dît ku dawî nayê, hişê wê çû, pêş çavên wê reşe vehatin. Xwast ku derkeve, here malê. Dil kir ku pirsên xweyên dawiyên jî bêje.

— Xulî li serê webe. Xulî li mêraniya webe. Ev çi halê weye? Tu ji karekîre nabin. Tirsê hûn qepeçe kirine. Him jî, ji tirsan, hetanî mêjiyên hestiyan hûn dilerizin. Fedî bikin. Şerm bikin. Em çend sed kesin? Axa, bi der dora xweve pênc, şeş mal jî nîne. Em ji wî ditirsin. Gerek hûn cotê xwe, gayên xwe qoş bikin, herin serên zeviyên xwe. Em gerek berî wî, wan zeviyan bajon. Emê bi çoyên xweve herin pêş, bira bênê, me li ber serên zeviyên me bikujin. Ya herî baş jî eve. Ji niha xirabtir tiştek nabe êdî di dinêde. Em bimrin jî qet nebe zarên me wê xilas bibin. Heke ku wê me bikuje, bira bê, ser seran û ser çavan. Çi bikin em? Çawa em tênê mirinê, ew jî dibe bimre.

Hemûyan heq didan Fatê. Paşê Soro:

— Xwişka Fatê, gotinên te gişt rastin. Tu dibêjî ku tu di dilê mede yî. Wilo xeber didî. Hevalno, em lêxin herin an jî li gund bimînin û erdê xwe bibine xwayî?...

Hemûyan bi hevre:

— Neçin em. Li ser erdê xwe bimînin, gotin.Gelek ji wan nika dilfireh bûn. Qerarên xwe dabûn. Hetanî mirinê wê li erdên xwe bibûna xwayî. Nan bêxîret bi destê kesî nediket. Ev şerê jiyanê bû. Ne tiştekî kêm bû. Tengasî, hetanî qerar dayinê bû. Mînanî avê, hetanî ku ji xwere rêkê veke. Paşî hêdî hêdî zelal dibe û dikişe diçe. Hetanî rastî astengeke nû tê.

Qerara mayinê anjî çûyinê dayin... Eva wisa ne hêsan bû. Pir, him jî pir pir bi zehmet bû. Vî qerarî, hemû dilfireh û dilşa kiribû. Çima heta niha ev qerara nedabûn?

Kes derdê jin û zarande nîn bû niha û ji jiyanê jî qet neditirsiyan. Ne ji kêfê bû, dibe ku ji derd û kulan bû. Rojên ku dihatin wisa giran û zehmet bûn ku kesî jin, zar nedihanî bîra xwe. Niha bi hevre bûn, rehet bûn hemû. Zelal, zelal difikirîn.

Wekî ev kara biçûya sêrî, qet nebe, zarê wan , zarê zarê wan şerpeze nedibûn. Feqîr, belengaz, li ber deriyên xelqê li kar nedigeriyan. Çima her tişt ne ji bo wê bû? Jiyan, neslê merivan car caran nahêlin ku meriv ji bo xwe tenê bifikire. Jiyan şêrîne. Xebata ji bo ku tiştekî li pey xwe bihêle, ji zarên xwere jiyaneke serfirazî bi destê xwe xe... Dilxweşî di vê xebatêde heye. Eva xebateke badilhewa nîne. Di vê xebatêde, gelek tişt veşartîne. Bi salan bêxew, birçîmayîn, li pey hêvîkê çûyîn. Meriv dixwaze bibe sêrî, pêşiya jiyanê veke. Serê xwe berjêr neke, eniya xwe bilind bike, di bin mineta kesîde nemîne.

Tendûrekiyan ev tenê di çîrokande bihîstibûn. Çi zanibûn feqîran? Hema usa rojên xweş kiribûne bîra xwe. Wan, ev di jiyana qehremanê çîrok û serpêhatiyande dîtibûn. Gelek rojên bi hêvî dîtibûn. Ew qehremanên ji bo hezjêkiriya xwe li hemberî gundekî radiwestan û ji ber tanekê bêjimar kes dişewitandin, serpêhatiyên wan tev bihîstibûn. Mêrxasên weha Kerr û Kulik bûn, Îbo Beg bû, Reşoyê Silo bû. Meriv ku bêrûmet bû, bêar bû, wê çima bijî? Kî jiyana weha pêpeha pêpez nake, nade bin lingan? Belê gerek heta roja dawiyê bi hevre, li hemberî axa bisekinîna. Di dilê çend kesande dilipitî ku mêraniya xwe nîşan bidin. Xwe dixistine dewsa Kerr, Kulik, Îbo Begê Parsinî. Hela ka heta dawiyê dikaribûn biçûna? Anjî wê xwe bi şûnve bikişandina, hevalên xwe pêşda bidehfandina. Canê xweyî şêrîn xilas bikirana. «Ca-

nê xweyî delal xilas bike, dîn nebe», gelo eva dîtina bi gelekanve nîn bû?

Hemû dilşa bûn, ji bo qerarên ku tevayî dan. Hamo jî tûj tûj xeberdan, tinaz û qîrîna cîranên xwe ji bîr kiribû, baxişandibû. Ew û çend malên dinê jî eşkere kirin ku cîran çawa dikin, ewê jî bi wanre bin.

Xeberdan xilas bûn. Tendûrekî çûne malên xwe. Qerarên xwe dabûn êdî. Li malan, hinekan li dar û çoyên xwe digeriyan, hinekan dixwastin tiştnê dinê tivdarek bikin.

- Hate heta vê dera me êdî. Em bîhnteng bûn di vêderêde. Hela ka wê debanca min bîne.

Jinên wan ji bin stêr û sandoqan debancên li pîna pêçayî dianîn. Hinekan darên nûyên baş didîtin, wê çaxê yên destê xwe diavêtin, diguhêrandin. Hemû jîr bûn, «çi dibe, bira lezekî pêşde bibe», digotin.

Leze-lez hatin nava gund, li wir civiyan. Li darên destê hev dinhêrîn. Çavên wan li ser yên ku dihatin bûn. Paşê darên xwe, her bêtir dişidandin. Didane çêran.

Zarên piçûk li ser xaniyan, li ber deriyan bûn. Bi meraq mêze dikirin, notilanî lîstikeke xweş wê dest pê bike. Çend jinên pîr jî di nav mêrande bûn. Dilteng bûn, lê dîsa jî cesaret didane mêrên xwe. Niha hemû yekdil bûn. Hema yekî bigota «ha», her tişt ji destê wan dihat. Yekî ku biqîriya, bigota, «de em herin li ser mala Ûsiv axa, lêxin bikujin», hemûya wê bi hevre bireviyan. Di dilên hinekande derbas dibû ev karan. Wê mala wî û traktor di nîv saetêde bi erdêre bikirina yek. Çend kesan dixwastin ku bira her tişt zûtirê bibe. Lê kî wê biqîriya û bigota? Li hêwiya wê bûn. Tu kesî ev pirsa ku giştan hêvî dikir, negot.

Yekî kal, di nava gundde, li ser kevirekî, zivirî û cemaetêre weha got:

- Hûn dibînin, em gişt li vêderêne. Eva nîşan dide ku em erdê xwe wisa hêsa nadine kesî. Yê ku ji me tê hêvî kirinê, ew jî eve. Heke ku em bi hevrebin, pişta me nayê erdê. Lê hûn hemû zanin, we giştan dîtiye, derbas kiriye. We rojên teng û fireh dîtine. Meriv hema ji nişkêve şer nake, li hev naxe. Di dawiyêde poşman dibe meriv. Pir caran tiştên giran, mezin ji destê meriyan derdikevin. Hûn rind dizanin, hinek dixwazin ku yekî bitirsînin, lê wî dikujin. Ji bo wê, berî lêxistinê, gerek em hemû rêyan biceribînin. Paşê em dikarin bi Ûsiv axare şer bikin. Li hev xistin bi zend û daran dibe, şikir ji xwedêre, ew jî bi mere heye. Binhêrîn, di nava nîv saetêde em çiqas civiyan? Wisa nîne? Em dikarin dîsa bicivin? Lêxistinê gerek em di dawiyêde bînin bîra xwe. Baş bifikirin, rind hildin û daynin vî karî. Heke ku hûn dixwazin, niha em

herin wî şîkat bikin. Herine wîlayetê. Xwedê nekirî, lê em yekî bikujin, emê gelek şerpeze bibin. Zar û zêç li ber dîwaran, di kuçande tî û birçî wê parsê bikin.

Ji paşve dengek:

- Dîsa şîkat. Careke din jî şîkat? Qet kesî li ruyên me nenihêrîn û guh nedane me. Me çi zû ji bîr kir?

- Bisekinin hevalno, bisekinin lo. Bira bipeyive. Bira peyiva xwe xilas bike.

Bi vî tehrî çendek li hember derketin.

Nû, dîsa hinekên dinê kuştin, anjî bê kuştinê, li hepsande rizandin, li ber dîwaran şerpeze bûyîn hate ber çavên gelekan. Lewra kîngê ku ew cîranên xwenî kal guhdarî dikirin, destên wan mînanî berê şiv û dar neşidand û sist dibûn. Hela hê kalê gotinên xwe xilas nekirî, yekî dinê dest pê kiribû jî.

- Qet kes tunebe jî... Heke ku ez bi tenê neçim, bi serê xwe, li hember nesekinim, ez bênamûsim. Lê belê rast dibêje. Em wisa bikin ku di dawiyêde poşman nebin. Poşmaniya dereng bê xêre. Kêrî karekî nabe êdî. Tu ku di dawiyêde poşman bûyî, çi xêra wê heye? Lewra hemû rêyan biceribînin, rind bifikirin, ya rastî eve. Bi lihevxistinê, axa bi mere nikare serederiyê bike. Bira dawî başbe, dawî.

- Oro hûn çi zû guhurîn? Çibû? Mînanî ceniyên xam, bîhna we qediya. Kar hat li ser lêxistinê û dara, we dîsa xwe da alîkî. Şerme şerm. Ev kirinên we eybin. Em bê abûr bûn, ji ber ruyên hinekên mînanî we. Xwedê bela xwe bide yên ku guh didine yên mînanî we û tênê vir.

Xeberdan dîsa tev hev bûn. Bê rêz bûn. Ji hevre, «tirsonek, genefis, heval bi nîv rêde hişî» digotin.

Dihate xuyanê ku tevayî, yekitî êdî xirab dibû. Mînanî şerê koran bû. Bendê gloka rîs tev hev bûbû. Her diçû, yên ku dixwastin ji axêre bêjin ku «dest ji erdê me bikşîne, nêzîk nebe» û şerê axê bikin, kêm dibûn. Şik û şibhe dihate nav wan.

Soro xwast ku cîranên xwe nerm û ser rast bike.

- Hela bisekinin hevalno. Deqîqekê. Destûrê bidin min.

Deng kurt û kêm bûn. Çend kes bi tûje tûj li ser hevdû diqîriyan. Tirsa Soro ew bû ku piştî van xeberdanan cîran li hev xin. Lewra xwest ku, wan bide îna kirinê, baweriya wan bide nûkirinê.

- Binhêrin, hûn dibînin. Hela hê qet tiştekî mezin nebûye, me dest pê kir ku em hevdu bixwin. Tu dibêjî ku em hatine vira ji bo ku li hevdu xin. Şerm bikin, fedî bikin cîranno. Ji xwe fedî bikin. Emê her tiştî bi hevre bikin. Emê bi hevre xeberdin. Tûj û tehl jî xeberdin lê bi hev-

dure şer nekin. Hine cîran dibêjin ku werin em baş bifikirin. Yên ku di dawiyêde bêne kirinê, ji nahave nekin. Ev ne tiştekî hêsaye. Bi zûtirê qerardayîn zehmete. Bi van gotinên xweve ne neheqin. Na. Na xêr. Ji erdê heta ezmana heqê wan heye. Me gilî kir, lê belê qet kesî jî bersiv neda me. Me serê xwe li kîjan kevirî xist, dîsa jî nebû. Dibe ku mehkeme kêrî me bihata. Lê me ew rêya neceriband. Gelek pere dixwast. Em jî tirsiyan. Dibêjin ku wexteke dûr û dirêj dixwaze. Caran qasî emrê merivekî dikşînin. Her roj mesrefeke nû tê pêşiya me. Raste, ev rê jî heye. Em dikarin vê jî bifikirin. Lê ne bi serê hevdu şikestandî, ne bi çavên hevdu rijandî. Hela em bisekinin bira apê Mihê gotinên xwe xilas bike. Hela ka çi rê dide pêşiya me? Bihêlin bira feqîrê feqîr dawiya pirsên xwe bîne.

Hemû nerm bûn. Baweriya kesî bi mehkemê tune bû. Lewra. Bi salan çûyin û hatin, zanemêr û şahid, pere û nizam çi çi. Dîsa jî bi beza mûristanekê pêşde nediçûn. Meriv aciz dibûn, sed carî poşman dibûn ku li vî karî walyane. Ne bira ev kara bibiya ne jî ev mehkeme û kûçiksaniyan, digot meriya di dawiyêde. Niha hêk hatibû di qûna mirîşkêde asê bûbû. Lê dîsa jî kesî mehkeme nedianî bîra xwe. «Mehkeme wê ji mere çi bike» digotin. Kin û kurt pêşiya gotinan digirtin.

Li pey Soro, Xalê Mihê mînanî ku «binhêrin, hûn hatin li ser gotina min», li dora xwe nihêrî û got.

- Li wîlayetê kesên mezin û baş hene. Bi xwe serê xwe kar kirin ne başe. Em wan pêpez dikin bi vî teherî. Nasekî minî tacîr heye, nasên wî pirin. Abûqatên dostê wî hene. Tacîrekî bi namûs û başe. Ya rastî em di nav xwede peran bicivînin. Çend heval bira herin, bipirsin, xeber bidin. Bi abûqatan bişêwirin. Bira herine hukumetê, mehkemê. Wê çaxê emê pişta xwe bidine cîkî qewî.

Hinekên ku dixwastin li hemberî vê pêşneyarê derkevin, awqasî li ser nesekinîn. Roj lêbû here ava. Ji ber vî qerarê nû, hemû çûne malên xwe ku peran bînin. Di demeke kurtde du sed zêr civandin. Jinan zêrên serê xwe, ber kofiyên xwe û ji hustiyên xwe derxistibûn û dabûn. Niha çima dema xemilandin û kincên xweşik li xwe kirinê bûn? Rojên mirin û mayinê, rojên xîretê bûn. Hemûyan çi ji destên wan tên, gişt anîn û dan. Bi vî teherî giştan xîreteke bi namûs anîbûne cî û şa dibûn. Soro û Mihê, navê yên ku pere didan, nîşan dikirin. Qet ji hinek malan bawerî nedikirin, ku pere wê bênê. Jinên wan zêrên serê xwenî, ji mala bavê xwe hatî, dianîn. Çavên meriyan tijî hêsir dibûn. Hinekan dizanibûn ku paşê dîsa pere wê bênê xwastinê, lewra hindik hindik didan. Ji bo careke din bira çend qurişên wan bimînc.

Nişkêva rewşa gund ne baş bûbû. Gundî hemû civiyabûn ku li zeviyên xwe bibîne xwayî. Ûsiv axa her tişt dît û bihîst. Nava awqas gundiyande xwe bêkes û tenê didît. Bê taqet bû. Lê wekî ewên tî û birçî ji nişkêve rikêf bikin û li wî xin? Wê çi bikira? Ew, kurê wî, çend xwarzî û xulamên wî bûn. Xulam kurê xelqêne. Berî hemûyan ewê bihatana û pêsîra wî bigirtana. Van rojan bi dilbaziyên wan nayên derbaskirin. Bi pêle pêl li dora xwe dinhêriyan. Giran giran û hêdî hêdî dixebitîn. Çawa merî bi wan bawerî dike?

Gazî kurê xwe kir. Teme dayê ku bira tivdarekên xwe bikin, ji bo xulaman jî debance, kêr, dar, hine tişt bira bin destbin.

Gund dikeliya. Hinekan gund tev didan. Bûbû hêlîna xirabiyê. Di van demande, yekî ku meriv qet tiştekî jê bawer nake, nişkêve dibe mêrxasekî û kes nikare li pêşiyê bisekine. Hema carekê, yên weha bira xwe nedine ser rê. Pêş çavên xwe nabînin. Kes wan ji riya wan nikare vegerîne. Wisa bê wijdan dibin. Lê dixin û her tiştî dikin. Tu dibêjî ku bîst salin li benda vê rojêne. Mala axê di tirs, şik û şaş bûnêde bû. Hişê wî tev li hev bû. Malek, yê çawa bi gundekîre serederî bikirina? Jin û zarên gund, çawa bi çavên dijminan li wan dinhêriyan, hate bîra Ûsiv axa. Bi kesî nîşan nedayî, li kuçan, ber dîwaran, di bin çavande mêze dikirin ku binhêrin çi dibe û çi dikin? Wê niha bênê. Aha li ser hatinêne. Tirpe tirpa dilê wan bû. Şev merivên wan ên bi îtbar, wê xeberên rast bianîna. Kê çi digot û çi dixwastin?

Ew tiştên ku axa jê ditirsiya, qet yek jî nebûn. Gundiyan Soro, Xalê Mihê û du kesên din dişandine wîlayetê. Yên ew tacîrê ku Xalê Mihê nas dike, bidîtana. Derdên xwe jêre bigotana û li ser rêberbûna wî bi abûqatekîre xeber bidana.

Ûsiv axa rojtira dinê, piştî şeveke bêxew û xewnên xirab, çû bajêr. Çû cem dostê xwe, qumandarê cendirman. Tirsa xwe û gundî çi dixwazin binîne serê wî, ji qumandarre got. Hine pere jî da qumandar. Rabûn tev çûne cem qeymaqam. Yekî digot, wî dihişt û yê dinê dest pê dikir. Ji qaymeqamre yek û yek gotin. Gundî çi dixwazin bikin û armanca wan çiye? Rind baweriya wî anîn ku gundiyan dixwast tiştekî giran, xirabîke mezin bikin. Gerek ew rind bihatana perçiqandinê. Meriv çiqasî bi sebir û nermayî dixwaze ku bi wanre rê here, lê dîsa ew nasitirin, pir pêşde diçin. Çend kes li gund hebûn ku wan aqilbendî dikir. Fesadî dixistine nav gund, wan gundî ji rê derdixist. Van nedihiştin ku cîran gund bihêlin herin. Digotin ku «eger em yekbin, emê berî axê bidin, hestiyên wî hûr hûrî bikin.» Hukumet û qanûn qet talaşa wande nîn bûn. Qelemek di destê qaymeqamde bû, him pê di-

leyst, him jî xwere pê hinek şikil çê dikir. Civata li wîlayetê hate bîra wî. Li wêderê dûr û direj xeberdabûn ku erdê bidine gundiyên bê erd. Piştî civatê misteşar çi gotibû, mînanî niha ber guhê wîde bûn. Te digot ku, di sêrîde nû dibihîse. «Em hemû rêber, meselên nû dernexistî, rewşeke baş bidine pêşiya xwe û xelqê. Qanûn gerek li ser her tiştî bin. Emrên qanûnan gerek bêşik, bêguman bênê cî. Hukumatê derd û meselên nû nedixwast. Lê gerek destûr nedin ku gundî karên bêqanûnî bikin.»

## –XXIX–

Her çar hatin dikana tacîr Xelef, nasê Xalê Mihê. Berê awqas dewlemend nîn bû. Dihate gundan berx, pez, hirî û genim dikirî. Tacîrê her tiştî bû. Waxta rûn û penêr, bi merivên xweve dihat, bi hespan, ereban dikişand dibire bajêr. Car caran perên wan pêşîn dida û gundî dibir li bajêr malê wî dida wî. Carekê duda hatibû gundê wan jî. Paşê kîngê Mihê tiştin dibir li bajêr bifroşe, ew didît. Qet xeberdanên bê kar nedikir. Bi yekîre qise dikir û ji yekî dinre karek digot. Ji zimanê gundiyan rind fem dikir. Rind zanibû ku çavên wan bi çi bahayiyê, wê ji dikana wî çi bistînin. Mînanî kefa destî xwe zanibû gişt. Gundî ji cem wî, tiştek nekirî an jî tiştek nefirotî dernediketin. Li vanderan, ji sê, çar tacîrên herî mezin yek jî ew bû. Kesî nizanibû çiqas perên wî hene. Bê hesab bû malê wî. Hemû kes, jêre deyndar bûn. Mîna berê êdî ne li ser xwe bû, kal dibû.

Dikana wî, nava sûkêde, ji jorve çûyinê, li destê rastê bû. Gelekî fireh û bilind bû. Bi tiştan tijî bû. Kinc, pirtî, çi digerî dikarî bibînî li vira. Hemû tiştên dinê jî. Li aliyê pêşîn, ciyê tiştan dide û peran distîne. Ji bo ew merivên, ku wê tiştan bistînin, bo rûniştandinê cîkî direj bi textan çêkiribûn. Yên ku cî nedidîtin, li ser piyan diman. Di dawiya dikanêde derîkî din hebû. Ew derî vedibû li aliyê herdu enbarên mezin. Deriyên van embaran li aliyê dinê, riya pişt dikanê dinhêrî. Li wê derê hirî, penêr, rûnê gundiyan dihate pîvandinê. Nivîsdar û berdestiyên wan diçûn, dihatine hundir. Tişt dikişandine embaran. Çûyin, hatin hetanî nîvro dikişand. Paşê dihatine hundir û hesabê wan dikirin. Kesî mecal nedidît ku tacîr Xelefre dûr û direj xeber bide. Yek dihat û yekî din diçû. Nivîsdar derheqên tiştên nû pîvandî dipeyiviya. Kurê wî, heqê tiştan dinivîse, bersivên bavê xwe digîhîne wî.

Ew ku hatin dikanê, hundir tijî meriv bûn. Xelef kaxizek li pêş, gundîkî tişt kirîbû, wî jî bihayên wan dicivand. Xelef yên nû hatî bi serê xwe silav kir. Bi reqemên kevn dinivisî û li ser hev kom dikir. Li pêş, nêzîkî wî du mêr û jineke bi salzêde hebûn. Dibe ku diya wan an jî xwîşka wan mezin bû. Qumaş, lêçek, kincên hundir sitandin. Jinikê çend mêtro patisqe xwast. Tivdareke dîlanekê, daweteke dikirin, çibû? Ewqas tişt ji malekêre zêde bûn. Dibe ku wisabe. Tiştên xwe pêçandin û derketin. Yên nû diketine dorê. Li ser namila wî heqîwek hebû. Kêm tişt sitand. Ji kinc û halê wî kifş dibû ku yekî feqîr bû. Bi tengasî hinek tişt xwast.

Xelef bi metro dipîviya.

- Çend mehan şûnve berxan bi ter û can dixwazim ha, got.

Gundî, çavên wî, xênji pirtiyê ku distîne, tu tişt nedidît.

- Çi dibêjî Xelef axa? Ew yê tene. Çima ezê xêra bavê xwe bidime te? Lê evên ku ez dibim çine?

Xelef him dipîviya him jî ducar dikir ku ji bîr neke. Yek xilas kir û got:

- Çi zanim? Paşê li pey te nême gund! Li pey te nepirsim paşê!

Gundî tiştên xwe berev kir. Xelef defter tevda û li cîkî deynê wî nivisî. Gundî dîsa zivirî û:

- Rema xwedê li bavê tebe Xelef axa. Tu dikarî tirpaneke şakirof jî bidî min? got.

Tirpanên şakirof, yên herî qencin. Ji birrînê û damîşbûnê, ser wanre tirpan tunenin. Ji yên din zêdetir têne kar kirinê. Him jî çend sal. Hertim nedihatine dîtinê. Bi dest nediketin. Xelef axa giran girt, lê bi lavakirina yê dinê damîş nebû. Ji jêr, ji qutîka texte, yeke çar numre derxist û da gundî. Ew jî li defterê nivisî. Wê çaxê dîsa hinek hatin û hinek çûn.

Tendûrekiyan ciyên vala dîtin, rûniştin. Xwastin ku tenê bimînin û derdê xwe jêre bi xweşik bêjin. Çend kesan dîsa tişt kirîn. Xelef ji van çar kesan, tenê Mihê nas dikir. Ew jî ne pir. Wekî mişteriyên xwenên dinê. Yên ku weha pêşde nedihatin, şûnve disekinîn, Xelef ew rind nasdikirin. An qîza xwe didine mêr, an jî kurê xwe dizewicînin û bi deyn tiştan dixwazin. An jî ji bo karekî, peran deyn dikin. Lewra ji nihava mî, berx, rûn, genimên xwe difrotin. Perê xwe bi pêşve distandin û diçûn. Yên weha bêtir kêrî Xelef dihatin. Bi erzanbiha distand û giranbiha difrote wan. Dor hate tendûrekiyan. Nû bi sêrîde hevdu silav kirin. Bi sare sar hal û xatirê hev pirsîn.

Mihê:

- Xelef axa, derdekî me bi gundîtî heye. Em hatin bi te bişêwirin. Ûsiv axa dixwaze ku erdê me ji destê me bigre. Gelo tu dikarî alîkariya me bikî? Şikir ji xwedêre, tu mezinî. Hemû kes te nas dikin. Li hukumetê, li mehkeman gelek dostên te hene. Rêkê nîşanî me bide. Berê xwedê, paşê me tu gotî, em hatin.

Hinekên nû hatin. Herkesî tiştek dipirsiya. Xeberdana wan dihate birînê. Xelef têgihîşt ku ev tiştekî tevîheve. Ya başî ew bû ku nîvro, wexta navrojê, çend deqîqên xwe bide vî karî û ew guhdarî bikirana. «Dema ku ez mezin hesab kirine, hatine cem min, gerek ez wan guhdarî bikim. Wê lezekê bikşîne. Dibe ku tiştna jî bistînin, bi deyn peran bigrin. Ev başin û gura meriya dikin», got bi xwe xwe.

- Hûn dibînin ku gelek karê me heye. Karê we, heke hûn dixwazin, çend saeten şûnde, bi karberdana nîvrode em xeberdin. Dereng nemînin. Hûn dibînin ku çiqas tên û diçin.

Tendûrekî şa bûn li ser vê pêşneyarê. Rast digot Xelef, di nav awqas kesande, her yek tiştekî dibêje, meriya nikaribû derdê xwe ji hevdure bêje. Ne tu dikarî bêjî, ne jî ew dikare guhdarî bike.

Mihê:

- Way xwedê ji te razîbe. Tu çawa baş dibînî, bira wisabe. Li ser serê me. Em dereng namînin. Tu me hazir bixwaze.

Xwe bi lez avêtine der, çend kesên din diketine dikanê.

- Xalê Mihê, ev çito tacîre? Way bavo, ev çiqas dewlemende? Çend merivên wî hene, hey lolo. Hewqas malê min hebe, ne wisane? Kincên qenc, xaniyên rind, xwarinên xweş, -paşê kenya- jinên bedew yê merivan dibin.

Yê pêşiyê:

- Lê tu halê wî dibînî. Qet ne dilxweşe. Ji yekî distîne dide yekî dinê. Na, gelo çi hat, gelo çi çû? Tu dizanî qet di meriyande hiş dimîne?

Li tevî qelebalixa sûkê bûn. Diçûn.

Soro:

- Min ev bihîstibû, lê nedîtibû heta niha. Dibe ku berê dihate aliyê me jî, nayê bîra min. yekî jîre, dijware. We ferq kir qet? Çiqasî bilıa jî bêje, kes li hember dernakeve. Ji bo ku bi deynbe, wehaye. Malê xelqê jî, ew çawa dixwaze bi wî bihayî dikire. Yên wilo dijwar dibin. Tiştên ji destên wan neyên, tunin. Hela ka ji mere wê çi bêje?

Xalê Mihê bersiva wî da.

- Dayin û sitandine ev. Kara meriya têde tunebe, kî qurişekî xwe dide? Perên xwe nade cîkî dinê. Tê, malê xwe dide te. Piştê çend mehan tu heqê wî didî. Wê kar bike. Paşê, tu bi zorê nafroşe kesî. Yên

ku distînin, bi dilê xwe distînin, birakê Soro. Karê van jî eve. Hişê me vana hilnade.

Soro:- Raste Xalê Mihê. Perê me tunebe, qûna me jî tazîbe, emê ji xwere derpîkî, şalekî bikirin. Wê çaxê hinekî kêm, an jî hinekî zêde, kes lê nanihêre. Deweta kurê xwe an jî qîza xwe bikî. Gayê te miriye, tê gakî bikirî. Kurê te nexweşe, jêre pere dixwaze. Tê dîsa wê çaxê bêyî, tiştekî teyî firotinê hebe, tê erzan bidî. Ew ku peran bide, wê bihayê wan tiştan jî bi qîma dilê xwe bêje. Ez dibêjim, bi herdu seriyande jî kara wiye. Çi me re? Gotina teye, gundiyên feqîr bi dilê xwe distînin. Kêmasiya wan heye, çi bikin? Çi mere lo? Pirsek bû min got.

Li pêş yekî kibabfiroş derbas dibûn. Devê wîde cixare, kirasekî bi qirêj lê bû. Çavekî wî ji ber tavê venedibû, ruyê wî ji heftekê zêdetir dirêj, pêncî salî dihate xuyanê û diqîriya:

- Kerem bikin. Begê min keremkin.

Yekî zik berdayî, pêsîra kirasê wî bi rûn û qirêj, wisa nîşan dida ku qasî kibabên ku difroşe, awqas jî dixwar.

- Keremkin, ha kerem kin. Ha werin, ha werin.

Derî vekirîbû, bîhna goştê qelandî dihat. Li ruyên hevdu mêze kirin. Zikê wan birçî bûbû. Hînî qelebalixê nebûbûn û hişê wan diçû. Nêzîkî nîvro, êdî sist bûbûn.

Bajarî, kincên xweş lê bûn û zû zû diçûn. Rengê kincên wan çiqasî delal bûn. Jinên bajariyan, te digot qet tav nedîtine, bi xeberdan diçûn, li cem hinekan zarên wan hebûn. Ser û porê wan vekirî û lêvên wan boyax kirîbûn. Mil û zendên wan negirtî bûn. Tendûrekiyan him diçûn û him jî li dora xwe dinhêrîn. Di bin çavande li xelqê dinhêrîn ku gelo kes li wan mêze dike an na? Qet telaşa kesî nîn bû. Kesî ew nedidîtin. Jinên bedew ku didîtin, bi hevre henek dikirin.

- Oro ev bajarî jî dijîn ha. Jinên wan çi xweşikin?

Hingî kibabfiroş diqîriya, «kerem kin ha, kerem kin» digot, damîş nebûn, ew jî ketine hundir. Li ser masan mişembe hebûn. Tarîlk, çetel û kevçî danîne ber wan. Feqîran kîngê bi çetelan xwarin xwaribûn? Soro li Edenê mabû, wî zanibû. Lê yên dinê? Bêdeng rûniştin, nedixwastin ku tiştekî şaşî bikin. Zarekî piçûk, çilmisokî, westiyayî, bi pînekî ser masê paqiş kir û dest pê kir, jimart.

- Goştê mînanî serê çivikan, kibaba Edenê, kibaba bi badilcan, kibaba di tasêde, kiftên petî...

Hemû di derbekêde li ser hev rêz kirin.

- Keremkin begê min. Çi dixwazin?

Qet tu tişt fem nekiribûn. Gişt jî kibab bûn. Ev yeka fem kirin. Soro ew ji şerm kirinê xilas kirin.

- Careke din bêje, lê hêdî hêdî.

- Keremkin begê min. Goştê wek serê çivikê. Kiftên petî. Kibaba Edenê. Kibaba bi badilcan. Kibaba di tasêde.

Soro qerar dabû, ku kibaba Edenê bixwaze.

- Bira ya min, kibaba Edenêbe.

Lawik li aliyê yên din zivirî.

- Lê hûn? Edene xweşe. Ji were jî bînim?

Hemûyan qebûl kirin, serê xwe hêjandin. Garson dîsa jî li ser piya bû.

- Bira çend hewbin, begê min? Yek an du hew? Bira çilo be?

- Bira yê me gişta jî yek û nîv be, got Soro.

Garson çaryek nan da ber wan û çû. Paşê qedeh û di şûşekêde av anî.

- Niha, hema zûtirê, kibabên we tênê, got.

Tendûrekiyan hîn nebûbûn, awqasî zêde li hêviya xwarinê bisekinin. Berê li nanê mînanî pemû û qedîfe nihêrîn. Paşê bi destên xwe teselî kirin. Bi tirs perçekî piçûk jê kirin, avêtine devê xwe. Çend deqîqe şûnde li pêş wan nan nemabû. Kibabên Edenê anîbûn. Kibabeke dirêj û nivê wî jî li cem bû. Wekî fedî nekirana, li cîkî dinê bûya, wê di carekêde hemû biavêtina devê xwe. Qet meriv bi vî têr dibe? Soro ji wanre got, bi nan gerek zikên xwe têr bikin. Ewî çilo kir, yên din jî wisa kirin. Di bîhnekêde xwarin, xilas kirin. Bi serde av vexwarin. Birçîbûna wan hinekî kêm bû. Lê belê têr nebûbûn. Heqê kibaban dan, derdiketin, garson darên nav diranan anî. Yên dinê, di bin çavande, van darên ziravok dinhêrîn. Soro çend hew hildan û kirine berîka xwe. Li derve ji hevdure:

- Tu çima nabêjî ku li bajêr her roj hemû birçî digerin. Xwedê ne giravî, me yek na, yek û nîv kibab xwar. Bi navê xwedê, bîst hewên wilo bixwim, dîsa jî têr nabim. Hezar carî şikir bikin, ji bo halê meyî gund.

- Te dît, çiqas jî pere diçe? Way. Way.

Hêdî hêdî berjor, berve aliyê dikana Xelef çûn. Nedixwastin ku jê dûr bikevin. Qederekê geriyan. Dikanan yek yek deriyên xwe digirtin. Wê çaxê têdigîhiştin ku wext hatiye. Çûne cem Xelef.

- Zû bikin, zû bikin. Bi nîvro hemû der têne girtinê, digot Xelef.

Çend gundî, di hemêza wande tiştên ku kirîbûn, ji dikanê derdiketin. Xelef ji yê cem xwere:

- Xepeng û derî bigre kurê min, got.

Xepeng nîvcî berjêr kiribûn. Hundirde niha Xelef û tendûrekî tenê hebûn.

- Hela karê xwe bêjin, ji minre. Hûn mêze dikin ku, kar zefin û giranin. Hela hê ezê herim malê jî.

Ji Mihê pirsî. Xalê Mihê her tişt ji sêrîde xwast bêje, lê hinek ji bîr kirin û hinek jî bi xwe jêre negot.

Abûqat Fihat hate bîra Xelef. Fihat beg dostê wiyî baş bû. Ji dûrvebe jî, bi qîzeke mêrivê wîre zewicîbû.

- Di nava awqas karîdebe jî, ezê bi were bêmê, bi abûqatre xeberdim. Çi ji destê mim bê, ji bo we, şûnve nahêlim.

Bihîst ku li cem wan du sed zêrên zer hene, bêtir nerm bû. Dostî nîşanî wan da.

- Ezê ji malê bizivirim, hêviya min bisekinin, em tev herin cem abûqat Fihat beg. Li vê derê abûqatê herî mezin, bi nav û deng, ewe.

Ji cîkîre telefon kir.

- Yildiz xanim. Hûn çewanin?

- Belê ezim. Xelef. Fihat beg li male gelo? Deqîqekê. Sipas dikim.

- Elo. Fihat beg. Merheba begê min. Çawanî, başî? Na. Na. Heke ku tu nîvro şûnda, li ciyê xwebî, çend dostên min hene, ji bo karekî wan, min xwast serîkî bidime te. Belê. Belê. Sipas dikim.

Fihat beg, wê nîvro şûnde li hêviya wan biya.

Tacîr Xelef ji bo tiştekî bi xêr dihate cem wî. Fihat beg wisa texmîn dikir. Lewra zûtirê çû dayra xwe. Berê jî Xelef beg çend kar şandibûn cem wî. Hemû jî karên baş bûn. Karên ku perên wan zêde bûn. Hetanî li pey çend dewan diçî û têyî, deweke bi giranbiha bigre, her baş dibe. Xelef beg di alîkîde jî merivê wî dihat. Gere wisa bikira. Lê belê, Fihat beg jî ji bo karê wî hertim serê xwe êşandibû û jêre hurmet dikir. Dostên herduyan jî zanibûn ku Xelef ji Fihat û Fihat ji Xelef hez dike. Qet hevdu neêşandibûn. Car caran di wan şevên zivistanê dirêjde diçûn malên hevdu, dihatin.

Karê Fihat begê, bi abûqatî baş çûbû. Paşê dest bi tiştên dinê kir. Kêderêde, çi kêrî wî tê, baş dizanibû. Di nav abûqatande gelek caran qala wî dikirin. Dostê walî bû. Hakim û sawciyanre hevaltiya wî hebû. Mezinên wîlayetê, pêşde hatiyên van aliyan, yên ku bi polîtîkayê kar dikin, giştan Fihat beg nêzî xwe didîtin. Niha li bajarên der doran jî bêjimar dost û dilxwestiyên wî hebûn. Zû zû rê diçû. Jiyan hez dikir. Piçekî qelew bû. Eniya wî bê por bû berê, lê niha serê wî hema hema tût rût bûbû. Rengê wî hewekî vekirî, çavên wî hêşîn bûn, ne hêşîntîke wisa tarî. Ji wîlayeteke dinê hatibû vir. Li vira cî girtîbû. Çi bigirta

dibire sêrî. Te digot bersivên wî, di bêrîka wîdane. Abûqatekî bi nav û deng bû. Karê wî her ku zêde bû, dora wî fireh bû, êdî mînanî berê li pey dewên xwe nediket. Wexta dewe digirt, ji herdu aliyên ji dostên wî, dixwastin ku alîkariya wan bike.

Li ser riya ku diçe hukumetê, otêleke mezin û di bin otêlêde jî, çend dikan didane çêkirinê. Her otêl çêdibû û bilind dibû, perên destê wî gişt hêdî hêdî diheliyan. Ev merivê ku awqsî bi aqile, çito nizanibû, ji bo vî karî gelek pere wê biçûyan? Zanibû. Lê belê gelekan bi xeberdanê alîkarî kiribûn. «Xwedê alîkariya yên ku xanî çêdikin dike» gotibûn jêre. Çend dostên wî yên dewlemend, alîkarî kiribûn. Hinekan jî bi deyn tiştên ku bi kêrî wî tên, dabûnê. Lê, ya rastî ev karê ku xwe dabû ber, giran û fireh bû. Li alîkî jî, xwastibû ku di pênc, şeş mehande vî tiştî mezin xilas bike. Ji bo dewan diçû bajarên der doran, li vegerê zûtirê direviya ser çêkirina otêlê. Ji wir dibeziya mehkemê, ji mehkemê diçû ji bo tiştên ku nedihatine dîtinê. Di van rojên dawiyêde westiyayî û bê taqet bû. Heke deweke bi giranbiha, îro, sibê bi dest biketa, wê pir baş bibiya. Telefona Xelef begê ew hêvîdar kiribû.

Xelef beg û tendûrekî ku ketine hundir, Fihat begê ew li ser piyan kerem kirin. Xelef beg, li cem xwe da rûniştandinê. Ji yên dinêre jî cî nîşan da. Çend gundî, piştî mehkemê, wê biçûna gundê xwe, Fihat ew bi rê kirin.

Xelef û Fihat qehwe, yên dinê jî çay vedixwarin. Halê hevdu pirsiyan. Xelef bi zimanekî nermik jêre got, ev nasên wî û ji dikana wî dan û sitandina xwe dikirin. Ji bo erdê, xweyî derd bûn. Xwast yê mayî jî ew bi xwe bêjin.

Gelo kî ji wan wê bêje? Lewra li ruyên hevdu nihêrîn. Di dawiyêde Soro dest bi qalkirinê kir. Abûqat Fihat beg gelek baş guh didayê. Xelef beg, li hinek pirtûkên bi reng dinhêrî, tev didan. Car cara jî serê xwe bilind dikir, li ruyên wan mêze dikir, nîşan dida ku ew jî guh didê.

Soro got ku tapiyên wan tune bûn. Qeydên tespîtê jî nîn bûn. Lê belê li cem Ûsiv axa bi xwe jî tune bûn. Meqbûzê, kaxizên bêşdayinê tenê hebûn li ba axê. Paşê qala wan kaxizên ku gundiyan mor kiribûn kir. Wê çaxê Xelef kete nav xeberdana wan.

- Dilxwastina min ji te ewe ku tu erdê wan, bê kuştin û bê şer bidî wan. Li ber peran nekeve. Xwedê nîşan nede. Heke yekî bikujin, anjî bênê kuştinê, xirabiya giran ewe.

Fihat begê eniya xwe bi destmaleke sipî zuha kir û got:

- Na lo. Na lo. Dewa wan awqasî jî ne bêgumane. Aliyê dinê jî mînanî wane. Tu ferq tune di nava wande. Di dest wande, pirtûkên ku bi kar bên tunenin, lê belê di dest yên dinêde jî nînin. Bes ku çend merivên kal bibînin. Ji wan gundên der doran. Wan deran rind nas bikin, cî bi cî nîşanî hakim bidin. Zaneyên bi sal wê di vê dewêde rê nîşanî hakim bidin. Bi destûra xwedê emê ji bin vî karî derkevin. Bê şer û bê kuştin. Wê herin li ber zeviyên xwebin. Çend rojan berê min deweke mînanî vê heq kir. Lê tiştek tenê heye, dibe ku hinekî dirêj bikşîne. Dewên erdê, zevî û mêrgan wilone. Na keşfa wan, zaneyên wê derê, na nizanim çi, bi salan dirêj dibin. Yeke din, hûn dizanin ku dewên weha dirêj, hinekî jî bihane. Gelek pere dixwaze.

Bi qelema destê xweve him dileyst û him jî dixwast ji ruyên wan fem bike, hela ka çi difikirin. Ew çi dibêjin? Di dawiyêde wê tiştekî ku bê qebûlkirinê, bigota.

Xalê Mihê:

- Xwedê te bihêle. Xwedê ji te razîbe. Em têdigîhêjin, bi destê te karê me, wê here sêrî. Lê belê tiştek heye. Niha, hetanî dawiya mehkemê, kî wê van zeviyan bajo? Emê zeviyan biçînin an Ûsiv axa?

Tiştekî qet ne baş dipirsiyan. Dewe wê dûr û dirêj bikişanda. Heke axa, wê zeviyan biajota, wê çaxê çi dikete destê wan? «Nemire kera min nemire, bihar wê bê». Hevalên wî jî bi meraq li çavên Fihat û Xelef began nihêrîn.

Soro:

- Ya rastî, eger dîsa axa wê zeviyên me bajo, hela hê dewe neqedyayî emê bimrin herin. Me jî bihîst, hine dewe bi dirêjiya jiyanekê dikişînin. Ew hakim diçe, yekî din tê. Yê nûhatî, hinekî hîn dibe bûyerê, ew jî diçe paşê. Yek wê qerar bide, «de wêde here lo, çi ji minre, bira yekî dinê qerar bide» dibêje, diçe.

Fihat begê dît ku evî porsor, rû zer, ji van tiştan fem dike, ne awqasî nezane.

- Raste. Dilê meriyan hilnade. Li welatê me mehkemen zûtirê naşixulin. Gelek kes jê zirarê dibînin, got Fihat begê.

Xeberdana xwe ajot, xwast ku Xelef jî heq bide wî.

- Heke nebû, di pêşiyêde emê deweke din jî vekin. Dewa pêşîgirtina zirarê. Wekî bikaribim hakim razî bikim, wisa zêde pere nexwastî jî, meriv dikare bîne cî. Ji bo qîmetê zeviyan, genim û cehên ji wan zeviyan tê hildanê, meriv hine pere radizîne li cem hukumetê.

- Belê. Belê. Perên ku pêşde bê razandinê dixwaze, got Xelef begê û li sacta xwe dinhêrî.

- Îro jî pir karê min hebû. Ez gelekî li vir mam. De karê xwe bi qerarekîve girêbidin lo.

Fihat begê, baxişandina xwe dixwast, destê xwe bire eniya xwe. Bi heyşt hezara wê ev kara qebûl bikira. Bi tevayî wê erdê gundiyan ji destê axê derxista. Ev jî ji bo xatirê Xelef begê qebûl dikir.

Gundiyan heyşt hezar bihîstin, te digot derzî têre kirin. Li ruyên hevdu dinhêrîn. «Çi dibêjî, em çi bikin?» dipirsiyan bi çavên hev. Niha şaşbûnek li ser gundiyan bû. Xelef begê got:

- Hûn qerar bidin hela. Xwedê jê razîbe, emê ji Fihat begê rica bikin. Hûn feqîrin. Ji bo we, meriv hinekî dîsa kêm dike. Zû bikin. Ev karan pênc zêde anjî pênc kêm dibin. Gund wilo hêsa nayê, nakeve kefa destê meriya.

Mihê:- Walle me jî Xelef beg ji xwere mezin got û em hatine vir. Gundî ev du salin perîşanin. Ne mînanî berêne. Niha pêncî mal tenê mane li gund. Lewra em dixwazin, gerek gunehê we bi me bê. Ji mere tiştekî kêm bikin. Wallehî di destê mede tune. Hûn nizanin em di çi halîdene? Me zêrên serê jinên xwe anîn. Bira qeda serê webe. Yekê me, ji duduyê xelqê çêtire. Di destê mede tune, em çi bikin?

Fihat begê got, ku karê wî girane, nikare bi tehrekî dinê bike. Xelef beg rabû ser piya.

- Belê, belê, ez jî reca dikim. Ev merivên başin. Pir tişt hatine serê wan. Bira bi heft hezar û pêncsedî bibe ev kara.

Sekinî. Li ruyên gundiyan nihêrî. Nikaribûn tiştekî bêjin. Serên wan di berde, sermilên wan nizm bûn. Kerr bûn.

Xalê Mihê:

- Belê, de bira wisabe. Waxta hûn wilo dixwazin, bira wilobe. Xelef beg, te wisa gotiye, em çi bêjin? Wallehî gelek geleke ji bo me. Lê... Çi bikin em?

Fihat beg:

- Na xêr. Na xêr. Ne geleke. Xelef begê çi xwast, bira wisabe. Ji kesên dinêre ji deh hezarî kêmtir nedibû. Li ber wî, zimanê min negeriya. Nikarim zêde bêjim. Lê, ezê niha pênc hezara pêşîn bistînim. Du hezar pêncsedê mayî jî paşê.

Xwast ku her tiştî kuta bike. Hinek kaxiz anîn. Gundiyan pêçiyên xwe lêxistin, mor kirin. Ji bo ku wekaleta xwe bidin, ew bi lawikê li cem xweve şandin ba notêr.

Xelef beg jî çû. Tendûrekî ji notêr zivirandinê, wê biçûna dikana wî. Karê wan li notêr zû qediya. Bi şûnve hatin, Fihat beg û çend merivan, bo deweke mêrkuştinê xeber didan, bihayê dewê dibiriyan. We-

kalet hilda kire cîkî. Nav nîşanên yên dinê, di demeke firehde wê bihata û bistanda. Wexta ku bo keşfê hate gund, wê çaxê jî dibû.

Dema ku pere xwast, Mihê, zêrên di destmalekêde pêçiyayî, ji paşila xwe derxist. Hûrkirina pera û zêran Xelef dikir. Bi çi diçe zêrê Reşadî? Bihayên zêrên Cimhûriyet bi çine? Fihat ji Xelef begêre têlefon kir. Jê reca kir ku tendûrekiyan dişîne cem wî, pênc hezar paqnotê wî bira li ba Xelefbe. Xwast bira di dawiyêde jêre têlefon bike. Destê wan girt, wê rojtira dinê dewe vekira. Li bajêr ev kar wê baş biçûna sêrî. Bê şer û bê derd wê xwayî erdê xwe bibûna. Gerek bi vê bawer bikirana. Paşê dîsa zivirî li aliyê nû hatiyan, li ser dewa wan qise kirin.

Wê çaxê zêrê Reşad çil û neh, pêncî paqnot dikirin. Xelef zêr bi çilpênc paqnota hûr kirin. Pênc hezarê Fihat begê hilda û jêre têlefon kir.

Karê tendûrekiyan xilas bû, lê êvar jî hatibû. Zêrên mayî di paşila Xalê Mihêde bûn. Pir kar qedandibûn îro. Abûqat girtibûn, pirseke bi bawer jê sitandibûn. Perên wan wê biçûyan, lê wê xwayê erdê xwe bûna. Abûqat wilo gotibû. Him jî qûşê li axê biqetînin.

Wan salan heft hezar û pêncsed paqnot gelek pere bû. Him jî gelek gelek pere. Di xewna xwede bidîtana, dîsa jî bawer nedikirin. Hema bira tenê ji erdê xwe û ji ciyên xwe nebûna. Bi tehrekî dinê nedibû. Malên xwe hurneşînin û neçin. Li xeribiyê, di nav xelqêde jin û zar bê abûr nebin.

Çend sal bûn ku partiyên nû çêbûbûn. Demirqirasî digotin û partî çêdikirin. Ji bo heqê gundiyan, zilma cendirman, memûrên bêş kom dikirin, gelek tişt dihatine xeberdanê. Gerek kesî zorbetî li ser kesî nekira. Mirteza dostê Ûsiv axa bû. Ew jî di partiyêde bû. Lê birabe, çima xênji wî kesekî dinê tune? Hema di dinêde Mirteza tenê heye?

Tendûrekiya nedixwastin ku bi şev li wir bimînin û pera bidine otêlê, aşxanê û qehwexanê. Hatin ciyê ku kamyon, otobos lê disekinin.

Bi kamyonekê hatine bajêr. Di kamyonêde torbên çîmentoyê û hesinên xanî çêkirinê hebûn. Rê ne baş bû. Di kortikande her quloz dibûn û hesin di ciyên wanre diçûn, diêşandin. Ji bo ku nekevin, xwe bi textên dorê girtibûn, cara serên wan lê diket. Ji bo ku şewqên wan nefirin neçin, hetanî guhên xwe daxistibûn. Rê piçekî baş dibû, rêwiyên ku berî wan hatibûn li kamyonê rûniştibûn, yek ji wan dest pê dikir, kilam digot. Şev, dereng hatine bajêr. Lastiga kamyonê teqyabû û guhartina wê ew dereng xistibûn.

Soro wan pir westiyayî, hal têde nemabûn. Hatine xanê. Di quncikekî xanêde şev derbas kirin. Hîn nebûbûn ku dereng razên. Him jî

westiyayî bûn, zûtirê ketine xewê. Abûqat ji wanre gotibû, ku qet meraq nekin. Lewra ew jî baş razan. Karê herî baş anîbûne cî û vedigeriyan gund.

Van rojan Fihat beg gelekî hewcî peran bû. Pirsên bi bawer û germ dabûne tendûrekiyan. Ew jî, bi hêviya van pirsan, ketine xeweke giran. Çi bikirana feqîran? Pênc hezarê wan zûda çûbû, ciyê xwe dîtibû, li ber deynê hesinan anjî çîmentoyan. Perê xwe çawa jî dilop bi dilop xerc kiribûn. Zikên xwe jî bi dilê xwe têr nekiribûn.

Dane ser rê, ku herin gund. Gundiyên wan dihatine ber çavên wan. Wê çilo bihatana pêşiya wan? Mînanî meriv diçe pêşiya mêrxasan. Wê ew guhdarî bikirana û devê wan binhêriyan. Bi van fikran him xeber didan him jî diçûn. Li xanê derheqê vî karî, ji kesîre tiştek negotibûn. Nedixwastin zûtirê here ber guhê axê. Merivên wî bira nebihîsin. Lê wakî yek here karê wan xirab bike?

Ji dûrve gund hate xuyanê, bê hemdî xwe, gavên xwe sivik kirin. Giran giran hatibûn. Xalê Mihê kal bû, nedixwastin ew bîhnteng bibe. Li ser avan sekinî bûn, bîhna xwe hilda bûn. Xalê Mihê, cara destê xwe dibir paşila xwe, zêr teselî dikirin. Heke ew nebiya, yên dinê niha zûva gihîştibûn gund. Çi bike? Xwedê çavê kalbûnê derxe. Taqeta çokên wî ne mînanî berê bûn. Ka ew rojên berê. Şev û roj rê diçû, dîsa jî meriya nizanibû ku rêwîtî kiriye. Hê lez, nêzî gund bûn. Gund rind dihate xuyanê. Li aliyê jêrê mala Ûsiv axa, baxçê wî... Li jorê mala Hesen, Hemzo û mala Eyo. Dûyê wan zirav zirav quloz dibû.

Bîhna Xalê Mihê diçikiya.

- Lawo çi li we qewimiye? Kafir li pey wene, berî we didin, çiye? Hûn dixwazin, min bikujin? got, yên dinê hêdî hêdî sekinîn.

- Hûn xortin, ne kalin. Dibe we bîra jinên xwe kiribin? Lo lawno, kes ji destê we narevîne, netirsin. Lezekê şûnde hûn li cem wanin.

Hemû keniyan. Soro:

- Xalê Mihê, henek li alîkî. Te pir bîra xaltiya Almastê kiriye an na? Tu wê zêde hez dikî an xaltiya Besê?

- Herdu jî yekin. Piştî awqas salan çi ferq dike? Hêla hûn jî kal bibin. Hûnê bibînin, hûnê ji xortan bêtir bîrê bikin. Eva ne mîna bîranîna ciwanane. Wekî hevaltiya salên dûr û dirêj, mînanî ku meriv hînî hev dibe. Çilo meriv hînî cixarê dibe, lê digere.

Henek dikirin û diçûn. Lêbûn têketana gund. Qerar dan. Wê biçûna malên xwe, demekê bîhna xwe hildana. Xeber bidana cîranan, li oda mizgeftêde kom bibana. Paşê, çi kiribûn, çi bihîstibûn, wê ji gundiyên xwere bigotana.

Li pêş gund, dengê traktora nû dihat. Ji serîkî zeviyê lêdixist û serê dinêre derdiket. Wexta ketina nava gund, dengê zaran û heywanan tevîhev dibû. Zarok reviyan hatin pêşiya wan. Yek dudu ji wan dixwastin ku pêşde birevin, li deveriya erdê ketin. Di nav tozêde man. Pozên wan bi firtix, porê wan hewîrdor kur kirîbûn. Bi porê serê wanve nivişt anjî hinek istêrk û şiklên dinê bi hesin, zeliqandîbûn. Li ser namilên wan, morî û pişkokên bi reng dûritîbûn. Qet li qûna kesî derpê anjî şal tune bûn. Kirasê wanî dirêj dewsa her tiştî digirt. Hemû reş û qemitîbûn. Ruyên wan li ber tavê qelişîbûn. Lingên wan wisa reş bûn, meriya ji xuliyê ferq nedikir berê pêşîn. Zarok direviyan cem nêzê xwe. Xalê Mihê zar pir hez dikirin, dev û pozê kê paqişe, lê nedinhêrî, hemû hemêz û maç dikir. Ji berîka xwe şekirên gilover derdixist, dida wan.

Dîsa anîne bîra hev, wê çilo bikin. Li ber derên gelek malan jin û zar bi meraq li wan mêze dikirin. Hinek damîş nedibûn, dipirsiyan.

- Hûn xêr hatin Xalê Mihê. Xêr hatin Soro. Xwedê bike hûn bi xêr û silamet hatin. Xeberên xêrê nehe qet? Li mizgeftê? De bi xêrbe, li mizgeftêbe. Bira, bira. Hûn hinekî bîhna xwe hildin. Emê hayê bidine hemû cîranan, digotin hinekan.

Paşê di nav xwede:

- Eger tu li ruyê wan dinhêrî, çûyina wan mêze dikî... Tiştin bûne, xwedê zane.

- Belê, hatina wan xêrê nîşan dide.

- Tu nabînî, Xalê Mihê jî mîna xortan bi rê diçû.

- Tu Xalê Mihê nenihêre, berê wî li aliyê pîranbe, hertim wisa diçe. Niha li malê, wê xwe bide nazan. Qet nebêje. Yekê gorên wî derxe, ya din wê bi ava germ lingên wî bişo. Wê bêje, way, way. Of... Hela werin, hinekî pişta min miz bidin.

- Kîjan ne wisane çima? Hûn wî hildidine ser zimanê xwe. Erê çima tu ne wiloyî? Navê wî derketiye, digotin.

Vê demê Tendûrek pir xweş bû. Te digot kulîlkên, gulên hemû dinê li dora vî çemî rêz bûne. Çiya û banî, van rojan hêşînin li vir. Hênikayîke şêrîn heye. Germayên ku meriyan diqelîne hela hê nîn bû. Wexta şîr, penêr, rûn danînê bû. Van rojan dinê şêrîn û xweşe. Kal û pîran, «ox, pişta me piçekî germ bû, dinê heye» digotin. Hemû kes bi hevre dikenin û henekan dikin. Keç û xortên ku ji hevdu hez dikin, di van rojande dikarin pirsekê dudan bi hevre bêjin. Şevên zivistanê yên dirêj, cîran çûbûn hatibûne hevdu. Niha hemû kes di nav jiyanê û re-

wşeke dinêde bûn. Dixwastin, jiyan hertim weha şêrîn here. Lê belê, van rojan jî hêdî hêdî dest û lingên xwe dikişand.

Dîsa li oda mizgeftê... Vê carê her zêde kes, bi meraq rûniştibûn. Ji hemû malan meriv hebûn. Tijî bûn. Hinekên ku wê roja berê nehatibûn, di nav cîranande ciyên xwe hilda bûn. Berê Soro hat. Cîranan bi hurmet silav danê. Halê wî pirsiyan û xêrhatin gotin. Cixare fermû kirin. Paşê yên dinê jî hatin û çûne aliyê jorê.

Xalê Mihê mînanî ku çîroka dibêje. Wek bûyareke berî gelek salan berê bûye, digot. Çawa çûne dikana Xelef. Li wira çi dîtine, yek û yek, qet tiştek ji bîr nekirî digot. Paşê derbasî kibabên Edenê bû. Tam û bihayê wan, nîvbirçîmayina xwe jî ji bîr nekir.

- Dinê dîtiye. Xatirê meriyan zane. Heqê kesan, hûqûqa hemûyan baş zane. Xelef beg rabû, kar û tevdera xwe hîşt, bi mere hat. Abûqatekî baş, dijwar. Jîr. Min jêre got, paşê Soro got. «Ev çawa dibe? Çawa erdê we dikare bajo» got. «Bê şer û bê lêxistin, hûnê li gundê xwe bibine xwayî» got. Xelef begê jî, «ev dostên minin, reca dikim li ser karê wan baş bisekine» got, jêre.

Hemû di meraqêde bûn. Çavên gelekan, li ruyê Xalê Mihê dinhêrîn. Qet nedilipitîn. Nedixwastin ku pirsekî jî winda bikin, ji xeber- danê.

- Xwedê jê razîbe. Şîrê helal mêtiye, got yekî.

- Paşê abûqat got, mizgîniya min ji were, «emê vê dewê pêk bînin. Dewên wilo yên zevî û mêrgan zû xilas nabin. Dirêj dikşînin. Lê belê dawiyêde, sedî sed emê biserkevin.»

Dîsa yekî:

- Bira dawî başbe, tiştek nabe, bira hinekî derengbe. Bira tenê gund têkeve destê me. Me awqasî sebir kir, çima em nikarin hinekî din jî bisekinin?

Yekî din:

- Qet negot, wê çiqasî dirêjbe?

Yekî kal nikaribû pêşiya meraqa xwe bigre.

- Oro, hevalno. Hûn çawa di zikê diya xwede sekinîn? Bise, bira mêrik bêje. Xilas bike gotina xwe.

Xalê Mihê dest pê kir:

- Emê ji gundên doran, merivên zana bibînin. Abûqatê nava çend rojande wê dewê veke û keşfê derxe. Ji bo vî karî Xelef beg jî kete navê, heft hezar pênc sed paqnotî razî bû. Karê gundekiye. Pir mezin û girane. Him abûqatekî bi nav û denge. Digotin, abûqatê weha deh û

panzde hezaran kêmtir mêze nakin. Pênc hezara niha, yên dinê jî emê paşê bidinê.

Yekî, duda «way bavo, çiqasî pere distînin!», «way dayê way, gerek meriv bixwanda û bibûya abûqat», digotin di ber xwede.

Zêr çilo kiribûne pere, qal kir. Zêrên dinê, destê xwe avête ber piziya şalê xwe derxist, da pêşiya xwe. Hinek jî perên kaxiz. Zêr û pere tev, di destmalêde peçiyayîbûn. Ji bo keşfa gund paşê wê bihata xerçkirinê. Cîranan qerar dan ku pere, zêr li cem wî bimînin. Bi vî teherî hertişt di riya xwede diçû. Lê ji nav qelebalixê dengek hat:

- Niha Ûsiv axa qet nasekine, zeviyên me dajo. Çima abûqat nikare wî bide sekinandinê? Evê çilobe? Zevî dîsa di destê wîde. Em jî, ji dûrve, wekî pisik li goşt dinhêrin, mêze bikin? Wê wisabe?

Te digot, nûve ji xewê hişyar bûn. Gava dinê awqas tiştên baş dianîne bîra xwe, gişt nişkêve çûn. Vêdrokek ava sar li ser serê wande kiribûn, te digot. Veciniqîn. Hişyar bûn. Belê wisane, axa erdê me, li pêş çavên me bajo, em jî mînanî berfa biharê hêdî hêdî bihelin. Xilas bibin. Çiye, çi nîne? Abûqatê ji mere erdê şûnve bistîne.

Xalê Mihê li dora xwe nihêrî. Tûka xwe daqultand. Bersiv ji dêv dernediket. Cîranan dît ku ew wilo şaş û metele, her zêde li ser vî karî sekinîn.

— Xalê Mihê, we gelek tiştên baş anîne cî. Başin, baş bûne. Qet nebe, bira Ûsiv axa jî dest nede zeviyan. Wexta em najon, bira ew jî najo.

Gava dinê, mînanî kesên ku gelek tişt birine sêrî, xeber dida Xalê Mihê. Niha tiştekî bi aqil nedihate bîrê. Bilde bilda zimanê wî bû. Tiştek meriv jê fem nedikir, dikire mirtinî. «Abûqat got ezê pêk bînim. Emê ji mehkemê bixwazin ku tedbîrê îhtiyadê bidin ser zeviyan...»

Di dawiyêde Xalê Mihê qal kir ku abûqat ji bo vê pirsek nedabû. Zivirî li aliyê wan hevalên xwe, ku pêre çûbûne wîlayetê. Li hêviya alîkariya wan bû. Soro serî di berde, nedixwast bipeyive. Hemû metel û şaş bûn. Çend kesan dixwast ku dengê ew kesên ku li hember derdikevin, bê birrînê. Mihê wekî ku elektrîk dane canê wî, ji nişkêve rabû ser xwe.

— Bisekinin. Bisekinin. Piştî du roja, zêde zêde piştî hefteke abûqatê bê bajêr. Dibe bê vira jî. Em gişt pêre xeber bidin. Bêtir hêsa dibe wê çaxê.

Ev piçekî kete hişê gundiyan. Dema abûqat tê, wê bi tevayî pêre bipeyiviyan. Piştî van peyivan dîsa jî:

— Çûn, hemêzek zêr, pere dane abûqat.

— Destvala zivirîn, hatin.
— Ûsiv axa bi dilê xwe zeviyan dajo.
— Heyfa perên meyî çûyî, got hinekan.
— Bisekinin, we çi lez û beze? Hûn hertim wehane. Piçekî sebir bikin.

Bi van pirsan hinekî nerm bûn. Hemû kes, her tişt tevîhev bû. Bi vî halî çûnê malên xwe. Hinek şa dibûn, wê bê şer û bê kuştin li erdê xwe bibine xwayî. Dereng bi dest keve jî, dîsa baş bû. Wekî dinê nedibû. Perê wan wê bi çûya. Lê çi bikin? Xwedê weha nivîsî bû. Ma di jiyana xwede pere dîtibûn? Wisa hînî vê feqîriyê bûbûn ku dikarîbûn vê belengaziyê demeka din jî bikişînin.

Heke ji yên li hember sekinî dipirsî; her tişt tût û rût û bê xêr bû. Tiştekî vikî vala bû. Lê perên wan, zêrê serên bûk û jinan... Hêviya wan, ev zêrên di hustiyê jinande bûn, ew jî bê kar û bê xêr çûbûn der. Ev kara wisa bi hêsanî hel nedibû. Heke abûqat bê û pêşiya çandina Ûsiv axa bigre, dibû. Eger hakim, bêje «ne ji were û ne jî ji axêre», wê çaxê dîsa dibû. Wilo dikete hişê wan. Bi curekî din nedibû.

Piraniya cîranan bi şik bûn. Bihîstibûn ku mehkeme bi lihevnehatina li ser erd, gelek caran herdu aliyan jî dide sekinandinê û erdê bi wan nade ajotinê. Hê jî zanibûn, mehkeme ji destê herdu aliyan jî digre û heta dawiya mehkemê, dide yekî bi îtibar. Wekî weha nebûya, belengaziya wan wê her biçûya, heta hetê. Ji alîkî din dîsa difikiriyan, «mehkeme awqas şerên li ser erdê, çawa pêk tînin? Bi taybetî jî karên mînanî yên me... Mehkemê wextekê bikşîne, keşf wê bên. Şahid û merivên zana, di dawiyêde, heqê kêbe, wê bidine wan. Ji vê wêde wê çawa bikirina? Roja pêşîn bi def û zurne, werin ev erdê weye, hûn rast dibêjin, nedihate gotinê.

Van fikrên cure bi cure dihatine gotinê. Di nava sê çar rojande abûqatê wan hate gund. Fihat beg di jîpeka kevnde hat. Xortek pêre bû. Şewqe li serî, di lingande solên nerm, şalê wî yê siyariya bû. Ne bi dilfirêqet bû. Şoferekî ji bajêr, ew anî bûn. Gundiyan şofêr nas dikir. Wexta hatine nava gund, di qasekêde hewîrdora wan tijî bûn. Kîngê ku li Xalê Mihê pirsîn, gundiyan fem kirin ku yê hatî, abûqatê wane. Nava gund ji nişkêve pir qelebalix kom bû. Xalê Mihê bi lez, bi bîhn çikyayî hate wir û dît, Soro û yên dinê jî li wirin. Şewqê Mihê di destde, abûqat silav kir. Xwast, abûqat bê hundir, fermo kir, lê wî qebûl nekir. Wê zûtirê biziviriya.

— Min dewe vekir. Ev kar hate cî. Min hakim jî razî kir. Vê şemiyê, li zozana Berwarê, keşfa wir heye. Wê here wir. Ewê di vire der-

bas bibin, herin. Hê ku payiz û zivistan nehatiye, ezê keşfê jî bikim, got. Zivistanê pir zemet dibe. Min jê reca kir. Memûrê qadastroyê, wê krokiyê, planên wan mêrg û zeviyên ku hûn dibêjin, çêke.

Di vê demê, li xortê ba xweve zivirî:

– Yên ku navnîşanên wan, ne li cem mimin, bira tilya xwe li vir xin an jî mora xwe. Ji bo wekaletê. Wan jî bigîhînime hakim. Heke hûn bikaribin, çend kesên bi emrê zêde, yên ku van deran dizanin, bibîmin pir baş dibe. Hakim gerek, wan guhdarî bike. Ew jî bira li vêderêbin.

Paşê bagêr bû.

– Na xêr. Na xêr. Niha ji wan merivên zana dest berdin. Vê carê nabe. Nikare wan guhdarî bike. Krokî û planan bide çêkirinê, vê carê gund nas bike, besî meye. Ji nihade gerek hûn jî, ji gundên dora we, merivên kal û zana tivdarek bikin. Paşê yên kêrî me bên. «Em ji diya xwe bûn, nebûn, em zanin ku ev der yên gundiyanin, ne yê Ûsiv axanin. Ew cîranên hevin.» Gerek wilo bêjin.

Hetanî wê demê, karê wekaletnamê qediya bû. Fihat beg dixwast, zûtirê bifilite û here. Lê yekî xort:

– Abûqat beg. Ev Ûsiv axa erdê me dajo. Ev kar wê çilobe? Wê hema usa weha bajo?

Fihat beg ji pirsiyara wî qehirî û pirçiyê xwe kir. Berê xwast, wî bi qehir bide kerrkirinê, paşê bagêr bû.

– Wê jî difikirim. Gerek bi hakimre bipeyivim. Bi destûra xwedê emê wê jî têxine rê.

Yê dinê hê jî nedisekinî û pêşde diçû.

– Eman eman begê min. Heke ku ew bajo, paşê halê me wê çilobe? Ez xwe dawêjime dest û lingên te begê min.

Fihat beg li aliyê şofêr zivirî, serê xwe jêre bakir ku bira xwe bide ser rê. Xortê dinê kaxizên destê xwe didane ser hev.

– Ber xwe nekevin. Ev kar wê herin sêrî. Duh yek, îro dudu. Hîn çi bû? Her tişt wê bê cî.

Ev peyivandin û ev kar gişt nîv seet tenê girtin. Jîp di ciyê xwede zivirî û dûr ket. Abûqatê wan, destê xwe ji jîpê derxistibû, tendûrekî silav dikir. Gelek ji wan hêvî nedikirin ku abûqat wê awqasî zûtirê bê. Vê hatinê, dilşayî û bawerî da wan. Her çiqas hinek pere dabûne jîpê û xortê ku navnîşan kom dikirin jî. Ew nedihatine bîra kesî. Ji rû û çavên wan dilgeşî dihate xwendinê. Dema gundî dihatine cem hev û nêzî hev dibûn, bêtir bi hevre şêrîn bûn û bi zimanekî xweş bi hevre dipeyiviyan.

Piştî çûyîna abûqat, kesên dora Xalê Mihê qederekê bela nebûn, li dorê man. Ew dîsa dilgeş, ser bilind bû.

— Çiqasî dijware. Xwedê zane wekî şêrane. Tu nanihêrî, çi zûtirê keşfê tîne gund. Hûnê binhêrin, ev kara pir dirêj nakşîne. Him jî wê di demeke kurtde pêk bîne.

Yekî li cem:

— Belê, kifşe. Tu mêrik nabînî, di karê xwede çiqas jîre? Pênc deqîqa vala nasekine. Tê xuyanê bavo, tê xuyanê. Wilo dijwar nînbe awqas pere wê jêre ji ku bê? Çima qet bi destê me nakeve? Kurê bavan xwendine, ciyên mezin dîtine. Qanûnan giştan jiber zane. Lo bavo, te dît mînanî me şewqe dabû serê xwe.

Yekî dinê kenya:

— Tu wisa lê nenihêre. Ew di wextên rêwîtiyêde, diçine cîkî, wehane. Tu wan li bajêr bibînî, meriv metel dibe, ava devê merivan diçe. Em diçine bajêr, şewqe û çakêtê hevdu deyn dikin. Ew tênê gunda, ji bo ku xwe ji toz û qirêjê biparêzin, wilo li xwe dikin.

Ji vê hatinê, gundî û Fihat beg dilxweş bûn. Lê belê agir ketibû Ûsiv axa. Dilê wî tijî tirs bû û dilerzî. Heta niha di mehkemande karê xwe rind biribû serî. Lê dîsa jî ditirsiya. «Ezê pêk bînim dibêjî, mêze dikî ku te her tişt ji binîva winda kiriye. Hine abûqatên mînanî şeytanan hene. Li ser, binê qanûnan wilo tev didin ku hişê kesî hilnade. Çi dikin dikin dewê bi aliyê xweve dikşînin. Lê wekî ev kurê kerê jî wisa bike? Paşê wê çawa bibiya halê wî? Gundî êdî ew li gund jî nedihiştin. Carekê bi meriya bikaribin, êdî her roj li hustiyê meriya siwar dibin.» Qaymeqam, qumandarê cendirman li aliyê wî bûn. Lê dîsa jî meriv baweriya xwe pê nayne. Îro ji tiştekîre «erê» dibêjin, sibetirê bê minet dizivirin û dibêjin «na». Revî çû bajêr. Bûyerên nû, ji qumandarre got. Qumandar bi dilê wî dipeyivî, bîr û baweriya wî nûjen dikir. Lê dîsa jî kurm ketibû hundirê wî carekê. Kurman dilê wî dikola.

Mirtezayê partiya nû dît. Mirteza keder û tirsên Ûsiv axa di cîde nedidît. Di dawiyêde gundî wê destvala vegeriyan. Kir nekir Ûsiv axa ji şika xilas nedibû. Mirteza, Ûsiv axa hilda, li wîlayetê çûn cem abûqatekî ji wan û nas. Wexta ji cem wî derketin, Ûsiv axa êdî rind fem dikir ku vî erdî kes wisa bi hêsanî nikare ji destê Ûsiv axa bigre. Hela ka paşê wê çi bibe? Eger pêwîstbe, abûqat wê bihata, têketa dewê. Niha bi rehetî vedigeriya gundê xwe.

Gund wekî ava zelal bêdeng û di halê xwede dijiya. Gundî li hêviya abûqatê xweyî dijwar bûn. Wê hakim û memûrê ku krokî û planên mêrg û zeviyan çê dike, bianiya. Çawa hebe wê di dawiyêde li erdê xwe

bibûna xwayî. Lewra ne hewce bû, nepakî û levxistin çêbibe. Bira ew nebûna sebebên xirabiyan. Lê Ûsiv axa jî li wîlayetê ji merivên zana pirsîbû. Qet şika wî tune bû... Rind bawer dikir, ev erd yên wîne. Kes nikare ji destê wî bigre. Memûrên bajêr jî li aliyê wî bûn. Qumandar pirs dabû, wekî pêwîstbe, wê ji berê xirabtir ew bikuta, bihavêta feleqê. Çawa hebe dawî kifş bû. Ewî di mehkemêde winda nedikir. Lewra bê aqilî dibû ku bi gundiyanre şer bikira niha. Ew çi dikin bira bikin, difikirî Ûsiv axa.

Abûqat bi wanre, ji bo şemiyê gotibû. Gundî li benda wî bûn. Îro kefşa gundê wan bû. Îro hakim û memûrê krokî û plana, wê bihatana. Dibe ku hemû kes yek bi yek zeviyên xwe nîşan bidin. Derdê xwe bêjin. Lewra hemû dilgerm bûn. Gelekên wan, sibê zû rabûn. Rûyên xwe kurkirin bi kêrên ji tirpanên kevn hatine çêkirinê, anjî bi cilêtên ku xwe pê bîst sîh carî berê kur kirine... Ew cîletên kevn, di hundirê qedehande bi pêçiyên xwe dizivrandin û tuj dikirin.

Lê kar, qet jî wekî ku wan hêvî dikir, nebû. Wexta abûqat dewe vekiribû, hakim ji bo ku navnîşan kêmin, wê rojê qebûl nekiribû. Lewra abûqat hatibû gund, navnîşanên kêm tivdîr kiribû. Hakim ji abûqatre gotibû, her tim memûrê krokî û plana nayê dîtin. Wê şemiyê li zozanê Berwarê kefş heye. Heke karê wir zû biqede û memûr jî bi xwere bibîne, dikare krokiyên zeviyên Tendûrekê jî çêke. Ew jî li ser dil û xwastina memûrê krokiyê bû. Fihat begê di dilê xwede, firset ev firsete got û spas kir û wê şemiyê ewê jî pêre bihata gund.

Abûqat, carekê ji hakim sozek girtibû. Hela hê hakim, wê ewraqê dewê bixwanda û lê binhêriya. Paşê wê ji herd aliyanre jî, roja mehkemê elam bikira. Bi xwe jî wê hinek ewraqên nû tivdarek bikira û bida mehkemê. Dawî êdî hêsan bû.

Hakim yekî hema hema xort bû. Salê wî ne zêde bûn. Roja şemiyê, sibe zû, hakim dît ku ev abûqatê kêmfirset, li wî digere. Hate bîra wî, bi xwe qewl dabû abûqat. Tiştek negot êdî.

Abûqat baş zanibû ku ne wiloye, weha nayê kirinê. Lê dîsa jî wilo kir. Rind zanibû ku mehkeme wisa hêsan hêsan dest pê nake. Çiqasî zûbe, dîsa jî wê sê çar meh bikişanda. Paşê, wê bi mehan şûnveavêtin, bihata. Niha wê gundî pê bida kerr kirinê.

Hakim, memûrê krokiyê, nivîsdarê hakim û abûqat Fihat beg, xwe dane rê. Wexta hatin Tendûrekê, gundî hemû li benda wan bûn. Pozê hakim gilover, bejn kin, kincên kevn lê bûn. Meriya nizanibû, rengên wan hêşînin an gewrin. Hakim, dema gundî di vî halîde dît, piçekî şaş bû berê. Gelo çima wisa di meraqêde bûn? Çima li benda wan

bûn? Li hatinê, di rêde virda wêda peyivîbûn. Fihat beg gotibû ku wî serîk dabû gund. Hate bîra wî.

Jîp sekinî, berê hakim, paşê abûqat peya bûn. Te digot, ewê keşfê çêke, wê vê lezê qerarê xwe bide. Bi vî tehrî li der dora xwe dinhêrî abûqat. Hakim şermoke, ne mîna Fihat begê bi teşaxuz bû. Got ku dixwaze zûtirê ji zozana Berwarê vegerin. Wê memûrê krokî û planê, paşê li cem wan bihîşta ku krokiyên erdê wan çêke. Bi tevayî dîsa bi rê ketin.

Karê wanî Berwarê zû qediya bû. Kevrê reş hidûd nîşan dabûn. Ew der dîtibûn. Ji zanemêrên ji herdu aliyan jî pirsî bûn. Memûrê krokiyê, kevrê reş dîtibû û di krokiya xwede nîşan kiribû. Paşê ji wir rê ketibûn. Memûrê krokiyê, zanemêrê mehkemê bû, wê li vegerê gotinên şahidan jî bixwanda û paşê dîtina xwe ji mehkemêre binivisiya.

Dema vegeriyane Tendûrekê, ew qelebalix dîsa li benda wan bûn. Him hê jî zêde bûn. Ew zeviyên ku qal dikirin, nîşanî hakîm dan. Hakim dît, wê dirêj bikişîne.

— Letîf beg, heke tu jî di cîde dibînî, tu Fihat begêve li vir bimînin. Tê xuyanê, wê gelekî bikşîne. Karê min pire. Jîp bira vegere paşê we bîne. Wisa ne başe? Qisûrê mêze neke.

Letîf beg hînî van halan bû.

— Birabe. Belê. Tu çilo dixwazî bira wisabe. Him jî li vêderê bîhna te wê teng bibe. Ya rastî jî wê dirêj bikşîne. Me carekê got «erê». Me qewl da. Hela ka ezê çawa bikim? —Di bin çavande, li Fihat begê mêze kir. «Me ji ku got erê» digot nihêrandinên wî.

Gundiyan bi lava û gazin, tasek avdew bi hakim dane vexwardinê. Ewî nivîsdarê xwe jî hilda û bi rê ketin. Berî çûyina xwe gazî muxtar û Şukriyê nobedar kir. Ji wanre got, bira alîkariya Letîf begê bikin.

Letîf begê, hinek şikil çêdikirin li ser kaxizan. Sêkoşe, çarkoşe. Hinek jî qet mînanî tiştekî nîn bûn. Li dora wan şiklan, navê cîranên ku xwayê zeviyên dorê, meziniya zeviyan, navê wan deran dihate nivîsandinê. Gundiyan berê bi meraq li van krokiyan mêze dikirin. Di pîvandinêde alîkarî dikirin, virde û wêde diçûn, dihatin. Lê belê gundî ne li hêviya van krokiyan bûn. Wan dixwast ku zevî ne yê Ûsiv axa, yê wanbin. Hêdî hêdî bîhna wan teng bû ji van çixîzan. Letîf beg bi krokî çêkirinê westiya. Fihat beg, li ser lingan diçû, dihat. Jîp vegeriya û li benda wan bû. Gundiyan dixwastin, tiştna ji abûqat bipirsin. Fihat begê zanibû ku carekê meriva rû da dest, êdî şûnve hildan ne wisa hêsaye. Lewra wisa ji wan dûr, piçekî sar sekinî ku kes tiştekî jê nepirse. Caran dihate cem Letîf begê, caran berve çemê piçûk, ji ber gundre der-

bas dibe, diçû. Mala axê, traktora ku kar dike, ji dûrve dît. Dawiya vî tiştî tune bû. Tiştekî vikî vala bû. Dewa van gundiyên bê aqil, tiştekî badilhewa bû. Qet tiştek di destê wande nîn bû. Bi serde jî axa, gelek karên xwe di serîde şidyayî girtîbûn, heq kiribûn.

Ne tiştekî giran bû, zehmetê Fihat begê ev car tenê bû. Nava mehkeman her car, çend meh digirt. Heke karê wî yên dinê hebûna, dikaribû rapor ji doxtir bistanda û bişanda mehkemê. Çend meh dîsa dibuhurî bi vî tehrî. Ev tişt wehane.

Abûqat birçîbû, ewî û Letîf begê penêr, mast xwarin. Herdu jî, li firseteke xilasbûnê û çûyinê digeriyan. Gundiyan xwast, ku tiştekî şerjê bikin, wan qebûl nekir. Gelek lava kirin ku berxekê bikin sêleqelî. Fihat beg û Letîf beg nedixwastin ku dereng bimînin. Karên wan qediya, bi lez û bez çûne cem jîpê ku herin, ew xortê wê rojê, dîsa hate pêşiya wan.

— Begê min, zeviyên me têne ajotinê. Emê çi bikin? Niha ajotinan wan wê bisekinê an na? An jî hema usa wê bi vî tehrî here?

Fihat beg dema ku wê xilas bibûya, hatibû girtinê niha. Him jî li cem Letîf begê. Ne nas dikir, ne jî hevalê wî bû.

— Hûn dibînin, em çiqasî li ser karê we dixebitin. Dora wê jî wê bê. Ev çito ciye? Kal û rûsipî disekinin, xort û ciwan xeber didin. Ne ji gotinan, ne jî ji guhdarî kirinê fem dikin. Tiştê weha bêteşe çiye lo? Hûn nabînin ku ez çilo dixebitim?

Çend kes ketin nava xeberdana wan:

— Ew zare begê min. Xorte. Qisûra wî mêze neke.

Abûqat nerm bû hinekî. Firset neda, kes tiştekî nû bêje.

— De bi xatirê we. Di xêrêde bimînin.

Bi rê ketin. Hinekî pêşde jîp sekinî. Fihat beg peya bû, yên dinê di hundirde man. Çendek berve wî beziyan çûn. Xalê Mihê pirsî. Ewa û yekî dinê, wê rojê pêre hatibû cem wî, ew ji yên dinê piçekî dûr xist. Xar bû, di guhên wande got:

— Axê vê carê hinekî bitirsînin. Dibe, ajotina erdê bihêle. Heke hakim jî niha baş nebîne ku zevî ji wîre bimînin... Ji bo me rind dibe. Paşê bi gavên ecele banzda jîpê.

Çend seetan berê, gazî Xalê Mihê kiribû, ji bo heqê jîpê û ji bo Letîf begê sed û pêncî paqnot jê sitandibû û dabû wan.

# -XXX-

Jiyana gundiyan tevîhev bûbû, niha jî tiştên bêxêr dihatine xuyanê. Abûqatê wan hat û çû. Gelek krokî hatibûn çêkirinê. Lê tiştek di halê wande nehatibû guhartinê. Mînanî bi derziyan bîrekê bikolin, îşqa çavan rêtibûn, bi zehmetî li van zeviyan bûbûn xwayî, lê niha ne dilgeş û ne rehet bûn. Ne mîna berê bûn. Kevirên zeviyan berev kiribûn. Gîhayên biyanî êdî ji zeviyan paqiş nedikirin. Berê hinek hêviya wan hebû, niha ew jî nema bû. Îro wisa xuya dikir ku ji bo wan xêra tiştekî tune bû.

Ji roja ku dest bi vî karî kiribûn, abûqat girtin û bi Ûsiv axare mehkeme bûn, her çûyî Eşo zorbetiya xwe li ser tendûrekiyan zêde kiribû. Him jî bi tehrekî dinê. Car caran gundê wan dabû ber gullan. Bi şev, wan saetên ku ew di malên xwede bûn, wisa dikir. Tiştek nedibû. Ne mînanî berê bû, tenê çend gulle diavêt niha. Cara pêşîn gundî wisa tirsiya bûn, wisa tirsiya bûn... Qet nepirse. Paşê êdî hîn bûn. Hinekan got ku «em têlekê li serê Eşo çêkin.» Paşê ji xirabiya wî tirsiyan, poşman bûn. De bira hema gulla bavêje. Niha li derve nediman, heywanên xwe jî zûtirê dixistine hundir. Tendûrekiyan zanibûn ku ev gişt ji bin serê Zubêd axa derdikevin. Ne tendûrekiyan tenê, li wan der doran hemûyan. Ewî gazî Eşo kiriye, xwastiye, ku tendûrekiyan bide ber gullan.

«Ev dinê çiqasî qehpike. Çiqasî bêbexte? Merivtî çawa bûye pênc pere. Yê ku bavê vî daye darda kirinê, niha herdu mînanî biranin. Bûye dijminê gundiyên feqîr.» digot tendûrekiyan û gundiyên wî aliyê.

Reşaya şevê wekî perdeka reş kete ser gund. Hemûyan xebat û karên xwe zûtirê xilas kirin. Deriyên xwe dadidan û diketine hundir.

Li gundên der doran, kalên ku ji wan hez dikirin û dostê bav û kalên wan bûn, hebûn. Gerek çend kes ji Tendûrekê biçûyana û bi wanre xeber bidana. Bira bizanibûna ku bi Ûsiv axare ketine mehkemê. Dibe rojekê, mehkemê wê wek zanamêran gazî wan bikira. Tiştekî zêde nedixwestin. Nedixwestin ku xwe ji dîn û îmanê bikin. Çi dizanin, hema wê bêjin bese. Van kesên kal dizanîbûn ku ev erd yên wane. Tiştekî bi tirs tune bû di dawiyêde. Xwestineke bê pere û bê zehmet bû. Ji gund, kê hinekên weha nas dikir, ew şandibûn, ku bi wanre bipeyivin. Hemûyan qebûl kiribûn. Çima nekin? Tu xêreke wan nedigihişte tendûrekiyan, lê belê ev kara ji destê wan dihat. Giştan qewl dabûn,

ku gava haya wan bû, wê bihatana. Çawa zanibûn ku evder yê tendûrekiyane, wê wisa jî bigotana. Ev xeber ku bî vî tehrî dihatin, hurmet û dilxwestina tendûrekiyan her zêde dibû. Wan kesan pirs dabûn, lê belê kê çi zanibû, mehkemê kîngê gazî wan bike.

Demekê şûnda hate bîhîstinê ku tendûrekiyan bi hinek kalên zanamêr, ji gundên der doranre xeberdane. Dibe gundiyan anjî merivên Ûsiv axa, jêre gotibûn. Piştî van xeberan, hinekan ev kalan pîroz dikirin û pesnê wan didan. Hinekan jî digot ku axa û dostên wî yê nehêlin ev kalên zanemêr, ji bo tendûrekiyan şahidiyê bikin. Gotinên wan jî derket. Rojekê ji Berwarê kalek hat. Diranê wiyên sed salî ji yên xortan zexmtir bûn. Rengê wî gewr bû. Çendekî berê, tendûrekiyan bi wîre jî, qise kiribûn. Li hespekê siwar bû. Nevyê wî, li pêşiyê, serê hespê dikişand. Kete gund. Berve mala axê neçû. Da nava gund. Berbi malên gundiyan. Tê xuyanê ku pir caran hatiye û çûye vî gundî. Ji gund lê dinhêrîn ku tê derxin, ew kiye? Paşê ew nas kirin, gundî berve wî çûn. Gundiyên vî yalî ew pir hez dikirin. Kes neêşandibû heta niha. Yên wî nas dikin dibêjin, di piçûktiya xwede jî qet derew nedikir. Dibêjin ew, yên ku li cem wî derewan dike, rind nas dike. Xwediyê pirsa xwene. Nevyê wî, gorên dirêj kişandibû ser şalê xwe. Gorenên sipî û bi nexş nexşî bûn. Hevde, heyjde salî û gavekê li pêş hespê diçû. Kalê gem di destde hesp dajot. Serê hespê kişand û sekinî. Yên nêzîkî wî dibûn:

— Way kalko. Ser seran, ser çavan hatî. Tu ji wir heta vira ser serê me hatî, digotin, hirmeta xwe pêşkêş dikirin.

— Di navxêrêde bin. Lawo, xwedê we bihêle.

Hemû wî nas dikin. Li ser hespêye. Yên tênê, destê wî maç dikin. — Ax. Lo lo. Kalbûn ne tu tişte. Tiştekî gelekî bê abûre. Ez êdî gele gelekî kal bûme. Kalbûn, xwedê xirab bike kalbûnê lo. Rê jî piçekî sere jêr bû, westiyam.

Soro berve wî dihat. Destê xwe bire pêş çevên xwe, li Soro nihêrî. Soro hê bi lez bû. Kirasekî bi reng li xwe kiribû. Çû destê kalê.

— Kalkê Şakir. Ev çi xortbûne? Ser seran hatî kalkê Şakir. Li ser serê me û ser çevên me hatî.

— Serê te û çevên te neêşin, kurê min.

Xortê nevyê wî tenê mabû. Paşê zivirîn ew jî pirsiyan. Ew jî pir dilxweş dibû ku ji kalê wîre, awqas hurmet nîşan didin, qedrê wî digrin. Kalkê Şakir destê Soro girtibû.

— Bira destûra min bidin. Tu min bibe mal. Tu mêvanê xwe nabî mal?

Soro mînanî qîzên xama şerm kir, hê jî sor bû. Sorbûna wî têr nedikir, bi serda ji fedîkirinê wekî silqekê sor bû. Xort serê hespê dikişand, bi nav malanre derbas dibûn. Soro tu tiştek ji vê hatina kalkê Şakir fem nedikir. Gelo ji bo çibû? Di dilê xwede bi nerehetîkê hesya. Hatineke baş nedixuya.

Mala Soro ne bilind bû. Li ber derî sê selên mezin hebûn, ji bo ku xwê bidine heywanan. Jina Soro di hundirde bû. Li ser dengê wan banzda, hate derva. Mêrê xwe û mêvan ku dîtin, lêçega serê xwe teselî kir. Serê hespê girt. Soro alîkariya kalkê Şakir kir û ew peya kir.

– Way bereket bi emrê tekeve, lawê min, Soro, got û xwe jorda berda.

Soro mêvan hildane hundir û jina wî jî hesp bire tewlê, zîn jê kir. Ji istêr doşegek û balgî anîn, li ser kulavekî raxistin. Kalkê Şakir li ser doşegê rûnişt. Bi destên xwe, solên nermik ji lingên xwe derxist. Beroşek li ser êgir bû.

Zarên Soro, di quncikê malêde, xwe sipartibûne hev, li kalê mêze dikirin. Jina wî misîn û legan anî. Kalkê Şakir dest û ruyê xwe şûşt. Nevyê wî li ser kulêv rûniştibû, ewî jî misîn hilda û destên xwe şûştin. Jina Soro bi tivdîr bû. Qet meriya bawer nedikir, lê ewê ji kêderê dianî, çawa dikir? Pêvîstiyên xwe dianîne cî. Avdew ji mêvananre anî, ji bo çay av danî ser kuçik. Kalo hêdî hêdî dihate ser xwe. Zimanê wî vedibû.

Çend cîran jî hatine dîtina kalo. Li pêş wî, li ser cilekê rûniştibûn, yên nûhatî. Mîro hat. Jina Soro, dîkê wanî reş bi xwarziyê wî, Elî da girtinê û şerjêkirinê. Zarok ji bo dîk hinekî giriyan. Lê dîsa jî hate serjêkirinê.

Êvarê, tarî hêdî hêdî kete ser gund, mêvan yek bi yek çûne malên xwe. Him ji Eşoyê eşqiya ditirsiyan, him jî dixwastin ku mêvanên westiyayî bira razên. Gelek ji cîranan jî meraq dikirin, ku gelo ev hatin ji bo çibû? Lê dîsa jî tiştek tênegihîştîn.Şîv li dora textê glover, kalo Şakir, Soro, Mîro, nevyê kalo bi hevre xwarin. Xwarziyê Soro xizmet dikir. Li ser şîvê kêm xeber dan. Gele tişt hebûn ku ji hevdure bêjin. Halê wan wisa nîşan dida. Kalkê Şakir, xweşî û şirînayî li ser bû. Mînanî kalên dinê ne şerpeze bû. Henek dikir. Ji jiyan û canê xwe jî pir hez dikir. Piştî xwarinê, kalkê Şakir ji Soro, halê mehkema gundê wan pirsî.

– Li gund, yekîtî gelek zehmete, kalko. Du roja yekin, bi hevre ne. Kar hinekî dikeve rêke baş, roja sisya tu dinhêrî dîsa hemû tevîhev bûn. Yekîtî karekî pir girane kalko. Wisa bi hêsanî dest ji hevdu dikşî-

nin, qet nebêje. Hinek ji hevalan bi femin. Ev, hevalê Mîro gelek başe. Him jî bi dilê teye. Carna bi lava kirin, caran bi sebir. Bi vî halî du sal derbas bû, me nehîşt ku nîvê gund bela bibe. Niha jî me abûqat girtiye, bi heft hezar û pêncsed paqnota. Hela hê ji mehkemê gazî me nekirin. Axa jî zeviyan dajo. Kar ku wilo dirêj dibe û axa erdê me dajo, li gund ji her kesî dengek derdikeve. Hinek dibêjin me perê xwe badilhewa da abûqat. Hinek dibêjin, hela salekê din jî em diranên xwe bişidînin, sebir bikin.

– Lawê min tu zanî... Xwedê jî zane. Dilê min bi wereye. Him jî heqê weye. Gere meriv ji xwedê bitirse, xwedê hez bike. Hezkirina xwedê jî birazî min, bi hezkirina kesan dibe. Gere meriv cîranan, yên dora xwe, yên dinê û hêjî zêde yên xerîb hez bike. Lê lawê min, meriv heke ku vê hezkirinê ji dilê xwe dûr bixe, êdî bê însaf û zalim dibe ew kes. Hemû xirabî ji dêstê wî tên. Lewra kurê min, niha gelek nepakî, zordestî ji heznekirinê tên. Binhêr, heke meriv hespê xwe hez bike, qet wî dide ber qamçiyan? Na xêr nade. Meriv qet li zarên xwe naxe. Ew rojên zewacê yên pêşîn, hevdû hez kirin pir germ û bi dile. Mêr û jin wekî şekir û hingiv bi hevdure xeber didin. Lê kurê min, ev jî wisa. Tu ku ji merivan hez bikî, li ser wan zorbetiyê nikarî bikî. Yekî dinê jî bike, tu nikarî damîş bidî.

Mîro jî tev xeberdanê bû.

– Kalko, karê me pir zehmete. Wekî ji nav lepên şêran, xwarinê birevînî.

Kalkê Şakir li aliyê Mîro zivirî:

– Raste. Raste kurê min. Di dilê merivande tirseke veşartî heye. Tirsa serhildanê. Carekê ew bê şikênandin, birazyê min... Lê, ew jî bi tenê nabe. Gava meriv tê cem hevudu ev tirs tê şikênandin. Carekê ku tirs şikest, êdî pêşî nayê girtinê. Neheqî bi erdêre dibine yek. Mînanî dîwarên ku hildiweşin. Lê çara her tiştî; yekîtî û bi hevrebûn, bêtirs li mafê xwe xwedîbûne. Lavê min hûn wilone. Kêm û zêde tendûrekî wehane. Lewra ez ji we hez dikim. Lê belê, zarno, karê we zehmete û bê fesale. Niha ezê ji were tiştekî bêjim.

Li vê derê sekinî. Dengê wî dilerizî. Gişt dewsa neviyên wî bûn. Nikaribû li ruyên wan binhêre. Têgihîşt ku di halekî ne başde bû. Yên ku niha wê bêje, bi yên ku gava dinê gotin, hevdu nedigirtin. Li hembcrî hev, li dijî hev bûn. Lewra jê nedihat, bêje. Disekinî û li ber xwe dinhêrî. Tûka xwe daqultand. Paşê dîsa got:

– Gotinên merivan û kirinên wan, gerek hevdu bigre. Eger kirin û gotin bi hevre ne bûn yek, pir guh nede wî mêrî. Kî çi dibêje, gerek wê

jî bi cî bîne. Lewra, meriv çi dikare bike, gere awqasî xeber bide. Ne zêde. Bi vî halî xweyî kal, lingek di tirbêde, çima ez hatime gundê we?

Soro, Mîro û Elî bi meraq li hêviya gotinên wî bûn. Jin û zarên Soro li aliyê dinê, derê wan girtî bû.

– Tu ku hatî, bi minre peyiviyî, zimanê xelkê nasekine. Çûne ji Ûsiv û Zubêd axare gotine. Me dît, rojekê Zubêd axa hate mal. Wisa zêde nedihate mala min. Me got, hela ka ji bo çi hatiye? Dest bi xwastin û qisa xwe kir. Ji min xwast ku ez tevî karê tendûrekiyan û Ûsiv axa nebim. Min jî ew kire dewsa meriva û çend şîret lê kirin. Zorbetî ne başe. Gerek meriv dêst nevêje nanê feqîran, got. Ev aliyan qet nedihatine bîra wî. Qet, qet. Paşê ez dizanim ku ev deran yên wene. Ez çi bizanibim, ezê wê bêjim. Ew jî, eger ji min bipirsin. Min ev ji wîre got. Ewî dîsa reca kir. Ne baş dibe got, lê dixwest min bitirsine. Çend roja berê jî ev Eşoyê firar li serê gund kire bela. Tê, nebaşiyê derdixe li der doran. Hatine, şivanê gund kutane, du pez şerjêkirine û xwarine. Gotiye, herin kalkê Şakirre bêjin, destê wî maç dikim, bira tevî karê Ûsiv axa nebe. Ez ji wîre hurmet dikim, lê ev tiştekî dinêye gotiye.

Caran destê xwe dibir rûyên xweyî sipî. Çavên wî dibiriqiyan. Ji çavên wî dostî, germî, hezkirin dirijiyan. Bi van salên zêde, ewqas rêçûn tiştekî zehmete. Yên ku di dewsa neviyên wînc, bi wanre wilo bi dilgermî qise dike. Ji bo vê gerek dilekî gelekî fireh, paqiş lêbe. Kalkê Şakir ya rastî jî dost bû. Destê xwe dibire eniya xweya qirçimok, pozê xwe, dixwast ku xeberdana xwe bibe sêrî.

– Gundiyên me civiyan. Zarên me li ber min geriyan, lava kirin. Bavo me ji şer û bela van kûçikan xilas bike. Tevî vî karî nebe. Ez qehirîm. Ez tevî karê kê bûme? Hukumet tiştekî ji min bipirse, ez çi bizanim ezê wê bêjim, got min. Ez kîngê tevî tiştekî bûme? Ji Eşo ditirsin. Ji xirabiya Zubêd axa ditirsin. Yê zevî û gîhayên wan bide şewatê. Lema ditirsin. Hûn zanin, Zubêd axa ji berêde bi me berwariyanre cîrantîke baş nake. Ji me hez nake. Ew qewl û pirsa ku min dabû te, hate bîra min. Li ser fikirîm. Min nikaribû, ji pirsa xwe vegerim. Min got, ez vî karî bi tere bipeyivim. Bû kulekê, kete hundirê min. Heqê min jî tune bû, ez gazî te bikim. Ji bo ku pirsa xwe nexwim, xwayî pirsa xwebim, min li salên xwe nenihêrî û hatim vira. Gundiyên me lava dikin. Hemû tiştî ji min dizanin. Lewra ez jî, dilşikestîme, lawê min.

Piştî van gotinan hinekî kuxiya. Bi vî tehrî piçek wext bi dest xist. Nedixwest ku li pêş van xortan biketa vî halî. Ji xwe şerm dikir. Ji xwere kêmasî didît. Sekinî. Nikaribû pêşde bibe. Qasekê berê kalê şirîn, wekî milyaketan, xweş xweş dipeyivî. Hemûyan li devê wî dinhêrîn. Ni-

ha, dikire bilde bild. Pirs ji dêv dernediketin. Bîhna wî diçikiya. Destê xwe bire berîka xwe. Destmala xweya qirçimî serxist. Poz, çavên xwe paqij kir. Çavên wî niha bi mij û dûman, te digot ku pêşiya xwe nabînin. Serê wî diêşiya, gêj dibû. Wekî zaran, dest bi girî kir. Hêsir ji çevan dirijiyan. Soro, Mîro, Elî û nevyê wî dillerizî bûn. Tiştekî tehl û tûj diçilkiya ji dilên wan.

Lavakirina zar û gundiyên wî, ew bêkêf kiribû. Hemûyan jêre hirmet dikir. Ji rûyê wî, serên wan di derd û belayêde bûn. Axayê gundê cîran, eşqiyayê serê van çiyan bûbûn dijminê wan. Giştan gune dixistin hustiyê wî. Kalkê Şakir ne ew kesê ku ji pirsa xwe vegere. Yê çawa bikira? Çi bikira? Tiştekî neçê bû. Xwedê canê wî bistanda ji vî halî çêtir bû. Hay lolo. Yekî ku wekî wî ji jiyanê hez bike nîn bû di dinêde. Bi hinekan şaş dihat ku kalkê Şakir awqasî bi jiyanêve girêdayiye. Lê nedixwestin, li ruyê wî tiştekî bêjin, dilê wî bişkênin. Lê niha, xwe bi xwe mirina xwe dixwest. Paşê qerarê xwe dabû. Yê biçûya Tendûrekê, reca bikira ku bira wî bibaxşînin. Ji bo ku dilê wan nemîne, li pêş tendûrekiyan dixwest, mînanî zaran bigrî, lava bike. Niha lema digiriya. Ji bo ku bê baxişandinê.

Soro:

– Eman kalkê Şakir. Çibû? Piçekî xwe weha dirêj bike. Tu gelekî westiyayî. Me jî tu dayî xeberdanê, got û xwest ku wî li ser doşegê dirêj bike, alî bike. Destê xwe dirêjî balgî kir, kalo nehîşt.

– Na, na kurê min. Tiştekî min tune. Derbas bû çû, got, lê dîsa jî dengê wî dilerizî.

– Mînanî barana biharê bû. Dilê min teng bû. Xwedê xirab bike kalbûnê, meriv wekî zaran dibe. Caran weha dike.

Lemba pênc numre, li dîregê darda kirî bû. Îşqa wê têrê nedikir, lewra kesî êşa rû û çavên wî nedidît. Lê belê rind fem dikirin.

– Kalko, li ber xwe nekeve. Ji xwere neke derd. Em te, ji gundiyên te zêdetir hez dikin, hurmet dikin. Em zanin, dilê te bi mereye. Lewra, ji ruyê me xirabî bênê serê gundiyên we, emê pir dilêşî bibin. Em dikşînin, bira ew nekişînin. Lê belê, te em dane şermê. Bi van salên xwe, heta vira hatî. Te neviyê xwe bişanda bes bû. Çima em te nizanin? Em te nas nakin çima? Bihata û bigota, hal ehwal wahaye. Kalkê min nikare bê gundê we zanamêriyê bike. Zorê didine gundê me. Heywanên me didizin, dibin. Zorbetiyên dikin bigota, em jî gundîne. Halên weha rind fem dikin.

Soro ev tişt digot. lê ewî jî çavên xwe, ji wî direvand. Têdigihîşt, ku kalo çima hatiye. Berxweketina kalkê Şakir didît, lê dîsa jî dilsar bû

Soro. Mîro jî wisa. Kalên dinê nedihatin mehkemê, ji bo ku li hemberî gotinên Şakirê kal derkevin. Tu kesan, zanemêrî nedikir li pêş wî. Hemûyan zanibû, ew derewan nake, heqê kesî naxwe. Lewra fedî dikirin li pêş wî. Ji bo vê bû, Zubêd û Ûsiv axa awqasî li ser vî karî disekiniyan. Lewra Eşoyê eşqiya dişandine ser gundê wan.

Kalê ku giriya, Elî jî kelogirî bû. Lê, bê ku bi kesî nîşan bide, hêsrên çavê xwe ziha kir. Paşê hate ser xwe. Niha, dilê wî, te digot ku vik û valaye. Dilê wî dişewitî û bi şaşbûyîneke giran li dora xwe dinhêrî. Ji bo kalo Şakir çiqasî kelogirî bû. Kalê şêrîn guhdarî dikir, her diçû bi germî ew hez dikir. Te digot, hevalê wiye, ne kalekî pîre. Niha, «gelo wê çilo bibe?» tenê dihate bîra wî.

Şev, pêlekê derbas bû. Eşo û merivên wî gund dane ber gullan. Tendûrekî hîn bûbûn êdî. Ji nişkêve, bû dengê gullan. Kalkê Şakir xwe şaş kir. Nizanibû, ku gulle nêzî malêne. Zûva tiştekî weha nedîtibû. Zarên ku di hundirde radizan, bi girî, çavên xwe miz didan û pêşde hatin. Soro bi destê wan girt, nehîşt bitirsin. Ew dîsa birin hundir. Dengê gullan li serhev bîst, sîh deqîqe kişand. Berê xewa kalkê Şakir hat, lê niha ew jî revî. Kalê difikirî niha. Yên bûyî fikirî. Dîsa mîna gava dinê dilteng, diltenik bû. Sîngê wî diêşiya. Gelekî berxweda, ku bira nebêjin tirsiya.

– Zarno, halê we ne tu hale. Pir xirabe. Ne tu halê merivaye. Wisa neheqî jî nabe. Ev zilme. Ez awqasî jiyam, min rojên xirab û qenc dîtin. Kesên baş û ne baş, hatin û çûn. Meriv her roj tiştekî nû hîn dibe lo. Hingî min xwe nas kiriye, ez ji xirabiyê direvim. Derew li dûrî mine. Min got ku dostiyê, qenciyê bikim û bibînim. Çiqasî ji destê min hat, min wisa jî kir. Min fem dikir ku meriv xirabî û derewan bi xwastina xwe tenê nake. Eger bixwazin, dikarin li pêş vê bisekinin. Ez jî wisame niha. Ji bo van kirinan, dibe, min gelek zehmet nekişandiye. Lewra ez bi hişê xwe, bi xwastina xwe, li pêş nepakiyê disekinim. Ji bo min weha dibû. Dîsa dibînim ku ji nişkêva qehirandin, hêrsbûn gelek nepakiyan bi merivan dide kirinê. Îşev, li cem we, van bûyeran nîşanî min da ku ez di vî emrê xwede gelek tişt hîn nebûme. Gava dinê ku giriyam, min hêviya xwe ji jiyanê biribû. Niha têgihîştim ku hatina min baş bûye. Heke nehatibûma, min nikaribû van bûyeran bibînim.

Li derve, dengê gullan ku dihat, kûçikên gund diewtiyan, vî yalî û wî yalî direviyan. Dengê gelek cîranan dihat. Niha hemûyan li malên xwe difikirîn, wê çilo razên? Gund hemû.

– Lawê min. Salên hînbûnê tunenin. Min rind dît îşev. Xirabî, derew, lêxistin, kuştin çima dibe? We niha çavên min vekir, we nîşanî

min da. Pêwîstî van bi meriyan dide kirinê. Gelek caran her tiştî... De bêje, hûnê ana çilo bikin? Li hemberî vê neheqiyê? Heke ku qet rê nemîne, çi hat hişê we, hûnê bikin. Ez, îşev yekî di nav ba û bagerêdeme, û kalo dom kir:

– Şeveke tarî, ba, baran... Paşê her tişt disekine, sahil dibe û dîsa dest pê dike. Şeveke weha. Qisûrê mêze nekin, ez hatim ku hûn min bibaxşînin. Ji ber lavakirina gund, cara pêşîn bû, ku ezê ji pirsa xwe vegeriyam. Lewra ez hatim. Bi şerm, dilşikestî û poşman hatime cem we. Ez dizanim, yên ku wê bênê serê me, li cem yên we ne tu tiştin. Pirsa wê jî nayê kirinê. Her roj eşqiya êrîşî gund dikin, zilma axê, bê erd û feqîrî... Lawê min, ev yek dîtin û bihîstin jî şerme. Min qerarê xwe da. Niha ji qerarê xweyî kevn vedigerim. Ezê hemû gotinên we bînim cî. Ezê bême mehkemê. Çi dizanim, ezê giştikê jî bêjim. Vê nekim nabe. Xwedê dizane ku cara pêşîne ezê derewa bikim. Ji kesîre qal nakim ku min ev pirsa daye we. Ezê bêjim, ji bo mehkemê ez nabim zanemêr. Gundî jî wê ji pêsîra min destê xwe vekişîne. Him jî bira piçekî rehetbin. Niha, we fem kir. Jiyan û heqîqetên tûj çilo meriyan tînine rê. Tu çiqasî jî bêjî, ku «ez derewa nakim, ezê li ser pirsa xwe bisekinim». Ne di destê tedeye, kurê min. Jiyan bê însafe, ji me dijwartire. Çawa dixwaze, me dike wî tehrî. Lê belê, ev naye wê manayê ku hemû xirabiyan bikin û paşê bêjin, ku "de çi bikim, pêvîstî wisa bû." Weha jî nabe. Lê hidûdê van herduyan, vijdan, aqil û namûsa meriyan kifş dike.

Soro:

– Kalko, em hînî van kêmasiyan bûne. Gundê xwe û xwe ji bo me neêşîne. Piştî van salan, naxwazim tu aciz bibî. Ez çi zanim... Dawiya gotina xwe neanî.

– Na. Na. De wêda here lo. Hinekên li cem me zilmê bibînin, emê jî serê xwe vegerînin û nexwazin ku mêze bikin. Aqlê min vê hilnade. Şikir ji xwedêre, ezî niha rehetim. Ezê bêmê, ji bo we bipeyivim. Xwedê ji vêre derew nabêje. Hetanî roja mehkemê ez ji kesîre ya rastî nabêjim.

Hemû niha dilgeş bûn. Mîro dît ku kalê Şakir sekinî û difikire.

– Kalkê Şakir, bawer bike çi ji destê me tê, em dikin. Em naxwazin xirabî derkeve. Du salin Ûsiv axa, dest ji xirabiyê venakşîne. Gundî ji feqîriyê nikare çavên xwe vekin. Heke ku tu bihêlî, hinek wê di du rojande wî bikujin.

– Zarno, min bibaxşînin, xewa min tê. Sibê zû me rêwî bikin. Du sê pirsên min dîsa hene, ji were bêjim. Van derdên weyî tevayî, zeh-

metiyê ku hûn dikşînin, xwedê zane, wê bi xêr bigihêje dawiyê. Di wextên wehade, gerek meriv ji hevdu hez bike. Yekîtî li ser hîmekî xurt rûdine. Tenê, tiştên nav xwe, karên piçûk ji bîr bikin, hilnedin û daneynin. Hûnê bibînin, wekî tilyên pêçiyan hûnê hevdu bigirin. We du sala damîş kiriye, hûnê hêjî bikin. Mînanî xortan ecele nekin. Gelekî bi aqilbin. Şîretên min evin. Car cara difikirim, çima van ji were dibêjim? Dixwazim ku hûn bi serkevin. Dilê min tiştek wisa dixwaze. Dixwazim, hûn jî rehet bin, hûn vî karî bibin serî. Ez jî gotina dilê xwe tînime cî.

Te digot ku ji hevre gotine. Wan rojan, yên pirs dabûn, ku ji bo wan zanemêriyê bikin, li pey hev qasid dişandin. Digotin ku "me bibaxşînin, em nikarin." Yên hatî, bi şerm û ber xwe diketin. Gotinên xwe dibêjin û bargiraniyê ji ser piyên xwe davêjin. Bîhna xwe hildidin.

Her ku yên weha didîtin, tendûrekî diqehiriyan. Ya qala diziya wî ya berê, an jî xirabîke wî digotin û didane çêran. Ji bo kalkê Şakir jî:

— Ji ruyên xwe şerm nekir. Tirsiya û pirsa xwe xwar. Ditirse ku zanemêriyê bike. Sibê, wê li pêş xwedê çi bêje? hinekan digot.

Çend roj wisa derbas bûn, paşê di nava karê girande, hate ji bîr kirinê. Eşo jî dest ji kalkê Şakir û gundê wî vekişand.

## – XXXI –

Bihar diçû, havîn li ser hatinê bû. Germ bû. Zeviyên ku gundiyan nû rakiribûn, çandibûn, êdî bilind bûbûn, bejn dabûn. Ter hêşîn bûn. Wê piştî zeviyên deştê bigihîştana. Gundî dilxweş bûn. Par jî wilo bûbû. Zeviyên axê, yên li deştê, wekî ewrên hêşîn. Îsal çandin bi dilê her kesî bûn. Wê bi bereket bibiya. Vî halî dilê wan hinekî fireh dikir. Van nêzîkiyande wê çayiran biçinin.

Du salin, nava gundiyan û Ûsiv axa ne baş bû, lê dîsa jî axa bi wanve nehatibû hemberî hev. Ji zeviyên nû çi hildidan, para axê jê didanê. Wisa dihate xuyanê, wê îsal jî mînanî par bibiya. Yekî duda got, em tiştekî nedine axê. Carekê wisa pirs dabûnê. Me par jî da, heta dawiya mehkemê bira vî tehrî here digotin. Hinekan deng nedikirin. Nav awqas tevliheviyêde, dîsa jî li ser karê xwe bûn, zeviyê nû ajotibûn. Di wextêde kevirên wan berev kiribûn, zû bi zû teselî kiribûn. Jin û zar bi hevre gîhayên zeviyan jibartibûn. Yên hînî xebatê bûne, nasekinin. Xebat nan û ava wan bû. Demên ku gelekî diwestiyan, dil diavêtin ewên bê kar vedilezin. Lê hewekî bîhna xwe distandin, êdî her tişt ji bîr di-

kirin. Kar wekî nan û av bû. Bê kar nikaribûn bisekinîna. Ji kar vegerandinê, ji zeviyan dihatine gund, heta malê, di rêde henek dikirin, hevdu xûlî dikirin. Caran dilhezkirinê xwe yên dizî qal dikirin. Caran behsa rojên eskeriyê û zewac xwastinên xwe dikirin. Yên eskerî nekiribûn, awqasî zêde xeber nedidan. Li pêş çavên wan, heta eskeriyê nekin, meriv mêr nayê hesibandinê.

"Hela bisekine, bîhna şîr ji devê te tê. Hela here qerewana sibê bixwe. Razê û rabe. Paşê were, xeber bide. Bira onbaşî li pêş te bisekine, du sîlla bide bin guhê te. Hela ka dîsa wisa dipeyîvî an na?"

Nizanim çima, lê kîngê ji eskeriyê qal dikirin, an sîllên çawîşan, anjî pîhnên başçawîşan dihat bîra wan. Serê çawîşanre başçawîş digotin. Şevên dirêj nobedarîkirin dihate ber çavên wan. Hemûyan jî zilma eskeriyê kişandibûn. Lewra kesî venedişart, her tişt ji hevdure digotin. Kesî kêmasî nedihesiband. Mînanî tiştekî ku her roj dibe.

Karê Ûsiv axa baş bûn. Motora wî ya nû, pir bi qewet bû. Nedisekinî û erd daduqultand. Ecele nedikirin, bi fesal dixebitîn. Şofêr diçû mala xwe, rojekê duda li wir dima. Merivekî baş bû. Kesekî giran bû. Tevî her tiştî nedibû. Kes jî tevî karê xwe nedikir. Yekî bi rûmet bû. Ûsiv axa jî wilo rehet nikaribû ku pêre mînanî xulamên xwe yên dinê bipeyive. Pêwîst jî nîn bû, her karê wî bi cî bû. Her tim li cem motorê bû.

— Motor mînanî qîzane. Gerek lê binhêrî. Eger wisa nekî, wê di malêde bimîne qîz.Merivên malê, hemûyan qedrê wî digirtin. Xulamên malê, «kekê» digotin jêre. Car caran derheqê bajarên mezin jê dipirsiyan. Ewî jî qala Edenê û bajarên dinê ku lê kar kiribû, dikir. Him qedrê wî zanibûn, him jî ji wî hez dikirin. Qedirzanîn, bê dilxwestî nabe. Qedirgirtin, hevdu hezkirin ku bi du alîbe, dijî. Ew jî di demeka kurtde hînî mala Ûsiv axa bûbû, te digot, yekî ji malêye.

Gelek caran, çîroka Ûsiv axa û gundiyan ji xulaman û meriyên malê bihîstibû. Her carê jî dîtina xwe qet nîşan nedida û guhdarî dikir. Xulam li dijî gundiyan dipeyivîn, ew di ber xwede dikeniya, «gelo ji dil dibêjin» digot di dilê xwede. An jî van xulamên feqîr, heqê wan tenê têra zikê wan dikir, gelo bi wî bawer nedikirin, lewra weha qise dikirin? Guhdarî kiribû, bi dostî xwastibû rastiya vî karî hîn bibe. Têgihîşt ku van xulamên belengaz gelekî bi axayê xweve giredayîne. Dijî gundiyanin. Ya xirab jî, ji bo çi li dijî wan bûn, ev jî nizanîbûn. Dijminîke bêhemd û nezanî. Dibe, wisa hînî wan kiribûn. Bihîstibûn û bawer dikirin ku li van deran erd yê axanin, ji berêve jî wisa bû. Wilo bîr û bawerî dikirin ku erdê gundiyan nabe. Qet qet nebiye jî. Di çirokande,

di kilamande, gotinên mezinande erd hertim yê axan bûn. Tendûrekiyan ku serî hildabûn, xulaman he dizanibûn, ew li hemberî edet û toran derdikevin. Neheqiyê dikin, rewşa gundiyan xirab dikin. Ew hîn nekiribûn ku bifikirin. Ya rastî, hîn kiribûn ku xênjî van dîtinan, bira tiştekî neynine bîra xwe. Ûsiv axa erd dabû gundiyan, bi wî erdî dijiyan. Niha li dijî Ûsiv axa derdiketin. Neheqî bû. Xulam weha difikiriyan. Ji bo wan, dinê ji ber derê Ûsiv axa dest pê dikir, heta gom û heywanên wî dirêj dibû. Ji wira jî diçû karê xermanan, simbilên genimên zeviyan û çêra heywanan. Dinya wan carna fireh dibû. Ew jî zevî, heywan û gundê axayên nû bûn. Guhartina wan hemû ev bû. Diçûn û dihatin, hemû peyîvên wan li ser gund û jiyana axayê wan bûn.

Di vî gundê mezinde dibistan nîn bû. Heta du sala berê, sed bîst mal bûn. Dîsa jî kesî qala vê pevîstiyê nekiribû. Qaymeqam demekê li ser sekinîbû. Cîkî baş li pêş gund, hine erd ji bo dibistanê qerar dabû û kevir bi gundiyan dabû kişandinê. Xwe hat, paşê hine memûr şandin ji bo vî karî. Qet filitandin nîn bû, dibistan wê bihata çêkirinê. Hukumatê wisa xwestiye. Gundên bê dibistan bira nemînin. Hemû gund, wê dibistanên xwe bi xwe çêkirina. Hukumat feqîre. Dewlet feqîre. Heke bi hêviya dewletê bimîne wê gelek dereng bikeve, gotibûn. Hemû gund bira bi xwe çêkin, bînine cî. Yên hukumat rê dibirin, wan salan gelekî li ser vî karî disekiniyan.

Li gundên deştê, gelek jî hatine çêkirinê. Yên riyên wan rind, dar û çîmento bi hêsa dihate kişandinê... Li gundên çiya, mînanî Tendûrekê nîv deşt û nîv çiya, dibistan çêkirin wisa baş nediçû. Dîsa jî ciyê dewsa dibistanê kifş kiribûn. Hemû malan bi erebên ga, kevir kişandibûn. Dest û piyên wan bi keviranve tîş tîşî bûbûn. Karên xwe hîştibûn, li pey kevirên dibistanê ketibûn. Lewra hemû diqehiriyan. Ji tirsa qaymeqam û cendirman kişandibûn. Yên kal:

– Ev dibistan çi pêşene? Yê ji mere çi bikin? Ji kure serê me kirine vê xezewê? Derdê me çima ne besî meye? Zeviyên me hişk dibin, em pêre nagihêjin. Şev û roj werin keviran bikşînin. Çiya û banî negotî, keviran bikşînin, ha bikşînin. Dibistanê çi bike ji mere? Ji çî mere dibistan? Bê dîn û bê îman jê derdikevin. Li dibistanan, zarên me bê edeb û bê tore dibin. Na bavo, na. Ne dibistanê dixwazin, ne jî tu tiştî. Bira me rihet bihêlin, gotibûn.

Gundî jî bê dilin. Olam didîtin ev kara. Paşê hêdî hêdî, «çi heqê hukumatê heye ku bi zorê gundiyan bide xebatê, yê çêke bira xwe çêke, dema olamiyê derbas bû, niha demirqirasî hatiye...» digotin di nav gundande. Karê dibistanê hêdî hêdî sist bû. Hukumatê jî dev jê ber-

dabû. Wan rojan Tendûrekiyan di nav xwede pere komkirin, rişwet dane nivîsdarê qaymeqam ku bira dibistan neyê çêkirinê. Dibistan hate bîrkirinê. Çû û çû. Niha li dewsa ciyê dibistanê kevrên kişandî wekî dîwarekî bi rêz disekinin. Kes jî dest nade wan.

Ûsiv axa piçekî dixwend û dinivisî, lê ne baş. wexta hukumatê ew şandibûn rojava, hîn bûbû. Têra wî dikir. Bername û name hêdî hêdî û dereng dikaribû bixwîne. Hinek reqem û hesaw jî pêre dibû. Kurê wiyî mezin jî wisa. Yê piçûk neşandibû dibistanê. Pêvîst jî nîn bû. Yê bixwîne û bibe çi, digot. Yên dixwînin paşê ji rê derdikevin, gura mezinan nakin, li hemberî dê û bavan disekinin. Lewra nedixwest. Li vê jî pêşdetir, yên dixwînin, diçin li bajaran cî dibin. Ji dê û bavên xwe dûr, dibine hine kesên nû. Car caran Ûsiv axa difikirî, digot, baş bûye ku dibistan li gund nehatiye çêkirinê. Paşê wê çilo sereder î bikira. Xwedê neke, xwedê necirîne.

Ji bo çêkirina dibistanê, biniya gund, bin rê, ciyek veqetandibûn. Kevir li wira, li ser hev rêzkirine niha. Erdê gundî hemûye. Lewra qaymeqam ji bo vê derê qerar dabû. Baxçekî fireh. Ciyê dibistanê û li cem wê jî malên mamosteyên dibistanê. Bi vî tehrî cîkî fireh digirt. Hemû heywanên gund, bi salan, di vire çûye û hatiye. Lewra têda peyn zef bû. Hemû kesan jî zanibûn, ev dera pir bi berekete, zêde dide. Dixwazî têke zevî, têke baxçe, çawa dixwazî wisa bike. Hezdikî zebeş û pêtixan biçîne. Genim bi bejna mêrivekî bilind dibû. Simbêlên wê bi bihustekê dibûn, ku bihata reşandinê. Heta wê rojê kesekî dest bi vê derê neda bûn. Heqê kesî jî tunebû. Malê gundî hemûyan bû. Paşê dibe ku hukumat rojekê dîsa dest bi çêkirina dibistanê bike. Wê nepirsiyan çima, ka erdê wê, ka kevirên ku hatine kişandinê?

Ûsiv axa qerar dabû, vê derê bike zevî û bajo. Hema bira memûran tiştek negota, yê dinê ne tiştekî giran bû. Xwest û fikirî, traktora xwe têke mene, memûrên ku yê kêrî wî bênê, gazî gundê xwe bike û çend berxa bi wan bide xwarinê. Bi piraniya wanre dost bû. Lê dîsa jî gere meriv dostaniyê zû bi zû, nû bike. Zeman gelek tiştan bi xwere dixwe, kêm dike, dostaniyê jî pêre birîndar dike. Bo ku dostî kêm û birîndar nebe, gere bê alaf kirinê, avdanê. Gere dostî bi vî tehrî xurt bibe. Çima her tişt jî ne wisaye? Jiyan jî. Gere meriv wext û dewranê bi kêrî xwe vegerîne. Dema çû bajêr, yek bi yek serî li wan da û got. Midirê maliyê Îsmet begê jî xwestina Ûsiv axa qebûl kir. Medê wî ne baş bû, zikê wî gelek caran diêşiya. Xwarin nediheland. Roja şemiyê, li dewsa Ûsiv axa, qumandarê cendirma du jîp kirê kir û mêvan anîn Tendûrekê. Ji jîpa pêşîn qaymeqam, midirê maliyê, reîsê şiba eskeriyê,

memûrê tapiyê û yekî nenas peyabûn. Li dû wan, ji paşiyê, nav wande nîv perçiqandîbûyî, memûrê nifûsê banzda jêrê. Navê wî danîbûn, «ezebê havînê, bê bermalê havînê». Di jîpa dudade, qumandarê cendirma, serokê belediyê û çar memûrên dinê hebûn. Bo yê nenas, «midirê dibistana navîn» got qeymeqam.

Raste rast hatine baxçê. Di nav darande xalîçe, doşirme û doşeg raxistibûn. Balgî danîbûn. Av di nav daranre derbas dibû. Li ser riya avê hine golên piçûk çêkiribûn. Fêkî û hêşinayî kiribûnê wan golan. Wan çend deqîqên westiyayî derbasbûn, giştan çakêtên xwe derxistin, bi daranve darde kirin. Ji bo yên ku nedixwastin li erdê rûnin, çend îstol anîbûn. Ew jî heta dawiyê vala man, kes lê rûnenişt. Kurê axêyî mezin û şofêr xizmet dikirin. Bo tiştek ji malê bê, bi dengekî bilind xulamanre gazî kirin têrê dikir.

Ji wan wêde, du berx bi tevayî, li ser agir diziviriyan û rûn jê dunuqutiyan, diçiziriyan. Herek di destê wande xeyarên teze, him dixwarin him jî pijandina berxa mêze dikirin. Wê lezekî şûnda bixwarana. Xeyar bi qalikanve dixwarin. Bi çavan têr dibûn.

Li erdê rûniştin. Berx, fêkî, hêşnayî xwarin û bi pêre reqî vedixwarin. Serên wan bi kêf dibûn, hêdî hêdî di bin darande xwe vedilezandin. Henek dikirin, dikeniyan. Giştan dawiyêde pirs dianîn li dora ezebê havînê, memûrê nifûsê. Midirê maliyê Îsmet beg, medê wî diêşiya. Piçek jî goştê berxê xwar û hinek jî reqî vexwar. Bi midirê tapiyêre henek dikirin, «dijminê berxan», digotin jêre. Berxek têrê nake digotin, lê kesî bawer nedikir. Dîsa jî wê rojê, sisya yek par ji berxa tevayî xwar û qasî wê jî reqî vexwar. Sîniyek dihat û yek diçû. Li bajaran tenê meriyan dikaribû awqasî bi cure xwarin û tişt bîter bikira. Nîv serxweş bûn, bi debancan nîşan digirtin. Debanca midirê dibistana navînê, ya hinek memûrên piçûk, tunebûn. Yê ku çavê meriya pê digirt, midirê tapiyê bû. Kêm vexwaribû, dibe ji wê be jî. Destên yên dinê diricifiyan û gullan ciyê xwe nedigirtin. Ev çend meh bûn, awqasi kêf nekiribûn. Gişta wisa digot. Derva, ava sar, hêdî hêdî vexwarin, dilkêfî dabû wanan. Wisa pir serxweş nebûbûn, der dorê xwe nedilewitandin. Piştî nîvro, bi jîpan çûne ber çemê mezin. Di ciyên kûrde, qedera sehetekê avjenî kiribûn. Ûsiv axa bi wanre bû, tev sobanî dikirin. Hênikayî, rehetî hatibû canê wan. Di vegerandinê, dîsa birçîbûn. Xwastin, hinekî dîsa vexwin. Wana jî wisa kir. Roj êdî lê bû here ava. Ji çemê mezin, bo wana masî girtibûn. Masî dixwarin, li ber xilaskirinê bûn.

Piştî çûyina mêvanan, Ûsiv axa û xelqê malê, di nav xuyêde mabûn, westiyayî, «ax, lo çûn, em jî xilas bûn» digotin.

Tu deng û behsa abûqatê tendûrekiyan tunebû. Hema hema havîneke dirêj diqediya. Hela hê carekê jî, mehkemê gazî kesî nekiribû. Perê wan çûbû. Axê zevî ajotibûn. Baweriya wanê ew çend rojên pêşîn jî pêre çûbû. Axa, li pêş çavên wana, hemû memûrên bajêr gazî gund dike, berxan pê dide xwarinê, reqiyê dide vexwarinê. Te digot ku nîşanî wan dide, «binhêrin ez awhame, hemû li aliyê mimin.» Wan bide bihecandinê, terqandinê. «Ezê we giştan têxime quleka teng, zûtirê na, hêdî hêdî û yek bi yek we hemûyan bikujim. Bi dilop dilop hûnê bimirin.»

Heftekî piştî vê bûyerê, sibêh zû, gundiyan karê xwe dikirin ku herin ser karên xwe, zeviyan û mêrgan. Hinekan heywanên xwe tevî naxirê dikirin. Nişkêve traktora Ûsiv axa dîtin. Li bin rê, ew ciyê dibistanê dajot. Traktorê, gişt qehirandibûn. Li pêş çavên wan, te digot agir diçirûse. Ji koka hustiyên wan, ji bin guhên wan şûjin têre dikirin. Dinê li pêş çavên wan reş bû, tevî hev bû. Ji gund deng û qîrîn bilind bû. Wekî ciyek dişewite. Wekî li ser gundde girtine. Wisa nişkêve bû ku kes nizane çilo dest pê kir. Kê dest pê kir? Yên diçûne karê xwe, zivirîn. Heywanên xwe hiştin. Diçûne malan, dar û şiv didane destê xwe. Didane çêra, berve nava gund dihatin. Wexta fikirandinê nîn bû. Te digot, ji dilê wan, yek dibêje ku «de zû, de zû, hûn hêviya çine, hûn çi disekinin?» Kef li dora devên wan ketibû. Destê hinek jinande kevirên mezin hebûn. Derbekêde mal gişt vala bûn. Li nava gund kom bûn.

— Hela lê, hela lê. Tu bê namûsê dola bê namûsa binhêre. Wekî ku dê û jinê mere dide xebera. Hatiye îcar jî, pêş malên me dajo. Dewsa ciyê dibistanê... Malê gundî tevayî. Ev çi bê abûriye?

— Ezê devê mezinê te û pêşiyê te... Ji mere şerma girane, tu heta niha dijî. Hela lê mêze. Hela. Tu diya me nî, çima ji vê ne çêtire?

— Ezê te jî, traktora te jî...

Gujîniyek, qîrîniyek bilind bû. Kê gotê û çawa bû? Serejêr, wekî sêlafekê qetiyan. Nişkêve gijinî hat. Ji ser malan, xaniyan banzdidan, diqîriyan. Qîjînî li berve zeviyê kişiya. Li ser traktorê, şofêr, caran li zeviyê û caran li dora xwe dinihêrî. Dengê gundiyan bihîst. Dît, li nav gund kom bûne. Destê wande şiv û dar. Serejêr dihatin. Serîk ajot, çû û zivirî. Zûtirê fem kir, berve wî tênê. Wê wî perçe perçeyî, qît qîtî bikin. Xilaskirina xwe û traktorê tunebû. Wê lezê bend kişand, gîsin hemû ji erdê derxistin. Bi pulixêve, lez pêş da çû. Dît, halê wî dîsa jî baş naxuyanê. Hesinê nava motorê û pulixê kişand û hilda. Niha tenê bi motorêve bû. Gaz dayê. Vîtes guhart. Xwe da ser riya Zîlanê. Li pişt xwe toz û dûman hildida. Carna jî pare dinihêrî. Hinekan dîtîn ku ew

dûr dikeve, li pey reviyan, lê negihîştinê. Paşê jêre dane çêra, dûrve kevir avêtinê. Wilo gelekî netirsiyabû. Hatina wan zû dîtibû. Rind hesaw kiribû. Bêricaf, zûçûyîna herî pêş dabû motorê. Zanibû gundî zûtirê nikarin bigihên. Wisa jî bû. Gundî, hatine cem pulixê, ew welgerandin. Bi kevirên mezin çep, rast lêxistin û dîsa walgerandin. Dîtin, wisa hêsan nayê şikestinê, hîştin û çûn.

Çi bû, wê lezêde bû. Kurê axayê mezin, li cem sûra dor xermanan, berve traktorê dihat. Nişkêve sed, sedpêncî metro wêde dît ku şofêr diqîre:

— Gundî... Gundî...

Wê waxtê kurê axê li şofêr dinihêrî. Jiyana şofêr di tengasiyêde didît, lê ya xwe qet nedihanî ber çavan û ji bo xwe nefikirî. Di vî dema kurtde, gundî gihîştibûne ser rê. Di destê wande kevir û dar hebûn. Tirsek nişkêve kete dilê wî. Tirsana ricifî. Xwedê kir, ricafa xwe, wî bi xwe tenê dît. Zer bû, li eniya wî dilopên xudanê çêbûn. Eger wî lezî bireviya, dibe ku xilas bûbûya. Ji tirsa nereviya. Taqeta revê di xwede nedît. Nava çend saniyande qerar bida, dibû. Lê ewî xwe şaş kiribû, di ciyê xwede mabû. Bi vî halî qedera deqîqekê derbas bûbû û her tişt fem kir. Vê carê jî, rev ji xwere ne baş dît. Nexwast, navê revê bîne ser xwe. Mêr gerek wilo nebûna. Paşê wê biketa ser zimanê gundiyan. Ana, bixwasta jî êdî rev nedibû. Çend gundî jî, bi riya nava mala wan û gundve dihatin. Ewê pêşî lê bigirtana! Dît, gundiyan pulix du cara walgerandin, kevir lêxistin. Çavên xwe ji wan qet nediqetand. Vegeriya û li aliyê dinê mêze kir. Traktor êdî dûr bû. Yên ku kevir davêtin, nikaribûn bigihêjin. Di ciyê xwede bisekiniya, dibe ku ev bûyer nedibûn. Gundiyan pulix walgerandin û bi keviran lêdixistin, wî ew zanîbû ku kevir li bedena wî dikevin. Ji hundirê wî, ji dilê wî yekî digot ku here wir. Çiyê bi hesinan bihata? Gundî ji wêderê çûbûn jî. Lê ew xwe çend metro berve wana nêzîk bûbû. Hişê wî gelek di cîda bû. Her tişt rind dihate ber çavên wî. Dar û şivên wan bilind dibûn. Didane xeberan. Ew çêrên wanê mînanî gullan giran, guhê wîdene. Kevir di ser serê wîre çilo derbas dibûn. Paşê êşeke giran kete hêta wî, çîpa xwe, sêvika xwe nikaribû bi xwere bikişîne. Paşê, serê wî, singê wî...

Jîp dileqiya, ewî çavên xwe vedikir. Hişê wî diçû. Çavên wî reşve dihatin. Yên cem xwe nas nedikir, çavên wî dîsa dihatine ser hev.

Çavên xwe ku vekir, li dora xwe, dîwarên sipî dîtin. Dîwar li dor wî diziviriyan. Hinekan kincên spî li xwe kiribûn. Rengên wan, şêlî didît. Hine şûşe... Xênji wan çendên dinê dît. Te digot hinek qalpaxê çavên wî dikişînine jêrê û digrin. Serê wî di nava du hesinande dişidandin.

Çavên wî dixwastin derkevine derve. Demekê şûnde çavên xwe dîsa vekir, vê carê bêtir didît. Her tişt êdî kêm tevîhev dibû. Xwast, destê xwe bibe serê xwe. Destê wî ranedibû. Gelekî diêşiya. Lingê xwe dilipand. Ne mînanî milê wî bûn. Dikaribû bikşîne jorê. Lê te digot, barekî giran li ser hebû. Paşê hêdî hêdî, çi bû, çi nebû dihate bîrê. Lê hemû ji hevdû qetyayî dihate ber çavên wî. Serê wî pêçandibûn. Di torbekî lastîkde bûz dabûne ser. Nedihîştin xwe bilipitîne. Milekî wî nedihiviya, yê dinê jî, bi şûşa seromêve girêdayîbû. Mînanî ku bi ciyê wîve zeliqandibûn.

Çend rojan şûnve, doxtoran got, êdî dikarin milê wî têxîne alçiyê. Milê wî kişandin, wekî canê wî derdiket. Pemû li milê wî pêçandin paşê. Bo êşê derzî lêxistin, lê qet tu kar nekiribû jêre. Leganekêde, di nav ava germde, bi kirêcê hasilkirî, pînên pêçandinê hebûn. Bi wan çend car berjêr û berjor, milê wî pêçandin. Serê pêçiyên wî li derve mabûn. Paşê milê wiyê di nav kirêcêde, bi hustiyê wîve darde kirin, qeyda wê rojê li ser kirêcê nivisîn. Bûz li ser serê wî kêm dibû, diheliya, dihatin teze dikirin. Piştî alçiyê, bi alîkariya derziyan rehet rehet razabû.

Yên dora xwe, hemû nas dikir êdî. Destûr dabûn, hêdî hêdî xeber bide, lê belê ne awqasî zêde. Wan rojên pêşîn, bi xweve çûbû, lewra bi êşa sîngê xwe nehesiyabû. Bi zehmet bîhn distand. Hustî, hêt, pişta wî gişt di nav birînande, jan didan. Wekî hevîr û palaxê bû. Di kîjan alîde bihêlî, wê bi wî alîde biketa. Diya wî ji ber serê wî neqetiyabû. Di destekîde destmala şil, cara digiriya, caran rû û eniya kurê xwe paqiş dikir. Doxtor ku diçûn, bi çavên hêsir, ji hemşîran û yên ku nexwaşan dinhêrin lava dikir.

— Hûn çi dibêjin? Kurê minê xilas bibe gelo? Ez qurbana weme, erê wê xilas bibe?

Paşê xwe nedigirt, dîsa digiriya. Ew, li vê jinika herdu çavên wê wekî du kaniyan, dinihêriyan û gunehê wan pê dihat. Wê dîsa: — Ne hêsaye. Dilê diya, biborin. Erê wê xilasbe? digot. Wan gelek caran karê xwe dikirin û dizivirîn, çend pirs jêre digotin.

— Netirse, xaltiyê. Netirse. Wê xilasbe. Ev çiye? Me yên, ji kurê te xirabtir dîtin. Bi lingê xwe çûne malên xwe. Tu jî. Tê çend rojan şûnve bibinî. Diya wî dîsa herdu destên xwe bilind dikir, di nav lêvê xwede dua dikir.

— Xwedê... Xwedê. Ez qurbana te xwedêyime. Ewî ji minre, ji jin û zarê wîre bihêle. Xwedê, Xwedêyo.

Ew herdu rojên pêşîn Ûsiv axa jî, ji ber serê kurê xwe dûrneket. Kurê wî ku hate ser xwe, Ûsiv axa zivirî gund. Kes li gund nîn bûn. Karê wî li bajêr hebûn. Her tişt li hev waliyabûn. Bo karên xwenî dinê, bo gundiyan ku xwastibûn kurê wî bikujin, çû bajêr.

Diya wî, li ser kursîkî, bi nîvcî rûniştibû, dest û milê kurê xwenî neşikestî miz dida. Li ser gotina doxtiran, nedihîşt kurê wê pir bipeyive. Li ser pirsandina kurê xwe, wê dûr û dirêj bersiv dida wî. Bi vî tehrî nedihîşt, ew zêde xeber bide. Alçî wekî keviran hişk bûbû, wî bi destê xwenî dinê lêdixist caran. Şaş dibû, kirêç çilo awha hişk dibe.

— Wax, wax... Kurê min, tu ji kure ketî nav wan zaliman?

Kurê wê nedikaribû bîne bîra xwe ku ev bûyera çilo bû. Ji diya xwe pirsî. Doxtiran di derheqê wê rojê gelek tişt jê pirsiyabûn. Qet tiştek nehatibû bîra wî. Doxtirekî «torbê bûzê» xwastibû, çend derzî lêxistibû. Niha, dîsa jî qet tiştek nedihate bîrê.

— Wan gurên har, hatine dora te. Traktor dûr ketîbû. Xilas bûbû. Min ji bavê tere got, «ew ciyên me çandine, çima têra me nakin?» «Tu çi zanî?» got. Çima tu bavê xwe nasnakî? Min jî zimanê xwe girt. Tevî karê wî nebûm. Tu li bintara sûrê bûyî. Me hêvî kir ku tu bêyî malê. Em çi bibînin nişkêve? Tu berve koma gundiyan diçî. Destê tede ne darek, ne jî çekek hebû. Wekî sêlafekê, di destande kevir û dar nêzî te dihatin. Bavê te qîriya. Debanca xwe kişand û reviya. Tu zanî, piştî wê rojê, bi destekî nikare debancê bikar bîne. Gulek dudu teqand. Ew hê jî xûlîbûn, qehirîn. Min tu nedît. Tu li erdê bûyî. Te destên xwe li ser serê xwe şidandibû. «Li min nexin, li min nexin» te digot. Paşê çi hate bîra bavê te nizanim, debance kire paşila xwe. Dihate cem te. Çendek hatine pêşiya wî jî. Lê belê xênji çêran, pêşda neçûn. Min xwe avête ser te. Nehîşt, ku li te xin. Soro, yê dora xwe didehfandin, dûrdixistin ku te biparêze. «Lawo hûnê mêrik bikujin. We yek hildaye nav xwe. Hûn çi bêvicdanin...» digot Soro. Paşê ji destê yekî, dar sitand. Herdu çîpên xwe vekir, tu hildayî navê. Tu paraztî. Tu li erdê dirêj kirîbûyî. Çend kevir jî li min ketin. Diya te qurbana tebe. Xwezila gişt jî li min ketana, tiştek bi te nebûya. Tu wek ku xweve çûbûyî. Dinalyayî. Çend hew jî li Soro ketin. Paşê bavê te jî hate cem me. Dema ku tu dîtî, ricifî. Dîntiya wî girt. Bo debancê, destê xwe bire paşila xwe. Yên dinê jî wekî gurên ku têr nexwerî, bi dijminî lê dinihêrîn. Didane xeberan. Yalêk dinê jî dîntiya bavê te.

— Rind kiriye. Ax gere du sê hew velezandina ku... Ax, çi bexte? Ax... Ji wanre namîne ev.

— Tu nepeyîve. Bisekine kurê min. Nepeyîve.

Marûf ruyê xwe li alê dinê zivirand. Diya wî jî rabû çû, destmala destê xwe şil kir. Eniya wî mizda. Torbê bûzê bi destan teselî kir. Nîvî nîvî helya bû.

Paşê diya wî, çilo kurê xweyî bi xweve çûyî anîbûn, nobedar xeber dabû bajêr, jîp anîbûn, çawa cendirme hatibûne gund, yek û yek ji kurê xwere qise kir.

– Doxtirê bajêr tiştek kire milê te. Çend caran bi qîrîn gazî te kir. Deng ji te dernediket. Birîna serê te pêçand. Bin çevên te wisa reşhêşin bûbûn ku sê carî qasî nilıa. Her derên te bi birîn bûn. Milê te, wî yalî û vî yalî diket. Şikestibû. Textikek dane cem ınilê te, bi pînên sipî pêçandin. «Li vir nabe, zûtirê bibin wîlayetê, nexweşxanê» gotin. Em jî hatine vir. Ez wisa tirsiyabûm... Te qet qise nedikir. Te gotin nedibihîstin. Şikir ji xwedêre, tu niha başî. Ne wisane kurê min? Tu başî ne?

Li rûyê kurê xwe nihêrî. Çirmisî û melomestoyî bû. Du sê hêsir ji çavan jêrde hatin xwarê. Hemşîra bilinda zerîn hat bûz guhart. Agirê wî pîva. Havîtandina damarên wî, li kaxizên ber serê wî nivisî bi qelemên sor û hêşin. Diya wî kurê xwe neda xeberdanê. Çend sehetan bi xewre çûbû. Dema kurê wê palda, ew jî li ser kursîkî, serê wê li ser ciyê Marûf, hinekî bênijî. Hişyar bû, dest û rûyên xwe şûşt. Bi dengê ava qurnê kurê wê jî hişyar bû. Wexta xwarinê bû, xuregê wî anîbûne ser ciyê wî.

Çend rojan şûnde, doxtirne dinê hatin. Derzî li bin peniya wîre kirin. Bi çakûçne lastik, li milê wiyê neşikestî û çokê wî xistibûn. Paşê bi hinek hacetên bi tîrj û elektrîk çavên wî nihêrîbûn. Li kaxizên ber sêrî, bi herfên ınezin û xiloxarî, «comınotîo – amnesî, binê çavan başin, reflex başin, hefteke şûnde nihêrandineke nû» nivisîn...

Wê êvarê diya wî, li dora xwe dinhêrî û:

– Tu dirêj kirîbûyî. Li ser cî. Em hêviya jîpê bûn. Min ji bavê tere got, «Soro nebûya, yê kurik bikuştana. Ez jî pêre... Xwedê jê razîbe.» Bavê te rûyê xwe tirş kir û qirçinand. «Wî kûçikî wêde bihêle. Her tişt ji bin serê wî derdikeve. Lê, vê carê xilasbûna wan tunene. Ez diya wî, jina wî...» got. Meriv qet tiştekî ji bavê te fam nake. Ev çine, têne serê me? Ji kurê xwere got.

## – XXXII –

Şukriyê nobedar hate bajêr, çû qereqolê, cem qumandarê cendirman. Bihna wî çikyayî, hilke hilka wî bû.

— Gundiyan, îro kurê axê kuştin.

— Kê kuşt, kê?

— Hemû gundiyan, giştan. Kurê axêyî mezin, hildane nava xwe, bi kevir û daranve kuştin.

— Mir an birîndare?

— Wexta ez hatim, hela hê nemiribû. Lê belê ber mirinê bû. Ruh dida. Dibe niha can daye.

— Lawo, rast bêje, kuro. Çima tu ji cem xwedê têyî? Meriyê nemirî dikujî tu.

— Ew zeviya ciyê dibistanê, traktora axê ew der vê sibê dajot. Wê çaxê lêxistin. Hemû hatine ser. Paşê şofêr bi traktorêve revî û xilas bû. Kurê axê li wir bû. Bezyane wî. Rikêfî wî kirin. Bi kevir û daranve. Dê û bavê wî gîhiştinê. Birîndar û bi xweveçûyî birine malê. Bi deh ciyan birîndare. Ezê jîpekê bigrim, eger nemiribe, em birîndar bînine vira.

Qumandar bi lez rabû ser piyan. Lêvê xwe gez dikir. Difikirî. Li pêş malê, bi wî salên xweve, Marûf wekî zaran, çito ji wanre xizmet kiribû? Gişt hatine bîrê. Çawa jî bi hemdê xwe bû. Ji bavê xwe nermtir bû. Feqîrê feqîr. Hatin li wî xistin.

Bi têlefonê li qaymeqam geriya.

— Begê min... Niha nobedarê Tendûrekê hat. Gundiyan vê carê jî, kurê axayî mezin birîndar kirine. Na xêr. Ne bi gullan. Bi kevr û daran. Belê vê sibê bûye. Bi gotina wî, pir giran birîndare. Belê... Belê. Ezê hayê bidime savcî jî. Difikirim birîndar, zûtirê, bigihînime vir. Heke destûrê bidî, ez jîpa we jî bibim. Yekê jî, nobedarê bibîne. Belê. Belê. Ser seran. Sipas dikim. Ez çewa hatim, ezê xeberê bidim te, begê min.

Telefon girt. Cixarek vêxist. Paşê tiliya xwe da ser zengil, cendirmek hate hundir.

— Ji hevalên xwere bêje. Kî heye li santralê? Nobedarê santralê, nivîsdar, du kesên dinê bira li vir bimînin. Yên duh çûbûn, hela hê nehatin ne?

— Na xêr nehatin, qumandarê min.

– Wisane, bira deh kes hazir bin. Li Tendûrekê bûyer heye. Bira yek here û şofêrê qaymeqam begê bibîne. Zû, zû. Xwe giran negre wisa. Zû.

Ji dû cendirmanre dîsa qîriya. Nobedarê Tendûrekê jî wê jîpek bidîtiya. Bira wî jî mêze bikin. Li ser hev teme dayê, nava panzde deqîqade bira li ser rê bin.

Vê carê sawcî geriya. Çi bihîstibû, ji wîre jî got. Nobedar digot ku kurê axê Tendûrekê birîndare. Heke mirîbû, wê jîp zûtirê jêre bişanda. Bi hirmet têlefon danî cî.

Nişkêve, gundî wekî babelîskekê berve zeviya ku dihate ajotinê çûn, wê çaxê Soro li mal bû. Ciyê dest girtina stîlê qetya bû, ewa çêdikir. Pêre jî awqas zemet kişand, lê dîsa jî hela hê baş nebûbû ku qîrîn û deng bihîst. Reviya berderê malê. Piçek dereng hate zeviyê, wê çaxê traktor dûrketibû. Yên li ser pûllixê jî, jê dûrdiketin. Cîranên wî bi cîkî kom bûbûn, di nav xwede li yekî dixistin, didane ber pîhnan. Darek radibû û yek dadiket. Soro bi bîhn çikyayî gihîştê. Yek, wekî çiwalekî di bin lingên wande bû. Kevir û pîhn li ser hev lê diketin. Soro dît, eva kurê axa yê mezin Marûfe. Lezekê sekinî. Bi vî halî, pênc deqîqe nedikişand, wê bikuştana. Gundî nedisekinîn. Pir zehmet bû. Ûsiv axa ku dest avêtibû debanca xwe, gundî bêtir qehirîbûn. Bi mirma wî lêdixistin. Bi xeyzeke giran. Soro digot, «lêmexin, lêmexin, ez ji were dibêjim, lêmexin...» Herdu çîpên xwe vekiribû, Marûf hildabû navê, xwe li ser wîde xwar kiribû Soro. Ewa ji daran diparêzand. Wê çaxê diya wî, mînanî istêrkek ji ezmanan bikeve jêr, wek bombeke ber bi teqandinê hate wir. Kurê xwe hemêz kir. «Wax kurê min... Lê mexin. Wax kurê min...» digot û li nav çîpê Soro, kurê xwe diparast. Çend kevir û dar li wê jî ketin.

Nişkêve, wek hewaneka ba ji ber here, gundî şûnve vekişiyan. Te digot, yên gava dinê ne ev bûn. Wan lê nexistibûn. Darên destê wan sist, bêdeng, dûrve li Marûf, dê û bavê wî dinihêrîn. Diya Marûf têdigîhîşt, êdî lênaxin. Kurê xwe li aliyê dinê zivirand. Ji dev û pozê wî xwîn dihat. Rûyê wî bi xuliyê aliyayî, nedihate naskirinê. Şewqê wî ji sêrî ketibû. Porê wî bi xwînêve wekî helîsê bûbû. – Wayê. Wayê. Kurê min kuştin. Qet dîn, îman bi were tune? Wax lawê min, digot diya wî û destê xwe bire ruyê xwe. Xwe pencerûk dikir, singê xwe dida ber kulman. Soro li ser Marûfde xar bûbû û li halê wiyê xirab mêze dikir. Ûsiv axa jî hatibû ba wan. Kef bi dêv ketibû. Mînanî kaxizekê sipîçilokî bû. Dest û lingên wî diricifîyan. Li ser piya, li jina xwe nihêrî, paşê li Soro nihê-

rî. Çavên wî wekî dînan bûn. Di ciyê xwede ranediwestiyan û dilîziyan. Serê wî jî bi wanre diçû û dihat.

— We gûkî rind xwar, de herin. We ew jî kuşt. Bira dilê we rehetbe. Gurê serê çiyan, mêrkujên bê dîn û bê îman.

Pirsên wî wekî qamçikî li meriyan xin. Kesî bersiv nedayê. Serê Marûf li ser çoka diya wî bû û bi zehmet bîhn hildida û dida. Serê xwe hevraz kir, li mêrê xwe nihêrî. Te digot, wê wî bixwe. Wekî kêreka tûj, li pişika meriya keve.

— Mir. Bira bimre. Bira ez jî bimrim. Wê çaxê çavên te têr dibin. Ax kurê min. We gişta bi tevayî ew kuşt. Hûn, gundiyên wî yên çav sor, dev bi xwîn. We û bavê wî tev ew kuştin.

Zare zara wê li serê gund, alê jorîn dihate bihîstinê. Dilê meriya tîşî tîşî dibû, wexta mirov dibîhîst. Niha, li wir çend kes tenê hebûn. Yek û dudu, şûnve kişiyabûn, çûbûn. Soro berî wan têgêhîşt:

— Lehîfekê, cercîmekê bînin. Em wî bibine malê, got.

Ev cendekî bi xwîn, wekî torbekî goşt, di nav lehîfêde birine hundirê odê, Soro jî li wir bû. Dît kes pêre xeber nade, gelekî rûsar lê mêze dikin, Soro ji ba wan bêdeng, hêdî hêdî vekişiya û çû.

Birîndar her bîhn hildida û dida, ji dev, pozê wî xwîn dipekiya û dikişiya der dorê wî. Milê wî wekî darekî şikestî, badibû. Meriyan ku digirt, dihejiya. Bi ava şîrogermî xwîna wî, birînên wî, ciyên xulî bi xwînêve zeliqîbûn, şûştin, paqiş kirin. Bîhn hildanên wî gelekî tenik bûn. Meriya bi zehmet dibihîst. Jinan li rû û singên xwe dixistin. Mêr her şaş bûbûn. Ûsiv axa, du balgî dabûn li ser hev û rûniştibû. Serê wî di nava herdu destên wîde bûn, difikiriya. Gişt jî bê çare bûn. Tiştek ji destan nedihatin. Wekî belengazan bûn.

Nobedar Şukrî, melê gund û hinek ji gund, li odê bûn. Xwastin nobedar Şukrî, bi hespekî zûtirê bişînine bajêr. Xeberê bide cendirman. Li hatinê jî jîpek bi xwere bihaniya, birîndar pê bibirana bajêr. Halê wî ne baş bû. Ji xwedê hêvî nayê birrînê. Ax hela lê, hela lê. Awqas meh derbas bûn, hela hê romorka paşiya traktorê nesitandibûn. Wekî bihata, niha wê birîndar pê bibirana bajêr. Çi hewcebû, dûr, dirêj li benda jîpê rawestana. Him jî baş dibû. Çiqasî zû bigêhêje ba doxtir, awqasî baş dibû. Bê namûsan. Perê wê girtibûn, lê hela hê romork neanîbûn.

Piştî rêxistina Şukrî, li ber serê birîndar, qîrîn û girîn zemanekî kişand. Dîsa êşa sîngê Ûsiv axa dest pêkir. Car caran bîhna wî diçikiya û hişê wî diçû. Ew jî dirêj kirin. Ava sar pê dane vexarinê. Hinek jî li ruyê wî reşandin. Şofêr hat. Traktor anîbû ber dêrî, xwe sipartibû

dîwarê odê, bûyerên îro difikirî. «Heke ku ez nereviyam, dewsa wî, niha ezê di vî halîde bûm» got di dilê xwede. Paşê ji bo van fikrên xwe, fedî kir. Dewsa wî yekî din dimir. Bo vêya meriv şa nedibû. Ya rastî, xwe jî nedixwast bimre. Çi sûcê wî hebû? Digotin zeviyan bajo, wî jî dajot. Bisekine digotin, wê çaxê disekinî. Ji vê zêde, çi ji wîre bû? Her tişt ji bo perçek nan nîn bû çima? Li milê şikestî, serê bi xwîn, ruyê ku nedihate naskirinê, dinihêrî. Milê wiyê şikestî, ruyê wiyê birîndar û nav xwînêde mayî dihate ber çavan. Ricifî. «Xwedê kiriye ez nînim. Xwedê kiriye, ez reviyame û xilas bûme.»

Piştî çend sehetan, halê Marûf nehate guhartinê. Baş nedixwiya. Lê nemir jî. Dema li dê û bavê xwe mêze dikir, kurê wan li ber mirinê bû. Ne tiştek dibihîst, ne jî çavên xwe vedikir. Yên awha qet xilas nedibûn. Nihave şîna wî digirtin. Diya wî digiriya û kilamên şînê distra. Wê dihîşt û yeka din dest pê dikir.

— Wax kurê min. Kurê minî bê miraz çûyî. Ax erd serê me bixwe. Çawa serê te xwar. Mîrat erdê Tendûrekê. Ax, xwazila qet bira ev erda jî nebûya. Ax bira ew destên li te xistin, bişkestana. Jin û zarên wan li ber dîwaran pars bikirana. Ax, ew destên li te xistin, bira kotîbûn têketanê. Tilî, pêçiyên wan, pozê wan biketa. Rezîl bibûna. Ax lawê min ax...

Tu kes ji malê, pariyek xwarin nekiribû devê xwe. Destên xwe nedane tiştekî. Mî û çêlek nedotî çûne çolê. Karên din jî dest nedayî man.

Şofêr xwe sipartibû dîwêr, difikirî, «tu gunê vî lawikî tune, çi dike ew bavê wî dike. Ji kîsî xwe ewê badilhewa here. Pir heyfe.»

Jina Marûf, li cem hemûyan nedigiriya. Lê li malê, hêsrên çavên wê, mînanî baranê dihatine xarê. Li cem wan, li pê, wexta mêrê xwe mêze dikir, bi lêçeqa xweve dev û lêvên xwe digirt. Zarên wê, pêşa wê girtibûn. Ji kesî tiştek nedipirsiyan. Wekî hemû kesan, ew jî digiriyan. Hêsrên çavên xwe û firtixa pozê xwe, bi pêşa xwe paqiş dikirin.

Rojeke biharê û xweş, lê jin û mêr digirîn û dilşewitîne. Hewa odê wekî mirinê giran bû. Yên li ber serê wî rûniştî, destmal di destde, berî mêşan didan û zanibûn êdî ew şûnve nayê.

Te digot, ba û bager damiriye. Çilo carna, bagera şevê bi sibêre diqede û sahî, nermî, nîvgermî dest pê dike. Niha yên çûne malên xwe, wilo bêdeng, di hemdê xwede, giran giran difikiriyan. Çawa bûbû ku gihîştibûne vê nuxtê? Dest bi şer kiribûn. Cîranên nêzî hev, yên merivên hevin, çend kes dihatine ba hev, yên bûyî û dawiya vî karî ji hev dipirsiyan. Gelo wê çilo bibe?

– Birangê min, ev du salin me sebir kir, me dengê xwe birrî. Kurê xelqê wekî qumandarê eskeriyê, bi plan kar dike. Berê traktoreke bi şirîk anî. Paşê jî çû, xwe yek kirî. Nîvê gund ji gund derketin. Dîsa jî têrê nekir. Zeviyên me hêdî hêdî bi xwe ajot. Dît karê wî rast diçe, vê carê dest avête dewsa ciyê dibistanê.

Yê dinê, bêdeng û di halê xwede difikirî, bersiv da:

– Xwazila me li kurê wî nexista. Dibêjin ku ne başe, li ber mirinêye. Bi xwedêde nemiriya. Heke bimre, serê meyê gelekî biêşe. Kurê wî jî ne mîna bavê xwe bû. Ya rastî ew jî têjkê maraye. Dîsa jî ji bavê xwe çêtire. Bavê wî ji xirabiyê têr nabe. Gere bav bimra. Heyfa lêwik.

Cixara xwe dikişand.

– Lo birao, çiqasî zû pê hesiyan? Awqas meriv kure pê hesiya? Te digot, wê deqîqêde haya hev kirine. Te çûye, gişt ji malên wan derxistine. Way li min bavo. Ew çi bû? Ew çilo bû?

Yên îro bûyî dîsa anîn pêş çavên xwe. Hinekan digot:

– Çi heyf, me traktor ji dest derxist. Çû xilas bû. Kurê kerê, çiqasî jî bi aqil bûye? Fem kir ku çi wê bê serî. Diya min jina minbe, eger me bigirta, meyê bi erdêve bikira yek. Wê ji kurê axê xirabtir bûbûya.

Gişt jî têdigîhîştin, pir nakşîne, cenderme wê bihatana gund. Şukriyê nobedar bi siwarî çûbû. Çawa hebe hesp yê axê bû, wê bê eman bibezanda, zû bigîhîşta bajêr. Paşê ji kîsê axê jîp kirêkirin ne zehmet bû. Cendirme wê bihatana gund. Hemûyan rind zanîbûn ev. Çûbûn malên xwe, di nav hevdude qise dikirin. Berê, kesî cendirme nedianî bîra xwe. Yên ku dianî bîra xwe, nedixwastin, cîran bitirsin. Te digot, cendirme ne ji bo wan dihat. Karên vê sibê, wan nekiriye. Tirsa dilên xwe nîşan nedidan. Bo vê, xeberdan nedianîne dor cendirman. Sehet derbas bûn. Tirsa dilên wan, êdî xwe dida der. Hêdî hêdî ji lêv, dev, çav û rûyên wan, bîhn hildana wan, tirs dihate xuyanê. Çi qasî xîret dikirin ku tirsa xwe binixêmînin, hêrsa wan her zêde dibû. Çi bikirina nedibû êdî. Tirsa wan ji rûyên wan dihate xwandinê.

Soro dereng hate mal. Li ber xwe diket, xemgîn bû. Milên wî ranedibûn. Çawa jî haya wî zû nebûbû. Sitîlê çawa nehîştibû, zûtirê bibîhise? Heke di sêrîde bigihîşta, nedihîşt tiştên awha bibin. Eger ew nebûya, kurê axê mirîbû. Heke xilasbe, xwedê jî zane, wê bi xêra Soro bijî. Soro jî çend dar û kevir xwaribû. Pir dilteng bû. Xwazila wisa nebûya. Ya rastî jî, wekî bavê, gunê wî pir tunebû.

Jina Soro, qehr, berxweketina wî ferq kir. Lê tiştek ji dêst nedihat. Xwast, çend pirsên dilgermîn bêje. Nikaribû. Wê çaxê Mîro hat. Bi pirçî bû. Medê wî tunebû. Ewî jî wek Soro, xeter baş didît. Cendirme

wê bihatana. Yên zordestî û teda bikirana. Heke birîndar bimre, tu wê çaxê bibîne. Herdu jî ji tiştekî ditirsiyan. Kê kurê axê kuşt? Lê wekî gundî hevdu negirin û bitirsin. Paşê sûc bavêjine hustiyên hev. Emê wê çaxê bişewitin. Cendirme li ber hatinê bûn. Birîndar bimre, kes nikare ji kesîre bêje ku te kuşt. Kî çi zane kê kuştiye. Gundekî hemûyan. Wê kê bi ceza bikin? Lewra, gerek meriv hemû cîranan hişyar bike. Gundî gişt li wê derê bûn. Lê belê kesî nedîtibû ku kê lêxistibû. Kevir û dar havêtibûn kurê axê. Gerek hemûyan wisa xeber bidana. Şerê di nava gunda bû. Heke sûc bavêjine ser hev, qet yek jî nikaribû, ji bin vî karî bifilite.

Soro gazî Eliyê xwarziyê xwe kir. Ewa rind serwext kir. Di nava nîv sehetêde gerek hemûyan ev tişta bibîhîstana.

Herkesî fem dikir, wê li gund tiştên mezin bibin. Bêdengî hebû. Eger li cîkî bêdengî hebe, ji wir bitirse. Dawiya bêdengiyan tîpî û bagerin. Teqîniye. Lewra di halê wilode, hêrs û şik bi hevre dimeşin. Guhên meriyan her tiştî dibihîsin. Ji her tiştî meriv dikevine şikê. Van deman, meriv di dilê xwede pir tiştan dihêse. Halê merivan, nihêrandinên çavên kesan, gelek tiştan dibêjin. Belê, dinêya di hundirê kesan û dinya derve bi hevre girêdayiye. Nava wande rêyek heye ku em wê nabînin. Di piçûktiya xwede gelek caran dîtibûn, piştî dewreke bêdeng, bê bûyer, qîrîn û şerên giran, bûyerên kesî hêvî nedikir, dihatin. Lewra kîngê halekî awha bijîn, dawiya wê dianîn bîra xwe. Li Tendûrekê jî, piştî bûyerên vê sibê, ev bêdengî, ev kerrbûn nîşan dida ku tiştên mezin wê bibin. Di peyre dihatin ew.

Carekê duda, çend jinên bi salên wan zêde, çûn mala axê. Li vegerandinê halê Marûf ji gundiyanre digotin. Hela hê nemirîbû, lê belê wekî berê, li ber mirinê bû. Hinekan bi nîvdilî digotin:

– Xwedê zane, xilasbûna wî tune. Tobe, tobe. Xwedê zane. Qet ne başe. Ne çavên xwe vedike ne jî tiştekî dibîhîse. Kevçîkî ava sar jî nikarin ji gewriyêde daqultînin. Tu cîkî wiyê sax tune, lê dayê. Serî, çav birîndarin. Mil şikestiye. Her derên wî perçiqîne. Ne bi cane. Wekî mirîkî bi nîvcane.

Ev jinên ku dihatine mala axê, hevalên jina wî bûn. Berê çend caran çûn û hatin. Kîngê ku vedigeriyan, li malê gundiyan dor lê digirtin û dipirsiyan.

– Kî hene li mala wan? Bîhna xwe dikare hilde?

– Çavên xwe qet nikare veke? Çima qet nabihîse?

Bersivên wan jî, gelek caran, dilxweşî nedida kesî.

Qumandar bi deh cendirmanve hate pêş mala axê, êdî nîvro zûve derbas bûbû. Bi du jîpanve hatin, toz û dûman li pey xwe radikirin. Esir nêzîk bû. Nobedar ku got «kurê axê kuştine», qumandar bi rêde çend cara şofêr hişyar kir, hê lez bajo û zûtirê bigîhêjine gund. Te digot, difiriyan. Ji binya gundve nêzî malê dibûn, qumandar mêze kir, li derve kes tunebûn. Ne li gund, ne jî li ber derê axê. Wî zanibû, her tim awha dikin. Pir caran kom dibin, xwîna birînên xwe naşon û dixwazin ku bûyeran mezin nîşan bidin. An jî wekî qet tiştek nebûye, qet haya wan ji kesî tune. Xwe wisa nîşan didin. Kes nayê xuyanê. Meriv ku kesî digere, kes tune li wir. Niha jî wisa. Lêxistine, kurê axê kuştine. paşê jî xwe wenda kirine. «Hela hûn rawestin, rawestin. Emê ji hevdû bipirsin, kûçiksanno.» got di dilê xwede.

Ji mala axê jin û mêr derketin pêşiya wan. Dema çavên wan, bi qumandar û cendirman ket, he dizanibûn, xilaskarên wan hatine. Hêjî dengê xwe bilind kirin ku gunehê qumandar her zêde bi wan bê. Her bêtir giriyan. Berê qumandar, paşê cendirme peyabûn. Serçavên wan di nav tozêde bûn. Yê herî dawîn, çav biryên wî ji tozê nedihatine xuyanê. Qumandar nêzîkê Ûsiv axa bû.

— Ûsiv axa, serê te sax be. Marûf çawaye? Hê dijî?

Dengê Ûsiv axa ketibû. Kurt, kurt, hema ku dihate bihîstinê.

— Belê dijî. Lê bêxêre.

Cendirman, wekî di bin ava sar, nîv veciniqîbûn. Serên wan li ber wan, di pey qumandar ketine odê. Ode, carekêde tijîbû. Yên gava din, li ber dêrî bûn, ew jî hêdî hêdî hatin hundir. Birîndar li ber dîwarê odêyî rastê, li ser doşegeke sor dirêj kiribûn. Wekî zarekî piçûk bû. Yên ew nasdikirin, bawer nedikirin ku ev bedena ya Marûfe.

Doşeg hemû di xwînêde bû. Lihêfa li ser jî wisa bû. Lêçegeke spî avêtibûne ser serê wî. Nîvê pirî di xwîna sorde mabû. Hine cî zûha bûbûn, lê ji hine deran jî xwînê kêm kêm dilop dikir. Qumandar bi serde xar bû, bîhna Marûf gelekî tenik bû. Berê gelek caran dîtibû ku doxtir li damarên zenda merivan dinihêrin. Wî jî wisa kir. Li seheta xwe nihêrî, xwast bijmêre. Lê belê nikaribû damaran bibîne. Carekê duda dîsa bi tiliyên xwe teselî kir. Damarên wî wekî takî zirav, meriya bi zehmet ferq dikir. Qumandar rabû ser xwe, çav û biriyên wî tirş û bi hêrs, eniya wîde dilopên xwiyê hebûn. Berî peyivandina xwe, lêvên xwe gez kir. Ji Ûsiv axa re:

— Kurê xwe hilde. Karê meyê dirêj bikişîne. Hêviya me nemîne. Zûtirê bibe bajêr. Li bajêr wê çi bikin? Qet... Lê belê karê hukumatêye, bira haya doxtirê hukumatê jî bibe. Ew jî gelekî naxwaze we li wir

bide rawestandinê. Wê we bigihîne wîlayetê. Bi xwastina xwedê wê xilas bibe. Bira li vir nava dest û piyande neçe, got.

Berya Ûsiv axa, vegerî û ban kir:

– De... Tivdarekê jîpekê bikin. Nivînekê têde raxin. Pêre bira jinek jî here. De zû. De zû. Tu jî, tu jî pêre, Ûsiv axa.

Ser van gotinan jina Ûsiv axa him digiriya, him jî tivdareka xwe dikir. Nav çend deqîqande her tişt hatibû cîh. Birîndar kirine jîpê, serê wî di hemêza diya wîde, Ûsiv axa jî li ba şofêr bû. Qumandar derê jîpê vekir:

– Axa, tu, yên li kurê te xistin, nas dikî?

– Çi yek, çi dudu. Gund hemû. Ewanên bênamûs, gişt bi hevre bûn. Gişt, gişt. Hemû. Bi jin û zarên xweve, qumandar.

Birîndar şandin. Niha nobedar Şukrî, xulam, Hesen, Eso û biraziyê axê hebûn di odêde. Bîhna xwînê ji her derê dihat. Merivan ku li ruyê qumandar dinihêrî, ji çavên wî, niyetên wî baş fem dikir. Dixwast gundiyan bîne rê, heyfa Marûf ji wan bistîne. Mînanî dijminan bû. Cendirmên li cem jî jê ditirsiyan ku lê mêze bikin. Çavên xwe direvandin, nedixwastin li ruyê qumandar binihêrin.

Hela hê pir wext hebû, roj here ava. Rojên biharan, havînan dirêj bûn. Qumandar li ser kevirekî rûniştîbû û bê hizûr bû. Cendirme jî li ber, li benda gotinên wî bûn. Germa nîvroya havînê ku merivan diqelîne çûbû, niha hênikayîke şirîn hebû. Hênikaya esran. Tendûrek bêdeng, kerre, lê belê guh beliqandiye.

Qumandar he zanibû ku dinê li ser wîde hurşiyaye û ew di binde maye. Qumandar xwe di tengasiyêde didît. Birîndar li hemêza diya xwede li ber mirinê dîtin, hê jî dilê wî teng kiribû. Mînanî rêwîkî bû. Li pişt xwe nedinihêrî. Lez dikir. Dixwast, riya xwe biqedîne. Rê di serê çiyan, di newalande, wekî maran dûr, dirêj dibû. Rê bi çûyinê xilas dibû. Wî jî dixwast, dest bi karê xwe bike. Ya rastî çiye, eşkere bike. Dibe ku paşê, hewekî sivikbûn dihate bedena wî. Niha piçek şaşbûn li ser hebû. Ji ku û çawa dest pê bikira? Gelo kê dikaribû alî wî bikira? Digotin, gundekî hemûyan lêxistiye. Qet yên ku lênexistibûn, tunebûn gelo? Wê bi gundekîre, vê êvarê çilo bikira? Ya rastî, ji kê hîn bibûya? Ûsiv axa çû. Marûf nikaribû bipeyive. Yên ji pare mayî, tiştek ji dêst nayên. Wekî ne bê xeberbûna, nedihîştin Marûf di nav dest û piyada bê kuştinê. Ji vanên tirsonek, qet tu gû jî dernediket. Bi hêrs, rûtirş li dora xwe dinihêrî. Şofêrê traktorê li ber çavên wî ket. Yekî bêteşe û terrikî bû.

— Tu rind xilas bûyî. Te baş kiriye ku tu reviyayî. Kesî nikaribû te ji destên wan derxe.

Şofêr sor bû. He zanibû ku şerma wî dane rûyê wî. Serê xwe xar kir. Paşê dîsa li qumandar nihêrî.

— Belê wer bû. Min dît ku gelekin. Hemû berve min têne. Min jî zûtirê ajot, çûm, got şofêr bi şermoke.

Qumandar lêvên xwe dadikot û hişê xwede çend plan çêdikirin.

— Te rind kiriye. Ya rind te kiriye, got jêre.

Nobedar Şukrî bi wanre vegeriyabû. Çokê wî, paşiya şalê wî pîne kirîbûn. Wekî eskeran ew jî hazir disekinî. Texmîn dikir, qasekê şûnve, gelek kar wê bi para wî bikeve. Lewra çavên xwe ji qumandar nediqetand. Pismamekî Ûsiv axa, li bajêr, dema ku bûyer hîn bûbû, hesp ji nobedar sitandibû. Ew jî bi cendirmanre vegeriyabû, bi jîpê. Niha ji herdu çavên qumandar, hêrs û qehreka wisa dihate xuyanê ku ew bagera gundiyan ya vê sibê, li cem nedihate xeberdanê. Wisa nesitirîbû ku te digot her tişt wê bê serê wî bi xwe. Wekî kuviyan bi tirs bû. Ji qîrandinê, qelebalixê, bûyerên wilo hez nedikir. Dilê wî reş û tarî dibû. Xwe şaş dikir, nedifikirî. Pêşiya xwe nedidît wê çaxê. Piştî qederekê dirricifî, hêdî hêdî hînî vî halî dibû. Tirsa wî dilop bi dilop winda dibû û xwe jî nêzîkî bûyeran dibû.

Qumandar rabû ser piya. Destê xwe dirêjî herdu eskerên pêş xwe kir.

— Tu û tu.

Eskeran xwe berhev kirin û gavek pêşde hatin. Destên wan li ser tivingên milê wande, hazir rawestiyabûn. Li çavên qumandar dinihêrîn. Qumandar paşê, li aliyê Şukriyê nobedar zivirî:

— Tu jî nobedar, tu jî, got.

Qumandar ku rabû ser xwe, nobedar hat li ba herdu cendirman cî girt. Biriyên qumandar quloz dibûn û dihatine xarê. Di hişê xwede hine tişt hildidan û datanîn. Eniya wî dileyzt.

— Hûnê tev herin. Nobedar, tê gazî mêrên hemû malan bikî. Bira bênê vira. Yên ji heyjde salî mezintirin. Yên ku nayên, hûnê bi zorê bînin. Destên xwe sivik bigrin. Wisa xwe nehejînin, wekî zarên efendiyan. Binihêrin, paşê hûn zanin ha. Pir hişyarbin ha.

Qumandar ewanan şandin, xwe li pêş derî diçû û dihat. Dilteng bû. Kerr û bêdeng disekinî û hêrsa wî her zêde dibû. Paşê zivirî, ew heyşt cendirmên mayî mêze kir. Xulam diçûn, dihatin. Jin û zar, pey çûyina birîndar, ketibûne malê.

— Hûnê sungiyên xwe pêvekin. Yên hatî bi rêz li ber dîwêr bidine sekinandinê. Ezê ji hundir yek, yek ji we bixwazim û hûnê bînine odê. Emê ji nav wan, yê ku bûyer kirine û rê berê wanin, bibine bajêr. Gere em dereng nemînin.

Rengê wî çilmisî, dengê wî bi lerzok bû. Dixwest ku gundiyan di tariyêde bibe bajêr û kes wana nebîne. Awqas kesan, bi qelebalix, ronahiya rojêde têxe qereqolê. Qet tiştekî baş nîn bû. Belê vana kurê axê kuştibûn, lê dîsa jî baş nedigotin. Wana, Marûf birîndar kiribûn, wekî miriyan. Gunehkar bûn. Dîsa jî awqas kesan, di nav sungiyan, di nav bajêr derbas bike, bibe û têxe qereqolê. Wisa nabe. Hinek ji xelqê bajêr, di kuça û qehwan dest bi xeberdanê dikin. Lewra xwest wextê rind hesaw bike. Gewrî û lêvên wî zuhabûn. Ji yên cem xwe av xwest. Lezekê şunde, jêre avdew anîn. Bi ser hev du şerbik vexwar, paşê eskeran jî dûmî hev kirin. Xulamê avdew anîbû diçû hundir. Qumandar ew zivirand, avdewa mayî jî bi ser xweve kir. Wê çaxê gundiyên ku hêdî hêdî ji nav gund dihatin, dît. Lingên wana nedixwestin ku pêşde bênê. Bi xwe serê xwe dihatin. Serên wan di berde bûn. Ji cendermekîre:

— Here wî yalî, li wê derê binihêre. Gazî wana bike. Bira zû bên, got.

Cendirme berve gundiyan çû, wana jî gavên xwe sivik kirin. Xwe dispartine hevdu û dihatin. Nêzî qumandar dibûn, te digot ku lingên wan ji erdê ranedibû.

— Nêzîk werin. Nêzîk werin. Qumandar qehirî û paşê vegeriya li aliyê cendirman.

— Min ji were çi gotibû, erê? Hûn çi wekî gêjan rûyê wan dinihêrin?

Cendirmê pêşîn, wekî sûcê xwe bide bîrkirinê:

— Li vira. Li vira. Li ber dîwêr rêzbin. De zû, de zû.

Şewqên xwe dabûne destên xwe. Xeber nedidan. Nîv diricifiyan. Pişta xwe dane dîwêr û sipartine hev. Li pey wan jî hê dihatin. Van dît ku berya wana gelek hatine, tirsa xwe vedişartin û nêzî rêzê dibûn. Di bin çavande li hev dinihêrîn. Ji ruyên qumandar û cendirman, dixwestin ku tiştna fem bikin. Qumandar niha bê deng û kerr bû. Yên nûhatî mêze dikir. Bi lêvên xwe dileyst û gez dikir. Qelebalix her diçû zêde dibû. Hinek wekî gunehkaran dihatin, kerr û lal diketine tevî rêzê. Wekî şagirtên ku sûcên xwe zanibin. Hinek, çavên qumandar û cendirman digeriyan ku li ber xarbin. Li ew jî nedibû. Yek ji cendirman ji wanre got, bi sê hew sê hew têkevine rêzê. Mînanî eskeriyê. Bêdeng,

di nav hevde bi piste pist dipeyîvîn. Yên rêz şaş dikirin jî hebûn. Yên nû dihatin, bi hêsanî ba cîranên xwe cî digirtin. Dawiyêde nobedar, herdu cendirman, çar gundî li pêşiya wan hatin. Gundî tevî rêzê bûn. Cendirman paniyên xwe li hevdû xistin û silav dane qumandar.

– Hemû hatin qumandarê min.

– Kes nema ne?

– Na xêr. Kes nema, begê min.

Soro di navîna rêzêde, li cem Mîro û Seîd bû. Pişta xwe daye dîwêr. Pişta wî diêşe. Piştî bûyerên vê sibê, serêşekê pê girtiye. Serê wî diziqitiya. Pişta wî bi çokanve diêşiyan. Destên wî diricifiyan. Bêkêf bû. Mihê kalemêr, xwe dabû ser qulofîskan. Nikaribû li ser piyan bisekine. Qumandar jêre dengê xwe nekir, cendirman jî li ser nesekinîn. Evdo li pêş wî, li ser piyan bû. Ji tirsan milên wî daketibûne jêrê, lê bû li erdêkeve. Bi dizî dizî li dora xwe dinihêrî. Kesî li wî mêze nedikir. Bersiv nedidan. Hişê wî hilnedida. Gundiyan wisa zêde rû nedidanê. Digotin ku merivê axêye. Xwe jî niha di nava sungiyande bû. Bi meraq, bendewar bû.

Soro bi xwarziyê xweve xeber şandibû hemûyan. Gelo gişta bîhîstiye? Dibe ku bêjin, «ez nîn bûm, hinekên dinê bûn». Qumandar li pêş wana diçe û tê. Li ruyê kesî nanihêre. Ji dûrve jin, zarên wan mêze dikin. Çavtirsîne. Mala Ûsiv axa jî meraq dikin, gelo yê çi bibe? Birîndarê çûyî bîr kirine. Ji gundiyên xwe gelekî diqehiriyan. Qet ji xwedê netirsiyabûn, hetanî mirinê li Marûf xistibûn? Marûf çi li wana kiribû? Gundî tu cara jî, nedihatine rê. Du salin ji derd û belan xilas nedibûn. Yek diçû û yek dihat.

Qumandar bi cendirmekîve çûne oda Ûsiv axa. Li odê kes tunebû. Xulaman her der paqiş kiribûn. Şofêr, derva li ser motorê, çend hacetê wê teselî dikir. Qumandar li ser piyan bû, ji cendirmanı e got:

– Ji sêrîde dest pê bike û bîne. Gunehkarên rastî kîne, gere ez wana bibînim. De bîne. Ewê, herî sêrî bîne.

Cendirme, li pêşiyê, yekî pêncî salîve kete hundir. Rûyê wî qemitî, poz xiloxarî bû. Xwe şûnve ma, bi destê xwe gundî pêşda dehfand bi nermik. Hestiyên gundî mezin, rûyê wî gelekî bi pirç bûn. Pêşde çû. Şewqe di destê çepê, minanî eskeran sekinî. Qumandar li pêş wî bû. Li rûyê qumandar na, lê li sîngê wî dinihêrî. Qumandar nedixwast xwe bi hêrs nîşan bide. Nermayî da dengê xwe. Nava wande niha du metro hebûn.

– Navê te çiye?

Gundî serê xwe bilind kir. Li çavên hev nihêrîn. Rûyê qumandar qet hez nekir. – Tahir.

– De bêje Tahir. Kê li kurê Ûsiv axa xist? Ya rastî bêje... Tu ku nebêjî, tu zanî, di dawiyêde çi dibe? Ne wisane?

– Belê begê min, ez zanim.

– De wakî wisane, bi aqil, ya rastî bêje.

– Gundî hemû hebûn. Gişt jî li wêderê bûn. Kî hebû, kî tunebû, niha nikarim yek û yek bêjim. Hema gişt jî hebûn.

Qumandar hela hê nerm bû. Dixwast ku wisa here.

– Binhêre, bira gotinên te bênê ber guhê te jî. Çilo, gişt li wêderêbin û tu jî nizanibî, kî hebû, kî tunebû? Zarok jî vê nabêjin.

– Belê gundî hemû hebûn. Hinekan kevir diavêtine traktorê. Hinekan jî diavêtine Marûf. Kê lêxist û kê lênexist, nizanim. Gelekan kevir û dar diavêtin.

– Tu jî li wêderê bûyî?

– Belê, ez jî li wir bûm.

Nişkêva qumandar nermiya xwe winda kir. Çavên wî wekî brûskê bûn û ciyên xwede ranediwastiyan.

– Kuro, çawa ferq nakî tu? Erê? Rast bêje.

– Rast dibêjim. Welle, bille rast dibêjim.

– Kerê kurê kera. Çima hemû gundekî bi hevre lêxist? Yên ku bi kuştina wî lêxistin, kîne? Wana bêje.

– Nizanim, hemû hebûn.

Qumandar êdî nikaribû li hêviya dawiya gotinên gundî bisekine. Nişkêve pîhnek li çokê Tahir xist. Yek, yek dîsa. Dîsa, dîsa. Hestiyê çokê, wisa diêşiya, te digot ku şikestiye.

– Way dayê.

Kulm û sîlle, wekî baranê dihatine li dev, lêvên Tahir. Rû û çavên wî bi kulman reş hêşin bûn. Li erdê ket. Rabû. Xwast, bi destên xwe rûyê xwe biparêze. Pîhnek xwar û li ser qûnê dîsa li erdê ket. Serê wî ku li erdê ket, îstêrk li ber çavên wî dipeqiyan. Qumandar qet cîkî wî nedianî ber çavên xwe, bi pîhnan lêdixist. Cendirme tirsiya. Kîjan pîhn, kulm li Tahir diket, cendirme bêhemdî xwe, rûyê xwe diqirçimand. Ji dev û pozê wî xwîn dihat. Tahir he zanibû ku çenga wî şikest, anjî ji cî derket. Tûyî kefa destê xwe kir, du diranên wî yên şikestî, bi tevî xwînê ketine destê wî. Qumandar bêtir hêrs bû. Diricifiya. Çawa û li kêdera wî dixist, xwe jî nizanibû. Destê xwe avête pêsîra gundî û bilind kir. Kişande quncikê odê, kulmeka zexm li çavan xist.

– Niha, li vêderê bisekine.

Qumandar wekî dînan bû. Çavên wî ji cî derdiketin. Dora devê wî kef bû. Gundiyê feqîr di wî quncikîde telya û dinaliya. Qumandar li destên xwe dinihêrî. Sor bûbûn. Zendên wî diêşiyan. Çend caran, zendên xwe virde, wêde livand. Tiştek nîn bûn. Ji cendirmere got, bira gazî xulamekî û birazyê Ûsiv axa bike.

Xulam hate hundir. Qumandr çend darên qalind û zexm jê xwastin. Gundiyê duemîn xwaste hundir. Cendirme ew anî. Di nêzîkayêde rûyê xwe kur kiribû. Nêzîkî kina, rûyê wî gilover, hinekî hupizî, poznikil û wekî rûviyan li dora xwe dinihêrî. Gavên xwe bi teql diavêtin. Zanibû, ji bo tiştekî baş nehatiye vir. Lewra, di dilê xwede bi tivdarek bû. Wisa dihate xuyanê, ji bo her tiştî xwe hazir kiribû.

Qumandar, çîpên xwe hinekî ji hev dûr xistî disekinî. Lê bû, wê nûhatî, saxî saxî bixwe. Gavek pêşde çû, nêzîkî wî bû.

— Navê te çiye?

— Osman.

— Kê lêxist? Kê Marûf axa kire halê miriya?

Li ber çavên qumandar ha li Ûsiv axa xistine, ha li kurê wî. Herd jî yekin. Lewra wisa dipirsiya.

— Min nedît kê lêxist. Gundî hemû li wir bûn.

— Çilo te nedît? Kê berê pêşiyê lêxist? Kê kire vî halî? Kê milê wî şikênand? Qe hemûya bi hevre milê wî neşikênandin? Ji bin serê kê derket ev kara? Kî bûn? Qey gund bi tevayî ne gunehkare. Yên ku kirine, çend kesên tolazin, ne wisane? Tu niha navê wan ji minre bêje.

— Ez nizanim begê min. Gundî bi tevayî lê bû.

— Lawo, wisa dîn dîn nepeyive. Tu jî, li wir bûyî?

— Belê, ez jî li wir bûm. Hemû li wir bûn.

— Wisane, rêberê wan, tuyî?

— Rêberê çi? Ez kesî wilo nizanim. Gişt jî hebûn. Ez vê zanim.

Gundiyê pêşîn, di quncikê xwede, yê nû guhdarî kir, êşa bedena wî nemabû. Dilgeşî hate canê wî. Cîranî wî Osman jî mîna wî dipeyiviya. Çavên wî, bi dilxweşiyê dibiriqiyan. Dixwast çavên Osman bibîne, lê pişta wî pêre bû.

Vê demê, xulam bi çar daranve hate hundir. Ne çar dar, çar mertek bûn di hemêza wîde. Li fêza odê danî. Kerre kerr, dîsa derket û çû. Evî kinî, hupizî, qumandar hê zêde dîn kiribû. Xwe da ser lingekî, wekî kevanekê teviya û kulmek avête gundî. Li hustiyê wî ket. Teisî, lê, nekete erdê. Ne kulm bû, te digot gulle bû. Li van deran hemû kes, li ber kulmên wî tamîş nedibûn. Hela feqîrê gundî fem nekir ku çibû, bi destên dinê yek jî da ser çavên wî. Pêş çavên Osman reş bûn, hişê

wî çû. Li erdê ket. Tahir li piş wî, hal perîşan bû. Lê belê bi çavên bîr û bawer li Osman dinihêrî. Osman ferq kir. Wê çaxê Osman xwe her şidyayî girt û xurt bû. Sîlle û pîhn bi tevîhev bûn. Bê hesab bûn. Te digot ku bi têrekêde kartol havêtine navê, hemû bi pîhnan lêdixin. Bi vana têr nebû qumandar. Darekî mezin hilda destê xwe. Çav û serî nedigot, lêdixist. Paşê yek, yek dîsa...

Rû û serên wan, dest û piyên wan di nava xwînêde, ode her diçû, tijî meriv dibû. Nîvê cendirman li pêş wan bûn. Paşê çar cendirmên bi sungî, evên ku hatine kutanê, li hewşê rêz kirin. Gelekên wan, nikaribûn li ser lingan bisekinin. Xwe sipartibûne hev, pişta xwe didane dîwêr. Çend kes li hember derketibûn, kiribûne zarinî. Qumandar, ew pêşde derxistin û careka din jî, da ber kulm û pîhnan. Di ber xwede, bi dengekî nizm dê û jina qumandarre didane xeberan. Qumandar pir westiyabû. Te digot, pîhn, kulm û bi awqas daran li wî xistine. Dihejiya. Lê bû ji xweve here. Dilê wî diricifiya. Firnikên pozê wî vedibûn, lêvên wî dileriziyan. Milên wî mînanî kulavan, tiştek nedigirtin. Lewra, yên ku nû dianîn, nikaribû bi dilê xwe, bide ber kulman. Waxta bi dilê xwe li gundiyan nedixist, her diçû hêrsa wî zêde dibû. Bêtir diricifiya. Xalê Mihê, li pêş wî, nîv kelogirî bû. Bi van salên xwenê zêde, bê kutanê... Pirsên ne baş bihîstin, jêre gelek giran dihat. Lewra, lê bû bigrî. Qumandar dewsa kurê wî bû. Dar di destê qumandar, çavên wî bi hêrs, ji qehrana bedena wî diricifiya. Mihê qumandar wisa dît. Derdê wî ne êşa daran bû, lê ev kara pir giran lê dihat.

– Kê lêxist? Kê dest pê kir? Kesên rêber hene elbet. Bêje. Tu kalî. Derewîn ji tere eybe.

– Heşa begê min. Ez rast dibêjim. Bi van salên xwe...

Wê hela hê bigota.

– Berde, berde vana. Tu niha bersivên min bide.

– Ez çi bêjim? Buxtanan bavêjime kê, begê min? Hemû jî hebûn. Ez vêya zanim. Gişta jî ew birîndar kirin. Ya rastî eve.

Hela hê dawiya peyiva xwe nehanîbû pîhnek xwar. Li erdê ket. Nikaribû rabe ser xwe. Wisa ma li erdê. Qumandar jorve lê dinihêrî. Ewî çîpên xwe kişandibûne ber zikê xwe, çavên wî li rûyê qumandar û wisa li erdê dirêj, disekinî. Ji ber vî halî, qumandar pir dilteng bû. Ji kirina xwe şerm dikir. Kalê êdî lê nedinhêrî. Dixwast rabe ser xwe. Digiriya. Him jî bi deng, bi kûre–kûr digiriya. Yên pêşî li hewşê bûn, lewra kesî ew nedidît niha. Qumandar ku dît ew digirî, hê jî tevîhev bû. Bi hêrs dar avête erdê. Ji cendirmanre:

– Ezê qasekê şûnde bêmê, got û derket.

Derket û çû. Di pişt malêre, berve ava piçûk meşiya. Cixare dikişand. Tiliyên wî wekî kaxizên li ber ba, dihejiyan. Devê wî mînanî jerê bû. Li ber avê bîhneka kûr ji cixarê kişande hundirê xwe. Dest û serçavên xwe bi ava sar şûşt. Pêsîra kirasê xwe vekir. Ava sar li sîngê xwe reşand. Hêdî hêdî ziviri malê. Li ser xaniyan, li ber dîwaran jin û zar dîtin. Destên wan li paşilan, anjî li ber rûyên wan, nedilipitiyan. Wilo bi çavên sar li wî mêze dikirin. Hinekî din jî nêzîk bû. Di wan çavên ku li wî dinihêrîn, dijminayî, dilşikestî û qehr dihate xuyanê. Wekî tîran, dilê qumandar diêşandin. Li seheta xwe mêze kir, têgihîşt ku dereng maye. Lêxistina gundiyan, sehet û nîvek kişandibû. Çawa jî qet ferq nekiribû. Hate ber derî. Nihêrî, awqas pir gundî, ji pare nemabûn.

Mîro jî para xwe hildabû, lê qasî yên dinê nînbû. Li pey wî Soro anîbûn.

— Lo, çûrî heramo. Tu dîsa li pêş minî? Çima tu nabî meriv? Bê heyayo. Çend çêrên wilo li pey hev rêz kir qumandar. Paşê:

— Kê birîndar kir, erê? Bêje kê dest pê kir? Kê pêşiyê lêxist? Kiye şeytanê we? Eger tu ji min dipirsî, haya te ji wan gişta heye. Ji te baştir jî şeytan nabe. Ez çûme li rêberan digerim, te bêtir rêber heye tu?

— Na xêr begê min. Na xêr. Ez esse dibêjim, na xêr. Min li mal kar dikir, dengê qelebalixê bihîst. Min dît ku hemû gundî berve zeviya, ciyê dibistanê direvin. Ez jî pare revîm û gihîştime wan.

— Çima çûyî? Çima tu neçûbiyayî nedibû? Yekî ji tere got here?

— Na xêr. Ji bo çi? Qet kesî jî negot. Xelq gişt diçû, ez jî çûm. Gundiyan gişta kevir dihavêtinê. Birîndar kirin. Em gişt li wê derê bûn. Kê lêxist, nizanim. Yê birîndar, bi xwe jî nizane.

— Helbet nizane. Kuçikê heram. We tu mêrikve, halê yekî ku bizanibe hiştiye... We dinê li ser wî hurşandiye. Wekî miriya bû. Dibe niha, zûve jî miriye. Tê rastî bêjî an na?

— Rast dibêjim. Çima bawer nakî?

Hetanî wê çaxê qumandar nermîn bû, lê her diçû wekî berê har dibû. Nişkêve xar bû, ji erdê darek hilda. Bilind kir ku lêxe.

— Li min nexe. Begê min. Li min nexe.

Van pirsan qumandar şaş û metel kirin. Di ciyê xwede ma. Wekî kevirekî. Paşê hejiya bi ser lingan.

— Îca, tu dibêjî li min nexe, ne? Li min nexe.

Bi xezew çû ser Soro. Rikêfî wî kir. Bi darê qalind, li milan, navmilan û her deran xist. Serî û çav nediparast. Soro xwe da alîkî, nişkêve. Qumandar wekî gurekî ku nêçîra wî ji dest filitiye. Mîna pisîkekî, li dû

mişka ketiye. Şoro, darê ku qumandar pê lêdixist, girt. Serê şiva wekî mertega, di destê Sorode bû niha. Yalê dinê ji dest qumandar filitî. Tilyên wî sist bûn, nedişidand qasî Soro. Soro li pêş qumandar bû, li pîşt wî jî du cendirme hebûn ana. Bi sungî bûn. Cendirme qet ji ciyên xwe nelipitîn. Li wan mêze kirin. Cendirma jî nizanibûn, ku wê çilo bikin. Qumandar tu tişt ji wanre negotibû. Lewra, wisa benda wî man.

Soro bi kîn li qumandar nihêrî, paşê şiv havîte erdê. Xar bû şewqê xwe ji erdê hilda. Dengê qumandar wekî brûskê bilind bû.

– Ev çiyê, ez ji destên we dikşînim? Hûn bûne bela serê min. Wekî naxireke heywanan. Biteyise, magî heramo.

Eskerên bi sungî, destên xwe dane ser milê Soro, ew şûnve kişandin. Soro, pirsek ji dêv derneket, çavên wî mînanî agir dibiriqiyan.

Yekî wê çaxê Evdo anî hundir. Evdo wisa çilmisî û hûr bûbû, te digot, wê têkeve nava qalikê findeqa. Rengê wî sipîçilokî. Pir ditirsiya. Bi vî halî, gunehê meriya pê dihat.

– Ev karên awha, kê kir?

– Nizanim.

Li ber xwe nihêrî, paşê kire bilde bild.

– Welle nizanim, got.

Meriya ku yek lêxista, wê bi ciyê xwede biketa erdê. Nîvê kulmê jî dibe, vala biçûya. Yê pêşiya wî, çiqasî bi ser xwe bû, xwe nedida perçiqandinê... Lewra qumandar xûlî bûbû. Lê belê dilê xwede ewê pêşîn pîroz dikir. Wekî guran lê dinihêrî. Ne sist bû. «Lê eva? Te digot, hundirê kurê kerê qetyaye» digot qumandar, di ber xwede.

– Tu jî hebûyî li nav yên ku lêdixistin?

Nikaribû bersîvê bide. Fikirî. Zanîbû, gundiyan çilo bersîv dane. Li gund bihîstibû. Di rêzêde, li cem gundiyên xwe, ji yên hatibûne kutandinê hîn bûbû. Hemûyan jî rind fem dikirin, wê qumandar bêtir diqehirîne, gundî bi mînanî hev xeber didan, wekî hev dipeyîvîn. Gelo ewî jî dikarîbû wekî wan bike? Zimanê wî, dêvde venegeriya. Kire bilde bild.

– Begê min... Ez. Ez. Nîn bûm. Na xêr, ez li wira nîn bûm. Hezdikî ji Ûsiv axa bipirse.

– Kuro, kûçikê heram. Ûsiv axa, wê sehetê çawa bizanibe ku tu ne li wir bûyî.

Qumandar diqîriya. Evdo bi dengekî nizm, bi zehmet dihate bihistinê, pirsên xwenên bcrê dîsa ducar kir.

– Heke bawer nakî, ji Ûsiv axa bipirse. Ew zane.

Qumandar pêwîst nedît lêxe. Lê belê pîhnek tenê havête qorikê. Çend kes dîsa hildane hundir. Hinek bi kulman, hinek bi daran, dev lêvên wan di xwînêde, çûn rêzêde ciyê xwe girtin. Di nav birînande bûn. Halên çendekan ji yên din baştir bûn. Li ber derî, ser qulofîskan rûniştibûn. «Eger bi awqasî bifilitin, başe» digotin di nav xwede. Cendirmên bi sungî li dora wan bûn.

Gelekê wan ditirsiyan ku eger birîndar bimre, wê çi bibûya? Belê, hela ka Marûf bimre, wisa erzan xilas nedibûn.

Du darên mezin bi lêxistinê şikestin. Kê îna dikir ku ev dar bi lêxistina merivan, awha tîş tîşî bûne. Yên ku zare zar kiribûn, giriyabûn, ji yek û duda zêdetir nîn bûn. Gelo, wilo kerr û lal, awqas zorbetî, lêxistin çima qebûl dikirin? Bi birîndariya kurê axê, gunehê hemûyan hebû. Yên ku gunehkarin, gere dawiyê jî qebûl bikin. Wisa difikiriyan. Yekê jî, di van du salande, guhartinek çêbû di nav wande. Hêdî hêdî bûbû. Kesî ferq nedikir, çilo û kîngê guhirîn ew. Ji bo zeviyên xwe, du salan zorbetî, birçîbûn û belengazî dîtibûn. Tevayî li hember sekinîbûn. Girî û zare zarbûn êdî ne pêşê wan bû. Gelek ji wan tê digihîştin ku bi girî û lavakirin nabe. Gere ner tiştî bidine ber çavên xwe, dewa erdê xwe bikin. Ev guhertina tiştekî rast bû niha. Lê wan bi xwe tiştek ferq nedikirin. Vê guhartinê quwet û sebr dida wan. Lewra deng nedikirin, her tişt qebûl dikirin. Jin, zar û mêrên wan, êdî baş zanibûn ku bê derd, bê êşandin meriv xweyî erd nabe. «Keremkin ev zeviyên wene» nabêje kes ji kesîre. Ketin û rabûn. Serê xwe bide şikandinê û serê kesan bişkîne. Berê, ji vêya pir ditirsiyan. Tiştekî piçûk jî hundirê wan diqetand. Niha, hatine guhartinê û awha bûne.

Nav du salande, kêm kar di gundê wande nebûn. Yên ku malên xwe hîştin, çûn. Berê dizî, dizî li hemberî axê derketin, paşê eşkere bû. Wekî berê, edî kes neditirsiya. Giştan jî heq didan van karan. Bi tehrekî din nedibû.

Ev hefteke li hemû malan dihate xeberdanê. «Em ji zeviyan kêm hildidin. Zêde nayên. Îsal qet kulmekê jî nadine Ûsiv axa. Me got ku em dîsa wekî berê, bi hevre derbasiyê bikin. Lewra ji van zeviyên nûvekirî para wî didin. Ew, jiyanê jî ji mere zêde dibîne. Ev zeviyên nû ku dane me, me nûrakirin, çima tu erdê bavê wîne? Çima em kerin, hela hê bidine wiya? Ew erdê kêne? Îsal qet libek genim jî jêre tune», digotin.

Ji bo vî qerarî, gundî neciviyabûn û nepeyîvîbûn. Lê wisa dihate xuyanê ku îsal tiştek nedidane axê. Traktora axê, ajotina zeviyên wan...

Berê ev qerara di hişê xwede, paşê di malên xwede dan. Gundî hemû wisa difikirîn.

Axa bi xwe jî di şikêde bû. Tirs ketibû dilê wî. Tirsana ev kara nedipirsiya, hilnedida û danedida. Nedixwest ku tev bide. Paşê jî ev bûyera bû.

Halê gelekan ne baş bû. Milê hinekan werimîbû, ji ber êşan, nikaribûn bilind bikin. Çenga Tahir reş bûbû, du diranê wî şikestibûn. Yên ku serê wan şikestibûn, pênc, şeş zilam bûn. Xwîn ji rû û hustiyên wanve hatibû xarê. Xwîna zuha dibiriqiya. Gelek ji wan hela hê xwîn lê zuha nebûbûn. Ji wan destmalên du kesan tenê hebûn. Yên dinê bi dawa kirasên xwe xwîna xwe dimaltin, birînên xwe dipêçandin. Dewsa pîhn û tizikan reş bûbûn. Ji ber êşan, nikaribûn ser piyan bisekinin. Ber çavên gelekan, ji kundikan werimîbûn.

Mala axê, wekî ciyê ku tu lê pêz şerjêkî, di xwînêde mabû. Berê, gelê mala axê jî, bi rû tirş li van kesên ço xwar mêze dikirin. Di pêre, hêdî hêdî dilê wan jî, ji van kesan dest bi şewatê kir. Li ser vê lêxistinê, birîndarê xwe jî bîra kiribûn. Gişta jî baş zanibû ku Soro nebûya, tu kesî miriyê Marûf jî ji wan xilas nedikir. Ew jî gelekî hatibû kutandin. Wan jî fem dikirin ku di pey vê tadayê êdî gundî jî, wan rehet bernadin. Dibe ku gele tiştên hê mezin bênê serê wan.

Axayê gundên nêzî wan, Zubêd û Cemal, piştî nîvro hatibûn mala Ûsiv axa. Ew hîn bûn ku Ûsiv axa Marûf hildaye çûye bajêr û cendirme qumandarî jî dest daye ser bûyerê. Silav dane qumandar. Xatirê xwe xwestin û vegeriyane malên xwe.

Roj diçû ava. Niha êvareke biharêye xweş, Tendûrek di nav tajanekêde hişt û çû. Tîrja royê ji dûrve xuya dibû, bîsteke şûnde ewên winda bibiyan. Golikvanê gund, gava ku hate li perê gund, xênji çend zarokên rûpirçî pêvatir tu kes nedît. Gavanê gund jî li pişt golikvan ketibû gund. Jinên gund guh nedidan borîna çêlekan û dûmana li pey naxirê. Bi dil sarî dest dihavêtin lemê çêlekan û dest bi doşanê dikirin. Zarokan vê êvarê, mînanî her tim bi lotik û xweşiyê bi diwêla heywana nedigirt, nedileystin. Jinên gund li ser giryên bûn. Gundiyan hemû zanibûn ku zilamên wan, li mala Ûsiv axa hatibûn hincirandinê. Xort û kal ji hev nehatibûn bijartinê, bo lêxistinê. Çend jinê gund, demekê, dixwestin bigotana ku em çima sekinîne, em çima li peyên xwe xwedî dernakevin? Tu kesî ji wana di xwede ev cireta nedîbûn ku pêşde herin. Tirsa wan ji cendirman zêdetir ji peyayên xwe bûn. Gelek şerme ku navê jinan tevî van bûyînan bibe. Bi mêrên biyanîre ziman gerandin û deng kirin qedexeye. Ji bapîrên xwe, wer dîtibûn. Car ca-

ran hinekan, guh nedidan vê rewşê. Îro jinên Tendûrekê, ji tirsa mêrên xwe, ji ciyên xwe nedihiviyan.

Qumandar diranên xwe diqirçiyand. Gelek westiyayî û perîşan bû. Li ser vê bûyînê qet tiştek destê wî neketibû û tiştek jî hîn nebûbû. Çep û rast bi leb û tepan, bi pîhnan li gundiyan xistibû. Hal têda nemabû. «Ezê, li pêş van rezîl bibim» digot. Lewra ji ciyê xwe nikaribû bilipitiya. Palek sibê heta êvarê bixebitiya, dîsa jî ji wî jîrtir bû. Milên wî, bi lêxistinê tevizîbûn, bûbûn wekî kulavan. Pîlên wî zef qerimîbûn. Nikaribû mêşan ji xwe biqewitîne. Jiyên hustiyê wî, wer hatibûn ragirtin, weke masûran peît bûbûn.

Ro çû ava. Hew li piştê çiyayên bilind tîrêja wê xuya dikir. Ew jî hêdî hêdî winda dibû. Demekê şûnde tariyê wekî serlehêfek reş, wê der dorê bilehîfîn. Awqas meriv, yê pê çi bikira? Xebera wî ji birîndarê çûyî jî tunebû. Di nav du avande mabû. Şev daketibû. Pêncî, şêst meriv wekî kerîkî pez jendibû. Wê niha çi bikira? An giştа berde. An jî bi peywanda bi hev girêde û bibe bajêr. Vegeriya cendirman:

— Hazir bikin. Emê hinekan bi xwere bibin. Bira li wê derê jî ya rastî nebêjin. Ewê wê çaxê bibînin.

Gundiyan xwe sipartibûn hev, li ser tûtikan rûniştibûn. Cendirman ew rakirin dane rêzekê. Kî dihate pêş qumandar, wî ruyên wanî birîndar mêze dikir. Yên ku bi sûc û bê sûc, li gora hişê xwe dijbart.

— Ez carekê tenê ruyê kesekî mêze bikim, ez zanim ew çi kese. Ez bi xwe bawerim.

Yên kal û yên ku bi dîtina wî bê sûcin, careka din da tirsandinê û gelek gotinên kêmasî ji wanre got.

— Herin malên xwe. Dilê we ku dixwaze, dîsa netebiyê derxin. Ez ku careke din werim, ezê nîşanî wê bidim ku dinê çend perçeye.

Yek, duduyan:

— Belê, lê cîranên me? Ewê çi bibin? Çi sûcê wan heye? gotin.

Qumandar ji nûve qîrya.

— Ez ji were dibêjim, herin. Îca xwe xilas kirine, niha jî ketine derdê cîranan. Hadê yalla. Ez ji nûve dest pê nekim.

Ji tirsan, tiştek lê zêde nekirin. Berên xwe dane malên xwe. Bi ser milanve, cîranên xwe mêze dikirin. Lingên wan pêşde nediçûn. Bi vê gengaziyê çar neçar razî dibûn. Dizanibûn ku çiyê bê serê cîranên wan. Ji ber vê gelekî dilteng bûn.

Qumandar sî û du zilam ji wan bijart. Çar bi çar dane rêzê, bi deh cendirmanve şandine bajêr. Cendirmên bi sûngîre got:

— Hedar bin.

Ji bona çav tirsandina gundiyan, zivirî aliyê cendirman.

– Yên ku gura we nakin, bi mirinê lêxin. We fem kir ne? got.

– Belê qumandarê min. Ser sera.

Dîtin û sawa wan li derheqê cendirman, gelekî hatibû guhartin. Kal û pîr, jin û mêr, zar û zêç, weke berê girî û hawar nedikirin. Li ber dîwaran, li ser xaniyan, destên wan di paşilên wande, stuxwar, derdê xwe dadiqultandin. Hên bi pisporî, bi ser xwe, zilamên xwenên di nava sungiyande mêze dikirin. Evdo jî li tev wan bû. Serî di berde, bi gavên sist, di nava hevalande winda bûbû. Soro û Mîro li kêlekên hevdû bûn. Serên wan bilind, di nav pêçiyande cixarên wan hebûn. Rûyên wan nedikeniyan, lê tirs jî di çavên wandê tunebûn. Ya rastî, qumandar berê jî çend cara ku meriv dibirin, gele kesan bi lavayî, stuxwarî xwe diavêtine ber ling û destên wî. Vaya bi xweşa wî dihat. Gava ku sûc gengaz bû, dev jê berdida. Caran jî xwe pir giran digirt. Ji wiya pir hez dikir. Vê carê ne weke carên berê, gundiya ji bona têbuhartiya heval û hogirên xwena, xwe nediavêtin dest û lingê qumandarê cendirman. Diranên xwe diqirçandin û bi awirekî tehl li qumandar û cendirman dinihêrîn.

Gava ku qumandar li kêleka şofêr, kete jîpê, ji gund rêwî bû, çend xulamên axê bi nîv tirs dûrve qumandar rêwî kirin. Qumandar qet rû nedabû van kesan û ji gund derketibû. Birîndaran, pîrekan, zar û zêçan di bin çavan, wekî biyaniyan li qumandar dinihêrîn. Bi vê nihêrandinê, heznekirina xwe û alîkîde jî tirsa xwe didane rûyê qumandar.

Tariya êvarê li ser erdê digirt. Hewa gelek xweş bû. Jiyana êvarê, li gund... Ne minanî êvarên dinê. Jiyan şirîn û dinê bi rûkên, lê dev û zimanê tendûrekiya tunebûn. Çavên wan bi kîn. Gelekên wan li birîndarên xwe dinihêrîn. Hevalên wan, niha di nava singo, gavên wan bi zehmet bi wanre dikişiyan. Gundiyan niha ew hevalên xwenên di rêde bûn, dianîn ber çavên xwe. Çend mêrên mayî, ber xwe diketin ku çima ew jî nehatine şandinê. Şerm dikirin. Dilê wan nedixwest ku li rûyên jin û zarên yê mayî binihêrin. Zanibûn ku tu sûcê wan tunebûn. Lê dîsa jî dilxemgîn bûn. Dema ku birînên xwe dipêçandin û dişûştin, hevalên wanê çûyî li ber çavên wan bûn. Gelo çawa rê hildidan? Ev riya dirêj, wê çilo biqediya?

Jina Soro nedixwest ku giriyê xwe nîşanî kesî bide. Li cem wê, çend caran, çiqas gotinên dilxweşî û dilsozî hatibûn gotinê. Niha dihate bîra wê, Soro, Mîro, Seît û xwarziyê wî Elî, li malê çi tehrî peyîvîbûn.

— Em çi bikin, bikin lê bibine yek. Ji ber zorê, tirsê anjî hine menfeetên piçûk, ji hevdû neqetin. Her tişt bi vê derêve girêdayiye. Rojên teda û teng tên û derbas dibin, diçin...

Paşê tiştek hate ber çavên wê, ji ber, êşên dilê wê zêde dibûn û li ber xwe diket. Par, çilo Soro kutabûn. Perîşan, wekî miriyan kiribûn. Çend roja li mêrê xwe nihêrîbû? Dîsa jî zû nehatibû ser xwe. Çiqasî nexwestibû ku êş û derdê xwe nîşanî kesî bide... Di vê demêde gelek tişt ji mêrê xwe hîn bûbû. Mîna berê nîn bû êdî. Soro ku ne mal bû, pir berxwe nediket, zû zû nediçû û dêrîve nedinihêrî. Ewê jî zanibû êdî bi vê feqîriyê, jiyana baş û rehet nedibû. Tiştek nedayî, tiştekî dinê nedihate sitandinê. Ji bo erdên xwe, gerek pir tişt bidana û hazir bibana. Berê jî di nav tengasiyê û belengaziyêde bûn. Bi xwe xwe diqehiriyan û dizariyan. Niha ne wilo bûn. Hê li wan xweş dihat. Derd û tedan mînanî berê, bi girî û gazin qebûl nedikirin. Wekî ku yekî nas tê. Zanibûn çi tê. Fem dikirin ku erd bê derd û bê belengazî bi dest nakeve. Lewra, li hemberî hemû bûyînên tûj û dilêşiyê gerek meriv xurt bûya. Jina Soro jî vê carê hê bêtir li ser xwe bû. Di hişê wê de, mînanî ava şêlî, wekî hewa bi mij û dûmande baş neyê xuyanê, lê dîsa jî, li hember sekinandin hîm dida. Mêrê wê pir zordestî dikişand, lê wê jî hêdî hêdî dilxweşî didît di van bûyînande. Ne wekî ku ji mêrê xwe hez dikir. Ev tiştekî din bû. Lê dîsa jî him tehl, tûj û him jî şirîn bû tema wê. Ne mînanî hezkirina zarên xwe. Tiştekî dinê. Kîngê meriv tema wê hildide, wê çaxê zane çiye. Wê çaxê meriv xurt û bi ser xwe dibe.

Karê xwe xilas kir, çû cem jina Mîro û zarên wê. Jineke jîr, hestî mezin û qalind bû. Heta niha gelek derd, belengazî kişandibû. Çend sala berê, biraye wê yê xort li eskeriyê, li xerîbiyê miribû, dergistî bû xwe jî. Bo wî, çiqasî giriyabû û kiribûn zarîn. Bavê wêyî topal ku paşê herd çîpên wî kişiyan, nikaribû ne mîz ne jî destava xwe ya mezin bike. Her roj bi destên xwe, çend caran mîz û gûyên wî paqiş dikir. Paşê dema ku zewicîn, wan hersê salên pêşîn çi kişandibû ji zimanê xwesiya xwe. Zimanê xwesiyê wekî yê marane. Dire dira wê, zikê meriyan zer dikir. Lê niha bêhemdî xwe dest bi girî kiribû. Piştî girî, rehet bû ana. Tengasiyên dilê wê, bi nîvî nîvî nemabûn. Cîrana xwe ku li cem xwe dît, her tişt bîra kir û dest bi karê malê kir. Ewanan jî mînanî mêrên xwe, xwe nêzî hev didîtin.

— Lêlê xwengê, ew çiye? Dibe ku tu giryayî?

— Welle nizanim çi bû. Giriyan hinekî. Niha tiştek nema. Hela, were, rûne.

– Qîzê, xulî li serê tebe. Mêrên me qewîne, qet tiştek jî bi wan nabe. Çima tu nizanî? Gişt hate bîra kirinê. Nê bîra te qet, par halê mêrê min çilo bû? Me çi nekişand? Gişt çû, derbas bû.

Li ser van peyivan, her bêtir bi jîr û sebir, gerek li kar, barê xwe mêze bikirina. Herdûyan, wisa qerar dan. Wê zarên xwe ji nexwaşiyê û mala xwe ji xirabiyê biparastana.

Şeveka biharêya xweş û hênik. Gund di tariyêde bû. Li esmanan bê hesaw istêrk dibiriqiyan. Li mala axê, bêdengî û kerrbûneka wekî miriya hebû.

Nêzîkiya sibê cendirme û gundî gihîştine bajêr. Wekî koma girtiyan bûn. Di rêde pî û çîpên gelekan westiyan, qerimîn. Lê dîsa jî nedixwastin ku bibine barê hustiyên hevalên xwe. Ji ber pîhnên ku li sîngên wan ketibûn, çend kes ji wan nikaribûn bîhna xwe baş hildin. Zû bi zû radiwestiyan, bîhna xwe hildidan. Gavên wan bi wanre nedihatin.

Pêşiyêde cendirmên bi sungî, li ser gura qumandar gelekî bi tûjayî û bê însafî ew dibirin. Paşê wan jî dît û fem kirin ku sûcê wan nînbû, nikaribûn rêve herin, gavên xwe zû bavêjin. Hêdî hêdî rêz û rewşa çûyinê sist kirin. Herkes qasî taqeta xwe diçû. Cendirman bi xwe jî westiyabûn êdî. Berê çend pişkokên çakêtên xwe vekirin. Tivingên xwe havêtine milên xwe. Gundiyên belengaz nikaribûn ku du gava bavêjin, îca wê bi kure ji ber wan bireviyan? Cixare dan hev. Li ser kaniyê serçavên xwe şûştin, birînên xwe paqiş kirin. Li dora kaniyê, darên nizm wekî çeperekê bilind bûbûn. Peyivên nav gundiyan û cendirman her pêşde çûn. Tendûrekiyan jî têgihîştin ku tu sûcê cendirman tunebûn. Ji wanre çi hatibû gotinê, ew jî wê tînine cî. Cendirman êdî wekî dost û biran bi wanre rêwîtî dikirin. Qala bajarên xwe, qedandina eskeriyê, şer û giliyên li ser erdê ku li wan bajaran dibû, dikirin. Caran hine heval di pare diman, nikaribûn bihatana. Yên dinê li hêviya wan disekinîn. Lê caran jî ferq dikirin ku dereng mane, wê çaxê jî, gavên xwe bi lezûbez davêtin. Bi dostî dipeyiviyan. Gundiyan ji van peyivan fem dikirin ku ev xort, ev cendirme ne dijminê wane. Di dilên wande dostî hebû. Xênji yek, duda hemû gundî bûn. Ji rêvaçûyîna wan kifş dibû. Yên ku ji gundan bûn, bêtir rehet rê hildidan. Yên ku ji bajaran bûn, zû zû xuhya eniyên xwe zuha dikirin. Pife pifa wan bûn. Hela hê bîstekî neçûyî, disekiniyan û bîhna xwe distandin. Ew jî xortên baş bûn.

Wexta ku gihîştine qereqolê, êdî kesî nikaribû gavekê jî bavêje. Te digot ku lingên wan, ne bi wanre bûn. Wekî kulavan bê ruh û kişyayî bûn. Şev hênik bû lê dîsa jî kirasên wan di xuhyêde mabûn. Bîhna xuh-

yê tevîhev dibû. Çend kesên ku birînên wan zêde bûn, bi alîkariya hevalên xwe gihîştibûn qereqolê.

Eskerê li ber qereqolê ku ew bi tevayî dît, şaş ma. Vê şevê wê awqas meriv li ku bi cî bikirna? Bi dengê nûhatiyan, cendirmên razayî jî hişyarbûn, hatine cem hevalên xwenên westiyayî û perîşan. Di carekêde qereqol û hewşa wê, tijî gundî bû. Çekên xwe derxistin, darde kirin. Dest ruyên xwe şûştin. Paşê gundiyan jî wekî wan li wê derê, xwe şûştin û hênik bûn. Cendirman dixwast ku zûtirê razên. Ji xewê, çavên wan dihate girtinê. Nikaribûn xwe li ser lingan bigrin. Yek û yek, «em diçin, radizên» digotin û diçûn.

Derê girtîgehê vekiribûn. Bîhna kefikê û nêmê dihat. Meriya digot ku dîwar di avêde mane. Yên birîndar û çendên dinê hildane odekê. Li wê derê meriv dikutan û teda dikirin, him jî bin çavande digirtin. Hela hê deriyê wan nedadayî bû. Cendirmekî reş, çav û birî bedew, hinekî bi beden qelew, digot ku «xuhê ji binê lingên mere havêtiye». Wî di guhê nobedarde tiştek got. Demekê şûnda, meriya zanibû ku çi jê xwastiye. Çi xortekî dilxweş bû. Nobedar ji bo van gundiyên westiyayî û perîşan, av danî li ser kuçikê niftê, xwast ku çay çêke. Paşê hate cem gundiyan.

– Canê we saxbe, birano. Wê derbas bibe ev jî. Her tişt tê serê mêran. Pakêtek cixara eskeriyê derxist, da hemûyan. Pakêt xilas bû. Çû ji hundir, ji ciyê razanê, du pakêtên din jî hanî. Gundî qet hînî dostiya wilo nebûbûn bi cendirmanre. Lewra şaş, metel man. Bi çav, ev jî ji hevre digotin.

– Çi xortên başin. Vê şevê birayên meriya jî awha nakin.

– Şîrê he'al mêtiye. Şîrê helal. Kurê maleke mezine. Dinê dîtiye mêrikan. Cendirme ji wanre got ku birîndar ne baş bû. Lewra zûtirê şandibûne nexweşxana wîlayetê. Doxtirê vir gotibû ku nexweşxanên mezin, hacetên rind û fîlim jêre dixwaze. Wexta ku birîndar şandine, halê wî qet ne baş bûye. Qaymeqam û sawcî çend caran bi telefonê hatina qumandar pirsîne. Qumandar sê seheta piştî êvarê hatibû, qaymeqam û sawcî ji malên wan pirsîbûn û yên bûyî ji wanre qal kiribû.

Dûrve dengê dîkan dihat. Pir tarîbû niha. Gundiyan zanibûn ku, ronayî êdî nêzîke. paşê çîvik, gîha, av, meriv û dinê gişt wê hişyar bibe. Van herdu odên qereqolêde, gundiyên belengaz bi carekêde ketibûne xewê. Serî dabûn ser hev. Wilo çep û rast dirêj bûbûn. Bihustek cîkî vala nehiştibûn. Nobedar li ser wan, derî dada û çû. Wisa westiyabûn ku wê deqîqê ketine xewê. Yên ku birînên wan pir diêşiyan, dina-

liyan car caran. Di xewêde xeber didan hinekan. Lê kesî ji devên wan tiştek fem ne dikir.

Ro derketibû, her der dibiriqiya. Bajêr dest bi rojeka nû kiribû. Nobedarê qereqolê hatibû guhartinê. Der dor berev dikirin li qawîşên cendirman. Cendirmên ku şev hatibûn, nû hişyar dibûn. Hevalên wan ew ranekiribûn. Ji bo taştê, dema ku ew jî rabûn, êdî gundî jî hişyar bûn hêdî hêdî. Her derên wan tevizîbûn, diêşiyan. Nikaribûn ku serên xwe ji erdê rakin. Te digot ku sîtileka giran li ser serê wanaye.

Eskeran der li wan vekir. Wê bi dor biçûna avdestxanê. Lê eskeran mînanî şevê, nermik û bi dostî nedipeyiviyan. Ya xwedê, tiştekî ne baş jî nedikirin. Gundiya fem kir ku ji tirsa qumandar wilo dikin. Çi hatibû guhertinê? Eskerekî, bi perên wan, ji wanre nan û penêr kirî. Li cîkî fireh, li ser «ciyê xwarinê» nivîsandî, bi tevayî taştê dixwarin. Ew cendirmê qemer, şev ji wanre çay çêkiribû, dît ku nan û penêr naçe xwarê, ji wanre ava sar hanî. Dema ku qumandar hat, ev kar hemû qediyabûn êdî.

Qumandar ser, rûyê xwe kur kiribû, wekî xortan bû. Li kaxizên pêş xwe nihêrî ku tu tiştên nû hatine an na. Pişta xwe siparte dawiya kursiyê. Serê xwe bilind kir, hevraz nihêrî. Hişê xwede xwast ku rêzekê çêke ji bo îro. Li bajêr, li ser lingan, virde wêde, ji hinekan di derheqê kurê Ûsiv axade xeber girtibû. Li nexweşxanê razandine. Halê wî ne baş bûye. Hela hê çavên xwe venake û nikare bipeyive. Dê û bavê wî li cem, li nexweşxanê bûne. Berê her tiştî gerek ji doxtorê nexweşxanêre têlefon bikira û rapora di derheqê Marûf, bixwasta. Dibe ku rapora dawiyê îro nedin, qet nebe, rapora halê wî niha dikaribûn bişandana. Paşê wê xeber bida sawcî û berpirsiyara wan bigirta. Wê jêre, bi têlefonê, nexweşxane bidîtana. Heta wê çaxê nivîsdar û mekîneke nivîsandinê anîne oda wî.

Li ser maseke piçûk, makîneke nivîsandinê ya mezin û hine herfên wê ketibûn. Nivîsdar kaxiz kire makînê û li hêviya qumandar sekinî. Xwast ku yek û yek gundiyan bînine odê.

Li pêş xwe, gundî dît, dîsa qehirî û rûyê wî tirş bû. Gundî di nav tozêde bû. Li erdê razabû, ser milên wî, pişta wî gişt di nava tozêde bûn. Bi destên xwe paqiş kiribû, lê têrê nekiribû. Hela li ser şewqê wî jî toz hebûn. Dibe ku şewqê xwe dabû bin serê xwe. Şewqe di dêstde, rûyê wî werimî bû, li bin çengê, yalê rastê, du birînên ne pir kur dihatin xuyanê. Berê navê wî, dê û bavê wî dipirsiya. Paşê wan pirsên ku li gund ji wan pirsiyabû, ducar dikir. Diziviri û bi nivîsdar dida nivîsandinê. Bi nermik şîret li gundî dikir.

— Binhêr kurê min. Tu gunehî. Bê aqiliyê neke. Kê ev karan kir, wana wekî meriya bêje. Lêxe here mala xwe. Bi eynad kirinê tiştek nakeve destê te. Îca, tu vana li hemberî kê dikî? Çavê xwe veke, li min binihêre. Tê li pêş kê vira bikî? Ya rastî bêje. Tu li yên dinê nenihêre. Ezê te ji nav vî karî derxim, qet şahid jî nanivîsîm te. Eger nebe, ezê te bişînime ba sawcî, tu serokê wanayî. Qet te guhdarî jî nake, wê te bavêje hundir. Tê, wê çaxê roja xwe bibînî.

Bersiva gundî wekî ya berê, ya gund bû.

— Gundî hemû hebûn. Nizanim kê lêxist. Qet kes jî ne rêbere, rênîşane. Kesekî wisa jî nas nakim.

Qumandar diqehirî, lê nedixwast ku nîşan bide. Bi nermik, dîsa nêzî wî bû.

— Lawo, kurê min. Qet hişê te hildide çima? Him tu li wir bî, him jî tu nebînî ku kê lêxist.

— Begê min, walle gundî hemû lêxist. Walle, bille giştan lêxistin.

— Belê. Te jî lêxist, te jî kevir avêtin?

— Belê min jî lêxist. Wekî hemûyan.

Qumandar wekî yekî ku bi dorê, ji nêçîra xwe bigre. Rêka nû, derîkî di dilê xwede dîtibû. Zivirî ser nivîsdar:

— Binivîse kurê min. Wê rojê min jî, li Marûfê kurê Ûsiv axa xist.

— Te, bi çi lêxist? Bi keviran an bi daran?

— Bi daran, begê min.

— Te li kî dera wî xist?

— Nizanim.

— Çawa tu nizanî? Ciyê ku te bi daran lêxist, tu nizanî?

— Nizanim. Na xêr nizanim.

Dîsa bi alê nivîsdarde vegeriya:

— Binivîse. Min bi darê destê xwe lêxist. Lê nizanim, li kî derê ket. Çend cara, min li her derên wî xist. Kesî ji minre negot ku li wî xe. Min bi xwe qerar da û lêxist.

Paşê hinek tiştên dinê jî da nivîsandinê. Qumandar rind zanibû ku bi vê gotinê, gundî bi xwe sûcdar dike. Lewra bi tiliyan, gotinên wî dane navnîşandanê. Gundî ku derdikete derve, têlefonê lêxist. Serdoxtorê nexweşxanê bû. Xwe pê da naskirinê, xwastinên xwe jêre got.

— Begê min. Duh, kurê axê Tendûrekê, kurê Ûsiv axa birîndar hate wir, nexweşxane we. Halê wî çawane? Heke ku ji destê te tê, kerema xwe, rapora wî bişîne.

— Awqas ne başe. Çi ji destê me tê, em dikin. Meriv nikare ji nihave tişteki bêje. Rapordayin anha zehmete.

— Belê begê min. Min bibaxşîne. Tu jî zanî me û sawcî dest daye ser bûyerê. Qet nebe gerek di destê mede raporeke ku halê nû nîşan dide, hebe. Heke ku xetera mirinê, gerek meriv ji bo wê, her zêde li ser bisekine.

— Erê. Erê. Zanim. Ezê niha rapora pêşîn bişînim. Xetera mirinê heye. Belê ezê îro bidime nivisandinê. Xetera mirinê him jî pir zêdeye.

— Spas dikim. Tu çilo baş dizanî, bira wisa be. Ser sera, ser çavan. Têlefon danî cî. Nerehetiya wî her zêde bû. Serde jî kurê dostekî wî, li ber mirinê bû. Yê duda ku hildane odê, yê pêşîn şandine qawîşa cendirman.

Li ser yê nûhatî, çakêt tunebû. Kirasek û li ser wî êlegek hebû. Eniya wiya alê rastê werimîbû. Serê wî şikestî, porê wî bi xwînêve tevîhev, wekî qetranê, li ser eniya wî zuha bûbû.

— Binhêre kurê min. Hevalê te her tişt got. Em her tiştî zanin. Tu jî bêje û xilas bibe. Ev kara di destê kê hatine cî? Hevalê te yek bi yek ji mere got. Nebê, nebê tu bê aqiliyê dikî, ya rastî nebêjî.

— Çilo? Ez tiştekî nizanim ku. Ez jî wekî hemûyan li wê derê bûm. Tu kesî jî ev bûyera nedaye kirinê. Ez kesekî wisa nasnakim.

— Çawa kesekî wisa tune? Hevalê te çima derewa dike?

— Vira dike. Derewîn dibêje. Ez nizanim. Eger ew dizane jî ez nizanim.

— Lawê min. Tu feydê wilo kirinê tune. Me nede zehmet. Yekê jî, lêxistinê bîne bîra xwe. Ezê li te xim. Tuyî bê sucî. Kê kiriye, wana bêje. Wekî hevalê xwe, here mala xwe.

— Welle, bille. Bi namûs tiştekî wilo tune.

— Kuro, niha ezê dest bi namûsa te bikim, ha.

Dît ku bêfeydeye, ji bo wî jî da nivîsandinê ku ew jî li wir bû, bi dar û keviran li Marûf xistibû. Tilya wî li kaxizê xist.

Gundiyê duda ku çû cem hevalê xwe, lê bû ku wî saxî saxî bixwe. Bi qehr lê dinihêrî. Li ber derên wan cendirmek hebû. Bi dengekî nizm ji gundiyê xwere got:

— Bênamûs. Te şiltax avêtine kê? Bo tirsa qûna xwe, te kê avête agir? Erê?

— Şiltaxê çi? Kuro te hişê xwe winda kiriye?

— Lê qumandar got «hevalê te her tişt û navên rêberan yek û yek got.»

— Bê aqilê heram. Xwastiye ku te bixapîne. Dibe ku tu xapiyayî, te gû xwar?

— Here karê xwe! Ez kîme? Tu min nasnakî çima?

Cendirme fem nedikir ku çi dibêjin di nav xwede, serê xwe dirêj kir, îşaret da wan ku kerrbin.

Çavên qumandar ji kîjanan dibirî, «binhêr, hevalên te dibêjin ku tu jî rêberê vî kariyî, tu didî kirinê» digot. Kenehû ji kaxizên pêşiya xwe gotinên hevalên wanên berê, ducar dikir. Dîsa jî tiştek li destê neket. Heta niha qet wiha nebûbû. Ji karên gelekî tevîhev, qet nebe dîsa jî piçek serê bend bi dest dixist. Lê vê carê, her tişt vala dixuya. Lewra diqehirî. Lê sebir dikir ku dibe ku yek ji wan xeber bide, her tiştî bêje.

Gelek ji wan, bi gotinên xwe sûcê xwe qebûl kiribûn. Mehkemande gelekî li ser van gotinan disekinîn. Qerardayînêde li van dinihêrîn. Niha Soro li pêş wî bû.

— Tu dîsa hatî pêş min? Ev çiye ji destê te dikşînim? Mêzeke, hevalên te dibêjin ku Soro em şîret kirin ku li Marûf xin. Tê vê carê çi bêjî? Binhêr, eger dixwazî, ez ji tere bixwînim. Pênc, şeş kes wisa dibêjin.

— Derewe. Min tu kes şîret nekiriye. Kîne ew pênc, şeş kes? Navê wanan bêje?

— Lê. Lê. Tu li begê min binihêre. Çima navê wanan ji tere bêjim? Tu nizanî ku te kê şîret kir? Te aqil da kê?Soro têgihîşt ku dixwaze wî bixapîne. Tiştekî wisa hebûya, wê navê wan jî bigota, wê ew bihanîna pêş hev. Dixwast ku li ser wîde bigre. Soro got ku ew jî li wê derê bû, ew jî wekî hemûyan li tev lêxistinê bû. «Hemû li wê derê bûn, mînanî wan, min jî lêxist», hetanî gotinên wî bi vî tehrî nehate guhartinê, bin nivîsandinê navnîşan nekir. Qumandar li ser hember sekinandina wî, gelekî bi hêrs bû. Soro yekî wekî rûviyan bû, bi dîtina qumandar. Lê dîsa jî xilasbûna wî tunebû. Bi şirinî, bi nermayî tiştek bi dest nexistibû qumandar. Li pêş van gundiyên bêqîmet, kar nebiribû sêrî. Lewra dilteng bû, bi pirçî bû.

Lêxistina duh, têra van berazan nekiriye got di dilê xwe de. Vê carê wê herboqe vekira. Serê bend bidîta, gore wê bişkiviya... Hema tiştekî piçûk jî bi dest keta, êdî hêsan bû dawiya wê. Paşê fikirî ku gotinên wan hemûyan mînanî hevdû bûn. Qet şika wî tunebû. Evanan çawa gişt wekî hev xeber didin? Çima qet yek jî bi tehrekî dinê napeyive. Na... Na. Hinek, van hîn dikin. Nedihate dîtinê, lê eşkere bû ku wisa bi serê xwe nedibû. Şeytanek, xinzîrek di bin vî karîde hebû. Qumandar bawer dikir ku yek ji van Soro bû. Hate bîra wî, cara dinê çilo li wî xistibû. Çawa netirsiya êdî? Gerek niha wekî bilbilan xeber bi-

da, her tişt bigota. Eger dîsa jî nepeyive... Meriv şaş dibe li ber jîr û xurtbûna wî.

Dilê wî her dihate givaştinê. Derkete derve. Odek hebû li alê rastê, cem girtîxanê. Car caran meriv li wê derê dikutan, tiştên zêde dikirinê. Hate wir. Li odêde du kursî û masek hebû. Ji serokdehre got ku bira çend şivên xurt û du hevalên ku alîkariyê bikin bibîne.

Yên ku hildida odê, lingên wanan dixiste feleqê û binê lingên wan dixist. Heta ku westiya. Qayişên tivinga zexm bûn, nediqetiyan. Meriv davêtin erdê, lingên wan dixistine nava qayişê û quloz dikirin. Yê dinê mabû, bi merivtaya û însafa yê ku lêdixe. Hetanî ku tamîş dibûn, şiv li binê lingên wan diketin. Hinek gelekî diqîriyan, tamîş nedibûn. Qumandar diqehirî ku çima tamîş nabin. Piştî qasekê, vê carê, her bêtir lêdixist. Dema ku diwestiya, cendirme dihatin li dewsa qumandar, li wan dixist. Kîngê, cendirman bi dilê qumandar lênedixistin, her hêrs dibû, şiv ji destê wan hildida:

— Lawo, çima hûn gûzan hûr dikin? Awha... Awha... Digot, bi hemû quweta xwe lêdixist.

Çend kesên ku li rû û çîpên wan, birînên lêxistina duh hebûn, ewana îro di feleqêde kêm man. Li gund bi kêfa xwe, bi dilê xwe Mîro nekutabû. Vê carê heyfa wê jê derxist. Mîro diranên xwe dişidand, dixwast ku heta dawiyê tamîş bibe. Peniya wî terqiya, xwîn dilop dikire erdê. Berê pêşîn şivên ku li binê lingê wî diketin, te digot ku wê canê wî bistînin. Paşê hêdî hêdî êdî lingên wî bibûne wekî kulavan. Mînanî ku ne ling û çîpên wîne. Li binê piyên wî dixistin, lê li ser piyan diwerimîn, bi xwîna reş dibûn. Mîro deng nedikir, tamîş dibû lê qumandar bi qehran lê bû, bimre. Hetanî ku «of, of, kurê kerê, ez jî bi tere mirim» got û dar avête alîkî. Xwastin ku wî rakin ser lingan. Lê nikaribû rabe. Piyên wî bi pînên şil pêçandin. paşê kirine nava vêdrokek av. Ketin bin milên wî, ew gerandin. Pî û çîpên wî werimîbûn.Hetanî nîvro bi vî tehrî lêxistinê kişand. Yên ku karê wan li qereqolê hebûn, nehîştin bênê hundir, wê bi piştî nîvro bihatana. Li qereqolê piraniya cendirman, bê xeberdan, karûbarê xwe dikirin. Dihate kifşê ku van tiştan di dilê xwede qebûl nedikirin. Qumandar ku çû mala xwe, av hanîn dane gundiyan. Dest û piyên wanên birîndar şûştin, pemûyê bi tenturdiyot têdan. Ji dikanê, ji wanre xwarin kirîn. Lê belê kesekî tiştek nekire devê xwe, zimanê xwe lê nexist. Li ser vê cendirman her bêtir li ber xwe ketin. Ji hundir, rojnameke kevn hanîn, xwarin pêçandin ku êvarê bixwin.

Hetanî esrê kesek nehat û ew nepirsiyan. Li ser çîmentoya hênik, çend kes ji wana xewre çûn. Hinekan lingê xwe di nav destên xwede mizdidan ku êşa wan kêm bibe. Çûyin, hatin dibû li qereqolê. Dengê têlefonan û gas kirinan. Qet kesekî ferq nedikir, gelo van herdu odande çi heye, çi tune?

Çend kes ji gundiyan difikirîn ku piştî ewqas lêxistin, êdî ji nû dest pê nakin. Soro û çendê dinê digotin ku wê bi şev dîsa dest pê bikin, lê gerek em tamîş bibin. Wê çaxê yê dinê:

— Îca em tamîş nebin emê çi bikin? Yê ku hatiye serê me, emê bikşînin. Xilasbûn tune, digotin.

Qumandar çilo xwastibû ku wan bixapîne, hevalên wan bide dest. Bi hevre bi laqirdî dipeyiviyan. Lîstikê qumandar çawa gişt, vala derketibûn. Dilşa û pê bi kêf dibûn. Qet yek jî nehatibû xapandinê.

— Oro ez te zanim. Ji minre dibêje ku hevalê te navê te da. Tu van tiştan didî kirinê, em giştî zanin. Were tu jî bêje û xilas bibe. Ez te zanim. Tu şiltaxên wilo nakî. Paşê hate bîra min. Him dibê ku hevalê te got, tu didî kirinê, him jî dibê, bêje û xilas bibe. Heke ku ez didime kirinê, rêberim, ezê çawa xilas bibim? Min fem kir ku gişt vir, derewin.

Yekî dinê:

— Çima me jî wisa nedikir, li gund? Tiştekî dizî an jî tiştekî winda bûyî ku me dixwast bibînin. Me çi dikir, nayê bîra te?

Hinek ji wanan birçî bûbûn, lê medê wan nediçû, nedixwastin ku tiştekî bixwin. Cendirmekî derê wan vekir. Qumandar kaxizek di dêstde. Gişt rabûne ser piyan. Hinek bi zehmet li ser xwe bûn. Xwe sipartibûne dîwaran. Çend nîşan li kaxizê dixist, bi nav nav xwest ku wan bibîne. Kaxiz da cendirme. Wê yek û yek bihanîna oda qumandar. Wî bi xwe, ji rêza pêşîn, çend kes bi xwere bire hundir.

Li oda tedayê bûn êdî. Wan jî ev ode rind nas dikir. Qumandar bê bawer ji wan dipirsî ku çi zanibûn bira bêjin. Bi xwe jî fem dikir, tu tiştekî baş nikaribû hîn bibûya. Hela hê, «ez tiştekî nizanim» xilas nebûyî dest bi pîhn û sîlla dikir. Du cendirma lingê yekî dixistine feleqê. Çarixên wî derxistibûn. Qumandar:

— Na. Na. Şiveke hê qalind. Darekî hê qalind bînin, got.

Darek hanîn. Te digot ku ne şive, mertegê ku meriv pê ser xaniyan digre. Gundî dabûne ser qulofîska. Dar kirine fêza kapên wî. Cendirmekî bêteşe, piyekî xwe da ser alîkî û yên jî ser alê dinê. Li ser rabû pê. Gundî qet tiştekî awha nedîtibû û ne jî bihîstibû. Te digot ku kêran têre dikin. Bendê pişta piyên wî diqetandin. Sed şiv li binê lingê wî xistana ji vê baştirbû. Wekî elektrîk ji dil dikişiya heta mêjiyê wî.

Hundirê wî dihate devê wî, dikişandin, diqetandin. Cendirme ku xwe dilipitand, li ser gûzik û kapên wî, ruhê wî derdiket. Paşê rakirin ser piyan. Rûyê wî di nav xuhyêde bû. Kulm li ser hev dihatine li ruyê gundî û di nav xwînêde hişt. Qumandar wekî dîna bû. Dev lêvên gundî di nav xwînêde. Lê nihêrî, nêzîk bû. Simbêlên wî kire nav tiliyên xwe. Bi kokêve hilgirt. Simbêl bi xwînêve di destê qumandarde man. Çend hêsir ji çavên gundî hatine xwarê û berjêr tevî lêvên wî yên bi xwîn bûn. Zimanê wî, şorbûna hêsirên giryan û xwîna germ ji hev dernexist. Berî her tiştî, bo vî halî, bo simbêlên xwenê hilgirtî li ber xwe ket. Gelekî lê giran hat.

– Wilo neke, qumandar. Wilo neke. Tu jî mêrî. Merî wilo nayne serê mêra.

– Loylo. Niha tê aqil bidî min îca? Erê?

Dîsa rikêfî ser wî kir. Wî xwe da alîkî. Gavekê şûnve çû. Qumandar pîhnek avêtê. Gundî texmîn kiribû, vê carê xwe revande alê dinê. Lingê qumandar li hewê, vala ma. Hejya, li ser milê xwe, nêzî masê, li erdê ket. Milê wî di bin wîde ma û êşiya. Çavên wî êdî dinê nedidît. Gundî jî, li erdê ketina wî ji rûyê xwede zanibû, lewra, tirsana ji ciyê xwe nedilipitî. Diricifiya.

Gundî ku ji odê derxistin, tu cara îro û ev kutana, ji bîr nedikir. Wê di jiyîna xwede, heta hetê bihaniya ber çavên xwe. Ketin bin milên wî û birin.

«Xwedê kir ku milê minî rastê nîn bû» digot qumandar û dil hênik dibû. Hinek kirine feleqê. Cixare dadimirand li sîngê hinekande. Çi dihate hişê wî, wilo dikir.

Dora Soro bû. Xwe jî westiyabû. Lê dîsa jî dixwast ku Soro ji gişta zêdetir bikute û perîşan bike. Her tişt ji bin serê wî kûçikî zer derdikeve digot, bi xwe xwere. Bêşik. Tu lê nanihêrî, mêzekirina çavên wî qet ne mînanî kesekî dinêye. Bi şeytanî, rûvîtî dinhêre. Îca çilo jî li hember meriya disekine. Tu dibêjî ku dixwaze nîşanî min bide ku ew ne wekî yên dinêye. Ji wanan cihêye. Heke ku evî çûr dev jê berde, yên dinê duhve qebûlin. Ev nahêle.

Berê destekî Soro, paşê yê dinê pêşde kirin. Direj kirin, kirine nava qayişan. Serê pêçiyên wî sor, paşê hêşin bûn. Derzî li serê pêçiyên wîre dikirin. Her carê ku derzî têre diçûn, êş hetanî dil, hinavê wî dikişiyan. Ode li ser hurdişiya. Hiş di sêrîde nedima. Derzî ku zûtirê, li ser hev, serê tilyan dikirin, êş jî li ser hev siwar dibûn. Meriya dikaribû tamîş bibe. Xwînê dilop dikir ji dewsa derziyan. Du, sê cara rûyê xwe qirçimandibû, «ax, of» gotibû. Lê dîsa jî xwe navêtibû ber dest û

piyên wî. Xwe navêtibû ber bextê wî. Dibe ku bibaxişanda wê çaxê. Soro ku kerr, bêdeng disekinî, qumandar hê bêtir bi hêrs dibû. Rûyê wî tijî dilopên wekî ava sar bûn. Destên wî di nav qayişan, diricifiyan. Derzî ku nêzîk dibûn, wekî çavên tiliyên wî hebûn û derzî didîtin, ji ber dileriziyan û xwe şûnve dikişandin.

Qumandar li tilya wî ya alê çepê nihêrî. Dirêj bû neynûk, zûve nehatibû jêkirinê. Dibiriqiyan û ser jî bi rêz rêzî bûn. Kerpetenek xwast. Jêre kerpeten hanîn. Kir ku neynûkê têxe nava herd lêvên kerpeten. Soro nedihîşt. Heta niha qet neynûkên wî nehatibûn kişandinê. Lê gelek caran bihîstibû, çiloye. Dibêjin ku pir diêşîne. Ji birîna gullan pirtir dewsa birîna neynûkan diêşe, digotin. Lewra tiliyên xwe nedida û li hember disekinî. Li ser vê, destên wî yên ku di nav qayişande şidyayî, her bêtir hate givaştinê. Bi şivan li destê wî dixistin.

— Destê wî her bişidînîn, got qumandar. Cendirmanre qehirî. Wan hê şidyayî û nêzîk girtin destên wî. Kerpeten niha neynûka Soro xistibû nava lêvên xwe. Him dizivirand û him jî kerpeten dikişande alê xwe. Soro bela xwe dîtibû. Kesî nizanibû ku çi dibêje.

— Way dayê. Ez mirim. Ez mirim, digot û xwe virde wêde davêt. Lê nikaribû destên xwe, ji wan xilas bike. Li ser milan heta zendên wî û ji wir heta serê pêçiyên wî wisa disincirîn, diêşiyan ku nedihate gotinê. Yê kişandî tenê fem dikin vê. Tiliya mezin lê bû biqetiya. Hestiyên wî dişewitîn. Nîvê neynûkê tenê hatibû kişandinê. Di nav xwînêde bû. Bi êşa canê xwe, destê xwe ji kerpetan filitandibû. Dîsa di nav qayişan û di destê cendirmande bû.

Vê carê, bi kerpetanê destê xweve, li rû û sermilên wî dixist. Paşê hate bîrê ku yê di destde hesine. Li mil û navmilên wî xist tenê. Bi pîhnan li çok û çîpên wî dixist. Dîsa jî dilê wî rehet nedibû. Qayiş venekirî, ew birine oda satralê û têlefonê. Têlên elektirikêyên tezî hebûn li wir. Ji bo tedayê car cara kêrî wan dihat. Destê Soro yên bi xwîn, bi pîneki paqiş kirin. Têlên elektrîkê kirine kefa destên wî. Soro berê, carekê dîsa dîtibû li vir. Zaniblû, wê çawa biêşe. Qumandar makîna têlefonê ku bi dest dizivirand, ji bin porê Soro heta tilyên lingê wî, pêçiyên destê wî bi zexm dihejiyan, dikişiyan, diêşiyan û dişewityan. Ziravê wî diqetiya, waxta ku qumandar, ew hacetê elektrîkêyî destê xwe, wê dîsa biziviranda. Çavên wî ji cî derdiketin û ji tirsana hema usa li qumandar dinhêrî. Xwedê bike, bira dîsa manyeto neke û vê mîratê nezivirîne. Çend caran wilo, hundirê wî hate kişandinê, qîş qîşî bû, xwe jî nizanibû. Her derên wî hişk dibûn. Çîp û milên wî diricifiyan. Neynûka nîv kişandî lê bû, ruhê wî bistîne.

Zûve bûbû êvar êdî. Her der tarî bû. Qumandar ji berêve zanîbû ku neynûkên awha paşê pir diêşin. Çend caran wilo kiribû... Bi tevayî derxistin her baş bû. Hinekî jî gunehê wî pê hat. Niha destê Soro yê bê derman bê qayiş û di nav destê eskerekî tenêde bû. Qumandar kerpetan rind bi cî kir û bi quweta xwe hilkişande jorê.

Soro:

– Way bavo... Way, got.

Bi neynûka xweve xwe dikişande jorê, hevraz dikir. Soro niha li wê oda ku bo lêxistinê kar tînînde bû. Li erdê dirêj kirî û ji xweve çûbû. Di nava kerpetan de, neynûka wî, bi xwîn û goştê sor pêre bû.

Hevalên Soro zanibûn ku awqasî dûr, dirêj li hundirde girtina wî ji bo çiye. Bi dil xemgîn, merûm merûm li ruyê hev dinihêrîn.

– Erê, gelo çibû? Çi hate sêrî?

– Çima awqasî dirêj di hundirde girtin?

– Feqîrê Soro, niha kuştin, xwedê zane.

Di nav xwede qise dikirin.

Cendirman ava sar li rû û sîngê wî direşandin. Pemûyê bi tenturdiyotkirî, li dewsa neynûkê wî dixistin. Pêsîrên wî vekirin. Sîng, enî û ruyê wî, wekî berfa zivistanêde mayî cemidî bûn. Xuhya sar li ser ketibû. Wekî xewêde, çavgirtî û damarên wî bê mecal davêtin. Qumandar xar bû, li damarê zenda wî nihêrî. Çû oda xwe, cixarek vêxist. Bîstekî şûnde şewqê xwe hilda ku derkeve. Hat dîsa li Soro mêze kir.

– Ez diçim. Heke ku tiştek bibe... Tiştekî ne baş bibe, ez li malême. Hayê bidine min. Texmîn nakim ku hûn gazî doxtir bikin. Haya min nebûyî qet tiştekî nekin ha. We fem kir?

Bi gavên kurt û şidyayî lêxist, çû. Wê şevê kesî parîk xwarin nexwar. Dest, piyên Soro mizdan. Heta sibê li ber serê wî bûn. Cendirmekî çar lib hew, ji cîkî hanî û dayê:

– Vana hilde, bixwe. Ev aspîrînin. Du hewa bi hevre daqultîne. Wê êşa te kêm bike. Hilde bixwe.

Qumandar nêzîkî nîvro hat. Berê çûbû cem qaymeqam. Yên bûyî jêre gotibû. Ji wîlayetê dipirsiyan. Hinekan digot ku gund bi gundîtî serî hildaye. Jin, zarên axê û xaniyên wî, xwastine ku bidine ber agir, bişewitînin. Dijminên hûkûmatê pêçiyên xwe tevî vî karî dikin. Hinek dibêjin ku rêberên bajêr sistin, nikarin rê bibin. Ya herî hêsa eve. Lewra herkes bi xwastina dilê xwe dipeyiviya û hertişt davêtine hustiyê rêberên bajêr. Walî jî bi têlefonê, xwastibû wisa bêje.

— Ez dixwazim ku hûn li ser vî karî pir pir bisekinin. Gerek meriv gelekî hişyarbe. Eman, eman, rêberê sist nekin, gotibû di nav xeberdana xwede.

Qaymeqam jî rûtirş bû ji qise û gazinên awha. Çi bikira? Li hemû bajaran, bûyerên wilo dibin. Çima li wîlayetê, li pêş çavên wan, karên awha qet nabin? Çima li bajarên mezin, her tişt bi dilê wan rê diçe? Li Edenê, Qonyayê, Manîsayê hê jî wê bêtir dibin. Him jî salekêde çend caran? Gundî bikuştana? Çi bikirana vê zêdetir? Du sîlla, du kulman lêxî... Paşê, wê bêjin te çawa rê nebir. Kar ku ne baş çû... Yek ji wan bimre? Seqet bimîne. Wê bênê bi pêsîra min bigrin, ne pêsîra walî.

Qumandar jî heq dida van fikrên wî. Paşê ji van xeberdanan cesaret girt û du rojade çi hanîbû serê gundiyan yek, yek ji qaymeqamre got. Li alê dêrî ku dinihêrî, dengê xwe nizm dikir.

— Neynûkê yekî min hilgirt. Ket, xweve çû, got.

— Eman, eman. Pir hişyarbe. Bê tivdarekiyê neke. Karê me bê emane. Binhêr heke ku tiştek bê serê wana... Berê pêşîn walî wê te ji karê te bavêje. Bela neyne serê me. Emê karê xwenî qanûnî bikin. Tu li wan nenihêre. Çend roja şûnde, walî û yên dinê jî, wê sist bibin. Qasekê zûtir ji destê xwe derxe. Bide sawcî. Bide mehkemê. Çi dikin, bira bikin. Çi mere? Ya me rewşê bibine sêrî, bînine cî. Me gundî girtine. Yê mayî, karê wanaye, bira ew bikin.

Qumandar serê xwe hejand, heq dayê. Rabû ser xwe.

— Ez jî wisa difikirim. Ezê îro wisa bikim. Kêmasiyê bînime cî, bişînime ba sawcî, got.

Dema ku hate qereqolê, berve girtigehê çû. Derî da vekirinê û li gundiyan mêze kir. Bê hal bûn. Ji odê bihneka ne xweş dihate pozê meriya. Rû û porên wan tevî hev bûbûn. Xênji Soro, hemû rabûne ser piyan. Ev kesê wekî çiya û zinara wisa bûbû ku nedihate naskirinê. Şûnve zivirî, gazî cendirmê ber destê xwe kir. Ji wî xwest ku birîn mirînê wana bênê paqiş kirinê û rewşeke baş bidine wana. Dixwest îro wan bişîne ba sawcî.

Seheteke şûnde, dema kû qumandar hat, cendirmê serwaxt û hişyar, jêre got ku her tişt hazire. Lê ew gundiyê çûr, halê wî ne başe. Wê çaxê poşman bû qumandar. Xwest roja dinê bişîne ba sawcî. Ma rojtira dinê. Bi têlefonê hevalê xwe, memûrê sihetê, Celal geriya. Dema ku bo navrojê diçû malê, bira xwere hine hacetê birîn nihêrandin, pêçandin û dermanê jan birînê bîne.

Yê bi dîtina xwe hinek ji wan bibijarta. Wek her tim ku dikir. Yên ku gotibûn, «em li wê derê bûn, me bi kevir û daran li Marûf xist», wê ew bigirta û yên dinê berda.

Di êvara tarî û teng de:

– Ku ez we li bajêr bibînim, ezê we dîsa bigrim, bavêjim hundir, got û çavên wan tirsand.

Bo kirina van karan, qumandar êvarê heta demekê dereng ma. Wê wextê, Ûsiv axa kete hundir. Rewşa kurê wî berve başbunê diçû. Doxtir hêvîdarin ku wê baş bibe. Bi keder evana ji qumandare got. Qumandar wek dost û şirîk derdê wî, ew guhdarî dikir. Du roja li qereqolê, rojekê jî li gund, çi anîbû serê gundiyan, gişt yek û yek ji axêre got. Xênji wana, tiştekî ku Ûsiv axa zanibû, qumandar dixwest ku wan jî hîn bibe. Gilî û gotinên wî da nivisandinê. Ûsiv axa ew nav nîşan kir. Paşê qumandar ew kaxiz hemû kirine ciyên wan.

Ûsiv axa dît ku her tişt bi dilê wî bûye. Sipas kir û xwest ku tiştekî dinê jî bêje. Ji bo vî tiştî, gelekî şikêde bû, ku gelo bibêje an nebêje. Dawiyêde qerarê xwe da. Vê dêla bê edeb, gund tevî hev dikir, gundî radikirne ser piyan. Bira wê jî bela xwe bidîta.

– Hemû tişt başin. Lê belê li gund Fateke jinebî heye. Ji deh mêra xirabtire. Serê gund tîne binê gund. «Hûn çito mêrin, bi yekî nikarin, bi heqê wîde nayên» dibêje û gundiya dişîne ser min. Hingî Fatê ku li wirbe, wê gund li tevîhev bike. Zimanekî wisa di devê qehpikêdeye... Li ser van pirsan qumandar piçekî nikisî. Nedixwest ku jinan tevî van karan bike. Nav xelqêde gele tişt tênê gotinê û pir xetere.

– Ûsiv, axa ew jine. Wê çi bike?

– Of. Of. nebêje, Wê çi bike. Belaka xwedêye. Mêrê wê tune. Bê mêrî, nizanim serê vê bê namûsê xistiye, çiye? Wekî dîna gundiya li diji min derdixe. Yên dinê ku wê wisa dibînin, ew jî qet disekinin? Qumandar gere meriv çavên vê pir bitirsîne. Ne wilo pir dirêj. Aha bi wextekê. Eman çi dêlegureke ew? Tu were, wê ji min bipirse.

Qumandar bi dilekî bê xwest qebûl kir. Nedixwast ku Ûsiv axa xemgîn bişîne.

Rojtira dinê, nêzîkî tariya êvarê, birîndarbûn û nemirina Marûf anî berçavên xwe, hinek ji wan girtiyan berda. Lê dîsa jî hevde kes li hundir man. Dûr û dirêj ew tirsandin û bi sê cendirmanve ew şandine gund. Li cendirman teme kir ku ji Tendûrekê Fata jinebî, bi xwere bînine qereqolê. Nebê, nebê xerabiyê bibîne. Heke nas û kesên wê dixwazin bira pêre bên, ku tu kes virde wêde xeber nedin.

Li pey wan qederekê nihêrî. Çilo bi biratî, dostî û dilxem ji hev qetiyan. Pere derxistin, dane hev. Yên ku çarixên wan kevn bûn, bi yê nûre guhartin. Çend kesan kirasên nû yên li ser xwe derxistin dane hevalên xwenên mayî. Qumandar ku ev hala dît, dilteng bû. Serê pozê wî şewitî. Dema ku piçûk bû, li dibistanê, çiqasî ji hevalên xwe hez dikir! Ewana jî ji wî. Perên xweyî mayî parve dikirin di nav hevde. Heval û dost. Paşê her kesek bi alîkîde çûbû. Jiyanê hemû, bela belayî kiribûn. Piştî çend salên dirêj, êdî bi emrên zêde, bi jin û zar, wexta ku wan dostên kevn hevdu didîtin, tiştekî germ dilê wîde dinuqutî. Bi sehetan rûdiniştin û qala rojên berê dikirin. Vî karî, qumandarê cendirmetiyê, ev tişt hêdî hêdî, bi dilop û dilop helandibû. Bûbû kesekî nû. Dostên wî yên berê jî, êdî germ û bi dilbiratî ew nedipirsiyan.

Niha ku Tendûrekiyan di vî halîde dît, wekî agirê bin xuliyê, hevaltî, dostî û alîkarîkirin hate bîra wî. Wekî êmîşekî şêrîn û nîvtirş, zimanê meriya bişewitîne. Wilo ku tengasiya dilê wî piçekî sivik û kêm bû. Ew niha bi dilhezkirî, bi biratî, bê vir û derew nêzî hev bûn. Qumandar, rojên berê, zaroktiya xwe hanî ber çavên xwe. Lê belê demekî kurt. Wisa nîşan dida ku awqas hatibû guhartinê, lê dîsa jî hine tişt di dilê wîde mabûn. Ji bo vê jî, du roj û du şeva gundiyên bênê kutanê û bi biratî yê hevdû hemêz bikin, paşê qumandarê rojên berê bîne bîra xwe.

Çima gelo hereket û fikrên wî wilo hatibûn guhartinê, xeraw bûbûn? Ew niha wekî perçê hesinekî makînê bû. Hesin bê makîne nedibû. Ku wilo nebe, hesinê bê avêtinê û wê zengê bigre. Ev makîne li ser hezkirin, dostî, alîkariyê nehatiye çêkirinê. Ji sêrî heta dawiyê, ji dawiyê heta sêrî bi heloqanve bi hevdû hatiye girêdanê. Her tiştî kêmasiyek dihanî cî. Pêşda çûyin, dewlemend bûn, ciyên bilind li berî her tiştî bûn. Herkesî pê li ser serê yekî din dikir ku hilkişe jorê. Kê ku xwe xilas kir, yê jîr ewe. Ev makîna, makîneke wiloye. Her tim gotina meriya, xwastina meriya nabe. Wisa naçe. Makîne meriyan diguherîne. Dixe tehrekî dinê. Qumandar jî wisa. Makînê wilo kiribû ku hesin êdî ne hesinê berê bû. Dibe ku rojekê wisa nebûya, lê îro awha bû. Lê belê tiştekî dinê hebû. Vê makînê, meriv diguhartin û dixistine bi tehrekî dinê, gelo meriv nikarin vê mekînê, qet nebe, piçekî jî biguhurînin? Dibe. Dibe. Çima nebe? Ne wisane çima? Soro û tendûrekiyan îro bi biratî li hevdû dibine xwayî û li hemberî her tiştî radiwestin. Dibe ku her çûyî, mekîne nikaribe tiştekî bike. Belê. Belê. Ya rastî jî eve. Ev bûyerên di jiyana me, bi hevre girêdayine. Kêm kes vana dibîne, ferq dike. Ew jî bi salan, piştî xebat û ceribandinê... Bi hiş û aqilekî nû.

Gundiyên girtî, rojekê dîsa dereng diman ku herin hember sawcî. Nêzîkî nîvro, sê cendirme û Fatê hatin. Fatê destê kurê xwe girtibû, jineke pîr û xwarziyê Soro Elî jî pêre bûn. Ji gund, hespekî jar û pîr jêre dîtibûn. Herdu jin û zarok bi dor lê siwar bûbûn. Elî rêde bi cendirmanre qise û hevaltî kiribû. Jin him westiyayî, him jî di meraqêde bû. Kurik ji tirsa, destê xwe havêtibû pêşa diya xwe. Dema ku hatine qereqolê, kurik serê hespê girt, Elî û jin çûne hundir.

Fatê, cara pêşîn bû ku diçû daîrekê. Emrê xwede qereqol nedîtibû. Lê dîsa jî neditirsiya. Li gund, cendirman ku jêre qala çûyina wê kiribûn:

— Erê. Erê. Ezê niha rabim herim. Wê çi bi min bikin? Çî min ji mêran kêmtire? Ew mêrin ji xwere. Ez jî bi jintiya xwe, her tiştî dikarim bikim got.

Çend jin xemgîn bûn.

— Keçê dînê. Beredayî, beredayî xeber nede wilo. Li nav cendirman, li qereqolan çi karê te heye? Kî çi zane, wê çi bînine serê te? Îca tu dîn û îmana wan heye, gotibûn.

Dîsa jî telaşa Fatê nîn bû.

— Gû xwarine. Hela bira yek ji wan, bi çavekî dinê li min binihêre. Xwedê tiştekî wisa nîşan nede. Tê bibînî. Xwîşka te devê çend hewa tijî xwîn dike. Yê ku destê mede maye, namûsa meye. Emê li wê nebine xwayî? Hela em li gund û erdê nebûne xwayî, me ji dest derxist. Yê mayî jî ji dest here, erê? Xwedê neke, got û bersiv dabû wan.

Wisa digot, lê dîsa jî di dilê xwede ditirsiya. Li gund qet pirsek nehanîbû ser xwe. Lê li qereqol û daîran? Li ser van deran, gelek gotinên ne baş bihîstibû. Li qereqolê, par gundiyên wan çiqasî kutabûn? Ewên ku îro ji bajêr hatin, di çi halîde bûn? Wekî neçûya? Îca wê çi bikira? Sê cendirmên bi çek. Hukumateke bi deng. Li hemberî wan bisekiniya? Paşê, pênc pêçî jî ne yekin. Qet yekî wanî baş tune çima? Ew jî merivin. Lawê dê û bavanin. Namûsa hemûyan jî heye. Lê hukumat? Ewê namûsa me biparêze. Wisa digot di dilê xwe de. Lê piştî du deqîqan ev tişt difiriyan, diçûn. Dîsa tiştên ne baş dihatine ber çavên wê.

Gundî tevî hev bûn. Hinekan digot ku, bira Fatê neçe. Dewsa wê, mêrên mayî herin. Çend kesan jî digot ku, bira mêr hemû pêre herin. Gotinên bê ser, bê binî bûn. Di nav vê qelebalixêde dîsa Fatê, ji hemûyan jîrtir derket.

— Ezê herim. Çawa neçim? Ez neçim, îca ezê çi bikim? Li hemberî hukumatê bisekinim, ev çiye? Ji bo min, ber xwe nekevin. Xaltiya Zelêxa bira bi minre bê, bese.

Kurê wê, çav kelogirî, destekî wê girtiye, pêşa wê bernade. Diya xwe guhdarî dikir, jêrve li rûyê wê dinhêrî. Cîranan gotinên Fatê qebûl kirin. Karê malê û her tişt ji jinên Mîro û Sorore got. Çawa hebe, wê sibê an jî du siba vegeriya. Wilo difikirî. Qet tiştekî dinê nedihate hişê kesî. Sibê zû, cîranekî, hespê xwe jêre hanî. Hespekî jar û pîr bû. Dîsa jî lingên wan ji erdê xilas dikir. Ev jî besî wan bû. Elî jî hazir bû.

— Ezê jî bi tere bêmê, xwenga Fatê.

— Na. Na. Tê bêyî çi? Ne pêwîste. Çima em diçine ku? Emê zûtirê bizivirin. Tu neyê. Tu li mal û karê cîrana miqat be.

— Na walle, ezê bêm. Tu bibêjî jî, nebêjî jî ezê bêm.

Cîranan jî got, «bira bê, bira bê, xorte, çi dibe, bira bê...» Ew jî tevî wan bû. Fatê xatirê xwe xwast, kurê wêyî mezin li mal dima. Ewa hemêz kir. Rû û çavên wî, bi deng maç kir. Ji çavên lêwîk, zûve dilop dihatine xwarê.

Xaltiya Zelêxa û Fatê, di rêde, virde wêde, ji yên bûyî, yên berê xeberdan. Li Tendûrekê, xaltiya Zelêxa şirîkê derdê hemûyan bû. Zarên gund gişt di destê wêde hatibûne dinê. Bi ken û henek bû, nedigot eva jine an jî mêre. Bi hemûyanre xeber dida, henek dikir. Kin û qemer bû. Wisa dixuya ku di civantiya xwede bedew bû. Yên ku serî, dil û dereka wan biêşe, direviyan ba wê. Yên ku heywanên wan nexweş bikevin, jî dîsa wisa. Zimanê wê şêrîn, meriya bi xeberdanên wê bîr û bawer dikir. Yên ku ji hev dixeyidiyan, dilsar dibûn, wê li hev dihanî. Lewra, berî her kesî, li gund çibûye, çi nebûye, wê dibihîst.

Nêzîkiya nîvro, dema ku hatine bajêr, êdî tiştekî wan yê xeberdanê nemabû. Bajar ji gundê wan pir mezintir bû. Xaniyên bilind, mînara camiyê hildikişane ezmanan. Şaş û metel li van tiştên nû dinihêrîn. Kurê wê bi tilyên xwe, hine cî nîşan dida û dipirsiya. He zanibû ku diya wî ji wî bêtir zane.

Fatê û xaltiya Zelêxa, birine oda qumandar. Ew jî li benda wan bû.

— Hûn hatin?

Ji gotinên wî, pirsên wî, herdu jina jî tiştek fem nedikirin. Nezan, nezan li rûyê hevdu mêze dikirin. Qumandar û mêrên gund, karibûn bi hevre bipeyivin. Lê bi van herdû pîrekanve nedibû. Qumandar gazî Zeynel kir. Zeynel cendirmekî ji Zarayê bû.

— Kurê min ji vanre bêje. Ez texmîn dikim ku eva ciwan Fatêye?

Zeynel ji wan pirsî û zivirî bersiva qumandar da. – Belê qumandarê min, ewaye.

– Di birîndarkirina Marûf, par şewitandina traktorê, dibêjin ku ewêya gund berî van karan daye. «Hûn çito merivin, bi axakîre serederiyê nakin?» gotiye. Gund berî hev daye. Çima wilo kiriye? Hela jê bipirse.

Qederekê li hêviya wan ma. Zeynel ji Fatê pirsî. Fatê bi dest û milên xwe tiştna dibêje, dipeyive.

– Vir, derewin. Ez jinebiyekim. Çi dikarim mêran berê axê dim. Ez kîme çima? Kî gura min dike? Kê gotiye ev gotinan? Bira bê, carekê jî li ba min bêje. Derewin. Derew. Axa hat li ser erdê me rûnişt. Mêrê min li çol û baniyande, da kuştinê. Ez û êtîmên min bê bav hiştin. Zeviyên me jî têra wî nekirin. Paşê, zeviya dewsa dibistana gund jî ajotin. Gundiyan jî lêxistin. Çi sûcê min heye?

– Lê te gotiye ku, «hûn bi axakîre nikarin serederiyê bikin». Ev çiye lê? Tu dibêjî, min kes berî axê neda.

– Belê min got. Merivek li ser gundekî rûniştiye, hûn hemû gundek pê nakin, min eva got. Min negot ku, «herin lêxin, bikujin». Sûc kîdera van pirsandeye? Erê?

– Dema ku li Marûf xistin, tu jî li wêderê bûyî?

– Belê, li wir bûm.

– Tu li wir çi digeriyayî? Nav mêranda?

– Ez ne tenê bûm. Jinên din jî hebûn. Jin, mêr, zar hemû li wir bûn.

– Te jî bi dar û keviran lêxist?

– Belê. Ne bi daran, lê, min jî kevir havêtine. Lêket an lêneket, nizanim.

– Çawa nizanî? Meriv çawa nizane ku kevirên havêtî lêketin an na?

– Gelekan kevir dihavêtin. hinek lê diketin, hinek jî vala diçûn. Ez çi zanim ku kevirên min an yê hinekên din lêdiketin?

Qumandar îro bêdeng bû. Canê wî ji duh siviktir bû. Fatê jî di nav yên ku li Marûf xistîde bû. Xwe bi xwe digotê. Her tişt êdî hazir bûn. Wek xwestina qumandar qise kiribû.

– Lê tu dibêjî ku jinên din jî hebûn li cem te û kevir davêtin. Navê wan bêje, heke wisane.

Fatê fikirî. Wê çend nav bigotana, paşê hate bîra wê ku ev tiştekî ne başe. Li gund, her tim ne baş xeber didan ji bo yên awha. Çawa wê navên wan jinan bigota?

– Ez çizanim kî bûn? Gelek hebûn. Lê nizanim kê, kê bûn. – Tu jineke bi sal û bi aqilî. Tu ne zarî. Li cem te bûn. Dibe ku hûn tev çûn wir. Keviran davêjin. Niha jî tu nizanî, ew kî bûn.

– Nizanim.

– Rind bifikire. Paşê ji bo te baş nabe.

– Hûn hukumatin. Hukumeteke mezin. Çima ji min dipirsin, navên wan? Hûn min bikujin jî ez nabêjim.

Qumandar xwestibû ku ya rastî hîn bibe, lewra dipirsiya. Xwe jî nedixwwest ku jina tevî van karan bike.

Gotinên wê hanî bi ser hev, hinek jî xwe pêde kir. Pêçiya Fatê da lêxistinê. Karê wî qediya bû êdî. Gotinên wan û gilîkirina axê hildan, çû cem sawcî. Sawcî jî bi halê birîndar hesiyabû. Rapora pêşîn îro an jî sibê, wê bihata. Xetera mirinê pir bû, nexweş li ber mirinê bû.

Sawcî li gotinên wan mêze kir, dît ku hemû wek hev dibêjin. Gişt jî hetanî dawiyê, di nav bûyerêde bûn. Belê, heke ku têde şaşî tunebe, wisa nîşan dide. Giştan jî eva sûca kiriye. Eger bi zorbetiyê wilo negotibin, gişt jî sûcê xwe qebûl dikin. Qet yek jî poşman nîn bû. Di nav wande, jinek jî hebû. Ew jî wek yên dinê dibêje. Raste rast gotiye ku ew jî di nav wande bûye. Hevde mêr, yek jî jin, heyjde kes. Awqas kes gerek ku bihatana girtinê. Gelek bûn. Gelo meriya nikaribû ku hinekî kêm bike? Gelo gişta jî wilo, mîna hev xeber dabûn? Dibe ku bi vî tehrî, bi wan dabûne mor kirinê, nav nîşan kirinê? Xwe xwest ku carekê jî wan guhdarî bike û ji wan bipirse.

Piştî nîv sehetê, li hember sawcî bûn. Xênji nivîsdarê wî kes li odê tunebû. Dît ku mîna berê, wek hev dipeyivin. Xwe jî şaş û metel ma. Gotinên zêde ji dev dernediketin. Di nav toz û xulyêde bûn. Ruyên wan dirêj bûbûn. Dest, ruyên hinekande birîn û werimandin dihate xuyanê. Sawcî zanibû ku ev du rojin li qereqolê hatine kutanê. Lewra ji wî alîde qet tiştek nepirsî ji wan. Wisa bawer dikir ku gerek hinek tiştan nebîne û nebihîse. Bi tehrekî dinê nedibû. Axatî û şerên li ser erda, li vî alî, ji wîlayetên dinê zêdetir bûn. Lê wilo difikirî ku kes nikare vê biguhurîne û li hember derkeve. Ji taqeta wan zêdetir bû. Xwe jî ji axatiyê diqehirî. Jiyana memûrtiyêde rind fem kiribû. Eva mîna marekî bi heft seriye. Meriv pê nikare.

Gotinên Soro ku guhdarî kir, tê gihîşt ku ewa gelekî hatiye kutanê. Bin çavên wî reş, werimî, poz sor û birîndar, ruyê wî tev birîn û qalik girtibûn. Pêçiya wî pêçandî bû. Soro jî gotina xwe ducar kir. Çend pirs di derheqê axande got. Çawa bû, sawcî tev pirsên wî bû.

— Ev axatî çima, yê pirî li ba we heye? We gundiyan, ew anîne wêderê. We ji wanre xulamî kiriye. We ew bilind kirine. Niha hukumat jî pê nikare êdî. Li alê me jî axayên zorbe hene, lê ne wekî vir.

Soro li ser piyan, gotinên sawcî, heta dawiyê guhdarî kir. Dibe ku bi dil û bê mene digot. Paşê:

— Lê belê sawciyê min. Tu dibêjî ku hukumat bi van nikare. Hukumat kiye çima? Sawciye, hakime, qaymeqame, qumandare. Ne wisane? Memûr û cendirmên hukumatê hene. Te got ku we xulamî kiriye, aniye vê derê, we ew bilind kirine. Wekî wisane begê min, me bi kêfa dilê xwe çima awha kiriye? Çima kê can, namûs, zevî û kar, barê xwe li erdê dîtiye? Em jî ji bo wan dijîn, ne wisane? Lê belê ya rastî, hukumat yalê van axan digire. Qaymeqam tê, li malên wan dibe mêvan, ne malên me. Sawcî û hakim tên li malên wan, berxa dixwin. Qet silavekê jî nedine me. Wilo ku dibe, em feqîrên xwedê çi bikin? Bê çare dimînin. Ji wanre xizmetê nekin, îca çi bikin? Kî bi destên me digire? Binhêr, ev du salin, çi nehate serê me? Paşê çi bû?

Soro bi dil nexwestî, birîn û werima rûyê xwe pê nîşan da. Destê xwe dirêjî pêş wî kir.

— Dawiyêde ez ketime vî halî. Qedera me wiloye.

Sawcî êdî nikaribû dirêj bike. Xwe da ser karê xwe. Hemû guhdarî kir. Paşê dora Fatê hat. Yekî vegerande tirkî. Lê dîsa jî kê lêxistibû, Marûf anîbû ber mirinê, nedihate xuyanê. tiştekî dinê ku bihata kirinê, tunebû. Wê hemû bida girtinê.

Xaltiya Zelêxa, Fatê û kurê wê, di salonêde digiriyan, dizariyan. Memûrên daîran û hine gundiyên dinê, bi dilxemgîn li wan mêze dikirin. Bi zorê ew ji hev qetandin. Fatê wilo bi hesret kurê xwe hemêz dikir ku... Zelêxayê ew bi zorê ji diya wî dûr xist. Hevde mêr û li dû wan, Fatê, di nav cendirmande sûka bajêr tijî kiribûn. Ewana, bi berve girtîgehê dibirin. Kesên li dikanên sûkê, li kuçan qelebalixeke giran li wan mêze dikirin. Li pey wan, zarekî kurîn, sere jêr digiriya û diqîriya. Dora porê wî jêkirî, polikên bi rengîn û morî li ser namilan xemilandî, rû qemer û xweşik bû lawik.

— Dayê... Dayê...

Wexta ku dengê wî wilo dihat, di nava sûkêde bûn. Fatê li ser dengê kurê xwe zivirî. Tiştekî germ niqutî dilê wê. Kezewa wê dişewitî. Ji cîranên xwe, cendirman û qelebalixê fedî kir. Di emrê xwede awqas kes nedîtibû. Di ciyê xwede sekinî. Du gav şûnve avêt. Kurê wê xwe havête hemêza wê. Bi pêşa xwe, çavên wî zuha kir. Destê wî girt û te-

vî hevalên xwe bû. Hemû li ser dengê lawik, hêdî diçûn niha. Girtî, bûne nozde kes niha. Yek jî girtîkî bi xwe, bi dilê xwe bû.

Vî halî gelek kesan dilşewitî kir, xênji çend dostên Ûsiv axa. Dilê hemûyande, ji bo van kesan, pir an hindik şewat hebû ana. Wê rojê di bajêrde, ji bo tendûrekiyan, Ûsiv axa, kurê wî û qumandar gelek tişt hatine xeberdanê. Her kesî heq didane hinekan. Yên ku digotin, tendûrekî bi heqin, ne kêm bûn.

## – XXXIII –

Ev hefteyeke ku li girtîgehêde bûn. Serekê gardiyanan Soro, Mîro û Seîd nas kir. Berê jî, gelek dostî nîşanî wan dabû. Ji gund nivîn û tiştên wan hatibûn. Li gund, cîranên wan karên yên ku girtîgehêdene, hildane ser milên xwe. Li zeviyên wan miqate dibûn. Ji gund savar, penêr, nîsk û rûn anîbûn. Ji hemû malan xwarin berhev kiribûn. Nedihate bîra kesî ku kur, bira, kesekî nêzî wan girtiye, ji wanre diçe. Bi xurc û têrada, tevî hev şandibûn. Gundiya fem dikir ku hemûya tevayî li kurê axê xistibûn. Lê belê li ber wanve hinek gundiyên wan, niha hatibûne girtinê. Lewra giştan jî kar û malê cîranên xwe dinihêrîn, kêmasî dihanîne cî. Her bêtir nêzî hev bûbûn. Kêmasiyên yên çûyî, nedixwastin ku nîşanî jin û zarên wan bidin. Bi vî tehrî kar, bi rêve diçû.

Xaltiya Zelêxa, bi kurê Fatê yê mezinve, li mala wê dima. Mala wê ji berê rindtir, bi rêzeke baş bû. Girtiya wilo dibihîstin. Qet Ûsiv axa nedîtibûn. Nobedar Şukrî, Eso û Hesenê Hemzo car caran diçûn mala axê û cem gundiyan. Wan xeber dihanîn. Kurê axê, Marûf her diçû baş dibû. Zimanê wî giran bûbû, nikaribû wekî berê xeber bide, digotin yên hatî.

Fatê li alê girtîgeha jinan bû. Nêzî ya mêran, du ode bû, ew dera. Maleka nû çêkirîbû ku kirê kiribûn. Xênji du odan, odeke ser û kinçşûştinê hebû. Ciyê avdesê û aşxanê jî baş bû. Bi têl û hesinan hewîrdora wê girtibûn. Li derî têlan, ciyê nobedar hebû ku ji daran hatibû çêkirinê. Gelek caran nobedar diçû li cem hevalên xwenên girtîgeha mêran, lewra, jin bê nobedar diman.

Dema ku ew hatin, li alê jinan, sê girtî hebûn. Rojên pêşîn, hela hê, gelekî nêzî hev nebûbûn. Fatê çend roja, serê xwe bilind nedikir, digiriya. Kurê wê li gund mabû. Hertim li pêş çavên wê bû. Lê, wekî li gund nexweş bikeve, kes lê nenihêre? Ji tenêbûnê bitirse lawik. Kurê wêyî piçûk, ev der hez dikir. Baxçe, elektrîk û ciyê avdêsê, ji bo wî, tiştên nû bûn. Diya wî ku digiriya, li pêş çokên wê rûdinişt, bi destên xwenên piçûk hêsirên çavên diya xwe zuha dikir û destên wê miz dida. Diya wî dest ji girî berdida. Ew dida hemêza xwe, bi çend pirsên dilxweşî ew şa dikir. Zikê wî têr dikir, xwe jî bi wîre hine nanê tisî dixwar.

Carekê her sê girtî, bi hevre, ji bo kurê Fatê dûr û dirêj giriyan. Yên ku ji gund dihatin, xeber dihanîn ku kurê wê qet diya xwe nagere û pir başe. Paşê hêdî hêdî Fatê jî wekî berê bû. Gundiyên wê pirs danê ku careka dinê, hevdîtinêde wê kurê wê jî bînin.

Fatê hînî herdu hevalên xwe dibû, ji hevdû hez dikirin êdî. Xwarin tev çêdikirin, dixwarin. Lawik dişandin, ji wan piştan dar dihanîn. Kincên xwe dişûştin. Emrê xwede qet rojekê, wilo rehet û bi dilê xwe, serê xwe neşûştibûn, wekî vira. Seyîtxanê piçûk, vira, mînanî li mala xwene kêfxweş bû. Diçû, dihat bi qurnê avê dileyst. Li vir mijûliya hersêkan jî Seyîtxan bû. Nedîtibû berê. Qurne li alîkî dizivirand û ava zelal dikire şire şir. Têr, têr şa dibû. Dest û rûyê xwe şil dikir, bi avê dileyst. Her sê, bi Seyîtxanve dilşa dibûn, sebra wan dihat û ji wî hez dikirin. Delaliyê wan bû. Li gund jî wisa bû, lê li vir her zêde. Diçû baxçê, nêzî ciyê nobedar dibû. Ji dûrve li tivinga wî mêze dikir û bi sehetan ji mêzekirinê nediwestiya. Eşqa wî bi hesinê tûjî serê tivingê û qawişa ku meriv davêje hustiyê xwe dihat. «Xwazila eva ya min bibiya», digot di dilê xwe de.

Rojekê ji cendirmanre gotin, Seyitxan jî bi xwere birin girtîgaha mêran. Seyîtxan ji bo ku gotinên diya xwe bigîhîne cîranan, çûbû wir. Dixwast ku kincên wan, ji bo şûştinê bibe cem diya xwe. Giştan Seyîtxan ji dest hev digirtin, hez dikirin. Yekî şekir kire bêrîka wî. Girtîkî şehkî reş da wî. Dema ku bi rev û lez şûnve dihat, şehê xwe hişke hişk, di destê xwede digirt. Cîranan kincên xwe, bi xwe dişûştin, lewra ji Fatêre neşandin. Ji bo diya wî, hinek pere kirine bêrîka wî. Him Soro him jî serekê gardiyanan, ewî serrût û rûken, ji cendirmere gotin ku bira li Seyîtxan miqatebe. Soro destê wî girt û her derê gerand. Wexta ku ew şande cem diya wî, pêre teme kir ku bira car cara, bi nêzîkiya nîvro tenê bê. Ji baxçê gazî bike, «apê Soro», paşê were hundir. Seyîtxan ti-

ştek fem nedikir ji van gotinên Soro. Dîsa jî serê xwe hejand, qebûl kir.

Seyîtxan êdî bi hêsan diçû û dihat. Roja pêşîn ku gotinên Soro ji diya xwere got, ew têgihîşt ku Soro çima wer gotiye.

– Raste. Rast gotiye Soro, kurê min. Neçe cem kesên ku tu nasnakî. Bi wanre qise meke. Ew ne gundiyên mene. Ji minre negotî, neçe cîkî, lawê minî delal, got Fatê.

Niha di destekî Seyîtxande şeh û di destê dinêde neynikeke şikestî, her tim porê xwe şeh dike. Neçê dibe, paşê xirab dike û dîsa şeh dike. Niha mînanî malekê dijiyan ew her çar. Sê jin û mêrê malê Seyîtxan.

Li cem diya xwe rawestandina Seyîtxan jî bûyereka dine. Serok gardiyan deng nedikir, tiştek nedigot. Dilê wî bi wan dişewitî. Gerek nivîsdarê girtîgehê li van karan binhêriya, teselî bikira. Lê belê ew awqasî tevî her karî nedibû. Ewî, tenê, rojên xwe derbas dikir.

Li alê jinan, gardiyana wan «Xaltiya Cewahir» bû. Gelekî qelew, rûyê wê sor, xaleke reşe mezin li fêza alîkî biriyê wê hebû. Mala wê, çend mal ji dûrî girtîgehê bû. Lê dîsa jî, dema ku dihate karê xwe, di nav xuhyêde dima. Wekî qazan rêve diçû. Bîhntengî pêre hebû. Di devê xwere bîhn distand. Laşê wêyê bi goşt dilerizî. Tansiyona wê bilind bû. Tiştên qelandî û xwê xwarin jêre ne baş bû. Lê belê kesekî devê Cewahirê vala nedidît. Wexta ku jêre digotin, gerek kêm bixwe, jar bibe:

– Ez qet tiştekî nexwim jî, kok dibim. Çi bixwim li min tê. Hemû kes dibînin. Ez tu tiştekî zêde naxwim, digot û diqehirî.

Dema ku ji malê dihat, nîv sehetê bîhna xwe distand. Dikire ofînî, pofînî. Way pişta min, way çokê min diêşin, digot her tim. Wan her sê girtiyan, karê Cewahirê gişt dikirin, lewra wê destê xwe nediavête tiştekî.

Ew rojên pêşîn ku Fatê zû zû digiriya, qediyan. Ana jî wê Esmerê dest pê kirin. Berê jî her tim digiriya, lê waxta ku Fatê nû hat, wê derdên xwe qasekê ji bîr kir. Niha dîsa digiriya. Vê carê jî Fatê dilê wê distand, li ber digeriya û nedihişt bigrî. Kulên Esmerê dîsa serî hildabûn. Diya wê li gund bû, dihate bîrê. Ji dawiya xwe ditirsiya.

Bi gotinan, dibe ku paşê wê bişînine wîlayetê, mehkema giran. Ji gundên deştê, dest û piyên wê gir, nexweşî nedîtiye, yeka sor qemere Esmer. Wexta ku dest bi girî dikir, bi sehetan dikişand giriyên wê. Hetanî êvarê, parîk nan nedikire devê xwe. Lê heke ku wê rojê bi kêfbe, henek û laqirdî dikir, di nava karê xwede kilam digotin bi pêre. Den-

gê wê mînanî zengilan û dilê meriya dikizkizand. Zareke dê û bavê xwe tenê bû. Nîvê gund yê wan û nîvê din jî yê apê wê bûye. Malên wan li cem hev. Herdû bira, bi hevre pir xweş derbasiyê dikin. Qet tu cara, dilê hev neşikênandine. Şer nekirine. Jiyana hemûyan bi dilên wan. Ap, piçûkê bavê wê ye. Ji gura birayê xwenî mezin dernakeve. Qedrê hev zanin, hurmet dikin. Tu xwîşk û birayê Esmerê nebûne. Birakî wê bûye, lê şeş salî, beriya wê miriye. Paşê ji nexwaşiyê, an jî çimaye kes nizane, lê diya wê êdî zar nehanîne. Kî çi dibêje bira bêje, diya wê bawer nedikir. Îna dikir ku li ser nivîştên nexwazan, ji zaran bûye. Tu şêx û mele li wan deran nehiştibû. Çû ber derên hemûyan, lê dîsa jî zarê wê nedibûn. Esmer ku qala bûyera xwe dikir:

— Ax, wekî birayekî min hebûya, tu ev dihatin serê min. Wax ez serreşê. Wax ez bextreşê. Bira hema tenê mêr bûya. Halê bira, tiştekî dinêye. Ax, ax bira, digot û digiriya.

— Xwedêyo, te çima ruhê birayê min sitand? Bo ku min li vê dinê, pêş hemû kesan rezîl bikî, perîşan bikî, erê? Lê diya mine belengaz? Ew niha di çi halîdeye?

Bavê wê rojekê nexweş dikeve. Cîran dibêjin ku serma girtiye, ne tu tişte. Dane xuhdanê. Qedeh havêtine pişta wî. Nava rojekêde giran dibe nexweşî. Qet tiştek ji destê kesî nehatî, berbanga sibê dimre. Bi rojan, bi ev mirina nişkêve hatî, bawer nekirine. Diya wê, demeke dirêj nehatiye ser hişê xwe. Nişkêve tenê maye. Giraniya malê ketiye ser milên wê. Feqîrê berê jî jar û zirav bû, lê niha wekî pepûkan qet nemaye. Mala apê xweve wekî malekê bûne. Çend meh derbas bûne, êdî hêdî hêdî tunebûna bavê wekî berê giran nehatiye. Karê malê, mêrg û zevî bi rê çûne.

Qîzik êdî xama bû. Di jiyana bavê wêde, çend kesan jê xwastibûn. Lê bavê nedixwast keça xwe wisa zû zû bide û ji xwe dûr bixe. Salekê berê, bavê wê ku mir, ew hevde salî bû. Li wan deran, qîzeke bi nav û deng, bedew bû. Ji maleke dewlemend, zareke malêye tenê. Dê û bavê wê ew delalî hîn kiribûn. Lê dîsa jî diya wê her tişt hînî wê kiribû. Tiştên ku ji destê Esmerê nehatana tunebûn. Gelekî zû hînî tiştan dibû. Destên wê mezin bûn. Ku bi dest karekî dikir, mêran nikaribûn pêre serederiyê bikin. Bi van destên gir, tiştên wilo zirav dikir ku meriv şaş û metel diman. Mînanî hinekên dinê ne bi derdê xwede, bêdeng û bê hereket bû. Gotin û xwastinê xwe bi dê û bavê xwere xeber dida, digot. Rengê pûşiya serê xwe, dêrê xwe, xwe dijibart. Digot ku ev heqê wêye. Lê qîz û bûkên gund ne wisa bûn, ya rastî. Mêran çi bikira,

wan bêdeng qebûl dikirin. Bavê wê ku mir, nîvê gund ji Esmerêre mabû.

Kurê apê wê, ji wê çar salan piçûk bû. Esmer di piçûktiya wîde jê hez dikir, alîkarî dikir. Wekî xwîşkeke mezin. Lawik pir nexweşî kişandibû. Lewra çilmisî û gewrik bû. Carekê jî herd çokên wî werimîn, sor bûn. Di hemêzande dibir û dihanîn. Ber êşan, qîrîniya wî diçû ezmanan. Esmer him ji wî gelekî mezin û him jî nexweşî çiye, nizanibû. Car cara jêre tiştekî gotinê didît, dilê wê pê dişewitî. Te digot ku ev derdên lawik ne bes bûn, paşê li gûzikên lingê wîde birîn derketin. Qet nedihatine xitimandinê. Bi mehan kêm jê dihatin. Ji hestiyên wî têne, digotin. Çend caran birine ser doxtiran, birîn hatine girtinê. Pismamê wêyî çilmisî pak bû lê dîsa jî dest, pî û rûyê wî spîçilokîn bûn. Bi goşt û reng nîn bûn. Bi kesîre nedipeyivî, dûr direviya. Ji Esmerêre 'xwaha Esê' digot, her tim. Ji malê, giştan zêdetir ji xwaha Esê hez dikir. Nava wande çar sal hebûn lê dîsa jî Esêre hurmeteke mezin nîşan dida.

Piştî salekê, apê wê ne mînanî berê bû. Bi tehrekî din wê û diya wê mêze dikir. Apê nedixwast ku ev qîza bedew û nîvê gund, pêre here yekî dinê. Esmer li pêş çavên xwe didît, awqas jîr û xweşik... Nîvê gund, zeviyên herî baş ji hişê wî dernediketin. Her diçû dilê wî diêşiya li ser van. Ji Esmerê baştir bûk bi dest nediket. Him jî nîvê gund ku pêrebe. Wê baştir her ewe.

Berê bi zimanekî şêrîn ji diya wêre gotin.

— Heke ku here yekî nenas, yekî bê şîr û bê tore bike? Heyfa keçikê. Tê wê çaxê, her bêtir ber xwe bikevî, dilşikestî bibî, gotin.

Jin û mêr bi roj û şev diya wêre ev qalan dikirin êdî.

— Ez dewsa bavê wê me. Ew keça mine jî. Ez namûs û heya birayê xwe, wilo bê xwayî nikarim bihêlim. Paşê xelqê ji minre çi bêje?

Xwastin ku diya wê, bi wan bawer bike. Lê diya wê xisyet û edeta wê rind nas dikir. Dê jî, qîz jî ew lawikê tifal wekî kurê xwe, birayê xwe zanibûn û wilo qebûl dikirin. Zavatiya vî feqîrî nedikete hişê wan.

— Tiştek ji destê min nayê. Keçik waye li wiraye. Herin ji wêre bêjin.

— Tu çawa wisa dibêjî? Tu ne diya wêyî? Ez ap û tu diya wê. Ku me qebûl kir, çi heqê wê heye? Ewê çi bêje? Kê dîtiye ku meriv karê awha, ji keçan dipirse?

— Belê, ya rastî jî wisane. Lê hûn zanin ku bavê wê çilo ew mezin kir. Bi çi tehrî da gihîştinê, terbiye û tore kirinê. Heke ku Esmer bi xwe qebûl neke, bi dilê wê nebe, hişê min vî karî hilnade, ya rastî.

Diya wê jî zanibû ku ev tişta, karên merivên bi aqil nîn bû. Wekî tiştekî bi xeyal bû. Jin ap û diya wê ku ji Esmerêre gotin, te digot ku derzî têre kirine. Wilo weciniqî.

— Çima hûn dîn bûne? Ew birayê minî piçûke. We eva kara ji ku derxist? Careka din jî vî karî hilnedin ser zimanê xwe, got û ji wan dûrket.

Nedixwast êdî pismamê xwe bibîne û li rûyê wî binihêre. Kurapê wê jî her tişt ferq dikir. Dema ku dihatine cem hev, ser xwe di ber xwede xar dikir. «Bawer bike ku, vana ez nabêjim. Xwastina wan bi xweye. Ez jî te rind fem dikim xwenga Esmerê» dixwast bêje, bi çavan.

Apê wê dest ji vî karî venedikişand. Caran bi dilxweşî, caran bi çavtirsandî dihanî bîra jinbira xwe. Dixwast ku her tişt bi dilê wî bibe.

Kîngê yek ji wan dest bi van pirsan dikir, Esmerê pirsên wan di devên wande dixitimand û hertim li hember derdiket. Roj û meh ku derbas bûn, li her derê dihate xeberdanê ku Esmerê didine pismamê wê. Esmerê fem dikir ku mînanî tora pîrhevotkê her çar aliyê wê hatine girtinê û her diçe jî teng dibe. Wê çi bikira? Diya wê ya feqîr ne jineke wisaye ku bi serê xwe qerar bide û li hemberî vê xwastinê bisekine. Bi keça xweve ku tenê dima, ew hez û hemêz dikir. Bi çavên xwenên hêsir, wê jî digot ku ew jî bê dile, mînanî keça xwe. Tiştek ji dêst nedihat. Xwe tenê û bêkes didît. Ew Esmera berê ya bi ken û rûgeş çû, dewsa wê yeka bi rûpirçî hat. Te digot ku dixwaze bi hinekanre şer bike. Wekî berê xwarin û xemla xwe nedinihêrî. Dixwast ku hema usa li malbe û têr bigrî. Amojina wê pê dişewitî. Ji mêrê xwere digot ku bira dest ji vî karî berde. Him jî çend cara got.

— Hûn jin çi fem dikin? Ev qîza dînik û bê tore, wê ji kurê min baştir mêr bibîne, tu dibêjî? Ez nahêlim yekî nenas, bîjekî pêxwas bê têkeve biçenga min. We fem kir? Virde, wêde nizanim. Gotina min gerek bê cî, digot û jina xwe por poşman dikir.

Esmer digiriya, destê xwe nedida tiştekî. Her diçû spîçilok û zer dibû. Gundî jî êdî, hêdî hêdî her tişt dibihîst. Paşê her çû, ev xeber çûn ber guhê kesên ji gundên dinê. Esmerê nexwar û ne vexwar. Wisa bû ku dawiyêde kete nav nivînan. Apê wî jî her diçû zêde diqehirî, dikete înadê. Zavayê belengaz, nedixwast ku ber rûyê xelqê keve. Her tişt ji rûyê wîde hatibûne vî halî. Lewra, gelekî şerm dikir. Li nava gundde xwe bi xwe piçûk didît. Wilo zanibû ku hemû kes dijî wîne, bi çavên neyarî li wî dinihêrin. Qet tu kesîre nedipeyiviya êdî. Kesî rûçikê wî nedidît.

Esmerê çend caran xwast ku xwe bikuje. Lê nikaribû, bîne cî. Dest ji jiyanê kişandin wisa ne hêsa bû. Nikaribû her tiştî bide ber çavên xwe. Nedihate wê derê. Dev jê berdida. Mala apê û diya wê jî bi van dînitiyên wê hesiyabûn. Rehetî û qenciya kesî tunebû êdî. Pismamê wê di bin vî barî girande lê bû bifetisiya. Nikaribû li ruyê kesî binihêre. Carekê duda xwast ku ji bavê xwere bêje, naxwaze bi Esmerêre bizewice. Kire bilde bild û bavê xwe serwaxt nekir. Tifalekî çardeh salî, nexweş û hela hê rû derneketî, girya û ji cem bavê xwe dûrket.

Ji wê rojê şûnve, kire hişê xwe ku xwe bikuje. Bavê wî debanca xwe hertim bi xwere digerand. Şevê jî dikire bin balgiya xwe. Gelekî li pey ket, lê belê pêre seredarî nekir. Debanca apê wî, di qutiya amojina wîde bû. Car caran bi tele tel, dizîkave diçû mala apê xwe. Qutiya amojina xwe teselî dikir. Dibe ku derî vekirî hiştine anjî mifte li ser bîr kirine digot di dilê xwe de. Lê dinihêrî ku Esmer ne li mal bûya, diçû li serê istêrî jorîn. Qutî li wir bû. Derê wê dihejand, miftê digeriya. Lê her carê jî bi dilsar vedigeriya malê. Ciyê decancê rind zanibû. Çend cara dîtibû ku amojina wî, debance, sehet û qalûna mêrê xwe di quncikekî qutiyêde baş dihebîne.

Dîsa wilo kete hundir. Vê carê, mifte li ser qutiyê disekinî. Destê xwe dirêj kir, bin qutiyê, ew hesinê sar û meriya dilerizîne bi qilifêve hilda. Kire paşila xwe. Zû zû ji mal derket. Nişkêve diya wî derkete pêşiyê. Bi lezkirina kurê xwe, diya wî lê kete şikê.

— Çiye lawê min? Tu ne bêkêfî îro? Jê pirsî diya wî. Lê lawik li pişt xwe venegeriya, dûr ket.

— Na dayê. Tiştekî min tune. Ez başim.

Rojtira dinê ap, jinap û diya wê li pêş malê bûn. Birîna pişta hespê derman dikirin. Toyê sîrkirî li birînê didan. Esmer çû hundir ku serîk dudu sîrên dinê bîne. Pismamê wê, derê odê girtî, ji sibê virde, carekê tenê hatibû xuyanê. Apê wê, hinek sîr dîsa ku xwast, Esmer ji bo wê revî çû hundir. Ji ber derê odêre derbas dibû ku gurrînîk hat. Wekî ku xanî hurdişiya. Bi qîrînî şûnve zivirî. Derî vekir. Kurapê wê, deveriya welgeriyayî bû. Debance jî metrok ji wî dûr bû. Destên xwe birin ber çavên xwe. Nikaribû lê binihêre.

— Cemal mir. Cemal mir.

Ku wisa qîriya, apê wê û yên dinê jî hatibûne hundir. Li ber derê odê Esmer ji xwe çûbû. Cemal li odê, serî bela belabûyî, li erdê xwîn û mêjiyê wî dîtin. Apê wê, mêjiyê kurê xwe li erdê û li cem jî debance ku dît, li Esmerê zivirî.

— Qehpikê. Te ew kuşt, got û ew da ber pîhnan.

Amojina wê tiştekî baqil kir, qirme hilda, kire biçenga xwe. Apê wê, wê sibê, debanca xwe din bin balîfêde ji bîr kiribû. Ne li cem bû. Li biraziya xweya xweve çûyî dixist. Amojin û diya wê, bi tirs û şaşbûnê lê nebûne xwayî. Dengê xwe nekirin. Apê wê destê xwe bire ser debanca xwe, debance li cî nîn bû. Bû wekî dîna. Wê li Esmerê xista, bikuşta.

Esmera belengaz. Her tişt, ji ser heta bin, xirab çûn. Cendirme hatin. Bi debanca bavê wê hatibû kuştinê Cemal. Debance di qutiyêde dihate veşartinê. Xênji Esmerê jî kes neçûbû hundir. Şik û şipe gişt li ser Esmerê kom dibûn. Xênji jinap û diya wê, hemû kesan bawer dikir ku Esmerê Cemal kuştiye. Amojina wê li Esmerê dinihêrî û digiriya. Dixwast ku hinek tiştan bêje, lê nedibû. Esmer digiriya û li çokên xwe dixist.

– Welle, haya min jê tune. Ez bê guneme, digot û xwe li vî yalî, li wî yalî dixist. Çend cara xweve çû. Niha jî di girtîgeha bajêrde bû.

Apê, diya wê neêşandibû. Her hefte, dayika feqîr dihate dîtina wê. Qet nemabû tifalê. Wisa piçûk bûbû, wekî lepekî. Li ser vî karîre du meh derbas bûn, lê belê tu tîrja hêviyekê qet nedihate xuyanê. Apê wê, ji berê pirtir, niha jêre dijminatî dikir. Bi vî emrê xwenî ciwan wê di girtîgehande biriziya. Ev ku dihatine bîra wê, hêsir ji çavan dibarî xarê.

– Ji min bawer bikin. Dibe ku hûn jî baweriya xwe bi min naynin. Qet, qet haya min jê tunebû. Heke ku min bizanibûya ku wê wilo bike, minê ew bistande. Bi wîre zewac qebûl bikira. Minê bigota, çi bikim, qedera min wehaye. Tiştekî dinê heye ku hişê min hilnade. Debanca bavê min li cem wî çi digeriya? Kê dabû wî? Qirme, ji ku bi dest xistibû?

Dema ku digot û dihate vê derê, li rûyê yên dora xwe dinihêrî. Difikirî, dibe ku bawer nekin.

Carekê gazî kiribûn, jê pirsiyabûn. Lê peyre tu deng jê dernediket. Merivên herdu malan, dîtina xwe ji sawcîre gotibûn. Tu kesî nikaribû bêje ku Esmerê pismamê xwe kuştiye. Lê apê wê, biraziya xwe gunehkar dikir û heye, tune Esmerê kuştiye digot.

Gardiyan, xaltiya Cewahîr didît ku ew digirî:

– Lê lê, keçika dînik. Çima digirî? Ev rojan gişt wê bibuhurin. Tê bibînî. Xwedê wê derîkî xêrê veke. Keça min negrî. Tu zanî tansiyona min zêdeye. Dilşewat li min nayê. Wisa meke. Rabe, rabe. Here ruyê xwe bişo. Ne heyfa çavên teye? Keça mina delal.

Wextên dinê, tev rûdiniştin, tivdaregê xuregê xwe dikirin. Kîngê canê wan bixwasta, çend pompe lêdixistin û ava çayê didane ser kuçikê niftê.

## – XXXIV –

Li girtîgaha mêran, deh tendûrekî li qowîşeke mezin û heftê din jî yeka dinde bûn. Hemû der tijîne. Girtiya pişta xwe sipartine hev û hema hema di hemêza hevde radizan. Mîro û Soro li ba hevin. Seîd, Tahir û Osman bi çar hevalên dinêve qowîşekêdene.

Ji cara pêşîn mayî gelekên nas hene. Hinek jî hatine berdanê. Ew herdu dizên cara dinê tunebûn niha. Ew xortê tendûrekî, ku bê hemdî xwe xeberdida îxbar kiribûn. Gişta jî derseka mezin jê girtibû. Qet yek ji wan, niha virde wêde xeber nade.

Heftekêde hemû cî bûbûn. Qet kêmasiyên wan tunebûn. Du kesan bi dor xwarin çêdikir. Ji gund feraq û tiştên din anîbûn. Paşê dibûne du çîka. Li cem hev, ser nivîna rûdiniştin, xwarina xwe dixwarin. Birînên wan pak bûbûn, lê hela hê pêçiya Soro diêşiya, jan dida.

Li wan qowîşên piçûk, çend kesê ku Soro ji cara pêşîn nas dikir, hebûn. Hatibûne cem Soro û serxweşî dabûne wî û hevalên wî. Soro gelekî kêfxweş bû ku Bekir dîsa dît. Cara dinê hevaltîke pir delal kiribûn bi hevre. Dewa wî xilas bûbû. Zêde ceza nedabûnê. Alê dinê pir çûbûne ser, wî jî xwe parastibû digot hakim di qerarê xwede. Panzde roja berê, bi ser xwastina wî, ji girtîgeha wîlayetê hatibû vir.

— Birayê Soro, serokê mehkemê pir baş bû. yekî wekî bavê meriya. Yekî ciwan bû lê ji bavê meriya zêdetir bû. Ji halê kesan fem dikir. Feqîranre bavtî dikir. Min jêre got, wî jî bi sebr guhdarî kir. Guhdarî kir. Bêje kurê min got. Bawer kir ku ez derewan nakim. Yên hatine serê me gişt rastin, em bê sûcin. Şahid jî nîn bûn. Çend kes bûn. Yên dîtî tunebûn. Çi bêjin ji tere? Gunehê wî bi halê me hat. Nizanim, tiştne dirêj got. Xwe parastin, kişînî kirin... Poşman bûyî got. Dawiyêde sê sal ceza da min. Ez berêve bi sê salan razîbûm. Hatime girtîgehê. Hinekên kevn hebûn li wir... Ji abûqatan bêtir zanibûn. Min pirsî. Dev jê berde. Bavtîke mezin ji tere kiriye, 'temyîz' neke, gotin. Min jî wisa kir. Ya kutasî, tiştekî wisa dirêj nemaye. Xweha min niha bi kurapê minre zewiciye. Tu hundirdayî, em dawetê nakin, gotin. Min got, lawo tu semeyî an bê aqilî? Tu nabînî ku serê me ji belan xilas nabe. Hela hê derdekî nû nehatiye ser we, herin bizewicin. Wan jî di nav çend

malande dîlan û dawet kirin. Niha gelekî dilxweşin. Qedrê hev zanin. Zû, zû serî didine min. Li min dipirsin. Hemû kêmasiyên min tînine cî.

Niha ji berê bêtir bêdeng bû. Berê baştir însan nas dikir. Li baxçê bi Sorore digeriya. Bi lez lez diçûn, kurt dibiriyan gera xwe. Li girtîgehan wilo digerîn girtî. Jêre, 'volta' dibêjin. Qala girtîgeha wîlayetê, girtiyan û mehkemê dikir. Zûtirê destûra wan diqediya, diketin hundir. Bekir hêdî hêdî bû hevalê hemû tendûrekiyan.

Hefta pêşîn, gundiyan li girtîgehê xerîbî dikişandin. Nikaribûn rehet herine baxçê û avdesê. Eman, eman di nav xelqê xerîbde tiştne şaş, şermoke nekin digotin ji hevre. Loma ditirsiyan. Xerîbiya wan ji her aliyên wan dihate ferq kirinê û xwendinê. Dema ku girtiyên derkevin li baxçe, yê kevn rind zanibûn yê çi bikin. Bi tivdarek bûn. Bi derketinêve, di alîkî baxçe lez bi lez diçûn, dihatin. Volte davêtin. Tendûrekiya tiştek nizanibûn. Vî yalî, wî yalî li dora xwe dinihêrî û digeriyan. Paşê şerm dikirin, diçûne quncikekî baxçe, di nav xwede xeber didan. Qala ciyê xwenî nû dikirin.

Soro û Bekir, qaîdên girtîgehê, gerandinê bi wan jî dane hînkirinê. Bi vî tehrî waxt bêtir derbas dibû û hê rehet digeriyan.

Yên ku cezayên wan zêdene û yên kevn, girtîgehêde bi qedir û qîmetin. Ji wanre hurmet tê kirinê. tendûrekiyan jî ev ferq kirin. Simêlên wanê badayî, destên wan li ser qûnê, di destande tizbiyên mezin hebûn. Giştа jî ew nas dikirin. Di gerêde rê didane wan, destê xwe dibirine ser singê xwe û silav didanê.

Sergardiyan halê wan dipirsiya. Nedixwast ku ber xwe bikevin. Li bajêr, derheqê wande, çi dihate gotinê, car caran di peyivên xwede ji wanre digot.

Di dawiya heftêde, rojekê, abûqatê wan û Xalê Mihê hatine girtîgehê. Li oda nivîsdarde, Soro û çend kes çûne cem. Xalê Mihê pir dil xemgîn bû. Ji bo cîranên xwe nedisitirî. Cîran li gund kom bûne, Mihê şandine ba abûqat. Hinek perê wan, ji cara pêşîn, pare mabû. Gundiyên wan hundirde û ew di malên xwede, qet xwedê qebûl dike? Çûbûn bi abûqatre xeber dabûn. Du hezar paqnot dabûnê. Di piştî berdana wan, wê du hezarê din jî bidanê. Abûqat hela hê wext nebuhurî, wê îro li hemberî girtina wan bisekiniya, îstida binivîsiya. Abûqat Fihat beg li avdestxanê bû. Xalê Mihê, di nav çend deqîqande evana ji Soro wanre got. Fihat beg hat, bi sereser li ruyê wan nihêrî. Bi eeele:

– Berêve wekeleta we li cem min hebû. Ezê îro, ji bo berdana we îstîdayê bidim. Texmîn dikim ku wê bê qebûlkirinê. Hûnê bênê ber-

danê. Canê we saxbe. We giştan gotiye ku me tevayî kir. Tiştekî rinde. Lê bi alîkîde jî têde qebûlkirin heye, ev ne rinde. Lewra, dibe ku hinekî bi zehmetbe. Hela ka, bi destûra xwedê, ezê we bidime berdanê.

Ku ji derî derketin, Xalê Mihê zûtirê xatirê xwe ji gundiyên xwe xwast û li pey abûqat ket.

Soro, Mîro û Bekir wê êvarê li ser ciyê Seît rûniştibûn, dipeyivîn.

– Lo lo hevalno. Ya rastî Xalê Mihê merîkî başe. Lê belê hinekî semeye. Çend paqnot perên gundiya hebûn. Gişt, zêrên serê jin, bûk û keçan bûn. Hemû bir kire gewriya vî abûqatî bênamûs. Cara pêşîn em birin li wî walandin. Pênc hezarê me dayê. Qet ji mere nebû tiştekî jî. Xêra wî negihîşte me. Nilıa jî yê mayî, bir çû dayê. Abûqat têr nebûye. Evê jî badilhewa here. Paşê gundiyên herin pêsîra Xalê Mihê bigrin. Lo kalê xurifî. Were ji me jî bipirse. Paşê here cem abûqatê ne bimbarek. Ji jinên xwere kiras, derpiya nestînin, peran bibin bixine bêrîka Fihat begê. Bekir jî serê xwe pêre bakir.

– Ez li wîlayetê, di girtîgehêde bûm. Fihat begê dewên gelek girtiyan dinihêrî. Digotin ku pera pir distîne. Hinekan pesnê wî didan. Lê belê hinekan jî dê û jina wîre didane xebera. Hemû karên wan li ser nezaniya meye. Emê hinekan bikujin. Em hevdu dixwin û qira hev tînin. Ew jî têrê nake. Destê mede, bêrîka mede çi heye, emê bibin bidine kesên weha.

Mîro hê bêtir diqehiriya:

– Te çima ji minre negot? Me berî herduyan jî bida. Li pişt xwe nenihêrî, bira biçûna. Derd û kulên me ne besî mene? Serde jî Fihat beg bû barê hustiyê me. Lo Mihêyî qûn bi gû. Em ji birçîna dimirin, tu du hezara didî Fihatê segbav. Xwedê ji herduyanre jî nehêle, seybisanno.

Di hişê xwede hejmartin, dikire çil û pênc zêrên Reşad. Tu tiştek jî ji destên wan nedihat. Ji girtîgehê dengê wan nediçû gund. Soro diqehirî, bîhna wî teng dibû.

Çend kes ji wan, çend li ser îstîda abûqat hêvîdar bûn. Îro anjî sibê wê bihatana berdanê êdî. Xwe jî nizanibû çimaye, lê Soro, di dilê xwede qet tîrjeka hêviyê nedidît. Vê dîtina xwe ji Mîro û Bekir tenêre got.Li ser îstida abûqat, çend roj derbas bûn. Rojekê hine kaxiz anîn, ji wanre xwendin. Xwastina abûqat nedihate qebûlkirinê. Ev deriya jî hate girtinê. Çend kes ji wan, ber xwe ketin, reşe reş dibênijiyan. Soro ku ev ferq dikir, diçû cem wan. Dipeyiviyan. Ew didane bawerkirinê ku gelekî di hundirde namînin. Wê derkevin. Vê diltengiyê jî zêde nekişand. Hate ji bîrkirinê. Girtîgeh dîsa bû wekî mala wan. Kesî êdî

qala berdanê nedikir. Niha panzde roj bû ku Tendûrekiya girtîbûn. Di nava çar dîwarande bûn. Wekî xelqê malekê tev dixwin û vedixwin. Hela serde jî tev difikirin.

## – XXXV –

Rojên dîtina girtiyan dûşem û pêncşem bûn. Lê belê rojên dinê jî qet kes vala nediziviri. Giştan merivên xwe didîtin. Ji berêde weha bû, niha jî wisa diçû. Derîkî mezin, hesinên qalind hebûn nava girtiyê hundir û dîtiyên wande. Girtî û yên ku hatine dîtina wan, nêzî derî û hesinên qalind dibin û xeber didin. Heke ku wê rojê gelek kes hatibin ji bo dîtinê, deng tevî hev dibin. Gotinên kesî nedihate femkirinê. Lewra, her zêde diqîriyan. Yê nêzî wî, bo ku dengê wî here dîtiyê wî, vê carê her bêtir diqîriya. Dest û milên xwe dihejand.

Gundî caran bi hesp û keranve dihatin. Jin, mêr, zar, ji her salan meriv hebûn di navde. Di destê wande satilên mast, heqîwên pişta wande nan, penêr, nîsk, bulxur hebûn. Fêkî, hêşinayî jî dihanîn bi xwere. Jin û zar bi stuxarî li yê hundur mêzê dikirin. Pêrîşaniya wan ji kincên ser û ser piyên wan dihate xuyanê. Ji sibê zû, hela ro der neketî dihatin, li ber derê girtîgehê li benda seheta dîtinê diman.

Îro roja dîtinêye. Dîsa qelebalix heye. Ji Tendûrekê jî pir kes hatine dîtina girtiyên xwe. Xwarin bi xwere anîne. Gorên hirî pêrene. Ji hundir yek dudu nêzî derî û hesina dibe, çend pirsa dike û hela gotinên wî neqedyayî yên dinê dihatin. Yê hatî, silavên gundiyên xwe digotin. Malên wan bi rehet rê diçûn. Her tişt wekî berê. Çilo hîştine dîsa wisa. Kurê axê, hela hê ji nexweşxanê derneketiye. Li pey bavê wî, diya wî jî hatiye gund. Niha jina Marûf li cem wiye. Yên ku ew dîtine, dibêjin ku zimanê wî her diçe giran dibe. Alîkî devê wî, piçekî xwar bûye. Doxtiran gotiye ku wê pak bibe, lê belê her diçe bi zehmet dipeyive.

Zevî, çayîr û karê gund bi rê diçû. Xalê Mihê pir dil xemgîne ku ew nehatine berdanê. Gelekî poşmane ku perên mayî jî daye abûqat. Gundiyan jêre pirsên giran gotine, him jî li rûyê wî. Dema ku Fatê bihîst, wekî dîna, aqil ji serî çû.

– Çawa dibe, gotin û gura evî xurifî dikin? Çima li gund, qet yekî aqil li sêrî nemaye? Piştî awqas ceribandinê, dîsa jî li pey wî herin. Ax, ax bira ez li gund bûma. Minê, ew du muyên ruyê wiyî kose jî birûçi-

kandina. Bira roja xwe bidîta. Xwarziyê Soro jî hatibû. Kurê Fatê bir çû cem diya wî. Paşê zivirî ba xalê xwe.

Caran, gardiyanan ku dil bikiran, zarên piçûk hildidane hundir. Çend zar hebûn vê gavê li girtîgehê. Girtiyan şekir, pere û tişt didine wana û hez dikin.

Bekir demekê gazî Soro kir:

– Were, Hela were birangê Soro.

Pismamê wî hatibû dîtinê. Dûrve hevdu dane naskirinê. Kêf, xweşî dane hevdu. Li alê mêran dîtin bi vî tehrî, bi pêrîşanî dibû. Li alê jinan, Fatê herdu kurên xwe yek li ser çokên xwe, yê din li cem xwe dabû rûniştandinê. Ew maç dikir, hez dikir. Kurê wêyî piçûk bi dil, şehyê xwe da birayê xwenî mezin. Ewî jî porê xwe şil û şeh dikir. Lê porê wî wekî kulavan bûbû bi neşûştinê. Lewra şeh lê nedixewitî. Kurê wê bi kêf bû. Li dervayî têlên dora girtîgehê, bi tirs, nêzîk nebû, berê. Ji dûrve li diya xwe nihêrî. Paşê eskerê nobedar ew hilda hundir. Reviya, diya xwe hemêz kir. Serê xwe kire paşila wê. Herdu jî bi bîstekî kurt giriyan û paşê çûne hundir. Bi xaltiya Zelêxave dima. Karê malê û gund, bi wekî hişê xwe ji diya xwere qal kir. Bi Elîre hatibû, Eliyê paşê bê û wî ji vir hilde.

Diya wî zûtirê av germ kir û kurê xwe şûşt. Navroj tev xwarin. Diya Esmerê tirî û to hanîbû ji bo qîza xwe. Dane wî jî. Diya wê ya feqîr, ji keça xwe bêtir heliyabû. Tu nemabû. Kafirê apê wê, hela dîsa dida xeberan û diqîriya. Jinapa wê jêre dizîka pere, lêçek û destmal şandibû. Jinmama wê li ser diya wêde çend cara giriyabû:

– Ez zanim, tu guneh û sûcê Esmerê tune. Rastî wehaye, lê belê kê ev mêrê minî anût dikare serwaxt bike.

Gundiyên wan wê zû vegeriyan, lewra diya Esmerê seheteke tenê ma. Nikaribû ji diya xwe biqete. Gelekî dilxweş bû ku jinmama wê, weha difikirî û dilşewitiye. Jinapa wê hate bîrê. Ew rojên berê. Ewê jî, jinapa xwe hez dikir. Ji alê jina, kesek nehatibû dîtina Gulîzerê. Du, sê deqîqa carekê derdikeve ber derî, li dûr dinihêre. Bi dil şikestî, kelogirî, çavên wê hema usa di rêde bûn. Paşê hêviya xwe birrî, bi zarên Fatêre dest bi hinekan kir.

Bi êvarên rojên dîtinê û rojên pey, wan qowîşên mezinde qumar dileystin girtiyan di nav xwede. Ne qumarên giran bûn awqas. Lê wan qowîşên piçûkde qumarên mezin dihate danînê. Zar davêtin. Vê êvarê Bekir, Soro, Mîro bi çend hevalanve, dîsa li ser ciya rûniştibûn, xeber didan. Li alê dinê dame dileystin. Rêzên damê li ser qartonekî qalind çêkiribûn. Bi kevirên reş û spî dileystin. Qederekê şûnve ji wî alî:

– Kevirê te nediçû wir. Te cixizî kir.

– Bavê te cixizî dike lawo. Ezê yekê li devê texim ha.

Berê ji hevre bê tore xeberdan, paşê dê û bavê hevre dane xebera û çêra. Çend kes ji ser nivînan banzdane jêrê. Ketine nava wan. Du zilam, ji gundekî bûn, Yekî dinê qusandibûn di quncikekîde. Ji xwedê, ji der doran gihîştinê, nehiştin şer zêde bibe.

Ji qelebalixa hundirre:

– Çiye, çi dibe li wir? Dîsa kê dikire mirte mirt? digot ew gardiyanê terikiyî bêteşe.

Te digot ku qet tiştek nebûye. Hemûyan dengê xwe birrî. Zanibûn ku ev gardiyana bê merhemete. Dibir û dikuta, gardiyan. Destê wî jî wisa giran bû. Bi du kulman de, sîllande meriv weldigeriya. Kê şer bikira dawiyêde poşman dibû. Heke ku wisa nekira, girtîgeh rê nedibir. Gura kesî nedikirin paşê.

– Tiştek tune, begê min. Heval henekan dikin.

– Bira henekên keran nînbin. Çi zanim.

Piştî çûyina gardiyan, te digot ku wan şer nekiriye, dîsa rûniştin, ji bo lîstinê. Yên dorê, bêdeng li wan mêze dikirin. Dizanibûn ku ji sebebekê pir piçûk, şerê wan wê dîsa dest pê bikira.

Li aliyê Soro wan, peyivandin, sohbeteke şêrîn hebû. Xortekî di halê xwede, kîbar, Xalis nêzî wan bû. Berê, li çiyan, demekê geriyabû, paşê xwe bi xwe dabû dest. Xalis kêm xeber dida. Zêde guhdarî dikir. Hemûyan zanibû ev edetên wî. Cara, kesî qet ew ferq nedikir. Bi vî halî, ewî hemû kesan guhdarî dikir. Ew nas dikirin. Çavên xwe ji tendûrekiyan neqetandibû. Ferq kir ku hemû jî merivên başin. Bi hevre rind rê diçin. Soro û Mîrore hurmet dikin. Berêve baş hîn bûbû ku meriv gerek bi tivdarekbe, pir xeber nede û zûtirê bi kesîre nebe dost. Xalis ji van gotinan her tim xêr dîtibû. Lewra bi tendûrekiyanre zûtirê hevaltî daneynî. Piştî demekê, ew baş nas kiribûn êdî. Cezayê wî kêm bû. Dijminan dest jê vekişandine û lewra hêsa xelas bûbû, digot girtiyên dinê, ji bo wî.

Çay vedixwarin, qala gund dikirin. Paşê Xalis qala Îbo kir. Gişt şaş û metel man. Virde, wêde pir tişt bihîstibûn derheqê wîde. Soro û Mîro li ruyê hev nihêrîn, dema ku navê Îbo derbas bû. Çawa hatibûne cem hev, hevdu dîtibûn... Rojên wanê tengasî, giran û birçî, li serê çiyan. Cendirman çilo dora wan girtibûn. Vana hemûyan, wekî bûyerên her rojî qal dikir Xalis. Qerardayina dawiyêde... Li Tendûrekê, wê çilo Ûsiv axa bikuştana? Çi tehrî ji hevalên xwe qetyabû. Qala apê Sîno, Îbo kir. Çawa, wekî biran ew dabûne rê. Pere dabûnê. Nû, ji serîde di-

jiya ew demana. Çavên wî li dûr dinihêrîn. Paşê bihîstibû ku ew berve rojhilat, ew çiyayên rê nedayî çûne. Li wan dera û baş bûne.

Dema ku ew guhdarî kirin, ew Qeyseriyê xwayê traktorê, mirina wî, pêçiyên Ûsiv axayê birîndar û rojên bi zehmet hatine bîra wan. Çi tehrî miriyê Qeyserî ji gorê derxistibûn û biribûn?

Xalis bi dil û dost bû hevalê wan. Ji wê şevê şûnve, mîna Bekir, ew jî hevalê Soro wan bû. Him jî gelek nêzî wan.

Li girtîgeha meriv hertim dikare ji bo xeberdanê gelek tiştan bibîne. Hinek ji nêçîrvanî û mala xwe, hinek ji mêrxasî û çilo tele haniye serê dijminê xwe dipeyiviya. Ji cin û periyan. Ji wê dinê. Hinek tiştên ku qet nayên bîr û aqilê kesî. Ji zorbetiya axan, dikarin bi rojan qal bikin. Di alîkî dinde, methên axan bikin, wan hildine ser serê xwe.

Li pey hatina tendûrekiyan, li girtîgehê, her bêtir qala axan dihate kirinê. Gelek gundiyên ku ji axan kişandine, tevî xeberdanan dibûn. Li ku yekî tendûrekî rûniştibû, pirs diçû û diziviriya, dihate ser kirinên axan û began. Zorbetiya wan ya îro.

— Hûn Îbrahîm axayê Millî, ewê bi nav û deng, zanin. Îbrahîm paşayê Millî. Zilm û teda wî gihîştibû erd û ezmanan. Zilma Siltan Evdilhemîd li cem ya wî ne tu tişte. Ew eiyên ku ewî talan dikirin, ji çîvikanre jî tiştek nedihîşt. Kîngê bixwasta, ne tenê merîk, gundek bi tevayî ji rûyê dinê radikir. Kîngê dil bikira, gundên hinekan ji destên wan digirt û dida kesên dinê. Osmaniya jî pêre serederî nedikirin. Zilm û zilm... Lê xwedê ji wîre jî nehişt.

— Kalkiyê min qal dikir. Digot ku ji gundê me wê de, axayek hebûye. Rojekê, bûkeke bedew diçe avê. Dixwaze ku dest bavêje feqîrê. Ji merivê ku li cem dixebitere dibêje û gazî bûkê dike. Belengazê mêrik dizivire û çi dibîne? Bûk, bûka wî bi xwe ye. «Eman axa, ez tême lingên te. Eva bûka mine...» gotiye, lê dîsa jî axê qerarê xwe neguhartiye. Çûye ba bûka xulamê xwe. Dîn û îman bi van kafiranre tune.

— Wextekê berê, lê nizanim kîngê, axayek, hêrsa wî tê, diqehire. Serê gundîkî bi saxî, darekîve dide mix kirinê. Carekê jî yekî rût tezî û paşê dimis bi serde dike û bi darekêve girê dide. Germa havînê ya ku diqijirîne. Mêrik du rojade dimire.

Ev çîrok hertim dihatine gotinê. Tiştên wilo ku hinekan heta niha qet nebihîstibûn. Zorbetî û van gotinan gundî nêzî hev dikirin. Xeberdanê niha ji yên berê zêdetir bi qîmet bûn.

Soro, piştî nîvro, li qowîşa dinê, li cem hevalê xwe bû. Pirs zivirî û hate ser kirinên wan yên gund. Seîd dîtinên xwe wilo digot:

— Berê, li gund, bi tevayî karek kirin zehmet bû. Ya rastî kesî jî hêvî nedikir. Lewra nîvê gund, qetyan û çûn. Te digot ku ji yekbûnê ditirsiyan. Baweriya wan xwe bi xwe tunebû. Qet nebihîstibûn ku bi axanre serederî tê kirinê. Yên mayî, hinekên wan gelekî diqehiriyan ji axa. Çend mal ji bo xatirê cîrantiyê, an jî tiştekî dinê ku bikin tunebûn, lewra li gund man û bi tevayî li hember axê sekinîn. Lê belê niha hemû fem dikin ku yekbûn, bi tevayî rê çûyin serê her tiştiye. Wilo nebe, bi axanre serederî nabe. Tendûrekiyan jî wisa kiribûn. Çilo bi tevayî rikêfî Marûf kiribûn? Tu tiştekî nikaribû wan bide sekinandinê. Niha, ji berê bêtir, bi xwe bawer dikirin. Axa bi wan nikaribû êdî. Paşê, hemûyan gotinên xwe kiribûne yek. Li qereqolê, li ba sawcî giştа ınînanî hev xeber dabûn. Ev tiştekî pir giranbihabû.

Cixarên xwe nû dikirin. Giştan gotinên Seîd di cîde didîtin. Diranên Tahir şikestibûn û bi alîkî diranan xwarin dixwar. Wî: — Heke ku yekî em hîn bikira, tu ev dihatine serê me. Pêşiyên me jî wisa. Em ji nezaniya xwe dikşînin, got.

Soro dît ku Tahir pirsa xwe birrî:

— Raste. Ji nezaniya me. Lê belê tiştekî din jî heye. Heke ku ev traktor û hesin nehatana, hela hê ev xewa me wê gelekî bikişanda. Van hesinan gund tevîhev kirine. Van hesinan em li hemberî axê derxistine. Ew ku derketin, axa êdî ne hewcî me bû. Axê ku rê da me, em bi tevayî li hember derketin. Li hemû deran jî wilo ye. Hinek mîna me li pêş, şer dikin. Li hinek ciyan gundî, gundan vala dikin û diçin. Ya kin û kuta, li her deran tiştin dibin niha. Lê yê herî giranbiha, yekbûn û bi tevayî li pêş sekinandina meye. Eva ne tiştekî wilo hêsaye. Yê herî zehmet eve, got.

Yekî jê pirsî:

— Ana, vir ha wê çilo bibe?

Soro hêdî hêdî û yek, yek bersiva wî dayê.

— Qet. Çiyê bibe? Ûsiv axa nikare niha gundiyên mayî bavêje der. Serde jî kurê wî birîndare. Hela hê li nexweşxanêdeye. Derdê wî ji yê me ne kêmtire. Niha xetereke mezin tune. Sawcî wê vî yalî û wî yalî binhêre. Nikare kesî têke gunehkarê vî karî. Emê demekê li vê derê bimînin. Eve hemû tişt.

Cîranê wî yê dinê:

— Tu ji halê Mihêre çi dibêjî? Awqas pere bi gewriya abûqatde da daqulandinê. Qet kêrî karekî jî nehat abûqat. Vê birçîbûn û belengaziya mede, em perên xwe didine yên weha, got û xwast ku hê jî bêje. Lê Soro kete nava pirsên wî.

— Emê vêya paşê bifikirin. Hela bisekine. Hela ka cîranên me yên li gund çi dibêjin? Em vê paşê xeber bidin. Emê bipirsin, çima û çilo bû? Gerek em wisa bê dawî nehêlin.

Paşê keniya:

— Kurê Fatê got. Diya wî gotiye ku yên ewî devgenî û kose bawer dikin, gelo qet piçikek aqil pêre heye. Gundek bi tevayî qir bû, her tişt di destê wîde ma? Heke ku ez li gund bûma, minê ew rûyê wî yê kose biçirikanda. Hela bira vê heftê bênê, ka çi xeberan tînin.

Tendûrekiya, Bekir, Xalis bi gundiyanre car caran ev karan dipeyivîn. Hildidan û dadanîn lê rêyeke bi aqil nikaribûn bidîtina. Ji sêrîde difikiriyan. Hinekên ku salên wan ji tendûrekiyan zêdetir, car caran ew şîret dikirin. Qala berê dikirin. Çilo bi axanre gundiyan şer û gilî kirine.

Herşev an dama an jî gustîl veşartin dileystin girtiyan. Leystikên berê û hêsan bûn. Heke ku leystikê wan li ser peraba, zêde kes komî dora wan dibûn. Hinek caran yên ku dengên wan xweşin, kilam digotin.Şevan gerek sehet nehande elektrîk bihatana damirandinê û girtî razana, lê belê wilo nedibû. Dirêj dibû, diçû heta sehet yanzda. Hinek li ser ciyên xwe dirêj dibûn. Li jorê dinihêrîn. Hinek kom dibûn, dengbêj guhdarî dikirin. Mihemed bi sûcê rêbirrînê, şêlandinê ketibû girtîgehê. Dengê wî mînanî zengilan bû. Dilê meriyan diheland. Caran bo guhdarî kirina wî, girtiyên qowîşên dinê, gardiyan û eskerê nobedar jî dihatin. Dema ku gardiyan dihat, hemû radibûne pê. Dixwastin ku bê li ser ciyê wan rûnê. Gardiyan ku bi yekîre xeber bida, anjî biçûya li ser ciyê wî rûnişta, eva tiştekî pir mezin bû ji bo wî girtî. Lê belê, gardiyan jî her tim diçûne ba yên ku bi îtbar û bi qîmetin. Cixarên baş, çay û caran şêrinayî jêre dianîn.

Mihemed îşev dest bi kilama 'Saliho û Nûrê' kir. Gelekên guhdaran dilxemgîn dibûn. Di nav kilamêde ku qala jiyana girtîgehê, jina wî, derd û kulê wan dibû, gelekên girtiyan jiyan û mala xwe dianîne bîra xwe. Salih û Nûrê, pismam û dotmamin. Bi dilxwestî bi hevre dizewicin. Jiyana wan xweşe û bi dilê wane. Li wan deran, bedewbûnê, li ser Nûrêre kes tune. Salih xortekî mêrxase. Rojekê ji rojan Salih lêdixe dijminê xwe dikuje. Wî digirin, davêjin girtîgeha, kela Diyarbekirê. Cezakî giran didinê. Di jiyana emrê xwe wê girtîbe. Lê Nûrê, xwe davêje her derê. Rojekê sibê zû tê ber derê girtîgehê, ji bo dîtina mêrê xwe. Salih gelekî dilteng dibe, ditirse. Ji tirsa diricife, dilerize. Yên ku bi jiyana emrê xwe cezyê girtîbûnê distînin, gelek caran jinên wan tên û dixwazin ku mêrê wan, wan berde. Nikaha wan bê hildanê. Saliho

ev bihîstibû, zanibû. Hêviya derketinê ku tunebe, hinek jin taqet nakin êdî bêhêvî, li malê rûnin. Jiyan jî zehmete, lewra vê rê diceribînin. Salih hew zanibû ku Nûrê jî bi vê xwastinê hatiye. Nûrê ji Saliho dipirse, çima wilo bêreng û spîçilokiye? Nexweşbûn û nebûna wî dipirse. Salih sebebê tirsa xwe jêre dibêje: «Dilê mêrê te, wekî gola Wanêye. Dilekî firehe. Têde tirs tune. Lê ez ditirsiyam ku tu hatî, ji bo dewa jinberdanê.» Li ser vê Nûrê bersiva wî dide. Mirin tenê dikare wê ji Saliho biqetîne. Ji bo xilasbûna wî wê here merkeza cumhûriyetê, Enqerê. Wê lava bike û wî bide xilaskirinê... Di kilamêde wilo tê nîşandanê ku diçe xwe davêje ber bextê serokê mehkema giran û herî mezin, li Enqerê. Mêrê xwe ji girtîgeh û kela Diyarbekirê dide berdanê. Li der doran pirs bela dibin. Nûrê bi serokê mehkema giran û ya Enqerêve tiştên neçê, nepak kirine û ev karê pir giran hatiye cî, Saliho xilas bûye. Jin û mêr, kevir û kuçik, li her derê wisa tê gotinê. Salih dilxemgîn, dilbirîndar dibe. Li ser van gotinan, Nûra feqîr dide ber kêran, qul qulî, pirtî pirtî dike, dikuje. Vê carê Saliho tê darde kirinê.

Kilam ku xilas bû, kesî nizanibû ku guhdar çi difikiriyan. Nûrê yên, hemûyan dihatine pêş çavên wan. Paşê Mihemed çend kilamên dinê, ji hevdu xweştir got. Hinek li ser zordestiya axakî, hinek mêrxasî û dest vekirîbûna axakî bûn. Kîjan rast bû, nedihate zanînê. Kilamên weha gelek gelek bûn.

Dengbêjên axan hebûne berê. Ewana, kilaman davêjine ser axayên xwe. Pesnan didinê û wan derdixine ezmanan. Ev kilaman hetanî niha jî tênê gotinê. Hine kilam jî li ser bûyînên mezinin. Meriv di wan kilamande, wan kesên wê çaxê baş nas dike. Çi kes bûne, çi tehrî fikirîne, çilo mêr bûne? Wisa dihatc xuyanê ku li van deran, gelek tişt nehatine nivîsandinê û lewra ketine nav kilamên xelqê. Li girtîgehêde heke ku kilam nebin, tu cara wext û roj derbas nabin. Lê yê ku dibêje, gerek baş bizanibe û halê meriyan fem bike. Gerek tiştên reş, tarî û dilxemgîn nebêje. Kilamên bîhna meriyan vekin, hêvîbûnê bidine meriyan, bêje. Wê çaxê tu bibîne girtî çilo kêfxweş û bi bîr û bawerin. Çawa dest bi hezkirina jiyanê dikin. Berdanê tînine bîra xwe, qala bibaxişandinê û bîra rojên derve dikin. Zû bi zû şevên wisa dibin di qowîşande.

Li qowîşa sisya, mezinde du girtî hene. Ji gundên deştêne. Yek ji wan, kine û rûyê wî wekî kartolaye. Rû û hustiyê wî ji pirçê nayê dîtinê. Rûyê wî mînanî geliyane. Çavên wî tenê tenê xuyanê. Wekî têjikên hirçan. Pozê wî mezin mînanî şûrekî, di jorde daliqandiye. Xwe jî qelewe. Dema ku qise dike, tu dibêjî zimanê wî li ciyekî asê dibe. Heva-

lê wî piçekî zerînî, dirêj û zirave. Ji nihêrandina wî, meriv fem dike ku ji ewî qelew şeytantire. Gelek rûvî di hişê wîde radizên. Lê belê, kêm xeber dide. Loma meriv tê dernaxe. Li gund yekî dewlemend bi peran, ewana kişkişî yekî dinê kiribû. Deweka wan li ser erd, zevî û mêrgan hebûye. Herduka mêrik dabûne nava xwe. Wisa tê xuyanê ku heft ruhê wî hebûne. Bi kêran nehatiye kuştinê. Car caran bi hevdure şer dikin. «Sûcê te bû. Na, tu nebûya min xwe bi vî karî nediwaland.» Lê piştî nîv sehetekî tiştekî wan nedima.

Li baxçê, roj dibiriqî. Hewa xweş bû. Li ber dîwaran hinekan cixarên xwe dipêçandin û dipeyiviyan. Hinek diçûn û dihatin. Pêgermok dikirin. Soro, Bekir, û hevalên wanî nû Xalis, bi hevre bûn. Xalis qala rojên wanê li çiyan dikir. Ji apê Sîno, Îbo xeber dida. Mîro, Seîd û Tahirê ku diranên wî ji kulmên qumandar hatibûn şikestinê, di alîkî dinêde dimeşiyan. Tahir kete nav pirsên derheqê axa û gundiyan.

— Yên ku alî axan dikin, hemû bê dîn û bê îmanin. Gelo tu şeref û namûs bi wanre heye? Çend kesên bê şîr ji me jî derketin. Xirabî û bê şerefiya wan, ji wanre ma.

Ew gundiyê mînanî hirçan û hevalê wî ji cem wanre derbas dibûn. Guh dane van gotinan. Her dizanibûn ku van pirsan ji bo wan dibêjin. Herdu heval dimeşiyan û di vegerandinê, hela hê yên dinê qise dikirin.

Mîro:

— Hertim, yên ku ji axanre kûçiktiyê bikin hene. Ji sedan yekbe jî, dîsa tê dîtinê.

Ewê rû bi pirç tamîş nebû.

— Lawo, kûçikê kurê kûçika. Tu, van ji kêre dibêjî? Tu ji kêre dibêjî kûçik? Erê?

Qet haya Mîro ji wan tunebû. Nişkêve li cem wan, li ser piyan bûn. Mîro wisa bi dil qise dikir ku qet ew ferq nedikir.

— Nede xeberan. Bê terbiya. Çi dayin û sitandina min bi tere heye? Kî bi tere qise dike?

Yê dinê hela hê dikire mirte mirt. Dixwast ku rikêfî Mîro bike. Hevalê wiyî zirav û dirêj, 'gelo berê li kîjanî xim' difikiriya, di dilê xwede. Soro gihîşte wir. Tendûrekiyên dinê jî li pey hev hatin. Li ser vê, herd gundiyan xwe nizm kirin, xwe dakişandin. Soro bi zimanekî nerm ew dûrxistin.

Hetanî êvarê bi wan herdu gundiyanre ma Soro. Zordestî û zilma axan, çi hanîbûn serê Tendûrekiyan, qal kir. Qisa Mîro li ser wan axan bû. Tu karê Mîro, bi van herdu gundiyanre nîn bû.

— Binihêrin, hûn jî xapandin. Qet tu xirabiya wî mêrikî bi were tunebû. We çû, pêşiya wî girt. Da ber kêran. We lê bû ku mêrik bikujin. Paşê çi bû? Axa dîsa li dervaye. Bi kêfa xwedeye. Hûn jî di hundirde, ji ber axê radizên. Tênê rizandinê. Qet hat û hûn pirsîn? Karê we hetanî vir bû. Ew, ser di berde, bêdeng û kerr bûn.

— Lê birano. Gerek meriv bi wan baweriyê neke. Her car yê mînanî te, yê mînanî min zirarê dibînin.

Ew bi çend gotinên kurt tevî xeberdanê dibûn. Pirî kerr bûn. Wexta wan hat, çûne hundir. Li wê derê jî çendekî xeberdan.

Soro paşê van peyivên xwe ji Bekir û Xalisre got. Herduyan jî heq dane wî. Serde Bekir wisa qal kir:

— Li alê me, li gundê me, yên weha gelekin. Xulamtî, bendetî di hestiyên wandeye. Ji merivtiyê derketine. Wekî kûçikanin. Tu çiqasî lêxî, zilmê pê bikî, qasekî şûnde dîsa tê û poçika xwe li dora te dihejîne. Meriv nikare wan bîne rê.

Xalis qal kir ku yên weha li her derê hene. Dema ku li çiyê bûn, direviyan, çend kes bi çavên xwe dîtibûn. Ji axan ditirsiyan û ji wanre koletî dikirin.

Soro heta dawiyê guhdarî kir.

— Lê çi dibe bira bibe. Bi yên wehare xeberdan ne bê feydeye. Ji sedan yek jî fem bike û bê guhartinê, ew jî kare. Lewra, yên awha bîzê meriyan tînin, lê dîsa jî gere meriv nepakiya wan bîne bîra wan.

Wan rojên dinê jî, Soro bi van herdûyanre mijûl bû. Vê carê êdî xeber didan. Wekî berê kerr, bêdeng neradiwestiyan.

— Wisa bûye. Xwedê awha çêkiriye. Meriv bê axa nabin. Qet gundê bê axa dibin? digotin.

Caran heq didane qisên Soro, lê dîsa jî li hember bûn.

— Gotinên te hemû rastin. Yên kû zordestiyê, zilmê dikin hene. Lê belê ne hemû. Wexta ku wisaye, axa nebe, kiyê gundiyan biparêze? Kiyê ew memûr û ew cendirmên tênê gund, têke mêvan? Tazî û birçiyên mîna me? Paşê tu nizanî çima, çi tê serê keriyên bê şivan? Xwedê ku pez da, şivan jî pêre da, ne wisane? Kî dikare bi axanre serederiyê bike?

Ewê wekî hirçan, bi pirç her bêtir tiştên bê aqil digotin. — Axê me xirawbe jî, axê meye. Bira ne başbe. Xwedê bira wiya ji serê me kêm neke.

Paşê Soro dîsa bi wanre hevaltî kir. Tê gîhîşt ku xulam û bendê axê zû bi zû nayên guhartinê. Her tim kêm û zêde wê wisa hene. Di wexteke dirêjde, dibe ku hinek pak bibin. Lê gelekên wan ji vê hezeka zir-

mixê xilas nabin. Carekê jiyana bi namûs, serbilindî winda kirine. Ji nûve lê xweyîbûn, ne hêsaye. Li vî alîde pir zehmete. Çend rojên Soro, bi wanre wilo çûn.

Yên ku mehkemên wan nêzîk dibûn, dest pê dikirin dua dixwendin. Caran berêve qerar didan ku wê çend dua bixwînin. Bawer dikirin ku wê bênê berdanê, ji bo xatirê van duan. Lewra dema ku digeriyan, rûdiniştin, li baxçê û hundirde hertim di nav lêvên xwede dixwendin. Bo ku hejmaran bîr nekin, an kevirên piçûk dixistine bêrîka xwe an jî, li dîwaran çixîz dikirin. Ayetên ceribandî dizanibûn. Wilo bawer dikirin ku li ser van ayetan, hakim û sawcî wê alî wan bikin. Devê wan dihate girtinê. Li girtîgehên dinêde, nivîştên wisa hebûne ku, girtî wê dike bêrîka xwe û diçe mehkemê û êvarê tê berdanê.

Mela Siraceddîn jî girtîbû. Digot ku şiltax avêtinê. Ji keç û bûkanre nivîşt çêkiriye. Lewra hatiye girtinê, digotin. Niha, li girtîgehêde nêzîkî van karan nedibû. Nivîştên pir baş ji dêst dihatin, lê ji tirsa, nedikir. Ji çend kesanre gotibû:

– Ez nivîştên gelek bi ceribandî dizanim. Lê belê guneye. Lewra naxwazim binivîsim.

Heke ku sawcî bibîhîsta, êdî xilasbûna wî nedibû.

Ew herdu gundiyên ku Soro dixwest bîne rê, mehkema wan piştî heftekê bû. Ev meheke ku bi dizî peran didine mela Siraceddîn. Jêre tiştan dikirin, şirînayên xweş pê didine xwarinê. Lê dîsa jî nedihate rê. Xwe kelogirî dikirin, dîsa nedibû. Mele di qowîşa Soro wande radiza. Wê şevê, dîsa hatin, lava kirin û giriyan. Xwestin ku Soro têkeve nava wan û alî bike. Dawiyêde mele ji wanre nivîşt çêkir. Lê yê tu cara, ji kesîre tiştek negotana.

Bekir li ser ciyê xwe, bin çavande mêze dikir û dikeniya. Mele pişta xwe li wan kiribû, qelem bi zimanê xwe şil dikir û li ser kaxizeka piçûk tiştin dinvîsî. Bekir li alê Soro zivirî:

– Soro, meriv çi dibêje, tu zanî? Heke ku dermanê mele Siraceddîn hebûya wê berê li serê xwe bida. Wexta ku devê hakim girêdide, ew xwe çima çend mehin girtiye?

Heftekê şûnde herdu gundî, di nav cendirmande, kelepçe di destên wande, dilxemgîn û bi pirçî vedigeriyan. Nehatibûne berdanê. Devê hakim nehatibû girêdanê. Hatin hundir. Li ser ciyên xwe dirêjbûn. Kerr û lal. Hinekan jê pirsîn ku mehkeme çilo derbas bûbû? Bersivên kin û bê dil dan. Mele nehate cem wan. Ber êvarê, li baxçê, di pêş melere derbas bûn û bi xeyd, dilsar li wî mêze kirin. Mele çavên xwe revand.

Niha hemû tendûrekiya kêm û zêde bi girtiyên dinêre hevaltî dikirin, hevdû dipirsiyan. Rind zanibûn niha, sûeê kê çiye û mehkemên wan çito diçe. Çend kes hebûn ku tendûrekiya, xwe ji wan dûr digirtin. Ji bo esrar firotinê hatibûne girtinê. Caran diçûne wê oda piçûk, lê ne gelekî. Hine rêz û edetên girtîgehê rind fem dikirin û lewra ji berê bêtir rehet dijiyan niha. Ew rojên pêşîn ên tewş derbas bûbûn. Rêçûyina Tendûrekiya baş bû. Ji gundekî gelek bi hevre bûn, wekî maleke mezin bi hevre dijiyan, dibe ku lewra baş bûn. Kîjan bê kêf û bîra gund dikir, yên dinê ferq dikirin û dihatine cem.

Dizanibûn ku yên nû tênê girtîgehê, ya rastî nabêjin. Piştî qederekê, ji hinekanre kirinê xwe dizîkave dibêjin. Ew jî ji kesên bi bawerre. Tu ji kê bipirsî, hemû li ser bihtan û şiltaxan hatine vir. Yên berê, vêya rind zanin, lewra kî nû hat:

— Birayê min, tu sax û xweşbî. Xwedê te xilas bike, çi bihtan avêtine te? Digotin û jêre rê vedikirin.

Ewa, sûcê xwe, çi şiltax ku avêtinê, hêdî hêdî dibêje êdî. Hinek ciyên ku ne bi dilê wîbe, ser wan deranre, bêdeng derbas dibe. Ew rojên pêşî, hemû, bi kesîre napeyivin. Wekî qutiyên miftekirîne. Nav van bîst rojan, yên nû hatibûn û çend kes jî hatibûne berdanê. Her tişt wekî berê bû. Dîsa wilo dihate xuyanê ku yên ku meriv kuştine, bê sûc bûn. Sûc her tim li alê yê ku hatiye kuştinê bû. An rikêfî li ser wî kiriye, xilasbûn ku nemaye, lêxistiye kuştiye. An jî bi tehrekî din bûye. Lê çilo dibe bira bibe, heke ku tu ji yê girtî dipirsî, ewana bê guneh û bê sûcin.

Tendûrekiya, ji berê xurttir bûn. Kes ne poşman bû û li ber xwe nediketin. Di girtîgehêde çend kes dîtibûn ku di hundirde wekî gorên rîsî vedireşiyan. Sûc davêtin ser hevalên xwe. Paşê, ew hevalên tev hatî, di hundirde dest bi şer û giliyan dikirin. Bi yêkî wisare êdî ne henek dihate kirinê, ne dihate xeberdanê. Hêviya wan ku kêm dibe, her bêtir perîşan dibin. Li zimanê xwe nabine xwayî. Çi wana hebe, giştan dibêjin. Paşê bi tevayî ji vê zirar dibînin. Dewên wilo her tim neçê diqediyan. Çawa dest pê dikirin û wisa jî diçûn. Yên kevn, yên nû hatî ji bo halê wisa her tim şîret dikirin.

— Gerek meriv zimanê xwe bigre. nevereşe, birano, digotin.

Ji Tendûrekê vê heftê xeberên nû hatin. Xalê Mihê perê gund dabû abûqat Fiat begê, paşê tu xêra wî negîhîşte girtiyan. Gundiyan her roj şerê wî kiribûn. Li kî derê rabûn û rûniştibûn, qala vî karî kiribûn. Mihê êdî tamîş nebûbû. Bê hêvî mabû. Wekî kesên di xewêde digerin. Ji xênji gund terkkirinê, tu rê jêre nemabû. Herdu jinên wiyên pîr, bi-

rayê wî, bi jin û zaranve ji gund derketibûn. Tu kes li ber çûyina wan neketibû. Gelekên wan jî dilşa bûbûn.

– Bê qerarê pintî. Kalê tirsonek. Her tişt tevîhev dikir, gotibûn peyre.

Tendûrekiyên girtî jî wekî gundiyên xwe, ji çûyina wî şabûn. Soro jî wisa. Lê belê, awqas salên dirêj, bi hevre cîrantî kiribûn. Dawiya Mihê, kalê bêqerar, dilê wî şewitand di alîkî de. Tirsonek bû, gele tişt berêve nedidîtin, rêyên nebaş dida pêşiya cîrana. Lê ji gelek aliyande jî, merivekî baş bû. Halê Marûfê kurê Ûsiv axade, tu guhartineke baş tunebû. Devê wî ji berê zêdetir xar bûbû û diçû alîkî. Ji xeberdana wî qet tiştek nayê femkirinê. Yên ku di nexweşxanêde ew dîtine, wilo digotin. Wê çendekî şûnde dermankirina elektrîkê biceribînin. Hela hê li nexweşxanêye. Karê gundî di riya xwede diçe, lê zeviyên wan îsal awqasî ne baş bûn. Zêde bilind bûbûn, lê têde serî tunebûn. Hebên genim ziravok bûn. Toximê çandî şûnve bistînin, ew jî başe digotin. Van xeberên ne baş hê jî nerm dikirin, paşê digotin gundiyên wan. nedixwestin ku girtî pir ber xwe bikevin. Li alê jina dîsa mîna berê bû. Tiştek nehatibû guhartinê. Seyîtxan êdî bîra gund dikir. Kes tunebû ku pêre bileyze. Ji wir dûr nediket. Tu cî nas nedikir. Carekê duda bi xaltiya Cewahîrêre çûbû mala wan. Zarên cîranên wê, Seyîtxan hilnedabûne nava xwe, pêre nelîstibûn. Sekinîbû, dûrve leystikên wan mêze kiribû. Gog û tiştên wanên leystikê, çi xweş bûn? Dilê wî jî dixwest.

Fatê ji her kesî bêtir şabû ku Mihê ji gund çûye. Ne bi nav xelqê, lê di nav hevalên xwede, «Mihê devgenî» digot, jêre. «Çû, em jê xilas bûn.» Pere û zêrên ku dabûne abûqat dihate bîra wê, «ax devgenî» digot û tiştekî din nedihate bîra wê.

Hine şevan Esmer, bi dengekî nizm kilam digotin. Dema ku şaş û xelet digot, Fatê alîkariya wê dikir. Fatê di qîztiya xwede, ev kilam hemû baş zanibûn. Li yalê xal û bavê wê, dengbêjên pir bi nav û deng hebûn. Wilo digot Fatê. Wexta ku xewa wan direviya, çîrokên dilan, bûyinê xwenên berê qal dikirin.

Hevala wan sisya Gulîzar, ne bi wanre bû awqasî. Kêm xeber dida. Wexta ku dixwar, vedixwar, qise dikir te digot, li vê dinê nîne, li dinêke dinê dijî. Gotin baş guhdarî nedikirin. Xwe nedida ser. Dihate kifşê ku di dilê wêde, gele tiştên tevîhev hene. Hela hê gelekî bê qerar bû. Lewra wekî ker û gêjan bû. Gelo, xwe bi xwe gunedar didît? Yên ku hatine serê wê, gelo ji rûyê wê xwede nîn bûn? Gelo ji poşmaniyê wisa bû? Ji merivan bê guman mabû, paşê ji herkesî direviya gelo? Nizanim... Dibe ku ji van hemûyan qederek hebû, di nav dilxwînbûna

Gulîzerêde. Çîroka xwe ji kesîre nedigot. Dema ku jê dihate pirsînê, «ne tiştekî ku bê guhdarî kirinêye, bihtan û şiltaxeke hişk û valaye» digot.

Merê wê gelekî jê mezintir bû. Qedera wê wilo bû. Dê û bavê wê ew dabûne mêr. Zarên wan bû paşê. Mêrê wê êdî pir kal bû. Wisa tê gotinê ku Gulîzer bi yekî dinêreye. Gulîzer û dilketiyê wê, dixwazin ku mêrê wê bikujin. Şevekê mêrê wê li malê, Gulîzer kûçikê ber derî dûr dixe û dostê wê dikeve hundir. Bi mavzerê lêdixe kalê feqîr dikuje û direve. Gulîzer xwe erdê û dîwaran dixe. Digrî û dinale. Porê xwe dirûçikîne. «Ax mêrê min, wax mêrê min. Mêrê minî wekî çiyan» dibêje û virda, wêda diçe û tê. Kî û çito ketiye hundirê malê, kes nizane. Herdu çavên Gulîzerê wekî kaniyan. Dilê gundiyan hemû pê dişewite. Cîranan car caran berê, ji bo herda xeber didan. Gulîzera jinebî, feqîr û belengaza xwedê. Çend meh derbas dibin. Dostê wê nayê xuyanê. Hinek dikevine şikê. Meraq dikin. Gundî vê carê, ji Gulîzerê jî hêdî hêdî dikevine şikê. Giliyan dibêjin. Paşê wê îxbar dikin.

Girtina wê li ser vê şipê bûye. Lê belê digerin, nagerin, dostê wê li tu deran nabînin. Hemû kesan rûyê xwe ji Gulîzerê vegerandine. Ji gundê mêrê wê, ji alê bavê wê kes naxwaze ku wê bibîne. Lewra her diçû diheliya, diçirmisî.

– Zarên min jî, guh didine gundiyan. Nayênê cem min. Li min napirsin. Min ew jî winda kirin, digot û digiriya.

Bi sehetan di quncikekîde wisa dima. Fatê gelek caran pêre dipeyivî. «Ji van şiltaxên vik û vala tiştek dernakeve. Herkesê dawiyêde ya rastî bibîne. Gerek mcriv xwe bi xwe nexwe, nehelîne.» Lê belê hemû gotin guhekî wêre diket û alê dinre derdiket.

Gulîzer sî, sîpênc saliye. Xurt û li ser xweye. Rû û bedena wê bedew û ciwane. Bi awqas berketin û girî, dîsa jî bedewbûna wê dihate xuyanê. Di rojên xwenê dilxweşde, ji Seyîtxanre çîrokê cin, periyan, mêrxasiyê, qîzên padişahên bedew, kurên wanên dijwar qal dikir. Wisa şêrîn û ji dil digot... Te he dizanibû ku ew kesên çîrokan li pêş tene, tu li wan dinihêrî û pêre xeber didî. Gelek caran Seyîtxan dixwast ku çîrokê ji sêrîde careka din guhdarî bike. Lê fedî dikir jêre bêje.

Esmerê Seyîtxan dixemiland, porê wî şeh dikir. Lewra gelek caran li dora Esmerê nediqetiya. Cara, çaxa ku ew dixemiland:

– Seyîtxan, tê min bistînî? Erê? digot.

Seyîtxan şa dibû. Şerm dikir, diçû xwe davête pişt diya xwe, serê xwe dirêj dikir. Dixwast ku Esmer careka din jî wisa bêje. Cendirme û gardiyan hemû ji Seyîtxan hez dikirin. Kîngê dilê wî bixwasta, diçû

alê mêran. «Apê Soro, apê Mîro» digot û gazî wan dikir. Seyîtxan hildidane hundir. Lê qet tu rojan, kincên wanê qirêj ji diya xwere nehanî. Mêran bi xwe dişûşt û nedidanê. Carekê kîsikekî peran danê. Bi moriyên piçûk û bi reng rengî çêkiribûn. Wisa şabû, wisa şabû. Zûtirê reviya, hate cem diya xwe, Esmer û Gulîzerê. Nîşanî wan da.

Seyîtxan bihîst ku li alê mêran, guhê yekî jêkirine. Ji tirsan çend rojan neçû wir.

Guhê yekî ku gundiyên xwe îxbar kiribû, hatibû jêkirmê. Du gundiyên xwe îxbarî cendirman kiribû ku ew esrarê çêdikin û difroşin. Mehkemê gelek cezayên giran dane wan herdu gundiyan. Li cem wî xwe jî esrar dîtibûn, lê bi cezakî sivik filitîbû. Li piştî qerarê mehkemê, girtî hemû şaş û metel man. Neheqîka mezin hatibû kirinê.

Yê îxbar kirî, êvarê, li ser ciyê xwe, xwe dirêj kiribû. Yek ji wan gundiyên ku cezayê giran girtibû, bi kêrê rikêfî guhê wî kir. Guhê çepê ji binve hatibû jêkirinê. Ev bûyîna li hemû qowîşande nişkêva bû wekî şayiya eyd û dîlana. Gundiyê xwe îxbar kiribû û guhê wî hatibû jêkirinê. Girtî gişt dilşa û bi kêf bûn. Sawcî dest da ser bûyerê. Kesî şahidî nekir. Kesî nedîtibû, nebihîstibû. Girtî, gardiyan û hemû kes. Hemû kes li hember wî bûn. Kesî alîkarî nekir.

Tendûrekî jî şaş bûn. Ji wî dûr disekinîn. Bi çavên ne baş lê dinihêrîn. Yê îxbar kiriye, guhê wî tê jêkirinê. Serda jî qet tu kes şahidiyê, ji bo wî nake. Ew jî şa dibûn. Eso û Hesen hate ber çavên wan. Çend cara gundiyê xwe îxbar kiribû. Gotinên wan ji Ûsiv axare gotibû. Çi derseka giran bû ev. Kesên awhare heqê jiyanê nedidanê. Qet ne li tu ciya. Li derve, di hundirde û ne li tu cî. Dilê kesî bi wan nedişewitî. Gunê kesî pê nedihat. Ev bûyera, li hemberî kesên wisa hevdû girtina hemû girtiyan, gelek tişt hînî tendûrekiyan dikir.

Wexta ku li gund, nexweş diketin, awqasî pir li ser nedisekinîn. Lê niha li vê derê, baş hîn bûn ku di girtîgehande gerek meriv pir baş li sihetê xwe binihêre. Doxtir nayên, nanihêrin, talaşa kesîde nîne. Dîsa xêra hevalên girtî dighêje meriya. Gelek tişt ji destê kesî nedihat. Rojên dirêj, li pêşiya wan bû. Kî çi zane ku wê çi bibe û çi nebe? Lewra gerek sihetê meriya li cîbe. Yên ku rind naxwin, xwarinê dijbêrin ne baş bûn di hepsande. Xwarina xwe, heta pariyê dawiyê xwarin... Ji wê şûnve jî ken, henek û bi hevre peyivandin... Ne wilo wekî dîna, bi her tiştî kenandin. Kenekî bi dil, bi hezkirin. Ne pirçî kirin û rû daketin. Kesî ev hînî wan nekirin li girtîgehê. Jiyana vir hêdî hêdî ew elimandin. Her diçûn pêre, pêre digihîştin. Wan jî nizanibû, çilo dibe. Bi dilop dilop pêşde diçûn. Di nav xwede, di nav wan û girtiyên dinêde ferq

dikirin ku her diçe, çûyineka baş hebû niha. Tendûrekî gelekî hatibûne guhartinê. Niha gelek caran ne bi gundiyên xwere, bi gundiyên dinêre digeriyan, dipeyivîn û hevaltî dikirin. Bi vî tehrî dîtina wan her diçû fireh dibû. Meriv û fikrên nû nas dikirin êdî. Ji berê zêdetir fem dikirin û fireh difikiriyan niha.

Qet şik û şipe nedikirin. Heke ku bi tevayî hereket bikin, dibe ku bibine xwayê erdê xwe. Hêvî û baweriya wan, ji berê zêdetir bû ku erdê xwe ji destê Ûsiv axa xilas bikin. Dîsa jî bi hêvîkê pêşde, tiştek tunebû. Lewra ku hertişt li hemberî wan bû. Niha, nêzîkî nîvê gund, ji berê pirtir bi hev digirtin. Vê zêdetir jî tu tişt tunebû. Hemû nezanin. Bê xwendin û bê nivîsandin. Yekî rêber tunebû di navde. Di her alî, bê hêvîtî dihate xuyanê. Lê di dilê wande, tiştek, wekî gogeke rîsê, her diçû mezin dibû. Dilfirehtî, sebir dida wan. Wekî hêvîka nû bişkive. Di girtîgehêde pişta xwe dabûne hev. Qet kesek jî poşman nîn bû. Dixwastin ku tiştên nû hîn bibin. Ev hêviya nû, di dilê wande her diçû bejn dida. Car caran di nav xwede henek dikirin:

— Vê girtinê gelek tişt hînî me kir. Wek dibistanêye. Ne wisane? digotin.

Niha ji berê baqiltir bûn. Çav û hişên wan tiştên hinekî berê mezintir hildida. Tiştên mezin, lê dîsa jî gora Tendûrekê. Dibihîstin ku li hinek gundên dinê jî şerê axan dikin. Pir kêfxweş dibûn. wekî ew gundiyên wilo, li cem wan û bi wanrene. Bi salan berê ew gundiyên ku dijî axa derketine, hatine kuştinê, axan dest avêtine namûsên wan... Kesên wilo, wekî bav û kalê xwe didîtin. Cara hela hê jî nêz.

Ji nav wan hinek, kisikê moriyan, tizbî çêkirinê hîn bûn. Di nava tasekêde, moriyên piçûk û rengîn dijbêrin, bi tare dikin û dîsa dijbêrin. Bi rojan şûnde kîsikekî gelekî xweş çêdibû. Yekî, marek çêkir ji moriyan. Te dûrve lê mêze bikira, marek li erdê, xwe walandiye û razaye. Te digot ku marekî raste. Pazbendê milan çêkirin. Navê hevalên xwenê gund li ser nivisîn û ji wanre şandin. Girtîgeh niha ne cîkî wisa bû ku nehata kişandinê. Lê vê dcrê hinek tişt hebûn ku aqilê meriya hilnedida. Hinek girtî, wexta ku mehkemên wan hela hê neqediyaye, dest ji nimêja xwe ne dikişandin. Lê heke ku ceza bistînin, cezakî giran bigrin, dest ji nimêjê dikşînin. Qet tiştek nayê bîra wan. Tiştekî nafikirin. Lê hinek jî ne wisane. Berî cezagirtinê nimêj çiye nizanin. Paşê misînê wan di destde, kumekî sofîtiyê li serî, serê wan ji nimêjê bilind nedibû. Nizanibûn ku ji van herdan kîjan raste. An herdu jî şaşin.

Di bin ciyê Soro, yekî keçel radiza. Dizî kiribû. Her roj, «serê min diêşe, pişta min diêşe» digot. Dermanê êşê dida kirînê. Te dinihêrî du

roja serê xwe bilind nekiriye û razaye. Kesî ew bê kêf û hişyar nedikir. Dema ku perê wî tunebûn an jî hewên êşê nehatibûna kirinê, bi hêrs û qehr diçû, dihat. Tevî lîstikên dama dibû. Dest pê dikir digot, «ez nexweşim.» Dest, piyên wî dikişiyan. Bîhnteng dibû. Çavên wî lê bûn ku ji cî derkevin. Yên qowîşa piçûk, zanibûn ku çima wisa dibe. Ji bêrîkên xwe tiştek derdixistin û pê didane vexwarinê. Qasekê şûnde dihate ser xwe, tiştekî wî nedima û dilşa dibû. Dîsa dest bi xewê dikir. Tendûrekiyan berê ji vê nexweşiyê tirsiyan û paşê ew jî hîn bûn. Feqîra ji kure bizanibûna?

Di nav xwede, li ser rojên ku pêşiya wane xeber didan, hertim. Di dawiyê vê dewê, di pey ji girtîgehê derketinê, wê rêke çawa bigirtana? Gişta jî dixwast ku bi hevre hereket bikin û li pêş axê bisekinin. Qerarê wan qerar bû. Wê li erdê xwe bibûna xweyî. Zivirandin êdî nedibû. Rê wisa nîşan dida.

Yên hundir jî dixwazin, mînanî yên dervc bijîn. Sê, çar gava wêde yek radize, dema ku tê cem hevalê xwe, yê ku di binde radizê, wekî ji gundekî dinê çûyc bajarekî dinê. Wilo mêvan tê qebûlkirinê. Li ser cî, alê jorîn tê rûnişkandinê. Balîfan didine ber milên wî. Bi hatinê, li ser lingan disekinin, diçine pêşiya wî. Li malê çiloye, li vir jî wisa. Cixare tên girtinê, paşê çay û şêrinayî. Kêf, halên hev dipirsin. Xeberdan dihatin li ser tiştên ku mêvan jê hezdikin. Dema ku diçû, dîsa wekî gund, bajêr dibû. «Bi xêr û silamet herin. Ser seran, ser çavan hatin...» Belê wekî dervaye girtîgeh. Dûr, dirêj nakişine, paşê yê dinê tê mêvaniyê. Heke ku mêvan ji qowîşekê herine qowîşeke dinê, her zêde mêvantîke girane. Çend kes bi hevre diçin. Wê rojê, xeberdanên wê mêvantiyê, xwarin û vexwarinê wê, rojtira din di girtîgehêde tê qalkirin. Dihate kifşê, kî ji kê hezdike an jî diqehire.

Şîv çêkirin. Savar û pîvaz li cem bû. Kevçiyên darînî, yek diçû û yek dihat. Sibê zû, herkesî nanek didanê. Nîvro tasek girar, nok an jî fasolye heqê wan bû. Pir caran bê rûn û baş nekeliyabû. Caran riz didanê. Hine rûn, pamador û îsot bê tev kirinê, wê çaxê tê xwarinê. Pir kes wisa dikin. Hinekên qowîşa piçûk, yên ku halê wan baş bûn, nîvro jî xwurek çêdikirin. Beroşa wan dikeliya. Caran goşt jî dixwarin. Bîhna goşt dihat ji dûrve. Dûyê mitbaxê, bêhna kuçikên niftê û xwurek wisa tevî hev dibû ku yên wir ji serêşê xilas nedibûn.

Hertim qerar didan ku kuçikên niftê, di qowîşande negrin, lê belê tu cara wisa nebû.

Şevê gardiyan tê û girtiyan dijmire. Di girtîgahande gardiyan wekî qiralane. Bira gardiyan dostê tebe, bese. Tu êdî rehetî. Gardiyan ku

dikeve hundir, kal û xort hemû radibine ser piyan. Dengê xwe dibirin, li hêviya jimarê disekinin. Karê wî ku diqede û diçe qowîşa dinê:

– Xwedê we xilas bike hevalno, dibêje. Girtî jî:

– Xwedê ji te razîbe. Tu bijî. Amîn, bersivê didinê.

Girtî wisa ji gardiyana ditirsin ku ji xwedê jî wilo natirsin. Kê tişteki ne baş kir, dibin û dikutin. Bi cendirman didine lêxistinê. Tî û birçî davêtine ciyê sar û tarî. Sergardiyan nedixwast wilo bibe, lê dîsa jî gardiyanên dinê, van edetên xwenên kevn kar dianîn. Xwuregên baş bê çêkirinê, anjî bi rojên dîtinê hingiv û to ji wanre bê, tu cara para gardiyanan ji bîr nakin. Cixarên giranbiha. Qet nebe çend rojan carekê, pakêtek. Nivîsdarê girtîgehê, pirîn diçû qowîşên piçûk.

Her şev hinek dama dileyzin, hinek kilaman dibêjin û guhdarî dikin û hinek jî di nav xwede dipeyivin. Ji wan çend kes hene ku du sê şeva carekê kom dibin. Nusret efendî, berê di belediyêde cndamî kiriye û wê jî pir caran tîne bîra yên li dora xwe. Neh, deh kesanre qala hespê hezretî Elî, dildulê û zilfîqarê dikir. Dema ku hezretî Elî gurzê xwe ba dikir, serên çil kesan ji pê dikir. Çîrokên periyan. Yên çiyayê Qafê. Yên li dora wî, wekî ku di xewnêdene, pêre diçûne şerê hezretî Eî û çiyayê Qafê. Nusret efendî ji kure awqas çîrok zanibûn? Pesnê bedewbûna qîza periyê pênc deqîqa dikişand. Ava devê guhdara diçû êdî.

Du meh bûn ku girtîbûn. Xwedê zane wê hê çiqasî di hundirdebin. Di nav tendûrekiyande xeberdaneke dilêşandî û meriv şikestandî çêbû wê rojê. Berê du kesan di nav xwede qise dikir. Paşê hinek tendûrekiyên guhdar jî tevî bûn. Hemûyan êdî dîtinên xwe digotin. Yekî xort:

– Gundiyên me yên din, ji tirsa canê xwe, du salande nîvê gund vala kirin û çûn. Ciyên bav, kalên xwe, gorên wan terk kirin. Ev cybeka girane. Qet fedî nekirin? Heke ku em erdê xwe şûnve bistînin, ew bênê jî, diya min jina min kiribe, em nahêlin têkevine gund, digot.

– Oro, lo birao. Tu çawa wisa dibêjî? Çawa em nahêline gund? Ne ew jî gundî û dostê mene. Awqas sal em tev neman çima? Îca em çi bikin, wan ku lêxist çûn? Belê ne baş kirin ya rastî. Gerek neçûna. Lê dema ku şûnve hatin, gerek em wan bi biratî û cîrantî qebûl bikin, bersiv da Seît.

Yê xort vê carê, bêtir qehirî.

– Lê, dema ku wisaye, gêj û bê aqilê dinê emin çima? Di qereqolande bê kutanê, li gund pariyek nan têr nexwin. Di girtîgehande be-

lengazbin. paşê jî tirsonek û bê xîretanre «keremkin werin, fermo vaye erdê we» bêjin. Bira neçûna.

Qasim bi nîvken kete nav xeberdanên wan.

– Lo lo. Hela lê. Ez dinihêrim, we her tişt xilas kiriye... Gund di destê wedeye. Niha jî maye derdên yên çûyî. Hûn xwedê, yê we jî aqile niha. Vê gotinê ji herduya jî girt. Berê Seît xeber da:

– Wê çi bibe, lê? Tu emê heta mirinê virabin. Qet emê der nekevin? Em van erdan tu cara bi Ûsiv axa nadine xwarinê. Tu çi dibêjî, erê?

– Ez jî wek te difikirim. Lê belê, bila hela ew roj bênê. Ew karê paşêne.

Ew xortê, bi sêrîde xeberdan vekiribû, pêşde hat:

– Ew karê paşêye, maşêye tune. Him li ber canê xwenên şîrin bikevin, him jî em erdê bidine wan. Ji bo wan began nizanim çi bikin? Hema ez na, kî vê qebûl dike? Heke ku hûn wisa difikirin, hema di sêrîde, hema ji îrove bêjin, bavê min.

Yên nû hatî tevî peyivan bûn. Hema hema hemû tendûrekî kom bûbûn. Li qowîşê, ser ciyan, xwe sipartibûne hev û qise dikirin. Soro xwest ku hemûyan guhdarî bike. Yên ku ji bo cîranên çûyî ne baş xeber didan du, sê kes tenê bûn.

– Heke ku neçûna, dibe ku bêtir hêsan bibûya karê me. Şerê axê awqas giran nedibû. De were, ew xalê Mihêyî genî bîne bîra xwe. Perên me avêtine avê. Him jî çiqas pere? Du sed zêrên zerînî. Tu me hemûyan bigerî, jin û mal, du sed zêr dernakeve. Tirsonekî kîz kîzok. Dawiyêde revî, çû. Bira gora xwede here. De were bêje. Ana em bêjin ku me zeviyên xwe bi dest xistin. Ware xalê Mihê, evanan jî yên tene. Emê wisa bêjin?

– Belê. Gotina teye. De bêje me çima gura wî kir? Em çima li pey çûn? Erê? Çima qet sûcê me tune? Me gotina wî nekira. Kê bi zorê dida kirinê? Na. Ya rastî, kêmasiyên me hemûyan hene. Ewî jî ji neçarbûna xwe dikir. Tu dijminê me bû. Tu şirîkê abûqat nîn bû ez dibêjim.

Qasim ev pirs digotin û nebirî:

– Yên çûyî, rêka dinê nedîtin, lewra çûn. Bi dilê xwe neçûn. Merivên gelekan, hela di nav medene. Yê te tunenin? Xaltiya te lu kuye? Ne li Qonyêye? Lê zavê te çima çû? Xwîşka te wekî hêsiran digiriya. Nedixwast ku ji we biqete. Te çi zû ji bîr kirin? Hela em zeviyên xwe şûnve bistînin. Derdê me ewe. Kî dide me erda, zeviyan? Erê kî dide

me? Hukumat an Ûsiv axa? Ya rastî gerek em ji bo vê yekê, bi dest û neynûkan bixebitin. Karê giran eve.

— Tu wê ji hişê xwe derxe Qasim. Diya min jina min kiribe ku vê girtîgehêde deh salan jî razêm... Bîst salan jî. Lê ezê dîsa jî zeviyan şûnve bistînim. Çima hûn ne wisanin? Yê ku wilo nafikire heye di nav mede? Hûn wilo nefikirin jî, êdî derbas bû her tişt. Emê serê xwe bidine şikênandinê, emê seriyan bişikênin. Lê emê dîsa jî erdê xwe bigirin. Lê belê wê çaxê, qet bihustek erd jî ne para yên cîranên çûyinê. Wexta erd zêde bû, emê di nav xwede parvekin. Erdê zêde çavên kê derdixe? Kê gotiye ku erdê min zêdeye, eva ji minre bese, vê dinêde? Hela ji minre bêjin, ne wisane?Seît xwest ku bipeyive. Lê dît Mîro dilipite ji bo xeberdanê, deng nekir. Pirs ya Mîro bû niha.

— Birano, tamîşbûna hemû kesan û sebra wan ne yeke. Hiş û aqilê wan ne yeke. Yên çûyî tamîş nebûn û sebir nekirin. Ji destên wan awqas dihat. Lê em hevdu digirin, dest didine hevdu. Dixwazin ku zeviyên xwe ji dest dernexin. Dibe ku em bikaribin jî. Di vî halî emê du tiştan bikin. Yek, emê mêrg û zeviyên xwe ji destê Ûsiv axa derxin. Ya dudan, emê him bi gundiyên xwenê çûyînre, him gundên cîran, der doranre nîşan bidin ku me bi sebir û dest hevdayî ev kara bire serî. Ez bêjim me erd ji dest Ûsiv axa derxist. Wekî em erdên yên çûyî di nav xwede parvekin, wê çaxê ferqa me û Ûsiv axa çiye? Em dibine xwayê erdekî ku ne heqê meye. Ûsiv axa jî wiloye. Lewra, em çi bikin, emê bi derd û kul di hepsande bimînin... Diranên Tahir yên bênê şikandinê. Lê pey yên çûyî, em nikarin awha bipeyivin. Gerek em her zêde dilfireh bin. Em nikarin neheqiyê bikin. Me neheqî dîtiye, em çilo ji bo xelqê qala neheqiyê dikin? Ev ne karê meye. Neynûkên Soro jî hatin kişandinê.

Ew xort û yên ku dixwastin erdê cîranên çûyî parvekin, zivirîn li alê Soro û jê pirsiyan.

— Tu çi dibêjî Soro?

Soro li ruyên wan nihêrî û dest pêkir:

— Ji berêve tivdîr sitandin tiştekî başe. Meriv gerek hine tiştan hela hê nehatî bifikire. Dema ku hêk tê ber qûna mirîşkê, dike qarînî. Ya rastî ev ne rinde. Gerek meriv ji berêve bîne bîra xwe. Yê me jî wisa. Me dîtina hev guhdarî kir, bihîst. Ez wisa zanim ku ji vî alîde baş bû ev peyiva me îro. Hela hê em nizanin ku erdê me, wê destê me keve an na. Lê wisa tê xuyanê ku em wilo bi hevrene û bi qerarin, emê dawiyêde lê bibine xwayî. Wê çaxê emê xuliyê bavêjin ser van rojên belengazî û tedayî. Van du salên derd û kul. Hûn dibînin ku çi tên se-

rê me. Hela hê wê bênê jî. Tiştên wer bûn ku kesî texmîn nedikir. Yên çûyî çûn. Yên mayî bi qasî dîtina xwe li hemberî axê derketin. Yekîtî û bi hevrebûna me, ya rastî gelek rind bû. Kesî wisa hêvî nedikir. Em gişt nezanin. Feqîrin. Nasên me ne di hukumatê, ne jî li bajêr hene. Em peran bêjin, ew jî tunin. Me baş an xeraw hanî heta vir. Em li vir hevde kesin. Girtiyên din hemû ji mere başin. Ji me ne acizin. Em wekî birane. Lê Fatê. Mêrê wê tune. Kurê wêyî mezin tune. Ji me hemûyan zêdetir feqîre. Kê dîtiye ku awqas derd bênê serê jinebiyekê? Çima ev ne li ber çavane? Ya rastî çend hevalên me gelekî qehirîne. Lewra îro, ji bo yên çûyî wisa xeberdan. Heqê wan jî heye, di alîkîde. Ez texmîn nakim ku çavên wan di erdên yên çûyîde bin. Ew naxwazin ku bê zehmet, bê teda cîranên çûyî bênê li ser erdê xwe rûnin. Ez awha texmîn dikim.

Cîranê wanî xort tamîş nebû:

– Belê, belê. Ez lewra diqehirim.

Soro dîsa dest pê kir:

– Yê bûyî bûye. Yê çûyî çûye. Me nikaribû wan bidine sekinandinê. Yê çû nede dû. Me lava kir, me deh caran ji wanre got, lê nebû. Ew jî ne bi xirabiyên xwe çûn. Tu rêka dinê ne dîtin, lewra çûn. Li ciyên çûyî, gelekên wan jî, pir pêrîşan bûne. Birçîne. Em ji wan belengazin, ew jî ji me. Ew jî mînanî me nezan û feqîrîn. Wisa fem kirin. He zanibûn ku çûyin ji wanre wê başbe. Em çawa bikin? Wisa bû. Ji vir ha bifikirin, niha. Nedine li pey yê çûyî. Em ji wan dersê bigrin, ew jî besî meye. Ji du bira yek kar dike û dixebite. Birayê dinê jî, ji vê kedê dixwe. Ne wiloye çima? Ji berçve wisane. Gelekî ber nekevin. Ewên çûyî, herkes di jiyaneke nûdene. Bi tehrekî nû, rê diçin û dijîn. Texmîn nakim ku gelek ji wan şûnve bên. Heke ku bên, ser serê me û ser çavên me ciyê wan heye. Niha hûn ji vir derketinê û paşê emê çilo bikin, wê bifikirin. Karê meyî îro evin.

Giştan heq dane xeberdana Soro. Ew xortê pir diqehirî jî bi tevre. Firehbûnek hatibû dilê hemûyan.

Bihar zûtirê derbas bû. Tendûrekiyan nikaribûn serê xwe bixurînin ji ber bûyeran. Kurê Ûsiv axa, Marûf, nişkêva wekî babeliskekê, di nava gundiyande mabû, lê bû ku bihata kuştinê. Ji ber mirinê filitîbû. Dûr, dirêj di nexweşxanêde mabû. Milê wî kiribûne alçiyê. Lê derdê wî, ne ev bû. Kula wî ser êş û gêjbûna wî bû. Wexta ku serê xwe bilind dikir, li eniya wî, te digot ku çavên wî dikolin. Hişê wî diçû. Tu dermana jî kar nekirin. Ji berê zêdebûn ew êş. Paşê hêdî hêdî kêm kirin, lê vê carê jî zimanê wî giran bûbû, nikaribû xeber bide. Marûf ku nika-

ribû qise bike, her diçû diqehirî. Dema ku wisa diqehirî, zimanê wî bêtir diwaliya û qet xeber nedida. Te digot ku kevir tijî devê wî kirine. Ne dixwast ku kes wî di vî halîde bibîne. Lewra yên ku dihatine dîtina wî, halê wî dipirsiyan, nedixwast wan bibîne û pêre xeber bide. Ji destê wî bihata kes nêzî xwe nedikir. Car cara hêrsa wî ji bavê wî dihat. Ji ruyê wîde ketibû vî halî. Çêr û xeberên wisa ji gundiyanre digot ku hetanî niha kesî ne bihîstine. Wan hindik mabûn wî bikujin. Lêxistin ne bes bû, îca niha devê wî jî xwar bûbû. Niha wekî merivekî nîvcî bû. Zû zû diçû li pêş neynikê, li xwe dinihêrî.

— Ez bimirama, ji vê çêtir bû. Tehrê merivan bi minre nemaye, digot.

Doxtir her roj dihatin.

— Hela pif bike. Pif bike. Hela bifitîne, digotin.

Marûf dikir ne dikir nedibû. Dixwast ku bifitîne, lê lêva wî ya xwar, nedihîşt. Doxtiran:

— Wê başbe. Wê başbe, înşalla digotin.

Te digot ku ji oda Marûf direvin. Berê Marûf çiqasî hîviya doxtiran bû ku zû zû bênê cem. Lê niha nedixwest ku rûçikê yekî jî bibîne. «Ji vir derewan pêştir tiştekî nabêjin» digot Marûf. Jina wî li ba, berketina dilê xwe nîşan nedida. Lê dizîkave digiriya, her roj. Ji bo xezûrê xwe tiştek nedigot. Lê dîsa jî, mêrê wê fem dikir ku dilê wêde derbas dibe, «ax te ev belanan anîn serê me, te mala me şewitand.»

Qasekê ji oda Marûf dûrkeve, mêrê wê xûlî dibe, diqehire. Wexta ku nikare xeber bide û gazî jina xwe bike, hê zêde di ezmanan diket.

Meh nîvek şûnde, milê wî ji alçiyê derxistin. Car cara meraq dikir, wê vê alçiya mînanî keviran, çawa ji milê wî derxin. Bi meqes û kêrên mezin hatin û alçî vekirin. Wê çaxê Marûf wekî zaran şabû. Xwest ku milê xwe dirêj û rast bike. Diêşiya û wisa nedibû. Gelekî ber xwe ket. Lê bû dîn bibe. Te digot ku najî, di xewêdeye. Hine merhem têdan. Fîlimne nû kişandin. Dil û bîhna wî teng dibû. Doxtir fîlim di destê xwede bilind girt li berve tîrjê, paşê nîşanî Marûf jî da.

— Rind cebiriye. Rind girtiye. Qet tiştek nemaye. Ma rastbûna milê te. Ew jî di destê tedeye. Her roj, hêdî hêdî gere vebe. Bi zorê nabe. Tê bibînî, mehekê şûnde, wê gelekî vebe.

Doxtir bi Marûf hîn kir ku wê çilo bike. Hine derzî, derman danê û şandine malê. Wê rûyê xwe ji sermê, surê biparêze. Bayê sar jêre ne başe. Destmalên germkirî wê bida li ser lêv û rûyê xwe. Heke ku heta meh nîvekê berve pakbûnê neçûya, wê dîsa bihata cem doxtir. Raporeke dirêj ji sawcîre şandin.

Hevde gundî girtîne. Halê Fata belengaz meriya dihelîne. Kurê wê li ba xaltiya Zelêxayêye. Hesreta diya xwe dikşîne. Kar û pêşên girtiyan di hustiyê cîranande maye. Her hefte çend kes tênê dîtina girtiyan. Nayê kişandinê. Perê xwe hemû dabûne abûqat. Kesî careka din jî rûyê wî ne dîtibû. Hêviya giştan zeviyên wan bûn.

Zevî, bi bejna merivan bilind bûn, lê têde hew tunebûn. Te serîk simbil bipişiranda, sê, çar genimên ziravok jê derdiketin. Hevde gundiyên bi can û quwet hundirde bûn, lewra yên gund mayî dixwest ku her zêde kar bikin. Şev, roj nedigotin. Kar dikirin. Kêmasiya cîranên xwe, li malên wan nedane nîşanê. Berê karê malên girtiyan dikirin. Ji bo xatirê kayê, kam dajotin. Têde genim pir kêm bû îsal.

Piştî bêderan, toximê par avêtibûn, şûnve hildan an jî hilnedan. Ji bo xwarina wan genim nemabû. Gere ji der bikirîna. Salekê meriv, heywan, cot û zevî, awqas zehmet gişt badilhewa çû. Tiştekî awha nedîtibûn. Li vanderan qet wilo nedibû.

Ûsiv axa Şukrî şand, heqê xwe, para xwe, jî gundî xwest. Ne dihat û li ser bêdera nedisekinî. Lê belê gerek wana jî heqê zeviyên wî bişandana.

Gundî, Şukrî bi deste vala şûnve şandin. Îsal çi hildabûn ku çi jî bidine Ûsiv axa, digot gundî. Wan rojan di derdê kurê xwe ketibû, lewra careke din jî li ser nesekinîbû Ûsiv axa. Wilo nîşan dida ku wexteke bi dilê xwe dipîviya. Lê xwe jî zanibû ku kesî tiştek hilnedaye îsal.

Haya Fatê û girtiyên dinê jê hebûn. Tu tişt ji destê wan jî ne dihat. Hela kanê çilo diçe? Marûf bi jîpekê hate gund. Tu kes ji gundiyan neçûn dîtina wî. Ji xaltiya Zelêxanêre hurmet dikirin, tiştek nedigotin, lewra ew çû mala Ûsiv axa. Wexta zivirî û hate nav malan, jin û mêran dora wê girtin, Marûf jê pirsiyan. Ewê jî pirçik pirçik digot. Gotinên Zelêxayê, wekî bihîstinên wanên berê bûn. Marûf nikaribû baş xeber bide. Devê wî xwar bû, di alîkîde dikişand. Te digot ku hemûya çûne bi çavên xwe dîtine. Giştan qala Marûf dikirin.

Ne Ûsiv axa gundî dipirsiyan, ne jî gundî Ûsiv axa. Herdu alî jî ketibûne derdên xwe. Dixwastin ku ev dema bira wilo derbasbe. Dîwarekî bilind di nava herdu aliyande hebû. Dîtin û baweriya wan ji hevdu pir dûr bû ana.

Bihareke dirêj, havîneka xweş hat û derbas bû, ji ser wanre. Tu kesî tiştek jê fem nekir. Tam hilnedan. Rojên îsal, gişt bi derd û kul bûn. Nepakî û xezew li ser hev dihatin.

Ji gundên dorê, axa û gundî dihatin, ji bo dîtina Marûf. Qefle qefle siyar û peya mala Ûsiv axa bûn mêvan. Tendûrekiyan ji ber dîwaran,

li ser xaniyan, ji dûrve mêze dikirin ku yên hatî nas bikin. Qet dilê wan ji kesî nedima. Li wan deran edet û dîtin wisaye. Rojên awhade, dijmintiya xwe ji bîr dikin. Serxweşiyê didine hev. Diçine malên hev û tên. Şermeka girane heke meriv wilo neke. Dereng nemayî û zûtirê hevdu pirsîn, hêviya hemû kesane.

Herdu alî jî, di dilê xwede tenêbûn, bêkesî didîtin. Awqas kes diçû, dihat, lê Ûsiv axa xwe di nav wande vik û vala dihesiband. Wekî kesekî li beriyê, bi xwe serê xwe mayî. Dijwarî û şerê van du salan tu kareke mezin ne gihandibû Ûsiv axa. Xelqê malê jî bi hevre sar bûn. Marûf ku li rûyê bavê xwe dinihêre, ne wekî berêye. Bi dost, germ, dilxweşî nanihêre niha. Berê xwe bi dîwêrde dike, «xewa min tê» dibêje û bi sehetan naxwaze ku bi kesîre xeber bide. Di demekî kurtde te digot kal bûye. Yên ku hatibûne serê wî pir giran bûn, nedihatine kişandinê. Meriv diheland û dirizand. Rizandina Marûf, ji bedena wî zêdetir di ruhê wîde bû. Bi çavekî tarî û bi dilekî sar li kesên dora xwe û jiyanê dinihêrî. Neheqîke mezin dîtibû. Hetanî dawiya emrê xwe, nedixwast wilo merîkî nîvcî bimîne. Xwarin pak nedixwar, bê mede bû. Diya wî:

– Ez qurbana teme. Te ji vê xwarinê pir hez dikir. Gelek caran dixwast. Çima naxwî niha? Tu ji nexweşxanê nû derketî. Ji bedena tere dibe xwîn. Tê zûtirê bêyî ser xwe.

– Ez çilo bikim? Medê min tune. Dilê min naxwaze.

– Lê Marûf. Canê xwe, bedena xwe bîne bîra xwe. Vî tehrî, bi ne xwarî, tê paşê çawa bibî?

– Bi zorê nabe dayê.

Wisa ku digot, xwîh dida û zehmet dikişand. Diya wî gotinên Marûf bi zorekê fem dikirin. Vî halî Marûf ew her dida qehirandinê.

Ûsiv axa fem dikir ku Marûf wekî berê ji wî hez nake, jê dûr dikeve. Lewra Ûsiv axa ber xwe diket. Çend caran li cem kurê xwe, dûr û direj rûdinişt. Dixwast ku dilê wî hilde. Nedigot, lê belê, meriya ferq dikir. Niha nava kur û bavêde kaşên kûr hebûn. Berê bi dil û can nêzî hev bûn. Bavê ji kur hez dikir, kur jî ji bavêre hurmet dikir. Gelekî bi hev bawer bûn. Niha li ser bendekî zirav mabû têkiliyên wan. Ew jî li ber qetandinê bû. Marûf nedixwast ku bavê xwe bibîne. Wan rojên pêşiyê, Ûsiv axa dilfirehtî nîşan dida.

– Ev Marûfê me, çiqasî pirçiyê xwe dike? Rûyê wî hertim tirşe. Tu dibêjî ku min ew birîndar kiriye.

Ew jî hêdî hêdî ji kurê xwe sar dibû û dûr diket. Jê hez nedikir. Wekî berê, êdî dilê wî pê nedişewitî.

Pêşiyan gotine ku «rojên jimar zû derbas dibin». Raste. Meriv hînî çi nabe ku? Ew halên herî giran û bê hêvî jî... Yê ku mînanî însanan xwe biguhurîne, nehatiye dinê. Sê mehên tendûrekiyan qediyan ku di girtîgehêdene. Wekî duh na pêr. Her roj yên nû hatî û yên ku tênê berdanê. Bûyerên nû û kesên nû. Ne niha, lê dibe ku paşê, girtîbûn neyê kişandinê. Meriv tamîş nebe. Bi hevrene tunebûnê nakişînin. Şevên girtîgehê. Kilam, çîrokên Nisret efendî, leystikên damê. Di nav xwede henek û xeberdan...

Çi kesên cure bi cure hene li vir. Hinek hebûn ku jîr û dijwar bûn. Bawerî û hêviyên xwe winda nedikirin. Hevalên dora xwe dipirsiyan. Hurmet didîtin di hundirde. Bi derdên hevalên xwere mijûl dibûn. Yên xwe bîr dikirin. Du rojan carekê rûyê xwe kur dikirin. Te digot ku wê sibê bênê berdanê. Kincên xwenên paqiş li xwe dikirin. Hertim tiştên baş difikirîn. Cara xênji cixarê, hînbûnê wanî xirab tunebûn. Çawa haya wan dibû, kesî nizanibû. Pere û cixarên kê nemaye, dîtiyên kê nehatine, wan rind ferq dikir. Gardiyan û memûrên girtîgahê jî, bi kesên awhare hurmetê nîşan didin. Hinekên dinê hene. Por û ruyê wan bi tevî heve. Kirasê ser wan qirêj û di bîhnêdeye. Di piştde, ji bo herkesî xeber didin. Naxwazin ciyê xwe jî berev bikin. Gardiyan hertim ji wanre pirsên nebaş dibêjin. Serê wan di berdane. Kêm xeber didin û nakenin. Di dinêke reş û tarîdene. Rojên şayî û xweş naynine bîra xwe. Tendûrekiya ferq dikir ku vanên dawiyê, yên pêşîn hez nedikirin. Di paş wande xeber didan. Dixwastin ku hemû girtî wekî wan bê tevdîr û perîşanbin. Şev û roj gişt li cem hev bûn. Lewra meriya, kesên baş û xeraw rind ji hevdu dijbart. Yê pêşîn dîtiyên xwe dilşa û xurt dikirin. Lê yê paşîn, dilê wan dişkênand û xemgîn vedigerandin dîtiyên xwe.

Tendûrekiyan, ji gardiyanekî bihîstin ku sawcî di dawiyêde kes gunehkar nedîtibû.

— Gundekî bi tevayî eva sûca kiriye. Hemû gunehkarin. Gişt dibêjin ku bi tevayî kevir havêtine û bi daran lêxistine. Ez ji ku û çilo bizanibim ku kê birîndar kiriye? Sawcî wisa gotiye.

Gazî gardiyan kirin, çay û cixare dane pêş. Hine perê reqî û şerabê kirin bêrîka wî.

Di sêrîde jî tendûrekiya texmîn dikir ku wê wilobe. Lê paşê tiştek derneket di alê berdana wande. Sawcî ji der dora xwere awha gotibû. Lê dîsa jî meriv nikare bi wan bawer bike. Li ser vê xeberê, tendûrekî şa bûn. Her roj êdî qala gund û zeviyên xwe dikirin.

— Ax, me zeviyên xwe şûnve bigirta carekê.

– Me bikariba Ûsiv axa ji gund derxista, berda wî, digotin û dest bi gotinê niyetên xwe dikirin.

Dewên girtiyan, gelek caran dûr an jî nêzîk, bi mêrg, çayir, zeviyanve girêdayî bûn. Li ser erdê şer û gilîkirin, bi salan kişandiye. Hinekan bê heq, zorbetî dest daye ser erdê cîranên xwe. Bi salan dewe û mehkeman, kiş kiş kirin. Li berî hev dayin. Bi vî tehrî, kîjan kevirî radikî, di binde şerê erdê dihate xuyanê. Anjî şerên di nav gundiyan. Di binve kûr bûne û nişkêve xwe rûyê avê xistine.

Di qowîşa sisya, ya mezinde, ji gundekî, çar pizmam hebûn. Li ser erdê, nepakiyên mezin bûbûn. Bûyerên ne baş ketibûn nav herdû aliyan. Beriya Tendûrekiyan hatibûne girtinê. Dema ku nû hatibûn girtinê, abûqatê wan carekê hatibû dîtina wan. Carek jî pey wêre. Ji nav wan yê herî zana û çav vekirî Cimşît bû. Kêm, zêde tirkî fem dikir. Diranên wî yên pêşîn zêr û yekî bi goşt û qelew bû. Giran giran xeber dida. Ew dişandine cem abûqat. Her çar bi hevre nediçûn. Ji abûqat û gardiyananre jî wisa hêsa dihat. Cimşît ku çû ba abûqat, bi ser linga, hal û çûyina dewê jê pirsî. Abûqat tiştin got, lê belê Cimşît fem nedikir. Fedî kir ku careke din jî jê bipirse. Tiştek tenê fem dikir. Abûqat digot ku «çûyina dewê normale». Dema ku Cimşît vegeriya ciyê xwe, pismamên wî û yên dinê ku jê dipirsiyan:

– Nizanim walle. Dibê ku normale. Lê belê ez nizanim, «normalê» tu xêrî an şerî. Min jê pirsî, abûqat dibê her tişt «normale».

Hinekan got, «normal» pir başe, hinekan got, ne xerawe. Paşê du kes ji wan çûne ba sergardiyan, jê pirsîn. Ew jî dikeniya.

– De hema, çilo hûn zanin. «Normale» lo.

Paşê xwast ku bi tehrekî din ji wanre bêje.

– Wisane ku bi rê diçe. Çilo hûn difikirin, wilo diçe. Di alîkî da jî, mena wê ewe ku «başe». Ya rastî ne xerawe ha.

– Lo Cimşît ez heyran. Te çima ji mêrik baş nepirsî?

– Ez çi bipirsim? Devê xwe vekir got, normal, girt got normal. We niha rind fem kir. Sergardiyan ji were got, êdî hûn çi dixwazin?

Wê çaxê Mîro hate cem wan. Dikeniya. Ev bûyera ku ji Xalisre digotin, Mîro dîsa kete nav xeberdanên wan:

– Bi dîn û îman, dîsa jî başe. Binhêr qet nebe, mêrik tê. Hûn fem nekin jî dîsa dibê «normale», paşê diçe. Ev çend care tê abûqatê we?

– Ev cara sisiyane.

– Walle, bille rast dibêjim. Mêze bikin, me çiqas pere dayê. Hema hema pê çara yek, gundek tê kirînê. Qet rojekê li ruyê me nenihêrî. Gelo em mirin an man? Qet telaşa mêrik nîne.

Destê xwe da ser pîlê wî.

– Ax. Ax. Carekê nekeve vê telê. Meriya wekî pîvazan bê qalik dikin. Wekî zolên çarixan zirav dikin. Bextê we heye ku dewa we baş diçe.

## –XXXVI–

Hevalên Tendûrekiyan bi tehr tehrî bûn. Yek ne mînanî yên dinê bûn. Ew rojên pêşîn, hevalekî Soro hebû. Bi hevre wekî bira bûn. Gelek nasê wî hene li bajêr. Gelek der dîtine. Salên wî zêde tênê xuyanê, lê hela hê nezewiciye. Zana dixuya. Ji her derê tiştek hîn bûbû. Ji Sorore digot ku heqê wane, gerek heta dawiyê şerê axê bikin. Hevalên xwe jî wisa bide bawer kirinê. Soro dilxweş û şa dibû, dema ku ew guhdarî dikir. Bi rojan ji wî nediqetiya. Dixwast ku jê hinek tiştan hîn bibe. Ev hevala bi tehrekî din dibêje. Tu dibêjî ku di dilê meriyandeye.Dijwarî hînî meriyan dikir. Henek û qala rojên xweş û ronayî dikir. Deh roja şûnde, qet di nava wande tu tişt derbas nebûyî, hevalê Soro, bê silav û bê xeberdan ji cem derbas bû. Soro xemgîn bû. Berê got ku dibe hevalê wî ew ferq nekiribe, nedîtibe. Paşê fem kir ku xwe wisa dixwaze. Qet tu mene neda vî halî. Vê carê bi hinekên dinre wisa bi dost û heval bû. Paşê ew jî berdan. Demekê şûnde, çawa dest ji Soro kişandibû, wisa jî dîsa hat, dest bi dostiyê kir. Wisa nîşan dida ku eva edet û xisetê wî bû. Rojekê başe, rojtira dinê bê sebeb û bê tune dixeyide. Soro fem nekir ku wê bi vî hevalîve çilo rê biçûya. Bê qerar bû Soro.

Xortekî kinik û çavekî wî hinekî piçûk hebû di hundirde. Jîr, dijwar û xurt bû. Xênji wê, wekî şeytan hişyar û bi aqil bû. Zûtirê her tişt fem dikir. Ji maleke dewlemend bû. Lê dijî beg û axan bû. Ha ezraîl ha axa, ferqa wan tunebû ji bo vî xortî. Çawa bûbû dijminê axan, bi xwe jî nizanibû. «Piçûktiya xwede jî awha bûm.» digot. Zûtirê bû dostê tendûrekiyan. Yekî mîna wî hêsa hevaltiyê, dostiyê dayne tunebû. Comerd bû. Pariyê devê xwe bi hevalên xwere parve dikir. Dostên xwe zû bi zû bîr nedikir. Dostê dostê xwe bû. Lê zûtirê pozê xwe bilind dikir. Tiştekî ji dilê wî bigirta, dixwast ku bela xwe bi wan bide. Diçû, bi xwe serê xwe digeriya wê çaxê. Cixare bi cixaran vêdixist. Çavên wî kes nedidît. Dixwast şerekî dayne. Alîkî wiyê dinê hebû, alîkî xirab. Dema ku diqehirî, dilê dostê xwenî herî baş jî, dikaribû bişkêne. Piştî çend saetan poşman dibû. Lê belê carekê dil hatibû şikestinê. Ew pirên di

nav kesan, hatibûn hildanê. Carna hevalên herî baş dihîşt, diçû li der doran, tiştên vik û vala qise dikir. Yên ku ew nas nedikirin, diecibandin. Ya rastî ewa serda pê jiyan bû. Lewra wisa bû. Dixwast, çîrokên xort û keçan guhdarî bike. Dilê wî hela hê zelal nîn bû. Dema ku bîhna wî teng dibû, diçû girtîk didît, qala tiştên wilo dikirin ku bi saetan dikeniyan. Caran bîra derve dikir. Ji jiyana xwena derve, dû keçan gerandina xwe qal dikir. Soro, Mîro û hevalên wanî nû, Xalis û Bekir, dostê vî xortî bûn. Soro ewa baş fem dikir. Bi gelek aliyanve pir baş bû. Çend salan şûnde ev alên dinê, alên xortiyê wê biçûna, wê çaxê wê bêtir baş bûya. Ew û Soro ku tenê diman:

– Ez ditirsim ku tu derve, têkevî bi zewq û kêfê. Bi axanre hevaltiyê bikî. Bibî yekî mînanî wan, digot Soro.

Ewî bi dilpaqijî û bi dilekî nizm bersiv dida.

– Ez jî car caran wisa dibêjim, ji xwe re. Meriv tamîş nabin. Mal, milk û nizam tiştên dinê, alîkî meriyayî baş û bi namûs hebe jî, tu dinhêrî hêdî hêdî xirab kiriye. Daye windakirinê. Meriv di dawiyêde rezîl dibe. Lê Soro ez qewlê mêran didime te ku ez wisa nabim. Wekî wisa bibûma, çi karê min li van deran hebû? Tu min rind zanî. Ez ku qehirîm, her tiştî didime bin lingên xwe. Pêpez dikim. We awqasî ji destê axê kişandiye. Lo, ez bi dîn û îman, qet kesek, wan mîna min nas nake. Dek û dolabên wan, kes ji min rindtir nizane.

– Birako te çima nexwend? Te ku bixwenda, tuyê pir dijwar bibûya, bi xwedê. Ev abûqatê wer tela tîne serê me, nikaribû avê li destê teke.

Ewa him dikeniya, him jî ji van gotinan dizî dizî şa dibû.– Min xwend. Bavê min ez şandime bajêr, mala nasekî me, bo ku di dibistana navînde bixwînim. Xwedê giravî ez di gundê mede xwendevanekî yekemîn bûm. Gundê me nehiye bû. Sûk, bazar, qereqol lê bû. Gelekî ji vir dûre. Ez çûme bajêr, hefta pêşîn, mamoste ez rakirim, ji min pirsî. Got ku nozda têxe du çîqa. Nozda bi duda parveke. De bifikire Soro, min dibistana pêşîn, pênc sal xilas kiriye. Him jî ez yekemîn bûm. Min nikaribû nozde sêvan, bi du kesanre parvekim. Mamoste qehirî. Zarên bajêr bi min keniyan. Min dev ji dibistanê berda. Min berê jî tiştek nizanibû, yê mayî jî ji bîr kir, çû. Nika ferqa min û te tune, di vî alîde. Ha elif ha mertek.

Ya rebî, ya elem. Çilo hişê wî hemû şeytaniyê hildida? Kî, çi dekan dike? Çawa texmîn dikir dawiya gelek tiştan? Digot ku axayên di dawiyêde wenda bikin. Ji nihave li gelek ciyan şerê wan tê kirinê.

— Hela tu bisekine. Bira ev partiyên nû, hinekî pêşda herin. Tê bibînî. Çavên gundiyan, wê vebe, wê hişyar bibin. Mînanî mûriyane. Çavên wan ku vebûn, êdî bi zehmet tênê xapandinê. Mêzeke, ev pirseke ez ji tere dibêjim. Ji bîr neke. Tê bînî bîra xwe ku li girtîgahêde hevalekî ji minre wilo gotibû.

Ev xorta hevalê tendûrekiyan û berê pêşîn yê Soro bû. Diçû cem Xalis, bûyerên çiyê, firariyê guhdarî dikir. Qala Îbo wilo hatibû kirinê ku Îbo li ber çavên wî, merivekî pir giranbiha bû. Alîkarîkirina tendûrekiyan, Soro wan tiştekî pir hêja bû. Eva besî Îbo bû. Di dilê xwede gelek qîmet dida Îbo.

— Bijî. Merivekî bi namûs bûye, birayê minbe. Kesên bi xîret, bi namûs wilo dibin, digot wî xortî.

Bîzê tendûrekiyan ji Remzî dihat. Çend kes ji çek, tiving firotinê hatibûne girtinê. Remzî jî yek ji wan bû. Berê, li derve wekî qiralekî bûye. Lêxe, bibire. Kêf û zewq. Di nav hevalên xwede, yê herî bi aqil tê xuyanê. Çekan difroşe, peran parve dike. Lewra li ser hevalên xwe quretiyê û hikim dike. Xwe cesûr û dijwar nîşanî hevalên xwe daye. Ji jorve li hemû kesan dinihêre. Dinêde, heye tune, xênji wî kes tune. Di girtîgehêde bi her kesîre hevaltî nedikir. Emir dida hevalên xwe. Mezinê wan bû. Teşaxuza wî nedihate kişandinê. Rojên pêşîn kesî ev kêmasiyên wî nedîtin, lê qasek ku derbas bû, giştan ferq kirin. Tirsonek bû, lê bi qêrîn û zart, zûrtan tirsa xwe vedişart. Tamîş nedibû. Her diçû diweşiya. Mene hevalên xwere digeriya. Ew dişandine ser girtiyên dinê. Paşê wekî merivên mezin dikete navê. Ji hevalên xwe û yên dinre hêrsa xwe dihanî. Dixwast nîşan bide ku «li vê derê gerek pirsa min derbas bibe». Dixwast ku hevalên pêrc, xizmeta wî bikin. Yekî pîs bû, nedihate kişandinê. Dema ku Soro wan ew nas kirin, êdî ne wisa bû. Ew roj derbas bûbûn. Xwe li ser ciyê xwe dirêj dikir. Hinek ciyên min diêşin digot û li baxçê çend serî ger jî nedikir êdî. Berxweketin û bîhntengbûnê mala wî xirab kiribû. Ew çekfiroşê berê, bi çiya û ezmananre difiriyayî çûye, dewsa wî, yekî tolaz, bêxîret hatiye. Bi xwere nabîne ku dest, ruyê xwe bişo. Ji berêve çavên tendûrekiyan ew nedigirt. Bi merivên xweve hatibû ser xweşiyê û paşê Soro wan jî bersiv dabûnê, çûbûne ser ciyê wî. Serokên eşîretan, axayê gundan çer dikir, wî jî wilo mêvanên xwe qebûl dikir. Paşê tendûrekiyan têdigîhiştin ku pêre dostî ne hêsaye, lewra tenê silav didane hev.

## – XXXVII –

Qet şaşî nebû. Her hefte ji Tendûrekê hatin, ji bo dîtina girtiyan. Karê gund nediqediya. Yên giran çûbûne sêrî. Xerman rakiribûn êdî. Ka û gîha kişandibûn. Der dorên xaniyan, ciyên hurşiyayî çêkiribûn.

Sawcî gazî şofêr û xulamên Ûsiv axa kiribûn. Jina wî jî pêre. Navbera du heftande jinika feqîr, dîsa ji sêrîde, yên bûyîn qal dikir. Çilo li Marûf xistin, hate ber çavên wê.

– Ew Soro, ewê çûrî sor nebûya û min xwe nehavêta ser kurê xwe, wê Marûf bikuştana. Hemû gundiyan lêdixistin.

Sawcî bi tevayî guhdarî dikir, jê pirsî.

– Soro nedihişt ku lêxin? Ne?

– Belê ewî nedihişt. Lênexin, lênexin, digot.

Paşê mêrê wê hate bîrê. Wê gelekî biqehiriya. Çima wisa got? Qet tiştek şûnve nedihişt, wê bûyinên nemayî bihaniya serê feqîrê. Lê êdî, wisa gotibû carekê. Ê, ya rastî jî ne wisane çima?

Ev çiye gelo? Qumandarê cendirma, ji bo Soro baş xeber nedabû. Ûsiv axa digot ku her tiştî Soro dide kirinê û ew bi xwe dike.

– Mêrê te jî dît ku Soro kurê te diparêze? Ûsiv axa çiqasî ji we dûr bû?

– Nizanim. Ez, mêrê xweve li ba hev bûn. Dibe ku wî jî dîtibe.

– Bi texmîn çiqasî, li piş we bû? Dema ku te û Soro Marûf diparast?

– Hewekî ji me wêde bû.

– Mêrê te û Soro bi hevre xeber didan? Tu tiştek di nav wande derbas bû? Berê?

– Na xêr, tiştek derbas nebû. Xeber didan, lê mêrê min ji wî heznedikir. Nizanim. Ez tevî karên wan nabim. Ez jinim. Tu tiştî jî ji minre nabêjin.

Sawcî têgihîşt ku jinik rast û ji dil xeber dide. Qumandar û Ûsiv axa di derheqê vî merivîde çima wisa peyivîn? Hişê wî hilnedida. Paşê Soro hate pêş çavên wî. Dema ku ji bo bûyerê pêre xeber da, gotinên wî hatine bîrê. "Hûn hemû memûr, bi axanre didin distînin. Bi wanre dostin. Em feqîrên belengaz çi bikin? gotibû." Wisa dihate bîra sawcî.

Di gotinên Marûfde jî tiştek tunebûn. Bi vî halî, sawcî nikaribû ji nav kar derkeve. Xeberdanên kesî jî alî wî nedikirin. Kî gunehkare, sûcê kêye? nedihate xuyanê.

## – XXXVIII –

Rojekê gazî tendûrekiyên girtî kirin. Li oda nivîsdar bûn. Hine kaxiz dane hemûyan. Çar rûpel bi hevre girêdayî bûn. Nivîsdarê qelew got ku:

– Ev «îddîanama» wene. Çavên we ronayîbe. Mehkema we deh rojan şûnve dest pê dike.

Xwendin û nivîsandina wan nîn bû. Bi kaxizên xweve zivirîne qowîşan. Çend kesên ku ji van tiştan fem dikirin hêdî hêdî ji wanre xwendin. Paşê:

– Qet tu tişt jî ji vê mehkemê dernakeve. Kêrî weye. Binhêrin, çi dixwazin ji bo we. Madda çarsed û pêncîşeşa. Evmadda ji bo kesên ku bi dil û hiş, kesekî birîndar dikin. Lê bi tevayî bûye. Yê ku birîndar kiriye ne kifşe. Ne wisane? Aha. Cezayê vê kême. Ne tu tişte. Ji bo vî cezayî jî rapora ew kesê birîndar gerek bê zanînê, got yekî.

Paşê çû ji bin balîfê xwe, kitêbeke qanûna cezayê hanî. Hinek rûpelên wê rizyayî û diryayî bûn. Qasî abûqat, wekîlên dewa ji van tiştan fem dikir. Girtiyan ku bûyerên xwe jêre digotin, ewî çiqas ceza bibiriya, li mehkemê jî wilo derdiket. Rûpelên kitêbê welgerand û welgerand.

– Heke ku alîkî bedena yê birîndar, bê xêr û bê kar bibe, tiştek jê neyê, ceza zêde dibe. Wisa dinivîse qanûn. Û dîsa, heke ku birîn di rû û dora seriyê meriyabe, cîkî ku bê dîtinêbe, di dîtina, bihîstina meriyade kêmasî bibe, cezayê wê du, sê carî zêdeye. Ya rastî eva jî li ser dîtina hakime. Maye ser însaf û dîtina wî. Hûn qelebalixin, lewra dîsa jî wisa zêde nabe cezayê we. De herin, tivdarekên xwe bikin. Hûn jî rêwîne, çendekî şûnde. Hemû girtîgeh şabû.

Li alî jinan, yek jî dabûne Fatê. Wê kaxîz bi kurê xweve şande ba Soro. Gelo ev kaxiz çine? Zanibû ku Seyîtxan serederiyê nake, lewra Cewahira gardiyan alî wan kir. Niha li aliyê jinan jî şabûn û hêvîkirina berdanê heye. Seyîtxan tiştek fem nedikir, lê wî zanibû ku guhartineke baş heye îro. Ku qala berdanê, çûyinê bû, ji hemûyan pirtir ew şa dibû. Bi evîna dilê xwe car diçû der û car dihate hundir. Bîra gund û birayê xwe kiribû. Bîhna wî teng dibû êdî. Birayê wî car cara hatibû dîtina wan. Wê çaxê rojên wan gelek bi kêf û xweş derbas bûbûn. Nedixwast ku birayê wî, şûnve here gund. Roja dîtinê bira qet xilas nebe. Carekê jî ji diya xwere qal kiribû.

– Kurê min. Lawê min. Xwedê ji wan razîbe. Sergardiyan bi zorekê te li vir digre. Mezinên wî jî hene. Nahêlin. Lewra qet nabe. Înşalla emê herin ba birayê te. Gelek nema. Tu ji wî pir hez dikî, erê?

– Lê, lê dayê. Wisa jê hez dikim ku. Yekê jî ew li wê derê natirse gelo? Tenêye. Çi dixwe?

– Bi xaltiya Zelêxare dimîne. Ew rind lê miqat dibe, digot û bi porê Seyîtxan dileyst.

Rojtira dinê Soro û hevalên wî çûne ba Xalit efendî. Di girtîgehêde rê nîşan dida û alîkariya dewan dike. Derdê xwe jêre gotin. Di mehkemêde, wê çawa bikirana, jê pirsîn.

– Xalit efendî, bav, birayo. Kesên nezan wekî merivên korin. Tu dikarî, xêra dê û bavê xwe, ji mere bêjî, me hîn bikî ku wê çawabe? Emê çer bikin? Abûqatê me heye, lê te dît ku nehat. Tiştek nema ji roja mehkemêre. Rojek çû ma neh. îro jî nehesibîne, ma heyşt. Hefta hatî, piştî îro.

Xalit efendî zêde dilgeş bû. Bi terbiye û tore hatibûne cem, qedr û qîmetê wî zanibûn. Xwe kom kir. Rêz da pêsîra kirasê xwe. Dengê xwe nihêrî.

– Berê wê we bibin, navê we û yê dê, bavê we ji we bipirsin. Kar û jin, zarê we. Paşê wê wan kaxizên ku ji were şandine, bixwînin. Pey wêre wê ji we, gotinên we bipirsin. Heke ku ewanan di rojekêde biqedin, başe. Na, hûn wê rojê, dereng hildabin û dereng dest pê kiribin, texmîn nakim ku biqede. Nîvcî dimîne. Xwedê bike ku zû dest pê bikin û pirsiyara we hemûyan xilas bibe. Xeberdanên we, başin. Bi hevdu digrin. Tu tirsa min, di vê dewêde tune. Kesî tu sûc nehavêtiye ser kesî. Ev tiştekî başe. Lê belê em nizanin niha, şahid wê çi bêjin? Wan berê çi gotiye?

Mîro xwast ku alî bike.

– Jina Ûsiv axa, şofêr û xulamên wî guhdarî kirine. Lê em jî nizanin ku çi gotine. Şofêr merivekî baş tê xuyanê. Ji me qehiriye. Dibe ku dijî mebe. Guh nede xulaman. Hemû jî seybisanin.

– Şofêr dij bêje jî wê çi bibe? Wê bêje ku dihatin li minxin. Vê zêdetir? Ew jî we bi xwe gotiye. Ne wisane?

– Belê wisane, got Soro.

– Lê şîreta min li webe ku kêm xeber bidin. Wisa dûr, dirêj qal nekin. Kin û kurt bersiva wan bidin. «Belê. Na.» Bersivên awha başin. Zanî çima, ev hakim, karê xwe baş zanin. Hostane. Şuxul û karê wan eve. Bira ji devê meriya tiştekî negrin. Tu êdî bi wan nikarî. Meriyan şaş dikin. Meriya di nav xuyêde dihêlin.

Xortek ji tendûrekiyan, ji giştanre çay çêkir û hanî. Vexwarin, qala tiştên dinê kirin. Xalit efendî dîsa ji wanre got: – Hûnê bibînin. Gotineke ez ji were dibêjim. Vê carê nebe, wê careke din we berdin. Çar meh nîv bû, nêzîkî pênc mehan. Cezayê vî karî kifşe. Wê çi bibe? Wê we berdin. Mehkeme wê wisa here, çendekî din jî.

Destûr jê xwastin û rabûn. Soro çû cem, pênc paqnot kire berîka wî.

– Na bavê min. Çi zehmet dibînî? Got, lê ruyê wî wilo nedigot. Ew jî dilşa bû.

Tendûrekî, ew heft rojan gelek bê sebir bûn. Sibeh û êvaran, rojên mehkemê dijmartin. Gelo haya abûqat jî bûye, an na? Çûn ji Xalit efendî pirsîn. Gerek mehkemê xeber bida wî jî. Ev xeber ku bihîstin, hêviya wan her zêde bû.

Abûqatê wan ku rabûya, xeberdaneke xweş bikira, hakimên bibê, nebê wê nerm bibûna. Çima xeberdana wan û ya abûqatan tu yek bûn. Ax wekî bihatana berdanê. Heftekê, hema usa evîn û dilxwestî, qala derve dikirin. Heta îro, tu cara awqas nexwastibûn bêne berdanê. Hinekan bîra mal, jin û zarên xwe, hinekan jî bîra dilketiyên xwe dikir.

Fatê pirs dida hevalên xwenê girtîgehê ku piştî berdanê bê dîtina wan. Wê ew ji bîr nekirana. Wê bi destê xwe, xaltiya Cewahirêre gore çêkirana. Rûnê nivîşk û bê xwey jêre bişanda. Çawa dihatine ji bîrkirinê? Çiqas alîkariya wê kiribû?

Xeber şandine gund, ji bo roja mehkemê. Ew gardiyanê mezin û terikî çûbû xanê û ji gundiyên wanre gotibû.

Bekir û Xalis, wê heftê qet terka Soro nekirin. Wisa nîşan dida ku dibe wan berdin. Belê, herduyan jî çend caran dîtibûn ku yên wisa, nava çend mehande têne berdanê. Cezayê Xalis û Bekir jî zêde nemabû. Hatibû ser mehan. Herd jî, pênc, şeş mehan li pey hev, wê li derve bûna. Qewl û pirs didan ku wê hertim, li hevdu bipirsiyan. Ev hevaltiya xweş, gerek li vir neqediya. Karê dinyayê kifş nabe. Dibe ku dest bidana hev, derd û kulên hev bipêçandana. Tu dinêde tiştên nebûyî heye. Bekir ji Sorore:

– Ê. Birao, hûn ku derkevin. Hûnê bi Ûsiv axare çilo bikin? We, carekê zevî xilas bikira. Hişê wede, tu rê û dîtinek heye? Xwedê nekirî, tiştek neyê serê te?

– Em çi bikin bira? Çi zanim. Bi tevayî, axê nêzî erdê nekin. Vê wêde çi ji destê me tê? Dibe ku vê carê, çavê wî tirsiyabe hinekî. Dibe ku bê rê. Wer tê xuyanê ku vê carê ya herro, ya merro, got Soro.

Xalis:

– Ez jî wisa texmîn dikim, wer dibînim.
Bekir kete nav pirsa wî.
– Bi hevalên xwere, li vir baş xeber bide. Hûnê çi bikin, wê çilo bibe? Hûnê li gund dîsa bipeyivin. Dibe ku hinek, kesî guhdarî nekin. Gerek hûn ji nihave bizanibin ku hûnê li gund di rêyeke çilode herin. Van rojên girtî gerek karekê bigîhînine we, ne wisane? Ji vir hevde kesên bi qerar û dizanibin ku wê çi bikin, derkevin. Ew jî, bira bi gundiyanre bipeyivin. Ji her serîkî gerek dengek dernekeve.
Soro li hundirê çavên Bekir nihêrî û:
– Ez jî difikiriyam Bekir. Mîro jî. Ji minre got. Sibêh nîvro şûnde, berve êvarê, emê di nav xwede qise bikin. Bira kes ferq neke. Çi zanim bavo, çi dibe û çi nabe? Dibêjin ku guhên erdê hene. Paşê bira derdekî dinê neyê pêşiya me. Bira Ûsiv axa, dijî me tivdarekên xwe hilnede.
Rojtira dinê, navroj xwarin. Soro:
– Zarno, hela ranebin. Em hinekî bipeyivin.
Mîro çend kîlo tirî dabû kirînê. Tirî dixwarin. Soro:
– Dibe ku em vê carê jî bênê berdanê. Em li gund di rêke çawada bimeşin? Hûn çi dibêjin? Me heta niha, cîrantî û hevaltîke baş kir. Yekîtî û dostîya me jî wisa. Gerek ku em bi hevdu bişêwirin. Cîkî ji vir baştir jî tune. Ji bo xeberdanê, ji gund rindtire. Kî, çi dibêje?
Qasekê hemû bêdeng bûn. Kesî xeber nedida. Kesî ev pirsa hêvî nedikir. Lê her roj di nav xwede, ev tiştan bi saetan dipeyivîn. Kesî dest bi peyivê nekir. Tirî dixwarin û li hêviya hev bûn. Soro bi nîv şaşbûn û ken:
– Çi bû? We zimanê xwe winda kiriye? Her roj we guhên hevdu dibir. Hûn çima wisa kerr û lalin. Dibe ku tiştekî gotinê tune?
Qasim kerrbûn bela kir.
– Ez tiştekî dûr û dirêj nabêjim. Nikarim jî. Bi ya minbe, bê feydeye. Wê zanim ku... Em bi mehkeme, hukumat û arzûhal... Bi van riyan, axê nikarin. Xwedê jî zane, em jî zanin. Heqê meye ev erdan. Gund yê me gundiyane. Lê emê vê ji kêre bêjin? Gundî ku yekbin, me dît. Kes nikare tiştekî bêje. Qulan digerin ku serên xwe têxinê. We halê Marûf dît. Ji bo me, ya bi tevayî terkkirina gund anjî dîsa bi tevayî li dijî axê sekinandinê pêştir rê nemaye. An emê vî karî bibine serî, anjî emê her tiştî winda bikin. Lewra dîsa bi tevayî guh bidine hev, pişta xwe bidine hev. Bavê me jî ji tirbê rabe, em erdê xwe nadine kesî.
Seît li cem wî rûniştibû. Pirsa wî birî:
– Belê, belê. Em çilo bikin? Çer dibêjî tu?

– Ez dibêjim ku Ûsiv axa berî me dide. Ne heqê wiye. Çima wilo dike? Bi quwete, lema. Lê belê em, ji wî û meriyên wî zêdetirin. Em jî bi quwetin. Hetanî ew berî me dide, em berî wî bidin.

Li ser van peyivên kin û vekirî, gişt kerr û lal bûn. Dibe ku hemû awha difikirin. Lê kesî, wilo vekirî û rût tezî nedigot. Wisa li pêş çavên meriya û ronahiyêde bû ku lê nihêrandin bes bû. Lê dîsa jî ricaf dikete dilê meriya. Li pêş awqas zordestî û teda, dîsa jî, berdana axê, ji wanre tiştekî xerîb dihat. Hişê wan hilnedida. Li girtîgehêde hêdî hêdî tiştên awha dihatine bîra wan. Lê niha, li ser xeberdana Qasim te digot ku bi qamçiyan li ruyên wan xistine. Qasim dît ku hemû bêdeng guhdarî dikin:

– Çi bû? Dema ku Ûsiv axa berî we dida, ew, wilo awqasî nedifikiriya. Ji bo ku ew berî we nede, gerek hûn berî wî bidin. Em çima bi kêfa xwe hatine vir? An em li bela xwe digerin? Na. Na. Ew dest ji me nakişîne. Em dixwazin dîsa jî, mîna hêsîr û xulaman bixebitin li wan zeviyan. Para wî jî bidinê. De were ku ew qebûl neke. Bi pîhna li qûna me dixe. Waxta ku wisane... An wê di ciyê xwede rihet rûnê, bela xwe bi me nede. Emê wekî berê rê herin. An jî mirinê bidine pêş çavên xwe, berî wî bidin. Ji gund derxin.

Paşê kesî xeber neda, demekê. Mîro wilo dest pê kir:

– Gotinên Qasim rastin. Em niha li ser derê kaş û kendalanin. Wexta me ya hêvîkirinê û sekinandinê ne pire. Ya emê di kaş û kendalande bifirin, anjî çi ji destê me tê, emê bikin. Çiqas ji me bê, em xirabiyê naxwazin. Wisa nîşan dide ku qedera me awhaye. Ji mere rehetî tune. Rehetiya wê, di binê erdêbe. Bira yên pey me tên, vê reziliyê nekişînin. Kûçelaniye ya rastî. Lewra vê carê gerek em her tiştî bînine pêş çavên xwe. Girtin û hepis bû, me ew jî dît. Li qereqolan kutan bû, kesî ji me bêtir nedît. Ji vê wêde çi heye? Mirin, ne wisane? Çawa hebe, emê rojekê nemirin? Bira heweki jî Ûsiv axa têkeve haya canê xweyî şêrîn. Em naxwazin lêxin, wî bikujin. Kuştin tiştekî xirabe. Emê tenê li zeviyên xwe bibine xweyî. Bira destê xwe ji wan bikişîne Ûsiv axa. Axa nabêje jin û namûsin, giştan dişîne hepsê. Heke ku bi camêrî li ciyê xwede rûdinê, ser seran. Na, wê wêde, ew çi li me dike, emê jî li wî.

Seît:

– Dibe ku piştî birîndarbûna kurê xwe, hatibe rê. Bûye meriv. Dibe ku tirsiyabe. Heke ku çavên wî bi dijminatiyê nehatibûne girtinê, wê here di ciyê xwede rûne. Ûsiv axaye... Tu çep û rastê wî tê zanînê? Li ber dijminatiya me, neçû bi Zubêyd axare lev nehat çima? Zubêyd

axayê ku bavê wî da dardekirinê. Niha di nav wanre av derbas nabe. Meriv tu cara kesên weha bawer nake. Dibe ku bitirse û bê rê. Ûsiv axayê duh here, yekî din bê. Dibe ku her here har bibe. Ji bo evlegek zevî, dinê li tevî hev bike. Wekî nû.

Yekî xort:

– We dît. Jin û mêr, çilo wekî mûriyan rawiştane ser Marûf? Diya min jina min kiribe, heke Ûsiv axa nebe meriv, emê hiriya wî quloz bikin.

Li ser vê pirsê, hemû keniyan. Tirî qediyabûn, qirşik tenê mabûn di siniyêde. Dîsa Mîro:

– Berî girtinê, ji bo yekîtiya cîranan em hemû xebitîn. Çi ji destê me hat, me kir. Hinekan xwe dane der. Lê şikir ji xwedêre ku tevayiya me başe niha. Lê gerek feydê vê girtinê bigihêje me. Em karê jê bikin. Dersekê jê hildin. Em hatin, me li vir kesên nû dîtin, nas kirin. Hemû ji bo sûcên dinê. Kesên cure cure... Yên ku mîna me, ji bo şerê erdê hatine... Me her tişt dît. Hetanî mirov kar bike, çend cara winda dike? Ew perên ku me dane abûqat, ji mere bû derseke giranbiha. Em wekî koran, bi nezanî, çûn, ketine bîrekê. Her tişt jî wiloye. Gerek em li ser karê xwe bisekinin. Çi dibe, çi nabe? Gerek em bipirsin. Wisa nebe, şaşika meriya, bi paşopêlî didine serê meriya. Heke ku em nemirin, ji vir derkevin... Abûqat mînanî heta niha kir, karê me mêze nekin. Ezê herim di nav xelqêde pêsîra wî bigrim, çend pirsan bêjim. Min sond xwariye. Him jî ezê xwe bêjim ku bira nebe sûcê kesî. Li vê derê baweriya me bi hevdu her zêde bû, em tiştnên nû hîn bûn. Ji bejna xwe zêde xebernedanê. Pir zêde pêşde neçûyinê. Qedrê yekîtiyê. Em ku derketin, îro nebe sibê... Wekî, qet tiştek nebûyî, gerek em herine ser karên xwe. Ji berê şiyartir, ji berê zêdetir pişta xwe bispêrine hevdu.

Yekî dît ku qise dirêj dibin, çû çay çêkir, hanî. Berê kesî xeber nedida. Niha zimanê giştan vebûbû. Gişta xeber dida. Hinekan digot ku dema çûne gund, çend kesa bişînine ba Ûsiv axa. Em her tiştî ji bîr bikin, bi hevre baş rê herin.

– Ew çiye? Em ku wilo bikin, êdî em nikarin pêşiya wî bigrin. Wê wisa bizanibe ku em ji wî ditirsin, lava dikin. Wê wekî dîkan, xwe gîze veke. Piştî awqas zorbetiya Ûsiv axa, awqas girtîbûnê, îca emê herin xwe bavêjine axê? Wê dîsa bê rê, tu dibêjî? Wê devê Marûfî xwar bihêle û bê, bi were cîraniyeke xweş bike? Ev gişt bêhişîne. Ji aqilê xwe derxin. Wê her jorve binhêre. Kê çû ber derê kê, gerek pir tiştan bide bin lingên xwe. Neyne ber çavên xwe. Çî me maye ku em ji ber çavan dûr bixin? Em ji bo nemirinê dijîn, digot çend kesan û dij derdiketin.

Soro ku cîranên xwe guhdarî dikir, dilfireh û dilxweş dibû. Bi xwe xwe ferq dikir ku ne Soroyê berêye. Ji berê bêtir tiştan dibîne û difikire. Cîranên xwe jî bi vî tehrî dît, lewra pêre şa dibû. Dixwast ku bira hema usa qise bikin. Gişt jî bi evîn û bi hêvî bûn. Rojên ronayî difikiriyan. Bi hevrebûn dixwastin. Hemûyan zanibû ku ev bara ne yê yekî tenêye. Ew, bi cîranên xweve êdî ji berê pêşde bûn. Mîna berê şaş û metel nediman. Kesên wisa, ne gelekî bi aqil û pêşde bûn, lê ji berê baştir bûn.

Tengasî û van perîşaniyê, ewana her baqil kiribûn. Têgihîştibûn. Hînî fikirandinê dibûn. Gelekên wan peyivîbûn. Hema hema wekî hev difikiriyan. Soro xwast ku van gotinan têxe bi rêzekê.

– Feyde tune ku em qala yên ku hatine serên me bikin. Me gelek kişand, emê hêjî bikişînin. Perên me nîne. Yê hebû jî me da abûqat Fihat begê. Bi saya serê Mihê. Ewî ji mere çi kir? Hûn gişt zanin. Niha ne zevî heye ne jî cot. Di destê mede tiştek tune. Zeviyên nû, îsal tiştek nedan. Di hukumatêde jî kesekî me tune. Yên ku destê me bigre, nîne. Me dibistan û xwendin nedît. Hetanî îro jî nezan man. Zar û zêç li ber dîwaran û deriyan. Bi vî tehrî, serên xwe xwayî dikin. Xwedê zane nîv têr û nîv birçîne. Zikên wan têr nabe. Em hela hê nezanin. Tiştekî nizanin. Lê ne wekî berêne. Gerek ku zû neyênê xapandinê. Dema ku dîsa xapiyan, ferqa me û keran tune. Ne wisane çima? Ker bi kertiya xwe, cîkî ku dikevine heriyê, careke din ji wir derbas nabin. Tu cara lingên xwe navêjin. Çilo ku heval dibêjin, em yekîtiyê hîn bûn. Ev ne tiştekî wisa hêsaye. Karê herî zehmet yekbûne. Yek ku di tingije, xirab dike. Yê din pêçîkê davê, xirab dike. An jî merivên axê, tên û xirab dikin. Bi dizî dizî, alê dinre kar dikin. Çima hûn nizanin? Li ba me jî wisa nebû? Emê li ser karên xwe bin. Ku lê nebine xwayî, tiştek bi destê me nakeve. Fatê rast digot, lê gelekên me fem nedikir. Me digot ku jine, kesî guh nedidayê. Ya rastî ew bû ku wê ji me baştir didît û digot. Çi bû, bû. Ya rind emê bê şer û bê qelebalix herine ser zeviyên xwe. Emê erdê xwe hildin û daynin. Bira mehkeme jî di alîkîde bajo. Em qet dendikek genim jî nadine axê. Paşê emê li benda mahkemêbin. Qet kesî jî nedîtiye ku mehkemên wilo neh, deh salande biqedin. Wexta ku axa hat, erdê me ajot, anjî nehişt em erdê xwe biçînin, wê çaxê emê wî ji gund derxin, berdine wî. Rêke dinê nabînim ez. Em ku çûne gund, bi merivtî, bêdeng û bê teşqele emê dest bi karên xwe bikin. Bela xwe di kesî nedin. Kîngê ku Ûsiv axa dest ji me nekişand, emê bi tevayî berî wî din û zeviyên xwe jê bistînin. Ku nebû, em nehatine berdanê, bira canê me saxbe. Em awqasî di hundirde mane, çima

em nikarin qasekê din jî bimînin? Ji bo feqîrên mîna mere, her der yeke. Ferq nake. Yên ku di rehetiyêdene, kevçiyên wan di hingivdene, bira ew ber xwe bikevin. Ya rastî me li vê derê kêf kir.

Hemû keniyan. Soro peyiva xwe nebirî.

– Hûn nanihêrin? Çend mehin, li ser piştê û bê kar, veleziyane em. Hestiyên me hemûyan çer qalind bûne. Qet yek ji me nexweş neket. Wê çilo bibiya?

Roja mehkemê hat gihîşt. Hemû wê şevê di meraq û tirsêde bûn. Rûyên xwe kur kirin. Ji girtiyên din hîn bûbûn. Wê şevê av germ kirin, xwe dişûştin û avdêst digirtin, ku xwedê alîkariya wan bike.

Kinc û pergela xwe dinihêrîn. Gorên nû dixistine piyên xwe. Yên bi sol bûn, boyax tê didan û yên bi çarix bûn, bendê wan teselî dikirin. Kirasên paqiş li xwe dikirin. Yên ku kirasên wan tunebûn, girtiyên dinê alîkarî dikirin, yên xwe didanê. Tendûrekî hevde kesin. Ji wanre kiras, çakêt tivdarek kirin zehmet bû. Dîsa jî di nav xwede, rê birin. Hemû, sibêh zû rabûn. Avdest girtin. Di neynikande xwe mêze dikirin. Di qowişêde diçûn û dihatin. Nikaribûn di cîkîde bisekinin. Kesî ji wanre tiştek negot ku, çima awqas zûtirê hevalên girtî hişyar dikin. Di rojên wehade hevdu dibaxişandin. Di alîkîde jî, tendûrekî him hevde kes bûn, him jî mehkema pêşîn bû û nû dest pê dikir.

Saeta çûyinê hat. Destên du kesan bi hevre kelepçe dikirin. Yê dawiyê, herd destên wî bi hevre. Li dora wan cendirme hebûn. Ji derê mezin derketin. Cara pêşîn bû ku kelepçe li destên wan dixistin. Van hesinên sar, ricaf dida hundirê meriya.

Li der qasekê sekinîn. Fatê jî hanîne cem wan. Bê kelepçe bû Fatê. Li pey wê cendirmekî bi sungî. Bi meraq li hewîr dora xwe dinihêrî. Hate ba gundiyên xwe. Destên wanên bi kelepçe mêze kir. Çar pênc meh bû ku gundiyên xwe nedîtibûn. Çiqas kincên xweşik lê bûn? Ser rûyên wanên kurkirî û bedew bûn... Silav da wan. Hinekan Seyîtxan jê pirsîn.

– Li pey min, gelekî giriya. Dît ku ez bi cendirmê bi sungîve diçim, tifalî xwe peritand.

Rengê Fatê jî dibiriqiya. Hê bedew dihate xuyanê. Van mehên girtî, li hemûya hatibû. Xwe wilo xemilandibû. Kincên wê yên kevn, lê belê paqiş bûn. Di nav cendirmande bi vî tehrî çûyin... Fatê berê sor û paşê sipîçilokî bû. Te digot ku rêvaçûyin ji bîr kiriye. Paşê hêdî hêdî hate halê xweyê berê. Peyre ketine riya mezin, riya sûkê. Li sûkê gelek kesan, li ber dikanan, li kuçan li wan mêze dikirin. Cendirme, kelepçe, awqas girtî û yek ji wan jî jin bû. Hemû kesî meraq dikir. Sûkê

giştî li wan dinhêrî. Seyra wande bûn. Bi dest û tiliyan ew nîşanî hev dikirin û xeber didan. Ewana riya sûkê, ji serîkî heta serê dinê derbas bûn. Wekî paşa û qumandarê wan di pêş eskeranre derbas dibe. Mînanî eydên romê. Çûne qonaxa hukumatê. Mehkeme di qatê herî jêrînde bû. Yên ku karên wan li mehkeman û li qatên dinê hebûn û xênji wan, qelebalixeke giran kom bû. Qorîdor tijî bû, nişkêve. Li wan, ya pir li Fatê mêze dikirin.

Hinekan:

— Ev kîne, çi kirine? digotin. Ji yên dora xwe dipirsiyan.

Hinekan bi nezanî ser milên xwe bilind dikir. Yên ku tiştek zanibûn, bi kurtayî qala wan dikirin.

Di ber derî mubaşir hate xuyanê. Yekî kal û por weşyayiye. Kincên kevn û mibaşiriyê lêbûn. Westiyayî û te digot ku olamiyê dike. Bi dengekî bilind:

— Tahir Yilmaz... Osman Qaya.

— Panzde hevalên wanê dinê...

Sekinî, li kaxiza destê xwe nihêrî.

— Fatma Keskîn.

Cendirman tendûrekî hildane hundir. Saloneke mezin. Wê biçûna ku? Ev oda mezin, tirs û xof dida dilê wan. Te digot ku serma dikin. Gavên xwe bi tirs û piçûk dihavêtin. Çavên wan çilmisî û mînanî kewan li dora xwe dinhêrîn.

Mibaşirê gava dinê, ciyê wan, di nav rêzên darînde nîşan da. Li nêzîkî dêrî, Fatê tenê di rêzekêde bû. Pir kesên bi meraq li dû wan tijî salonê bûn. Lê li alê girtiyayî çepê, cîkî gelek mezin tunebû. Kêm kesan li ser piyan guhdarî û mêze dikir li wî yalî. Salonê gelek kes hilnedida. Hinekên ku nikaribûn têkevine hundir, li ber derî bûn. Serên xwe dirêj dikirin, li van gundiyan dinihêrin. Ev jinika di nav wande çi digere, gelo? Çavên gelekan dihat li ser Fatê disekinî. Fatê di van nihêrandinêde bê kêf bû. Xemgîn û şermoke bû. Serê wê di berde, bi tiliyên xwe dileyst. Hakim li pêş wan, li cîkî bilind rûniştiye. Tiştekî fireh li xwe kiriye, pêsîrên wî sorin û dibiriqin. Ji wî wêde sawcî rûniştiye, li ser wî jî tiştekî wisa heye. Li pişt wan bi herfên mezin hatiye nivîsandinê: «Edalet ruknê milke.» Li bin ciyê ku hakim û sawcî rûniştiye, nivîsdarê mehkemê, li pêş, makîneke nivîsandinêye mezin heye.Porê hakim kin hatine birînê û dora wan êdî dest bi gewrbûnê kiriye. Rûyê wî gilover, çavên hêşîn lêne. Dosye û kaxizên pêş xwe tevdida. Li pêş sawcî du kitêbên qalind û yên nû hatî mêze dikir.

Hakim tiştin bi nivîsdar da nivisandinê. Girtiyan fem nedikir, çi dibûn. Paşê li wan vegeriya:

— Li gundê we, cîranê we Marûf heye. We ewa birîndar kiriye. We xwastiye ku wî bikujin. Raporên wî hene, ji nexweşxanê. Sê meha ji karê xwe bûye. Alîkî devê wî kişyaye. Lewra ji bo we, ceza tê xwastinê.

Lê berî van gotinan, hakim, yek û yek kî kiye da nivisandinê. Jin, zar, dê û bav, gundên wan. Kesî tiştek fem nedikir. Rûyên hakim dinihêrîn. Hakim ji nav kaxizan têlgrafek derxist û xwand. Da nivîsandinê. Ji abûqatê wan, Fihat begê dihat. Li cîkî dinê mehkema wî hebûye, lewra nikare bê. Mehkema dudade, wê li vir bûya.

Hakim, yê herî sêrîde rûniştî, Tahir rakire ser piyan. Ji lêxistinê, diranê wî hatibûne şikestinê.

— Kurê min, te bihîst ku min çi got? Tu çi dibêjî? Çilo bû, ji minre bêje. Te eva sûca kir an nekir?

Tahir li dora xwe nihêrî. Alîkarî digeriya. Kire bilde bild.

— Na xêr begê min. Kesî nexwast ku Marûf bikuje, lêxe. Min jî lênexist. Wan zeviyên me jî destên me girtibûn. Dixwastin ku dewsa dibistanê, ew ciyê başî li pêş gund jî bajon. Bi traktorê dest pê kirin. Gundî bi tevayî, dil kirin ku nehêlin û wan ji zeviyê derxin. Bi kevir û daran çûne ser. Ez jî hebûm. Kevir dihavêtin. Paşê ew birîndar bû.

Hakim gotinên wî bi rêz û rind, bi nîvîsdar da nivîsandinê. Paşê:

— Darê kê, kevirê kê lêket, tu dibêjî? Te nedît?

— Na xêr min nedît. Herkesî tiştek dihavêt. Gundek hemû. Ez nizanim, begê min.

Paşê jê pirsî, cendirme kîngê hatin? Birîndar çer şandibûne bajêr? Peyre ew da rûniştandinê û gotinên Tahir yên berê, careke din jî xwend. Berê jî wekî niha xeber dabû. Hakim vê carê:

— Hûn çima neçûn, we ew şîkat nekir? We çû lêxist. Kê ji were got ku lêxin?

— Na xêr begê min. Qet kesî jî negot. Hemû bi xwe serî xwe hatine wir. Me ji bo erdê xwe Ûsiv axa dabû mehkemê. Lê tiştek jê derneket.

Li vê derêde xwe şaş kir. Wê çi bigota? Bê tivdarek bû.

— Li piştî zeviyên gundiyan, ciyê dibistanê ku ajot, gundî tamîş nebûn.

Osman li cem Tahir rûniştibû. Dît ku çilo têne mehkeme kirinê, tirsa wî şikest û kêm bû. Ew şaşbûna li ser, çû. Hakim, ji wî jî ew tişt pirsîn. Bersiv wekî hev bûn. Paşê gotinên berê dixwand û derbas dibû.

Yên ku bi meraq guhdarî dikirin hêdî hêdî kêm bûn. Mehkeme zû dimeşiya. Hakim jî dilxweş bû. Gelekî nediwestiya.

Dor hate Fatê. Yên guhdarî dikirin, her ker bûn, li alê wê dinihêrîn. Nîvro bû. Dev, zimanê Fatê zûha bûbû. Li gundê wan bi mêranre qise kiribû. Fikrên xwe gotibû. Lê, wê di nav van bajariyande çilo xeber bide? Çîpên wê diricifiyan. Hişê wê diçû. Lê bû ku bikeve. Bi zehmet li ser piyan disekinî.

— Tu çi dibêjî keça min? Binihêre, ji bo te, çi dibêjin, çi ceza dixwazin. Te jî çûye, lêxistiye. Te jî Marûf birîndar kiriye. Wisane?

Ew gardiyanê kal, gotinên wê dizivirandin. Wer bersiv da:

— Gundî hemû li wir bûn. Di bintara rê, di zeviya dibistanê. Hinekan diqîriyan. Hinekan kevir dihavêtin. Jin, mêr, zar hemû li wir bûn. Ez jî.

— Bêje te jî bi keviran, bi daran lêxist? Çilo bû?

— Piranî kevir dihavêtin. Min jî kevir havêt. Awqas.

— Ew kevirên ku te havêtin, li Marûf ketin an na?

— Ez nizanim. Xwedê zane, lê ket an na.

— Waxta ku te kevir havêtin, ew li ser piya bû an li erdê bû?

— Ew li ser piyan bû û berve gundiyan dihat.

Piştî çend pirsiyarên wilo, gotinên wê jî xilas bû. Dawiya gotinên herkesî, hakim li alê sawcî diziviriya. Ewî jî serê xwe bilind û îşaret dikir ku tu pirsiyarên wî tunenin.

Şahid nehanîbûn. Hakim texmîn nekiribû ku gotinên girtiyan yên wisa zûtirê bimeşin. Li kaxizan nihêrî. Di ber xwe, gotinên şofêrê traktorê xwend. Nedigot ku sûcê kêye. Gotina axê hanîbû cî. Şofêr ji hinekan bihîstibû ku ev zeviya kevir lê kom kirî, berê dibistan wê lê bihata çêkirinê. Paşê dev jê berdabûn. Lê Ûsiv axa ku jêre gotibû wir jî bajo. Kê li Marûf xistibû? nedizanî.

Jina Ûsiv axa jî wilo. Di serde digot ku Soro xwastibû Marûf biparêze. Bi qelemê bintara van rêzan cixîz kir. Nîşan da bin. Xulaman kin û kurt xeber dabûn. Di wirde jî tiştek nedixuya.

Ûsiv axa sûc dihavête ser hemû gundiyan. Yên pirin jî evanên girtî. Van kurê wî birîndar kiribûn. Fatê gundî dişande ser axê. «Hûn bi merîkîre seredariyê nakin. Hûn çito mêrin?» digote gundiyan. Hakim di dilê xwede qerarê xwe da. Wê gundî hemû berda. Mehkeme bira negirtî bê domkirinê. Gune bûn. Çima awqas kesî di hundirde bigre?

Gundî hemû derxistine der. Paşê dîsa hanîne salonê ku hakim qerarê xwe bixwîne. Hakim dixwend, lê kesî tiştek jê fem nedikir. Di dawiyêde «ji bo hanîna şahidan, mehkeme maye filan rojê, hemû girtî

hatine berdanê...» Ev der fem kirin. Çavên wan dibiriqiyan. Hemû şa bûn.

Hakim, sawcî, nivîsdar derketin, çûn. Wê çaxê bi hevre xeberdan. Lêbûn ku bifirin. Rûyê Fatê bi şabûnê sor sor bû. Di çavên wêde du, sê dilopên şabûnê hebûn. Bi destên xwe, çavên xwe zûha dikir ku Soro hate cem.

— Dibe ku tu digirî, xwuha Fatê?

Mibaşir çav rohnayî dida wan. Cendirme jî, bi wanre kêfxweş bûn. Gıştan tendûrekiya hez dikirin. Dijî yekî zordest bûn. Awqas derd lewra tê serên wan digotin di nav xwede. Wan jî Soro û yên dinê pîroz kirin. Nivîsdar vegeriya hat û çav rohnayî da wan. Ehmed, ewê ku di maliyêde memûr, çend caran hatibû, mehkeme teselî kiribû. Neçû xwarinê, li hêviya wan mabû. Tendûrekî pîroz kirin.

Cendirman nizanibûn ku wê destên wan dîsa kelepçê xin an na? Sawcî ji oda xwe derdiket. Zivirî:

— Naxwaze. Naxwaze. Mêrikan hatine berdanê. Wê tu birevin.

Niha dîsa ew kesan, vê carê bê kelepçe di nava sûkêre, serêjêr diçûn. Lê bi lez û nîv rev. Gavên wan şidyayî, zexm. Te digot ku diçin mizgîniyê bidine hinekan.

Ji gundên wan kêmasî bîst kes hatibûn. Lê dereng mabûn. Rêde, hespê yekî xûlî bûbû. Çivîkek ji nav çirpiyan firyabû. Hesp veciniqî û xûlî bûbû. Cîranê wan li erdê ketibû. Hesp reviya û cîran di nav êşêde mabû. Çend kes li pey hespê ketibûn. Ji pare, çend rêwiyan alî kiribûn û hesp girtibûn. Ji ber êşê, hevalê wan dereng mabûn. Girtî ku ji mehkemê derketin, gundiyên wan gihîştinê û xeber bihîstin. Hevdu hemêz kirin.

Te digot ku Fatê rêve naçe, difire. Rêde, Ferzende li gund, Seyîtxan li girtîgahê, li ba hevalên wê, xênji wan tu tiştek nedihate bîrê. Niha ji meraqan terqiya Seyîtxan. Kî çi zane çiqasî li pey min giriya digot di dilê xwede.

Sûk qedya û ketine riya girtîgehê. Nobedar bi sungî li ber qilûba xwe dihate xuyanê. Di paşve, girtîgeha jinan tê dîtinê. Li pış wan jî, dûrve, çend malên nû çêkirî. Pirî, yên ku nû hatine bajêr.

Wisa zexm li deriyê derve dixistin ku... Te digot ku wê bişikênin. Ji alê dinê, gardiyan bi mifte derî vedikir, lê kesî dengê wî nedibihîst.

— Lawo bisekinin. Hûn terqiyan, çi bû? Ez zanim, ez zanim. Hûn berdane. Wisa nebûya, destê we ranedibû ku hûn li dêrî xin.

Li pey hev ketine hundir. Lê bûn ku gardiyan bidine ber xwe û bi xwere bibin. Yên ku xurek çêdikirin an jî dixwarin, nîvcî hiştin û komî

dora wan bûn. Hinek, wan hemêz dike, hinek destê wan digre. Sergardiyan û nivîsdarê girtîgahê jî ji ser xwarinê rabûn. Hatin û ew pîroz kirin. Hemû bi hevre şa dibûn, Çend kesan pirsîn ku «çilo bû?», «kes ji gundê we hatibûn?», «axa jî hatibû an na?», «hakim baş bû?». Di pey wan, tendûrekiyên cîranê wan gihîştine girtîgehê. Nivîsdar kaxizên berdanê kire nav ewraqan. Deftereke mezin vekir û qîrya:

— Zû, zû. Tivdarekên xwe bikin. Bese hûn di hundirde man. Derve, li hêviya wene.

Tendûrekiya di lezekêde nivînên xwe pêçandin. Kiras û kincên ji hevalan sitandibûn, ji xwe kirin. Didane xwayên wan û henek dikirin.

— Meriv ku hespê xelqê siwarbe, paşê zû peya dibe.

Tiştên xwarinêyê mayî dane hevalên xwe. Yê pir jî Bekir û Xalis hildan. Te rûyên wan herdu hevalan bidîta. Kesek çawa him şa dibe û him jî bi ber xwe dikeve... Wekî sêveke du nîvî. Ji bo berdana dostên xwe şa dibûn. Lê, wisa hînî wan bûbûn ku ji biran jî zêdetir. Hine tiştên xwe, ji girtiyên feqîrre hiştin. Hinek girtî pir şa dibûn. Mînanî ku ew bi xwe hatine berdanê. Lê kes nizane ev çiye. Hinek jî, ber ku di hundirde diman, dilxemgîn bûn. Di dilên wande janek hebû. Ne mînanî çavnebariyê. Lê dîsa jî şa nedibûn.

An ser binê girtîgehê li tevî heve. Hevde kes karê xwe dikin ku herin. Yên mayî li der dorê wanin. Hev hemêz dikin, maç dikin, destên hev digrin. Ji hev diqetin. Nîv saetî girt, xatir xwastina wan. Destê sergardiyan maç kirin. Soro ku ji gardiyanê qelew û terikî xatir xwast, hine pere kire berîka wî. Ne pir zêde bû. Lê, di destê wande tunebû. Edet wisane. Nivînên xwe li ser êşîga derîre kaş kirin û derxistin. Ev jî edeteke dinêye. «Careka din nezivirin û nekevine girtîgahê», mena wê eve.

Li pêş girtîgehê wekî dilan û dawetêye. Bi hevre bûne nêzikiya çil merî. Hevdu hemêz dikirin û şa dibûn. Yek dihiştin, diçûne cem yekî dinê.

Xwarziyê Soro ji alê girtîgeha jinan dihat. Nivînên Fatê havêtibû ser milên xwe. Tiştên dinê di destde bûn. Di pey wî Fatê dihat, destê wê di destê Seyîtxande bû. Li pişt diziviri û li hevalên xweyî mayî dinihêrî. Çavên wê bi hêsir bû. Seyîtxan hemêz û maç dikirin cîranan. Wek biran, bi dostî halê Fatê dipirsiyan. Yek ji wan:

— De ha, zû bikin. Xeberdanê bihêlin. Em têkevine rê, got.

Hine nivîn li hespan kirin. yê dinê jî, wê bi dor hilgirtana. Elî bi du hevalanve, wê biçûna bajêr. Nan, penêr û tirî bikirîna. Li ser kaniyê, rêde, wê bi hevre bixwarana. Ji sibêde birçî bûn, tiştek nexwaribûn.

Wek têne dawetê û dîlanê. Wilo hatine gund. Tarî zûve ketibû erdê. Vê şeva payizêde, te digot ku koçên koçera bi rê ketine. Bi deng bilind xeberdan, henek. Hinek di bin barande xwûh dane. Ku hatine gund, nava qasekêde hemû li ser piyan bûn. Jin, zar, hemû kes hişyar bûn.

Fatê, Seyîtxan û Elî ku hatine ber derî, gelek caran li derî xistin. Elî derkete ser xanî û di kulekêre ban kir:

– Xaltiya Zelêxan. Xaltiya Zelêxan. Dêrî veke.

Derî da vekirinê. Kirasê wê fireh û dirêj. Xwe bi dîwêr digirt. Destê wêde lemba niftê. Xaltiya Zelêxa derî vekir. Porê wê bela bela bûyî. Çavên wê, ji xewê venedibûn. Vê şevê ev kîne? Dengê Elî nas kir.

– Elî tu yî? Xêre înşalla?

– Veke. Veke. Xêre xaltiyê. Xêre.

Lembe bilind kir û li pişt Elî, Fatê û Seyîtxan dît.

– Way... Way... Hela lê. Hela lê.

Destên wê diricifiyan. Heke ku Elî negirta, lembe li erdê diket. Serê Fatê da ber sînga xwena şêst salî. Bi şabûnê, nizanibû çi bike.

– Way keça mina delal. Way ronayiya çavên min. Way delaliya min. Qîza mina dijwar.

Li alê Seyîtxan zivirî. Rû, dest û porê wî maç dikir. Bi şabûnê, nikaribû bipeyive. Yek radimûsa û paşê diziviri yên din. Waxta ku tev çûne hundir, Elî nivîn û boxçê wê danî erdê.

Fatê hela hê li derve fem dikir ku mala wê di rewşeke başdeye. Li ber derî wisa dixuya. Dema ku çû hundir, dît ku wisane, raste. Ji qelebalix û dengên wan, Ferzende nîv hişyar bû. Çavên wî rind nedihatine vekirinê. Diya wî:

– Ferzende. Ez qurban. Ez heyran. Hela mêzeke. Binhêr, kî hatine?

Dengê diya xwe nas kir. Rabû, hat, xwe havête hemêza wê. Ferzende di hemêza diya xwede. Seyîtxan destê birayê xwe girt. Rêde hema usa xewa wî dihat. Niha piçekî li ser xwe û hişyar bû. Destê birayê xwe bir çû li ser lêv û rûyê xwe. Ferzende hate jêrê. Ew û Seyîtxan, destên wan di destê hevde, çend gav ji diya xwe wan dûr ketin. Ku karê Elî nemabû êdî, destûra xwe xwast û çû.

Rojtira dinê di gundde şênî hebû. Di dawet û dîlanande jî ne wisa bû. Hemû, ji zaran heta kalên nava ciyan, jî dilşa û kêfxweş bûn. Çav ronahî didane hevdû, pirsên şêrîn ji hevre digotin. Li ber deriyan, li bin dîwaran û li ser kaniyê. Li her derê. Diçûne malên hev, tev dixwa-

rin, tiştên şêrîn dişandine malên hev. Li malekê rûdiniştin, xeber didan, paşê diçûne maleke dinê.

Vê demê, li mala Ûsiv axa, bêkêfî û dilnepakî hebû. Nîvê şevê, merivên wî, berdana girtiyan û hatina wanê gund ji Ûsiv axare gotibûn. Wekî îsotê tûj bû. Lê bû biterqe. «Van bênamûsan çend mehan di hundirde bigre û paşê berde. Qet meriv pêre serederiyê dike êdî. Wê her bêtir har bibin», digot di dilê xwede. Kurê wî van roja qet nedihate kişandinê. Jina wî jî pirsên sar û tel digot car caran. «Xwedê bela we hemûyan bide. Ez li ber çavên we gişta, wekî kelemekîme», digot Ûsiv axa. «Kurê kûçikan, ji minre Îran zevt kirine. Sibê ji teşexuza wan nayê derbas bûnê. Wê şewqê xwe bidine alîkî. Dibe ku pirsa jî, ji minre bêjin. Ya ne baş ewe ku êdî ji girtinê jî natirsin. Min da kutanê, nebû. Da girtinê nebû.» Xewa wî revî. Heta sibê li alê çepê zivirî, gundî hatine pêş çavan, alê rastê zivirî dîsa ew gundiyan hebûn. Berbanga sibê ku raza, wê çaxê ji gundiyan xilas bû.

Cîranan fedî dikirin ku diranê Tahirî şikestî bipirsin. Neynûka Soro vê carê xilo xwarî derketibû. Soro û Tahir ew zûve ji bîr kirin. Ew rojên berê, niha gelekî dûr bûn.

Jina Soro wê şevê, neynûkê mêrê xwe mêze dikir û destê wî bire ser ruyê xwe û giriya. Gelek tişt bihîstibû di derheqê tiliyên Soro.

– Xwedê ji wanre nehêle. Bira gişt qurbana tebin, got û xwe nêzî mêrê xwe kir.

Paşê, rojên dinê, hemû çûn ser karên xwe. Ji gundên der doran, dost û nas hatine dîtina wan. Tendûrek bi çendekî şa bû. Kalikê Şakir gelekî kal û pir ser xwe nîn bû, lewra nehat. Neviyê xwe şandibû mala Soro. Şekir û çay kiribû heqîwa neviyê xwe. Sibê hat û êvarê vegeriya neviyê wiyî xort. Ji gundê Cemal û Zubêd axa kes nehat. Gundên dora wan hatibûn çend kes. Wan ji tendûrekiyanre digot ku li hatinê, pêş êşre derbas bûne. Ji gundên Cemal û Zubêd axa jî, hine gundiyan silavê xwe şandine. Wilo nîşan dida ku ji Cemal û Zubêd axa ditirsiyan. Çav ronayiyên xwe gotibûn.

Hinekan wisa zanibû ku ev bêdengî û bê bûyerî wê wilo here. Pirên jî yên ku nehatibûne girtinê, texmîn nedikirin ku Ûsiv axa derdên nû derxe. Lê Soro û hevalên din ne wer bûn. Şika dilê wan roj bi roj zêde dibû. Îro an jî sibê bûyerên nû texmîn dikirin. Rewşa gund, van pênc mehan, çilo bû? Yek bi yek hîn bûn.

Xalê Mihê derneketiye nava gund. Li rûyê kesî nenihêriye ji şerma. Cara pêşîn jî, çima wisa nekir? Qet navê wî abûqatî jî nebihîstibûn. Wî ew birin û pere dane abûqat Fihat begê. Tu cara rêke baş bi gundiyên

xwe nîşan nedabû. Fatê roja pêşîn dij derket, lê kî guh dide pirsên jinan? Paşê ku hertişt li tevî hev bû, xalê Mihê fedî kir û li gund nema. Riya bajêr da pêşiya xwe. Kesî texmîn nedikir ku piştî vê çûyinê, xalê Mihê bijî. Li bajêr kî qedir, qîmet dide wî? Kar û perê wî jî tune. Tiştek ji destê wî nayê. Li bajêr qîmet didine kûçikan, lê nadine kesên awha. Merivekî kal, awqasî tamîş nabe. Wê ji qehran bimire.

## –XXXIX–

Ûsiv axa êdî zeviyên gund hemû, yê xwe hesaw dikir. Hinek ji wan hêrg kiribûn, çandibûn. Mînanî zeviyên dinê, yê gundiyan, îsal tiştek hilneda Ûsiv axa. Yê mayîn, îsal hêrg kiribûn. Perçek, dudên piçûk mabûn. Birîndar bûna kurê wî û karên dinê nedihîşt ku her tişt di riya xwede here. Lê meriya dikaribû niha bajo û dema ku berf rabû, genim bavêje.

Zeviyên gundiya gişt bi tevî hev kiribû. Bûne zeviyên mezin. Tendûrekiyan ku li zeviyên xwe dinhêrîn, dilê wan dixeriqî. Serda jî tu hidûd di nav zeviyande nemabû niha. Berê, ji bo bihustekê qîyamet radikirin, mêr dikuştin. Lê niha? Hidûd, midûd tiştek nîn bû. Zeviyên bê hidûd. Mena vê eve ku zevî tunenin. Tiştekî we êdî têde tune.

Paşê ev bêhêvitiya wan dîsa winda dibû. Axa çiqasî jî zeviyên wan tevî hev bike, meriya dikaribû ciyên xwe nas bike. Bi salan li ser kar kirine, pêre dest, piyên xwe tîş tîşî kirine. Hemûyan yên xwe bihust bi bihust zanibûn. Hema bira bi destê wan bikeve bese. Gav bi gav, evleg bi evleg, wê nas bikirana. Meriv keda destê xwe çawa ji bîr bike? Xwîya eniya xwe rêtiye. Meriv nexerîwê erdê xweye. Weke meriv li bûkekê, li keçeke xama dinihêre. Wisa li erdê xwe nenihêribûn tendûrekiyan? Lewra, çavên xwe bigirtana jî, herkesî ciyên xwe baş nas dikir.

Lê Ûsiv axa... Ji bo van zeviyan, bi hemêzan perê wî çûbûn. Kurê wî, di ber çavên wî, lêbû bihata kuştinê. Birîndar û nîvcî mabû. Rewşa mala wî nemabû. Jin, zarên wî li ber çavan reş bûbûn. Ji hemûyanre mene didît, diêşand û diqîriya. Tu tama xwarin û vexwarinê pêre nemabû. nedixwast ku rûyê gundîkî bibîne. Te digot ku xwe bi xwe kiriye girtîgehê. Mala wî ji malan dûr, xênji çend xulam, şofêr û du, sê biraziyên xwe kes nedidît. Cara ku diçû bajêr, hinekî bîhna wî vedibû. Rojên dinê, mînanî hev bûn. Tu guhartin nîn bûn di vê jiyanêde. Di gundekîde, lê di dinêne dinêde dijiyan herdu alî jî. Bedena Ûsiv axa ne mîna berê bû. Bê xisyet û pir tamîş nedibû êdî. Tilyên wî qut bûn.

Bîhntengî û êş dikete sîngê wî. Dilê wî caran pir zêde lêdixist. Gelekî aciz dibû. Dema ku ber xwe diket û diqehirî, êşeke giran li ser milê çepê dest pê dikir. Dest û tiliyên wî diteviziyan.

Car caran xwe jî, ev rêya ku girtiye, qawîl nedibû. Nedikete hişê wî. Rewşa wî çi baş bû. Berê, gotineke wî nedibû dudu. Xazila qet weha nekira. Wisa difikirî, lê pênc deqîqa şûnve, te digot ku destê wî dişewitî, xwe şûnve dikişand. Van fikran ji bîra xwe dihavêt. Tobe û îstixfar dihanî. Yekî bidîta, wê bigota ku Ûsiv axa dîn bûye, xwe bi xwe xeber dide.

Êşeke canê wî jî ew bû ku bi Zubêd axare li hev hatibû. Bi mehan, li her deran ev kara hatibû xeberdanê. Tu karek jî jê nedîtibû. Eşo du sê cara gulle havêtibûne gundiyan. Qet telaşa kesî nîn bû êdî. Çima xwe gazî Eşo bikira, çend paqnot pere bidanê, Eşoyê dîsa wisa nekira? Him jî mîna keran. Paşê Ûsiv axa dîsa poşman dibû. Min rind kir. Him jî gelekî rind. Mînanî poçika golikê ne kin dibûm, ne dirêj. Gundiyên bajon û biçînin. Paşê yên bînin para min bidin. Qet nabe tu tiştî. Kurên xelqê bi makînan kar dikin. Maleke wan li bajêr û yek li gund. Ez di Tendûrekê, vanên bê dîn, bê îmanve ketime xelayê. Na lo. Na lo. Ev ne tu kare. Min ya herî rind kiriye ku dersa wan daye wan. Niha wê herin li ser qûna xwe rûnin. Him jî wekî kûçikan. Wê hîn bibin ku dinê çiye. Kî bela xwe digere êdî? Çima dîn bûne? Hela bira saleka din jî zevî mînanî îsal tiştekî nedin. Qet yek jî namîne li gund. Wê revî revî herin. Pişt xwe jî nanihêrin. Evana hemû di hişê wîde tevî hev bûn.

Dixwast ku van roja xeberê bide gundiyan, para xwe, dehan yekê xwe bixwaze. Gerek wan wisa nede hînkirinê. Îsal nebe, wê saleke din xwe li erdê xin, heqê wî nedin. Bira kêmbe. Çi dibe bira bibe. Lê bira heqê wî, li ser wan nemîne.

Van rojên havînê hênik û şêrînin. Germa havînê ya ku meriyan difetisîne tunebû êdî. Fêkî pirin, kar her diçin kêm dibin. Dawetên xort û keçan, van rojan tê kirinê. Heftê carekê, deh roja carekê dengê def û zirnê tê, ji gundên cîran. Tên gazî hevdu dikin. Du salin li Tendûrekê def, zirne bi dil nehate lêxistinê. Yên ku keç û kurên xwe dizewicandin, dîlanên bê mesref dikirin. Pirê wan feqîrin. Her bêtir feqîr bûn van du, sê salande. Tu rojên xweş û rehet nedîtin ku van di salên dawiyêde, îca serde dîlanê çêkin. Mesrefên giran dixwast tiştên awha.

Bi şevan sar dibû êdî. Berve êvaran ezmanê hêşîn her diçû tarî û gewr dibû. Meriya qêmîş nedikir ku mêze bike. Kesî nikaribû êdî, wek havînê, li ser xaniyan razê. Merî diricifî. Gelek gundiyan tivdarekê zi-

vistanê dikirin, kêmasiyên xwe dihanîne cî. Bi dilnerm dest vê payizê kirin. Lê qet halekî başde nîn bûn. Gelo çima van rojan wilo bi kêf û dilgeş bûn? Ji zeviyan tiştek hilnedabûn. Gundiyên wan bi mehan di girtîgehêde mabûn. Lê hemû bi hevre hatibûn. Dostî û baweriya wan ji berê zêdetir bû. Hêvîke mezin di dilê wande hebû. Bi van halê wan, hemû gundî kêfxweş dibûn. Lewra wisa dilfireh û rehet bûn. Hemû cîran mînanî malên xwe, diçûn, dihatine malên hev. Tev dixwar û henek dikirin.

Di alê gundiya çiqas kêfxweşî û rehetî hebû, di alê Ûsiv axa jî awqas diltengî, nerehetî hebû. Ev gundî dixwazin ku min biterqînin, lewra wisa dikin, bi ken û kêfin digot, Ûsiv axa di dilê xwe de. Ev xêr naxuyanê.

– Kurê keran. Kurê kûçikan. Tu dibêjî ku ji hec hatine. Wilo bi kêf û bi kenin, digot.

Van du salande êdî devê Ûsiv axa şewitîbû. Heywanên xwe bi du caran dida jimarê. Xulam û şivanên xwe şîret û hişyar dikir. Traktor li ber dêrî, li ciyê xwe disekinî. Du kûçikên mezin û har ji ber dêrî nediqetiyan. Tirsa gundiyan ji dilê wî dernediket. Li ser xwarinê tirs. Razanê tirs. Tirs û tirs. Odêde, ciyê xwe ji pencerê dûr, li quncikande radixist. Hertim çavên wî berve pencerê bûn. Ku biçûya cîkî, diziviri li pişt xwe û li dora xwe mêze dikir. Caran jî ji hukumatêre dida xebera. «Çima lênaxe, wan dernaxe? Ez jî xilasbim, hukumat jî.» digot.

Ûsiv axa Şukriyê nobedar şande cem gundiyan.

– Here hemû malan. Heta niha zeviyên min ajotin, çandin û hildan. Nehanîn û heqê min nedane min. Bo ku ez zeviyan bidime wan, lava kirin, hustiyê xwe xwar kirin. Ji ser xermananre awqas wext derbas bû. Hela hê tiştek nehanîn. Îsal zevî ne rind bûn. Ez jî zanim. Çi hatiye, ez jî awqasî dixwazim. Heqê min çiye, awqasî. Îsal mîna par nîn bû, lê dîsa jî çandin û hildan. Ji giştanre bêje. Bêje ku Ûsiv axa wer digot.

Karê Şukrî zehmet bû. Dema ku diçû cem gundîyan, li rûyê wî nedinhêrîn. Te digot ku bîzên wan tê. Kesî, «hela were rûne» nedigot. Silava xwedê nedidane Şukrî. Ji bo dardekirinê, meriv çilo naxwaze nêzî bendê xeleq bibe, Şukrî jî wilo nedixwest here ba gundiya. Lingên wî nediçûn. Hat berderên cîranên xwe:

– Çiye Şukrî, dîsa çiye?

– Qet. Tu tişte tune cîrano. Xwedê ruhê min nesitand û ez ji vê nobedariyê xilas nebûm.

– Bêje. Bêje. Vê carê çiye?

— Ûsiv axa dibêje ku zevî xwastin min da wan. Zeviyên nû çêkirin. Paşê çandin. Nehanîn, heqê min nedane min. Kêm an zêde, çiye heqê min, bira bînin bidin. Dehan yek kod nîne? Nîv kodbe jî, ez heqê xwe dixwazim. Wisa dibêje.

Ew deriyê pêşîn bû. Cîranê Şukrî qasekê sekinî. Nedixwast ku hêrsa xwe nîşan bide.

— Şukrî, ev axê te, qet fedî nake gelo? Şerm nake? Me çi hilda ku em çi bidine wî? Meriv hewekî şerm dike. Me toximê çandî şûnve hilneda. Hela ka emê îsal çi biçînin? Bê toxim mane. Paşê, ew ciyên ku me ajotine, ji ku yên Ûsiv axane? Erdê gund tevayîne. Ciyên ji bo çêra heywanan bûn. Heywanên gund. Me pêre çermê bedena xwe qetandin, ajotin, kirine zevî. Niha jî te dişîne ser me, bira para min bidin. Ji wîre bêje ku tiştekî minî bidime Ûsiv axa tune. Hebe jî nadim. Jêre wilo bêje. De, tu li ser seran, ser çavan hatî.

— Birabe cîrano. Çi gunehê min heye? Ji min gotin. Dayin û sitandin di nava we û Ûsiv axadeye. Ez di navde xirab dibim. Gunehkar dibim.

— Na. Na. Çi sûcê teye? Kî wisa dibêje? Na xêr. Tiştekî wilo tune. Ew te dişîne.

Wexta ku Şukrî sebebê hatina xwe got, li mala cîranekî dinê, lê bû, bê kutanê.

— Tu jî, Ûsiv axa jî. Hûn wekî teyrên cendekxwurin. Mirî jî, ji destên we xilas nabin. Li dora cendekên mirî digerin hûn. Vê carê ji were, qet tiştek tune. Teyrên cendekxwurno. Çi gû heye ku Ûsiv axa bêpar maye? Birçîbûna me ne besî meye çima? Ji axê xwere bêje, bira mîna merivan di ciyê xwede rûnê. Dewa çi heqî dike? Heqê wî tiştekî dinêye. Tu jî hê ku serê min nehavêtiye, dûrkeve. Biteyse here. Bicehme Şukrî.

Şûkrî cîranê xwenî tir cunî, rind nas dikir. Pêre henek nedibû. Tu li ber daynî nabe, li serre bigrî nabe. Bêdeng, ku mala wî terikand rûyê Şukrî nedihate naskirinê. Ev çi bela bû? Nedihate kişandinê. Van cîranên dînok, çima ji wî diqehiriyan? Çima tu ez ji xwere dixwazim? Lo xînzîrno, dîsa ezê bidime pişta xwe, bikişînim. Kişandina li enbarê jî, hustiyê mine. Ezê di binde biricifim. Çima ez bi kêfa dilê xwe tême cem we? Şukrî him diqehirî û him jî wilo difikirî. Wexta kû hate ber derê Fatê, ewê di hewşêde, nava teyştekêde serê Seyîtxan dişûşt û Ferzende jî av lê dikir. Fatê serê xwe bilind kir, Şukrî dît. Sawûn di serê kurê xwe dida. Ji Ferzende re:

— Avê lêke, kurê min, avê lêke, got.

Alîkîde karê xwe dikir, li alê dinêve Şukrî guhdarî dikir Fatê. Pişta xwe rast kir. Diêşiya. Destên xwenî şil dane ser pişta xwe.

– Here Şukrî. Tu jî dewsa birayê minî. Here jêre bêje ku... Fatê dibêje ku ez qet kîrê kurê xwe jî nadimê. Ew hew dizane ku me vê kûçelaniyê, vê rezîltiyê hela hê ders negirtiye? Ew derbas bûn. Ew çûn. Ez libek genim jî nadime wî.

Seyîtxan çavên xwe miz didan.

– Dayê. Dayê ez cemidîm. Avê li minke.

Şukriyê nobedar bi heftê heft pêşiyên xwere tobe dikir. Careke din jî tevî karekî weha nebe. Pirsên wekî jehrê bihîstin îro. Tû bikirana li rûyê wî, ji wêya baştir bû.

Bi ya Şukrî, Soro ji hemûyan nermtir bû.

– Hela were Şukrî. Çawayî? Başî?

– Saxiya canê te dixwazim Soro. Başim vê gavê. Çima tu nizanî? Halê me wekî halê kûçikane. Ku tu ji min bipirsî, ji halê kûçikan jî xirabtir. Ne şev heye ne jî roj.

– Ber xwe nekeve. Jiyan hemû wisaye. Yê me hemûyan jî mîna te. Çi ferqa me heye? Ûsiv axa çawane? Lê Marûf?

– Ew jî başin Soro. Di karên xwedene.

Paşê sekinî, wê çi bigota?

– Marûf li male. Başe. Ne di nav ciyandeye, lê dernakeve der. Pir ber xwe dikeve. Devê wî hatiye kişandinê. Nikare xeber bide. Tu bibînî, gunehê te jî wê pê bê. Wisa perîşane ku.

– Raste. Ku ez nîn bûma... Xilasbûna wî tunebû. Dîsa jî bavê wî yê bê îman, her tişt ji min dizanî.

– Jina wî, ji tere dua dike. Çend caran min bi xwe bihîst. Soro nebûya Marûf kuştibûn, digot.

– Çi dixwaze van rojan? Dixwaze ku em ji gund derên? Qet hişê kê hildide? Qet em gund dihêlin û diçin? Berê diçûn, lê ji vir ha, bawar nakim. Qet yek jî naçe. Tu dev ji van berde. Zeviyên te jî îsal tu tişt nedan. Axa ji zeviyên kevn dane te. Lê dibêjin ku te jî kêm hildaye. Ber xwe nekeve. Ev qedera me gundiyan wehaye. Zikê me têr nabe. Zevî û mêrg başin lê heywan dimirin. Anjî heywan başin vê carê zevî bêxêrin. Tu dinihêrî hemû baş diçin, îcar sêlaf tê, bi erdêre dike yek. Ji alîkîde tiştek tê ji bo zirarê. Hela tu bêje. Bo çi tu şandin? Got û cixarek dirêjî Şukrî kir.

Şukriyê nobedar, ji wîre jî got, wekî cîranên dinê. Soro bi nîvken, cixara xwe kişand û neynûka xwene xilo xwarî nihêrî. Ewa ku li qere-

qolê kişandibûn. Te digot ku ana dîsa ji kokêve kaş dikin. Wisa dihate bîra wî.

— Gotinên min ne ji bo tene. Nexeyide. Hilnede ser xwe. Îro tu qasidî di nav mede. Bi van gotinan, wê kê bixapîne? Çima tu ji kîsê bavê xwe zevî dane me? Heta îro, ew deran ji bo çêra heywanên gund bûn. Ana me kiriye zevî. Ewî dixwast ku em wan deran vekin, kar bikin û têxine zeviyên bê kevir û kuçik. Paşê jî bê, li zeviyan bibe xwayî. Wekî zeviyên dinê. Ne ji zeviyên berê û ne jî ji vanên ku me nû kirine zevî, em bihustekê jî nadine wî. Bira herkes bi edeb û namûs, li ser erdê xwebe. Van gotinên min, wisa jêre bêje. Bêje ku gundî qebûl nakin. Heqê axê ne li ser zeviyên kevn û ne jî li ser zeviyên nû hene. Bira em yên xwe ew jî yên xwe bajon. Cîrantî, heq, merivtayî wer dibe. Min tu gelekî dereng xistî. Bira, tu li ser seran hatî. Wisa Şukrî. Tu tiştekî me tune ku em bidine wî.

Şukrî cixara xwe qedand. Ferq kir ku ne mîna gava dinê bû. Hinekî bêtir nerm û dil hênik bû. Qehra wî kêm bûbû. Ev Soro çi kesekî başe. Çer xweş dipeyive... Ewên dinê, tu dibêjî ku meriyanre didine çêra. Didine xeberan. Lê evî çûr ne wisane. Zane ku çilo tê xeberdanê. Bi Şukrî xwere wekî berê qise kiribû. Bêteşe, bêteşe xeber nedabû. Li zimanê xwe xwayî bû.

Şukrî ku qerarên gundiyan ji Ûsiv axare got, Ûsiv axa sor, hêşîn bû. Destên wî ricifiyan.

— Çi, çi? Hela tu li van bênamûsan binihêre. Zeviyên kevn û nû jî, yên wanane. Heqê wan bûne. Way ez dê û jina wenim. Way ez devê pêşiyên wenim. Tobe. Tobe. Kuro, evana dînin, bê hişin? Çine lawo?

Dîsa êşê pê girt. Sîngê wî diêşiya. Ya rastî ev bersivan nediecîband. Berêve texmîn dikir. Lê dîsa jî te digot ku tiştên nû bûne. Wilo qehirî. Meriyên malê, ditirsiyan ku tiştekî bêjin.

— Ji bo sihetê te ne başe. Neqehire, got jina wî.

Lê Ûsiv axa wisa bi serde qîrya ku feqîrê êdî devê xwe venekir. Îro jî wisa dest pê kir. Jina Ûsiv axa ji dûrve, bi dilşikestî li halê mêrê xwe mêze dikir. Di eniya wî, dilopên xwîya sar dixuyan. Jinê dîsa deng nekir. Eniya wî mîna gava dinê reş, hêşîn nîn bû lê spîçilokî bû. Wek kaxizeke sipî.

— Hela hinekî bi hemdê xwebe Ûsiv axa. Mêzeke çilo bû rengê te? got jina wî. Lê vê carê, pêre neqiriya. Dixwast ku jina wî û yên dinê alî wî bikin. Jinê dest girt û nermik ew da rûniştandinê.

Ev kes çima awhane? Bûyina tiştekî naxwazin û lê belê texmîn dikin. Paşê jî li ber vê bûyinê perîşan dibin. Gelo meriv çima dixwazin

ku xwe bi xwe bixapînin? Em çima li pêş van tiştên ku em texmîn dikin, wilo şaş û metel dimînin? Çima? Çima? Ji hewîrdora merivan, ew ciyên û kesên ku em di navde mezin bûne... Ji dûr û firehtiya dîtina kesan... Xênji van hela hê jî gelek tişt hene.

Şukrî gotinên gundiyan ji Ûsiv axare got. Paşê gundî ku dihatine ba hev, ferq kirin ku hemûyan mînanî hev bersiv dane Şukrî. Lewra dilteng nîn bûn. Ji hev neşiwêrî, dîsa jî wekî hev didîtin. Bi dîtina wan, ev bersiv bi aqil û baş bûn. Te digot ku yekî hînî wan kiriye. Ne bi hêrs bûn. Wan jî dizanibûn ku Ûsiv axa wê xwestinên awha bide pêş wan. Kesî tiştek nedida. Bi serde jî, tu heqê Ûsiv axa li ser zeviyên kevn û nû tunebûn. Qerarê dilê wan wisa bû.

Wê şevê Soro, Mîro bi hevre bûn. Paşê gazî Seîd û Qasim jî kirin. Gelo van rojan wê çi bibin? Wê çi bihata kirinê? Li ser van peyivîn. Wilo bi hev şêwirîn ku di nav cîranan, malan bi wanre qise bikin. Wisa dihate xuyanê ku gerek meriv bi tivdarekbe. Xênji tamîşbûnê û dij sekinandinê rê nedixuya. Dawiyêde, Ûsiv axa ku neyê rê, wê berî wî bidana, ji gund derxistana. Lewra bi her alî qise kirin baş bû. Bi tevayî û hevre nebûna, wê her tişt winda bikirana.

Rojên pey, di malan, bi van xeberdanan derbas bûn. Şabûna wan dirêj nedikişand. Meriya rind fem dikir. Jin, mêr, hemûyan texmîn dikirin ku tiştên bibin. Kesên mala Ûsiv axa jî wisa. Fem dikir meriyan. Lê bi çavan nedihate dîtinê. Mala axê jî di şik û meraqêde bûn. Car caran meriv xeteran li nêzî xwe nabîne. Ya rastî, naxwaze bibîne. Kêmasîke herî mezine. Mêranî, dijwarî, nav û deng. Kesên ku li pey van tiştên awha dikevin, ew xelqên ku hela hê di bin van dîtinande dijîn, piranî wilone. Caran jî ne weha. Rê namîne ji bo revê. Bo ku tirsa dilê xwe damirîne, meriv naxwaze xeterê bibîne. Di dilê Ûsiv axade, ev herd cure jî hebûn. Nikaribû êdî ji nîvê rê vegere. Berî her tiştî, ew axa bû. Li pêş gundiyan, şûnve gav havêtin, ne karê axan bû. Axa, gere axatiya xwe bizanibe. Xilasbûn, êdî tunebû. Li her derê û li her wextê, wê Ûsiv axa rezîl bikirana. Bê rûmet û bê qîmet. Wê serhevdenên wisa bihanîna serê wî. Wê ew têkirana hezekeke wisa... Çi di destên wîde heye, giştê biçûya, winda bibûya. Wê di dawiyêde biketa bin destên xelqê.

## – XL –

Hine zevî hebûn, li fêza riya Zîlanê. Nîvcî mabûn, nehatibûne ajotinê. Ûsiv axa ajotina wan, bi şofêrre teme kir. Şofêr heta êvarê kêmasiyên xwe hanîne cî û sibêh zû çû li ser karê xwe. Çend caran di berre derbas bûbû, zevî rind nas dikirin. Li hemberekî nizmde bûn. Zûve dihatine çandinê. Zevî êdî westiyabûn. Lê dîsa jî Ûsiv axa van zeviyan pir hez dikir. Nedihatine avdanê. Kêmasîke mezin bû eva. Tiştekî din jî hebû, erdê vira ne hişk bû. Wexta ku baraneke giran barî, ev erdê nerm bi xwere hildida û dibir. Lewra hine salan, zevî di ser hevde radiziya. Caran genim di bin hevde diriziya. Kevir tunebûn di van zeviyande. Dirêjayiya wê, du sê caran qasî bera wê bû. Berê sê, çar malan ev der diajotin. Hetanî hidûdê Zîlanê diçe. Di nava wande aveke piçûk derbas dibe. Hine salan ev ava zûha dibe. Li ser hidûd, tendûrekiyan û zîlaniyan dilên hev dişkênin, lê ne wisa zêde. Herdu aliyan, dîsa jî hidûd rind zanibûn. Ûsiv axa dixwest ku vî hemberî hemû têke zevîkê. Dîtina xwe ji şofêrre got. Şofêr qebûl kir. Eva, ji wîre jî hêsan bû.

Ûsiv axa du, sê saetan li pey şofêr, dixwest ku bi xwe here wira û bi çavên xwe bibîne. Nedixwest ku bi şaşî, têkevine hidûdê zîlaniya.

Zûde li hespa siwar nebûbû. Dilê wî xwe jî dixwast. Hespê kumêyt, zûve di xamêde bû. Kes lê siwar nebûbû. Di nav goştde mabû. Kurê Ûsiv axa, yê piçûk û xulam ku ew dibirine avdanê, dileyst û dixwast ku xwe ji destên wan derxe. Berê, Ûsiv axa ku li ser zînê çerkezî, hespan siwar dibû, ji dûrve dihate nas kirinê. Ji berêve, ji wexta bavêde, hespên rind hez dikir. Vê malê, ji zaran bêtir li hespan dinihêrin. Lê eva çend salin ku kes êdî wekî berê guh nadê. Dîsa jî hemû axa, xwayî hespê rind, zîn û gemên çerkezî anjî spanîne. Hespên ereb, hertim dihatine gotinê.

Van rojan li gund hewake giran hebû. Her roj û her saet, yên ji girtîgehê hatine berdanê, cîranên xwere dipeyiviyan. Qala kesên ku ji bo şerê erdê kiribûn û hatibûne girtinê, dikirin. Yek, dudu jî didane ser. Te digot ku yên nehatine girtinê, ber xwe diketin, çima em jî bi cîranên xwere, di hundirde nîn bûn... Li dijî axan, cînên dinê jî gundiyan şer dikir. Wilo digotin. Paşê, dihatin û digotin ku Ûsiv axa ku neyê rê, emê berî wî bidin, ji gund derxin.

Niha çavên hemûya li ji gund havêtina Ûsiv axa bûn. Çilo bikin, çer bikin ku wî ji gund derxin? Çi tiştekî xerîw bû. Berê ji bo ku erdê xwe

winda nekin, wisa bijîn. Lewra gund terk nedikirin. Ana, piştî du salan, vê jî naxwazin. Berî Ûsiv axa bidin, ji gund derxin. Niha dilê wan bi vê dikeliya.

Gelo bikaribûna an na? Gelo heqê wan hebû, an na? Ya rastî kesî awqasî dûr, dirêj nedihanî bîra xwe. Car caran li ser difikiriyan, lê wilo kiribûne hişê xwe. Bi qerar bûn. Di dilê xwede hêvî dikirin ku wê pê bikaribin. Niha ne wekî berê bûn. Hinekî bêtir rihet û bê tirs bûn. Wisa zanibûn ku gerek wisa bikin. Karên wan eve. Rêke dinê tune. Tirsa windakirinê bi wanre nîn bû. He zanibûn ku eva deynê hustiyê wane. Lewra kesî nedixwast ku vî karî têke hustiyê yekî dinê. Bi xwe, xwe dixwastin.

Gundiyan dît ku li fêza riya Zîlanê traktor erdê dajo. Erdên reşên ajotî li dû xwe dihêle. Banî hev kirin. Xeber dane hev. Derketine ser xaniyan û mêze kirin. Ûsiv axa li hespê siwar û li cem traktorê dihate xuyanê.

Hemûyan dar û çoyên xwe dane destên xwe. Mîna cara dinê, nebû pir qîre qîr. Berve riya Zîlanê çûn. Ne wekî çûyina her roj bû. Bi hêrs û lez dikirin. Hinekan şivên xwe ba dikirin. Çend zar jî tevî wan bûn. Rê ew gişt hilnedidan. Hema, hema gund bi tevayî diçû. Wekî pêlên piçûk. Ji mala axê, kur, jin, bûka wî û yên dinê pare li wan dinihêrîn.Di nava wande, pêsîra Soro vekirî û darekî mezin di destde bû. Bi gavên fireh diçûn. Çend cîranên wî zanibûn ku debance jî li piştê heye. Xwarziyê wî Elî, li herî pêşiyê bû. Dilê wî girme gum bû. Dixwast ku lêxe, bişkêne. Diranên xwe diriciqand. Lêvên wî diricifiyan. Tahir bêdeng, ker û lal, lê dilê wî tijî kul bû. Heyfa diranên xwenên şikestî dihanî bîra xwe. Toz li pey wan quloz dibû.

Rê hiştin û berê xwe dane hevraz. Ber bi jor. Kûr, kûr bîhn distandin. Jina Ûsiv axa, berî giştan ew dîtin. Di riya Zîlanêde qelebalixa wan, bi dar û çove diçûn. Ew dîtin. Te digot ku ji dilê wê tiştek qetiya. Bû girpîna dilê wê. Spîçilokî bû, di pey wan nihêrî.

— Marûf... Marûf... Gundî bi daranve, di riya Zîlanêdene. Li wî yalî diçin. Diçine zeviyê. Diçine cem bavê te. Dîsa, kî çi zane wê çi xeletiyê bikin? Çi gûyî bixwin? Wê belake giran derxin.

Bûk, zar û meriyên malê gişt, derketin der û mêze kirin.

— Way bavo. Way bavo. Tu dibêjî ku diçine şer, got bukê.

Marûf ji qelebalixêre çêr dikirin. Bilde bilda zimanê wî bû. Kesî tiştek ji dêv fem nedikir. Doxtiran gotibûn ku bira hêrs nebe, li ber xwe nekeve.

— Wayê, wayê... Ev çine, tênê serê me? Tu van karên bavê xwe dibînî? Van kûçikên har tiştekî neynine serê me?
Jina Ûsiv axa xwe şaş kir. Kete derdê mêrê xwe. Revî û kete hundir. Marûf û bûk li pey çûn. Marûf milê xwe kire bin istêr. Tiving li vir veşartibû. Li wê digeriya.
— Diya te qurbana te. Wê berde. Kirinekê ji destê te derkeve. Berde wê.
Marûf dixwast xeber bide, her diçû pêrîşan dibû û pê nedihat. Diya xwe dehfand, xwe rikêfî tivingê kir.
— Bihêle... Çi gûyî dixwin bira bixwin. Çûne traktorê. Ewê dîsa xwe xilas bike. Xwe xilas neke jî, tiştek nabe. Bavê te siyare, tiştek bi wî jî nayê.
Xwe avête çokên kurê xwe. Girya. Kurê wê gavek jî nehavêt. Bi du destan, çîpên kurê xwe hemêz kiribû. Bûka wê hate alê. Marûf pir diqehirî. Kef dora devê wî ket. Destên wî diricifiyan. Şûnve çû.
Dîsa derketine derve û lê nihêrîn. Nedihatine xuyanê êdî. Mala wan hinekî di kortêde bû, li bintara gund. Riya Zîlanê, hetanî Kaniya Gurriya tenê dihate xuyanê. Gerek li mal jî serwaxt û hişyar bûna. Te nihêrî ku vegeriyan û hatine vir. Jinan ew, bi zor û zehmet birine hundir. Xulam, virde û wêde çûn, hatin. Lê nedixwastin ku tiştekî bikin. Zarên piçûk, xwe telandine li der doran. Çend pismamên wan hatibûne malê. Bê qerar û bêdeng, li ser piyan disekinîn. Nedixwastin ku wilo destevala li vir bin. Lê tu tişt ji destên kesî nedihat. Diçûne der û dihatin. Derketine ser xanî, nihêrîn. Jin û zarên gundiyan jî li ser xaniyan mêze dikirin. Li alê Zîlanê dinihêrîn.
Şofêr li ser traktorê, di karê xwede bû. Hew hinêrî ku Ûsiv axa li ser hespê kumeyt, hatiye cem.
— Qawetbe.
— Tu saxbî axa. Xwedê ji te razîbe.
— Çilo diçe? Bi zehmete an na?
— Gelekî baş diçe. Erdê vir nerme. Bê kevire. Hetanî êvarê digihêjime tûmî hanê, got. Bi tilya xwe tûmikê li jêr nîşan da.
— Te rind li hidûdê Zîlanê binhêriya. Tu zanî...
— Qet tu ber nekeve axa. Gavek ne zêde ne jî kêm.
Şofêr traktor dajot, Ûsiv axa jî berê hespê xwe berve hemberê Zîlanê kir. Rind hatibû ajotinê. Ji wir, çû serê zeviyê jorîn. Di nav zeviyan, merjarkên hişk bûyin mêze kir. Çend zevî ku bi hevre dihatine ajotinê, êdî ew jî nediman. Xwast dîsa bê cem şofêr. Serê hespê vegerand. Nêzîkî traktorê bû. Rê, di bintara zeviyêre derbas dibû. Di rêde

qelebalix dît. Di destên wande dar, şiv... Deng û qîrîn bihîst. Traktor bi berve wî dihat. Pişta şofêr bi gundiyande bû, hatina wan nedidît. Ûsiv axa nişkêve veciniqî.

— Evên ku tênê, kîne?

Şofêr traktor da sekinandinê. Gundiyên ku tênê, dît.

— Gundiyên mene axa. Dîsa hatin.

Nava wande pêncsed metro, anjî hinekî zêdetir hebû niha. Ûsiv axa her tim debance bi xwere digerand. Lê piştî kopbûna tiliyên wî, rind pê kar nedikir. Gulle kire devê debancê û debanca tezî avête berîka xwe.

— Çi dixwazin? Niha wê çilo bibe?

— Axa, dev ji debancê berde. Li cem wan jî heye. Bê şik. Tu serî pê nakî. Tu nesekine, bireve. Bira tiştek bi te neyê.

— Çilo? Çilo? Ez birevim, te got?

Hespê gema devê xwe dixwar, di binde nedisekinî. Qîjîniya gundiyan her nêzîk dibû. Meriya dengên wan, ji hev ferq dikir. Ûsiv axa hela hê bê qerar bû.

— Ez çilo ji pêş van bênamûsan birevim?

— Lê tê çi bikî? Xênji revê, xilasbûn tune. Zû bike, zû. Tu ku dereng bimînî, êdî bê feydeye.

Ûsiv axa bi înad serê xwe ba kir. Gundiyan dît ku Ûsiv axa li ser hespê, li ba traktorêye. Her lez dikirin. Çend xortên newestiyayî, him didane çêran, him jî ji erdê kevir berev dikirin. Bi rev nêzî traktorê dibûn. Niha di nava wande, sê sed metro ya hebû, ya tunebû.

Yekî ban kir:

— Hinek ji we, bin tarê bigrin. Bira nereve. Berve jor, çend kes bi minre werin.

Qelebalixê xwe berda hember û fireh bûn. Yên pirîn xwe dane jêrê. Hinek jî jorve diçûn. Di nava wande giraniya gundiya, berve traktorê dihat. Bi tevayî nêzîkî sed kesî dihatine xuyanê. Şofêr:

— Tu çi disekinî axa? Tu nanihêrî ku hewar dora me digrin. Nesekine. Nesekine. Wê te bikujin.

«Wê bikujin». Ev pirsa hela hê di devê şofêrde bû ku Ûsiv axa hespê xwe serejêr zengû kir. Hesp ji qelebalixê xûlî bû. Ji pare kevir û dar dihavêtinê.

— Min devê pêşiyên te no. Min dê û jina te no.

— Nereve kûçiksan. Çi mîna jinan direvî?

Nîvê wê qelebalixê berjêr bûn, çûne ser rê. Rê birrîn. Axa, şûnve revî, paşê ji bin tara rê, xwe havête çayiran û çar gavî bezand hesp.

Axa ji wan pir dûr, ana nêzî gund bû. Jin û zarên gund kevir tijî pêş û berîkên xwe dikirin û hatine ser riya gund. Axa ku nêzîk bû, dest bi keviran kirin. Mînanî baranê zîpikê. Ûsiv axa bi zehmet xwe diparast. Vê carê xwe da binya zeviya dibistanê ku kevir lêbûn. Gihîşte riya bajêr. Dûr ket. Çend zar li pey direviyan. Kevir havêtin. Lê axa pir dûr bû êdî. Zarên axê lê kirin ku herine alîkariyê, paşê dîtin ku nayê girtinê, dev jê berdan.

Hinek ji gundiyan di pey axê revîn û kevir avêtinê. Paşê zivirîn. Bîhna wan hatibû çikandinê û hilke hilka wan bû. Yên ku çûne fêza zeviyê, dîtin ku axa revî, di nav toz û xwîhêde serejêr hatin. Nêzîkî traktorê bûn. Di nav ew kesên diçûn, Soro û Mîro jî hebûn. Şofêr li dora xwe nihêrî. Ciyê revê tunebû. Nişkêve tirsiya. Paşê xwe berev kir hinekî. Yên ku jorve dihatin pir nêzîk bûn û didane xeberan. Çêrên nebihîstî dikirin.

— Lawo. Kûçikê kurê kûçika. Tê vê carê kude birevî? Tê niha bibînî.

— Ez diya te jî diya axê te jî...

Çend kesan kevir dihavêtin, pêre, pêre. Traktor dabû sekinandinê û mifte kiribû bêrîka xwe. Rûyê wî di nav tozêde û ber tavê şewitiye. Kiras û şalê wî nav rûn û qirêjêdene. Destên wî mezin û qelişîne. Xwe ji keviran diparast. Du gav pêşde çû. Soro û hevalên wî hê pare, pêncî metro dûrin. Her alî, jê hatibû birrînê. Rast digotin, vê carê xilasbûna wî zehmet bû. Ew bedena mezin, nikarîbû tirsa xwe veşêre. Dilê wî dixiste girme girm. Pênc, şeş kes li pêş, lê bûn ku li wî xin.

— Bisekinin. Çima hûn dîn bûne? Hûn ji min çi dixwazin? Pirsên wî di devê wîde man. Ku xwe nehavîtiba alê dinê, darê hatî, wê serê wî pirtî pirtî bikira. Dengê Soro yî bilind nehişt ku darê duda û sisya lêkeve.

— Bisekinin... Bisekinin. Lê nexin.

Soro, çoyê wî di destde, li pêşiyê direviya. Yên dora şofêr, wekî teyrên birçî, wekî gurên çila... Li ser dengê Soro vekişiyan. Lê dîsa jî didane xeberan. Çêrên nemayî dikirin. Şofêr ji berêve bi Soro bawer dikir. Wexta ku Soro dît, dilê wî rehet bû. Ruh hate ber. Lê ewên cem? Darên destê wan, çavên wanên xayîn? Şofêr xwe li ber mirinê didît. Niha gişt li hawîrdora traktorê bûn. Yek, wekî dîna diqehiriya û diqîriya.

— Hûn çi sekinîne? Çima traktorê naşewitînin?

— Tu, cara dinê xilas bûyî. Kûçiksan. Bê şîro. Tê vê carê çi bikî?

Soro herdu destên xwe bilind kir. Kesî şofêr nexist û dest neda traktorê.

— Bisekinin. Hela bisekinin.

Dengên ne baş dihatine guhê şofêr. Yên pare mayî, yên pêşiyê didehfandin.

— Hûn çi rûyê wî dinihêrin? Çima devê wî, bela belayî nakin?

Şofêr xîret kir. Lê tûk devê wîde zuhabû. Nikaribû xeber bide. Destê xwe da ser tekera traktorê. Rûyên, yên li dora xwe mêze kir. Hemû wekî jehrê tûj bûn.

— Ez we nas dikim. Hûn ne dîn û ne jî semene. Hûn çi ji min dixwazin?

Kesî deng ne kir. Ew guhdarî dikirin. Ji pare dengek hat:

— Zêde xeber nede. Tu li vira çi digerî? Serê me dixî belayê.

— Neqehirin. Çend pirsên min hene, ji were. Hêrsa xwe neynin. Çima ez bi dil û kêfa xwe li virame?

Dengê wî dilerizî. Pêş çavên wî reş dibûn. Gêj dibû. Jin û zarên wî hatine pêş çavan. Niha rehet û bi hemdê xwe bû, hêdî hêdî. Dikaribû bi dilê xwe bipeyive. Hertim, kê tiştek jê dipirsiya wê çaxê bersîv dida. Niha dixwest ku bi wanre qise bike.

— Çima min jî nedixwest? Di ba jin û zarên xwe, tasek girar, bi tevayî bixwim? Hela hûn dest, pî û kincên min mêze bikin. Ev tu halê meriyane. Ne wisane? Gelo çima ez vê kûçelanê dikişînim? Ez jî wekî we birçîme, feqîrim. Lewra. Piştî van salan, min namûs, jin û zarên xwe, di nava xelqêde hiştine, hatime vira. Yê ku distînim, tenê têra zikê me dike. Li bin tavê, berbanga sibê hetanî tariya şevê. Caran şevê jî kar dikim. Hela ji minre bêjin. Çima kî pîjan di minre dike ku ez wilo kar dikim? Ne destê mindeye. Kurê xelqê ku peran bide, meriya awha dide xebatê. Ferqa min û we çiye? Erê? Ez jî yekî wekî weme. Birayekî weme. Hûn çima ji minre dijminatiyê dikin? Wekî dijminatiya birane ev. Hûn şaş difikirin, tênê bela xwe di min didin. Çi sûc û gunehê min heye? Ez derd û kulên we fem dikim. Ez awqasî ne bê femim. Dilê min jî dişewite. Ez jî merivim. Lê çi ji destê min tê?

Yekî pirsa wî birî.

— Wexta dilê te bi me dişewite, tu li vir çi digerî? Çima alî Ûsiv axa dikî?

Li ser vê gotinê, yekî din jî ban kir.

— Raste. Rast dibêje. Tu çima hatî vir, wekî wisane?

— Ez ku nehatama, yekî dinê wê bihata. Şoforên wekî min, karekî dinê nekin, jin û zar hêviya perçek nanbin, wê bênê. Ha ez hatime ha

yekî dinê. Çi ferq heye? Îca, ez nehatama, minê çi bikira? Erê? Ez birçî bimam? Hûn he zanin ku wê şofêr nedîta Ûsiv axa. Ev gotinên we şaşin. Birano.

Dîsa yekî din deng kir:

– Em naxwazim qet, biratiya mînanî biratiya te. Bira qe nebe.

Soro nedixwast ku tiştekî neçê û bê tam bibe. Lewra nehişt, kes zêde here.

– Bisekinin... Bisekinin... Hela dengê xwe bibirin qasekê. Neqehirî bipeyivin. Kê dest daye ser erdê me?

– Ûsiv axa.

– Ê. Wekî wiloye. Tu ev feqîrê xwedê, zeviyên we ji destên we girtiye? Ew jî ji bo keda xwe, Ûsiv axare dixebite. Erdê wî tune. Nexwendiye. Ew jî, xwere şofêrî hîn bûye. Ji bo xatirê me, bira nan nexwe? Erê? Ew jî di halê medeye. Heke ku kar neke, ew jî birçiye. Nexweş bikeve dîsa birçiye. Di bin destê xelqêdeye. Çî wîre, zeviyên me di mehkemêdene. Zevî kinin an dirêjin... Bajo dibêjin, ew jî dajo. Çi sûcê wî heye? Nanê xwe wilo bi dest dixe. Ez jî wisa bawer dikim ku ne dijminê meye. Ji bo çi, mere dijminiyê bike? Me çi kiriye?

Yek, dudu di ber xwede xeber didan. Mîro dengên wan birî.

– Kerrbin. Hevalê xwe guhdarî bikin. Çi xeber didin di nav xwede?

Hêrsa giştan kêm bû. Yên der doran jî hatin. Qelebalix zêde bû. Ji çav, rûyên wana wisa dihate xuyanê ku heq didane van gotinan. Ew nihêrandinên bi dijminayî, li ser şofêr, hêdî hêdî belabûn. Hinekan bi dostî mêze dikirin û gunehê wan pê dihat.

Şofêr hela hê dilxemgîn û bi çav kelogirî bû. Dît ku ew xeber nadin, dîsa dest pê kir.

– Niha ji minre bêjin. We dixwast ku li min xin. Traktorê jî bişewitînin. Çima? Em herdu jî ji axêre xizmet dikin, lewra. Ne wisane? Çi gunehê min heye? Bira traktor ya we biya. Perê we hebûya. Wê çaxê minê bihata, ji were kar bikira. Nanê min ji vir tê. Hûn ji traktorê jî diqehirin. Yên ku ev traktora çêkirine, gotine bira zûtirê û kûr erdê bajo. Bira zevî ji berê pirtir bidin. tu kesî nefikiriye ku bira ev traktora here, erdê tendûrekiyan ji destên wan bigre. Ku ji were kar kir, erdê we ajot, wê çaxê kara traktorê wê bigihêje we. Ne wisane? Tu sûcê traktorê jî tune. Sûc û guneh di cîkî dinêdeye. Hûn li zeviyan nebûne xwayî. Axa dest daye ser. Heke ku, zevî ne di destê Ûsiv axade, di destê wede bûna, çi karê min hebû li vir? Ezê ji were bixebitîma. Wê çaxê we bi minre dijîtî nedikir. We traktor nedişikênand. Weyê ji wê hez bikira.

Dengê wî ket. Bîhna wî çikiya. Soro pêşde çû. Destê xwe da ser pîlê wî.

– Min bibaxşîne bira. Me ji Ûsiv axa pir kişand. Lewra em baş nefikirîn. Hinek hevalên me şaş xeber dan. Tu jî nexeyide. Te dît ku ev du salin çi nehate serê me? Lewra ji bo te wilo hate gotinê. Tu jî birayê meyî. Ne dijminê me. Tu jî, ji axêre kar dikî. Kîngê bixwaze, dikare rê bide te. Tuyê ji me jî bêtir perîşanbî.

Ûsiv axa ji destên wan filitî û xilas bû. Xwastin ku heyfa xwe ji şofêr û traktor hildin. Niha, destevala mabûn. Her wekî ku tiştek tê bîra meriya. Tiştekî ku meriya ji bîr kiriye. Wê çi bikirana?

– Gerek Ûsiv axa ji gund derkeve. Ciyê wî, êdî li Tendûrekê tune. De zû... Emê heta kîngê li vira çîrokan guhdarî bikin?

– Hela bisekinin. We ji dest derxist, Ûsiv axa. Mala wî, jin û zarên wî, bar bikin, ji gund derxin. Diçine ku bira herin. Ewî tu ji me dipirsî ku emê herine ku... Ciyê we yên çûyinê hene an na.

– Raste. Rast dibêje Seîd. Em vegerine gund. Aha, traktora wî. Emê, mala wî têkine traktorê û ji gund dûr bixin.

– Erê walle. Pardon ji tere Seîd. Ya rastî eve.

– Hûn hêviya çine niha?

– De ha. Têkevine rê.

Hinek ji wan, serejêr, berve rê çûn. Soro û Mîro tiştek negotin. Gundî bi tevayî û bi qerar bûn.

Heke ku Ûsiv axa li vir bûya, ji bo xilaskirina canê xwe, wê qebûl bikira. Lê belê ew reviya. Bi çar gavî hespê xwe ajotibû. Wisa dixuya ku çûye bajêr. Çûye ba cendirme qumandarî. Di sêrîde derd û kul, wê dest pê bikin. Mal û jina Ûsiv axa, Marûf û yên dinê hatine bîrê. Evê çi bibûna? Lê wekî, gundî dîntîkê, bê aqiltîkê bikin? Wê çawa pêşiya wan bigirta? Lê ku, bûyereke pir xirab ji destên wan derketa? Piramiya gundiyan êdî bi rêde, berve gund diçûn. Soro her tişt ji şofêrre got.

– Tu gundiyan dibînî. Ditirsim ku xirabiyê bikin. Mala Ûsiv axa... Alî me bike? Emê çi tehrî pêşiya nepakiyê bigrin? Gerek mala Ûsiv axa bîr û bawer bike. Bira bihêlin herin. Ji vir ha, di gundde, cîrantî û bi hevre baş rêçûyin nabe. Gelek zahmete. De zû bajo. Lez bike. Here mal. Her tiştî ji wanre bêje. Bipeyive. Ezê jî bigihîjime gundiyan, ji pare bêmê. Zû... Zû. Alî me bike. De tu birayê min kiribî.

Şofêr mifte ji bêrîka xwe derxist û motor bi rê xist. Millê pûlixê bilind kir û ji motorê qetand. Paşê ku cem gundiyanre derbas dibû:

– Soro dibêje ku bira li hêviya min bisekinin. Bira neçin, heta ez têm. Wê bi were bipeyive.

Dixwast ku zûtirê here. Waxta ku gihîşte ber derê malê, Marûf dê û jina wî û yên dinê, li ber derî, bi meraq li benda şofêr bûn. Gundî hê li dûr bûn. Meraq dikirin ku şofêr çawa ji destên wan filitîbû. Li ser xaniyan, li ber deriyan jin, zarên gund li riya Zîlanê dinihêrîn. Hemûyan li rûyê şofêr mêze dikirin. Gelo çawa xilas bû? Jê pirsîn. Wî:

– Çi tehrî xilasbûna min bihêline alîkî. Têne vir. Min traktor xilas kir. Lava kir. Hezar tişt ji wanre got. Dilê wan bi min şewitî. Gunehê wan hat. Tên. Dixwazin ku we bi maltî, tevayî, ji gund derxin. Nebê, nebê hûn li dij derkevin. Wê we perîşan bikin. Xêrê di malêde nahêlin. Min ew dîtin, çilone. Xwedê nîşanî kesî nede.

Jina Ûsiv axa:

– Ev çiye tu dibêjî? Tu dînî, semeyî? Emê mala xwe bihêlin, herin ku? Ya ku anîne serê kurê min, ne besî wane? Qet fedî nakin? Way bê namûsên bê namûs.

Şofêr vegeriya li Marûf mêze kir. Ewî, bi zehmet, xwast ku xeber bide.

– Na... Na... Nabe, got.

– Xanim, ware neke. Neke vê yekê. Nava we wisa xirab bûye ku... Kes kesî guhdarî nake. Ez çawa xilas bûm? Çer filitîm? Bi zehmetê dinê. Yekî darek hanî serê min. Wê mêjiyê min birijanda erdê. Xwedê ez xilas kirim. Paşê ku we nihêrî hine zelalî çêbû, hûnê dîsa bênê. Niha malê û xwe biparêzin.

– Ûsiv axa... Lê Ûsiv axa, wê ji mere çi bêje? Wê me giştan şerjêke. Tu çawa wisa dibêjî?

Vegeriyan, nihêrîn. Qelebalix di nav tozê, ji yalê Zîlanê dihat. Ji sûr û baxçê wan wêde. Şofêr dît ku gundî her nêzîk dibin, careke din jî ceriband. Lê nebû. Kesî qebûl nedikir.

Bi nêzîkbûna gundiyan, tirs û xof kete dilê hemûyan. Marûf çû hundir ku tivingê bîne. Diya wî û şofêr bi milê wî girtin û nehîştin.

– Lawê min. Yên ku hatine serê me, ne besî mene? Bihêle wê mîratê. Xirabî bira ji destê te dernekeve. Debanca te di bêrîka tedeye. Ez qurban, dest bi wê jî mede. Bi girî:

– Dest medê. Şîrê xwe li te helal nakim, heke ku tu tiştekî bikî.

Qelebalix bû du çîqa. Yên pirîn, di riya bin baxçere dihatin. Hinek jî, fêza baxçere. Qasekê şûnde, wê li ber derî bûna. Jin, zarên li ser xanî û ber deriyan jî hêdî hêdî berve mala axê dihatin. Dora malê niha dihate girtinê. Wekî defikekê.

Jinên mala axê, zarên xwe birine hundir. Zar digiriyan û ji tirsa xwe dispartine hevdu. Ji mezinan nediqetiyan. Jin jî wekî zaran bûn. Ma-

rûf, xulam û pismamên wî li cem, li ber derî bû. Qelebalix bi deng û hela hela pir nêzîkî malêne niha. Şofêr berve wan çû û destê xwe bilind kir:

– Deqîqekê... Hela qasekê bisekinin. Min guhdarî bikin.

Ew kesên ku bi hêrs dihatin, sekinîn. Soro û Mîro jî di nav wande bûn.

– Çiye? Emê çima bisekinin? got yekî.

Soro bersiva wî da.

– Hela bisekinin. Çiye? Çi dibêje mêrik?

Wê çaxê kevirekî mezin hat li pencera odê, ya alê baxçe ket. Bû şingîniya şûşên şikestî. Mîro bi qehr û dengekî bilind:

– Wisa mekin. Wisa mekin.

Dengê xwe birîn. Marûf hundirqetî bû. Ji nişkêve awqas meriv li pêş. Gişt jî bi qehr û kîn. Nedikaribû pêşde here, ne jî şûnve here malê. Dilê wî nedixwast ku tirsa xwe, bi wan nîşan bide û têkeve malê. Qîre qîra wan bûn. Didane çêra. Pirsên nepak digotin.

Şofêr rast digot gava dinê. Belê, vê gavê, van kesên çavsor dikarin her tiştî bikin. Dîntiya ku nekin tune. Şaşiyek, pirseke neçê besî her tiştî bû. Bi çavên xwe dît. Soro û Mîro nebûna, ana zûve mal hilşandibûn. Şofêr nêzî Soro bû û bi dengekî nizm:

– Nebû. Bawer nakin. Dê û kur bi hevre ketine inyatê. Qebûl nakin.

– Ê. Emê çawa bikin niha?

– Nizanim.

Yên pêşiyê hinek tişt fem dikirin. Soro bi alê wande zivirî:

– Ez diçime hundir. Nebê, nebê yek tiştekî xirab bike. Xwedê zane ku berî giştan ezê li dijî wanbim. Şerme, eybe. Wekî pêxasan, wekî tolazan nekin. Di nava dinêde xwe rezîl nekin.

Soro, Mîro jî hilda ba xwe û bi şofêrve çûne malê. Panzde metro pêşde çûn. Hatine pêş Marûf. Marûf wekî dînan bû. Vê qelebalixê ew kiribû vî halî. Lê dît ku ne wexta dînitiyêye. Bi aqil bi hemdê xwe, li yên hatî dinihêrî.

– Bibaxşîne Marûf. Were em li hewşê xeber bidin. Çend pirsên min hene, ez ji tere bêjim.

Kin, kurt digot. Wekî ku emir dida. Wekî emirên ne wisa tûj. Marûf gura wî dikir. Şûnve çûne hewşê. Xulam û pismamên wî çûne alê malê.

– Binhêr Marûf. Ez gelekî ber xwe ketim... Ji vanên bûyî. Gişt jî bê dil bûn. Lê ev du salin ku bavê te xwîn ji bêfila me gundiyan tîne.

Cîrantî, merivtî û rewş nema li gund. Dostî nema. Dijmintî hate dewsê. Ûsiv axa wilo kir. Tu dibînî. Qet yek ji me, nikare pêşiyê bigre. Ez lava dikim, li ber te digerim. Bira nepakî çênebe. Naxwazim...

Wê çaxê diya wî jî hate cem wan.

— Soro, min he zanibû ku tu bi aqil û bi namûsî. Tu jî tevî van berdûşan, van tolazan bûyî? We derî li me girtiye. Hûn ji me çi dixwazin?

Marûf nikaribû xeber bide. Guhdarî dikir. Soro li diya wî zivirî û got:

— Neqîre. Neqîre wisa. Bi hemdê xwe xeber bide. Ev pirsan ne yên gotinêne. Tu ji min mezintirî û jinî. Dewsa diya minî. Ji tere hurmet dikim, lê belê, awqasî jî pêşde neçe.

— De bira wisabe. Belê, belê. Hûn çi dixwazin?

— Ez naxwazim. Ez tiştekî naxwazim. Gundî hemû, dixwazin ku hûn ji gund derên. Dibêjin ku zeviyên me ji destên me girtin. Gund vala kirin. Dijmintî kete nava me. Em êdî nayênê ba hev. Ji vir ha, qet qet nabe. Lewra tu were, bi pakî vê qebûl bike. Li dij nesekine. Tu û Marûf wekî Ûsiv axa nekin. Bese. Yên bûyî bese êdî. Min cara dinê jî Marûf neparast, erê? Te bi çavên xwe nedît? Mêrê te her tişt havête hustiyê min. Aha, lê binhêre. Ev neynûka mine kişandiye. Dîsa jî ez naxwazim ku xirabî derkeve. Te li ber derî, hemû dîtin. Mal, milkê we heye. Hûnê li bajêr, ji vir xweştir bijîn. Hêrs û qehra gundiyan ku derbas bû, werin li zeviyên xwe bibine xweyî. Dixwazin bifroşin, dixwazin bidine îcar.

Li ser van pirsan jina axê piçekî nerm bû. Paşê Ûsiv axa hate bîrê. Wê ew bikuta, bikuşta. Wê wisa bikira ku nedihate serê tu kesî.

— Tobe, tobe. Ezê çawa mala xwe bihêlim, herim? Hûn rêbirin? Hûn çine? Hûn qet ji hukumatê natirsin? Ûsiv axa wê me hemûyan bikuje.

Soro rind zanibû ku tirsa wê ji mêrê wêye.

— Em ne rêbirin. Ne jî dizin. Ne jî li ser malê xelqêde digrin. Te dît ku ev du salin, em çi dikşînin? Tu qet rojekê nezivirî û te ji mêrê xwere negot ku vê neheqiyê meke. Ev pirsên ku ji mere dibêjî, çima te qet nîvê nîvê wan jî, ji Ûsiv axare negot? Çima em jî ne meriv bûn? Me awqas sal cîrantî bi hevre nekiribû? Porê te sipiye. Ji tere hurmetê dikim. Tu çawa ji mere eşqiya, rêbir dibêjî? Tu qet ji xwedê natirsî? Ez hatim ku we biparêzim. Bira nepakî çênebe. Li te lava dikim. Wisa neke. Berde vê înadê. Nekeve gunehê awqas kesî. Nekeve bin gunehê zaran.

Çend gav pêşde çû. Xwast ku yên pêş xanî, bi Marûf û diya wî nîşan bide. Dibe ku bênê rê. Hela hê vê qasêde bû ku dengê gundiyan hate guhê wî.

– De zû, lo. Çi bû Soro? Bese êdî.

Van dengan têrî hişyarbûna Marûf û dê nebûn. Soro:

– Werin... Hela werin. Ji vir bibînin. Ez li vir, ne li ba webim, hûnê bibînin çi dibe. Nasekinin... Çima hûn nabînin? Hûn korin çima?

Dê û kur bi meraq, di devê dêrîde, li der mêze kirin. Panzde, bîst gav ji wan dûr, qelebalix bi hêrs û qehr û destên wan tijî dar û ço bûn. Bi tirs û ricaf xwe şûnve kişandin. Marûf wekî gêj û seman bû. Soro û diya xwe guhdarî dikir û bêqerar li dora xwe dinihêrî. Qehr û berketin jêre ne rind bû. Dê li rûyê wî mêze kir. Dît ku halê wî ne başe.

– Birabe. Bira wisabe. Xwedê ji were qebûl neke. Bira bi gotina webe.

Kete milê kurê xwe û çû odê. Li ser balîfekî da rûniştandinê. Marûf bêdeng gura diya xwe dikir. Diya wî bi girî çû yalê malê, ba bûkê û zaran.

Xulaman niha nivîn kom dikirin û li hev dipêçandin. Qutî û tiştên giranbiha yek û yek li pêş xanî rêz kirin. Eyarên rûn û penêr. Çiqas tiştên giranbiha hene dixwastin ku bi xwere bibin, hetanî ku ji destên wan dihat. Yên mayî, wê têkirina odan û derî li ser mifte bikirana.

Soro û Mîro pirs dane wan ku tu tişt bi mala wan nabe. Ewên lê bibine xwayî. Şofêr yek û yek, tiştên malê li romorkê cî dikir. Gundî, ji ciyên xwe nedilipitîn. Rûyên wan şa, çavên hemûyan dibiriqîn. Ku ew tiştên giranbiha dinihêrîn, diziviriyan di nav xwede qise dikirin. Jin û zarên gund hatine jêrê, ber goma Ûsiv axa. Xulamı û jinan mal dikişandine romorkê. Devê kesî venedibû. Xeber nedidan. Te gulle jî berdayê, xwîn ji kesî nediqutî, nedihat. Romork tijî bû.

Jin û zar di nav nivînande dane rûniştandinê. Marûf te digot ku di xewêde digere. Qet haya wî ji kesî tune, li dora xwe mêze dike. Wekî makîneke. Te digot ku bê ruhe. Kî çi dibêje, Marûf wilo dike. Nabêje na. Niha, hemû digiriyan. Heta niha piçekî tamîş bûn, hêsirên xwe girtin. Lê êdî pê nikaribûn. Bi deng û qîrîn digiriyan. Ew gundiyên ku gava dinê şa û bi rûken li wan mêze dikirin, ne wisa bûn niha. Dilê wan jî kizirî. Giriyê mala axê ew şa nedikirin.

Jina Ûsiv axa teme dane xulaman û ew şîret kirin. Wê zûtirê bihatana ji bo tiştên mayî. Wisa bê serî xwe nedihiştin. Hela ka Ûsiv axa çi dibêje? Hilkişiya ser romorkê, cem bûka xwe û:

– Xwedê qebûl neke. Xwedê vê ji were nehêle, got.

Him digiriya û him jî bi lêçega serê xwe çavên xwe zuha dikir.

Bê dengî... Wekî maleke ku mirî têdebe. Dengên yek, dudên ku digiriyan têne. Şofêr xwast ku zûtirê ji vir dûrkeve. Vegeriya alê Soro û Mîro nihêrî. Gelo çi dixwast ku ji wanre bêje, bi çavan? Lez kir...

Motor li kûça pişt gomê, berê xwe da riya bajêr. Wî hevrazîde toz li pey bilind dibû. Wekî ewrên payizê. Toza wan jî bi wanre diçû. Li pey çûyina motorê, gundî hatin ber derê Ûsiv axa, ji wir berve nava gund bûn. Meriya nizanibû ku şa dibûn an ber xwe diketin, ji rûyên wan nedihate kifşê. Şabûn... Lê şabûneke ne bi dilgermî. Di alîkîde şabûneke bê tem. Merivên ku dilşa dibin, tu wehane? Rûyên wan bi ken, tîrj nedidan. Merivên ku him karê û him zerarê bikin. Wilo bûn.

Giriyên jina, hustuxwarbûna zaran... Ew Marûfê wekî kirêca cemidî. Li tendûrekiyan hemûyan xweş nedihat. Mal li hêviya xulaman hiştîbûn. Rojekê berê, ew mala mezin, bi dû û ocax. Di nav çend saetande vemirî. Çû... Çû... Hemû dilşewitî bûn. Nedixwastin ku ocaxê yekî, mala yekî damire. Tûr û tepez bibe. Lê di alê dinêde, ji Ûsiv axa xilas bûbûn. Pariyê devên wan jî, ji destê wan digirt. Lê bû ku çavên wan derxe. Çawa şa nebin? Di xewna xwede bidîtina, dîsa jî bawer nedikirin. Ûsiv axa ku qebûl bikira, ew bi her tiştî razîbûn. Lê axa nedihate rê û nedixwast. Niha êdî Ûsiv axa tunebû. Ji vir ha, wê bi xwe, serê xwe bûna. Wê rehet bibûna. Bi salan hesreta vê rojê kişandibûn. Li van herdu salên dawiyê, her bêtir. Berve malên xwe diçûn. Dil û hişên wan tijî û giran bûn. Di dilê xwede digotin ku «hela hê neqedyaye.» Wisa jî bû. Soro ji yên dora xwere:

— Ûsiv axa li bajêre. Heke ku qasekê şûnde, cendirman tijî gund neke, rinde. Dibe ku koça mala xwe di rêde, şûnve vegerîne. Lewra, wisa xwe bernedin. Bi tivdarekbin. Bela xwe bi cendirman nedin. Li dijî wan dernekevin. Ku wisa nebû, em çûn. Kes nikare me xilas bike. Ew li me xin jî, ji mere bidine çêran jî... Pirsên nemayî ji mere bêjin jî, em bersivê gere nedin îro. Ûsiv axa bizanibe ku vê carê karê wî zehmete, cil bi giranbihaye... Ew jî nasekine. Di dawiyêde ewê jî here. Bira fem bike ku li vir mêranî nabe. Ew besî wiye.

Xortekî:

— Hetanî ew jî nekeve halê kurê xwe, nayê rê. Baqil nabe. Kopbûna tiliyê, têra wî nekir. Gerek dev û pozê wî biçûya. Te wê çaxê bidîta, got.

Mîro li alê çend xortan zivirî û:

— Dîn nebin. Dev û poz şikênandin ne kare. Bira xwîna wî nekeve hustiyê me. Bira nebe bela serê me. Derdê me ewe ku em wî ji gund

derxin. We ku destê xwe bi xwînê xist, êdî hûn nikarin bişon. Semetiyê, bê aqiliyê nekin. Eman... Eman...

Soro serê xwe pêre hejand. Kete nav pirsa wî.

— Heta niha, heta vir, hela hê baş diçe. Şaşî û xeletîk her tiştî şûnve dizivirîne. Eman ha. Xortno, ji were dibêjim. Gura mezinan bikin. Berî wan tevî tu tiştî nebin. Nesitiriyê nekin. Hişyarbin. Yê zehmet û dirêj çû. Pir nema êdî. Lê şaşiyê û xeletiyê qet qebûl nake. Ûsiv axa bi cendirmanve, nava du saetande, wê bê. Ya xêr ewe ku Ûsiv axa bitirse û şûnve neyê. Mala xwe şûnve venegerîne. Hema ku carekê çû, êdî şûnve hatina wî li gund, ne hêsaye.

Gundî li malên xwe bûn. Saetek, dudu derbas nebûbû, hela. Deng dihatin.

— Li ber derê mala axê jîpek sekinî. Cendirme, Ûsiv axa û qumandar jê peyabûn.

Vê carê ew nermbûna wê sibehê tunebû. Dilê kesî nedişewitî êdî. Ji hemû malan qelebalix derketin. Tirsa cendirman, qumandar û şûnve hatina axê hate ber çavên gişta. Serejêr, berve mala axê çûn.

Ûsiv axa li ber derê xwe, him berve wan dihat û him jî dê û jin dida xeberan. Çêrên ji doxînê jêrve dikir. Qumandar û çar cendirme nêzî wî bûn. Ji xulaman tiştin pirsî axê.. Ûsiv axa wekî dînan bû. Çi dihate ber devê wî digot. Reş hêşîn û kef bi dora devê wî diket. Pêsîra kirasê wî vekirî û sîngê wiyî bi pirç li derve bû. Çêrên wî, gundî aciz kirin. Her bêtir hêrs dibûn û diqehirîn.

Soro mecal nedît ku ji kesîre tiştekî bêje. Hinekan kevir havêtine Ûsiv axa. Ewî him xwe diparast û him jî dida xeberan. Çend kesan xwe pêre gîhandin, şivek, dudu lêxistin. Paşê dev û serî bi tevî hev bûn. Qumandar jî şaş bû. Qet texmîn nedikir. Her tişt ji nişkêve bû.

Soro ji yê pêşînre diqîriya:

— Lawo, hûnê mêrik bikujin. Lê mexin.

Ûsiv axa ber bi erebê reviya. Yekî ji pare, darek lê war kir. Lênekct. Derê malê nişkêve tevî hev bû. Jin û mêr bi hevre. Qîrînî bilind dibû. Kesî kes nedibihîst. Dengê gullan dest pê kir. Jin bi teqîniya gullanre qîryan.

— Way xwedê mala we vemirîne. Xwedê ji were nehêle. Gullan berdidinê. Wayê... Wayê... Gullan berdidinê.

Dîtîn ku gullan berî ezmana, berî hewa didin, hinekî nerm bûn. Dengê xwe kêm û nizm kirin.

Cendirman, tendûrekî ji qereqolê nas dikirin. Qumandar ji wan xwast ku gundiyan bi singû û qûntara tivinga dûrxin. Qelebalixê bela

bikin. Lê cendirma destê xwe wisa sivik negirtin. Li kesî nexistin. Tivingê xwe bilind dikirin û dihanîn ku lêxin. Lê ne bi dil. Te digot ku koze berx berdane nav keriyê miyan. Heke ku cendirman wisa nekirana, çend kesên birîndar û bûyerên ne baş wê bibûna.

Qumandar dît ku Ûsiv axa revî û xwe havête jîpê. Xeter nemabû êdî. Şewqê wî li nav piyade ma û serî wî şikestibû. Lêva Ûsiv axa jî qelişîbû. Xwe havête pişt şofêr. Bîhna wî çikiyabû.

— Wê min bikujin. Wê min bikujin... Eman, lawê min zû bajo. Min ji vir xilas bike.

Şofêr jîp da ber kar kirinê. Bi lez pêşde ajot. Ji gundiyan yek dudu xwe bi zehmet ji pêş jîpê xilas kirin. Banzdan alîkî rê.

Ûsiv axa destê xwe bire serê xwe. Xwîna germ tevî pirça sîng û tara hustiyê wî bû. Xwîna dora devê xwe dalêst. Bîhna xwînê, hetanî mêjiyê wî çû. Paşê tû kir. Jîp ku bi lez û bez diçû, hela hê êşa bedena xwe, tê dernedixist.

Ji pare kevir dihavêtin. Hinek li jîpê diketin. Nikribû bipeyive. Diricifiya. Tenê:

— Zû bajo. Zû bajo. Ji vî gundî bênamûs dûrkeve. Kurên qehpikan, tu dibêjî dîn û har bûne. Wê min bikujin, digot.

Destmal derxist, bire serê xwe, paşê lêva birîndar. Ji gund dûr ketibûn êdî. Şofêr hinekî leza jîpê kêm kir. Vegeriya, li rûyê Ûsiv axayî bi xwîn mêze kir.

— Hella... Hella. Ev çibû îro?

— Qet nepirse. Ez dê û jina wan.... Way kurê keran. Way tolazên ji dola tolazan. Ji xwedê û pêxemberan natirsin. Rêbirîne eva. Ya rastî rêbirîne.

— Qumandar wê li wir çi bike? Ewê çawa bê?

— Motora ku me rêde da zivirandinê, wa ji wêde tê. Wan bide sekinandinê. Ezê bi wanre şûnve herim. Tu jî here ba qumandar.

Şofêr ji bo sekinandina motorê îşqa erebê vêxist û damirand çend cara. Motor ji kevanê xelas bû, berve wan dihat. Nêz bû û li cem wan xwe da alîkî, sekinî. Yên li ser traktorê di nav tozêde mabûn. Nedihatine naskirinê. Tozeke reş û gewr li ser wande girtibû. Xênji diranên wan, her der di tozêde bû. Şofêrê jîpê fren hilkişande jorê. Ûsiv axa hêdî hêdî xwe livand û peyabû. Pişt, ser û hustiyê wî bi tevayî diêşiya. Jina wî, Marûf û yên dinê, Ûsiv axa di nav xwînêde dîtin. Jin û bûka wî li çokên xwe dixistin û rûyên xwe dirûçikandin.

— Bênamûsno. Mêrkujno. Dizno.

Jina wî berî giştan gihîşte Ûsiv axa. Ji salên wê nedihate texmîn kirinê. Banzda hat.

– Wayê... Wayê... Ev çine, tênê serê me? Mala me şewitandin. Em wêran kirin. Mala we serê wede hilşe, erê walle.

Marûf û şofêrê traktorê jî hatin. Dîtin ku Ûsiv axa ne birîndarekî girane. Jê re:

– Emê niha çi bikin axa? Li kîjan alîde bajon?

– Qet. Ezê jî bi were bizivirim.

Jîp şûnve dûrket. Bi alê Tendûrekêde qulibî.

– Bira deynê hustiyê minbe. Hûn ji min bixwazin. Heke ku ez di dê û jinên we nenim... Bira ji minre jî Ûsiv axa nebêjin. Ku min yek ji we li gund hişt, ez ne merivim. Pir dûr nakişîne. Hûnê bibînin. Ez vê ji were nahêlim. Sekbavno.

## Weşanên Weşanxana Kurdistan

**Rêza edebiyatê:**

Aşitî, Dîwana 8'a, Cigerxwîn, Stockholm 1985
Nehc-ul Enam, Mele Xelîlê Sêrtî, Stockholm 1988
Zeviyên Soro, Nûrî Şemdîn, Stockholm 1988
Berbang, Erebê Şemo, Stockholm 1988

**Rêza dîrokê:**

Dr. Kemal Mazhar Ahmed, Birinci Dünya Savaşı Yıllarında Kürdistan ve Ermeni Soykırımı, Stockholm 1986
(Kurdistan Di Şerê Cîhanê Ya yekemde û Qetlîama Ermeniyan)

**Navnîşan**

BOX 16139
103 23 Stockholm, Sweden




Weşanxana Kurdistan
Publishing House of Kurdistan
ISBN